# Ji Haysivê heta Stockholmê



Kazim Budak

**Ji Haysivê heta Stockholmê**

*Ji Haysivê heta Stockholmê*
© Kazim Budak

Wêneyên bergê: Haysiv
Apec tryck & förlag, 2015
ISBN: 978-91-86139-97-1

# Ji Haysivê heta Stockholmê

Kazim Budak

# Naverok


Pêşgotin ........ 9
Haysiv ........ 11
Bavê min Silêman ........ 15
Dergûşkêrt ........ 17
Xatûna Bûdê neqil dike ........ 18
Tarixa ji dayikbûna min nediyar e ........ 20
Çavêş ........ 21
Dibîstana destpêkê ........ 22
Dibîstana navîn ........ 30
Derba leşkerî ya 27ê gulanê ........ 32
Boyqota yekem ........ 33
Dîsîplîn an ceza? ........ 33
Li Çolîgê (Bîngolê) ........ 36
Parxonek – Çavuşlar ........ 41
Ez terim leşkerîya tirkan ........ 42
Keferabît-(Avuttepe) ........ 43
Li Çolîgê li dibistana Yenîşehîrê ........ 45
Li Çolîgê rojî ya remezanê ........ 46
Di tiyatro de Kurdistan ........ 47
Li Gazî Egîtimê ........ 48
Dadgeha çar kurdên welatperwer ........ 51
Li Tirkîyê hilbijartina parlamentarî ya 1969an ........ 52
"Ma şoreş bi xwîna mirişkên min tê nivisîn?" ........ 54
Faşîstan di zanîngeha Gazîyê de xwîn rijand ........ 55
Rojnama duwar ........ 55
Li Kurdistanê zilma qomando ........ 57
Em çar heval dixwazin herin kampa Filistînê ........ 59
Komela Dêrsimê ya Çandê, li Enqerê ........ 60
Di 12 adara sala 1971an de cunta leşkerî dest da ser hukim ........ 62
Êrîşa polis a li ser dibistana Gazî Egitimê ........ 64
Erdhejîna Bîngolê ........ 65

Ez hatim azad kirin ....72
Li Dîyarbekirê binçavkirina min ....75
Girtî Ezerîyê Îranê bû ....80
Ava sar li cem Musa Anter....81
Îbrahîm Qaypakkaya ....83
Midurê ajan ....83
Erdhejina Licê....92
Boyqota xwendevanên Lisa Dêrsîmê ....94
Sloxana Tuj! "KURDARA AZADÎ"(29ê Sibat 1976) ....97
Sibat 1977an de li Dîyarbekirê dijî faşîzmê xwepêşandan ....101
Komcivîna TÖB-DERê ya liqê Dîyarbekirê....103
Kuştina Endamê TOB-DER ê Şêxmus Hacıyusufoğlu ....105
Zewaca min ....107
Şeva piştgirîya gelê Kûba û Filistînê ....108
1ê Gulana 1977an ....110
Li Tirkîyê hilbijartina parlementoyê (5ê Hezirana 1977an) ....116
Di 11ê çileya pêşin 1977an de hilbijartinên şaredarîyê hatin çêkirin....118
Kongra navenda TÖB-DERê ya 4.emîn (21- 24 Tebax 1978) ....123
Greva firinciyan....127
Şerê navbera Yekitîyê û Qiyade Muwaqet....128
Karê minê nû ....130
Mehdî Zana ji Partîyê hat durxistin....132
Grewa karkerên Şaredarîya Dîyarbekirê (8 Tebax 1979) ....132
Hilbijartina nunertîya DÎSKê ya Herêmê (6ê Gulana 1979an)....134
Bîranîna 15-16 Hezîranê....135
Deklarasîyona Hevkarîya Demoqratîk a Netewî (UDG)....137
Kongra (PSKT) Partîyê ya yekem (1ê Çilê Paşin 1980) ....139
Li Dîyarbekir bûyera sinema Dîlanê....141
Dixwazim ji Dîyarbekirê derkevim....146
Vedigerim gundê xwe ....150
Hatina cunta faşîst a leşkerîya 12 îlona 1980....154
Gund û welatê xwe di terikînim....156

Bê tedbîrîya me hindik mabû ku me bide dest ... 160
Derbazî Rojava dibim ... 161
Mala me ya nû ... 165
Civîna Şamê ... 179
Namên ji xerîbîyê ... 189
Ozan Enver Gökçe mir ... 192
Kesên dilcewahîr ... 192
Li Beyrutê ... 199
Şiîr nivisîn an ji xîyar firotin? ... 233
Osman Sebrî ... 233
Necmettin Büyükkaya ... 235
Mamoste ez nizanim ... 235
Bi zimanê erebî ez kurd im ... 235
Rapora ser xebat û rewşa partîyê ... 236
Yilmaz Apaydin xwe kûşt ... 251
Li Şamê têkilîyên hêzên Kurdistanî û Tirkîyê ... 253
Ji bo nîqaşê mijarên ku hatibûn tesbîtkirin ev bûn: ... 253
Di derheqê civînê de ji hin prensîp hatin destnîşan kirin: ... 254
Di zindana Dîyarbekirê de berxwedan heye! ... 255
PDK-I ra têkilîyên me ... 260
Nama Kemal Burkay di derheqê hin bûyeran de agahî dide ... 267
Nexwaşîya kekê Mistefa gran dibe ... 268
Ez li Swêd im ... 271
Kekê Mistefa (Apê Selîm) çû ser dilovanîya xwe. ... 281
Bavê me 30 agustosê 1984 de wefat kir ... 291
Nurê di nama xwe de di derheqê vê nûça de usa nivisîye. ... 292
Ozanê gelê Kurd Cîgerxwîn çu ser dilovanîya xwe ... 294
Îndra Gandî hat kuştin ... 295
Pîrozkirina 10 salîya PSKT ... 296
Xebatên li Swêdê ... 297
Civînên ser hilbijartina Federasyonê ... 300
Enver Ata li bajarê Upsalayê hat kuştin ... 305

Çetîn Gungor hat kuştin ....................................................................................309
Xebata ser weşanan ..........................................................................................319
Rewşa Federasyonê ...........................................................................................319
Yekitîya Çep – Sol Bîrlîk ....................................................................................320
Komîta Yekitîya Çep a Swêd xebatên ku kirine (bi kurtasî) ew in: .........................320
Dîsîplîn .............................................................................................................321
Rapora xebtê ya herêma Swêdê ..........................................................................322
Xebatên ser weşanan .........................................................................................324
Helepçe ............................................................................................................326
Şehîdkirina Dr. Abddurrahman Qasimlo ...............................................................334
Civîna dawîn a Komita Merkezî dervayî welat ......................................................336
Konferansa Stockholmê 15-17 adar 1991 ..............................................................337
Îxaneta dil ........................................................................................................354
Mirina Zana ya bêwext .......................................................................................361
Birayê delal Zana ..............................................................................................361
Seddam ............................................................................................................362
Partîya Civaka Demoqrat (DTP) ..........................................................................363
Li ser pirtûka Burkay .........................................................................................368
Ji Partîya Demoqrat aKurdistan_Iraq – liqê Swêdê ra ............................................390
Ji Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê re ...................................................391
Ji komîta bîranîna serok Barzanî ra ......................................................................391
Ji bo yekitiya rewşenbîrên welatparêzên Kurdistanê ...............................................392
Ji bo yekitîya niştimanî Kurdistan- liqê Swêdê ......................................................393
Ji bo partî demoqrat a Kurdistan - liqê Swêdê .......................................................394
Ji bo partî ya demoqrat gelî Kurdistan- Iraq ..........................................................394
Piştî evqas xebat û zehmet, hepis û sirgun, diyarî jî ithamên usa bin? ....................395
Çend wêne... .....................................................................................................397

**PÊŞGOTIN**

Bîranîn, beşek ji edebiyatê ye. Bîranîn bûyerên ku meriv dijî, an jî dibe şahad bi objektîfî û samîmî dinivîse û derbazî nifşên hatî dike. Bîranîn, ji çavnêrî, qeneat û şiroveyên nivîskar tê holê, ji ber wê jî ew, li himber dîrokê xweparastina nivîskare jî.

Tiştekî xwezayîye ku, nivîskar li gorî dîtinên xwe bûyeran şirove dike, digîhîşe hin encaman û radîgihîne raya gel. Lê tiştê ku ne xwezayîye ew e, ku meriv bi zanebûn bûyeran serbijêr bike, an jî bi nêrînên şaş ve rastîyê veşêrîne, reş bike. Lê bi hin prensîban va girêdayî mayîn û nemayîn jî bi exlaqê sîyasî û sosyalîya nivîskar ve girêdayî ye. Berhemên ku dikarin, di dîrokê de dibin belge, ji ber vê yekê ye.

Xasima berhemên bi destê kesên ku di nava bûyeran de cî standîne, xwedî tecrube û zanîn ve hatine nivîsandin dîroka civatê ronî dike û tekoşîna hatî re rê nîşan dide.

Qadroyên kevn yên ku di nava bûyeran de cî girtîne, bûne şahadê gelek bûyerên dema xwe, bo ku ew nenivîsîne û çavkanîyên nivîskî ji şû xwe ve nehiştine, em pir caran ber dikevin û wan rexne dikin.

Bona vê yekê divê kurdên welatparêz bûyerên ku jîyane an jî dîne li gorê dîtin, bawerî û şiroveyên xwe binivîsînin û nehêlin ku ew bêne jibîrakirin, ew yeka ji bona dîroka gelê kurd girîng e.

Hestên neteweyî bi ziman, tên bilêvkirin. Ziman ji bona yekitîya milletekî giring e.

Ji bona vê pêwîst e kurd zimanê xwe bikarbînin. Kurdî bi dewlemendîya xwe, xwaşikîya xwe ji tu zimanan kêmtir nîne. Ziman wexta tê bi kar anîn pêş dikeve. Hemû gelên cîhanê di pêşketina ziman de, di çi derecê de bin jî ew hemû pêwistîyên xwe bi zmanê xwe dikarin bînin holê. Hemû ziman jî dikarin dek û dolav, zilm û zordarîya ku li cîhanê tê kirin bîne ziman.

Hemû millet xwedî zimanekî ne, yê me kurdan jî kurdî ye. Gelê kurd milletîya xwe bi ziman û çanda xwe parastîye. Em dîrok û çanda xwe bi rîya zimanê xwe fêr dibin.

Bi zimanê kurdî jî meriv dikare daxwazî û gazinên xwe bîne ziman. Bona wê jî ne lazime meriv tu zimanekî din bikarbînî û xizmeta wî zimanî bikî. Wek Abdullah Peşêw gotî *"ez şaş dimînim, ku kurd bi zimanekî din helbestan dinivîsînin."*

Li Tirkîyeyê kurdbûn û kurdî peyvandin qedexe ye. Bi zimanê kurdî, xwendin û nivisin qedexe ye. Bi zimanê tirkî gelê kurd tê asîmîle kirin û pelixandin. Bi wî zimanî me îşkence dikin û dikujin. Li himber asîmîlasyonê rîya berxwedan û rawestanê ya herî baş bi kurdî peyvandin û nivisandin e.

Bi zimanê tirkî, berhemdayîna ronakbîrên kurd, ji zimanê kurdî û gelê kurd ra xizmetnake, tenê bi vî awayî ew xwaşikî û delalîya zimanê wan ra xizmet dikin.

Ziman bi afirandina berheman pêş dikeve. Her berhêmê ku tê holê, an jî tê afirandin di pêvajokê ve derbaz dibe. Ev pêvajo li ziman tesîr dike û wî pêşve dibe. Wexta ku te, hezkirina xwe, hêrs û qara xwe, kar û barê xwe anî ziman, wexta ku te daxwaz, dîtin û ramanên xwe bi rîya axavitin, roman, helbest, şano û serpêhatîyên xwe nivisin, kirin pirtûk û kirin pirtûkxanan wê demê ziman pêşdikeve û xurt dibe. Roja ku min welatê xwe

terikand derketim, Li Surîyeyê têgîhaştim ku têkoşîna pêşin ew e ku, divê em berê zimanê xwe, ango zimanê dayikê fêr bibin. Ji ber ku di nava kurdan de zimanê miştêrek kurdi ye.

Min biryar da ku bi plan û program zimanê kurdî bixebitim.

Ziman ji bona yekitîya milletekî pir giring e. Gelê kurd di welatê xwe de xwedî çand û dîrokek dewlemend e, lê ji ber statûya welatê me berhemên nivîskî derfet nehatine dayîn ku bêne afirandin.

Min di pirtûkê de devoka herêma xwe bi kar anî. Em dizanin ku devok dewlemendîya ziman e. Her devokek reng û tama xwe cuda ye, ew xisusîyet û taybetîyên civakê tîne ziman. Meriv ji devoka xwe aramîyê dibîne, tevî heval û dostên xwe vê devokê bi kartîne û ji hev zêttir dikare fêm bike.

Em bihêlin gel azad bipeyîvî û binivisî. Bona ku hîn otorîteyek tuneye ku di seranserê welatê me de yek devokê bike fermî. Bona wê jî di devokê me de cudayetî hene. Di pêvajoyê de zimanzan wan devokan ber bihev bîne û ji wan zimanekî têkûz derxine.

Lê em nikarin li benda otorîtekê bisekinin. Divê ku kî çiqasî dikare lazime xîret bike û zimanê xwe bikar bîne.

Bona serrastkirina pirtûkê û piştgirtinê gelek sipasîya Salih Înce û Alaettin Înce dikim.

Ji bo girîngîya ziman **Konfûçyus dibêje;** *« Eger ez di welatekî de desthilat bûma, karê minê pêşin, ew bûya, ku bêşik min ziman ji ber çav re derbaz bikira. Eger ziman bi qisur be, bêje fikra merivan nikare rind bîne ziman. Fikra mirovan rind neyê ziman wezîfe û xizmet çawa ku dil dixwaze nayê kirin. Cîyên ku wezîfe û xizmet çawa ku dil dixwaze neyê kirin adet, qeîde û çand xirab dibe. Edelet ji rêya rast derdikeve. Eger edelet ji rîya rast derket, gel bi matmayî nizane çi bike, nizane ew yeka li kîderê disekine. Bona wê ye ku tu tiştek qasî ziman girîng nîne !.. »*

2015.10.9
Kazım Budak

## HAYSIV

Warê me Haysiv mezreke şîrin a Dêrsimê ye. Navê xwe yê dûyem Mezra Bûdan e. Mezra me bi ax û avîyên xwe, dar û bexçên xwe ve gelek dewlemend bû.

Haysiv li qiraxa çemê Gêxîyê - Pêrê ye û girêdayî Nehîya Moxindîyê ye.

Me rojên xwe yên havînê pir caran li ber wî çemî derbaz dikir.

Xwedîyê Haysivê yên kevn ji aşîra Şadîyan du bira, Alî Axa û Hesen Axa bûne. Wan bi navê Îsnîs û Haysivê du gundên xwe hebûne.

Mala Alî Axa li Haysivê û mala Hesen Axa jî li Îsnîsê ye, wan him bi hev ra him jî bi der û dora xwe re serhişkî û neyartî kirine.

Lawê Alî Axa Hamlî, lawê Hesen Axa ango pismamê xwe Osman dikuje û jîna wî Dûdu Xanimê ra dizewice.

Dûdu Xanim qîza axayê Çarsenceqê ye, bi xwe Tirk û sunî ye. Lawê Dûdu Xanimê Zilfî Axa bona xatirê xalanê xwe yê sunî li gundê Îsnîsê mizgeftek piçûk jî çêdike.

Bona ku Hamlî ji tolgirtina lawê Osman Zilfî ditirse wî bi mana xwendinê dişîne Paloyê dibîstanê. Zilfî piştî xwendina xwe dibe midûrê nehîya Moxindîyê. Zilfî jî bo tolgirtina bavê xwe, xisimê Hamlî, Îsmaîl dikuje û jina wî Fatoş Xanimê li xwe mar dike. Ew Fatoş Xanim Haysivê difiroşe mala Bûdê.

Ew kirinên wan şanoya Shakespeareê Hamletê[1] tîne bîra mirovan.

Hamlî têra xwe neheq û zorker bûye. Mezinê me digotin, piştî ku me Haysiv kirîye, rojek biharê çirpoz xwe dide çongê merivan, Hamlî bi cotek ga tevî nîr û hevcar di nava axpînan de dajo û tê.

Apê bavê min Weyîs dibîne, lê dengê xwe nake. Hamlî bang dike û dibêje: Weyîs, tu çima dengê xwe nakî, eger ku em bûna, me xwîna hevûdû dirijand.

Weyîs[2], lê vedigerîne, dibêje: Hamlî Axa bila canê te sax be, hesav bike ku em li ber genimin parsekçîyek[3] hatîye me barek genim dayê.

---

[1] Hamlet ji alî nivîskarê Îngilîz Willîam Shakespeareê ve di salên 1599-1601 da hatîye nivisîn. Claudîes brayê xwe Melîk dikuje, jina wî Gertude ra dizewice û di cîhê wî da dibe melîk. Claudîes bona ku ji tolgirtina lawê Melîk, Hamlet ditirse, wî dişîne Îngîltereyê û dixwaze wî li wir bide kuştin. Lê dawîyê, Hamlet apê xwe Melîk Claudîes dikuje.

Shakespeare gotina "Hebûn an Nebûn"ê di vê tiyatroyê da bikar anîye.

Grûpa şanogeriyê ji Dîyarbekirê hatibû, li Stockholmê 6'ê mijdara 2012 an li ser sekûya-dîka Södra Teatern ew piyêsa Şêkspîr a bi navûdeng Hamlêt bi kurdî pêşkêş kir.

[2] Weyîs apê bavê min bû, di salên şerê Cîhanê yê yekê da ew tevî birayê xwe Qîya çûne Amerîqayê. Ew bi salan li wir mane û xebitîne. Weyîs di xebatê da lingê xwe ber tirênê dikeve û tê jêkirin, ew vedigerî welat, lê Qîya çend salan şûnda vedigere. Li Amerîqayê jê ra ortopedîk ling çêkirîbûn wî her wext ev kar dianî. Me zarokan ji lingê wî xu dikir û dema ku dengê lingê wî dibihîst me xwe ji wî vedişart.

Hamlî dibêjê "herê lawê Bûdê bi vê binfrehtîya te Haysiv xwar û çû."

Mala Alî Axa her roj, neheqî û zordarî li ser gelê dora xwe zêde kirine û ew li dora xwe bûne tîmsala zordarîyê. Lê dewrana wan jî zêde nedomandîye.

Rojekê hespê gundîyên Mankiragê li Haysivê dikevin êkina mala Alî Axa. Ew hespê cîranan dikin axur û nadin xwedîyan.

Gundî, xwîşka Hamlî Axa ya ku li Mankiragê mêr kirîye, dişînin, ew dixwazin, hesp û heywanên wan ên ku kirine hindur berdin.

Lê mala Alî Axa heywanên wan bernadin û zeyîya xwe bi gotinên giran destvala şunde dişînin.

Ser vê yekê gundîyên Mankiragê, tevî gundîyên Mastan û gundîyên din yên ji aşîra Îzolîyan hêza xwe komî serhev dikin û bi hev ra êrîş dibine ser mala Alî Axa, agir berdidinê û mala wan dişewitînin.

Xortek bi navê Elîbeg, çekê jinan li xwe dike û tevî jinan ji mal baz dide, dixwaze xwe bavêje nava koma jinên Mankiragê, yên ku li dîyarê Tul kom bûne û li şerê eşîrê sêr dikin.

Pir namîne ku Elîbeg xwe bavêje nava koma jinan û xwe xilas ke, Mistê Balîyan dûrve dibîne ku çûyîna kesê revî, ne çûyîna jinan e, bi sîwarî[4] lez dike xwe digîşîne xort û li vir wî bi şûr dikuje. Dûra jî ji hespa xwe tê xar û bi mistan xwîna wî vedixwe.

Bi vê yekê ew tola lawê xwe yê ku ji mala Alî Axa ve hatîye kuştin digire!

Hamlî jî rojekê ku li birrê Qevaxê ji çem derbaz dibe, tê kuştin, pêşmêrê wî Bilo jî bîrîndar dibe.

Hespa Hamlî Axa tere Haysivê. Dîya hamlî dibêje,*"hespê tu hatî, lê kanê sûwarîyê li pişta te?"* Hesp dide pêşîya wan û wan dibe birrê Qevaxê.

Li wir cinazê Hamlî dibînin û wî dibin mal.

Bilo jî ji eşîra Îzolan e, li gundê Axkilîsê rûdine û xebatkarê Hamlî Axa ye.

Ji bona ku Bilo di rubalî Hamlî Axa de birîndar dibe, tayfa mala Hesen Axa keçkê didin Bilo. Serda jî maf dane wî ku ew di nêzikî gundê xwe li ser çemê Pêrê kelekvanîyê jî bike.

Malbata Bilo piştî ku bi mala Alî Axa û Hesen Axa re têkilî danîne şunde bûne xwedî îmkan û otorîte.

Tê gotin ku mala Bilo hin xisusîyetên xwe, wek talankerî, zordestî ji mala xalanên xwe girtine.

Bona ku otorita merkezî di Kurdistanê de qels e, an jî tune, serokeşîr di mintiqê de xwedî desthilat in. Bi piştgirîya grubên çekdar, rêyan dibirîn, talankerî dikin, merivan

[3] Wê demê kesên ku debara xwe nedibûn, li zevîyan digerîyan, gurz gurz an jî bar bar genim tevî sap pars dikirin, ew dibirin di bênderan da digerandin tene jê derdixistin.

[4] Bo ku xwe bigihîjîne Elîbegê Mistê Balîyan li Kevirêsorê hespa xwe di zinarekî asê da dike xwar, ew der hîn kifş e.

dikûjin. Van kirinên wan ji der û dorê ji wan ra neyar çêkirine. Eşîr û malbat jî li gorî rewşa wê rojê û menfatên xwe, beş bûne.

Hin caran eşîr di nava xwe de parçe bûne, bi eşîrên din re yekitî pêk anîne, li himber hev şer kirine.

Mala Îvê Osê jî wek mala Bilo ji eşîra Îzolan e, lê her yekî li cem hin hêzên din cî girtine û li himber hev in. Di şerê navbera herdu malbatan de ji gruba Îvê Osê Hesê Cahîl tê kuştin.

Hesen yek lawê malê ye, bi navê Melekê xwîşkek xwe hebûye. Malbat û derdora eqrebên Hesen didine zanîn ku, kî heyfa, (tola) Hesen bigire wê Meleka xwîşka Hesen li wî mehr bikin.

Wek hedef, kuştina Avdilayê mala Bilo tê bijartin. Avdila li Xarpitê polês e, hedefek berçav e.

Rojek zivistanê polês Avdila, li dikanek ber manqala agir rûniştîye xwe germ dike. Zarokek di dest de dîk bang dike, *"dîk difiroşim, dîk difiroşim"* û ber derê dikanê ra çend caran derbaz dibe. Xwedî dikanê bi zarok ra hêrs dibe, dixwaze ew ji wir dûr here. Lê zarok nişkeva şeşagirê ji ber xwe dikişîne û xij ser Avdila dike û wî li wê derê dikûje.

Di helbesta anonym de tê gotin ku:

"(... ...)
Avdila Axa ye, qirtik sîs e,
Hîm axa ye, hîm polês e."

Mêrkûj tê girtin. Ew ji malbata Îwê Osê, bi nave Axayê Hewo ji gundê Elaxmûrê kureke 12-13 salî ye. Disa di helbesta anonîm de jî li ser Axayê piçûk ûsa tê gotin:

"Elaxmûra şewitî dal û dirî,
Di nav de digerî Axa yê Gûrî"
... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ....
... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ... ....

Bo na ku qetîl salê xwe piçûk e, wî berdidin. Lê piştî ku ew mezin dibe, carek din digirin girtîgehê. Ew cezayê xwe radize û derdikeve. Lê ew heya ji zîndanê derdikewe Melek Xanim dizewice.

***

Di qetlîama Dêrsimê ya 1938[5] an de wek hemû gel ji eşîra Îzolan malbata Bilo û malbata Gêdûg jî mêrên xwe hatin kuştin, derbên giran xwarine.

Di girtina mêrên mala Bilo Axa û Mehmed Efendî de jî serleşkerê Tirkan zalimtîya xwe daye xûya kirin.

Li himber jin û zarokên wan, nîr dane ser stuyê wan herdu biran, bi lingê tazî di bêndera kêsê (palax) de bi wan gam gerandine.

Dûra jî birine, li Mêzgirê û tevî gelek kesên din ew jî kuştine.

Ji gundê Mastan, ji malbata Gêdûg jî bi navê Axa Çawûş û Zilfî du kes hatine kuştin û malbata mayî jî sirgunî Ûşaxê kirine. Ew piştî 10 salan şûnda dikarin vegerin welatê xwe.

***

Piştî şerê eşîran mala Alî Axa neçar - bêgav mane û gundê Haysivê, firotine mala Mehmedê Bûdan.

Di kirîna Haysivê de jî gelek tengasî çêbûne.

Li gorî gotinên mezinên me ji bo kirîna Haysivê sê caran pere dane.

Berî ku ew bên Haysivê bikirin û cî bibin dîya bavê min Besê Xatûn hatîye Haysiva Jorin waran.

Mehemed wê wextê li Gundê Rîçikê, mezra Bûdan rûdine. Bi navê Mistefa, Bapîr, Welîaxa, Weyîs û Qîya çar lawê xwe hene.

Birayê mezin kalê min Mistefa birayên xwe digire, tê li Haysiva jêrîn di dora 1902 an de û dest bi avakirina malan kiriye. Destpêkê de temela xanîyê ku mala apê Weyîs têda rûdiniştin danîne. Hin kesan bala wan kişandîye ku ew awahîyê di cîhê pagên şewitî de çênekin. Xanîyên malbata Alî Axa di eşîra Îzolan de hatîbû şewitandin. Dibêjin cîhên usa him bêxêr in, him jî zêde kêçan çêdike.

Gora ku dîya min dida zanîn xwîşka bavê min Fîdan û birayê bavê minê mezin Keko li gundê Rîçikê, Mezra Bûdan hatine dinê.

Zarokên din Çiman, Xatûn, Emîne, Alî, Husên û Silêman jî li Haysivê hatine dinê.

Xatûna dîya min bona ku çîroka Haysivê û xwedîyên wê yên kevn dizanîya tim bi şik bû û digot:

Biko biko Haysiv ji mala Alî Axa ra nebû milk, çawa ji me ra bibe milk? Bila lom nebe, emê samê çi bibînin.

[5] Havîn bû, em li Mêrgahespan li ber dasê bûn. Esker dor li me girt, em komîser hev kirin, Apê Husên bi qantirê birin barên wan bigerîne. Bi rîya Salîm Begê Mamostê nehîyê malbat du mawzer zûda teslîmî qereqol kiribû. Bi alîkarîya Salîm Begê malbat zêde zerarê nabine.

Xatûna jina Silêmanê Bûdê tim ûsa digot. Te digot, hela jinika dilovan xebera xwe ji hin tiştan heye.

Wek tê zanîn wexta ku generalên faşîst û devbixwîn di 12 Îlona 1980 de darbe ya leşkerî kirin û hukim kirin destê xwe, gelê Kurd bû hedefa êrîşên wan. Bi destê cunta faşîst li ser gelê Kurd agir hat barandin. Bi sedhezeran welatparêz û pêşverû hatin zîndankirin û ew di êşkencan de derbaz kirin.

Cunta faşîst, jin û mêr, mezin û piçûk, gundî û karker, polîtîk û ....nepolîtîk negot hemû kes û derûdor girt himberî xwe, zulum kir. Li seranserê Tirkîyê sedan kes di girtîgehan de hatin kuştin, hezaran kes seqet man. Hovitîya dijmin gîhaşt astek pir bilind.

Piştî ku cunta faşîst bû desthilat, wek hemû herêmên Kurdistanê li Haysivê jî jîyan hate jar kirin.

Gotina Xatûnê rast derketî bû. Adeta di axa Haysivê de bêxêriyê nobet digirt. Şeş lawên wê jî bibûn qaçaxê dewleta Romê.

Rojek payîza sala 1981 an, bi mana lêgera "terorîstan" tîmê leşkeran avit ser mezra me, hemû li bênderê civandin, mezin û zarok kirine feleqan.

Bavê me yê 63 salî jî ji vê yekê para xwe girt.

Malbatên me bêgav man ku cîh û warê bav û kalan biterikînin. Her yekî li gorî aborîya xwe, xwe li bajarekî girt û çûn. Berê pênc malbatên Bûdan û çend cîranên din li Haysivê diman. Weyîsê Bûdê, birayê wî Qîyayê Bûdê û sê lawên brayê wan ê mezin Mistefa ango, birazîyê wan Alî, Husên û Silêmanê Bûdê.

Dawîyê Haysiva şîrîn de ji 50-60 hêjmarî tu kes nema, hemûyan ew der terikandin. Mîna ku hêlîna çûk û têyran mar bikevinê. Daristan û deştên me ji gur û berazan ra man.

Havîn havînan xeynî zîyaretên derbazok 20 salan kes venegerî van deran.

**Bavê min Silêman**

Bavê min Silêman, lawê Mistefayê Mihemmed e. Dapîra min, dayika bavê min Besê digot, *"piştî qirkirina Filehan bû, fermana me derket. Em mecbûr man xwe amade bikin û gavekî zû warê xwê biterikînin. Me li pagên Sîngêkovê çend çal*[6]*, korm veda, genim, ce, ard û hin nivîn di korman de binax kir, destê zarokên xwe girt û em birê ketin. Bê ku bikarin pez û dewar bigirin ba xwe. Du tîyê min Bapîr û Welî Axa tevî qelfe nebûn. Wan tifingê xwe girtin berê xwe dan çîyan."*

Bi peyatî, çûyîna tevî zarok, nexwaş, kal û pîran ew bi rojan rê terin. Di wextek kin de nan û xwarina ku li pişta wan e diqede. Ji ber tî û birçîbûnê gel bêteqat û nexwaş dikeve. Zarok, kal û pîr di rîyan de dimînin. Malbat belav dibin, her

---

[6] Bona ku nikarin bigirin ba xwe, ew neyine dizîn di binê erdê da vêdişêrin.

endamekî malbatê bi alîkî ve tere, zarok dê û bavê xwe, jin zarok û mêren xwe wenda dikin.

Ji ber bêçaretîyê pir caran dayik zarokên xwe yê hembêzê cî dihêlin û dimeşin. Jinek bêçare dimîne êvarekê qundaxa xwe li kiraxa rê datine û diçe. Roja din dayîk poşman dibe, wedigere, piçekê durî ji cîhê ku qundax lê danîye, deste zarokê xwe dibîne.

Dapîra min Besê jî du lawên xwe Husên û Silêmanê bavê min û keça xwe Emîneyê wenda dike.

Silêman dora du salî, Husên çar salî, Emîne jî dora heft salî bûye. Tesellîya dayik û bavê wan ew e ku keça wan a zîrek, Emîne tevî zarokan e.

Emîne Silêman pişt dike, Husên jî bi dest digire, rîya bêdawî de û dû qefîla gel de terin.

Lê şev û roj di rîya dirêj de bê nan û bê av meşandin, hin caran Emînê jî bêhêwî dike.

Silêman cî dihêle û dixwaze tevî Husên xwe xilas bikin. Lê piştî çend gavan ew poşman dibe carek din şûnda tere birayê xwe pişt dike û dimeşe. Ew yeka çend caran tê dubare kirin. Ew Pêrtag û Xarpitê jî derbaz dikin li nêzikî Meletîyê bi emrekî duyem gel şûnda vedigere cîhê xwe. Di dawîyê de bi vegera lehîya gel ve ew jî digêjin cî û warê xwe.

Emîna, meta me dema ku bi çave girî ev bûyer dianî ziman, em hemû guhdarên wê, zarok û jin xemgîn dibûn. Bona ku wê bi fedekarî bav û apê me xilas kirîbû, me ew sedema hebûna xwe dizanî. Lewma jî me ji wê pir hezdikir.

Ew ji sirgunê vedigerîn, lê wan hîn li gundê xwe dezgehê xwe serast nekirine, vê cara jî ji çîyê xebera ku tê wan dike nava xemgînîyek kûr.

Bapir û Weliaxa herdu mêrê mala Bûdê di operasyonek lêşkeri de li çiyayê Dizgune (navbera Nazimiye û Gêxiyê de) di şikeftekê de hatine kuştin.

Bona ku meyîtên wan binax bikin dapîra min Besê û du mêr terin Çîyayê Dizgunê. Bo kefen jî caw nedîtine, cawê-ruyê lehîfê ji ber dikin, terin 3 cesedên helisî binax dikin û vedigerin. Cesedê sisîyan jî ji gundê Goman mala Îsê Alê Bekê ye. Ew jî hevalê wan ê çîyê ye.

Bona ku ew bi hev ra hatîbûn kuştin di navbera mala Bûdê û mala Îsê Alê Bekê de nêzikatîyek, dostanîyek pêyda kirîbû.

Mezinên herdu malbatan digotin xwîna me ketîye nava hev. Herdu malbatan jî ew yeka pîvanek eqrabatîyê, kirîvtîyê didîtin û tiştekî miqades dizanîn.[7]

---

[7] Ew serpêhatîya, min bi navê Xebat di Kovara Roja Nû da bi sernivîsa "Şikefta Bi Xwîn" nivîsî. Îsmailê Qewoşê ji malbata Bûdan e. Îsmaîl li gundê Rîçikê mezra Bûdan jîyana xwe bihurand. Min ew serpêhatî ji devê Îsmail bi xwe bist. Di nivîsê da tarîxa bûyerê 1916 de hatîye texmînkirin, lê dikare şaş be.

**Dergûşkêrt**[8]

Apê bavê min Weliaxa azev, lê Bapir zewici bûye û bi navê Gûzê jî keçika xwe hebûye. Bapir bi wêreki û cameriya xwe bi nav û deng bûye, di şere gunditiyê de kesê ku li ber çoyê wi xwe ragirtibe, tunebiye.

Malbat ji dayikbûyinê Gûzê bi pismamê wê Husen ra dike dergûşkêrt.

Lê pişti ku Gûz mezin dibe, bi xortaniya xwe hişyar dibe, bi alîkarîya hin navbeyinciyan bi Memê Seyid re-ji mezra ciran, Haysiva Jorin-direve û pêra dizewice.

Malbat bi riya dadgehê pir hewl dike ku keça xwe şunve bigire. Lê Gûza çeleng dev ji hezkiriyê xwe bernade. Ew yeka malbata feodal dieşine û Gûzê ji nava malbatê derdixine. Pir derbaz nabe mêrê wê tê kuştin û Gûza bêmêr tevi Mehemedê lawê xwe yê sêwi, li orte dimine. Zewaca bêdilê malbatê rê nade ku Gûz vegere mala bavê xwe.

Adet û kevneşopiyên feodali malbatê dike neyarê Gûzê; kes ali wê va naçe û nahêle ew jî ber bi wan bê.

Gûz mecbûr dibe, diçe Gundê Mastan, mala xalanê xwe, demikê li wir dimine.

Bi bejna bilind, çav û bruyên kej, porê zer, Gûz çelenga jin û bûkan e. Delalî û çelengîya wê di nava herêmê de belav dibe.

Çawa ku mezinê me qal dikirin wexta ku wê tînin dadgehê memurên Mêzgirê bona ku Gûza bejnzirav bibînin di pençiran de kom dibin û li delalîya wê sêr dikin. Lê bêmêr û bêmalbatî yê ew stuxwar kirîye.

Piştî demikê Gûz li gundê Qeresqelan bi Mêmê Zîvê re dizewice.

Mem di wexta xwe de xwedî nav û dengekî baş e, ji malbatê ra dost e.

Lê piştî ku bi Gûzê ra dizewice, malbat têkilîyên xwe bi wî ra jî dibire.

Meta Gûz 1950 de ku qadastro ket gundan, erazî tapî kirin jî bi rîya dadgehê tu daxwazîya mafekî nekir.

Wê hîn jî nedixwest ku malbatê nerehet bike. Mixabin pir caran bê- adeletî û neheqîyên civakî yên usa dibin.

Bi dilê malbatê nebe jî carekê ez çûm mala wan û min meta xwe ya Gûz[9] zîyaret kir.

---

[8] Zarok hin di zikê dîya xwe dane an di dergûşê da ye, bi yekî din ra soz tê birîn, berdêlî tê kirin, jê ra dergûşkêrt tê gotin.

[9] Di têkoşîna Kurdistanê da wek gelek Kurdê welatparêz lawê Gûz ê Elîbeg ji di salên 1980 da ji alî polês û eskeran ve di îşkencê da hate kuştin.

**Xatûna Bûdê neqil dike**

Li Kurdistanê xasima li Dêrsimê malbata ku ji alî Dewleta Tirk zerar nedîye, qurban nedaye tune.

Xatûna Bûdê, Xatûna dayika minê 90 salî bi hestên xemgîn qala bav û dayîka xwe dikir. Wê pir caran ji me re qala vê bûyerê kiribû jî, îro 02 Îlon 2009 min rind li wê gûhdarî kir û çîroka wê kir ser kaxizê, çîrok li jêr e.

"Navê bavê min Îmam, navê dayika min jî Xanê ye. Ew xisimên hev in. Lê bavê min jî, dayîka min jî bi zewaca duyem em anîne dinê.

Cara pêşin Îmam bi Sewê re, dîya min Xanê jî bi Evdilayê Qîya yê Alî re zewicîye.

Îmam, ji jina xwe Sewê, Xanê jî ji mêrê xwe Evdila û zewaca xwe kêfxweş in. Ji vê zewaca bavê min û ji jina xwe ya pêşin Sewê 4 zarok çêdibin. Dayika min Xanê jî ji mêrê xwe yê pêşin, ji Evdila xwedî du keç û lawekî ye.

Lê wek pir caran dewlet li gelê me tê xezebê bi êrîş û barbarî dajo ser gelê me. Ew mecbûr dimînin, ji ber zordarîya dewlêtê cîh û warê xwe diterikînin.Kesên ku xwe ji zilma dewletê xilas dikin berê xwe didin çîyan. Yê mayîn li gorî fermana dewletê ber bi Xarpitê, Meletyê, ber bi Rojava Anatolîyê rê dikevin.

Pir terin hindik terin bi emrê dûyem dewlet dixwaze gel vegere cîh û warê xwe.

Lê gel pir dûr çûye, bi rojan rê çûye û gelek sefalet û perîşanî dîye. Nexwaşî birçîtî û zilmê gelek can girtîye.

Zarok dayik û bav ji hev diqetin her yek derikê ve terin. Jin û mêr, zarok û dayik hev û du wenda dikin.

Bavê min Îmam, Sewa jina xwe û zarokên xwe wenda dike. Sew, ducanî ye û tevî 3 zarokên xwe nikare rê here, ji qelfe vediqete.

Bi emrê dûyem ku bavê min vedigere gundê xwe tenê qîza xwe Kiwê û birazîya xwe Xaskar pêra ne.

Piştî demekê ji bavê min Îmam ra xeber tê ku jina wî li filan derê ye û nexwaş e. Bavê min dide rîya cîhê ku jina xwe, Sew lê dimîne. Bi lingan çend rojan tere em nizanin.

Lê pir mixabin ku ew ne keçên xwe ne jî jina xwe dibîne. Ji wî ra dibêjin *"jina te zarok anî lê zarok jî jina te jî mirin."* Îmam bêçare vedigere mala xwe.

Dîya min Xanê jî di yek wextê de tevî mêrê xwe yê pêşin, Evdila û tevî sê zarokên xwe terine qelfe (sirgunê).

Di rîya dûrûdirêj de wek gelek zarok herdu keçên Xanê dimirin. Lawik jî di hembêza bavê de rastî gulebarana leşker tê. Bav, Evdila di cîda dimire û lawik jî birîndar dibe.

Di wê demê de gûndîyêk- merivê Xanê Îsmaîlê Qewoş'ê[10] jî leşker e. Îsmaîl ji serleşkerê xwe rica dike, dibêje lawik lawê xwîşka min e." Bi saya Îsmaîl lawikê birîndar ji destê leşker tê derxistin û didin dayika wî, Xanê. Lawikê birîndar jî li gund dimire.

Me li jorê gotîbû Îmam jina xwe Sewê û sê zarokên xwe dimirin tenê keçik xwe sax dimîne. Xanê jî mêr û sê zarokê xwe wenda dike.

Îmam û Xanê dizewicin. Piştî ku Îmam bi Xanê re dizewice qîza Îmam Kiwê bavê xwe ji damarîya xwe ya nû re parve nake. Ji mal direve tere çol û çîyan (yavan û yazîyê) xalî dixwe nexwaş dikeve û dimire.

Sewê birayê xwe tunebûne sê xwîşk bûne. Piştî ku erazî di nav xwîşkan de tê parwekirin Îmam para jina xwe Sewê nagire.

Îmam li gorê bawerîya Elewîtîyê naxwaze mêrasê bigire, bêxêr dibîne.

Dibêje, *"min ji jina xwe xêr nedî, mêrasê çibikim? Mêrasê naxwazim. Mêras e, dêrs e."* Hevlingê Îmam di nava xwe de mêrasê parvedikin.

Cara dûyem Îmam tevî dîya min Xanê dizewice.

Ji vê zewaca Îmam û Xanê 5 qîz ( dayîka min Xatûn, Gûnê, Încê, Sewê) û 4 lawên wan (Husên, Hesen, Zilfî û Memê) çê dibin.

Bavê min Îmê Welî, bûyerên ku derbazkirîbûn wek xirabî nedihesiband digot; eger ku ez rastî xirabîyan nayêm, sedem ew e, ku min dû xêr kirine.

Xêra yekê min li dayîka xwe kirîye. Min pir qîmeta wê zanîye, dilê wê neşikandîye. Xêra duyem jî, ewe ku min jinek ji agir xilas kir. Di tertela Şêx Seîd de, hikûmatê talankirina male wan serbest kirî- bû.

Em çûn gundê Palo yê gundê Sunnîyan talanê. Piranîya gundan vala bûn, heywan û mal bêxwedî bûn. Kê çi dihat ber digirtin dianîn. Pez, mange, ga, hesp, ferefol, sîtil…

Li gundekî min dît ku agir berdane malekê, dişewite, jinek jî di nava agirda ma ye. Min xwe gîyand jinikê ew ji nava agir kişand, derxist derva. Min jê pirsîya ku ew çima di nava agirda maye. Got: ez korim, nabînim, pêşîya te yekî çîta ser min jî revand bir. Eger rîya te pêket li Tacîkê (gundê Depê) Îsmaîlê Xenîyan ra bêje ku; qonax şewitîye, zevî ya we bêxwedî maye,..."

Lê ew Îmam ku mêras bêxêr didît û nagire, tere ji gundên Kurdên Sunnîyan talanê tîne!

Dewletê Kurd bi Kurda dane kuştin. Gotina mixtarê gundê Mîyalan, Selîm Axayê Çoligî hat bîra min. Digot; mamoste, cara pêşin di sala 1925 an de Elewîyan… dîya me, sunnîyan jî 1938 de… dîya Elewîyan.

[10] Em Îsmaîl di bûyera şikeftê da nasdikin. Piştî ku Îsmaîl ji şikeftê direve, vî digirin leşkerîyê. Ew dora 16-17 salî ye lê vî demik dirêj dikin leşker.

Min jê pirsî lê dawîyê, kê qezanç kir?

"Welle dewletê qezanç kir, dewletê him n... dîya Sunnîyan, him jî n... dîya Elewîyan."

**Tarixa ji dayikbûna min nediyar e**

Wek gelek Kurd tarixa ji dayîkbûna min jî nediyar e. Li gorî di nasnamê de hatîye nivisîn 20 ê Çileya Paşin, meha yekê sala 1944 an de li Haysivê ji dayik bûm e.

Wek sal nizanim, lê çend mehan dereng nivîsîna min li ber çavane. Ji ber ku dîya min dibêje " tu di dema rezbirînê de hatî dinê."

Lê rez di mehên payîzê de têne birîn û ev dem çend mehan digire. Lê di nasnamê de roja ji dayîkbûna min 20ê meha Çileya Paşin û sal jî 1944 hatîye nivisin. Ew tarîx bûye rojbûna min û hatiye qebul kirin, ango pejirandin.

Hin malbatan xasima zarokên law dereng piçûk dinivîsîn. Digotin di leşkerîya Tirkan de ew tengasîyan nekişînin.

Ya din jî bona qeydkirina zarok, lazim bû wan çend rojên xwe bidana vî karî. Em dizanin ku wê wextê daîre û memurên dewletê li her derê welatê me tune bûn, ji bona zarokên nû çêbûne bihatana nivîsînê gerê biçûna bajaran. Çûyîn û hatina bajaran jî mîna îro nehêsan bû. Rê jî û erebe jî tune bûn.

Ne ji ber nezanînê ji ber şert û zûrifên welat wan nikarîne ji dayik- bûyîna zarokên xwe di wextê de binivîsin. Lê dîsa min dît ku apê min Husên û bavê min Silêman li ser qapaxa dolavan tarîxa avismayîn û zayîna mangên xwe dinivîsîyan.

Bavê min ji alî xwendin û nivîsîn ve baş bû. Wî di sala 1930[11] de tevî brayê xwe Husên li Palo yê ji dibistana Muhtelît dîploma standîbû. Piştî wê jî herdu biran li Xarpite dest bi dibîstana navîn, rûştîye kirîbûn, lê ji bo ku bavê wan dimire ew dawî li dibîstanê tînin.

Li Tirkîyê 1928 de bi rîya zagonên nû, di cîhê tîpên erebî de tîpên latînî têne pejirandin. Apê min Husên û bavê min bi herdû cure tîpan xwendin û nivisandin rind dizanîn. Di vê salê de li Kurdistanê hêjmara kesên ku xwendin û nivîsandinê dizanin ji sedê 2-5.

Li bajarê Erzorimê % 5, li Wan ê piçekê li ser %1 re ye. (Çavkanî- Dîroka Tirkîyê A piştî Şoreşa Oktobrê rûpel-140)

Rewşa Dêrsimê ya dîrokî û coxrafî ya wê demê meriv bifikire ew hêjmar di binê %1 ê re ye.[12]

---

[11] Diploma Husên heye lê ya birayê wî Silêman di destê me da tune ye. Lê em dizanin ku ew bi hev ra çûne dibistanê û bi hev ra xanî kirê kirine û xwendîne.

[12] Du apên bavê min dora salên 1915 an da çûne Ameriqayê. Malbatê nekariye namên ku ji wan hatine bixwînin. Ber wê apê Weyis ku ji Ameriqayê vegerîye, herdu birazîyê xwe birine li dibistanê qeyd kirine, xwestîye ew xwendin û nivisandinê fêr bibin.

Ji ber ku Dêrsim bi dewleta merkezî re tim di nava dijayetîyê dabû, ji alî rê, awahî û şaristanîyê ve jî pir paştamayî bû.

* * *

Dinya me tenê der û dora gûnde me bû. Em bêxem bûn û ji halê xwe razi bûn. Meh û sal pêhev zu derbaz dibûn.

Mina zaroken iro pêlistikên (leystoken) me tunebûn. Em û zaroken gund bi hev ra li ser bênderan, zivistanê jî di malan de, di axuran de goma kar û berxan de dileystin.

Çavgirtik, simsimiki, çoreq, go, kerêdirej, dismalrevandin, serhevre bazdan leystiken me yên sereke bûn. Di salên piçûk de keç û lav bi hev ra, piştre ji em law tenê bi hev ra dilistin. Me zarokatîya xwe de ji mezinên xwe çîroka kirinên dewletê ya li ser gelê kurd pir dibîhîst.

Tarta Şêx Seîd, Seîd Riza, berxwedana Alê Gax, ber bi Anatolîyê sirgûnkirina malbatê, sohbeta nava malê ya taybetî bû.

Çend cîran an jî mîvan bihatina, pir an jî hindik qala bîranîna xwe, zilma dewletê dikirin û serborîyên xwe dianîn ziman.

Sîxurîya Alî Yildrim û Seyîd Husên jî di wan gotûbêjan de cîhekî taybet distend.

Her çiqas wan herdu kesan di qirkirina gelê Dêrsimê de ji gelê xwe ra îxanet kirîbûn jî, dîsa di nava gel de xwedî qedr û qîmet bûn. Gel ji wan dûr nedisekinî û di ciwatê de wan hîn jî cîhê xwe diparast. Her dû Sîxur jî endamên Parti ya İnönu, Partîya Komara Gel (CHP) bûn û bi dewletê re têkilîyên xwe baş bûn. Wan di navbera dewlet û hemwelatîyan de kar dimeşandin û heqê (!) xwe jî zêde zêde distendin.

Kesên ku dixwastin di Partîya Komara Gel de bibin parlamenter lazim bû, xelatek baş bidana Seît Hûsên û destê wî jî maçî bikirina.

**Çavêş**

Ez piçûk bûm, hîn nediçûm dibîstanê, nêzikê salên 1948-49 an bû. Wê demê payîzê li Kurdistanê nexwaşîya çavan pir belavbûyî bû. Min jî ew nexweşîya, çavêş girtîbû.

Pir caran kesên ku bi çavêşê diketin, bi navê xidudê şîrê gîyakê dikirin çav û pelê susikê didan ser û li ber germa rojê radizandin, çav xweş dibû, dibû mina *"tasa qelayikirî."* Lê vê cara dermanê gundê me tesîr nekir, bavê min neçar ma ez birim Xarpitê doxtor.

Êvarî em diçûn taxa binê rîya hesin, mala nasekî mîvantîyê. Di orta bajar ji Meydana Genim-Buxday Meydani- de em derbaz dibûn, bavê min rawestîya, piştî hin dua û bêdua nixtek ji min ra îşaret kir û got, *"... tam li vê meydanê Seyîd Riza daliqandin."*

Seyîd Riza kî bû, çima û kê daliqandî bû? Bersivên wan pirsan di nava jîyanê de ez dûra fêr bûm.

Hîn jî dema ku terim wê meydanê ew gotina bavê min tê bîra min, dizivirim li wî cîhî sêrdikim. Seyîd Rizayê bejn dirêj û rûsipî, derpê û kirasekî cawinê lê, di sêdarê de daliqandî xeyaldikim.

Çi rasthatinek balkêş bû, ku di sala 1960 de em, grubek xwendevanên dibîstana Akçedagê, bi hev ra hatîbûn Xarpitê betlaneya nîvê salê. Dîsa li Meydana Genim em rastî cendikê daliqandî ya leşkerekî hatîbûn. Leşker jinek kuştîbû û mala wê şelandî bû. Di kartona pêşîya laşê wî yê daliqandî de, bi destpêka, *"Bi tema pereyên Fatma Gullu..."* sedema bidarvekirina wî hatîbû nivisîn.

Qehwexane ya ku em lê rûniştin û me sibe kir, çend metran ji wê derê dûr bû. Derengî şevê her cara ku em diçûn me lê mêze dikir bi xof û tirs em şuve dihatin. Ew sahna daliqandinê cara yekê bû, min ewqas nêz- de didît. Histo lê verimîya bû, şirîta ku li dora histo hatibû gerandin jî, di perça histo de wenda bibû. Ziman ji dêv derketibû ser çenikê de dirêj bibû.

**Dibîstana destpêkê**

Min dibistana ewlin li gunde xwe, li Hulman xwend. Mezra Bûdan û mezra Heydan (Haysiva Jerin û ya Jorin) giredayiyê Hulman bûn. Hulman qasi 4-5 km ji me dûr bû û dora çil xaneyî bû.

Lê heri nezik mesafe ji bona dibistanê ev der bû. Ji xwe gûndên cîran li Mankirag û Axkilise dibistan tune bû.

Mankiragê jî zaroken xwe dişandin dibistana Hulmanê. Emên ku ji mezra me diçûn dibistanê 5-6 kes bûn. Sibê ji saet 8 heya pişti nivro saet 3-4 an em li dibistanê bûn.

Payizî piştî ku dibistan vedibûn li gorî hêjmara xwendevanan her xwendevanekî, barê kerê du bar, sê bar êzîng dibir dibistanê. Bona ku kesên du-sê xwîşk û bra diçûn dibistanê gelek êzing dibirin. Piştî wê jî lazim bû xwendevanan ew êzing li gora bejna sovê hûrkira û li cîhê êzingan de bidana serhev.

Di dibistanê de kesê ku paqişî bikira, zivistanî sobe dagirta, ango xedeme tunebû. Di dersxanê de yek sobe hebû û ji alî xwendevanên nobedar ve dihat vêxistin.

Her roj bi dor yek an jî du xwendevanan paqişîya dersxanê dikirin û sobe dadigirtin.

Demsalên zivistanê ji bona me pir zahmet derbaz dibû. Ji ber ku li gorî av û hewayê em ne amade bûn.

Me qaput, taxim çek, sol, gîzme nas ne dikir. Zivistanê ji bin ra tenê ji cawê sipî derpekî dirêj û jor re jî kirasekî dîsa ji cavê sipî çêkirî û mîntanekî kevn bêtir, li ser me zêde tişt tunebû.

Di lingê me de jî gore û çarix hebû. Gore dîya me çêdikir, çarix ji çermê dewar bavê me çêdikir. Lê bona ku çarix tenê binê lingan digirt, serê lingan nediximand, avê û herîyê ser linge me re davit.

Em hîn ji mala xwe derketîbûn hema li ber derî gorên me şil dibûn, dibûn av. Heya me xwe dîgîhand dibistanê jî em bi sar û sermê di qemîrîyan. Jana ku diket tilîyên ling û destên me bi saetan dikudand.

Lê hin caran me mecal nedidît, em xwe zuha bikin û tevî çekên şil heya dawîya rojê rûdiniştin.

Wexta ku em dereng bimana jî, mamostan weka ceza li nêzê textê reş li hember çavê xwendevanan em li ser yek lingekî didan sekinandin. An jî bi darekî tilî yên destên me yên cemîdî dixist.

Mamostên me helbet ji bona serkevtina me tiştên usa dikirin lê îro ev yeka li min weka zilm tê.

Ji ber ku xwendevan di roja berf û baranê de heya xwe digîhandin dibistanê di çekên wan de ta kî zuha nedima.

Ji bona van serborîyên usa her tim pozxîn dibim û di heyîrim ku em çawa li jîyanê mane.

Di sala 1975-76 de dema ku ez li lîsa Dêrsimê mamoste bûm, îdara dibîstanê biryar girtîbû ku, xwendevanên ku dereng tên mamoste wan negirin sinifê.

Ji ber van bîranînnên nebaş, min tu wext ev biryar nepejirand û xwendevanên ku hatin paşderî sinifê kîngê jî hatin min her tim ew girtin hindur.

Xwarin jî ji bo me xwendevanên ku ji derve dihatin problem bû. Gel wê demê pir neçar û belengaz bû.

Him hatin kêm bû him jî çêşît kêm bû. Di malan de wek çêşît ard, bilxur û nisk ê bêtir zêde tişt tune bû.

Di gelek malan de ev jî têr tune bû. Hetta ce, gilgil û garis ji têr tunebû. Wê demê li ba me xwarina laxenê, pirasê, patatêsê, pirinc û zeytûnê tunebû. Gelêk ji wan xwarinan min li dîbîstana mamostan a Akçedagê naskir.

Sibê sibê piranî me şorba nîskê dixwar û ji bona nîvrojê jî kerîk nanê tisî digirt û diçûn dibîstanê.

Di navbera nîvêrojê de me nanê xwe li dersxana dibîstanê dixwar.

Eger ku agir hebûna û me bikarîya nanê xwe germ kira, ev yeka ji bona me şanseke mezin bû.

Hin caran kilor (nanê bi run), parxaç, an jî nanê tenik, hişkeva bigirta cem xwe ew yeka jî bo me cejn bû.

Çend salên ku ez çûm dibîstana Hulmanê xwarina me ya nîvrojê tenê ev kerîyê nan bû. Nuha li gelek welatên Ewrûpayê di dibistanan de nîvrojê xwarina germ, fîkî û şîr didine hemû xwendevanan.

Meriv ji ber ferqîyek usa ecêp mayî dimîne. Hin caran ji zarokên xwe ra qala van tiştan dikim. Dibêjin, *"başe ku em di wê demê de natine dine"*.

Me zarokên vê demê bi vî avayî, nîvbirçi û tazî çawa kanîye guhdarîya mamoste bikin?

Ha zivistan ha bihar tu ferq nedikir diviya bû ku em her roj biçûna dibistanê. Ne serma û berf ne ji baran û bahoz ne sedem bû ku em ji dibistanê şunda bimana. Hin caran bona zarok herin nobedarîya pez, an ji malê ra alîkar bin, lazim bu ji mamoste destûr bihatana girtin.

Hin caran du, lê pir caran yek mamostekî 5 sinif di yek odekê de îdare dikir. Ji ber vê yekê hemû xwendevanan dersên hevûdû dişopandin.

Mamostên me bi xwe Kurd bûn. Ji gundên cîran bûn. Ya ku li gunde me pir ma û keda xwe pir derbazî me bû, ji gundê Canîgê Nîyazî Özturk bû. Mamostê me bi proxram û dîsîplîn bû. Ji karê xwe hezdikir û di xebata xwe de serkewtî bû. Di sala 1966-1968 an de jî li merkeza Bîngol di dibistana Yenîşehîrê de ew midûr ez mamoste, em du salan bi hev ra xebitîn. Wê wextê tenê roja betlanê yekeşemiyê bû. Piştî dibîstana sereta minê çibikira ne eşkere bû.

Birayê minê mezin Mistefa li lîsa Xarpitê diçû dibîstana navîn. Mesrefa xwe gelek giran bû. Rewşa malbatê têrê nedikir ku, bi kîsî xwe du kesan bide xwendin. Ji ber wê lazim bû min azmuna dibîstana ku xwendevanan kîsî dewletê dixwend, qezanç bikira. Xeynî wê tu şansê min ya xwendinê tune bû.

Piştî ku me dîploma girt, min ji bona hemû dibîstanên leylî miraceet kir; ango ya orta û lîsê ya sivîl û eskerî, û ya mamosteyî yê.

Azmuna ji bo dibîstana serete û lîsê, ya kîsî dewletê li Dêrsimê çêdibû. Lê ya leşkerî li Erzorimê bû û berî azmunê wek nîşana bêqisûrîya fizîkî ji nexweşxana leşkerî rapora xweşîyê, ango ya tendûrustî yê, dixwastin. Wê demê nexwaşxana leşkerî ya nêzikê me, li Dîyarbekirê bû. Bona rapora tendûristîyê lazim bû ez herim Dîyarbekirê.

Lê ew rê wê demê ji bona zarokekî 12 salî rêyek gelek dûr bû. Him ji ber karê gûndîtîyê him jî ji ber aborîya nebaş bavê min nedikarî bi min ra bê. Divîya bû ez tenê bi serê xwe herim, karê xwe bikim û bêm.

Ez ê ku heya wê demê bi serê xwe tenê ji gûndê xwe zêde dûr neçûme û nehatime çawa rîya xwe derxinim herim Dîyarbekir û bêm. Tenê di 5 salî ya xwe de ji ber nexwaşîya çavêşê bavê min ez biribûm Xarpitê doxtor.

Ew yeka min difikirine lê şika dilê xwe naxwazim bînim ziman û der û dora min ji şika min haydar bin. Tirsa min ew e ku ew bêjin mere!

Êvarekê dîya min derva li kanîyê sîtila mezin de ser av germ kir, berava min kir, bona rêwîtîya min bê qeza derbaz be gelek temî û dûa jî kir.

Bavê min piştî hesavekî glover ji min re reqemek derxist. Ji Kovancîyan heya Xarpitê heqê erebê ji Xarpitê heya Dîyarbekirê heqê trênê, ji bo 4-5 rojan heqê otelê, heqê xwarinê û dîsa heqê trên û erebê ya vegerê hesav kir û da min. Dîkê nîvê şevê bang kir nekir dîya min ez ji xewê rakirim. Li gund saeta me banga dîk bû, li gorî banga wan, me wext hesav dikir.

Got lawê min, rabe dereng mekeve. Dibêjin erebe ji Kovancîyan berî nîvro derbaz dibin.

Dê û bavê min bi lez gelek temî yên cara çendan dûbare kirin. Teqrîben saet 2-3 ê yê şevê bû min kincê xwe li xwe kir û em derketin derve. Bavê min ez kirim hembêza xwe maç kirim, min jî destê wî maç kir û xatirê xwe jê xwest û meşîyamDîya min heta 400-500 metre, ber bi rîya Kevirê Xizir[13] rast bû, got *"metirs, ji sibê ra hindik maye."* Bi çavên tujî ez kirim hemêza xwe û em ji hev veqetîyan.

Rêya ku divê ez peyatî herim heya Kovancîyan e, dora 30 km ye. Wê demê ji gûnde me heya Kovancîyan ne rîya erebê ne jî erebe tune bû.Divê wextê ra herim Kovancîyan û li erebê sîyarbim û herim Xarpitê. Der û dor tarîye, merivê xam nikare rîya xwe derxine lê ronahîya qels a hîve alîkarîyê dike. Di nava daristanan de di newalên kûr de derbaz dibîm, çûkê ku ji darê difirin, an dengê ku ji daristanê tên, çîrokên ser zîyaretan, dêvan gûr û hirçan tînin bîra min. Hin caran dar û sincên dora rê dibine merivên bejndirêj û têne ser rîya min. Porê serê min gij dibe, nefes girtin û dayîna min six dibe, dilê min zû zû lêdixine. Lê çare tune divê ez ji rîya xwe venegerim.

Şefaqê ra hatim gundê Kurkanê, ber çemê Pêrê, buhirê mirîşkan. Li vira rîya ava çêm fireh dibe, av dide binê çongê mirovan, mirîşk jî dikarin derbaz bibin. Lewma nav lê kirine, "birê Mirîşkan". Ji ber çêm berjorê – sîngê- Meterîsan dest pêdike heya dora 300 metre dirêj dike. Mezinê me qala eşqîyayên vir dikirin. Digotin eşqîyan pir caran bi şûr û tifangan li wir rê dibîrin, rêwî û kerwan dişelandin. Lê nuha tiştê usa nemaye. Ji gûndê Ertxanê, derbaz dibim rîya min di gûndê Qamîşlo, goma Yoqo, Hevav[14], û Karince ve derbaz dibe tere Kovancîyan. Tevî Apê Alî me genim anîbû, vê rîya ve biribû li Palo yê firotî bû. Şev jî me li çîmên gundê Qamîşloyê de kerên xwe girêdabûn, li ser barê keran me xew kiribû.

Li Kovancîyan ereba ku hat sîyar bûm çûm Xarpitê. Bi pirs çûm îstasyona trênê û min ji bo Dîyarbekirê bilêta xwe girt. Rê çend saet digire, trên kîngê digîhîşe

---

[13] Kevirekî korm, mîna afirê hespê ye. Tê baverkirin ku Xizir hespa xwe bi ava baranê ku li wir kom bûye av daye. Mîna zîyaretekê roja înîyê diçûne vir, dia dikirin, mûm vêdixistin, kilor û perê hûr dadanîn ser.

[14] Waxtêra ew gundekî mezin 500 xane, gundekî Ermanîyan bûye.

Dîyarbekirê nizanim. Piştî nivro, dora saet siseyan trênê hereket kir. Lê pir neçû trênê li îstasyonekê navber da û naçe.

Tû nabêjî lî îstasyona Yolçatiyê trên tê gûhartin, benda trênek din e, ew ji Meletîyê tê me digire û tere Dîyarbekirê. Lê em têra xwe li wir man, dema ku em li îstasyona Dîyarbekirê peya bûn wext nîvê şevê bû.

Rîya bajêr nizanim, bi dû rêwîyên din di rêke de dimeşim. Di çep û rastê rê de histunê elektrîgê de lambên qels rê ronî dikin. Duzek bê dar û bê xanî de rêwî, di desta bawûl, torbe, şelag dimeşin. Hin caran fayton, erebên hespan bî dengê tutik û qamçîyan ber me ra derbaz dibin. Lê tu otomobîl xûyanakin. Bajar di hembêza sûrên bilind de di xew de ye. Xanîyek bi navê Otêla Toros dibînim û dikevime hindur. Bona razanê dipirsim, nivîn heye, an na? Xort perê xwe girt û li ser pişta xanî ranzek nîşanî min da. Di rêzê de 10-15 ranze hene, hinek valane hinek tujîne. Demsal havîn e, heva gelek germ e, gel li derva ser xanîyan radizê. Piştî westandina rojê min dixwast hema razêm. Lê şev min nekarî saetikê jî razêm, li ser laşê min bezmik, gawuk (tahta kurusu) digerin, xûrandinekê ez girtime nizarim çi bikim.

Sibê rabûm çûm ber derê dadgehê, nama ku Welî Hakî Erdogan ji qazîyê zava yê xwe ra nivisî bû min dayê. Qazî ku name xwend ez li faytonê suwar kirim û em bi hev ra çûn nexwaşxana leşkerî. Nexwaşxana leşkerî dervayî bajar, li dîyarî Çemê Dîclê ye tenê bi serê xwe ye. Li wir nexwaşxane rawî min kir ew vegerî karê xwe, ez jî li wir mam û min ji dest bi karê xwe kir. Dora roja din li nexwaşxanê, tevî hindek xwendevanên di emrê min de em bûne heval. Germa nîvro em dadikevin, ber çemê Dîjlê avjenîyê dikin.

Lê dawîya heftê hat, min hîn karê xwe neqedandîye. Serda jî di miyane çavan de doxtor tesbît kir ku di çavê min kêmasîya nebijartina rengan heye. Dihate wê manê ku rapora ku ez bigirim wê kêrî min neyê. Heftê de du rojan dixtor dicivin raporan îmza dikin. Perê min jî li ber qedandinê ye. Tenê 2,50 lira bona perê trênê a vegerê ji min re maye. Di rewşa min de hin hevalên din jî hene. Me sê kesan biryar da ku em herin ji şaredarîyê alîkarîyê bixwazin.

Bîna şaredarîyê nêzî Mizgefta Mezin bû. Di ber derê şaredarîyê de darên tû yên mezin hebûn, li der û dora xwe sî dikirin. Di sîya wan de makînên rûletê danîbûn xort li ser cixarê dilîstin. Hin kesan li wir incix, morî, tizbî, esans, titûn difirotin. Me jî mina gelek kesî, wexta xwe piranî li wir derbaz dikir. Em sê heval bi hev ra çûn, me li derî şaredarîyê xist ketine hindur, pirsa xwe jê ra behs kir. Kesê ku em guhdarî kirin bi kêfxweşî bersiva me da û ceseret û zîrekî ya me jî pesinand. Lê divibîya ku em biçin, ji merkeza leşkerî belgeyekê bînin ka em ji bona çi li Dîyarbekir in.

Êdî ez ne tenê bûm em sê heval bi hev ra bi kêf çûn, belgeya ku ji me dixwastin, me anî û da Şaredarîyê. Di eynî êvarê yekî wezîfedar em li pîqabek fermî sûwarkirin

û birin nêzê derê Mêrdînê li cîyekî peya kirin. Li wîr grubek jin û mêrên kal û feqîr diman.

Kesê ku em birin bi kardarê wîr ra peyîvî û em teslîmî wî kirin. Vê êvarê xwarinek xweş dan me, fasulye, pîlava pirincê û xûşava mewijan...

Di malek mezin de bi gelek kesên kal û pîr ra em bûne heval. Lê me zû dest bi nerehetîyê kir.

Bi navê Ebû kalekî dora 60 û 65 salî hebû. Bi kûleki rê va tere. Çova dirêj di destê wi de, te digot çov balansa wî çêdike. Di wê germa demsalê de sakuyê reş û dirêj ku lê bû, ew zêde balkêş dikir. Wexta ku wan xwarin dixwar hevalekî ji me tasa Ebû nîşan digirt û parçek çaxil dawitê, çaqil ku li tasa wî diket, ji tasê çinginî dihat.

Wê demê Ebû har dibû, bi çov em zarok difetilandin. Lê kardarê wê derê zû pêşî li Ebû digirt. Kardar nedizanî ku em wî nerehet dikin, usa dizanî kû Ebû ji ber xwelî êrîşê me dike!

Sê çar rojan şûnda Şaredarîyê bilêta mina tirênê jî girt ez şevikê li tirênê sîyar bûm vegerîyam Xarpitê. Leşker trên tujî kirîye, cîh tune ku tu ling pavêjî. Leşkeran xwe dirêj kirine û di xwewê de ne, cîh tune ez rûnim. Di kompartimanekê de min li ser lingan xwe cîh kir. Ez jî li masa portativ a li ber pencirê rûniştim. Pencire heya jêr vekirîye. Di cîhê xwe de radizêm lê hin caran di virajan de trên min kil dike di pencirê de nivlaş derdikevim derva. Carek dudo tirsîyam ji wê rabûm çûm, li koridorê ser lingan sekinîm. Saet 6 ê sibê em gîhiştin Xarpitê. Bi lez çûm garaja ku erebeyên gundan lê radibin.

Dîsa li Kovancîyan peya bûm bi lez û bez min da rîya gund, dîsa eynê rê lê vedigerim. Di rê de tenê me, tu kes rastî min nehat, saet 18.00 evarê min xwe gîhande mal. Wexta dê û bavê min ez li ber derî dîtim gelek kêfxweş bûn, xûya bû ku derengketina min ew kiribûn fikaran.

Di sala 1976 an de dema ku li şaredarîya Dîyarbekirê ez bûm Midûrê Îqtisadê tevî alîgirê şaredar Kemal Ezber em çûn feqîrxana ku çend rojan lê bibûm mîvan, me zîyaret kir.

Piştî ku min qala çîroka xwe kir xebatkara jin got, *"madem usa ye hin pêwîstîyên me hene divê tu alîkar bî."*

Daxwazîyên wê malzemên xwarin û vexwarina kesên li saziyê bûn. Ew ji alî şaredarîyê ve dihatin temîn kirin, me jî daxwazîya wan pêk anî. Çend carên din jî ez çûm min ew gûhdarî kirin.

Di havîna sala 2011 an de min û lawê xwe Zinar bilêt girt ku em ji Stockholmê herin Dîyarbakirê.

Lê telefon hat ku dîya min pir nexwaş e, divîya bû ez zû herim. Min ji Zinar ra got, ez diçim, tu 17 salî yî, ziman dizanî, tenê jî dikarî bê. Min jê ra qala çîroka xwe ya di 12 salîya xwe de çûyîna Dîyarbekirê kir.

Piştî ku ez gudarî kirim, got *"tû ji çav derxistine, min mereq kir ew dixwaze çi bêje. Gotina xwe dubare kir, ji ber ku hûn 11 xwîşk û bira bûne, tu ji çav derxistine, lewma tu tenê şandine. Usa nebe meriv zarokekî 12 salî çawa dişîne rêyek usa dûr"!*

Min jî got *"eger, ku tu nikarî tenê bê Dîyarbekirê ez jî te ji çav derdixinim"* û ez dora roja din çûm, ew jî di roja xwe de hat.

Azmun ji bona dibistana mamostetîya leylî jî li bajar û navçan çêdibû. Ya me jî li navça (qeza) me, li Mêzgirê çê bû.

Roja azmunê em çûn Mêzgirê. Azmun bi nivîskî bû. Ji gundên Mêzgirê xwendewanên ku ji bo azmunê hatibûn sedûdeh (110) kes bûn.

Demekê şûnde xeber hat ku min azmuna pêşin a dibîstana mamosteyî qezenç kirîye. Di qeza me de me çar hevalan kezenç kirîbû.[15] Ev yeka di malbatê de bû sedema kêfxweşîyê. Azmuna duyem li dibistana mamaostan ya Akçedagê çêdibû. Akçedag navça Meletîyêye û ji bajêr dûrî ya xwe 27 km ye. Dibîstan jî di navbera Akçedag û Meletîyê de li ser rîya Semsur û Mereşêda ye. Ez û bavê xwe em bi hev ra çûn Meletîyê û şevikê li otêlê man. Sedema li vir mayîna me ew bû ku em Seyîd Husên Dogan bîbînin, nameya ku bavê min ji midûrê Lîsa Xarpitê Vahap Kîşoglu anîbû, em bidinê. Belkî ji bona azmuna min fêda xwe bibûna.

Husên Dogan serokê Partîya Demoqrat (partiya Menderes) a bajarê Meletîyê bû. Husên Dogan eslê xwe ji Dersimê, eqrebeyê Husênê muxbîrê Moxindîyê bû.

Kanîyên ku di nava bajar de di xulxulîya pir bala min dikişand. Mîna kanîya gundê me tim û tim hembêzek ava sar jê diherikîya û diçû. Min digot, belkê tenê li gundan kanî usa bê gem û azad in.

Nêzikî otêla me jî kanîke usa hebû. Qasî ku tê bîra min di otêlê de av di kuzikan dabû. Min ji ava kuzikan hez nekir. Kîngê ez tî dibûm diçûm kanîya nêzî otêlê û bi mistan têra xwe ava sar vedixwar û vedigerîyam otêla xwe. Me qasî kîlok tirî jî girt ber awa sar şûşt û tevî nanê teze xwar. Bavê min pir dixwest ku ez bikarim bikevim dibîstanê. Ez bi xwe pir bawer bûm, hertim min moral dida bavê xwe. *"Min digot tu qet mereq meke bavo ez ê qezenç bikim."*

Destikî xwe li stîyê min digerand ez ber bi xwe dikişandim û bi destê din li suretê min digerand û biken digot, *"ez jî ji te bawerim, lawê min lê dîsa jî meriv nizane. Me nama ku anîye em bidinê belkê fêyde xwe dibe."* Dora roja din em çûne edrêsa Husên Dogan. Me edrês bi rehetî dî. Mala xwe di nava bajar de nêzikî otêla me bû. Keçek ciwan û xweşik derê bexçe ji me re vekir em girtin hindur.

[15] Navên van jî Kazim Budak (Haysiv), Abdulhalik Aydin (Dirban), Kemal Ateş (Sindam), Hidir Arslan (Kelê).

Di bexçe de gelek dar û ber û hêşinayî hebû. Ew mîna parqekê bû. Di ber malê de holikek jî hebû, bi mêwa rez û lêpêçê ve ser hatibû girtin. Di holîkê de ji bona nanpêjîyê ocaxa agir jî hebû. Mase û kursî yên rûniştinê li wir vala bûn.

Li nêzî ocêx (pixirîgê) yekî şîşman, gepsor, zikkûş di dest de çentekî tenik, fotêrek li sêrî li ser lingan sekinîbû. Ew ji bona derketinê amade bû. Husên Dede ew meriva bû. Slavê bavê min bi dilsarî ragirt. Name ya ku me da wî, girt, çav lê gerand û kir bêrîka xwe. Husên kin peyîvîya, wî nedikarîya ji me re alikar bibe.

Pozbilindîya wî em êşandin û heya nuha jî di bîra min de ye. Min di zikê xwe de jê re dida carisîyan û sozda xwe, ku ez ê cehdbikim û azmunê bi hêza xwe qezenç bikim. Dora roja din em hatin dibîstana Mamostan, Axcedaxê.

Gelek kes hatîbû. Xwendewan, bavê wan û çend kes jî dayîk hebûn. Lê tiştekî bala min dikişand. Bavên van zarokan hemû di halê hev dabûn. Belengaz, bejntenik, rûqûrmiçikî, çermşewitî bûn. Ew gelê Semsur, Meletî, Dêrsim û Xarpêtê bûn. Ew bi çavûbiru û simbêlên xwe, bi kinc û solên xwe, bi zimanê xwe mîna hev bûn. Karker, kedkar û gûndî bûn. Xûya bû ku dewlemendan zarokên xwe nedişandin cî yê usa. Lê girse (kîtle) zû li hevûdu kelîya. Çend rojan şûnde lîsteya kesên ku 6 salan bikarîn ji kîsî dewletê bixwîn in êlan kirin. Dora sed û bîst kesî hatîbû bijartin. Navê min jî di dora şeşande bû. Xasima bavê min bi vê encmê kêfxweş bû.

Êvarê me xwe avête gundekî girêdayî Meletîyê. Em bûne mêvanê nasê bavê min. Camêr bi dilgermî û rûkenî em ezimandin. Jina malê ji gundê Mastan xwîşka Îmê Lotê bû.

Dora roja din me xatirê xwe ji malbatê xwest û bi trênê da rîya Xarpitê. Ji Xarpitê heya Kuwancîyan[16] em bi erebê çûn. Ji Kuwancîyan heya gûndê me jî 6 saetan bi peyatî rê çûn. Saet li dora 21.00 me xwe gihande mal. Kûçikên me hewtîyan heya 400 m ber bi me va hatin. Ji ber ku bavê min gelek wext bi min ra bû wê salê êkina me dereng hate çinîn. Gundîyan çilo qir dikir, lê em hîn li ber zeviya genim bûn.

Rojekê ji gundên dorê deh kes bi das û êlcegên xwe hatin alîkarîya me. Wan heya êvarê bi çîrok û henek, li zevîya Kanîya Kûsîyan genim çinîn. Min jî bi kerê sap, şixire dikişand û ji wan ra ji mal av û xwarin dibir.

Wan bihîstin ku min îmtihan qezanç kirîye zêtir bala xwe dan min. Hinekan jî bi henek wek "mamoste" bang min dikirin û ez dikirim şermê.

---

[16] Kovancîyan macirên ku di sala 1952 da ji Bulgaryayê hatibûn têda hatibûn bicih kirin. Wan navê gundê xwe dabûnê. Me digot gundê Macîran.

Ji bona malbatên feqîr di dibistanek mecanî de xwendin avantajek bû, ji ber wê min, bala wan dikişand.Wan wê rojê karê me gelek sivik kirin. Êkina mayî jî di nava çend rojan de me xwe çinî û ew ji zevîyan anî ser bênderan.

Piştî hin Amedekarîyan divîya ez vegerîyama, dibistanê dest pê dikir. Lê ji bona vegerê perê rêya min tune bû. Me hîn ne tene û ne jî pez nefirotî bû. Gundîyan exlep - piranî payîzî genim û dewarê xwe difirotin û diçûn bajar hewcedarîyên xwe dikirin. Bavê min ji dosteki hin pere dên girt ez pê çûm dibistana xwe.

**Dibîstana navîn**

Me kar û şuxulê xwe qedand û ez çûm li dibîstana mamostan a Akçadagê cîh bûm. Di cîhê razanê de ji me ra cil rawîkirin. Cara pêşine cîh û cila min kifşe. Li gund doşegên ji hirî yê dirêj û fireh me davit erdê, em zarok yek dudo têde radizîyan. Zarokan dikarîya di her nivînê de razên. Lê cara yekê ye ku tevî 50-60 kesî di salonekê de ez radizêm.

Wê wextê di gundê me de elektrîk, radîo, erebe, tualet tunebû. Li gund me dikarîya hemû zevîyan wek tualetê bikar bînin.

Li vir di hindur de tualet û av heye. Dîsa cara yekeme ku em ji dayîka xwe dûr in û nivînên xwe em xwe çê dikin.

Ji bo sinifa yekem 120 xwendevanên nû hatine girtin. Şêst kes jî, ji parve hatine girtin û bona sinifa yekê hatineS amade kirin. Serhev sinifa yekê, em 180 kesin, ji me 3 şûbe hat amadekirin. Dibistan şeş sale. Di dibistanê de, di hemû sinifan de nêzî 700 xwendevan heye.

Xwendevan tenê law in lê salên dawî 4-5 keçên karker û memûrên dibîstanê û çend keç jî ji gundê cîran, Karapinarê jî hatin.

Lê çawa ku min got dibistana me ya lawan bû. Tenê çend xwendevanên keç hebûn, ew jî roj dihatin êvaran diçûn mala xwe. Sibê sibê saetek mitaala- xwendin piştî wê em diçûn taştxwarinê. Sibê saet 8 an de di sinifan de dersan destpê dikir. Êvaran jî berî şîvê û dû şîvê ra du saet ji bona xwendinê hebû. Saet deh, dema razanê bû. Lê pir caran ew saet dibû 11 û 12 jî.

Sala pêşin çetin bû ku meriv rûtîn û proxramê bigire xwe. Tirkîya me jî ber ku têkûz nebû, termîna pêşin min gelek zahmetî kişand. Rojekê mamoste ji min ra got here oda sêpê (sehpa) makîn fotoxrafê bîne. Min nedizanî, sêpê çîye, çawaye, grane sivike? Çûm venegerîm, piçekê şûnda mamoste dû min hat, pirsî ku ez li ku mame. Min got tiştê ku te xwast li vir tune.

Mamoste li ser masa ber min, tiştekî sê ling rakir, got *"lê va çîye?"* Wê rojê ez pirsa *"sehpa"* yê fêr bûm.

Dîsa di dersa muzîgê de mamoste qala "nota", "gam", " porte" û "kilîtê" dike. Dipirse ka kî,*"dikare bêje kilîta ku li textê reş e ji bo çîye"* ez li textê reş dinêrim, li

kilîta derî digerim, kilît milît nabînim. Qasî ku ez dizanim du kilît hene, yek ji daran çêdikin ji bona derê axûr û kadînan, yek jî ji hesin çêdikin ji bona derê oda û malan.

Her roj em tiştekî fêrdibin, eger ku em zimanê xwe jî bîra nekin başe. Mamostên me piranî Tirkê Anatolîyê bûn. Ji halê me zêde fêmnedikirin.

Dîtinên şoven û nîjadparastî hînî xwendevanan dikirin. Di roja mirina Mistefa Kemal (10 Mijdarê ) de ji sêbê heya nîvê şevê, bi me xwendevan dudo dudo bi kincê îzcîyan yê kin, di binê ba û baranê de, di binê berfê de, li ber pêykerê wî nobet didan girtin. Di wê demê de pir caran berf û baran di ser me de dibarîya û gelek sar bû.

*"Dijminên Tirkîyayê gelek bûn, Yunan a esasî bû"* wê demê pirsa Qibrisê jî rû dabû, mamaostan her yekî gora branşê xwe li dijî Yunan propaxande dikir.

Di dersa resimê de gelek xwendevanan ji ber van propaxandan, tilîyên xwe bi cîlêtê dibirîyan, bi xwîna xwe nexşa Qibrisê boyax dikir û li bin jî dinivisîya "Qibris Tirke û wê Tirk bimîne." Ez jî yek ji wan bûm. Mamostên dersê ew yek rexne nedikirin, bi vê yekê ew serbilind dibûn. Her mamoste kî me navik lê kiribû. **Keloş, Faro, Efendim, Kuful, ...**

Mamosteyê sporê ku porê xwe tune bû, navê wî danîbûn **Keloş. Faro,** nave mamaoste yê muzîgê bû. Ew ji du notan yên muzîgê ya **fa** û **re** yê derxistîbûn, forma kurdî bû.

Di zimanê kurdî de dawîya navên nêr bi tîpê **o**, nave mê bi tîpê ê diqede, Heso, Nazê ...

Mamosteyê ziman û edebîyata Tirkî serîbinê hevokê gotina "efendîm" bikar danî. Hin hevalan di dersa wî de ew ji bona ku bizanin çend caran dibêje "efendim" guhdarî dikirin û not digirtin. Ew hêjmar her tim ji ser 47 carî ra bû. Lewma wî navê **Efendim** heq kirîbû.

Nave mamosteyê bîyolojîyê jî me danî bû **Koful**. Koful ji navê valahîya hucran ra tê gotin.

Çend rojan berê mamostekî leşkerîya xwe qedandîye hatîye, me hîn hevûdû nasnekirîye dibêje, ew sibê wê test çêke. Heta wê wextê kes nizane test çîye. Kelecanekê xwendewan girtine, em li dij derdikevin ku ew wê rojê azmun çêneke lê ew dibêje na. Me dî ku ew ji ya xwe nayê xwar, em xwendevan ji li hîle û desîsan gerîn.

Di sinifê de em pê hev di rêzê de, di masê de dudo dudo rudiniştin. Ez ji textê reş ber bi paşve di dora seem de û li ber diwar, Xidir, hevalê ku tevî min bixebite jî paş min va di rêza pêncem de û alî diwar rûdinişt.

Min got Xidir min formîlek dîye. Mamoste pirsê dixwîne em tenê li himber numira pirsê R (rast) an jî Ş (şaş) dinivîsin.

Em bendikî ber diwar ra dikişînin serî kî tu, serî kî jî ez em li destê xwe dipêçin, piştî ku mamoste pirs xwend eger rast be, carekê, nerast be du caran emê bend li ser hev bikişînin.

Hevalê ku di navbera me de rûdinişt, wî jî dixwast ew jî bizane, mesele çîye, lê me jê ra negot em çi fikirîne.

Mamoste dest pêkir pirs xwendin, em jî li ser kaxizê li himber numirên pirsan R an jî Ş dinivîsin. Me bend aktîf kir, lê hin caran bend naşixûle. Tu nabêjî hevalê navbera me bend zeftkirîye, lewma naşixûle.

Di encama azmunê de me herdu hevalên ku serê bend girtî bû poengên herî bilind, lê hevalê ku orta bend qeft kirîbû jî poengên herî nizm girt.

Li dibistanê salê carekê, payiz payîzê kinc û sol didan me. Bona kinc durinê ji Meletyê terzî-dirûnkar tevî malzemên xwe dihatin çend mehan li dibistanê cî dibûn karê xwe dikirin û diçûn. Xwendevanên sinifên bilind bi rûşwet qûmaşê rind ji xwe ra dibijartin.

**Derba leşkerî ya 27ê gulanê**

1960 ê û 27 ê meha Gulanê derba leşkerî çê bû. Hikûmata ku bi dengê gel hatîbû bijartin ji holê hat rakirin. Parlemento û partîyên sîyasî hatin girtin. Li dibistana me mamoste û karbidestan şahîyek li darxistin kêfxweşî û piştgirîya xwe dane zanîn. Şahîyê bi govend, bi sloxan û merşan heya êvarê dom kir.

Çend rojan piştî derba leşkerî wek propaxanda serokê derba leşkerî Orgeneral Cemal Gursel hat Meletyê. Ji dibistana me jî mamostan em grubek xwendevan birine Meletyê û di pêşwazîya Gursel de amade bûn.

Hezirana sala 1960 î de sinifa me tevî çend mamoste û midûrê dibistanê Alî Îhsan Beyhan çûn, li zozana çîyayê Beydaxê, du heftan li wir çadir çikand û qamp kir. Mîtînga ku li Doxanşehirê ji bo piştgirîya generalan hat çêkirin mamostan em jî ji qampê birin û beşdarî xwepêşandinan kirin.

Destpêka dibistanan ya sala 1961 î de ji Enqerê du mufettiş hatin dibistana me bi rojan li wir man. Ew çûn hemû sinifan, peyîvîn û bi xwendevanan ra têkilî danîn. Naveroka pirsa wan *"asîmîlasyona zarokên Kurda"* bû. Jî xwendewanan dipirsîyan, bona zarokên ku Tirkî nizanin çibikin?

Qaşo em jî mamosteyên namzet bûn ji me pêşniyar dixwestin. Cara yekî mufettîşan -yatili ilkogretim okullari- dibîstanên leylî ya ewlîn ji bona zarokên 6 û 12 salî li wir anîn ziman.

Piştre ew proje pêşket. Xasima li Kurdistanê ew (Dibistanên Mecanî Ya Navçe – Herêm) li gelek cîyan hatin damezrandin. Ew bûn merkeza helandin û asîmîlasyona ziman û çanda kurdî.

Demekê şûnde dibîstana navîn jî kirin ser wan dibistanan.

**Boyqota yekem**
Di dibistana leylî de me şeş salan bi hev ra rojên baş û xirab derbaz kir. Di bûyeran de pir caran me dikarî li hevûdû tesîr bikin û biryarên hevpar bigirin. Mamostek dihat sê dersê me; edebîyat, kompazîsyon û dersa coxrafyayê. Mamoste xort e, ji alî têkilîyên sosyalî feqîr e, metod û tewrê xwe nexweş e. Wezîfê li ser wezîfê dide, çend rojan carê de azmun dike û em bêzar kirine. Ji dersê û azmunan bêtir tiştekî nizane û napeyîve.

Xwendevanekî di mutaala êvarî de ji bo mamoste boyqot pêşkêş kir. Yên din jî macera dixwestin, li ser pêşniyarê hate peyvandin û dawîyê ew hate pejirandin. Hevalekî bona ku biryarê saxlem bike, pirtûkekî gelek piçûk qasî qûtîya kirkûte ji çentike di stûyê xwe de dardakirî bû, da derxist got *"Va Qûran e, kî ku qebûl dike û îxanetê nakê bila dest bide ser qûranê û sond bixwe."* Hevalan bi dor dest dane ser pirtûka piçûk sond xwarin. Ew yeka ji min ra wek henek hat. Pirtûkek qasî kirkûtê çi tesîra xwe hebû ku merivan ji şaşitî û bêbextîyan biparêze. Dora sondê hat min, min got, ez bi xwe bawerim nelazime ku ser quranê sond bixwim. Ez jî soz didim, dernakevim dervayî biryara ku me girtîye.

Sibê dersa pêşin ya edebîyatê ye, piştî taştê me hemûyan sinif terikand û çûn li qantînê rûniştin. Alîkî ve jî em mamoste dişopînin ka ew çi dike? Mamoste ji sinifa vala zû vegerî û çû di derheqa rewşê de agahî da karbidestan.

Cigirê midûr û mamostê nobedar hatin qantînê bi me ra rûniştin em guhdarî kirin. Bona ku ji me kes wek serokê berxwedanê neyê destnîşankirin, em hemû bi hev ra bersiva pirsan didin. Me daxwaz û rexnê xwe gotin em li hev hatin.

Karbidestan nerm pê girtin, nedixwastin ku di nava xwendevanan de ew bibe kevneşopîyek.

Piştî li hevhatinê em çûn li sinifê rûniştin, mamoste hat tenê yek gotinek kir, wek nifir. "Ez hêwîdikim ew tiştê ku we li himberî min kir, bê serê we jî."

**Dîsîplîn an ceza?**
Çend salan em di meha Cotmehê de diçûn dibistanê, Hezîranê de wedigerîyan mal. Di betlanean (betlanê) de kêm caran em diçûn gundê xwe. Him rêya me dûr bû him jî aborîya me dest nedida ku em herin û bên.

Di sinifa 6 an de min û hevalekî xwest sê rojên betlanea serê sale de em herin gûndê xwe. Em bê îzina îdarê çûn, hevalê min çû gûndê Depê Qeresqelan, ez çûm gundê xwe Haysivê. Du şevan li mal mam, dora rojê divê ez herim gundê hevalê xwe û em ji wir vegerin dibistanê. Zivistanek sar û gelek berf li erdê ye. Îro ji tevî bayê berfek dibare tu nikarî bist metro pêşîya xwe bibînî. Bona ku ji çem derbaz bibim xalê min, Mihemed hesp anîye, em çûn ber çem, birrê Dalê. Îro li wan deran birr nemaye. Ava barajê ew der kirine golên kûr.

Di avê de parçên cemedê –xişik pêhev tê. vexta ku hespê xişik didît, di tirsîya û şûve baz dida. Me çikir hesp neket avê.

Ez mecbûr mam, min kinc û solê xwe derxist, kire nava cakêt pêça girt destê xwe û ketim avê. Tenê derpê kin li ser min ma. Li ber wî çemî çima min ew dernedixist nizanim. Av xwe dide nava min û pir sare.

Dema ku pê li keviran dikim, tilîyên min bi keviran ve dizeliqe. Alî din ve pêhev kerîyê cemedê-xişik tê, eger ew li min kevin canê min bibirin. Perçê cemedê yek tere yê din tê, hindek gelek mezin tên. Ez disekinim heya ew ji min derbaz dibin terin wext digire.

Bi desteki kincên xwe li jor digirim ku ew şil nebin, bi destekî jî bi çoyê dest xwe bi tîkikî didime ber perçê cemedê ku ew li min nekevin, dawirin herin. Bi banga xalê xwe min çem zorê derbaz kir. Ji avê derketim, qor û lingê min, tilîyên min, organê minî cinsî tevizî ne. Cemedê cî cî laşê min birîye. Him ji ber sermê destê min qemirî bûn, him jî min fedî dikir ku ez derpê-kirasê şil ya li ser xwe derxinim. Min ser wî de pantol li xwe kir, gore û sol kirine pê û berjor meşîyam.

Him nîv metre berf li erdê ye û rêç tune him jî rîya min tim û tim tîk e, ber bijor e. Nîv saetê şûnda piçekê germ bûm. Lê bi kiras û kincê şil heta gundê hevalê xwe, Qeresqelan çûm. Li gund li ber sovê min xwe zûha kir. Roja din em çûn dibistanê, wek min li jorê gotîbû em bê îzîn hatîbûn.

Îdara dibistanê em bi *"sê rojan ji dibistanê dûrxistinê"* ve ceza kir. Me ji bona Turizm Yuksek Ogretmen Okulu-Dibîstana Turizm a Mamostan a Bilind, muracat kiribû. Bo ku notên me baş bûn dibistanê em bêazmun digirt, lê piştî ceza sê rojan kaxizên me li me vegerandin, ji ber wê cezê em negirtin dibistanê.

* * *

Sinifa 6 an piranî li dibisatanan û gundan bi pratîk dihat derbaz kirin. Ya me jî usa bû. Me 45 roj li gundan 2 hefte jî li dibistanên bajaran bi stajê derbaz kir.

Staja pêşin li gundê Dedeler a girêdayî Doxanşehîrê derbaz kir. Gund, elewî pêşverû û merivhez bûn. Dibistana me ya Akçedagê xwarin û nivînên me girtin tevî me anîn li gundê Dedelerê cîh kir.

Em şeş heval bûn. Bi dor rojê hevalekî xwarin çêdikir û paqişîya malê dikir. Çêkirina xwarinê li gorî lîsta amadekirî dibû. Di lîsta wê rojê de li ba hin xwarinên din xwaşav jî hebû

Wê rojê aşpezî dora hevalê Fadil bû, em 5 kesên din diçûne dersê. Li derketinê min bi henek got hevalê Fadil tu rûnê xwaşavê bîra nekî.

Nîvro em ji dersê derketin û hatin mal, leganek dagirtî wek ava cemidî,derva di nava berfê de ye. Derbazi hindur bûm heval rûniştine, bi lêv û pozin, bêdengin. Min pirsî:

-Çi bûye hevalino?

-Te ji Fadil ra gotîye "tu runê xwaşavê bîra nekî" Fadil jî tewek rûn helandîye, berdaye ser xwaşavê û ew derva danîye nava berfê ku xwaşav sar be.

Mi got:

-Min henek kirîye, ma Fadil te qet xwaşav nexwarîye? Di xwaşavê de rûn dibe caran?

Me legan anî rûne ku sera cemidî bû bi kevçî top kir û xwaşava xwe xwar.

* * *

Piştî pratîka gund dor hatîbû staja bajar. Li Meletyê em sibê sibê terin dibîstanan bi rêberîya mamostan ders didin, êvaran jî tên li mîvanxana fabrîqa Sûmerbankê radizên.

Sibehekê berî ku herim dibistanê, wek her roj li pastaxaneke rûniştim min taştê xwar. Li rabûnê cûzdanê xwe derxist pere bidim, min di ku di cûzdan de pere tune. Êvarî 60 lîrayê min hebû, lê nuha ew tune bû. Aşik Weysel negotî *"cûzdan di bêrîkê de ye, lê pere tune."* Min hemû bêrîkên xwe sekir, perê hûr civand, zorê dênê xwe da û çûm dibistanê. Heta êvarî ez wê yeka fikirîm, kê va dizî kirîbû?

Mehek din şûnda em hemû dibûn mamoste û xelkê zarokên xwe wê emanetî me bikira. Ma kesê han dikare ku ji van emanetan ra îxanetê neke? Êvarî min ji hin hevalan ra mesele vekir. Perê du hevalên din jî hatibûn dizîn. Hevalan wek diz bi navê Îsmet yekî ji Axina Xarpitê işaret kirin. Min Îsmet dît jê pirsî ew pere wî girtîye an na. Piştî hin gengeşîyan Îsmet qebûlkir ku wî girtîye, lê soz da ku şunda bide.

Di dawîya salê perwerdê de xwendevanên ku diploma digirtin, dibîstanê wek heqê rê 90 lîra pere dida wan. Îsmet soz da ku gava ew 90 lîrayê bigire, perê min bide. Min jî nexwast ew zerar bibîne, ji îdarê dibistanê ra negot. Lê Îsmet roja ku pere girt xwe vêşart, ez jî zêde pêneketim, Îsmet pere neda û çû. Nizanim di jîyanê de Îsmet dizîya xwe domand, ew ji xwe ra kir senet an dev jê berda. Carek din rastî wî nehatim. Rastî kesê ku wî nas bike jî nehatim.

* * *

Di Gulana 1962 an de xwendevanên sinifa dawîn a dibistana mamostan ya Axcedaxê bi hev ra çûn gera Erziromê. Li Mama Xatûnê em bûn mîvanê Dibîstana Mamosteyan a Keçan.

Midûrê vê dibîstanê salekê berê li Akçedagê mamosteyê me bû, ew ji wir hatîbu vira. Programa gerê jî wî çêkirîbû. Em roj li bajar gerîyan şev jî li dibistanê bûne mîvan. Şeş salan wek dibîstana lawan me keç, keçan jî lav di sinifên xwe de nedîbûn. Bona wê jî di nava xortan de nêzikbûna hev û têkileyek sosyalî rehet çênebû.

Keçan şevek tîyatro û folklorê pêşkeşkir.[17] Dora roja din em vegerîyan Akçedaxê. Dawîya meha Heziran a1962 de min dibîstan qedand û ez bûm mamoste. Min wek cîhê xebatê ji Wezereta Perwerdê sê bajarên Kurdistanê Çolîg, Xarpit û Dêrsim daxwaz kir.

**Li Çolîgê (Bîngolê)**

Rojek germa Tîrmehê min ji midûrîyeta Perwerda ya Çolîgê nameyek girt. Tê de hatîbû nivisîn ku ez wek mamoste li gundê Mirilê (Baxçelî) girêdayê Çolîgê hatime vezîfedar kirin.

Heyecan û hêvîyen mezin bi min re çêbûn. Gavekê zû dixwazim herim gundê xwe bibînim. Saet 04 ê sibê rabûm meşîyam ji çemê Pêrê li birê Dalê, birê ku di meha Çile de zorê derbaz bibûm, nuha bayê bezê derbazî alî din bûm. Di çar saeten de hatim Lexanê. Ereba ku hat lê sîwarbûm çûm Çolîgê Li çarşîya jêrin peya bûm meşîyam çûm daîra perverdê.

Min mamostê xwe Nîyazî Oztirk dî, me lihev pirsî rojên çûyî bi bîranî. Ew di didibistana Yenîşehîrê de midûr bû. Ez bi dîtina mamosteyê xwe pir kêfxweş bûm. Nîyazî Oztirk mamostê minê dibistana ewlîn bû û min gelek rêza wî digirt.

Ez rêya gundê ku herim nizanim, lê gorî ku ji min re rawakirin divîya bû heya pira Gêncê bi erebê û ji wê şûnde jî peyatî biçim gûndê Mirilê.

Min jî usa kir. Li pira Gêncê ji erebê peya bûm, bi pirs û pirs meşîyam. Dora 3 saetan çûm gundê Mirilê.

Gundê Mirilê nêzî çemê Miradê ye. Kîran, Suvêran, Tanzut, Pakedon, Mîyalan û Musyan gundên cîran nin.

Çûm ba mixtarê gund Mehmet Yilmaz,[18] em bi hev ra çûn min dibîstanê, derî vekir, dît û ez bi lez vegerîyam. Min dixwest wê şevê vegerim bajar.

Mixtar Mehmet Yilmaz û çend gundîyên ku min dîn rûken û dilgerm bûn. Min cara yekem dî, zimanê ku gundî yê min dipeyîvin, ez rind tê nagîhîşim. Ew Tirkî an jî Kurmancî nebû.

---

[17] Di vegerê da li garaja bajar rastî Kemal Burkay û Xelîl Îletmîş hatim. Ew li Erziromê leşker bûn.

[18] Di sala 1977 de wexta ku ez li belediya Dîyarbekirê dixebitîyam, min sekir ku mixtarê Mirilê Mehmet Yilmaz û hin merivên xwe hatine Dîyarbekirê li taxa Fisqeya cih bûne. Ez û xanima xwe Nazlî yê çûn ditina wan, me ew ezimandin mal. Hatin çûyîna me xurt bû.Gelek feqîr bûn. Du xortên wan Ehmed û Filît xwendewanê minê kevn min li ba xwe di Şaredarîya Dîyarbekirê da girtin kar. Di hilbijartina ku Mehdî Zana bû berendam-namzet hatin ba me. Li ser hilbijartinan me sohbet kir. Bavê Filît Henefî ji bêrika xwe destek pere derxist, nîşanî me da. Got "va perena Yahya Memetoxlî da min bo alîkarîya camîyê. Lê piştî ku min hun guhdarîkirin ez şerm dikim van peran bigirim, ez ê bibim perên wan şûnde bidimê û cihê min jî li ba we ye." Memetoxlî jî di partîya CHP da berendamê şaredarîya Dîyarbekir bû. Hevalên DD jî pişgirîya wî dikirin.

Cara pêşin, min zaravayê Zazakî û Kurdê Zaza li vir naskir. Lê xeynî zarave, hemû jîyan, dawet, adet û çanda me yek bû. Min gûndî û gundê xwe hezkir. Miril dora sîh malî bû, 35-40 jî xwendevanê xwe hebû. Ez yek mamoste bûm, ango him midûr him jî mamoste bûm. Li gûnd çend salan berê dibistan vedibû.

Ji dibistana gund bêtir kesî dibistanên din nexwendî bûn. Piranîya gundîyan zimanê Tirkî nedizanî. Mehmet Yilmazê ku ji eskerîyê piçekê Tirkî fêr bibû, ew jî kirîbûn mixtarê gûnd.

Ji bona çandinê zêde erd tune bû. Li jorî gund deştek-rastek hebû li wir piranîya gundîyan yek parçek erdê xwe hebû, li wir çandinî dikirin.

Piranî garis dajotin, genim hema hema tune bû.

Li vegerê nêzî pira Gêncê raste keçikî û du xortên sivik (ciwan) hatim. Di çola bêser û bêber de raste gulek bexçe hatîbûm.

Di sala 1962 an de li mêrga ber çemê Miradê keçik serqot û kincê modern û kin lê, wek xewn ji min re hat. Me slav lihev kir û hevûdu naskir. Keçik eba nahîya Musyan bû, xortê cem jî yek birayê wê, yê din jî gundîyê wê bû. Ebe xanim ji Rojava Anatolîyê ji bajarê Muxlayê bû.

Ew ji qeza Gêncê dihatin. Tiştên ku ji bajar kirîbûn kera li pêşîya xwe barkirîbûn. Ew çend sal bû li wî gundî dixebitîya. Wê ez daweta gundê xwe kirim, lê min dixwest gavekê zû vegerim Çolîgê. Di yekê Cotmeha sala 1962 an de li Mirilê me dest bi perwerdê kir. Piştî çend mehan şûnde ku min der û dora xwe naskir rîya xwe bi nehîya Musyan xist, ebe xanim bi mamaostekî ra nîşan bibû.

* * *

Rojekê mixtarê gund bang min kir ku ji Enqerê mîvanê wî hatine û ez herim ba wan. Mîvanê xwe grubek mendiz, topoxraf û memûrên din bûn. Di dest wan de hin makînên sûretkişandinê, xarîte (nexşe) û aletên din hebûn.

Gotin ew dixwazin erdnîgarîya Çolîgê tesbît bikin.

-Rê û dirban, çem û birran, çîya û deştan, şikeft û daristanan, çi hene em yek û yek bizanin.

Min got ew çima tê kirin.

Gotin:

-Ew karê dewletê ye, dewlet dixwaze bizane, belkê rojekê ew pêwîst be.

Meriv dibîne ku ji bona şerê li himber Kurdan a îro dewletê ji wê demê de xwe amade kiriye.

* * *

Grubek gundî sibê terin Gêncê. Ji bo zivistanê, xaz, xwê, şekir, çay ji bo zarok û jinan sol û hin lazimîyên xwe bigirin. Ji min ra jî ocaxa xazê, fere û fol, ji bo xwarinê hin tişt lazim in. Divê ez jî herim wan bigirim, tiştê ku bikirim jî dikarim li golîga wan barkim. Ez jî tevî wan bûm û me da ser rîya Gêncê.

Nêzî pira Gêncê gundîyan egalê serê xwe topkirin kirin koka bîyê, serqot man. Egalê li dorpêç serê wan de şop hiştîbû.

Min bi mereq pirsî çima ew egalê serê xwa derdixinin, li vir vêdiêşêrin, gotin li bajar vana qedexe ne, ji me digirin.

Em çûn ji me her yekî firotin û kirîna xwe kir me da rîya gund.

Vegerê, wan dîsa egalên xwe ji cîhê vêşartî derxistin, li serê xwe pêçan, bi ken û kêf em hatin.

Li gundan bi zimanê Kurdî peyvandin û di cîhê şevqe de egal û şal karanîn jî qedexe bû.

Carekê ji bona karekî du jendirme hatîbûn gund.

Gundî li nêzikî dibistanê civîyabûn, bi tirs û îtîat ew gûdarî dikirin. Xalê Memîşê 50 salî, egala serê xwe li serî bû.

Jendirme nişkeva dadayê, egal ji sêrî girt, pêşta xwest biçirîne nebû li erdê xist. Sîle jî li xalê Memîş xist ku çima ew egalê bikar tîne. Ew yeka li min zor hat lê tiştê ku min bikarîya bikirana tunebû.

Dij derketina min zêde netîce neda. Her jendirmekî Tirk li wan gundan xwe Atatûrkek dihesiband.

* * *

Rîya hesin, rîya trênê jî hebû. Trêna ku ji Xarpitê dihat ji Gencê ve derbaz dibû, diçû Mûş e.

Kesên li wê navçê ku bixwestana bi trênê biçûna Gencê li îstasyona Suvêranê sîyar dibûn. Lê trên rojê carekê derbaz dibû. Gundîyên vî alî li gundê Tanzutê çemê Muradê bi gemîyek piçûk derbazî îstasyona Suvêranê dibûn.

Li gundê Tanzutê, bi nave Şêx Abdulhemîd Bîlgîn merivekî welatperwer hebû. Di rêwîtîyekê de çend saetan bibûm mîvanê wî. Merivê wî û ji Kurdên gruba 49 an Mehmet Bîlgîn[19] jî li mala wî bû. Li wir li ba wan, min cara yekê rojnama Dîcle û Firat dît.

[19] Mehmet Bîlgîn di leşkerîyê da rutbê bînbaşîtîyê girt. Lê di rojnama millîyetê da got ku ez di îstixbaratê da xebitîme.

* * *

Li gundê cîran, Mîyalan bi navê Erdal Erdoxdu jî hevalekî min dixebîtîya. Ew ji Akcedagê bû û di dibîstanê de hevalê min bû. Ez rojek yekşemîyê çûm zîyaretîya wan.

Erdal û du mamostên din bûn. Ew jî du xortên ji Stenbolê bûn, leşkerîya xwe dikirin. Piştî derba leşkerî ya 1960 gelek xwendewanên zanîngehê, leşkerî ya xwe li gundan wek mamoste kar kirin.

Rind nayê bîra min lê navbera herdu gundan bawer dikim dora saet an jî saetûnîv bû. Ez hîn gîhaştîbûm ba wan, dû min bekçîyê gundê min xeber anî ku bavê min hatîye. Bavê min, birayê min Turgut û xwîşka min Ekîle jî bi xwe ra anîbûn ku ew li ba min bixwînin. Herdu jî diçûn pola 3 em.

Di gûndê Hulman de bo ku cî tune bû dibîstan hatîbû girtin. Bavê min ji bona me, du bar ard, qarme, rûn û doraq anîbû. Lê barê ku ji Xarpitê bi trênê anî bû li îstesyona Suvêranê danî bû. Lazim bû yek keran bibe, wan barke bîne. Me ji gund ker pêydakir û barên xwe da anîn. Ard heye lê kesê ku nan bipêje û xwarina me çêke tune.

Ji gund me jinek dît, ardê xwe da cem, heftê carê nan dipat û ji me ra dişand. Jinikê ji nan para xwe digirt, min hin pere jî dida wê.

Rojekê em herdu bira û xwîşk li dora sifrê rûnîştine, xwarin dixwin, wexta ku min parçek ji nanê teze kerî kir, min di nava nan de nixteke reş dît. Min lê rind mêzekir ku kêç e. Parî di gewrîya min de ma. Min ji wan re tiştek negot, çend rojan mada min negirt ez nan bixwim. Sala 1962-63 ji bona min bû sala tecrube, nasandina der û dora xwe.

Gundî jî mixtacê alîkarîya zarokên xwe ne. Lê ez jî hatina zarokan dibîstanê girîng dibînim.

Xwendewanê ku li textê reş hevoka ku dixwazim binivîse bala xwe dayê ku ji alî çepê dest bi nivîsandinê dike. Çend kesên din ceribandin ew jî ûsa.

Min mereq kir, ew çima usa dinivîsin? Fêrbûm ku ew terine qursa zimanê Erebî jî. Ji bê tecrubetîya xwe bê ku dayîk û bavê wan ra bipeyîvim min ji wan xwest ku ew çarek din nerin qursa zimanê Erebî.

Dora roja din, sibê de zû em hîn di nava cîyandabûn 15-20 gundî tevî mela û mixtarê gund li derê me xistin.

Mi got:

-Xêre mixtar, sibê sibê...

Mixtar got: "Te ji zarokên me xwestîye ku ew nerin qursa Qûranê. Bavê wan ji ber vê yekê hatin, dixwazin bi tera bipeyîvin."

Ez çûm min derê dibîstanê vekir, ew girtin hindur.

Gundîyekî bi hêrs got: "Ma tu dixwazî ola me qedexe bikî?"

Di rastî de min nezanî ku ew yeka ewqas dijitî bîne. Min dixwest zarok tenê bi yek elîfbê ra mijûl bin.

Elîfba Erebî û ya latînî ji hêlên nivîsê de li dijî hev dest pê dikin. Erebî ji alî rastê, latînî jî ji hêla çepê ber bi hêla rastê tê nivîsin.

Ji alî zanebûna olî de ez nezan bûm. Di dibîstanan de bi jehra Kemalizmê ve em hatîbûn jehr kirin. Serda jî ez ji malbatek Elewî û ne xwedî bawerîyên xurt dihatim. Lê me di nava xwe de pirsgirêk çareser kir.

Di destpêka sala perwerdê ya 1963-64 a de brayê min Atîlla jî bi daxwaz û zora xwe hat ba min. Zora xwe dibêjim ji ber ku sala par Ekîle û Turgut jî ba min bûn. Îsal jî bavê min wexta ku ew girtine bîne ba min, Atîlla jî bi zora xwe bi wan ra tê. Êdî me ew şûnve neşand, em bûn çar kes.

Me dest bi perwerdê kir, çend meh derbaz bûn. Rojekê ez li Bîngolê bûm bi rîya qereqolê Nehîya Musyan agahî dan min ku diwarê dibîstanê hêrifîye. Wê demê li Kurdistanê tenê qereqolan derfetên xwe yê telefon û têlê hebûn.

Ji bona xwîşk û birayên xwe ez gelek tirsîyam. Peyatî bi çîyê ra rêçûyina minê gund bi kêmanî şeş saet wext digirt. Lê merivan eger ku erebe bidîtina û heya pira Gêncê biçûna piştî wê jî peyatî sê, sê saet û nîv rê dima. Min jî usa kir bi erebê çûm li pira Gêncê peya bûm û çûm.

Wexta ku min xwîşk û brayên xwe li mala Hemîd Karaaslan sax û selîm dîtîn pir kêfxweş bûm. Cîranê min kevneşopîya kubarî û comerdî ya Kurdan dabû domandin, zarok girtîbûn mala xwe. Me li ba Hemîd Karaarslan odek girt çend rojan têda man. Min ji bona rewşa avahîya dibîstanê Midûrîyeta Perverdê ya Bîngolê agadar kir.

Qadroyên teknîk, pisporên wî karî hatin di derheqê dibîstanê de rapor dan ku, *"di dibistanê de razan, mayîn û pêkanîna karê perwerdetîyê nemimkun e."* Dibîstana Mirilê hate girtin, lê Midûrîyeta Perverdê ya Bîngolê lazim bû ji min ra cîh bibîne.

Me êdî nedikarî di wê rewşê de bimînin. Min xwîşk û brayên xwe girtin û da rîya gundê xwe, Dêrsimê. Li Lexanê em peya bûn û ji wê çûn gundê Kurusivan mala dostekî.

Radyoke min heye min ev jî girtîye cem xwe. Tevî xwedîyê malê û gundîyan xwe kerkirine, li dora radyoyê kom bûne ji Erîvanê muzîga Kurdî guhdarî dikin. Bi muzîga kurdî çav û rûyên wan bi çiruskên ken û kêfê ve hatine xemilandin. Di wê wextê de li wan deran hema hema radyo qet tune bû. Dora roja din sibê de me da rîya mala xwe, lazim bû em sê saetê din rê herin.

Di rê de min radyo vekir û nûçe guhdarî kir. Radyoyê nûçeya kuştina Serokê dewleta Amerîkaya Yekbûyî John Kennedy da. Tarîx 22 Mijdar 1963 bû.

Li Tirkîyê al daxistin nîvî û dibîstan çend rojan hatin girtin. Min her sê xwendevan li mal hiştin û ez piştî hefteke şûnda vegerîyam Bîngolê.

**Parxonek –Çavuşlar**

Di nîvê meha dozdehan, sala 1963 an de wek mamoste min li gundê Parxonekê-Çavuşlar dest bikar kir.

Hevalê berî min cigir mamoste ye. Bi çûyîna min karê wî dawî lê hat. Ji ber ku demsal zivistan bû, derûdor bi berfa sipî hatîbû niximandin. Em li meydana Şerefdînê ji qamyonê peya bûn û çend saetan bi meş me xwe gîhand gund.

Çend gundî jî bi min ra ne, bi alîkarîya wan nebûna minê gelek zahmetî bikişanda. Gundîye ku bi min ra bûn Ezîz û dayîka xwe Esma xanim dixwazin, çend rojan ez li mala wan bim.

Dibistan li dervayî gund, li qeracekî ye, bi ba û bahozê li berderê dibistanê du metro berf kom bûye. Bayê ku ji derva tê di valahîya binê derî va berf kirîye hindur, tujî kirîye. Derî û pençire ne kîp in. Him xirab hatine çêkirin him jî bi salane tamîr nedîne, ji ber vê sermayê derbaz dikin. Lê bi mîvantîya demek kin şunda ez çûm li dibistanê cîh bûm.

Ew gund min xwe bijart. Salekê berê hevalê min Nurettin Gedug li vir dixebîtîya û bona zîyaretîya wî ez çûbûm wî gundî.

Gund dora 80 xwendevanê xwe heye, lê hemû xwendevan nedihatin. Ji pola ewlîn heya pola 5 em, hemû xwendevan di yek cîhekî, odekê de rudiniştin. Li vir jî wek mamoste ez tenê bûm, him mamoste him jî midûrê xwe bûm. Li pir cîhan midûrî cîhê kesên xwedî torpîl e, lê li vir beleş bû.

Parxonek, gundekî mezin, dora sed xaneyî bû. Lê ji jîyana sosyalî û bajarî dûr bû. Gundê Parxonekê li ser rîya Solxanê, grêdayî Çolîgê ye.

Melê gund jî 4-5 şagirtên xwe hebûn. Ew ji bajarên din hatîbûn li wir perwerde dibûn. Ew di mizgeftê de diman, xwarin û debara wan li ser gundîyan bû. Ji gund 12-15 deh kes çûbun Hec. Yên mayîn jî bona çûyînê hewl didan.

Dewleta cumhurîyetê bi alî xizmetê li vir tune bû. Telefon, elektrîk, doxtor, rê wek li piranîya gundên Kurdîstanê li vir jî tune bûn. Dibistan jî çend salan berê hatîbu çêkirin.

Lê dewletê hatina sererd û binerda welatê me dimijîya. Daîra Ormanîyê li vir daristan qirdikir. Hemû gundîyên wê dorê bi mehan bi perekî hindik di çîya û kaşan de êzing birîn. Bi ker, qantir û bergîran êzingên birî dikişandin û li meydana Şerefdînê istif dikirin. Bi hezaran qamyon êzing ji çîyayên Kurdistanê hat birîn û birin li rojava Tirkîyê pê fabrîqên xwe şûxilandin û xwe germ kirin.

Bavê Ezîz, Hecî Mihemmed[20] kalekî 90 salî ye. Li gorî emrê xwe tenduristîya wî jî, hişê wî jî di cîhê xwe de ye. Ez dema ku li mala Ezîz ango li mala Hecî

---

[20] Piştî leşkerîyê ez di dibistana Yenîşehir ê mamoste bûm. Nivroj min li loqantê xwarin xwar derketim derva, rastî Hecî Mihemmed û çend gundîyê xwe hatim. Min ew birin loqantê ew xwarin bixwin. Min ji wan ra xwarin, ji xwe ra jî qedayif xwest. Ew bona duyem car herin Hecê hatîbûn bajêr. Hecî Mi-

Mihemmed mam, wî hin caran ji min ra qala bûyerên wexta xwe dikir. Ew carekî jî bibû şahadê şerê jendirman û Yadîn Paşa. Yadîn Paşa û jina wî Têlî Xanim qaçaxê dewletê bûn. Jendirme li pê wan bû, rojekî li çîyayê himber şer derket. Yadîn Paşa gullebaran dikir, Têlî Xanim direvîya, xwe dawite sîperê, vê cara jî, Têlî Xanimê ew diparast û wî baz dida. Wê torê xwe ji destê leşker xilas kirin.

Jina Hecî Mihemed, Hecî Esma, xanima jinan bû. Mîna dayîka min li min dimêzand. Malbatek halxweş û comerd bû. Malbatê bi navê Ezîz, Evdila, Ehmed, Selîm çar lawê xwe hene. Hemû zewicîne xwedî jin û zarokin û hemû bi hev ra dimînin.

Di gund de tu kesî radyoya xwe tune. Ne ji ber rewşa ekonomîk, ji alî olî ve naxwazin xwedî radîyo bin. Radyo îcada gawir didîtin, bona wê jî naxwazin guhdarî bikin. Yek jî bawerdikirin ku eger meriv muzîgê gudarî bike, eşq û kêfê bike, dikare xwedê xwe bîra bike.

Lê hin caran cîran li mala Hecî kom dibûn û li radyoya min, dengê Erîvanê muzîga Kurdî guhdarî dikin. Hecî hin caran tevî min guhdarîya radyoya Erîvanê dike. Dema ku Hecî nimêj dike ez radyoyê digirim. Lê Hecî jiber muzîga Kurdî radiyo hezkir.

Rojekê Hecî Mihemed got *"xoce, em hespa min û radîyoya te bihev re biguharin."*

Lê di nava xebatê de wext zû derbaz bû. Hîn li wan çîyan dawîya zivistanê nehatîbû, dawîya termîna perwerdê hat.

**Ez terim leşkerîya tirkan**

Di 23 Avrîla sala 1964 an li gundê Parxonekê berf dibarîya. Wê rojê min qamê xwendewanan li wan belav kir, dibistan girt, xatir xwest û çûm leşkerîyê. Li Manîsayê em 4 mehan di derheqê çekbikaranînê de hatin perwerde kirin. Dora pênchezar mamoste û ewqas jî leşkerê din hebû.

Berî derba leşkerî ya 1960 mamoste û kesên ku lîse qedandîbûn weka serbaz leşkerîya xwe dikirin. Lê piştî derba leşkerî ya Gulana 27 an ew maf ji wan hat girtin, mamoste jî êdi bûn leşker.

Xasima berbaz (astsubay), serdeste (onbaşi) û çawîşan li mamostan zulim dikirin. Hêrs dibûn ku çima çend salan berê mamoste dibûn serbazê wan, yên ji wan rutbe bilindtir. Ji ber neheqî û zordarîyê, çend mamostan xwestin, xwe bikujin.

---

hemmmed patatêsê nava xwarina xwe bijart kir ser qedayîfa min. Got "ez qartol heznakim, mamoste tu bixwe."bona ku dilê wî kalî neşikînim, min ji wî ra tu tişt negot û bi usil qartol da alîkê û qedayîfa xwe xwar.

Lê piştî erdhêja Çoligê ez çûm, zîyaretîya gundîyên xwe. Gund cîh guharî bû, barkirî bû hatibûn nêzî meydana Şerefdînê. Min hecî Esma Xanim zîyeret kir, lê Hecî yê kal û tewî du lawên xwe berî erdhêjê çûbûn ser dilovanîya xwe.

Bi gwîzan zendên destê xwe birîn ku dawî li jîyana xwe binin. Bi arîkariya doxtoran ew di deqê dawî de hatin xilas kirin.

Heftê de carê ji bona, kevçî, çetel, qedeh ji me pere komdikin. Lazim bû leşker çetal û kevçîyê xwe di bêrîkên xwe de bigerandana. Çay di tebaxan de bi kevçîyan me vedixwar. Lêdan û carisî mîna navê leşkeran bû.

Wê demê jî pirsa Qibrisê germ bû. Leşker şev û roj li benda emrê êrîşê bû. Carekê nîvê şevê em rakirin bar li pişta me, berê me dan çîyan. Em dora hefteké li çîya û çolan gerandin, şunde anîn.

Piştî ku perwerda me xilas bû, bi wijag(qure)kişandinê hin mamoste şandin dibîstana leşkerî ya Manîsa, Narlidereyê û Bornovayê. Yên mayîn jî terxîs kirin. Min jî di vijagê de Tuxaya topçîyan a 57 emîn a Bornova – Hacilar kiriyê kişand.

Em mamosteyên Bornova yê 70 kes bûn. Xwendewanên me jî nêzî 500 kesî bûn. Ji wan ra "Alî" dibistanê ra jî *"Dibîstana Alî"* yan dihat gotin. Alî bi mana analfebetîyê bi kar dianîn.

Di tugayê de razan, xwarin vexwarin bêpere bû. Lê me ji leşkerîyê usa xû kirîbû ku, nedixwast şevekê jî em li wir razên.

Mamosteyên kevn, yên ku berî me li vir xebitîya bûn, malên xwe devr me kirin, em ketin cihê wan. An jî wan alîkarîya me kirin ku, em bi kirê mal pêda bikin. Di wextek kin de me hemûyan ji xwe re mal dît. Her sibê em bi cemsan, erebeyên leşkerî diçûn karê xwe û êvarî jî em bi wan dihatin bajêr.

Lê piştî çend mehan me dî ku em nikarin(ekonomîk) îdara xwe bikin, dîsan car caran diçûn li tuxayê diman. Me pir caran xanî jî, heval jî diguharî. Dîsa em 5 heval di malekê de diman, hevalên din ji bo heftekê ji mal veqetîyan. Lê wan ji bona kirê pere dananî bûn. Kirê ji maaşek me zêtir bû. Serê mehê min nekarî kirê xanî bidim. Min çû ji bazara ku tiştên kevn lê dihatin firotên, merivek anî mal, pênc nivîn û ranze firotin. Min bi wî pereyî kirê xanî da û çûm dibistana *"Alî"*yan.

Piştî 13 mehan şunde em dîsa derbazî wezereta perwerdê bûn, vê carê jî tayîna min derket Hatay- Altinozu gundê Keferabît.

**Keferabît-(Avuttepe)**

Gundê Keferabît girêdayî Altinozu ya Hatayê ye. Gund dora 30-40 mal bû. Gundî Ereb bûn, bi zimanê erebî dipeyîvîyan. Mamostê berî min, Mistefa Sevîn yekê Meraşî bû. Hin dosya û muhira dibistanê da min û ew çû bajarê xwe.

Destpêkê wek mamostê dibistanê ez tenê bûm, lê dûra ji wî gundî, bi navê Avdilqadîr Êlçî xortekî xwedî dîploma lîsê jî wek alîkar hat dest bi kar kir. Li vir jî avahîya dibistanê çend salan berê hatîbû çêkirin, lê avahî xirabe bû, ji bona karanînê nekêrhatî bû. Meriv digîhîje wê encamê ku mutahîtê ku dibistan çêdikirin malzemê rind û têr bi kar nedianin, teknîkerên dewletê jî karê xwe yê qontrolê pêk nedianin.

Gundîyan xanîyêk ji bo dibistanê, xanîyek jî bona min pêda kirin û me dest bi perwerdê kir.

Min ji bajar torbek ard, çend kîlo bilxur, nîsk meqarna, çay û şekir girt anî li mal danî. Lê jî alî xwarinçêkirinê va ne jêhatî me. Dîsa jî rojekê min hewl da ku xwarina meqarnê çêkim. Min ocaxa xazê vêxist, tencika avê da ser, piştî ku av kelîya min pakêtek maqarna Pîyale firand û berda tencikê. Piçikê şuve hatim min dî ku meqarna perçûfî ye, nîvîk ji tencikê derketîye, serra çûye, ocax vemirandî ye û ode di bîn û duyê xazê de maye.

Min tencik û ocax avitin derva, pencire û derî vekir. Gundîyêk derbaz dibû bi mereq pirsî ka çi bûye.

Fikirîm ku xwarin çêkirin ne li gorî min e. Çewalê ard, a nevekirî û malzemê ku min ji bo xwarinê girtîbû şand mala mixtarê kevn Nurî Yogurtcu. Min ji wan daxwazkir ku , kîngê mîvanekî min hat ew bikarin ji min ra xwarinekê çêkin, ez ê spasdarê wan bim.

Min jî giranî da helev, tirşî, zêtûn, hêk, nan û çayê.

Rîya gund asfalt bû, Şemî û yekşemî nedinav de, her roj ji gund du erebe diçûne Hatayê û dihatin. Di rojek Şemîyê de li malê tişt nema ku ez bixwim.

Gundîyên min merd bûn û pêşniyar dikirin ku xwarin bişînin.

Lê min şerm dikir ku ez ji gundîyan nan an jî xwarin bixwazim. Min Şemî birçî derbazkir lê yekşemîyê derketim ser rîya asfaltê, troktora ku hat lê siwar bûm çûm Altinozîyê. Berê min xwe têr kir. Piştre jî çend porsîyon kebab kir pakêt, tevî hinek fêkî, sebze û şuşeke reqî-tînî[21] jî min girt û dîsa bi traktora xwe vegerîyam gund.

Bi navê Hîkmet Yogurtcu[22] xortek, Ebdulqadir û ez em rûniştin wê şevê tînîya ku min anîbû me vexwar.

Piştî nîvê şevê ez hîşarbûm ku herdu heval li erdê ser betonê razîne. Destê minê rastê ji paş tilîya piçûk ve birîn bûye. Nivîna min û hin kincên min di xwînê de mane. Dema ku min sêv hur kirîye kêr li ser destê min hatîye cî. Destê min birîye, hestî derketîye.

Min xort şîyar kirin şandin mal. Ez jî raketim. Sibê de rabûm gomlek û çarşefên ku xwîn pekîyayê bûn, hemû kom kirin û ew di sobê de şewitandin.

---

[21] Tînî xiristîyanên wê heremê ji hêcîrê çêdikir, pir bi tesîr bû.

[22]Hîkmet Yogurtçu, xortekî pêşverû bû. 1980 da bona semîrekê çûbûm Hatayê, şevikê min rîya xwe bi Keferabit xist. Ji wir fêrbûm ku di hilbijartinan da nava gundîyan da şer derketîye ji Partîya Adaletê (Demirel) mixtarê gund Vasfi Elçi gulebaran kirîye, Hîkmet kuştiye. Bi navê Mihemmed xortek jî ji ber birîna gullan ling hatîbû jêkirin û bi gopalan digerîya. Mixtarê kevn Nuri yoxurtçu jî felç bibû. Ji bona alîkarîyek piçûk min ew zorê qane kir. Min dostê xwe yê hêja hemêz kir, maç kir û cara dawîn jê veqetîyam.

Min ji wê bûyerê û rewşa xwe pir fedî kir, bona wê jî nexwast ji wê bûyerê tu şopek şunda bimîne.

Kîngê min dixwast alkol bigirim ew bûyer dihat ber çavê min û ew ji min ra bû ders ku ez pîvanê nerevînim. Di salên unîwersîtê de min dev ji alkolê berda. Ji wê demê vir de min carek- duyan encaq ew tem kir. Di vê biryara min de li ba tesîrên dîtinên pêşverû, tesîra vê bûyerê jî gelek e.

Gund bi sebze û fêkî, xasima bi darê zêytunê, hêcîr û bi baxê rezan ve dewlemend e. Di her malê de şereb û reqî hebû, lê di her malê de rocî û nêmêj tunebû. Gundîyên min têkilêyên civakî de pêşketî bûn. Ji alî bawerîyê de jî qasî Kurda baştamayî, olperest nebûn. Di meha Remezanê de kêm kesî rocî digirt û diçûn mizgeftê.

Birayê minê mezin Mistefa wê demê li Enqerê xwendewan bû, hat dîtina min. Dora du heftan ew li ba min ma. Dilê xwe hebû bi rîya îllegal derkeve Ewrûpa yê. Ew wê demê bi Şadîya jina xwe ra nîşankirî bû. Ez li himber çûyîna wî derketim. Em çend rojan bi hevre çûn Hatay û Kirikhanê gerîyan.

Hevalên ku Mistefê dixwast tevê derkeve derwayî welat li giravik Girekî hatin girtin.

**Li Çolîgê li dibistana Yenîşehîrê**

Piştî ku leşkerî ya min qedîya, min dîsa Çolig xwast û tayîna min derket, bajarê Çolîgê, dibistana Yenîşehîrê. Di salên 1966-68 de li dibîstana nava Çolîgê, li Yenîşehîrê du salan xebîtîm. Em çar mamoste yê mêr, sê mamoste jî jin heft mamoste ne. Midûrê perwerda pêşin (ilkogretim md.) mamoste yê min ê gûnd Nîyazî Oztirk e. Di Çolîgê de dibistana me, dibistana herî xwedî derfet e. Ez ê ku salan li gundan tenê bi sere xwe 5 sinifan ra mijûl bûm, jîyana vir ji min ra luks tê. Ji bona her polê dersxanek û ji bona her dersxanekê dersdarek heye. Bona kar û xebatê têkilîyan jî midûrê dibistanê heye.Kesên ku paqişîyê dikin, soban vêdixinin ango xedemê xwe hene. Êzing bi rîya dewletê, bi peran tê girtin. Li dibîstanê telefon û elekrtîk heye. Ya herî baş jî bînayeke paqiş û tuwaletên bi av heye. Ez li sê gundan xebitîm, tu dibistanekê ji bona xwendevanan tuwalet tune bû.

Li bajar ne lazime tu xwarin û çay çêkî. Li restorant xwarin dixwî, terî qehwê rûdinî çaya xwe vedixwî. Kesên ku tevê bigerî, lîstik bilîzî hevaltîyê bikî heye. Çêxirab sînamek xwe jî heye. Cadde û rê kevir an jî betonin solê te, şil nabin.

Ew tiştên ku min li jorê gotin, ji wan yek jî, li gundan min nedît. Hemû xwendevanên me di yek odekê de rûdiniştin. Ew jî odên gundîyan bûn, ne bînayên ji bo dibistanan bûn. Lazim bû, paqişîya dibistanê me xwe bikira, sobên sinifê em xwe dagirtina û agir pêxistana.

Li gundan, êzingê dibistanê jî bi rîya xwendevanan, mamostan temîn dikir. Li gundan me wek mamoste qelem, kaxiz, karton, tebeşur bi perêyê xwe digirt, textê reş xwe boyax dikir. Li gund gundî kar û barê xwe ra mijûl bûn, xwendewan jî ku diçûn mala xwe li dibistanê me hevalek ji nedidit ku em pê ra bipeyîvin.

Zarokên dibîstana me ya nû piranî zarokên buroqrat û halxwaşan bûn. Him ew ji alî maddî ve bê êhtîyac bûn, him jî bi rîya dê û bavê wan dibîstanê dikarîya pirsên xwe yên heyî çareser bikira. Ew tiştên ku min anîne ziman ji min ra hemû wek awantaj têne xuyakirin.

Di van salan de min Zekî Adsiz naskir. Wî bi navê Katîp hevalekî ku wek vekîlmamoste dixebitîya ra şer kiribû û ew bi kêrê bîrîndar kiribû. Ji ber wê Zekî ket girtîgehê. Rojekê ez û Saît Aymaz bihev re çûn girtîgeha Derê Qeseran zîyaretîya wî. Me bi xwe re hin pirtûkên lîsê jî birin, Zekî di girtîgehê de xwe amade dikir ku ji derva bikeve azmunên lîsê.

**Li Çolîgê rojî ya remezanê**

Di meha Remezanê de li bajarê Çolîgê atmosferek taybetî tê holê. Ji ber bêtoleransîya civakê Elewî jî, kesên ku rojî nagirin jî, vekirî nikarin xwarin bixwin.

Di Remezanê de li vi bajarî rojî girtin dibe mecbûrî, yên ku nagirin jî xwe usa didin xuyakirin. Xeynî min hemû mamostên dibistana me xwedî mal û melal in. Ew dibêjin ku ew rojî ne, lê di navbera nîvrojê de terin mal û tên. Rojekê mamosteka jin nîvro çû mal û hat. Wê jî digot ez rojî me. Bi henekî min got li ser lêvê te xwarin heye. Bi telaş ji bêrîka xwe dismal derxist peliştê, ku lêva xwe paqiş bike... dûra jî li xwe mukir hat; got *"di nava me de bimîne, lê ez nerojî me, min li mal xwarina ispanaxê xwar."*

Di meha rojîyê de li bajar hemû cîhên xwarin û vexwarinê, restorant, pastaxane, qehwexane dihatin girtîn. Bo xwarinê tu cîyekî vekirî tune bû. Eger te hazirîya xwe nekirîba, te dikarîya heya îftarê birçî bimana.

Ez nîvro terim ji dikanê nan û hin tiştên xwarinê wek tirşî, pênîr helev digirim, têm li dibistanê rûdinim dixwim.

Hin hevalên min yê xort jî rojîyê nagirin, lê nikarin li mala xwe jî bixwin. Bo ku ji propaxanda dijî xwe û malbata xwe ditirsin, xwe wek rojîyê digirin didin xuyakirin. Ji wan hin heval hin caran tên dibistanê cem min em bi hev ra dixwin.

Lê bona ku civat demoqratîze bibe, di têkilîyan de tolerans û dîyalox serkeve hin qadroyên mîna Şakîr Elçî, Arîf Ertugrul, Yêner Aytaç, Hîlmî Elçî, Îsmet Aydogdu, Ata Payir, Galîp Elçî ked dan.

Şakîr ew xebata xwe ya bona Kurdistanek azad û demoqratîk bi wêrekî domand. Ji ber wê jî ew bû qilçixê çavê qolonîyalist û faşîstan. Di 3 ê Adarê sala 1980 an de ji alî faşîstan ve li Bîngol hate şehît kirin.

**Di tîyatro de Kurdistan**

Li Çoligê di Salona Merkeza Perwerda ya Gel de (Halk Egitim Merkezî) şeva şahîyê dihat amadekirin. Şeva şahîyê, Dibistana Leylî ya Herêmê ya Solxanê amade kiribû.

Zarokan, di tîyatroyê de rewşa Tirkîyê ya 1919-20 an şirowe dikir. Qora pêşin da valî, komutanê leşkerî, qazî, dozger, midûrê perwerda netewî û hin midûrên din ango buroqratên wê derê rûniştine. Em jî çend heval bi hev ra li ser bankên dirêj û bêpişt rûniştine, li dikê sêrdikin.

Zarokek li ser Peymana Sewrê peyîvî û li ser nexşê (xarîtê) Kurdistanê îşaret kir û got "dixwastin ku li vîr ji Kurdistanekê ava bikin." Wexta ku navê Kurdistanê derbaz bû 4-5 kesan spontane çepik lêxistin.

Ji paş me ve yekî kûfir kir. *"Jin û dîya we g.....,"* bi carisîyê ve ez şûva zivirîm, ez û 2 kesan bi çavan beranberîhev bûn. 3 qor li paş me ve 2 serleşkerê Tirk bi çekên sivîl, di nava qorê de min naskirin. Yek ji wan usttegmen M.Alî bû. Ji şunde zivirandin û li wî mêzekirina min ew nerehet kir, ji min re got:

-Çîye, xweşa te neçû?'

Min bi vê pirsa wî bidengekî bilind got:

-Ez jî dê û jinê te..."

-Min ji te ra negotîye, yên ku çepik lêdane..."

Min got: ez ji te ra dibêjim.

Salon bêdeng bû, zarokên li dikê bêdeng bûn. Tîyatroyê navber hate dayîn, ez rabûm ber bi entrê herim, di cîhê xwe de yekî beredayî bi navê Seyfoyê Kanîreşê li min hêrs bû got, *"tu çi qebedayîtîyê dikî?"* Wî jî dixwest dilê serleşkeran xweş bike. Min got, tû fêm nakî, huş be û ez derketim entrê.

Lawê Sadiq Elçî mamoste Hîlmî li dû min hat, pîyê min girt û ez ber bi derve kişandim. Got " tû çi dikî, nuha poles bê te bibe, zûke em ji vir herin."

Me ew der terikand û em çûn. Çend roj din şuva qazî Turabî Erdogan qala vê bûyerê dikir. Got "wexta ku we dengekî bilind nîqaş kir me jî bîhîst.

Piştî wê navber hat dayîn, em derketin derva ber derî. Ez hevalên min yên qazî û dozger, walî li derva ser lingan radiwestîyan, qomutanê leşker xwe nêzikî me kir got " mamostekî ji serleşkerê Tirk ra daye carisîyan."

Min jî gotîye ku;"Tişt nabe qomutan beg mamostekî Tirk ji zabitekî Tirk ra daye carisîyan. Ne lazime meriv mezin bike."

Mamostekî Tirk bersiva serleşkerekî Tirk bide nesuc e, lê mamostekî Kurd bersiva zabitekî Tirk bide suc e. Qazî Turabî[23] ez kirîbum Tirk û pêşî li bûyerê girtîbû.

---

[23] Turabî Erdoxan ji Dêrsimê bû, li Çoligê hakim bû. Miroveki welatparêz û pêşverû bû.

Sala 2009 de li Xarpitê di qehwa Dêrsimîyan de rastî hevalê Hîlmî Elçî hatim. Ji hevalên dora masê re qala wê bûyerê kir û ji min ra got, kîngê ku ez te dibînim, ew bûyer tê bîra min.

**Li Gazî Egîtimê**

Payîza 1968 an de azmuna Gazî Egîtimê ya nivîskî li Çolîgê, ya devkî jî li Enqerê ez ketimê û min qezanç kir. Di wextek kin de min hemû formalîte qedand, çûm Enqerê û dest bi dibîstanê kir. Di wan salan de çi li Ewrûpa çi li Tirkîyê seranserê cîhanê xortên çep di zaningehan de di nava çalakîyan dabûn.

Bûyerên ku li Filistîn, Wîetnam, Kamboçya, Angola, Kuba û li cîhên din diqewimîyan di nava xwendewanên unîwersîtê de li himber Amerikayê û hevalbendên wan dijayetî xurt dikir.

Tenê şoreşa Kurdistana Başûr –şoreşa Mistefa Barzanî bala kesî nedikişand. Xwendevanên Tirk rojew tesbît û tayîn dikir. Heta ku DDKO nehatîbû damezrandin, xortên Kurd jî di nava hêzên Tirk de, di binê tesîra dîtin û îdeolojîya wan de dimeşîyan. Wan jî wek hemû serhildan û berxwedanên Kurd, şoreşa Barzanî jî kevneperest didîtin. Xwendevanên Kurd jî bi çavê wan li bûyerê mêze dikirin û tevgera Kurdistana Başûr kewneperest didîtin.

Zanîngeh di nav Faşîst û Şoreşgeran de hatîbû dabeşkirin û li himber hev şerê giran didan. Grubên ku zanîngeh zeft dikirin, xwendewanên li dijî xwe nedigirtin dibîstanê. Boykot, forum, mîtîng û şer bibû karê xwendevanan a rojane.

Dibistana me jî, di destê faşîstan debû. Xasima beşa xwendewanên sporê dora 150 kesi ne û hemû ji alî rastgir in. Hin kesên ku di alî raman de ne wek wan bin jî di binê tesîra grubîyê de bûn. Ordî ya Tirk çava ku xwe bekçîyê Kemalîzmê û laîsîzmî didît, xwendevanên beşa sporê jî xwe leşkerê îdarê û faşîzmê didîtin.

Destpêkirina perwerdê hîn mehek derbaz nebibû, êvarekê em ji bajêr hatin, me dî ku polês ketîye dibistanê. Hevalan behsa bûyerê kirin: Hin qadroyên DEV-GENÇê; Husên Cewahîr, Mistefa Qaçaroglu, Oktay Etîman û Ehmedê Rûhayî hatine dibîstanê. Ji bona ku ew qadroyên DEV-GENCê yên naskirî bûn, xwendevanên dibîstanê, ya beşa Jîmnastîkê bi hêzek grubî erîşî ser wan kirîye. Her yekî 9-10 kes êrîşê dike û gelikê li wan didin, ji wan hin kes birîndar dibin, didanê yekî jî tê şikandin. Dîwarên salon û qantîna dibistanê di xwînê de mabû.

Mistefa Qaçaroglu hatîbû girtin, yên din revîya bûn û xwe xilas kiribûn. Vê bûyera nexwaş em, xwendevanên Gazîyê, yên çepgir kir fikaran. Hin kesên ku hevûdû nasdikin, fikrê hev dizanin li ser rewşa dibistanê bihev şêvirîn. Me biryar da ku em di nava xwe de civînan çêkin hevalan nas bikin hêza xwe bizanin.

Di serî de me di sinifan de bi grubên piçûk, bi nasîna hevûdu destpêkir. Her roj heleqê beşdaran fireh bû û civînan bi semîner û minaqaşan domkir. Di beşa zimanê

Tirkî de bi navê Zekî û Ayhan SARIHAN du bira hene. Herdu bira sinifekê li pêşî me ne, ango sinifa duyem de ne. Zekî zana, bi plan û proxram e. Barê esasî wî girtîye ser milê xwe.

Bi rîya semîner û dîyalogê xeleka gruba çepan xwe fireh dike. Dora sala din hin kesên pêşverû jî ketin beşa sporê. Di wir de jî komek dilxwazê fikrên çepgir çêbû. Hêdî hêdî yekitîya navbera gruba sporê belav dibe, di nava wan de jî heval û dilxwazên fikrên çep pêyda dibin.

Gruba çep di nava xwe de lîstek amade kir û ji bona hilbijartina Komela Gazîyê dest bi propaxandê kir. Di hilbijartinan de lîsta ku ji çepgiran piştgirî dikir qezanç kir. Z. Sarihan bû serokê komelê. Min jî di komîta karger de cîh girt û bûm serokê baskê bi Gundan ra xebat û têkilîyê.

Xebat û lebat gelek e. Di rojên şemî û yekşemîyan em grub grub diçûn gundên dorê, gundî zîyaret dikirin û di derheqê rewşa sîyasî de bi wan ra dipêyîvîyan. Dora 30 kesî tevî qumanya xwe me gundê Ovacixê -girêdayî yê Enqerê ye- zîyaret kirîbû, ew zîyaret gelek serkevtî derbaz bibû. Çûyîna wî gundî belgeyek li himberî min di îddîanama dozgerê dadgeha leşkerî a Enqerê de cîh girt. Dawîyê Gazî Egîtim ket binê qontrola gruba çepgir, tesîra gruba faşîst qet nema. Me hemû hêz û wexta xwe ji bona xebatên Komeletîyê xerc dikir ku Komele careke din nekeve destê faşîstan.

Li kiderê semîner an jî bûyerek hebe ji dibîstana me em bi 20-30 kesan amade dibûn. Di merasîm û gorkirina şoreşgeran de, di xwepêşandanan de, belavkirina belavok afîşan de, di semîneran de me jî cîhê xwe digirt.

Di loqala Sîyasalê de em li benda hatina cinazê Batal Mehetoxlu bûn. Denîz Gezmîş jî tevî Husên Cewahîr li wir bû. Cinaze saet yekê şevê ji Stenbolê hat. Ez jî di nav gruba Enqerê de me cinaze bir Meletîyê. Demek şûnda cinazê Mustefa Qûseyrî jî me bir Antakyayê.

Harûn Karadenîz di Zanîngeha Stenbolê de xwendevan bû, li Enqerê di civînekê de axavtan bû. Ji dibîstana Gazîyê em dora 20 hevalan çûn û me guhdarîya wî kir. Di salonek nemezin de dora sed xortî hebû.

Harûn zêtir qala polîtîka Amerîkê û têkilîyên hikûmata Tirk kir. "Bi boykot û bûyeran em hikûmatê bikin tengasîyê (...)" ji gotara wî dihat fêmkirin ku armanc destxistina hin maf-azadî nebû. Lê bona ku ji hikûmatê ra problem derxinin organîzekirina bûyeran bû. Bi bûyeran çawa meriv dikare hikûmatê meşgul bike û hin tiştên din. Tiştên beredayî û vala... Civîn serkevtî nebû, me hevalê ku bi wan re di têkilêyan dabû, rexnekir. Di sinifa min de sê hevalên din jî hebûn. Ew ji Çorumê bûn, wan ew gotinên Harun ji xwe ra kirin mane, herçî çû berê xwe dan gruba faşîstan. Dawîyê di polîtîka wan de aktîf cî girtin. Qasî ku min ji medya Tirkî xwend, yek ji wan (Adnan Adivar Unal) di partîya Tûrkeş, MHP de bibû serokê şaredarîya

herêma xwe, Alacayê. Dixwazim bêjim ku hin polîtîkayên şaş û nezan dikare dewa biheq, neheq bike.

Di van xebatan de serok û kadroyên hêzan jî me naskirin. Cevahîr di Zanîngeha Sîyasalê de xwendevan bû û di nava kadroyên Dev Gençê de dihate naskirin û hezkirin. Têkilîyên min û Husên jî baş bûn. Bi rîya wî kadroyên pêş yên wê demê Denîz Gezmîş, Mahîr Çayan, M.K.Çamkiran, Yusuf Kupelî, Ertuxrul Kurkçu min nas kir.

* * *

Rokê jî ji gundê Paloyê Qereborikê bi navê Zekerîya û yekî din du kes hatin Gazî Egîtimê.

Gotin axayê gund li me neheqîyê dike, dixwaze me ji gund derxîne. Em dixwazin serokê Dev-Gençê bibînin û ew ji me ra alîkarîyê bike.

Serokê Dev-Genç ê Gazîyê xeber şand pê serokê Dev-Gençê Ertuxrul Kurkçî. Ew hat dibîstana me guhdarîya gundîyan kir û du heval dane ba wan ew şandin Qereborik a Palo yê.

Du xortên ku Ertuxrul tevî Zekerîya şandin navê yekî Mistefa Uçman bû. Xalê Zekerîya piçekê kulek, topal bû, lê di gotin û bersivên xwe de bi henek û amadebersiv bû. Digot; *"Rojekê ez û Turan Feyzîoxlî (sîyasetmedarekî paşverû bû) em di rêwîtîyêkê de rasthev hatin. Ew sîyasetvanekî nas, ez jî gûndîkî kulek im. Ew dipeyîvî min jî guhdarî dikir. Wî pir qala qomînîzmê kir "ew xwadê nasnakin, exlaq û namus li cem wan tune ye..."*

Wi ji min pirsî, ka ez çi dibêjîm?

Min got,*"Welle jinên me gundîyan ji sibê heya êvarê di nava rix û reşîyê de ne, baver nakim ku kes çav berde jinên me, ew jinên ku dest û pê yên xwe paqişin, çav kilkirî û lêvên xwe boyaxkirîne bila mêrê wan bitirsin."*

* * *

Di Gulan a 1969 an de DDKO hat damezrandin. DDKOyê gelek xortên Kurd civand serhev û kir endamê xwe. Ez jî bûm endam û di xebat û çalakîyên komelê de amade bûm.

Komela DDKOyê du karên esasî kirin: Yek, di pêvajoyê de xortên Kurd di bin baskê xwe de civandin. Bi semîner û xebatê, di pirsa netewî de bingehê xwe şîyar kir. Nehişt xortê Kurd di bin slogan û ala çepê Tirkan de xwîn û keda xwe birijînin, ew parastin.

Berî ku DDKO bê damezrandin xortên Kurd di hemû zanîngehan de bi xebat û mîlîtanî li qora pêşindabûn. Him jî di bin qontrola îdeolojîya çepê Tirkan de ew yeka

dikirin. Ji bona Filistînê, Wîetnam, Angola û Kamboçyayê sloxan diqêrîyan, azadî û Sosyalîzm dixwastin, lê ji berxwadana Kurdistana Başûr bêxeber bûn.

Ya duyem, DDKOyê pirsa Kurd û Kurdistanê parast, propaxanda kir, qadro perwerde kirin. Bi semîner, aksîyon, broşuran ji xwe ra dîtinek, çandek afirand, qadro çêkir, der û dorek çêkir.

Hêzên dewletê li ser Komele û endamên DDKOyê zor û zext kar dianî. Rojekê li DDKO yê semînera Îsmaîl Beşikçî hebû. Ez û du heval Saîm Buzrul û Yener Aytaç bihev re çûn civînê. Dora 20-30 kesî kom bibû. Qadroyek komelê di dest de kaxiz û pênûs navê bejdaran dinivisîya. Hevalên ku bi min ra hatîbûn xwe aciz kirin. Gotin eger ku belgeyek usa bikeve destê şefên me, wê me ji kar durxinin. Ew cîwîn bona wan hevalan bû civîna ewlîn û ya dawîn. Ew herdu jî hevalên pêşverû bûn û di wezereta Sanayîyê de postên bilind bidest xistîbûn.

Berê ku qadroyên Dev-Gençê yên ber biçav, nedikarîn wek mîvan bên dibîstana Gazîyê, lê nuha, êdî ew azad dihatin, civîn çêdikirin, diketin civînan û dîtinên xwe digotin.

Dîsa rojekê Husên Cewahîr û serokê komela Dev-Gençê Ertuxrul Kurkçî bo civînekê hev ra hatîbûn, dibîstana me, Gazî Egîtimê. Ertuxrul di gotara xwe de DDKO bi faşîstîyê tawanbar kir û got, "*tu ferqîya DDKO yê û faşîstan tune ye, lazim e em li himber wan bi tûndî bitekoşin.*"

Min mafê gotinê girt û li himber dîtinê wî derketim, min got ku,"*ez endamê DDKO yê me. DDKO ne faşîst e, welatperwer û pêşverû ye. Bona ku bikare faşîstîyê bike lazime hin sazîyên xwe hebin, gelê Kurd çi sazîyên xwe yên bingehîn hene? Dev-Genç divê DDKO dost bibîne, pê ra îttifaq bike neku êrîş bike ( ... )*"

Ertuxrul xwest hin tiştê din jî bêje, lê Husên Cewahîr di cîhê xwe de got, "*Ertuxrul tu şaş dipeyîvî, Kazim rast dibêje, em dûra dikarin, ser vê mijarê bisekinin*"nîqaş hat birîn.

Destpêkê de DEV-GENÇ ê jî DDKO ji xwe ra raqîp didît û bi wan ra xebat nedikir. Lê pir dem derbaz nebû DDKO yê bi xebat û çalekîyên xwe cîhê xwe de nasîn. Bi weşan û pratîka xwe ew bû qilçixê çavê hêzên şoven û faşîst.

Di bihara sala 2010 de li Dîyarbekirê di Xana Hesen Paşa de ez rastî Ertuxrul hatim. Min slav lê kir û halê wî pirsî. Wexta ku min nav ê xwe got, wî got,"*ew nav tê bîra min.*"

Di hilbijartina 2011 an de ew li Mêrsînê, 7 Heziran 2015 an jî li Îzmîrê bi piştgirîya Kurdan bû parlamenter, çû parlamentoyê.

**Dadgeha çar kurdên welatperwer**

Di sala 1968-69 an em pê hesîyan ku li Enqerê çar Kurdên, girtî derdixinin pêşberî dadgehê. Min mereq kir gelo ew kîne û çima têne dad kirin? Ji ber mereqa xwe wê rojê ez çûm Seraya Edilya Ûlûsê.

Min ji girtîyan kes nas nedikir, dûr va li wan dinêrî, têgîhîştim ku kesên ku têne dadkirin, Îbrahîm Guçlu û hevalên wî bûn. Ji çend nasê wan bêtir, zêde guhdar tunebûn. Kesên ku beşdar bibûn, bav, dayîk û brayê Îbrahîmê piçûk bûn.

Doza Kurd hîn pir teze bû. Hemû welatparêz di nava lêgerînikê dabûn. Di tarîya şevê de li çirûskekê digerîyan.

Min yekem car Îbrahîm li wir durve dît, lê tu têkilîyên me çênebû. Pir wext derbaz nebû têkilêyên min bi DDKO re çêbû. Piştî demek bihurî ji DDKO Mistefa Ozer tevî hevalekî din hatibûn, dibîstana Gazî Egîtimê ba me. Gotin Îbrahîm Guçlu û sê havalên xwe yê din wê bi kefalet bên berdan, lê pereyên DDKO yê têrê nake, gelo komela Gazîyê dikare alîkarîya wan bike an na? Ez bi serokê komela Gazî yê Îbrahîm Sevîmlî ra peyivîm û pereyê ku lazim bû ango pênc hezar lîra me da wan.

1971ê payîzê min li Erxanîyê dest bi mamosteyî kir. Gûçlû û gelek kurdên welatparêz di hepsa leşkerî ya Dîyarbekir de girtî bûn. Xanima Îbrahîm Gûlfer jî li Erqenîyê parêzer bû. Min bi rîya wê agahîyên hevalê Îbrahîm digirt. Hin caran roja Duşemîyan jî, bona dîtina wan em diçûn zîndana Dîyarbekirê. Lê piştî demekê şûnda ez jî hatim girtin û di girtîgehê dabûm cîranê wan.

Li wir, tevî Îbrahîm min gelek hewalên din jî nêz va naskirin.

**Li Tirkîyê hilbijartina parlamentarî ya 1969an**

Di dawîya salên 1960 an de, di nav çepê Tirkîyê de li himber teorîya Şoreşa Sosyalîst, dîtina Şoreşa Netewî ya Demoqratîk (teorîya MDD) hate derxistin. Mîhrî Bellî[24] teorîsîyen û pêşengîya wê dîtinê dikir. Di demek kinda qadro û bingehê Dev-Gençê û kovara YÖNê ( Doğan Avcioğlu, Mümtaz Soysal, Ilhan Selçuk) jî ew dîtinana pejirandin û parastin.

Partîya Karkerên Tirkîyê (TÎP) jî li himber vê dîtinê derdiket, Şoreşa Sosyalîst, ango slogana "Tirkîyeke Sosyalîst" diparast.

Têza MDD cîyan çibû? Li gorî wan welatên ku demoqrasîya burjuvazîyê têde rind runeniştîye, karker û gundî bi hev re di gave pêşin li himber emperyalîzmê şer dike, hemû têkilîyên feodalî ji ortê radike, demoqrasîya burjuvazîyê têde cîh dike. Du wê jî bo gava duyem, bo sosyalîzme dest bi xebatê dike.

Li gorî MDD, pirsa herî girîng pêwendîyên feodalî bûn. Axa yên xwedî ax, burjuvazîya xumalî ya pevxebat (yerlî işbirlikçi), û emparyalîzm hedef bû.

---

[24] Di sala 1969 an da tevî nasê wî Rifat Ozturk me Mîhrî Bellî li Enqerê – Ulusê di buroya wî ya qatê çatîyê da zîyaret kir. Fêr bû ku ez ji Dêrsimê me ji min pirsîya ez Kemal Burkay dinasim an na. Got "ji Kurdan ra lîderekî çavsor lazim e. "Dema ku bi Abdullah Ocalan ra têkilî danî ew gotina wî hat bîra min. Min got wî nuha lîderê Çavsor! dît.

Ji ber vê cudadîtinê Dev-Gençê li himber TÎPê serî rakir, li dijî wan propaxende dikir, hin caran şiddet jî bikar dianî.

1968 dan de li Enqerê di salona Dilşad de kongra TÎP ê çêbû. TîP îyan slogana,"Tirkîyek Sosyalist," Dev-Gençîyan jî sloxana "Tirkîyeyek Serbixwa" davêtin. Grubek xortên Dev-Gençê êrîşî delegên kongrê kir. Di nava Dev-Genç û TîP ê de şer derket. Endamê Dev-Gençê Mehmet Demir ê Mêrdînî xwest li himber delegeyan şeşagirê bikar bîne. Lê Husên Cewahîr, li wir jî cewhera xwe de xuyakirin pêşî li Mehmet girt.

Dev-Gençê navendî(merkezî) biryar girt ku di hilbijartinên parlamento ya 1969 de alîkarîya TÎP ê neke.

Xwendewanên Dêrsimî yên Enqerê jî piranî di binê dîtinên Dev-Gençê dabûn. Kemal Burkay jî li Dêrsimê berendamê TÎP ê bû.

Li Enqerê me hin xwendevanên Dêrsimî di nava xwe de cîvînek çêkir û biryar girt ku komîtak here Dêrsimê di hilbijartinan de alîkarîya K. Burkay bike.

Roja ku me tespîtkirî bû li Dêrsimê me hevûdû dît. Lê ji hevalên ku hatîbûn destnîşankirin, tenê em sê xwendevanên ûnîversîtê amade bibûn. Ez, Îsmail Eslan, Heyderê Ovacixî. Em tevî Kemal Burkay bi jîpek kewn û şoferikî nehosta dora 7 rojan li gundên Pilemur û Qizilqilîsê gerîyan û me propaxande kir. Nîvê wexta xwe, me, bi mijulîya ereba xrawe, an jî bi tandana eraba bê benzin derbazkir. Li wan gund û gomên serê çîyê, me li dijî emperyalizm û li dijî feodalan poropaxande dikir. Gundîyan bêmane li van gotinan guhdarî dikir.

Di vê gera de em carek din bûn şahadî feqîrtîya gelê xwe. Tenê li Plemur ê, gundê Karagolê rastî yekî halxweş hatin. Ew jî axayê wî gundî Welî Axa bu. Her çiqas em li dijî feodalan bûn û xortên gund jî em şîyarkirin ku nebin mîvanê axê gund, lê Welî Axa yê Karagolê hema bêje, em bi zorê birin mala xwe û xwarin bi me da xwarin.

Di gundekî Plemurê din de jî em rastî Hesen Qeya hatin. Ew jî xwendevanekî Zanîngeha Enqerê bû. Li gund Kemal Burkay bi tirkî qala emparyalîzmê, sermaya Tekelan, faîz û krêdîya bankan kir. Gundîyên di sîya dara guzan de bêdeng rûniştî bûn te digot hela ew tîyatro sêrdikin.

Wan him zimanê Tirkî rind nedizanî, him jî babetên ku dihat qalkirin ji wan ra nenas bû. Xasima wan salan de jargona çep gelek qalibî bû. Piştî ku Burkay gotina xwe qedand, çend gotin jî min bi Tirkî gotin. Min Hesen Qeya bi tilîya xwe nîşan kir û got;"a va lawê we jî şahide, em li Enqerê ji destê Tirkeşçîyan, Tirkçîyan çi dikişînin. Sebeb eve ku, em Kurd in, zimanê me cuda ye. 1938 de faşîstên Tirkan ji ber vê cudayetîya me, em kuştin, laşên me avitin çem û newalan. Lazime em dengê xwe nedin dijminê xwe."

Merivekî bejn bilind, zexm û simbêl li ser lêvan de daketî, ji nava koma rûniştîyan rabû hat ez hembêz kirim.

*"Tu ji me yî."* Lê hembêzkirina wî xwaşmêrî îşaretek dida ku di nava wan de tamarek welatperweriyê heye. Pirsa netewî di wê demê de pir teze bû û min zêde tişt jî nedizanî. Lê min yek tişt rind dizanî ku em ne Tirk in. Sebeba bingehîn jî ev bû ku dîya min yek bêjekî Tirkî nedizanî. Wê yekê tim û tim ez dikirim fikaran. Ziman, kinç û lîbasên dayîka min ji Kurdbûna min ra belgeke bingehîn bû.

Dûra em çûn gundên Qizilqilîs-Nazimîyê. Gelek gund û goman em gerîyan. Dawîyê li gundê Xarîkê, nêzî çemê Gêxîyê, ez li wir ji grubê veqetîyam. Heftek bû em li rê û dirban westiya bûn. Rîya gundê min ji vir nêziktir bû, dora çar saetan wext digirt.

Ji çem derbazî alî din alîyê Gêxîyê bûm. Min rîya navbera Gêxîyê û Depê girt û meşîyam. Wê demê li wan rîyan kêm caran erebe pêyda dibû.

Li warên gundê Îbî Mahmûd bûm mîvanê Husên Erdoxan. Lawî wî Heqî Erdoxan li Çolîgê xwendewanê min bû. (Heqî 1973 de di işkencê de hat kuştin.)

Li wir min bi navê Kazim mamostek jî naskir. Çend salan şûnde di 1973 an de di girtîgeha Dîyarbekirê de em 4 mehan bi hev ra man.

Hilbijartin hatin çêkirin, TÎPê bi 500 dengî wenda kir. Ji Partîya Adaletê (AP) Kenan Aral û ji Komara Partîya Gel (CHP) Huseyîn Yenîpinar bûn parlamenter.

Lîstikvanên Gel (Halk Oyunculari) di havîna sala 1968 de hatin li Dêrsimê xwestin tîyatroya Pîr Sultan pêşkeş bikin. Lê polês midaxele kir û bi navê Mehmet Qilan yek kes hat kuştin. Kemal Burkay, Beqal Alî û hin hevalên din hatine girtin. Roja pêşin polês rê neda ku kes here, Dêrsimê, lê dora roja din ez û kekê xwe Mistefa çûne Dêrsimê. Me hin fêkî û pakêtên cigarê girt û çûn girtîgehê dîtina wan.

Êrîş û zorkerîya polês û binçavkirina wan kesan nekarî gel çavtirsayî bike, ew kirinên polês di wê hilbijartinê de ji bo TÎP ê bibû avantajek.

**"Ma şoreş bi xwîna mirişkên min tê nivisîn?"**

Li dibistana Gazîyê li himber Kurdan û cuda dîtinan atmosferek demoqratîk hebû. Li balkona (şaneşîna) qatê herî jorin di teypê de bi zimanê Tirkî û Kurdî bi dor helbest û marş dihatin belav kirin. *"Bijî biratîya gelê Tirk û Kurd. Bimire Faşîzm û bimre Emperyalîzma Emerîkî. Şoreş bi xwînê tê nivisîn, uyd."* Ew sloganana li ser diwarên dibistanê bi tîpên mezin û rengîn hatîbun nivisandin.

Nîvrojekê em li ser xwarinê bûn Mamoste Mehmet Oztecîr hat masa me got: *"Ez dizanim li gorî we şoreş bi xwînê tê nivisîn lê bi xwîna mirîşkên min hûnê binivisîn"* em tê negihiştin ew çi dibêje. Oztecîr li Gazîyê mamoste bû û di lojmanek dibistanê de dima, di bexçê xwe de mirîşk xwedî dikir. Em jê fêr bûn ku wê şevê 29 mirîşkên wî hatine dizîn. Lê haya kesî jê tune bû.

**Faşistan di zaningeha Gaziyê de xwîn rijand**

Di nava gurubên çep û faşîst de li hemû zaningehan şer heye. Li ser Gazî Egîtimê jî faşîst provakasyonan çê dikin ku dibistanê bikin destê xwe. Payîza 1970ê de gelek xwendewanên nû ji bona azmunan (îmtihanan) hatine û di qantîna dibîstanê de cîhê vala nema ye. Ez tevî grubek hemvelatîyê xwe yê nu (Îbrahîm aydin, Nacî Alp uyd) rûniştime li ser azmunan em dipeyîvin.

Nişkeva 9-10 faşîstên tetikkêş, ne ji dibîstana me, ketin qantînê. Ji wan her yekî xwe li cîyekî şund kir. Me ew nasdikirin, armanca hatina wan çi bu me dizanî. Ew ji bona şer û êrîşê hatîbûn...

Min ji hevalên mîvan xwest ku ew wê derê biterikînin, wê li vir şer derkeve. Ew sibê bikarin bê qeza bikevin azmunan. Heval rabûn, lê wan hîn korîdor neqedandî bûn, deng bi şeşagiran ket.

Du kesan li ber derê mezin, yên din jî her yekî ji goşekî rasthatî qantîn gulebaran dikirin. Ez ku bi hevalên mîvan ra rabibûm û bi dengê sîlehê şûva vegerîm, min dî ku hema li pêş min du kesan pişt daye derê mezin li himber salona qantînê gullan diweşînin.

Min xwest ji destê yekî sîlehê bigirim, lê yê din ser milê hevalê xwe ra çek dirêjî serê min kir. Min xwe avit paş duwar, qirşunê kincên hevalê Fîkrîyê Sêvasî ku li paş min bû, qûl kir û derbaz bû.

Ji faşîstan bêtir kesî ra sîleh tune bû. Kê xwe avit tuwaletê, kê xwe di penciran de avit jêr, kê mase velqitand xwe da paş, kê jî hevalên keç himbêz kirin, ji xwe ra kirin mertal. Hevalên keç bi henekî digotin, *"xortên ku heya wê rojê bi me re rûnediniştin, wê rojê em ji para hembêz kirîbûn bernedidan."*

Di wê bûyerê de 9 kes bi gulle hatin birîndar kirin. Çend kesên din jî bi derbên lêdanê, du kesan jî bona ku ji pencirê bazdan, lingê xwe şikîyan.

Lê ji ber vê bûyerê kes nehat girtin, ne jî hate cezakirin. Kesên ku birîndar bûn mafê azmunê jî wenda kirin.

**Rojnama duwar**

Dibistana Gazîyê li Bêşewlerê di cîhekî stratejîk dabû. Akademîya Zanistî ya Bazirganîyê, Xwendina Bilind a Teknîkî Ya Xortên Mamoste, Wargeha ji bo razandina Xwendevanên Zanîngehê, Dibistana Turîzm û Bazirganîya Bilind, Dibistana Bilind ya Teknîkî û Hunerê Ya Keçan, Fakûlta Olî, Fakulta Dermanxanê, hemû li Beşewlerê û nêzî hev bûn.

Xasima di Wargeha razandina Xwendevanên Zanîngehê nêzî me bû û gelek xwendewanên Kurd lê diman. Kenan Kasar, Kamer Dunya, Mehmet Aslan, Mehmet Adibellî, Hesen Kaya, Îsa Geçît ...

Têkilîyên min bi wan re xurt bû. Li wir em pir caran li himber hêzên paşverû û faşîst bûn terefê şer. Bo ku em xwe ji êrîşên wan biparêzin, me heya sibê nobet digirt.

DDKO ji xwendevanên Kurd, ji yên li van doran dûr bû, çûyîn hatinê wext digirt. Ji ber wê me xortên kurd yên li Gazîyê dixwest em Komelekê damezirînin. Min û hevalê Celal Aydin Çolemêrgê (Heqarîyê) Kurdên Gazî Egîtimê civand û bi navê Şoreşgerên Rojhilatên Gazîyê" belavokek derxist û ji bona avakirina Komelekê jî biryar girt.

Di belavokê de li gorî wextê hin tiştên tûj û pêş hatîbûn, wek "heya mafên gelê Kurd yên demoqratik neyne dayîn em, wek şoreşgerên kurd, wê bitêkoşîn, (...)" Wê demê karanîna gotina gelê Kurd û daxwazkirina mafên wan bedîlên giran dixwast. Piştî belavkirina belavokê Midûra Gazîyê Nacîye Öncül gazî min kir û got; polîs dibêje di dibistanê de belavok hatîye belav kirin, kê belavok belavkir, lîsta xwendevanên ji Rojhelat, (ango Kurd) dixwaze.

Min got; "Tu navê min dizanî dikarî bidî lê ez navê kesî nadim." Wê canikê jî zêde israr nekir û tu nav neda polîs.

Nacîye Hanim mamosta zimanê îngîlîzî bû, mamostek demoqrat û pêşverû bû. Ji alî xwendevanan ve wek midûra dibistanê hatîbû hilbijartin. Gelek midûr ji alî hikûmatê ve hatin tayîn kirin. Lê kesî ji ber bûyeran deyax nekir û çûn. Dawîyê bi şikleki demoqratik ji alî xwendevan û mamosteyan ve ew wek midûra dibîstanê hat bijartin. Midûrê ewlîn ya ku bi dengê mamoste û xwendevanan hat bijartin Nacîye Xanim bû. Mêrê xwe jî buroqrateki ber biçav bû. Piştî 12 Adarê jî Nacîye Xanim hate girtin û dora salekê girtîgehê de ma. Di cezakirina wê de yek sedem jî di dibistan Gazîyê de xebatên xwendevanên Kurd bû. Eger ku komîta karger a komela Gazîyê û hevalên pêşverû ji me ra nebûna alîkar me nedikarî em tenê bi serê xwe wan xebatan pêk bînin.

Rêvabirên DDKO wexta ku ji belawok û daxwazîya damezrandina komelê agahdar bûn, ji me ra xeber şandin. Ez û hevalê Celal Aydin çûn komela DDKO yê. Li wir Ehmed Aras û Necmettîn Büyükkaya bi me ra rûniştin. Me daxwaz û dîtinên xwe ji wan re jî got. Me du pêşniyarên konkret kir:

1. Me got ku DDKO ji me dûr e û li herêma me jî gelek xortên Kurd hene em dixwazin li wir komelekê deynin.

2. Li dibistanê em dixwazin rojnameke duwar derxinin.

Hevalan, li Gazîyê damezrandina komelê şaş dîtin. Gotin ew yeka DDKOyê qels dike. Lê amadekirina rojnameka dîwar di cîde dîtin.

Di kafeterya Gazîyê de diwarek nêzikî 3x3 meter bi rengê sor bi rîya xwendevanên beşa resimê hate boyax kirin.

Nivîs û resimên ku me dibijartin bi alîkarîya wan hevalên nivîs xwaş li ser kartonên 1x1,5 m bi puntoyên mezin dihatin nivîsandin û li ser fona sor dihatin daliqandin.

Li ser şerê çînayetî û netewî hin maqale û gotinên Lenîn, Stalîn, Mao û Hoşîmîn tevî hin resiman dihatin weşandin. Hin gotar ji me dinivisîn.

Di hejmarekê de suretê şûr a gîyayê pêçekê lê pêçayî hatîbû çêkirin. Li kêleka suret jî hatîbû nivisîn ku "gelê me şer naxwaze, lê rêya aşitîyê ji di şer de derbaz dibe (...) mixabin zilm û zordarîya ku ser gelê me tê kirin, şer tine ber derê me ( ... )"

Rojnama hefteyî gelek bi rêk û pêk dihat amadekirin. Hin caran hevalên DDKO yê ew materyal dibirin li komela xwe daliqandin.

Bi pêşniyar û daxwaza me cara pêşin İsmail İpek di şeva şahîyê Komela Gazî Egîtimê derket bi Kurdî kulama "Gola wanê " got. Bi vê bûyerê îtifaqa hêzên çep û welatparêzên Kurd li Gazîyê giranîya xwe da perçin kirin. Bûyerê di nava mamoste û personalê zanîngehê de deng da. Hin guhdarên şoven û faşîst xwe nerehet kirin, digotin, di sazîya ku M. Kemal avakirî de, çawa bi Kurdî helbest tê gotin? lê nekarîn pêşîyê lê bigirin. Çend salan şunda mamoste Kemal Demiray[25] di civînikê de vê şevê bi bir tîne û dibêje "ew şev ji bona min bîranînek pir xirab e."

**Li Kurdistanê zilma qomando**

1970-1971 de li Kurdistanê leşker-komando li ser gelê Kurd êşkence û zulma xwe gelek zêde kir. Bi mana komkirina çekan li gundan êşkence û terora dewletê gel ji canê xwe bêzar kir.

DDKO dixwest di derheqê bûyerên Kurdistanê de afîşekê derxine û bûyeran protesto bike. Ew kar min girt ser milê xwe. Ji ber ku di dibîstana me de beşa resimê hebû. Nivîs û suret an jî afîş çêkirin karê wan bû. Ji alî ekonomîk ve ji komela Gazîyê rewşa xwe baş bû û dikarîya alîkarîyê jî bike.

Berpirsîyarên DDKO yê du sloxanên ku tespît kiribûn, ev bûn.

"Bîrleşelîm Kuduran Faşîzmî Yerle Bîr Edelim." Em bibine yek faşîzma har bi pelixînin!

*"Halklarin Bîrlîgî Kuduran Faşîzmî Yok Edecektir."* Yekitîya Gelan Wê Faşîzma Har Ji Hole Rake!

Di afîşa yekem de suretên karker, gundî û xwendevanek tirpan, çakûç û pirtûk di dest de hatîbûn resim kirin. Afîşê, bal dikişand ser yekitîya çin û tebaqên kedkar. Yekitîya gundî, karker û xwendevanan dihat parastin, tîfaqa wan dikarîya zora faşîzma har bibira.

---

[25] Kemal Demiray mamoste û niviskarê zimanê Tirkî û gramatika wê bû. Li dibistana Gazî Egîtimê di beşa zimanê Tirkî da mamoste bû.

Afîşa duyem de jî bi resmê Kurd û Tirkekî yekitîya Kurd û Tirkan hatîbû sembolîze kirin. Du hevalê hunermend li ser cawê hevrêşîm sûretê Kurd û Tirkekî bi libasên netewî, di destê wan de jî ala sor afîş çêkir û bona çapê amadekirin. Lê ji bona çapkirinê jî boyax, kaxiz û dezgehek sabît û hostatî divîya. Me tevî hin havalên din ji cawên ku afîş li ser hatîbû çêkirin ra dezgehek jî çêkir.

Heftekê ez neçûm sinifê bi rengê sor û sipî dora 75x100 cm mezinayê dora 1200 hebî afîş çapkir. Hemû mesrefa afîşan jî komela Gazîyê da.

Min afîş birin DDKO yê teslîmî hevalan kir. Ji afîşan para mezin berê şandin Kurdîstanê. Yên mayî jî di nava hevalan de hat beş kirin.

Li herêma Bêşevlerê daliqandina van afîşan bû para me.

Şevekê me hin hevalan; Kazim Budak, Qurbanî Yildirim, Faîk Bulut, Îbrahîm Aydin, Muhsîn Gokturk di nava xwe de biryar de ku em derkevin û afîşan daliqînin.

Piştî ku tarî ket erdê em çûn heya saet 21-22 an li gelek cadde û kolanan me afîş dalikqandin. Lê dawîyê polês ji karê me agahdar bû û pê me ket.

Me bazda em çûn nêzî faqulta Olî, nêzê dibîstana Teknîkî û Hunerî ya Keçan, li meydanek vala û tarî me xwe li wir vêşart.

Ereba polês hat derbaz bû, em heya 30- 45 deqîqe li cîhê xwe rûniştin. Êdî polês xuya nedikir. Em rabûn ketin ser rê ku, herin dibîstanê. Ez û hevalê Qurbanî li pêşîyê, yên din jî bi navber du me dihatin. Nêzî dibîstanê di binê pirê de, me dî ku polîs dafik danîye.

Min û Qurbanî ber bi pêş havalên dû me jî ber bi paş bazdan. Polîs gulle berda me, viz û viza gulleyan bûn, ew ji ber guhên me ra derbaz dibûn.

Komsêr ji dûrve ji polêsê du min re dikire qîr ku "ji bin navê re li min bide" di bexçê dibîstana Gazî yê de ez hatim girtin.

Polîsê bi dû min bi hêrs bi qebza şeşagira di dest de li suretê min xist xwîn berda ser min.

Cîhê ku Qurbanî bazda, li derê jêr hevalên Gazîyê ji bona êrîşên faşîstan nobet digirtin, wan li wê dere Qurbanî ji dest polîs xilas kirin. Polêsan bi lêdan û xeberdan, ez birim kirin jîpa xwe.

Dema ku di erebê de polês bi jopê li serê min dixist hemû laşê min dirucifîya. Min zanî ku jopên bi elektrîk li min didan.

Polês ez birim Akademîya Zanistî ya Bazirganîyê. Wan li wir qereqol danîbû. Ji nava koma polêsan yek ber bi min hat navê min û bajar û gundê min pirsî. Min hîn dawî li gotina xwe nanîbû, bi hêrs got *"çawa ji bajarê min komînîstê mîna te derdikeve"* û bi copa ku di destdabû raste rast kuta çavê min û bi copê li hin derbe li serî û pişta min da.

Min zanî ku polês ji Dêrsimê ye dixwaze xwe şefên xwe re şîrîn bike. Min jî got *"ji bajarê me komînîstên mîna min pirin, lê kuçikê mîna te dernakevin."*

Têra xwe li min xistin. Ji xwe wexta ku ez hatim girtin, bi destikê şeşagirê li suretê min xistin û ev bi xwîn bû. Bi vî hawî ne tenê keda me, xwîna me jî ket ser afîşê.

Piçek wext şunda Faîq Bulut û Muxsîn Gokturk jî anîn, ji gruba me ya 5 kesan em sê kes hatîbûn girtin.

Li wir ji peyva polêsan bi têlsizê em fêrbûn ku gavekê berê bombe avitîbûn mala rektorê Ûnîversîta Ortadoguyê, Erdal Înonu. Tarixa wê rojê 16.01.1971 bû.

Em sê heval birine Seraya Emnîyetê, qata bin erdê. Em him bêxew bûn, him ji bi lêdan û bazdanê westîya bûn. Me nedikarî li ser pîyên xwe bisekinin.

Li wir gelek bersucên din jî hebûn. Oda ku em têde bûn teng bû, bi dor li ser betona tazî me xwe dirêj dikir, ji ber encama wê jî em bi hindurêşê ketin.

Em dawîya heftê hatîbûn girtin. Şemî, yekşemî îfadên me negirtin, roja Duşemîyê îfadên me girtin û em berdan.

Polîs ji hevalê Bursayî Muhsîn ra digot; "Kazim û Faîq ji Rojhelata Anotolîyê ne, min ew fêmkirin, lê kê ...dîya te? Tu çima afîşê DDKO yê daliqînî?" Muhsîn ji Bursayê, Tirk bû. Piştre hinekan gotina polîs bi bîr dianî û bi Muhsîn henek dikirin.

**Em çar heval dixwazin herin kampa Filistînê**

Wê demê li Filistînê perwerda çekdarî, rojeva xortên çepgir de di xalê sereke de cîh digirt.

Gelek serok û endamên Dev-Gençê çûn Filistînê perwerda gerîllatîyê dîtin û şunda vegerîyan. Deniz Gezmîş û hevalên xwe serborîyên xwe yê ji Filistînê kirin pirtûk û weşandin jî.

Di vegera Filîstînê de Husên Înan û hevalên wî hatin girtin û di girtîgeha Dîyarbekir de hatin zîndankirin.

Me çar hevalan; Celal Polat, Hîkmet Ozdemir, Oner Yagci û Kazim Budak jî dil heye herin qampa Filistînê.

Em di nava xwe de dipeyîvin û ji kesên ku çûne qampê hatine agahî digirin. Mistefa Kemal Çamkiran jî çûye Filistînê hatîye û xwedî pratîk e. Rojekê me li edlîya Ulusê randewû da wî û li wir ew dît. Lê piştî hin gotûbêjan, ew wegerî, ji min ra got *"nebe ku tu li wê derê qala pirsa Kurd bikî, ew ji Kurdan hez nakin."* Li gorî xwe hin sedemên wan jî gotin.

Vê gotina M. Kemal ez kirim nava dudilîyê. Min got lê ew Kurdan heznakin ez çima wan hez bikim, ez jî narim. Min li wir biryara xwe guharî.

Sê hevalên din çûn, heftek derbaz nebû agahî hat ku ew di girtîgeha Mersînê de girtîne.

Me bi alîkarîya Komela Gazîyê, ji wan ra hin kinc, rûyê nivîn û newresîm, bona paqişî û rûkurkirinê hin malzeme pakêt kir û tevî hindik pere da hevalekî (Akay) û ew şand Mêrsînê.

Li gorî agahîyên wan ji dibîstana Gazîyê keçikê (Seyareyê) sîxurîya wan kiribû. Keça ku ew gilî kiribûn endamê komela Dev-genç ê bû. Keçik, hevala serokê komela Gazîyê Îbrahîm Sevîmlî bû. Wê ji ber pozîsyona Îbrahîm mesele rind dişopand. Piştî derba 12 Adarê keçikê rûyê xwe yî vêşartî eşkere kir, li ser şoreşgeran îfade da, ket nava refê polêsan.

Sê mehan şûnda hevalên girtî derketin hatin, lê ji ber bêdewamîyê sal wenda kirin.

Qampa Filistîyan ku me dixwast em herin û me nekarî em herin ez 10 salan şûnda, di sala 1981 an de tevî grubek heval çûm. Rastî jî ji pirsa Kurd û Kurdistanê ra çavê xwe digirtin. Sedema wê him şovenîzma erebî bû, him jî ditirsîyan ku pirsa Kurd di navnetewî de cîh bigire, pirsa Filistînê ji rojevê dakeve rêza jêrin.

**Komela Dêrsimê ya Çandê, li Enqerê**

Di dawîya sala 1970 de hilbijartina ku li Enqerê çêbû ez bûm serokê Komela Dêrsimê ya Çandê li Enqerê.

Di komita karger de ez, Silêman Atay, Şahîn Unlu, Mehmet Aslan û Îsmaîl Aslan hebûn.

Komela me bi alîkarîya hemwelatîyên halxweş li ser lingan dima. Mîna dewletên Ewrûpa, ji komelan re alîkarî nedihat kirin. Wexta ku me bi encama hilbijartinê ji komîta karger dewr girt tu pere, tu hatina komelê tunebû û kirê ya gelek mehan jî ketîbû ser hev.

Cîhê komelê li Ulusê di xanekê de, odak tarî û nepaqij dabû. Ew cî tenê ji bo edrêsê hatîbû kirê kirin. Tu kes nediçû û nedihat, tenê ji bona dayîna kirê rîya xwe bi komelê dixistin. Her mehê 120 TL bedêla kirêya odê bû. Di komelê de, çend kursî, mase û daktîloyekê bêtir tu tişt tunebû.

Li Tirkîyê rewşa sîyasî ber bi nebaşîyê diçû. Bi bûyerên provakatîv alozî gêş dibû. Em difikirin ku eger cuntayek leşkerî bê ser hukim, wê komelê jî bigire û dest bide ser her tiştî jî.

Komîta karger di nav xwe de hin civîn pêkanîn û rewşa komelê ber çav ra derbazkir û rojeva xebata xwe amadekir.

Ji ber rewşa aborî, em mecbûrbûn komelê vala bikin. Daktîlo û kursî hevalekî birin mala xwe û me komelê vala kir.

Ya duyem me dî ku gelek endamên kevn, xwendevanên zanîngehê, ya wê demê ji komelê pere dên kirine û dêynê xwe nedane.

Kaxizên ku dêyndaran îmze kirîbûn, ango qebul kiribûn ku ew dênê xwe bidin, di dosyan dabûn.

Gelek ji wan sedî sed xwedî karûbar û îmkan bûn. Doktor, parêzer, qadi, mamoste ango karmend (memur) bûn.

Gelek ji wan me nas dikirin. Kekê min Mamoste Mistefa Budak û Av. Pîltan Erdogan, qazî Cafer, qazî Dizgun, Karmend Şukrî uyd.

Min bi Parêzer Cemal Demir ra têkilî danî ku ew bi heqê xwe kesên dêyndar ra name binivîse. Dêyndar dêynê xwe bidin, heğer nedin bi rîya fermî dozê bike û bişopîne.

Cemal xwest Mistefa û Pîltan ji nav lîstê derxine û got para wan ez û tu ji para xwe bidin. Lê min got tu weke parêzer heqê xwe bigire, lê yên mayi ya komelê ye. Lazime tu ji Mistafa û Pîltan re jî namê bişînî û ew dêynê xwe bidin. Usa nebe neheqî dibe û ez qebul nakim.

Nişkeva xanima Cemal ji mitbaxê derket û bi hêrs pekande ser mêrê xwe got:

-*"Ne şerme tu tiştê nedirêda didî ber Kazim. Ma tu mixtacê perê Komelekê yî? Xazila ew gotina ji devê te derneketina."*

Cemal bi ken got.

-"Min henek kir."

Çend mehan şunde pereyên pêşin 800 Tl ji Mistefê, 800Tl ji Pîltan hatin.

Lî dibistana Gazîyê bi endamên Komela Dêrsimê ya Çandê ra me ciwînek hevnasînê çêkir.

Di ciwînê de gelek kes kom bibûn. Wek serokê komelê min ji wan ra behsa xebat û projên komîtê kir. Min li ser navê komîta karger, sê xebat pêşkeşî wan kir.

1.Komela ku xortên pêşverû li Dêrsimê avakirine bi hin pirtuk piştgirîya wan bikin.

2.Xwendewanên beşa tîyatroyê pîyesa Pîr Sultan amade bikin û ji betlanea Sibatê îstifade bikin li Dêrsimê pêşkêş bikin.

3.Di meha Nîsanê de li Enqerê ji bo endam û dostên me şevek şahîyê, şevek piştgirîya gelê Dêrsimê bê kirin.

Kesên di civînê de hazir bûn, hin dîtinên xwe gotin û pêşneyarên jorin pejirandin.

Tîyatro karekê giran û berpirsîyarî dixwast. Xasima li Dêrsimê pêşkeşkirina vê tîyatroyê maneke xwe ya sîyasî hebû.

Ji ber ku demik berê gruba Lîstikvanên Gel (Halk Oyunculari) Necmî Tuncer (şanogerekî Tirk) li Dêrsimê nekarîbûn vê tîyatro pêşkêş bikin. Di şevê de bi provakasîyona polês, mirovek hatîbû kuştin û gelek kes jî hatîbûn binçavkirin û bibûn mixatabê lêdan û êşkencan. Me dixwest ku tola (rowanşa) wê bûyerê bigirin.

Hevalên ku di şano de rol girtîbûn dilezandin. Xasima Musa Tanrikulu yê Plemurê û Hesênê Xozatî barê giran girtîbun ser milê xwe. yekê ji wan rola Pîr Sultan, yê din jî rola Xizir Paşa dabû. Xortên zanîngehê yên beşa tîyatroyê lîstika Pîr Sultan di wextê de amade kirin.

Di betlanea Sibat a 1971 an de grubek dora 20 kesî me berê xwe da Dêrsimê. Di grubê de 3-4 keç hebûn, yên din hemû law bûn.

Hunermendê navûdeng, ya wê demê Rahmî Saltuk jî bi mera bû, wî tembûr lê dida û kilam digot.

Yêkem pêşkêşkirin li Lîsa Dêrsimê, salona sporê de hate kirin.

Eleqe gelek zêde bû, gel di salona heyî de bi cîh nebû. Bi hunera xwe, hunermendan xwe dane hezkirin. Temaşevanan bi çepik û sloxanan piştgirîya hunermendan kir.

Lê di roja yekê de di komîta me de qelsîyek çêbû. Hesavê me hevdû nedigirt. Endamê komîta karger, Şahîn Unlu nekarî bi ruyê spî hesavê xwe bide. Kadroyekê ji Dev- Genç ê, Mistefa K. Çamkiran îtirafkir ku Şahîn dizîyan dora du hezar lîra perê Tirka dabû wî. Got *"Şahîn, ne zêde, tenê perê şeşagirekî da min."*

Di nava me de nîqaş derket, têkilîyên Şahîn bi pêşkêşkirina şevan hate birîn. Wî li himber peran zaef nîşan da. Têkilîyên wî bi Dev-Genç ê re hebû.

Me li dijî xebatên faşîst piştgirîya Dev-Gençê dikir lê bi dizîyan û bê agahîya komîtê pere dayîn ne exlaqî bû.

Me otobosek gundan, yeka piçûk kirê kir çûn Plemurê, Mêzgirê û Xozatê. Li wan deran jî tîyatro bi serkevtî hate pêşkêşkirin, me ji gelê xwe germahî û dosteyatî dît.

Piştî ku em vegerîyan, Enqerê me hesavê xwe kir, zêde kara komelê tunebû. Ji ber ku xwarin û wexarina 20 kesî heqê otêlê, heqê erebê, yê cixarê, û hin mesrefên din. serda jî dîzîya ku endamê komîtê dikir...

Lê disa jî di destê me de hinek pere mabû. Bi biryara komîtê (Şahîn ne di nav de) bi destê endamê komîtê Silêman Atay 1700 TL me teslîmi DDKO yê kir.

**Di 12 adara sala 1971an de cunta leşkerî dest da ser hukim**

Rewşa polîtîk nazik bû, di nava grubên leşkerî ya cep û rast de reqabeta çêkirina îhtilalê hebû. Hin grubên pêşverû ku bi wan ra di nava têkilîyandabûn, guhê xwe li ser wan bû.

9 ê Adarê şev saet 24.00 an de em di lokala dibistana Gazîyê li ser bûyeran û rewşa polîtîk dipeyîvîyan.

Ji derva du qadroyên sereke yên Dev- Genç ê, Sarp Kuray û serokê FKF (Federasyona Kulub a Raman)ê kevn Atilla Sarp ji hatin. Xûya bû ew ji rewşa polîtîk ditirsîyan û wê şevê ji xwe ra li cîyekî ewlehî digerîyan. Bi stres û bê sebir bûn.

Wexta ku li loqalê rojnama dîwar a ku me xortên Kurdan amadekirîbû, dîtin heyîrîyan, gotin we çima vana hîn ranekirîne, hun li benda çine, rewş ne baş e?

Heya wê rojê di nava gel de guman hebû ku baskê çep ya nav ordîyê di 9 ê Adarê de derba leşkerî çêke û rêvebirîyê têke destê xwe.

Lê ûsa nebû, cunta çepgir ne, a rastgir 3 rojan şûnda ango 12 Adarê sala 1971 de leşker dest da ser rêvebirîyê. Piştî derbê leşker ket zanîngehan bi sedan xwendevan girtin û zîndankirin. Gelek xwendewan jî revî bûn. Hevalê me, endamê komîta Komela Dêrsimê Memed Arslan jî lê dihat gerandin.

Mehmet bi Denîz Gezmîş ra têkilîyên xwe hebûn. Me randewû dabû hev ku em herin civîna Denîz a li Zanîngeha Ortadoguyê. Lê çend saetan berî civînê Mehmet hat Gazîyê agahî da me ku kes nere zanîngehê. Bo ku Deniz û hevalên xwe banqe şelandine, li wan tê gerandin û cîvîn betal bûye.

Mehmet wek me gelek xwendevanê Kurd rewşa xwe ya ekonomîk ne baş bû. Bona ku polês jî lê digerîya rewşa wî xirabtir bû.

Dêyndarên komela me dêynê xwe dişandin, di banqê de 3000 TL perê komelê kom bibû, bona girtina peran îmza min û hevalê Mehmed lazim bû. Lê li Mehmed dihate gerandin nedikarî bê banqê û îmze bide.

Me di cîhê heval Mehmed de hevalekî din wezîfedar kir. Em çûn banqê û me hemû pere kişand. Ji wan peran 2500 TL da Mehmed.

Dûre ku li min jî hat gerin, min nekarî hevalên komîtê bibînim, 500 lîreyê ku ji hesavê komelê mabû, min bir li ba dostê hêja Heqî Qereman danî.

Heqî ji Dêrsimê, gundê Goman, ji mala Îsê Şivê bû û di Şaredarîya Enqerê de wek zabita dixebîtî. Heqî mirovekî welathez, demoqrat û dirust bû. Min ew temî kir ku ji hevalan kî hat ew wî pereyî bide wan. Ew yeka min gîhande hevalên komîtê jî. Piştî rev û hepisê şunda min Heqî dît got *"Şahîn Unlu ev pere zûve girt."* Min ji Şahîn pirsî got erê, min girt.

Min got mala te heye, bavê te parêzer e û zengîne, tu pir mixtaci wî pereyî bûyî? Lê va cara duyem bû, ku wî ji peran ra zaef nîşan da û xwe nizim dikir. Lewma tewrî wî ya himber peran ji bona şexsîyeta wî bû pîvanek. Havalên ku me jê re name şandîbûn, dêne xwe dan. Lê wê carê jî ew pere hindik be jî ket bêrîka çavbirçîyekî.

Me sekir ku Kemal Burkay jî li Dîyarbekir girtîye.

Ser navê komelê li Enqerê me ji çend hevalên welatparêz, Yusuf Kaçar, Dr. Ferhat Benzer, min hindik hevalên din di nava xwe de 500 lîre komkir û da Silêman Atay bona ku bigîhîjîne wî, ew şand Dîyarbekirê. Lê Silêman heta çû ew ji girtîgehê hatîbû berdan.

Di 17 Nîsanê 1971 an de jî me li Kizilayê di salona Dilşad de şeva Dêrsimê çêkir.

Polîsê ku di Akademîya Zanist a Bazirganîyê de li min xistîbû jî hatîbû ber derê salonê. Hevalan nedixwestin, ew beşdarî şevê bibe, lê min ew girt hindur. Ew hat,

destê min girt û ji bo bûyera derbazbûyî lêborîna xwe xwast. Navê wî Mistefa bû û ji Mêzgirê gundê Kelê bû.

Min di şevê de wek serokê komelê axaftinek kir, Tevî Bexdayê pêkanîna Otonomîyê, serkevtina Kurdistana Başûr pîroz kir.

Atakan Çelîk jî bi helbestek Kurdî dilê beşdaran germ kir.

Folklora DDKO yê coşa şevê bilind kir.

Xalîça ku me kirîbû mezatê me da DDKO. Di şevê de parlementerên kevn û kesên ku dixwastin nuva bibin namzet di şevê de beşdar bûn. Lê hinekan gotarên ser Kurdistana Başûr û serokê wê M. Mistefa Barzanî heznekir, ji şeva me zêde kêf negirtin. Gotin "we şev kir şeva Barzanîyan."

Hikûmata 12 Adarê roj bi roj êrîşên xwe firehtir dike. Kilît li Derê hemû komelan xist, gelek endamên wan hatine girtin an jî cîhê xwe guharîn.

Gelek ronakbîr û welatparêzên Kurd û li girtîgeha leşkerî ya Dîyarbekirê hatine, binçavkirin.

Ji Çolîgê kekê min Mistefa Budak, Pîltan Erdoxan, Hîlmî Elçî, Şakîr Elçî jî hatine girtin û birine girtîgeha Dîyarbekir.

**Êrîşa polîs a li ser dibîstana Gazî Egitimê**

Piştî nîvro leşker û polîs çaralî avitin ser zanîngeha Gazî Egitimê. Dema ku leşker û polês ket, nav dibîstanê em xwendevan, li qantîna avhîya ku tê de zimanê Tirkî, Frensî, Îngilîzî û Almanî dihate perwerdekirin da rûniştîbûn.

Xasima hevalên xwestin bazdin û derketin derva, hemû hatin girtin. Min dî ku der û dora me hemû hatîye dorpêç kirin, Ez derneketim derve, çûm qatê duyem, ba şefê zimanê Frensî, Îsmet Bîrkan. Min ji mamoste rica kir ku, ew min derxinî derva. Di bêrika min de name, nivîs, belavok çi hebû min li wê valayî çopê kir.

Mamoste di dest de çente em ber bi derîyê derva meşîyan, du polêsên bi tomson li ber derî bûn û nehiştin em derkevin. Min got, *"Em mamostene, Îsmet Beg şefê beşa zimanê Frensî ye, divê em herin avahîya navendê, civîna me heye."*

Li ber derê avahîya navendê jî û li hemû avahîyên din jî leşker an jî polês hebû. Wan em berdan, heya cîyekî em bi hev re meşîyan, nêzikê saha basketbolê ez ji mamoste veqetîyam çûm saha basketbolê. Li wir hin xwendevanên nas basketbol dilîstin. Min jî, ji ser navê ra xwe tazî kir û ketim lîstikê.

Hin hevalên ku mesele fêmkirin ji durve bang dikirin, *"Kazim te ji kîngê dest bi lîstika basketbolê kirîye?"*

Polês wê rojê kî hat ber girt, têra xwe xwendevan kom kirin dû otobos tuji kirin û çûn.

**Erdhejîna Bîngolê**

Sibehê 22 meha Gulanê de Radyoyê di nûçen xwe de erdhejîna Bîngol da. Mirî û zerera maddî gelek bû. Birayê min Mistefa li Çolîgê mamoste bû. Çar birayên me li ba wî dixwendin. Min dizanîya ku Mistefa li Dîyarbekir di girtîgeha leşkerî de ye. Ji alîkî ve bi vê yekê şa dibûm, difikirîyam ku qet nebe ew ji erdhêjê xilas bûye.

Min gava ku agahîya erdhejînê girt, çûm ba hevalên Çolîgî, Saîm Buzrûl û Yener Aytaç. Em bi hev ra çûn wezereta Îmar û Îskanê.

Şaredarê Bîngol Faîk Ertuxrûl û çend kesên din jî li wê derê bûn. Wezîr Selahattîn Babûroxlû hat em gûhdarî kirin, dî ku Faîk Beg jî tevî me ye, têkilîyek germ rawa kir. Got "ereba min a wezaretê bigirin û herin." lê yê cem bala wî kişand ku di nava xwendewanan de nebe ku hinek "macereperest, goşîst" hebin. Ew gotin li himberî terorîstî ya îro bû. Wê demê wezîr zivirand, mînîbusek da ku em hemû bikarin pê herin.

Heya Çoligê em hemû, hema hema bi gîrî û bi şînê çûn. Her yek ji me bi jana xwe ra digîra. Me lezdikir, li tû cîyekî ranewestîn, xwarin nexwar, tenê benzîn digirt û dom dikir. Her cara ku radio nûçeyê erdhejînê dubare dikir, hêjmara mîrîyan jî bilind dibû.

Di nava birayên xwe de hin caran diketim fikaran eger bi bijartin bûna minê kî ji çav derxistana, difikirim na tû ferqîyekê nikarim di nava wan de bikim.

Saet yekê şevê em gîhaştin Çolîgê. Avahîyên bajar nîvîk hêrifîya bûn. Xasima lojman û avahîyên fermî. Ez çûm mala birayê xwe, min Mistefa dît. Du ranze avitîbûn derva, ser caddê li wir ew û xalê me Zilfî radizîyan. Zilfî ser xebera erdhejînê vê rojê hatibû Çolîgê.

Ji malbatê wek can zerar tune bû. Mistefê zarokên xwe û birayên me jî vê rojê tevî bavê me şandibû gûnd.

Bavê me, bona girtina Mistefê hatîye Bingol.

Wî digot "*ez li parkê rûniştîbûm, yekcar erdhejîya toz û bahozek rabû me rê li ber xwe nedit. Min lez kir herim mal, lê firtine û tozê nedihişt, em rîya xwe bibînin. Neyse çûm çûm .. li şukur ku kesî zerar nedîbû.*"

Gruba Çolîgê, tesaduf di wextek kinda, rojekê berî erdhejînê ji girtîgeha Dîyarbekir ya leşkerî hatîye berdan. Mistefa wexta erdhêjê, li mala xwe di xewê de bûye. Wê gave hinek hevalê xwe yê mamoste jî bona derbazîbûyînê hatine li mala wî bûne. Jina min Nazli jî wê demê keça azeb e ew jî tewî koma mamostan li wir bûye. Wê şevê em hindik razîyan, ji xwe cîhê razanê jî tune bû. Sibê de em çûn nava bajar. Bi çavê rojê meriv felaketê zêtir dibîne. Qatê bînan û şaneşîn (balkon) li ser hev rûniştîbûn, hindek bîna jî te digot di temelê de çûne xwarê. Di dibistana ebeyan di cîhê razanê, binê ranzan de, pênc keç sax mabûn qîrin û girîna wan dihat gûhê me. Kesî ceseret nedikir nêzikî avahîyê bibe.

Mistefa Budak û parêzer Şakir Elçî ji di binê xirabe ya avahîya lîsê de dengê du xortan dibihîsin. Xort bang dikin û alîkarî dixwazin. Ew vê nûçê digîhîjînin walîyê Çolîgê. Walî dibêje, *"hûn herin xilas kin."* Sazîyên dewletê ji bo alîkarîyê ne bi dil û can bûn. Wan nadihişt xort, xwendevanên ku ji derva hatibûn alîkarî bikin. Min tevî çend hevalan qamyonek xwarin û hin çadir bir li taxa Ataturkê belav kir.

Çend rojan şunda ez wegerîyam Enqerê. Saet 7ê sibê li nêzî Gazî yê berî ku erebe here garajê, li ser kolana Konya yê peya bûm çûm dibistanê.

Hevalan ez haydar kirim ku du rojan berê saet derengî şevê polês carek din avitîye ser dibîstanê. Hemû xwendevan (beşa sporê ne di nav de) ji xewê şîyar kirine li salona sînemê civandine û gora lîsta destê xwe gelek heval girtine birine.

Navê min jî xwendine, hevalan gotine ew çûye Çolîgê, serbaz bi hêrs, pirsîye *"çûye Çolîgê çi?"* Hemûyan bi hev ra bersiv dane, *"çûye erdhejînê, erdhejînê"*.

* * *

Xûya bu li zanîngehê polês rehetîyê nede me. Şevikê dereng ez û hevalê Hîkmet Ozdemir çûn ketin, sinifikê û me derî ser xwe kilît kir, batanya li erdê raxist û li ser vezelîyan ku razên. Bo ku em xwe ji êrîşê polês biparêzin me dixwest şevê li wir derbaz bikin.

Lê em hîn di xew ve neçûbûn derîyê kilît vebû. Lambe hate vêxistin, dengekî nizm ji hev ra gotin "vane li vir in." Du kes bûn, derî dan cî, çûn. Oda ku em lê bûn qatê erdê bû, em herdu hev ra yekcar rabûn bi pencirê ve me baz da. Wê saetê me nedikarî ji dibîstanê jî derkevin, orfî îdare hebû û çûyîna derva qedexe bû. Em çûn hilkişîyan ser sîwan (çati) a xanî, li wir hin cîhê ku meriv bikare xwe lê bigire hebû. Em li sîwanê hin caran di cîhê xwe de xew va çûn, hin caran şîyar bûn. Sibê rojê avit em daketin jêr, lê pişt û qolincên me bibûn ço. Piçekê me kûltûr fîzik kir em li xwe hatin.

Sal û termîna min ya dawîyê yê, dive ez bikarim bikevim azmunan. Di dersa edebîyatê de şefê beşa Lîteratûra Tirkî Îbrahîm Olgun azmun dikir. Min ji mamoste xwest, eger polês bê ew ji me ra alîkar be. Demikê şunda ew hat di ser kaxiza min de xwar bû û got bese te gelek nivisîye. Min baverkir ku ew hatina polês îşaret dike. Min xwest bazdim got telaş meke tişt tune.

* * *

Di hemû dibistanên bilind û di hin fakultan de bi navê Dîroka Şoreşa Tirkîyê dersek hebû. Di pirtûkê de dîroka şerê cîhanê yê yekem û şerê Tirk û Ruman -Şerê Rizgarkirina Tirkîyê- yek alî tê şirove kirin. Mamosteyê dersê jî merivekî cahil, paşverû û prîmîtîv e. Hin caran di dersê de di nava me de nîqaşên hişk hatin kirin.

Di azmuna dawî de ji pirsan yek ev bu, "di şerê Rizgarîya Netewîya Tirkan de komelên dost û dijmin kijan in? Di pirtukê de Tevger a Tealî ya Kurd di nava

dijminên tevgera Tirkan de hatîye hêjmartin. Min bi zanebûn di bersiva xwe de ew nav nenivisî. Mamoste hat piştî ku çav li kaxizê gerand got "Cemîyeta Tealî ya Kurdan jî neyar e, te ew nenivisî ye."

Di dersê de jî me li ser vê babetê nîqaş kirîbû, wî dixwast ji nîqaşên me yên li sinifê tol bigire.

Tiştên ku di dersê de nekarîbû bi me bide qebulkirin dixwast bi rîya azmunê ez ji dîtinên xwe tawîz bidim.

Min got na ez usa nabînim, lewma min ew tevger wek neyarê Tevgera Rizgarîya Tirkiyê nenivisî.

* * *

Hikûmata Nîhat Erîm[26] herçî diçe, destê xwe zêtir dike xwîna şoreşgeran. 1 ê Heziran a 1971 an de ez li Îçaydinlixê di mala hevalekî dabûm, piştî nîvro, radyoyê nuça kuştina Husên Cewahîr[27] da.

Apê Cewahîr, Alî Kemer digot:

-Hikûmatê ez ji derva anîm Stenbolê, cîhê bûyerê. Serleşkerê ku li ser tifangê bû û pencira wan dişopand ji min pirsî, *"Husên Cevahîr kîjane? Min bi dûrbînê kayt kir, di paş perdê ve Husên di dest de surahî û qedeh av vedixwar.*

*-Min got, Husên, ewî ku avê vedixwe, ew e.*

*-Got başe, de tu here.*

*-Ez hîn ji derecê (merdîvenê) daneketîbûm jêr, dengê tifangê hat min. Ez ku daketim nava qelebelixê gotin Husên hat kuştin."*

* * *

Dibistana me leylîye, lê ji bo ku xwe ji êrîşên polês biparêzim tenê roj terim dibistanê.

Ji azmunan derdiketim, diçûm bajar, mala hevalan. Dawîyê min dibîstana Gazî Egîtimê qedand, him jî bi encamek serkevtî, eger ku qezayek nebe êdî mamoste me. Roja qura- vîjak kişandinê her yek, tere vijaga xwe dikişîne. Lê ez neçûm, min ji hevalekî xwe xwest, ew here ser nave min vijagê bikişîne. Ne be ku poles li wir be û min bigire. Êvarê heval hat mizgînî da min ku wî ser navê min lîsa Erqenîyê

---

[26] Serokvezîr Nîhat Erîm bi mixtira leşkeran a 12 Adar 1971 an bu serokwezîr. 19 tîrmeh 1980 da ji alî Dev-Sol ve hat kuştin.

[27] Husên ji Dêrsêmê bû û di zaningeha Sîyasalê da xwendevan bû. Di nava refên Dev-Genç ê da ci girt. Tevî Mahîr Çayan THKP-C damezrandin. Bo ku gerîlayên bajar pêk bînin li Stenbolê dest bi bûyeran kirin. Li Maltepe Stenbolê mala ku ketinê keçik rehîn girtin. Yarbayekî nîşanker Husên kuşt, Mahîr jî birîndar hat girtin. 7 salan şûnda yarbayê ku ew kuşt ji hate kuştin.

kişandîye. Wek mamoste ya ziman û literatura Tirkî tayîna min derket lîsa Erqenîyê qeza Dîyarbekirê.

Bo ku polês nekare edrêsa min ji vir bigire, wê şevê çûm ber derê Wezereta Perwerdê, min di lîsta daliqandî de navê xwe dî û ew reş kir. Ez difikirim ku eger bikarim herim dest bi kar bikim, bo min dikare bibe avantajek. Rasterast çûm Erqenîyê û min dest bi mamostetîyê kir. Ez li wir fêr bûm ku mamostê lîsa Erqanîyê Yusuf Yildirim di girtîgeha leşkerî ya Dîyarbakirê de girtî ye.

Di girtîgehê de roja hevdîtinê Duşemî bû. Piçekê ku min xwe cîh kir, çûm Dîyarbakirê dîtina girtîyan.

Min mamoste Yusuf jî dît, ew ji Dêrsimê bû.

Wî çend navên xwendevanên ku li wî bêbextî kiribûn, dan min.

Xasima du bira Doxan û Muzaffer Karakûş, ew xwendevanên min bûn, ez bi wan ra peyivîm, wan îfadên xwe şunda girtin, Yusuf hate berdan.

* * *

Sala 1972 an heta 15 ê meha yekê li Erqenîyê xebitîm.

Min agahî girt ku dewa Dev-Genç ê ya ku li Enqerê di dadgeha leşkerî ya Mamaxê de dom dikir di meha Sibatê de dest pê dike. Bona ku bikarim dawê bişopînim, min 15 ê meha yekê, ji doxtor rapar girt çûm Enqerê. Piştî wê jî betlane Sibatê dihat. Wê demê navbera 1 û 15 sibatê dibistan girtî bûn.

Heval û der dorên nas ve me hevûdû dît, li ser rewşa dawa me min hin agahî girtin. Betlane qedîya xwendevanan dest bi dibîstanê kir lê ez hîn li Enqerê me. Ez dizanim ku di dewa Gazîyê de wê navê min derbaz be.

Rojekê ku li mala Dr.F. mîvan bûm û e me bi hev re nûçe guhdarî dikir. TV ê de, navê kesên ku lê dihat gerandin hat xwendin, di nava wan de navê min jî hebû, ango li min dihat gerandin. Polês li kîderê min bibîne wê min bigire.

Dr.F. bi rutba bînbaşi wek doxtor kardikir. Merivekî welatparêz, dilsoz û wêrek bû. Bi vê agahîya TV ê ew pir xemgîn bû. Wî nexwest ez ji mala wî herim derik din, lê bo ku ew di rubalî min da, zerarê nebîne min mal terikand. Li sûkê rastî hemwelatîyê xwe komsêr Zekî... hatim. Haya wî ji bûyerê çê bibû. Ez girtim jîpa xwe û birim li mala xwe danîm û derket çû karê xwe. Zekî vê demê li Seraya Emnîyetê dixebitî, azeb bû û di malê de tenê serê xwe bû.

Min bi alîkarîya hevalên nas du caran 20 roj, 20 roj li Enqerê ser hev 40 roj ji Dr.an rapor girt û li Enqerê mam.

Difikirim ku çi bikim?

Di bin lîdertîya Sînan Cemgîl[28] de grubek şoreşger li çîyayê Meletyê diman. Hin hevalên ji Dev-Gençê xwastin ez herim wir, ba wan, lê min qebul nekir.

Hemwelatîyê min Av. Sureya Qehreman xwest min bibe qereqolê, lê çûyîn û teslîm bûyîn jî li min nedihat. Min biryar da ku herim û li ser kar bême girtin wê baştir be. Piçekê bi nasnama xwe ya mamostetîyê lîstim û Kazim Budak kir Kasim Bardak.

Dema ku min nasname çêkirîbû, hesavê vê guhartinê kiribû. Du tîpên z û u ya Kazîm Budak bi pênusa zrêç, qelemzrêçê nivîsî. Nasname mûhir kir şunda cîhê ku pênûsa zrêç nivîsî bû paqişkir tîpa z kir s, tîpa u kir a û r jî lê zêdekir û nav bû Kasim Bardak.

30 Adara 1972 an de li otobusê sîyar bûm, ji Enqerê terim Dîyarbekirê. Li cem min hemwelatîyê min Mamoste Mehmet Alî Dogan rûniştîye. Ez naxwazim ew min nas bike. Ji min pirsî:

-Ma tu ne Kazim Budak î?

-Na, na! Navê min Kasim e, tu min dişibînî kesekî din, bisekin ez dixwazim razîm.

Û min xwe da xewê.

Halbû ku salikê berê ew tevî bavê Husên, Cewahîr, Dizgûn hatîbû Enqerê, li himber zanîngeha Sîyasalê di qehwa Betlisîyan de me hevûdû dî bû.

Dizgûn dixwest lawê xwe Hûsên bibîn e, lê Hûsên hefteke berî wan çû bû Stenbol ê. Berî ku ew here êvarekê em bihev re li restoranekê rûniştin me xwarin xwar û sohbet kir.

Min ji wan ra got, Husên ne li wir e, lê wan bawer nedikir, digotin ew li vir e, naxwaze wan bibîne.

Bavê Husên xwe gelek acz kir û ew rabûn çûn.

Ji ser ra pir wext derbaz nebû, Husên Cewahîr hatîbû kuştin.

Bona ku li min tê gerandin naxwazim bêm nas kirin, me têkilî birî, lê guhê min li ser polês e, kîngê erebe disekine stresek min digire.

Gelek qadroyên şoreşger, ji THKP-C Mahîr Çayan, Ulaş Bardakçı,Zîya_Yilmaz û ji THKO jî Cihan Alptekin ve Ömer Ayna, 29 Kasım 1971 de tunel kolan û ji girtîgehê revîyan û heta nuha nehatine girtin. Bona wê di rîyan de pir qontrol û sekirin heye.

Li çend cîyan polîs erebe da sekinandin nasname qontrol kirin. Li cîheke polîs mîzgînî (!) da rêvîyan ku anarşîstê Tokat- Nîksar- Kizilderê hatine kuştin. Mahîr

---

[28] Sînan Cemgîl, di nava bûyerên gerîllayên bajar, qadroyên THKO da cîh girt. Piştî muxtira 12 adarê sala 1971 da tevî hin hevalên xwe li Çîyayê Nûrheqê qampek gerila avakir. Bo êrişi ser baregeha radarê ya li Kurecikê bikin xwe amade dikirin, bi ser êxbariya mixtarê gundê Îneklî yê di roja 31 Gulan 1972 an da ji teref leşkeran ve hate kuştin.

Çayan tevî hin hevalên xwe, kadroyên THKP-C û THKO yê serhev 9 kes hatîbûn kuştin. Tenê serokê DEV-GENÇê Ertugrul Kûrkçî di wê bûyerê de sax xilas bibû. Du teknîsyenên Înglîz û yek jî Qanadî jî hatîbun kuştin. Min tirs û xofa xwe bîrakir, heya Xarpitê bi vê bûyerê ra mijul bûm. Li qeraja Xarpitê rastî hevalekî ji zanîngeha Gazîyê hatim.

Bi dengekî bilind got; "Kazim Televîzyonê de, navê te, tê anonskirin, li te digerin, tu çûy Enqerê an na?" çavuşê li ber sobê rûniştî û nîv di xew de çavê xwe vekir li me mêze kir.

Min di cîda bersiv da û got *"navê me şibandine hev, ez ji vir têm ji bona min tişt tune."* Çend deqqe şûnde min mamoste derxist derva jêrê got ku ev çima ha şaşitîyan dike. Xort gelek berxwe ket û lêborîna xwe xwast.

Min dixwast gavekî zû xwe bavêjim Erqenîyê. Ez dixwazim min ji ser kar bibin. Min bilêtek din girt û ji Xarpitê çûm Erqenîyê. Baran û berf telvîhev dibare. Ev ji bo min avantajek bû, bê ku rastî nasekî bêm, heya dibistanê dikarîm herim. Lê wexta ku nêzikî dibistanê bûm, xwendevanan dîtin, ku ez têm pençire vekirin bi sloxan û tilîlîyan qîrin kirin.

Şoreşgerî nû bû, mîna ku agirê ku dikeve nav gîya û palaxa işk û alawên mezin dadide, şoreşgerîyê jî di nava xortan de mîna alav gelek xurt bû. Raste rast derbazî oda midûr bûm. Yekcar korîdor û oda midûr bi mamoste û xwendevanan ve hate dagirtin. Xwendavanan sinif terk kirîbûn bi çepik û zilxitan ve piştgirîya min dikirin.

Nîv saet derbaz ne bû, komsêrek û du polîsên bi tomson hatin dibistanê.

Komsêr got:

-*"Fermo Kazim Beg em terin qereqol"*

Min got:

-Çima xêre?

Komsêr bi biryar got; tu dizanî, fermo.

Lê midûr û hevalên mamoste hemû tevî min hatine qereqola polîs, ji wîr jî em çûn ba qeymeqam. Xasima midûrê lîsê Yaşar Çaxlayan[29] alîkarîyek baş kir. Gotina

---

[29]Yaşar Çaglayan ji Qersê bû, Midûr ê Lîsa Erganî yê bû. Salekê em bi hev ra xebitîn. Dema ku ez ji mamostetîyê hatime durxistin dora çar pênc mehan li Enqerê mam.

Li çarşîya Zaferê rastî Yaşar û mamoste Tûran hatim. Em rûniştin me li hev pirsî, çay vexwar û sohbet kir.

Demikê Yaşar go " Alî Macar girêdayî min bû."Alî Macar li Erganîyê polêsekî sîvîl, vêşartî bû, ango ji MÎT ê bû.

Di komcivîna TOB-DER ê da wexta ku Dev-Yol ê Yaşar wek hevalekî xwe pêşniyarî komîta karker kirin, hevalên TSÎP ê şika xwe ya li ser Yaşar anî ziman. Min jî ev anekdota behskir. Nunerê Dev/Yol ê mamoste Îbrahîm Sevîmlî soz da ku pirsê bikule.

Pir wext derbaz nebû Yaşar wek mamoste hate Egitima Dîyarbekirê. Rojekê ji min pirsî ku tiştê ku wî li çarşîya Zaferê gotîbû tê bîra min an na, lê min bi zanetî ew gotina wî nanîbû bîra xwe!

xwe ji dihate guhdarîkirin, lê ew wê hêzê ji kîderê digire, wexta min tune ser bifikirim. Têkilîyên wî bala min kişand. Mînak;qeymeqam telefon qomitanê orîfî îdara Dîyarbekir kir û got,"*Me anarşîstek girtîye em ji we re bişînin, an jî bişînin kîderê?*" Ez li dij derketim, rabûm ser pîyan min got "we ez negirtim e, we ez ji ser kar anîme."

Midûr Yaşar Çaglayan jî îtiraz kir, heva nerm kir û qeymeqam nivîs li gorî daxwazîya me guharî.Wekî me dixwest "*li ser karê xwe hatîye girtin*".

Qeymeqam, destpêkir û da me nesîhatan "eger ku em herin Îzmîrê li Kordonê, qehva Atif rûnin kes nizane ku tu Kurdî? Ji Tirkbûna min şik dikin, ji ya te şik nakin?"

Berî çend rojan di Rojnamaya Yenî Ortamê de di bi sernivîsa, "*Mamostekî Xwendewanê Xwe Gilî kir*" agahîyek hatîbû weşandin. Di vê de dihate gotin ku "mamostekî ji Gazîyê bi navê Alî Haydar Dîrîoz di sikiyonetima Enqerê de li ser xwendevanê xwe Kazim Budak îfade daye. "Kazim di dersê de gotîye ez Kurdim û di Tirkîyê de Kurd hene."

Qeymeqam ew nivîs qest dikir. Min got ez ji Kurdbûna xwe ne bêzarim. Hakemtîya tu kesî jî ne lazime. Di nava me de bê dengîyek bû. Lê midûr dîsa tansîyon daxist, usa xuya dikir ku midûr ji ser qeymeqam re[30] bû. Min piçekê jî ji midûr pişt digirt. Saet 8-9 ê şevê bû. Dixwestin ku min bi rîya Dîyarbekirê ve bibin Enqerê. Lê di wê saetê de erebe tune bû. Gotin ku heya Entavê ez taksî kirê bikim, lê min got na, madem hun min dişînin, hun kirê bikin. Hevalên mamoste di nava xwe de xwestin pere topkin heqê taksî yê bidin. Min got hevalino, perê min heye, lê ez çend saetan berê ji Enqerê hatim, madem min tevî polês dişînin lazime, bilêta me jî ew bigirin. Lê dîsa ji bi alîkarîya wan kirin ser û takisîyek kirê kirin, pîyê min di pîyê polîs Mehmedê Kastamonî de em ketine rîya Enqerê. Me Dîyarbekir li paş xwe hişt, Sîverk di xew dabû.

Bona ku dora sê mehan bû, ez li Enqerê bûm, ser navnîşana dibistanê gelek name ji min re hatîbun, lê min wext nedî, wan bixwînim, min ew girtîbûn ba xwe. Min dixwast wan bixwînim, lê jî polês şik dikir. Nebe polês ji naman, edrêsa wan bigire. Lê demekê şûnda min ev derxistin xwendin. Li Ruha–Alîgorê wexta ku polês kelepça destê min vekir min, hemû name çirandin û avit ber bayê.

Dora roja din êvarê ra em çûn Mamaxê garnîzona leşkerî. Polês Mehmet ez teslîmî wan kirim û ew çû.

Min şev di bodroma kur de li ser sandalyêkê sibe kir.

---

[30] Qeymeqam Cengîz Kentlî ji Îzmêrê bû û faşîst bû. Dihate lisê, ders dida. Bona ku piranîya mamostan demoqrat û pêşverû bûn bi me ra dîyalox danenî, pir jî aciz dibû.

Di dûşa tavanê ra qulikek zirav û piçûk hebû ku ez bi derva girê didam. Sandelyê didim binê lingê xwe destê xwe dirêj dikim, dîsa jî nikarim xwe bigînim qûlikê. Leşkerê ku derva nobet digirt hin caran li ber qûlika piçûk radiwestîya potînê lingê wî wek kapax ew der ker dikir.

Ji hepsa Stenbolê fîrar kirîna, Mahîr Çayan û hevalên wî hatin bîra min. Herdu cîyan didim ber hev. Ma gelo di cîhekî usa de jî meriv dikare, bireve, îmkana wî tiştî heye? Diwarên qalind û bilind...

Piştî nîvro ez birim edlîya Yildirim Beyazitê. Prof. Mûmtaz Soysal jî di bin çavan dabû. Bona ku dozger îfadê wî bigire wê gavê ew anîbûn wir. Jina xwe Sevgî Soysal jî hatîbû dîtina wî, stuyê wî hembêz dikir û demikê berneda.

Leşker tifinga bi singû li ser serî me nobet digirt.

**Ez hatim azad kirin**

Dozger Bakî Tuğ û Alî Huner tevî gelek pirsan îfadê min girtin û ez hatim azad kirin. Bona ku ez ji ser kar hatîbûm anîn û edrêsa min aşkere bû, dozgeran ew yeka wek temînat dîtin.

Dozger Tuğ ji sîstemê gazin dikir:

-Çi welate em tê de dijîn, kesî ji kesî haya xwe tune. Bi mehane em li te digerin û tu jî çuyî li Erqenîyê mamostetîyê dikî. Me ji midûrê Gazîyê Mehmet Oztecîr pirsî, wî jî nivîsîye ku te hîn dibistan neqedandîye.

-Midûr begê xwestîye min bipareze.

Midûr M. Oztecîr, kesekî faşîst û merivekî bê qalîte bû. Bona ku gelek mamosten pêşverû hatîbûn sirgûn kirin û girtin ew kar nuha ji wî ra ma bû. Xwendevan û mamostên faşîst-paşverû ji berxwalî, tiştên nerast li ser xwendevanên pêşverû gelek derev gotîbûn. Wan li dibistanê çi çê bibû, kirine ser hin kesan.

Xwendevanên faşîst bo min jî tiştên ne rast gotîbûn, lê di nava wan de en pir jî bêbextîyek li min zor dihat; ew jî ew bû.

Şevek dereng, faşîstan li bexçê dibistanê serokê komela Gazîyê Rifat Ozturk revandin. Hemû xwendevan di xewê dabûn lê qîrina Rifat û dengê sîlehan em ji xewa kur şîyar kir. Bûyerê di nava xwendevanan de psîkolojîya şer, dijwarîyek pêda kir. Bi sedan kes rabûn ser pîyan bi sloxan û sonda tolgirtinê bang kirin. Rifat saetikê şûva xwe ji destê wan xilas kir revîya hat. Wî da zanîn ku kesên ku ew bi sîleh tehdît kirine û birine, xwendevanên dibîstana Gazîyê bûne. Hêrs û kîna xwendevanan zêtir bû. Sedan kesî di dest de ço û hesin bi marş û sloganan tevdigerin. Di vê navê de heft faşîstên sûcdar tevî midûr derketin hatin.

Qaşo ew ji derva dihatin haya xwe ji bûyerê tune bûn, midûr jî tevî wan hatîbû, wan bipareze. Girseyê gel sebir nekir û êrişî komandoyan- faşîstan kir. Midûr li himber hêrsa xwendevanan revîya çû. Heft kesan xwe avitin odekê, xwestin derî ser

xwe kilît kin lê nekarin. Gruba ku çend saetin bi hêrs û tolgirtinê ve hatine dagirtin, ketin hindurê odê û bi ço û hesinan êrîşi wan kirin.Em jî çûn derê odê. Her heft kes li erdê bûn, serî û çav di xwînê de lewitî bûn. Hin caran dixwastin rabin û bazdin lê nedikarîyan. Dixwastin bi diwaran ve helkişin, dîwar bi xwînê sor bibûn. Ji wan sê kes ji sinifa min bûn, Adnan Adiwar ku li erdê xwînê de gevzî bû, çawa ku ez di dêrî de dîtim, "Kazim ez .... te dixwim, me xilas ke. Tu Kurdî û merdî. "

Her çiqasî neheq bûn jî ji vê dîdara bi xwînî pir muteesîr bûm. Min dest dirêj wî kir, ew rakir, tevî hindek hevalên din me şer da sekinandin, birîndar rakirin şandin pansumanê.

Dora roja din her heft komando jî li serê wan mîna kuleyê Mewlana Celaleddînî Rûmî bi cavên sipî pêçayî hatin sinifan. Te digot wan ji xwe ra qalpaxên xisûsî dabûn çêkirin. Navê wan bû Alpago Adnan, Alpago ...,

Ew Alpago Adnanê ku digot *"tu kurdî û merdî,"* ji min ra namerdî kirîbû. Di îfada xwe ya ba dozger a leşkerî de gotîbû Kazim jî li min xistîye. Tiştê ku li min zor dihat ew derew bû. Dozgeran piştî îfada min ez azad kirim, lê xwastin, ez di dadgehan de hazir bim.

Dawî ji min pirsîn, ez ji vir çûm ji xwendevanên xwe ra çi bijêm?

*"Ez bêjim ku dadgehên ku ser navê maf û edaletê têne kirin ser gotina du şahadên derewîn biryar didin, mirovên bê guneh bi salan di girtîgehan de digirin. Maf edalet bi vî hawî tê qetil kirin."*

Bakî Tûğ bi hêrs got *"lê hûn şoreşger şahad nîşan nadin, tenê îddîa dikin, hiquq bi şahadan dimeşe."*

Berî ku ez ji odê derkevim dozger Alî Huner got *"îro li Gazîyê, dibîstana te ya kevnda şer derketîye, gelek kes hatîn girtin, tu nerî dibîstanê wê baş be."*

Ji ber şerê ku li Gazîyê di nava faşîst û şoreşgeran de derketîbû, ji cepgiran dora 60-70 kes hatîbû girtin. Hin heval jî lê dihate gerandin.[31] Piştî 12 Adarê li dibîstana Gazî yê faşîstan dîsa ceht dikir ku mewzî dest xwa xinin.

Dora roja din çûm Gazî Egîtimê, dîtina dost û hevalên kevn. Min heval dîn û tevî wan li qantînê rûniştîm. Ser ra pir wext derbaz nebû di pencirê de me dî ku du leşkerên bi tomson, serleşkerek û midûrê Gazî yê Mehmet Oztecîr ji cîpê peya bûn û ber bi qantînê tên. Me zanî ew ji bo min tên, ez derê din ve derketim derva.

Lê Albay- serleşker bi bez du min hat û bi navê min bang kir ku ez bisekinim.

Vegerîyam, ez û midûr hatine rû hev, min li çavê wî mêze kir.

-Sîxur, tu dîsa dereng ketî.

---

[31] Faîk Bulut jî lê dihate gerandin, ji ber wê ew çû derbazî Sûrî bû, li qampa Filistînîyan da bi êrîşek Îsrailî da dîl hate girtin. Navbera salên 1973 - 80 di hepsa israîl da hepıs razîya.

Albay xwest ez tevî wan herim.

Min ji wan ra da zanîn ku ez çûme dozgerî ya leşkerî min îfade xwe daye. Lê albay qane nebû, em li jîpê sîyar bûn çûn Baxçelîevlerê garnîzona leşkerî. Dûrve generalekî qelev, bi çend serleşkerên di amadebûnê de dipeyîvîya. Albay çû silav lê kir, pirsa min jê ra qal kir.

Şîşman berê xwe jî neguharî, got telefonî dozger bike.

Albay telefon kir dozger Alî Huner ji wan ra da zanîn ku îfada min girtine, li min nayê gerandin, wan ez azad kirim.

Lê albayekî tirtire fêm nekir, ew ser gotina min ji dozger ra telefon bike, bipirse ka ez rast dibêjim an na...

Dewa Dev-Gençê destpêkir. Ez jî çûm dadgehê. Li ser îfada Alî Heyder Dîrîoz ji min pirsîn.

Min minaqeşa ku di sinifê de, navbera me de derbaz bibû anî ziman: "*Alî Heyder îdîa dike ku li Turkîyê Kurd tune, kî ji xwe re dibêje Kurd, bila herin ba Barzanî, min jî got bi mîlyonan Kurd heye û ez jî Kurd im. Welatê me jî va der e.*"

Serokê mehkemê Alî Elverdî midaxele kir gotina min birî. Hinekan ji gruba Dev-genç ê kire qîr, gotin "*bipeyve Kazim bipeyve.*" Lê bona ku gotina Kurd derbaz dibû, serokê dadgehê nehîşt ez li ser wê mijarê zêde bipeyivim.

Piştî çend danişînan ez weraste hatim girtin. Ango ne lazim bû ku ez di danişînan de amade bim.

Lê bona ku navê min di TV de di nav lîsta kesên lê dihatin gerandin de hatibû anons kirin, polêsê Erqenî û Dîyarbekir êdî rehetîyê neda min. Dixwazin bi provakasyonekê min bigirin hindur.

Payîza 1972 an de ez surgun dibistana Dîyarbekirê ya Baxlerê (nuha navê wê lisa Ataturk e) bûm.

Kesî nas nakim, çend rojan li otêla Beran mam. Min li taxa Baxlarê malek kirê kir û derbazî malê bûm. Birayên xwe û dîya xwe anîn cem xwe, birayên xwe li dibistanan qeyd kir. Turgut tere Lîsa Dîyarbekirê, Dîyar û Fîkrî terine dibîstana navîn a Ataturkê, dibistana ku ez lê dixebitim. Zinar jî tere Dibistana Hunerê ya Lawan, (Erkek Sanat Okulu).

* * *

Li Dîyarbekir TOB-DER hîn natîye damezrandin, cîhên mamostan bi navê komela mamostan tê nasîn. Hin rojan rîya xwe bi komelê dixinim.

Em çar heval li dora soba komirê rûniştine li ser hin babetan sohbet dikin. Wê demê nûçên li ser tevgera Kurdistan a Başûr aktûel bû. Mamoste gelekê bi tedvîr in, naxwazin navê tevgerê jî bibên. Ez ji atmosfera Gazî Egîtimê hatime, hin tiştan

rehet dipeyîvim. Lê hîn gotina tevgera Barzanî, ji devê min derketî bû hersê heval jî rabûn çûn û ez tenê hiştim.

Lê têkoşîn pêşket, tevgerên Kurdî di nava gel de şax berda, xort û mamoste kişandin nav refê xwe, ji wan sê kesan, du kes hatin li cem me cîh girtin. Kesên usa him li himber hêzên din bi rîya tevgerê xwe diparastin, "em ne bêteref in," alî din jî destê xwe nedidan tiştekî. Ozgurluk Yolu bona gelekan cîhê starbûnê bû. Wê demê tevgerên dervayî Ozgurluk Yolu gotinên radîqal digotin. KÎP ê sloxana "*Kurdara Azadî,*" dianî ziman, gelek kesî nedixwest wê sloxanê bibê.

**Li Dîyarbekirê binçavkirina min**

Sala 1973 ê hîn bayê 12 Adarê hişk e, hêzên şoreşger, demoqrat, sazîyên sivîl hîn jî nikarin xwe li himber tesîrê leşker û polês ragirin. Li Dîyarbekirê, hemû zanîngeh,Enstîtû ya Perwerdê, wargeha xwendewanan, dibîstana Mamaostan, lîse û gelek cîhên din di binê qontrola faşîstan dabû. Di çarşîyê de jî te di stuyê gelek xortanda rozetên dêlgurê, yên mezin mîna nalê hespê daliqandî didît.

Li dibistana xwe ji dersê derketim ber bi oda mamosteyan diçûm min dî çend xwendevanên Perwerda Enstîtûyê, rozetên partîya faşîstan, rozeta dêlegûrê li pêsîra xwe xistine di nava xwendewanan de dixwazin propagande bikin. Ez li dijî vê yeka rawestîm û min rozetê yekî ji pêsîra wî derxist avite çopê, şer derket. Ew bûyer hatîbû plankirin, prowakasyon bû û bi destê îdara dibistanê û polis bi hev re hatîbû pêk anîn. Hedefê de jî ez hebûm.

Him di dewa Dev-gencê ya Enqerê de navê min derbaz dibû, him jî ez ji Erqênîyê bi ceza sirgûnê hatîbûm Dîyarbekirê. Ji ber wê çavê polês li ser min bû. Polîs berê brayê min, xwendevanê dibîstana navîn Yavuz-Dîyar û sê xwendewanên din girt bin çavan. Xebera min ji girtina Dîyar tune. Dû re ez pê hesîyam ku ew girtine û polîs hatiye ji malê li min jî pirsîye. Qehwaxana ku ez hin caran diçûm, wê rojê hin nasên ku li wir bûn, berê xwe guharîn hema bêje bi bazdan ji min durketin. Xwendewanekî lîsê bi dehan salan şunda li Qamişloyê bi fedî qala wê bûyerê dikir û ji min liborîn dixwest.

Polîs bona ku bikare min jî bigire, şeva pêşin di qereqolan de li ser navê xwendewanên girtî, li gora xwe hin îfadan amade dike û bi işkenceyan bi wan dide qebul kirin. Ango polês hin tiştan dibêje ew jî erê dibêjin. Ji ber ku tiştê ku xort bêjin li ortê tune ye.

Wê şevê ez peyatî ji Baxlerê çûm Derê Çîyê qluba bazirganan-ticaran. Qazîyek nas hebû, min mesele jê re behs kir. Min xwest ku ew alîkarî bike xwendewan bêne berdan.Tirsa min ew bû ku polês li xortan êşkence bike. Li gorî salê xwe ew yê hepis û êşkence nebûn. Birayê min wê demê hîn13 salî bû. Lê qazî li ser masa ximarê xwe nelivand, girtina xortan ji xwe ra nekir kar û got "*polês êşkence nake.*" Ji

gotina qazî ez aciz bûm. Hemû kesî dizanî ku li hemû qereqolê polîs û girtîgehên leşkerî de êşkence heye. Qazî jî ev yeka rind dizanî û wî xwe dixapand. Li ser gotina wî ez bê hêvî rabûm dîsa peyatî çûm mal, mala min li taxa Baxlarê bû. Wê wextê li Dîyarbekir erebe, an jî taksi pir kêm bûn, peyatî saet yekê şevê min xwe gîhad mal.

Dora roja din saet 06 sibê de polêsan li derê me xistin. *"Polês, Kazim Beg, derî veke, lazime tu tevî me heya qereqolê bê".*

Min derî vekir, du şefên ku li ber derî ne rind dinasim. Yek Husên Avci ji Kestemonîyê, lawê xwe di dibistana me de xwendewan e. Wexta ku ez li Erqenîyê bûm çend caran hatibû wir jî. Rojekê bêwext tevî midûrê lîseyê fotografê diwarê sinifê digirt ez rastê hatibûm, li wir jî pêy provakasîyonan bû. Yê din jî Hesenê Pincar e. Bona ku suret sor û pançilî ye ji wî re usa digotin. Ew ji hêla Behrareş e. Heya êvarê li qehwexane û qiluban digere zikê xwe diçêrîne, rûşwet digire, îskambîl dilîze. Herdu jî têrxûr, qelev ji 100 kiloyî zêtir in. Piştî ku derî de bi wan ra mixatab bûm vegerîyam hindur.

Dîya min ji êvar de, ji girtina Dîyar vir de ketibû telaşekê, di lerzand. Ew ji gund nû hatîbû, li himber vê bûyerê şaş û mat mayî mabû. Min ew hembêz kir û jêre got:*"Dayê, tu nebî mereqan bikî, berxwe bide çend roj şûnde em li mal in."* Lê wê dîsa bawerî bi vê gotinê nanî.

Fanîleyê ser birayê xwe min girt ji malê xatir xwest û derketim. Min hesav dikir, ku fanîle girtîgehê de min him germ bigire him jî di eşkencê de min biparêze. Fanîla qalind di êşkencê de zêde alikarîya xwe nebû, lê di girtîgehê de ez germ girtim.

Erebe polês li ber derî sekinî bû, em lê sîyar bûn. Xwendevanekî min jî li paş bû. Erebê hereket kir, Hesenê Pincar destpêkir li min da xef û xofan.

-Ez ê neynûgê te bikişînim ulan, ez ê te ha bikim, ez ê te çawa bikim...

Min got: Ma xêre? Te li jorê got Kazim Beg û nuha jî tu qala neynûgkişandinê dikî, çi ji destê te tê şunde me de.

Xundewanê ku di erebê de bû, ji bona min bibû piştgirîyek. Min nedixwest, li ba wî li himber polêsan bê deng bim. Lazim bû ku pişt bûyerê jî meriv bikare serbilind be.

* * *

Şeva pêşin min di qereqola Fatîhê de derbaz kir. Brayê min Dîyar û du xwendewanên din jî li qereqolê din bûn. Dora roja din polêsan ew jî girtin û em bi hev ra birin mehkema leşkerî. Suretê Dîyar perç û sor û mor bibû. Ji halê wî xûya dikir ku ew di qereqol da, du şevan gelek hatîbû êşandin. Min jê pirsîya wî eşkence dîye? Lê polêsan nehiştin, ew bersiva min bide.

Dozgerê Ereb Yuzbaşi Oktay Yûksel tevî şefê polês, Husên Avci dixebitîya. Berî me, Husên ket daîra dozger, piştî ku ew derket, dozger em girtin hindur, tişt ji me ne pirsî, daxwaza girtina me kir.

Em raste rast birin cîhê êşkencê. Li ser rîya Seyrantepê di nava leşkerîyê-kolordîyê de, di bînayek leşkerî de çavê me girêdan û em yekû yek kirin hucran. Hucre, koxuşek leşkerî bi brîketan hatîbûn beş kirin û ser jî bi sac hatîbû girtin. Du qor bûn, derên wan li himber hev bûn. Hucre şil, diwarên wê tim û tim hît bûn. Dirêjîya hucrê qasî 2 metro, firehîya xwe 1,5 metro û bilindîya xwe jî 2 metro kêmtir bû.

Di hucran de em yek û yek diman, lê min hîskir ku Dîyarê bira di hucra xwe de ne tenê ye. Min bi kurdî bang kir, got:

- Kesê hucra te dikare polês be vê re nepeyve.

Çavuşê Erzorimî ji vê aciz bû derî hucra min vekir û bi qasatura xwe li destê min xist. Destê min tevizîn, lê tu nikarî ku tiştekî bikî.

Piştre ez fêrbûm ku ya ba Dîyar melleyekî welatperwer, Dewrêşê Sîweregî bû. Ew ji herdu çavan kor bû. Kesên din 3-4 heftan de ji hucrê derdixistin, dibirin. Lê ew 90 roj bû ku hîn dernexistîbûn himberî dadgehê. Li wir rekor di destê Dewrêş dabû. Dewrêş hin caran lêdan digirt çav xwe û bi Kurdî qasîde jî dixwand. Bi mehan şûnda min rîya xwe bi Sweregê xist Dewrêş di dikkana dûrinker de dît. Min hîn navê xwe ne gotîbû wî ji dengê min ez naskirim.

Êvara roja ku em kirin hucrê, li ber derê hucra min bi dengekî nizm çawuş tiştê li ser girtî teslîm digirt. Kemerek, qirawetek, saetek, qelemek û nasnama mamosteyîyê. Ez dengê kesî girtî nagirim, lê wexta ku çawuş gotina "*Qastamonî, mamoste*" dubare kir û min bîhîst, ez qane bûm ku sedî sed ew birayê min Mistefa ye. Ji ber ku ew ji Çoligê hatîbû sirgûn kirin, nuha li Qestemonîyê mamoste bû.

Pozxînî û tirsa min zêde bû.

Gavekê şûnda çawuş derê hucra min vekir û bi şikilekî dizî ji min pirsî;

-Tu Kenan Qesar[32] dinasî?

- Na!

Çawuş derê hucra min girt. Ez êdî bawer bûm ku ew ne Mistefa, Kenan Qesar e, anîne.

Derê hucra cem min vekir, berî ku girtî bike hindur, jê pirsî;

-Tu Kazim Budak nas dikî? Bersiv na bû. Gardîyan girtî tan da kir hindur û derê hucrê hişk, li ser da cî. Çinginîya dengê derî deng veda.

Êdî qasî ku diwarê nava me dest dida me qontax danî.

Kenan li Qastamonîyê mamoste bû.

Bîst rojan şûnda em birin koxuşan çend rojan em bi hev ra man lê Kenan wê carê zû hat berdan.

---

[32] Min Kenan ji Enqerê nas dikir, li Dibistana Mamostan a Bilind da dima û fakulta Fenê da xwendevan bû hevalekî pêşverû, bi biryar û xwedî tecrube bû.

Hucran ne roj ne jî şev qet ronî nedigirt. Tenê di dêrî de qulek hebû ji derva dihate vekirin. Wexta ku xwarin didan qulik vedikirin û digirtin. Xwarina wan jî şorbe û kerîk nanê hişk bû.

Rojê du caran îzîn didan ku meriv here tualetê. Vê jî saete xwe hebû.

Wexta ku tu diçûyî tualetê jî lazim bû bi parkek leşkerî serê xwe bigirî û tenê pêşîya xwe bibînî.

Hin caran li hev nedihat em mecbûr diman ku di hucra xwe de mîza xwe bikin. Ji bona wê him pir bîn dihat him jî rutubet çêdikir.

Hewayê hucrê giran bû, ji ber bîna mîzê û rutubetê merivan dixwest 24 saetan razê. Lê xardîyanan ne roj ne jî şev rehetî nedidan girtîyan ku ew razên. Roj razan an jî li ser nivînan rûniştin qedexe bû, şev jî kîngê bixwestana bi darekî li saca hucrê dixistin nedihiştin em razên.

Heftekê berî girtina min, sibê de zû Mehmet Çetin mamosteyê lîsa Erganîyê hatîbû mala me. Simêl û porê wî dabûn sifirê û reng lê nema bû. Ew ji girtîgehî derketîbû. Îtiraf kir, ku polês di derheqê min de ji wî hin tişt pirsîne û wî jî ji ber êşkencan deyax nekirîye û li ser min hin gotinên polês erê kirîye. Gotî bû bi navê Köylü- Gundî, Maoîyê ku hate ba min bi Kazim ra jî pêwendîyên xwe hebûn.

Gundî min bi rîya Mehmet Gultekin naskir. Mehmet Gultekin ji Dêrsimê bû, min ji Enqerê nasdikir. Tewî Zîya Ulusoy li Ortadoguyê xwendevan bûn. Ji ber boykota Ortadoxuyê herdu hatin Gazîyê û çend rojan bûne mîvanê me. Herdu xortan jî bi sîyasetê ra têkilîyên xwe tune bûn. Bi paltoyê maksî, bi por û cênigên dirêj dişibîyan zarokên burjuwa.

Lê rojek Biharê Mehmedê ku min li pêşberî xwe dît kesekî din bû.

Li Erqenîyê li ber derê qehwa parqê rûniştî bûm. Nişkeva merivekî bejnziraf li pêşîya min pêydabû. Di nava şalwarê navrandirêj û kasketê çarkoşe da min Mehmet naskir.

Ew ji gruba Perînçek bû li Erqenîyê xwe vêdişart. Mehmet carekê jî tevî hevalê xwe Gundî hate, mal ba min.

Wê demê pirsa Bengaldeşê aktuel bû. Gelê bengaldeşê ji bo azadîya xwe di bin lîdertîya Muciburrahman de li himber Pakîstanê şer dikir. Lê dîtinên hevalê ba Mehmet, Gundî xerîb bûn.

Gorî wî Muciburrahman ne şoreşger bû lazim bû şoreşger li himber tevgera wî bin. Divî ya bu piştgirîya Tevgera Çarmuzum bihatana kirin û hin tiştên din.

Ji wir em hatin ser pirsa Kurdistanê, min jê pirsî, sibê ku hereketa Kurd dest pê bike, bi mana pêşengîyê ew li himber wê jî bisekinin? Lê min ji rewş û halê wî şik kir. Gava ku ew çû mitbaxê avê vexwe, min ji Mehmet ra da zanîn ku ez ji hevalê wî ketime şikê, ew dikare polês be, carek din jî wî tevî xwe neyne ba min.

Li gora parêzer Şerafetin Kaya û Gulfer Guçlî li dadgeha Enqerê di derheqê wî merivî de hin belge bi dest xistîbûn ku Gundî ajan bûye û wî li ser min jî îfade daye.

Mehmet Çetînê ku di êşkencê de gotîbû *"bi Kazim ra jî têkilî danîye"* ew Gundî bû.

Bê navber 15 rojan em hatin êşkencekirin.

Dest û pê min girêdayî ez kirim feleqê, du kesan jî lingê min bi darê va girêdayî bilind kirin, du kesî jî wek kutana dan û bilgur bi dor li binê lingê min xistin.

Yêk hilkişî ser singê min, ez pîn kirim, hin caran pê li lêv û pozê min kir. Wê demê çeşît û şiklê êşkencê ewqas ne pêşketî bû.

Çavê min girêdayî li ser sandalyê rûniştî bi min re dipeyîvin, nişkave darekê bi gilm li pişta min xistin ez ketim erdê ji xwe çûm. Wan bê şerefan çav, dest û pê me girêdayî bi rojan li me zulm kirin. Salan şûnda li Stockholmê ji ber piştêşê, çûm doxtor, wî da zanîn ku min derbe xwarîye.

Lê piştî 12 îlonê 1980 e êşkence û zilma ku li zîndana Dîyarbekir li hêsîrên Kurd hat kirin, meriv fedî dike qala êşkencê wê demê bike.

Lê ji êşkencan bêtir heqeret û gotinên xrab ez qehr dikirim. Di êşkencê de hin pirsên ku ji min dipirsîyan min dizanî çavkanîya wan Midurê dibistanê Mistefa Firengîzê ajan e. Lê min soz da ku ez ji hepsê derketim, vî hesavî ji wî merivî bipirsim.

Demikê dengê jina ku digîra, bi min dane gûhdarîkirin, gotin "gudarî bike, me dîya te jî anî ye."

Rastî jî min bawer kir û ez pir tirsîyam, lê dûra ku min guhdarîkir, *"min got dîya min nagîre, eger bigîre jî ne bi Tirkî bi Kurdî digîre."* Hêrsa wan zêde bûn...

Hatina min ê Dîyarbekirê vir de, bi ataxîya polês bi pêşengîya Recoyê Zaza grubek faşîst li pê min bû. Çendî çend caran êrîş kirin, me şer kir. Reco ji Bîngol bû. Ew jî havalên xwe jî Kurd bûn. Lê bi hin rûşvetan di partîya faşîstan a Tirkeşîyan de dixebitîyan, neyartîya gelê xwe dikirin. Ji ber êrîşên wan a ser pêşverûyan, polês jî esrar û çek karanîna wan ra çavê xwe digirt.

Birayên min jî di dibistanên xwe de ne rehetin. Bi ataxîya mamaoste û xwendevanên faşîst di nava xwendevanan de li himberî wan dijatîyek hatîye çêkirin. Xasima bi propaxanda mezhebî û qomunîstîyê wan tecrît dikin hedef nîşan didin. Bi kêran rîyên wan dibirin bi wan ra şer dikin.

Çend roj berê ji girtîgehê derketim, bona dîtina hevalekî çûm qehwa ku hin caran me rîya xwe pê dixist û lê rûdiniştin. Qehwexane li bajar nêzî sînema Dîlanê bû. Di diwarê qehwê de suretên dêlêguran û afişên faşîstan hatîbûn daliqandin. Nişke va min xwe di nava gruba faşîstan de dît. Wexta ku ez di girtîgehê dabû me, faşîstan ew qehwexane ji xwe ra kirine Komele haya min jê tune.

Dema ku min xwest ez derkevim derva, Reco û hevalên xwe êrîşi min kirin. Mamoste Guneri Erol û esnafê dorê ez ji nava wan derxistim.

Wê demê li Dîyabekirê hêzên pêşverû, welatparêz kêm bûn, yên heyî jî bê organîze bûn û bona baweriyên xwe ji şer ra ne amade bûn.

Wexta ku faşîstan digotin "lawê hecî Ehmed, Mehmed, Abidîn em te nas dikin, problemên me ne bi te re, tu xwe meke nav!" hevalên ba min di cîhê xwe de rudiniştin. Dema ku "kizilbaşî" û "qominîstî"ya min jî dianîn ziman hêza xwe jî zêde dikirin. Dîsa rojekê biharê ez tevî brayên xwe û xwendevanê Fakulta Bijijşkê Îlhan aslan li ber sûr rûniştîbûn me çay vedixwar. Recoyê faşîst tevî grubek hevalê xwe êriş anîn ser me lê dîn ku em zora wan dibin, li dijî qomunîstî û qizilbaşîya me bang kir û kî ji qehwê derdiket berê xwe da me û hatin. Di nava wan de xortekî bejn dirêj bi bez hat xwe gîhand me, wî Îlhan nasdikir, got "nuha vana we lînç bikin, bazdin"û em bi kuçan ra revandin birin Melîk Ahmedê.

Ew kesa Saît Aydoxmuş, Saîdê Zaza bû. Yekê welatparêz û pêşverûkî wê demê bû. Min cara pêşin ew li wir naskir, dûra em bûn heval û dost, me hev ra mal kirê kir. Saît têkoşîna xwe di nava Demoqratên şoreşger de domand.

Di pêvajoyê de gelê me jî hişyar bû, dost û dijminê xwe naskir.

Me jî hevalên rasteqinî, hevalên welatparêz dîtin û bi hev ra li himber êrîşên faşîstan rawestîyan. Şevekê ku grubek faşîst li Yek Derî afîşên Partîya faşîst daliqandin em rastê hatin me nehişt. Di şer de şoreşgeran derbeke rind li wan da. Di gruba me de mamoste Cengîz Tokgoz, Saît Degirmenî, Saît Aydoxmuş û Faruq Wakifehmedoxlu, hebû.

Lê derba dawîyê ya xurt gelê Dîyarbekirê, di hatina Tirkeş de li faşîstan xist. Roja 23.06.1975 de alîgirê serokwezîrê hikûmata cepha nasyonalist–alîkarê serokwezîr- Alparslan Turkeş hat Dîyarbekirê. Xwepêşandenek gelêrî çêbû wî nekarî derkeve pêşberî gel. Girsê gel derket meydanan, agir berdan erebe, kozik û klubên polêsan. Li himber pêlê lehîya gel ne hêza faşîstan ne jî ya polêsan nekarîn berxwe bidin. Bi sloxana "Tirkeş kûçikê reş" ew hate qevirandin. Piştî vê bûyerê Dîyarbekir ji faşîstan hat paqiş kirin, piranî dibistan û zanîngeh, ji destê faşîstan hatin derxistin.

**Girtî Ezerîyê Îranê bû**

Piştî êşkencê ez derxistim birin li odekê destê min bi qaryolê ve zincîr kirin û derî li ser min girtin. Wek ez di binê ava kur de me, di xewda me, an hişyarim nizanim. Bona ku rewşa min ne baş bû, hin caran leşkeran qulika derî vedikirin li min mêze dikirin ka rewşa min çawa ye.

Carekê jî derê oda min vekirin, meriverkî bi çekên sîvîl û bi simbêl hat ba min.

Ji min pirsî ez çi karî dikim û ji kîderê me?

Wexta ku fêrbû ez ji Dêrsimê me, qeza min nehîya min heya gundê min jî hur hur pirsî.Xûya bu ku ew der rind nas dikir.

Ji oda min derket çû odake din. Girtîyê odê ji wî re qala xwe û çîroka xwe kir. Dengê wan rind dihate min. Girtî Ezerîyê Îranê bû. Bê pasaport derbazî Tirkîyê bibû ji ber wê hatîbû girtin.

Kesê sivîl ji yê girtîre got: " Em brayê hevin. Şaşitîyek çêbûye, efu bike, emê hal bikin." û li leşker kir qîr ku ji wan re çay bîne.

Wê sibê Ezerî yê girtî hat berdan.

Vê bûyerê hêrs û kînek mezin kir dilê min. Nimunek ber bi çav bû ku dewletê, Kurd ji xwe ra dijmin didît. Me ji wan ra leşkerî dikir, vêrgî dida, lê dîsa jî em dijmin, ezerîyê Îranê ji xwe ra bira didîtin.

Pîştî veqetina wî, leşkeran di nava xwe de navê wî jî rutba wî jî gotin. Navê wî min bîra kir lê rutba wî albay bû, serleşkerikî ji îstixbaratê bû.

Di girtîgeha Dîyarbekir de gelek welatparêzên Kurd hatîbûn kom kirin. Kurdên endamê TÎP ê, Kurdên endamên PDK-T, endamên PDK, endamên DDKO, gelek welatparêzên serbixwe hemû li vir hatîbûn civandin. Bi sedan xwendewan, mamoste, doktor, parêzer, karker, gundî her cure Kurd di hepsa Dîyarbekir de hatîbû ba hev.

Dr. Nacî Kutlay, Dr. Tarik Zîya Ekîncî, Parêzer Ruşen Aslan, Parêzer Şerafettîn Kaya, Edîp Karahan, nivîskar Musa Anter, M.Emin Bozaslan, Terzî Nîyazî, Mehdî Zana gelek xwendevanên zanîngehê yên endamên DDKO Faruq Aras, Îhsan Aksoy, Şakîr Elçî, Mumtaz Kotan, Mehmet Tuysiz, Yumnî Budak, Zerruk Wakifahmedoglu gelekê din.

Endam û qadroyên DDKO ya Enqerê, Stenbolê, Dîyarbekirê, Batmanê, Farqîn û yên din hemû di zîndana Dîyarbekir de hatîbûn kom kirin.

Di girtîgehê de piranîya girtîyan Kurd bûn an jî ji ber pirsa Kurdî hatîbûn girtin. Dewleta Tirk hemû Kurdên sîyasî li Dîyarbekir anîbûn ba hev. Di vir de mesajek hebû ew jî ew bû, ku Kurd, di kijan partîyê de bin jî bi yek çavekî dihatine dîtin. Neyar ...!

**Ava sar li cem Musa Anter**

Girtîgehê de sibê derê qoxuşan vedikirin, hemû girtî dihatine ba hev. Bi hev re spor dikirin, digerîn, sohbet dikirin. Heftê de carek jî dê û bav û heval û dostên girtîyan dihatin dîtina wan. Bav û brayên min jî hin caran dihatin dîtina min.

Min wek nav Musa Anter ji berê de nas dikir, lê di hepsê de jî bi rîya hin hevalan têkilîyên me çêbûn. Ji xwe Musa Anter meriveki mitewazî û dilgerm bû. Di hepsê de kesê ku nasnekirina, halê wî nepirsîna tune bû.

Piştre têkilî û danûstandina me pêşket, germahîyek zêde ji min re nîşan dida. Rojekê birayê min Turgut hatîbû dîtina min. Musa Anter pirsî, ka ew kîye?

Digot, hun mamoste hostê mirovanin, him şikil didin, him jî mefkure dikine mêjîyê xwendevanan. Ji bona vê yekê karê we pîroz e. Hun mamoste merivan jî baş dinasin. Çavê xwe li xwendevanên xwe bigerîn, kesên layik, zîrek hene ji me ra bêje. Em dikarin wan li Ewrûpa bidine xwendin, perwerde bikin. Brayê te lîsê diqedîne em dikarin wî bişînin, dîtina te çi ye?

Min got lazime li ser bifikirim. Ji bo min ev pêşniyarêk nû ye. Musa Anter ji bêrîka xwe kaxiz û pênûsek derxist û adresek nivisî û dirêjî min kir. Got "ev edresa mala min ya Stênbolê ye. Rojên hatî de belkê em bîr bikin, an jî hevûdu nebînin, ji nuha ve bila ev li ba te be. Heke hun bixwazin bi vê edresê ew dikare here Swêd." Edrês ya mala wî ya li Suadîye-Stenbolê bû.

Ji girtîgehê derketim min ji kekê xwe Mistefa ra mesele vekir. Wî got li Swêd hevalê min Selîm Atak heye, em Turgut bişînin ba wî. Me usa kir çend mehan şunde 1974 an de Turgut şand Swêd. Em sê bira çûne Enqerê, hin karê wî hebû me li wir qedand. Lê perê me ji bo me sê kesan têrê nedikir, em herin Stenbolê. Ez li Enqerê mam, Mistefa tevî Turgut çû Stenbolê û ew rêwî kir.

Musa Anter îmkan û olaxên ku di dest de hebû dixwast ji xortên Kurd yên hêja re parve bike. Anter ji hêla mahkûmîyê de xwedî tecrube û pratîk bû. Ew bînfreh, rûken, bi henek û bêtirs bû.

Bi qerfokî xeberdana wî û mîzaca wî ya nerm, xisusûyeta wî bû. Di girtîgehê de wekî ku di mala xwe de be, rehet bû. Di zîndanê da jî li gorî bîr û bawerîya xwe tevdigerîya.

Kaxizê îskambîlê, satranç (kişik), tavle, kûzê avê, cibîn (ji bona xwe ji mêşan biparêze) li ba wî bûn.

Li Dîyarbekirê germa havînê di bereqan de germtir dibû. Ava sar a kûzikê Apê Musa di girtîgehê de gelek bi qîmet bu. Lê ji bona dehan kesa kûzikê Apê Musa wê çibe...

Rojekî ew li ser textê xwe rûniştî bû û grubek heval jî li dora wî civîya bûn. Bi henekî ji wî ava kûzik dixwastin. Wî jî got hun deh kesin kûzikê min têrî we nake.

Hevalekî ji Îhsan Aksoy pirsî. *"Rojekî radîyo ya Kurdan çêbe, wê Kurd çawa reklam bikin?"* Wê gavê tv.ne, tenê radîyo di hişê mirovan de hebû.

Îhsan di cîh de bersiv da, *"ava sar li cem Musa Antar."*

Piştre jî TRT 6 (şeş) dest bi weşana zimanê Kurdî kir. Îhsan Aksoy TRT 6 (şeş) ne reklam lê demekê bi navê *"Yek Mirov Yek Dîtinek"* proxramek çêkir.

**Îbrahîm Qaypakkaya**

Çend rojan berê Îbrahîm Qaypakkaya jî anîn kirine qoxûşê kêleka me. Rojek ji Gulanê ew ji koxuşê derxistin, li ber derê qulube ya ku serleşkerên karbidest têda rûdiniştin li jîpek leşkerî sîyar kirin birin.

Jîp 10-15 metran li himber derê qoxuşê me bû. Îbrahîm di rêçûyînê de dilicimî, mîna kulekan, hevalên wî yên li qoxuşê me mamoste Muslîm û Kazim gotin ku qismek tilî û lingê wî jêkirine, loma ew usa kulek rêva tere. Dema ku Îbrahîm ber bi me zivirî, me ew rind dît. Devkenîya wî wek resim hîn jî li ber çavê min e.

Du sê rojan şunda bang min jî kirin û bi jîpek leşkerî ez birim dozgerîyê.

Wê demê kesên ku wî hawî dibirin, dibirin êşkencê. Min jî bawerkir ku min dibin êşkencê, tirs û xofê ez girtim.

Lê, min dî ku ne usa ye, mamoste Abdulkadir Ozturk bi rîya xwendewanê xwe, katibê dozger hatibû min bibîne.

Me hevûdu dît, tenduristîya min pirsî û em li ser êşkencên ku dihat kirin peyîvîn.

Di vê navberê de Abdulkqadir agahîya ku girtîbû jî vêşartî bi min ra parve kir. Wî da zanîn ku *"Îbrahîm Qaypakkaya di êşkencê de hatîye kuştin. Bavê wî hatîye cinazê lawê xwe bibe."*

Ez hatim min ew nûça ne baş li qoxuşê belav kir. Piştî nîvro çawûşekî pêşverû jî ew nûçe piştrast kir.

Îbrahîm Qaypakkaya, Muzaffer Oruçoğlu û hevalên wan li devera Dêrsimê gelek mabûn. Îbrahîm dawîyê de li wir hat girtin.

Tayfur Budak dibêje rojekê li kanîya gund xortekî nenas mala Mistefa Budak ji min pirsî. Min ew bir mala kek Mistefa şevikê li wir ma dora roja din çû. Dûra ku min afîş û nave wî xortî dît min zanî ku ew Îbrahîm Kaypakkaya bi xwe bû.

Oruçoğlu jî pir caran dihat li mala Budakan dibû mîvan. Bavê min digot cara pêşin ku Oruçoğlu hatibû mala me, birayê min Husên xwast wî nas bike, nebe ku ew sîxûrê dewletê be. Dibêje ez ê xeberê bidim qereqol. Oruçoğlu piçekê dikeve sitresê, bavê min dibêje ew birayê min e tiştekî usa nake aram be. Dora roja din jî Oruçoxlu tere li mala Husên dibe mîvan.

Rojek Mistefa li gundê Oruçoğlu tê dibe mîvanê wî. Li çûyînê ew cotek gorê zivistanê û 30 pagnot jî pere dîde wî û wî rêwî dike. Ew yeka min bi xwe ji devê birayê xwe bihîst.

**Midurê ajan**

Çend mehan şûnda ez ji girtîgehê hatim berdan. Piştî roja din ber bi nîvro çûm dibistana ku ez lê mamoste bûm. Li oda alîgirê midur Fatma Topaloxlu rûniştim, hin heval hatin xêrhatina min. Di vê navberê de Midurê dibistanê, yê ajan jî hat bi qureti got

"Kazim, tu berdan, tu xêrhatî." êşkence û pirsên polês li ber çavê min ra derbaz bûn, soza ku min di êşkencê de dabû xwe hat bîra min, ez rabûm ser pîyan û min got "bê namus te çima gilîyê min kir?" û bi hemû hêza xwe du kulm da ser lêv û pozê wî. Ser û çavê wî di xwînê de lewitî.

Nîv saet derbaz nebû midurê Ewlehîyê Recep Şeker, polêsê dev bi xwîn Husên Avci û çend kesên din hatin dibistanê. Ez li benda wan bûm ku ew min bibin. Lê usa nebû, ew bi midur ra peyîvîn û derketin çûn.

Dûra hate gotin ku midur nexwastîye gilî bike. Mehekê şuve midur tayîn derxist çû Meletîyê. Heyeta dadgehê bona ku di derheqê min de biryar bide li benda gotina midur e. Du rojan berî mehkemê ji Dêrsimê hatim terim Dîyarbekirê. Li Xarpitê bi navê Selahattîn rastî nasekî hatim. Selahattin xortekî karker bû, lê tu caran kar ne dikir. Her wext bê şûxûl û bê pere bû, wî jîyana beleş û bê şûxûl hezdikir. Wî dixwast ew jî tev min bê, Dîyarbekir bibîne. Ji ber ku ez ji mamosteyi hatibûm durxistin, perê min jî zêde tune bû. Lê bi perêyê dawî min ji wî ra jî bilêtek girt em li ereba Dîyarbekirê sîyar bûn çûn. Wê demê rîya Dîyarbekirê, erebe di nava Erqenîyê ra derbaz dibû û li wir navber didayê. Li Erqenîyê em rastî hevalan hatin, nehiştin em herin, xwastin em wê şevê bibin mîvanê wan. Me jî usa kir, tevî hevalan me xwarin xwar, sohbet kir, ez çûm berber rih û porê xwe kurkir, saet derengî şevê tevî Mistefa Qûrişoxlî em rêketin herin mala wî rakevin.

Riya mala Mistefê li ser kolana paş şaredarîyê û piştî mizgeftê parikî li jor bû. Dema ku em nêzikî mala wî bûn, pîkaba qeymaqam jî jorda ber bi me dihat. Qeymeqam Cengîz Kentlî li alî rastê erebe sekinandin û ba Mistefa kir, ew bire ba xwe. Ez û Selehatîn çend metran ji wan durve sekinîn. Qeymeqam bi hêrs û tehdît hin tişt jê ra gotin û Mistefa[33] bi tirs û telaş ber bi me hat. Got: qeymeqam dibêje "tu çima bi mamoste Kazimê qomunîst, kurtçî û elewî ra hevaltîyê dikî û wî dikî mîvanê xwe? Ew hatîye lawê min birevîne. Ez ê vî hesavî ji we bipirsim."

Mistefa ew tişt ji me ra got û dû ereba qeymeqam bezî çû. Jina Mistefê jî di pencira mala xwe de ev manzara dît. Wê jî hin tirs û stres nîşan da. Em neçûn malê, şûnde vegerîn, hatin parqa şaredarîyê. Li wê derê min hevalê Selahaddîn teslîmî mamoste Cuma kir û ew şand otêlê. Ji dûrve min dît ku polêsek û bekçîyek ketine milê Mistefê, ew girtine nava xwe û ber bi qehvê terin. Xûya bu ku ew li min digeriyan.

Bona ku ew min nebînin min xwe da talda dara çinarê, ew çûn qehwê û derketin. Piştî wan ez çûm qehwê, derêngê şevê bû, tenê çend kes li wir rûniştîbûn, gotin mamoste "ew" li te digerin.

---

[33] 2004 an da ku ez ji Stockholmê çûme welat, li Dîyarbekirê Av. Xalis Ayçiçek zîyaret kir. Li yazixana Xalis Begê Mistefa Qûrişoxlî behsa wê bûyerê dikir ku ez serda çûm. Piştî 31 salan şûnde me hevûdû dît. Lê dîsa jî Mistefa biken, xwedî bawerî û dost bû.

Min got:Başe, ma hûn nikarin yek min bikin mîvan. Hûn dibînin ku qeymeqamê faşîst li provakasyonan digere. Hûn jî rind dizanin ez çend saetan berê hatim vir. Lê ew îddîa dike ku min xwastîye ez lawê wî birevînim, derevek hişk û kol. Qeymeqam eşkîyatîyê dike. Hêza dewletê li gorî dilê xwe bikar tîne.

Kemal Sûbaşi rabû:

-Were em herine mala me.

Kemal meriveki welatparêz, pêşverû û hevalekî min bû. Li ba parêzer Gûlfer Guçlu katibî dikir. Lê mala wî malek deşîfre bû,min nexwast herim wir.

Ez ji qehwê derketim bona ku wan bidim şaş kirin ber bijor çûm, dûra zivirîm daketim jêr, di paş dibîstana lîsê ra çûm ser rîya Dîyarbekirê. Min li wir dît ku polês, li îstasyona benzînê him rîya Çermûkê him jî rîya ku tere Dîyarbekirê girtine. Ez derbazî alî dinê caddê bûm û min berê xwe da rîya trênê. Rîya hesinî çend kîlometre dervayî Erqenîyê ve derbaz dibû.

Saet 24.00 ê şevê meha 11 an sala 1973 bû. Heva sar e, min pardosîyê xwe li dûkkana berber bîra kirîbû.

Dora roja din jî li Dîyarbekir di dadgeha leşkerî de mehkema min heye. Dixwazim bê qeza herim dadgehê. Ketim rîya hesin û ber bi Dîyarbekir terim, heya kîderê nizanim...

Qeymeqam dixwaze bi îftira û îşkence prestîj û moralê min xraw bike. Lê ez jî naxwazim wê şansê bidim wî. Dibêjim qeymaqam hevesa te dîsa di dilê te de ma.

Herçî wext derbaz dibe serma zêde dike. Hin caran dadikevim bêne menfezan-pirean, dest û rûyê xwe mist didim. Ji dûrve hin caran kuzina rovîyan tê. Nêzikî gûndan derbaz dibim kûçik bîn digirin û diewitin. Saet 06 ê sibê gîhaştim îstasyona Geyîkê. Navbera Îstasyona Geyîk û Erqenîyê dora 30 kîlometre ye. Li wir çûm qehwê, çend kes li dora sovê rûniştî bûn, çay vedixwarin. Min, slav li wan kir, nêzikî sovê rûniştim xwe germ kir û çay vexwar. Qamyona pêşin ku hat, sîyar bûm saet 07.30 an de çûme Dîyarbekir mala Mehmet Yokuş. Min ew teme kir ku saet 12 an de min şîyar ke, piştî nîvro mehkema min heye û raketim.

Mehmet saeta ku min gotî bû ez şîyar kirim, got "ji Erqenîyê Parêzer Gûlferê xeber şandîye, şeva berê polês tu girti, anîye Dîyarbekir. Qeymeqam îddîa kirîye ku tu çûyî lawê wî birevîni. Ji Dîyarbekir 40 polês şandine Erqenîyê û tu girtine anîne...xwastîye em ji te ra alîkar bin." Min jî got Kazim li mala meye, ew xeber derew e.

Piştî nîvro çûm dadgehê, midurê ku gilîyê min kirîbû, du rojan berê ji Meletîyê hatîye îfadê xwe daye, tiştên ku berê di derheqê min de gotîye şunve girtîye.Wê rojê biryara berata min hat dayîn.

**Dîsa li Enqerê me**

Min ji dawa li Dîyarbekir berat kir, lê wexta ku ketim zîndanê, ji mamosteti yê hatibûm dûrxistin. Di dadgeha leşkerî ya Enqerê, di dawa DEV-GENÇ ê ya baskê Gazî Egitimê de jî dihatim mehkeme kirin. Him ji bona çareserkirina vegera ser karê mamostetîyê, him jî ji bona şopandina dadgeha orfî çûm Enqerê. Ez û Faruq Wakifahmetoxlu li Enqerê çûn mala ku Abdullah Ocalan tevî hevalên xwe lê dima. Ocalan li Dîyarbekir tevî Farûq di daîra Tapu qadastroyê de xebitî bû û wan hevûdû rind nasdikir.

Li Baxçelievlerê dairek di qatê bine erdê de A. Ocalan, Kemal Pîr, du bira Bakî û Hakî diman. Lê hin hevalên din jî dihatin û diçûn. Gelemperî kesên ku dihatin wê malê xortên pêşverû yên Kurd û Tirk bûn.

Di rêvabirina karê malê de serûberî û paqişiyek ber bi çav hebû. Di nava xortan de têkilîyên germ û jîyanek hevpar hebû.

Kemal Pîr di (Tûrk Tarîh Kurumu) Sazîya Dîroka Tirk de dixebitîya. Serokê sazîyê jî Prof. Mummer Aksoy[34] bû. Kemal Pîr hin caran bi sedema karê daîra xwe diçû Kurdistanê. Rojekê wî hin posterên Atatûrk biribû Mêrdînê û vegerîyabû.

Me ew hin caran rexnedikir, digot "*ma va çawa şoreşgerîye Kemal? Tu him posterê M. Kemal belav dikî him jî li himber Kemalîzmê yî?*" Wî jî karê xwe bi xwe rexne dikir."*Ez jî dizanim tiştê ku dikim şaş e. Ez xwe li himber îdeolojîya Kemalîzmê me, lê posterê M.Kemal jî di nava Kurdan de ez belav dikim. Debara rojê ne be vî kara nakim, lê derê nan e, çi bikim?*"

Hin hevalan jî alîkarîya wî dikirin, digotin: Kemal, bi belge û bi suret îzah dike ku Kemalîzm çîye, kê derxistîye û çiqasî neyarê gelê Kurd e. Li wê malê em demikê bi hev ra man. Doza netewî ya Kurd hin pir teze bû, di nava me de kesên ku xwe bi selahîyet bibîne û rê veke tune bû. Hin caran em bi hev ra pirtûkên ser pirsa Marksîzm û Lenînîzmê hatine wêşandin dixwînin û li gorî wê şirovan dikin. Peyîv û guftûgoyên me hemû bi pirsekê ve hatibûn sînorkirin, pirsa Kurd û Kurdistanê. Di destê me de çavkanîkek li ser welatê me agahî bide, pirsgirêka Kurd texlîl bike jî tune bû. Hin caran em diketin nava şik û dudilîyê, ma gelo, bi navê Kurdistanê welatek heye, eger heye kîder e? Gotina Kurd û Kurdistanê nebe ku şaş be û li himber sosyalîzma zanistî be. Kurdistan çawa bûye koloni, kolonyalîzm çîye, çawa dibe?

Di nava xortên Kurd yên li Enqerê gelemperî li ser pirsa netewî daxwazîya lêgerînikê û li dijî kolonyalîzma Tirk mêl û atmosferek hebû.

---

[34] Prof. Muammer Aksoy 31 ê Çileya Paşin 1990 da li Enqerê ber derê mala xwe hate kuştin. Kujêrê wî nehatin girtin, lê şik li ser hêzên Îslamî ye.

Zîndana Dîyarbekir cudatîya nava girtîyên Tirk û Kurdan rind radixist ber çavan. Zîndana Dîyarbekir wek dibistan her roj tiştek fêrî mirovan dikir. Madem girtîgehên Kurda û zilma li ser wan cudabûn, divîya bu partîyên wan jî cuda bin.

Di pêvajoya dadgehên leşkerî de me dî ku, çepê Tirkan di doza gelê Kurd de bawerîyê nade û şûnva gav davêjin. Wek gelek welatparêzê kurd fikra cüda damezrandina partîyên kurdî di serê min de jî herçî diçû zelal dibû. Di vê navberê de rastî hindik xortên Çolîgê hatim. Min û wan hevûdu nasdikir. Ji xwe ez û kekê min Mistefa Budak ji ber ku li wir wek mamoste xebitiya bûn gelek nas û xwendewanên me hebûn.

Ji bona ku me hevûdu nasdikir û ez ji girtîgehê derketîbûm xwastin, ez herim li mala wan biminim. Ez çûm û dora 3-4 mehan em bi hev ra man. Sê bira Îsmail Hakki, kekê wi Ruşti û biraye wi Sami û du hevalen din, Alî Yilmaz, Zekayî Dursun li Enqere Turk-Îş blokan de xaniyeki hemwelatiye xwe kire kiribûn û têda diman.

Zekaî, Rûştû û du brayên xwe di zanîngeha Yukselişê de xwendewan bûn. F. Wakifahmetoxlu[35] ji di zanîngeha wan de xwendewan bû.

Wê demê di nava xortên pêşverû de li gora îdeolojîya rojê, fedekarî û parvekirin hebû. Jîyanek komunalî, kolektîfî hebû. Mal komunek piçûk bû, kê çi perê xwe hebû ji bona malê xerc dikir. Di malê de jîyanek bi proxram û hevpar hebû. Li wê malê jî sipora sibê û pirtûkxwendina me dom kir.

Mala ku em lê diman, bibu navenda kesên pêşverû û welatparêz. Kesen ku ji Kurdistanê dihatin Enqerê dihatin vê malê. Demekê şûnde Zekî Adsiz jî ji Stenbolê hat wê malê û ew jî tevî gruba me bû.

Di sala 1971 de li Bîngol, di mala Mistefa de rastî Zekî Adsiz hatibûm. Ew wê demê li Stenbolê xwendewan bû. Jîyana hepsê û zanîngehê ew kamil kirîbû. Di rabûn û rûniştina xwe de mutewazî û xwîngerm bû. Wê demê pêşverûtîyek tevayî hebû ew jî pêşverû bû. Ango nirînên me nêzî hev bûn.

Kekê Mistefa li Çolîgê, ji ber paştamayîna civakê û kêmbûna qadroyên pêşverû gazin dikir. Wî derê mala xwe ji kesên pêşveru ra vekirî bû.

Têkilîyek germ nîşanî Zekî dida û bawer dikir ku ew di pêşerojê de bibe kadroyeke baş û bikare li ser rewşa sîyasî ya Çolîgê tesîrek baş bike. Zekî li himber

[35] Nîvrojekê ez hin hevalên xwe li nêzî wezereta Perwerda a Netewî li ser lingan sohbet dikir. Nişkava ji wezaretê Alî Heyder Dirioz-mamosteyê ku di mehkema eskerî da ser min şahadî kiribû derket hat.

Ez bervê çûm min go "rojbaş mamosteyê min çawayî? Ma te şerm nekir te çû êxbarîya min kir, ew yek te çawa li xwe şikand?" Rengê xwe çû nekarî tiştekî bêje.

Her tişt inkar kir, mi got ma tu ne Heyder Dirioz î? Got na ez ne Heyder im.

Min got baş e, madem tu xwe jî inkar dikî ,her tişt li te dişikê. Farûq peyva me bîhîst û xwe nêzikî me kir, xwest ew jî tiştekî bêje, lê Heyder bi bazdan ji me dûr ket, çû kete nava trafîqê pir nema bikeve binê ereben.

Mistefê xwedî îhtiram û rêz bû. Wê têkilîya wan ya bi dil û can li min jî tesîr kir. Wê rojê şûnda têkilîyê me û Zekî qût nebû.

Me di nava herdu malan de, mala Îçaydinlixê û Baxçelî[36] de dîyalog danî, hevalên herdu malan me bi hev dane nasin.

Wek fikir û raman heval nêzî hev dibûn û di civîn û aksîyonên zanîngehan de tiştên hevpar dianîne ziman. Kesên nu ketin nava grubê û çembera hevalan her roj firehêtir dibû.

Di encama mehkema leşkerî ya Enqerê de min 8 sal ceza zîndanê û 2 sal û nîv jî ceza sirgunê bajarê Ispartayê girt. Lê wexta hikûmeta Ecevît û Erbakan de Dadgeha Makezagonê ya Bilind ew qanun betal kir, ez jî zîndankirinê xilas bûm.

Serda jî çend mehan şunda, dema Wezîrê Perwerda Netewî Mustafa Ustundax de, di sala 1974 an de wek mamoste tayîn derxist, wegerîyam *Dibîstana navîn Ataturk* a li Dîyarbekirê.

Ez bi balafirê çûm Dîyarbekir. Li ofisa Parêzer Yusuf Ekîncî telefonî midurê Perwerdê a Dîyarbekir kir û da zanîn ku ez, sibê li dibîstana xwe ya kevn dest bi kar dikim. Bona ku hikûmat guharî bû, midur di telefonê de bi germayî ez bersivandim. Lê çend mehan berê ku ez li wîlayêtê di nezareta polês de bûm, slav jî nedabû min.

**Li Dîyarbekirê**

Me li paş avahîya wîlayetê di apartimana Cîhanê qatê yekem de daîrek kirê kir. Mal bi qalorîfer bû û ava germ jî her wext hebû. Ew yek gorî wê demê awantajek mezin bû.

Di malê de em gelek heval bi hev ra diman. Ruhî Koç(xwendewanê zanîngehê),Sait Aydoxmuş (sendîqaci), Şefik Aydoxmuş, Kazim Budak (mamoste), Dîyar Budak (xwendevan), Hidir Tek (karker), Wezîr Perîşan (karker), Fewzî Paydaş (dermanfiroş), Mehmet Durmaz (xwendevan) dimînin. Lê şeva bê mîvan jî tune. Mala me mîna komela an jî buroya partîyek çep bû. Piştî ku ez li Dîyarbekirê cîh bûm, Zekî Atsiz hate dîtina min. Di nava germahîya xebatê de çend rojan li Dîyarbekir em bi hev ra man, lê dûra ew jî bû endamê male... Di mitbaxê de dor bi dor nobedarî dihat kirin. Me kirê serê merivan parve dikir, tenê ji Zekî Atsiz û Mehmet Durmaz kirê nedihat girtin. Zekî bê kar, Mehmed jî xwendevan û bê kar bû.

Welatparêz û pêşverûyên Dîyarbekir, xwendevan, mamoste, karker û kesên polîtîk kesên piçekî pêşverû miheqeq hatin wê malê.

Li wir ser pirsa karkeran, pirsa xwendevanên zanîngehê, pirsa mamosteyan, li ser xebat û tekoşîna li himber faşîstan dûrûdirêj dihat peyvandin û niqaş kirin.

[36]Çend sal dûra ku ez û Îsmaîl Mutewelîzade li Dîyarbekirê rastî hev hatin. Îsmaîl tevî grubê problem jîya bû û dev ji wan berdabû. Got,"kekê te em bi A. Ocalan dane nasin te dayika me girtxist."

Wê wextê li Dîyarbekir pêşverûtî, welatparêzî qels bû. Yên heyî jî di nava xwe de bê organîze bûn.

Hemû saziyên perwerdê, zanîngeh, Enstituya Perwerdê, dibîstana mamostan, lîse di destê faşîstandabû. Partî û komelên faşîstan aşkere dixebitîyan û êrîşî welatparêzan dikirin.

Piştî 12 Adarê di nava tevgera çep de ji hev belavbûnek û lêgerînek nû dest pêkir. Dî vê pêvajoyê de li ser statuya Kurdistanê dîtina kolonîye derket holê. Tesbîtkirina vê statûya Kurdistanê ya nû di dîtin û tekoşîna welatparêzên Kurd de perspektîfek nû vekir. Tevgera çep a Tirk di pirsa Kurdî de bona ku tahlîlek rast nedikir û di mehkeman de gavên paşve avitin, bawerî neda Kurdan û di serê gelek welatparêzan de damezrandina partîyên Kurdî derket pêş.

Qadroyên TÎP û TSÎP ê hewl didin ku li Dîyarbekir liqê partîya xwe damezirînin. Hin kes girtin nava xwe û li wir partî jî ava kirin. Lê ez, Saît Aydoxmuş û Zekî Atsiz nêzî hev difikirin. Hin caran jî em bo endambûyîna hin partîyên heyî lez nekin, hevûdû şîyar dikin. Çimku; piştî 12 Adarê tevgera çep hatîye çaterêke, vê yeka bi şiwazek nû li pirsa Kurd hûrbûn dianî rojevê. Di serê me de partîyek cuda, partîyek Kurdîstanî hebû. Di seranserê welat de li ser pirsa Kurd de lêgerînek hebû.

Zekî rojekê ji min pirsî "gelo, tu Kemal Burkay çiqasî dinasî? Tariq Zîya û der û dora TÎP a kevn dîsa çûn di partîya xwe de cîh stendin. Burkay jî ji Ewrûpê bê, mîna Tarik Zîya û kesên din bikeve nava partîya xwe ya kevn, TÎP ê? An ew dikare partîke Kurdîstanî, damezrîne? Meriv li benda wî bisekine, an na, tu çi dibêjî?"

Min got li gorî naveroka pirtuka Xidir Murat divê em lez nekin. Di vê navberê de Kemal Burkay jî ji Ewrûpê zivirî. Me li Xarpitê hevûdû dît, sohbet kir. Wî ji pirsa Kurdî bêtir sosyalîzm derdixist pêş. Me pirtûka Xidir Murat-navê wî yê vêşartî bû-jî xwendî bû. Li gorî pirtukê zêde vekîrî nedipeyîvî. Lê Kemal Burkay jî çû bû endamê (TÎP ) partîya xwe ya kevn.

**Li Lîsa Dêrsimê û endambûyina min a partîyê**

Di 7 Sibata1975 an min tayîna xwe derxist ji Dîyarbekir çûm Lîsa Dêrsimê. Ez, mamaoste Hesen Acar û xwendewanê lîsê birayê min Dîyar bi hev re bi bedêla perekî li pansîyona dibistanê diman. Xwarina nîvro jî dîsa em bi perê xwe li pansîyonê dixwin.

Di pansîyonê de piranî ji Dêrsimê 150 xwendewanê leylî diman. Her çiqasî Dêrsim bajarê min bû jî yekem car bû, ez li vir dimam û dixebitîyam. Di Sibata 1971 de jî weka Komela Çanda Dêrsimîyan şaxa Enqerê em hatîbûn Dêrsimê.

Rojek germ a Adarê Burkay hat li Dêrsimê bû mîvanê me.Şemîyê ez û wî tevî du hevalên din Hesen Acar û Yerlî daketin ber çemê Minzurê. Dudo dudo em bi navber pê hev, di rîya Ovacikê de, ber bi Anafatmayê terin. Ez û Kemal Burkay bi

hev re û herdu hevalên din jî bi hev re dimeşin. Em di nava xwe de li ser partî ya îllegal dipeyîvin. Wexta me heye, rîya me dirêj e û ewlehe ye. Wê rojê me qala partîyek illegal, prensîp û armancên wê kir. Min biryar da û ez bûm endamê Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê (PSKT).

Di rewşa wê dêmê de bi xwe ra gerandin, xwendina proxram û destûra partîyê ne hêsa bû. Ew dokumen min salekê şûnda karî bixwînim.

Li Dêrsimê ez endamekî tenê bûm. Belavkirin û firotina Kovara Özgürlük Yolu tevî hin xortên sempatîzan min dikir. Çepên Tirkan bi salan Dêrsim ji xwe ra kirîbû navenda xebatê, gelek kadroyên xwe li vir kom kirîbûn û dixebitîyan. Di welatê Seyît Riza de hemû hêzên Tirkan, xasima hemû grûbên Maoî hebûn, lê hêzên welatparêz li vir tunebûn. Hêzên welatparêz ev der vala hiştîbûn, an jî di xebata xwe de dereng mabûn. Bona ku ramanên netewî di nava gel de belav bibe û cîh bistîne me gelek hewl da. Kovara Rîya Azadî di nava gel û xwendewanên xwe de belav kir û ew da nasin. Min yek rojekê di nava mamosteyên Lîsê de 18 kes kirin endamê kovarê û bedelê endamtîya salekê şand navenda kovarê.

Me him di nava xwendevanan de him jî di nava gel de xebat kir. Di civîn û semînerên Komela Mamaostan de me ditinen xwe ani ziman. Di nava xebatkar, esnaf û karmendan de, di nava xortan de dora me roj bi roj firehtir dibû.

Her çiqasî Dr. Saît Kirmizitoprak, (Dr. Şivan) xwe ji Dêrsimê bû û bi navê PDK-li Tirkîyê partîyek avakirîbû jî, Endamên wê partîyê xwe bêdeng kirîbûn, ji wan kes li ortê tunebû. Li Dêrsimê gotina "Kurd"û "Kurdîstan"ê tu kesî nedianî ser zimanê xwe. Piştî jenosîda Dêrsimê gel him hatîbû tirsandin him jî wek qawram (têgîhiştin), Kurd û Kurdistan nedizanî. Bi saya berxwedana Kurdistana Başûr Kurd û Kurdistan belkê bihîstîbûn lê ew herdu pirs, ji xwe dûr, aîdê Kurdistana Başûr didîtin.

Wekî min li jorê got li Dêrsimê endam û dilxwazên hemû grub û hêzên Tirkan hebû lê wek welatparêzê Kurd vekirî, yek qadro jî tune bû.

Wê demê Alî Heyder Qeytan û Şahîn Donmez jî hatin Dêrsimê. Wan navê UKO (Ordîya Rizgariya Netewi) bi kar dianin. Min ew ji Enqerê nas dikirin. Ji bona ku em bikaribin, li himber Maoî û Kemalîzmê serkevin, me di nav xwe de hin tişt şirove kir. Têkilîyên me bi wan re gelek dewam kir. Ji bona ku Kemalîzm xurt bû lazim bû, kesên dijî kolonyalîzmê nêzî hev bûna.

Xwendevanên me sedî 95 Maoî bûn, ez û Hesen Acar bi Barazanîyîtîyê îtham dikirin û berê xwe ji me diguharin. Me di wextek kin de ji xwe ra hinek heval çêkir. Dilxwazên partîya me û kovara Özgürlük Yolu roj bi roj di nava karmendên piçûk de, di nava xwendevanan û di nava gel de belav dibû. Lê hikûmata M.C ê û rayedarên sîyasî û îstixbarata Dêrsimê jî vala nedisekinî.

Sala 1976 an de li Lîsa Dêrsimê gelek bûyer, xwepêşandin û tevlihevî qewimîn. Roja 5 ê şeva Gulanê ez û destgirtîya xwe Mamosta Enstîtûya Qîzan a Dêrsimê Nazli Sertkaya ji mîvantîya hevalekî dihatin. Me dî ku di dora dibîstana lîsê polîsên çekdar xwe di taldan de telizandine - vêşartine. Sivê salvegera daliqandina Deniz Gezmiş, Yusuf Arslan û Husên Înan e. Ew di 6 ê Gulanê 1972 an de hatibûn daliqandin.

Polis li bendê bû ku xort afîşan daliqînin an jî slogan binivîsin û bi provakasyonekê hin kesan bigirin bin çavan. Di vê navberê de Hesen Acar sirgûnî Zonguldaxê bû û ew derket çû. Nuha ez û brayê min Dîyar û Tahsîn Dîken em bi hev ra di lojmanê de diman.

Kekê min Mistefa dema ku li Solxanê mamoste bû, Tahsîn girtîbû nava hêzê şoreşger. Ji ber têkilî û daxwazîya wî Tahsîn hat li cem me diçû lîsê. Wê şevê min Dîyar û Tahsîn şîyar kirin, derva polis heye, ew hay ji xwe hebin. Belavokên ku roj ji alî hin gruban ve hatîbû belav kirin û wan diparastin ew şewitandin. Wê şevê me bi tirs sibekir.

Sivê çûm dibistanê, du xebatkarên, bekçîyên dibistanê gotin ku polîsan ji wan ra gotine, *"haya we jê hebe, mamaoste Kazim Budak dixwaze ala Kurdistanê daliqîne û bombê bike daîra qalorîferê."*

Min Midurê dibîstanê Kasim Koç agahdarkir û me gotinên bekçîyan kir ser kaxizê, du bekçî û dora 30 mamostan îmze kir. Mamaostên xwedî îmze bi hevre çûn ba Walî Cemal...

Walî, ji ew macîrên ku li dora Mûşê hatîbûn cîh kirin bû û pir dijminê Kurda bû. Wî, bi pirsa navê me û bajarê me dest bi gotinê kir. Me jî, li dibistanê kirin û gotinên ku polêsan, anî ziman û me ji wî xwest ku ew ser pirsê raweste. Lê ji wan belge û gotinên me ew ne rehet bû, bê bawerî û şika xwe anî ziman.

Got,*"ez nikarim tiştekî bikim, hun jî mezin mekin."*

Me dî ku tu xema wî nine, min got, *"gelî hevalan Walî beg dibêje ez nikarim tiştekî bikim, dive em tedvîrên xwe xwe bigir in."*

Di cî de Walî aciz bû û got, *"Kazim Budak ma vira sere çîyê ye, tu çawa "tedvîrên xwe, bi xwe digirî? Ma dewlet çi dike?"*

Min got walî beg eger te bigota ez li ser bûyerê radiwestim û pirsê dişopînim, emê razî bûna... Lê tu bi gotinên ewqas mamoste bawer nakî û dibêjî *"Ez nikarim tiştekî bikim, hun jî mezin mekin" Emê çibikin?"* Bê encam em ji cem Walî derketin çûn.

**1975 de hilbijartina senatoyê**

Li gorî Makezagona 1960i di Parlemento ya Tirkan de du meclîs dixebitîyan.

Yek Meclîsa Gel (BMM) û ya din jî Meclîsa Senatoyê bû. Kesên ku zanîngeh û dibistanên bilind xwendibûn û 40 salê xwe dagirtibûn dikarîyan bibin namzetê senatorîyê. Li gorî makezagonê sê cure endamên senatoyê hebûn.

1-Birek senator ji alî gel va dihatin bijartin. Hêjmara wan 150 kes bû.

2-Senatorên kontenjan hebû, hejmara wan 15 kes bû, ew ji teref serok komar va dihatin bijartin.

3-Senatorên tabiî; ew jî serok û endamên komîta netewî ya yekgirtî (Mîllî Birlîk Komîtasî) û ji serok komarên kevn pêk dihatin.

Li Tirkîyê Meclîsa Senatoya bi derba leşkerî ya 1960 hate dine, bi derba leşkerî ya 1980 de jî ji holê rabû.

Bona ku TÎP nediket hilbijartinan, Kemal Burkay di hilbijartina payîza 1975 de ser navê xwe li Dêrsimê bû namzetê senatoyê.

Her çiqas Partîya Karkerê Tirkîyê (TÎP ê ) di hilbijartina 1969 an de li Dêrsimê gelek deng girtîbû jî nuha rewş hatîbû guhartin.

Ji ber zilm zordarîya hukmê 12 Adarê gelek qadroyên çep, demoqrat an ketin zîndanê an ji Dêrsim terikandin.

Çepên Tirk, xasima grubên Maoî, qadroyên xwe kirin Dêrsimê, di nava gelda xebitin. Bi dehan grubên îllegal û çekdar, grubên ku şer bingeh digirtin pêydabûn. Van gruban bajar û gund di nava xwe de parve kirin. Ser navê *"şoreşgerîyê"* bi dehan mixtar û kesên sîvîl, demoqrat kuştin, yekitîya gel xira kirin. Bi wî hawî şer û reqabeta nava gruban di Dêrsimê de kaos pêyda kir.

Lê ji bona ku TÎP nediket hilbijartinan, bi biryara navenda partîyê nehiştin endamê wan Kemal Burkay jî li Dêrsimê bibe namzet û di hilbijartinê de beşdar be. Bona wê yekê Kemal Burkay jî berendamtîya xwe şunda girt û ji Dêrsimê çû.

Piştî hilbijartinan bi navê Nureddîn, ji ehlê Qersê kesek hat Dêrsimê. Ew ji bona ku li Dêrsimê liqê Partîya Karkerê Tirkîyê-TÎP ê damezirîne hatîbu. Bo min, ji Burkay, slav anîbû ku ez jê re alîkar bim. Lê min ew daxwaza wî bicîh nanî.Sosyalîst û welatperwerên Kurd bona ku ji partîyên heyî bersiva daxwazîyên xwe nedigirtin, Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê (PSKT) avakirî bûn. Ez çend mehan berê bibûm endamê wê partîyê û min bona xurtkirina wê hewl dida. Cardin jî bo damezrandin û xurtkirina partîyên Tirk alîkarî kirin şaş bû.

**Erdhêjina Lîcê**

Di 6 ê Îlon a 1975 an de di dereca 6,6 an de li Lîcê erdhêjînek çêbû. Zerara can û mal gelek bû. Gelê me mixtacê gelek tişt bû. Ji ber xisusîyeta welatparêzîya wan Dewleta Tirk di pêçana bîrînan de giran gav davit. Ez û Faruq Waqifahmedoxlu (wê demê ew li Dêrsimê mala xezurê xwe Duman bû) bi hev ra çûn ba rêvabirên komela TOB-DER a Dêrsimê. Me ji bo organîzekirina kampanyek alîkarîyê civînek

pêşneyar kir. Di civînê de ji bo her qezayekê çend kes hatin bijartin. Min û du hevalên din jî me gundên Mêzgirê girt ser mile xwe. Berê, me rîya xwe bi TOB-DER a Mêzgirê xist, ji wir em derbazî Nehîya Moxindîyê bûn. Li wir jî me gundîyê min midurê Dibistana Navîn Mistefa Topal jî girt û dest bi gera gundên Moxindîyê kir. Em hima hima hemû gund û goman gerîyan. Me qala erdhêja Lîcê kir û ji bona brayên xwe ji wan alîkarî xwast.

Hemû gundên ku em çûn me pêşwazîyek germ dît. Heftekê şûnde em dîsa wegerîyan Dêrsimê, bi hevalan ra rewş berçav kir. Her grubekê xebata xwe anî ziman.

Hate xûya kirin ku gelek xwarin û çek hatîbûn kom kirin. Ard, bilxur, genim, nanê teze, xasima nanê ser sacê dayîkên gundê Xozat û Pêrtagê ku bi îmkanên xwe bi keda rojan ew patîbûn ji bona depremzedên me dîyarîke bi mane bû.

Dor hatîbû şandina tiştên komkirî. Wê demê bi leqeba Şêx (mixabin navê wî ya rastî naye bîra min) Midurê Bayindirilixa Dêrsimê pênc kamyon dan me. Bi qamyonan em çûn wan gund û goman.

Navê şoferê qamyona ku em pê terin Mêzgirê Mehmet Dizgun e, ew, bi kêfxweşî karê xwe dike. Wê demê rêya pir gundan tunebû, rêya mezra me û gundê Hulmanê jî tune bû. Ji bona wê erebê nekarî dakeve gund. Erebe di binê Coşikbaba[37], li Qirtil sekinî. Ew der ji mezra me 5 km ji gundê Hulman jî 500 metre dûr bû. Di mezra me de bav û apên min serhev dora sê sed kilo genim û bilxur komî serhev kirîbûn. Bi alîkarîya Adil Can[38] û xortên gund, me genim, bilxûr, ard û tiştên komkirî bi keran bir ber erebê û li erebê barkir.

Erebeyên ji qezayên din jî bare xwe girtin hatin Dêrsimê, ez jî di nav de me da rîya Dîyarbekir. Bona ku têkilîyên min bi Dîyarbekir ra hebû, hevalan xwastin ez tev grubê bim.

Di gera gundan de min xwe cemidandibû, ez nexweş ketim, nekarî herim Lîcê. Li Dîyarbekirê min erebe teslîmî komîta TOB-DER ê ya ku ji bo alîkarîya Lîcê hatîbû damezrandin kir. Di wê komîtê de Mehmet Yokuş û hin hevalên din hebûn. Komîtê ew 5 erebe yên ji Dêrsimê hatibûn birin Lîcê, xwarin û kincên ku me komkirîbû li wan belav kirin.

---

[37]Coşik Baba wek zîyaret tê hesibandin. Hin caran gundî bona ku hemberê xwe qane bikin berê xwe didine wê derê û ser Coşik Baba sond dixwin. Nêzikî wî girî gundê Coşikê heye, îhtimalek mezin nave xwe ji wir digire.

[38]Adil Can, ji gundê girêdayîyê Dersimê, Hulmane. 16 Avril 1980 da ji alî cunta faşîst ve li Stenbolê hat qetil kirin.

**Boyqota xwendevanên Lîsa Dêrsîmê**

Di Lîsa Dêrsimê de ji du hezarî zêtir xwendevan hebû. Perwerde berî nîvro û piştî nîvro hatîbû beş kirin. Xwendevanên mezin di peryoda sibê, xwendevanên piçûk jî piştî nîvro tên dibistanê.

Lê dibistan him wek avahî him jî wek mamoste bersiva xwendevanan nade. Piranîya mamostan û rêvabirên dibistanê Tirkê nîjadperest in. Mamostên Kurd jî bi jara Kemalîzm û Maoîyê hatine jarkirin. Kesên ku ji xwendevanan ra rêke rast nişan didin kêm in. Mamoste yê dersa olî xwendevanên ku bi gavê lingê çepê dikevin sinifê wek gunekar navdike û notên kêm di de wan. Xwendewan ji sedî 99 Elewî bûn, mamoste dixwazî ew li ber derê sinifê ling biguharin û lingê çepê gav nevêjin hindur. Bi navê Hîlmî mamosta edebîyatê, bi kêrê êrîşî xwendevanê xwe kiribû. Heya ku ew li Dêrsimê bû, du polês tevê digerîyan. Vexta ku ez çûm Dêrsimê, wî jî tayîna xwe derxistîbû Erzorimê. Sinif û deftera wî ya notan devrî min kirin. Wê wextê di dibistanan de di navbera 0- 10 an de not dihate karanîn, nota herî bilind10 bû. Hima bêje hemû xwendevanên sinifa dawîn a lîsê, ya sifir, an jî yek dabûyê û defter teslîmî îdarê kiribû. Xûya bû ku mamoste bi qesit tevgerîyabû. Hima hima tevayî sinifê çawa dikarîya ewqas xirab be? Bona ku bikarim notê xwendevanan serast bikim, min jî dîsa ew reqemên wî bi kar anîn. Reqema (1) yekê de pêşîya sifiran, sifir jî da paş yekan, not serast bûn.

Min ji xwendevanên xwe ra vekirî digot,*"hun ne Tirkin, zimanê Tirkî zimanê we yê dûyem e. Tenê bi Tirkî peyivandin be jî hun 5 numire heq dikin."* Sinifa lîseya yekê jî diçûm dersan. Qîza qomsêr Yaşar di wê sinifê de xwendevan bû. Lê çend rojan nehat dibistanê, îdara dibistanê jî kesekê din jî nizane ew çima nayê dibistanê.

Dûra derket rastê ku qomsêr Yaşar jina xwe ducanî bûye û rojên xwe nêzik bûne. Bona ku jina wî *"li Moskova piçûk zarok neyne dinê"*, jin û zarokên xwe, di nîvê sala perwerdê de şandîbû Qastomonîyê.

Qomserîki mîna Yaşar li Dêrsimê çi nekir ku, çi nake ku?

Tiştê ku nedihat bîra kesî, an jî nedizanîn Qomsêr Yaşar, Reco û Salêhê Bêtilî dianî bîra xortan. Xortên ku digirtin bin çavan zora êşkencê dixwastin ku ew bêjin *"Kazim Xoce endamê Ordîya Azad a Kurdistanê ye"*, an jî "nêzik de ew ala Kurdistanê hildin." Sal 1975-76 bû lê bi rastî jî min heya wê deme, navê ordîyêk usa nebîhistîbû. Ala Kurdistanê jî min heya wê demê hîn neditîbû. Walî Cemal jî demecê xwe ya di rojnama Hurrîyetê de behsa boyqota lîsê dikir û got *"mamoste Kazim Budak xwestîye di cîhê ala Tirkan de ala Kurdistanê hilde jor."*

Zivistanî pir caran qalorîferên dibistanê naşewitin, cam û pencirên sinifan şikiyane. Di sinifan de hêjmara xwendevanan 50-60 hebin. Di yek bankê de 3-4 xwendevan rûdinin, ew di wir de hil nayên. Şertên dersxebitandinê tune.

Xwendevan ji alî grubên çep va hatine parçe kirin. Hetta tax û gund jî li gorî grubên çep hatine parve kirin. Hin xwendevan bi rojan nayn dibistanê, terin gund bi gund digerin, weşanên xwe belav dikin, propaxanda grubên xwe dikin.

Ser de jî, grubên Maoyî propaxanda dikin ku nêzik de şoreş çêbe û xwendina wan wê pere neke. Ew, qîmeta dersa fizîk, kîmya û matematîk ê nizanin. Zanistîya ku ji dibistanê tê girtin, kêmehatî, bêfeyde, wek kultura burjuwazîyê dibînin. Lê fizîk, kîmya û matematîka şoreşgerî çawa dibe wê jî nizanin.

Polês qet vala nasekine, ser navê gruban belavok belav dike, têkilîyên nava gruban provake dike, di nava wan de şer derdixine.

Mirovan bê belge digirin bin çavan, li wan êşkence dikin. Mehkeme û polês bi hev ra li ser gelê Dêrsimê terorek mezin bi kar tîne.

Mezheba Elewîtîyê jî bi serê xwe suc e.

Xasima ajan Salehê Bêtilî her provakasyonê bêcer dike. Dîsa bi provakasyonek usa xwendevan anîn lîstikê.

Ji ber belavokek sexte polês hin xwendevan girtin bin çavan. Xwendevanên din jî ew yeka protesto kirin û ders boykot kirin.

Walî, Midurê Perwerdê, Midurê polêsan û hin burokrat û bav û dayîkên xwendevanan hatin dibistanê.

Midurê Perwerde xwest bipeyîve, lê xwendevanan ew protesto kirin û belav bûn. Ser vê yekê walî, di cî de emir barand da ku komîta dîsîplînê ya Lîsê "*Serok û organîzatorên bûyeran bibînin û di cî de ceza bikin!*" Ez û du hevalên din di komîta dîsîplînê de ne. Dixwaze çavê me bitirsîne. Walîyê faşîst polêsên ku provakasyon dikirin diparast, ser şîkayetên me digot "*ez nikarim tiştekî bikim, hun jî mezin mekin.*" Lê xwendevanên ku mafê xwe yê demoqratîk bi kar dianîn jî dixwast bêne cezakirin. Eger usa nebe! walî beg me jî "*wek hevparê bûyeran bihesibîne.*"

Lê min got; em nikarin him sucdar pêda bikin û him jî wan ceza bikin, ango him dozger him jî qazî bin.

Hun bêjin, kî sucdar e û kî ji wan ra pêşengîyê dike, em jî wek komîte li ser bifikirin.

Walî ji vê bersiva min kêfxweş nebû. Rûyê xwe tirş kir, berê xwe da midur û got, lîsta kesên pêşengîyê dikin derxinin bidin komîtê, ez li benda encamê me.

Walî û buroqratan dibistan terikandin, çûn. Me bîhîst ku li sûkê polês êrîş birîye ser gruba xwendevanan. Hin xwendevanên keç jî di nav de polês grubek xwendevan girtîne bin çavan. Em çend mamoste ji dibistanê derketin çûn rewşê fêr bibin. Me dî ku dora 500 xwendevan bi sloxan ber bi avahîya walîtîyê terin. Me mamostan xwe gîyand wan ku em wan vegerînin, lê ew venegerîn, wan azadkirina hevalên xwe yên girtî dixwestin.

Grubek polês û leşker di ber derê avahîya walîtîyê de berê namlîyên tifingan dabûn xwendevanan û di paş torbên qûmê de xwe cîh kiribûn. Ji ber wê manzara dijminahî me jî piştgirîya xwendevanên xwe kir û bi sloxanên *"polêsê faşîst, îktidara faşîst, hukimet îstifa, walî were vir"* me jî dengê xwe tevî dengê wan kir.

Walî xwe ker kir û xwendevanên ku girtîbûn bin çavan jî nehatin berdan. Xwendevanan bi keviran êrîşî avahîya walîtîyê ya ku di qatê duyemda cîh digirt kirin.

Li ber derê vîlayetê yekî bejnkinik, hûrberdayî û bi berçavik, di dest de têlsiz dipeyîvîya, ji polêsê cem xwe ra em îşaret kirin û ket hindur. Hevalan da zanîn ku ew midurê Emnîyeta Dêrsimê ye.

Me grubek mamoste xwast em herin walî bibînin lê polês rê ne da. Dawîyê dîn ku xwendawanan di daîra walî de camek saxlem nehiştin, berdan, em çûn daîra walî camê şikayî perçe perçe li odê belav bibû. Li ser masa walî kevir û perçên caman kom bibû. Walî, fermandarê alaya cendirma, Midûrê Perverdê, Midûrê Ewlehîyê (kinikê ku bi têlsizê dipeyîvîya) bona ku xwe ji keviran biparêzin, xwe dabûn koşekî muşewere dikirin.

Walî çawa em dîtin bi qîrîn got *"Mamostên komînîst, va kirinên usa berhemên we ne. Midûr beg (Midûrê Ewlehîyê) mamostan bigire jêr"* ji derva kevir avitinê dom dikir. Kevir li perda pencirê diket hêza xwe wenda dikir û dikete odê. Kaxizek[39] navê me çar mamostan li ser nivisî li ser masa walî bû.

Dûra hat gotinê ku ew navana mamostê dersa olî wek lîsteya *"mamostên ku xwendevanan pîj dikin"* dabû walî.

Midûrê kinik em çar mamoste birin, li qatê jêrin kirin odekê û derî li ser me kilît kir.

Lê xwendevanan maydan neterikandin. Piştî dora du saetan em hatin berdan, lê xwendevanên girtî, di hindur de man. Wê êvarê heya derengîya şevê ji bîna walî ji qisma polês qîrîn û zîvîna xwendevanên me dihat.

Em çûn ba hin parêzer, dê û bavan ji bo ku li xwendevanên girtî, ewladên xwe xwedî derkevin.

Lê gel bêçare bû. Parêzer Husên Erkanli bi hestên kelogîrî got, *"Mamoste Kazim, em dikarin tiştekî bikin? Ma 38 an de çi anîne serê me, me ew bîr kir?"*

Pîroyê xwedî restoranta Tepebaşîyê bibû şahadê bûyerî ku keça wî çawa bi hovitî û lêdan hatîbû girtin. Di peyva me de dema ku Pîro bêçaretîya xwe anî ziman, min got:*"Madem hun nikarin tiştekî bikin, qet ne be, nan medin wan, mal medin wan, silavê medin wan."*

---

[39]Navê me tîpên erebî hatîbûn nivîsîn, mamostên olî ew nivîsî bû û dabû valî.

Wê şevê em tevî komîta TOB-DER ê li mala mamoste Alî Aydin rûniştin, me li ser navê TOB-DER ê belavokek ji bona çapê amade kir û çûn Xarpitê. Me baz dida, me dîzanî ku polês carek din me bigire û êşkence bike.

Ez derbazî Dîyarbekir bûm, du mehan şunda me ji hev agahî girt û em vegerin Dêrsimê.

**Sloxana Tuj! "KURDARA AZADÎ"**(29ê Sibat 1976)

Di 29 ê Sibata 1976 de li Dîyarbekir, bi pêşengîya(Diyarbakir Yüksek Öğrenim Derneği) Komela Dibistana Perwerda Bilind a Dîyarbekir û bi piştgirîya hin komelên din yên demoqratîk biryara xwepêşandinê girtîbû. Ew aktîvîte ji bo daxwazkirina hin mafên demoqratîk û protestokirina hin kiryarên ne demoqratîk a li Perwerda Enstîtuya Dîyarbekir bû. Komîta mîtîngê çend rojan berî mîtîngê di avahîya sînema Dîlanê de ser bernama û rêvabirina mîtîngê bi hin nunerên gruban ra civînek li darxistin.

Ez ji Dêrsimê hatîbûm, Dîyarbekirê. Di civînê de hin nîqaşên ku li ser sloganan çêbû, di nava hevalên Rîya Azadî de dubendî çêkir.

Hevalan slogana *"Kurdara azadî"* tûj û bêwext didîtin. Piştî hin nîqaşan Mehmet Yokuş û hin hevalên din civîn terikandin.

Di komîta rêvabirina mîtîngê de dilxwazên Rîya Azadî, ji komîtê îstifa kirin. Roja dinê di nava derûdora Rîya Azadî de dîtinek tevînebûna mîtîngê hate holê. Ew dîtin wek biryara partîyê hat pejirandin û gelek endam û dilxwazê Rîya azadî û hin kesên din ne çûn mîtîng ê. Lê vekirî neyê gotin jî ew dîtina ne rast wek biryara partîyê hate pejirandin.

Kesên ku wê demê têkilîyê me hebûn, wek; Saîd Aydoxmuş (serokê sendîqa gida-îş), Ruhî Qoç (serokê sendîqa Genel-îş), Fevzî Paydaş, Zekî Atsiz, Kazim Budak, Mehmet Yokuş, Mehdî Zana, Wezîr Perîşan, Xidir Tek, aydin Hasar, Mesud Baştıırk uyd. Hin dilxwazîn ku ji bajarên derva erebe girtîbûn, hatîbûn mîtîngê jî ji ber helwesta gruba Rîya Azadî beşdarî mîtîngê ne bûn.

Di hejmara 11 an ya kovara Ozgurluk Yolu, li ser vê bûyerê bi navê *"Goşîzmê"* nivîsek weşand. Di nivîsê de li ser goşîzmê şirovek dihat kirin û mîtîng wek bûyerek goşîstan hatîbû, nav kirin. Wê nivîsa bêwext û ne rast diwarên sar da navbera me û welatparêzên din. Xasima em û hevalên Devrimcî Demoqrat (Demoqratên Şoreşger) anîne himberî hev.

Him li Dîyarbekir him jî li Kurdistanê hêjmara firotina kovara Rîya Azadî daket. Gelek hevalên Rîya Azadî çûn bûn hevalê DD....Kevneşopîyek usa hate holê ku hevalên DD bi wê sloganê ve dihatine nasîn. Lê hevalên Rîya Azadî jî xwe ewqas jê dûr digirtin. Te digot di navbera wan de ew slogan bûye prensîba herî sereke.

Ji metrepolên Tirkîyê şirovekirina Kurdistanê, şaşitîya Kovara Rîya azadî bi xwe bû. Em çawa ku Cemîyeta Tealî ya Kurt bi neçûyîna wan a Kurdistanê rexnedikin. Ev jî eynî xeta bû. Ji durva qontrolkirina nabza Kurdistanê pir caran rast encam ne dida. Ew nivîsa jî yek nivîsek usa bû.

* * *

Min bilêtek ji ereba Erzinganê girt û ber bi Dêrsimê rêketim. Saet 22.00 şevê li Dêrsimê, li ber daîra Ormanyê ji erebê peya bûm.

Mala mamaoste Hesen Akbayin li vî alî çemê Minzûr e, min dixwest mamoste Hesen bibînim. Lê ew ne li mal bû, hîn ji bajar nehatî bû, Ber bi pirê, pire ya ser çemê Minzûr, cîhê ku Minzûr xwe digîşîne çemê Harçîkê ber bi bajar meşîyam, raste ereba midûrê dibistana ziraetê hatim.

Me dizanî ku ew midûr sîxur e û têlsiza xwe heye. Ji xwe li Dêrsimê hemû karmendan karê xwe ya yekem, sîxurî bû.

Gumana min hebû ku midûr bi têlsizê xeberê bide komsêr Yaşar û Reco, ji ber ku têkilîyên wan hebûn. Ew jî bên li ser pire min bigirin. Gumana min rast derket, min hîn pire nîvî nekirîbû ku erebekê ajote ser min, min bazda ji ber erebê xilas bûm, erebê ne dikarî li ser pire bizivire, lazim bu pire derbazke û li pêş bizivir e.

Min rîya xwe domand, pire xilas kir li çata rîya Erzinganê berê xwe da navenda Dêrsimê, ereba polês jî zivirî hat li alî rastê sekinî. Min ji ronîya lambên erebê polês naskirin, komsêrên ku ez li bendê bûm ew in.

Lê ji himber va sîluetek derket ber bi me tê, polês xwe giran kir, kesê ku hat bi navê Şukrî xortekî Dêrsimî bû. Şukrî di lîstika fotbolê de di kelê de dilîst. Mala xwe li nêzî cemevî ya nû bû ew diçû mala xwe. Bi saya wî polêsan ez negirtim û ereba dane şuxilandin çûn, lê min dizanî piştî ku Şukrî talde bû ew dîsa li min vegerin.

Min li Dîyarbekir ji weşanên çep pirtûkek girtîbû, ew avit û ji rîya erebê derketim û berjora nêzî Tepebaşîyê bi bez helkişîm çûm jor. Min sîng xilas kir li wir sekinîm bîna xwe bigirim. Min dît erebe zivirî hat li cîhekî sekinî, polês ji erebê derketin, li min digerin, min li jorê bang kir, min got ez li vir im vir, werin vir...

Çûm li restoranta Minzûr rûniştim benda wan im, ew bên, lê kes ne hat. Min dixwest ew li ber çavê hin kesan min bigirin û em failî meçul ne bin.

Rabûm çûm qluba ticcaran gelek nas û havalên mamoste hîn li wir rûniştî ne. Piştî ku min qala macera şevê kir midûrê lîsê hevalê delal Heyder Dizgun ji min ra hêrs bû. Min çawa şaşitîyek usa kirîye û wê saetê ji wir peya hatime.

Heyder nehişt wê şevê li pansîyonê bimînim û ez birim mala xwe. Sibê de rabûm çûm cem dozger ji ber bûyerên ber derê wîlayetê îfadê min girt ez hatim. Piştî nîvro em li pansîyonê ne, yekî bi nazik li derî xist hat, komsêr Reco ye. Bi roleki sexte kibarîyê dike;

-Kazim Beg divê em heya dozger herin.

-Min got va çi kibarîye, hûn şev me difitilînin, roj jî em dibin beg. Ez çûm ba dozger hatim.

Kaxiza di dest dabû, dirêjî min kir, min îmza kir û ew çû.

Dozger Kurdekî demoqrat e, li gorî îstixbarata polês îfadê min girt.

Lê di dosyayê de du nameyên xwendevanan jî hebû. Xwendevanan gorî daxwazîya polêsan gelek tişt gotibûn.

Wan jî di nama xwe de îddia dikir ku ez şev terim mala xwendevanan, semîneran çêdikim, ser pirsa Kurd bi wan ra dipeyîvim, banta muzîga Kurdî guhdarî dikin. Uyd. Herdu jî xwendevanên min bûn û min ew rind nas dikirin.

Yek di sinifa 4 an de, yek jî di sinifa 6 an dabû. Xwendevanê sinifa 6 an, Alî li pansîyonê dima, ango leylî bû. Piştî boykotek dirêj ya çar rojan, pansîyon hat girtin xwendevanên pansîyonê hatin belav kirin. Alî jî şandin Agrîyê. Demikê şûnda Alî ji pêşketinan bê xeber ji min ra namek xweşik! şand, dixwest ku ez hevalên Rîya Azadî yên Agrîyê ra name binivîsim ew li Alî xwedî derkevin. Li Agrîyê gelek dilxwazên tevgera Rîya Azadî hebû. Min agahî gîyand hevalê wê derê, ku bi navê Alî bê qalîtyek li wir xwendevane, ne layiqî tu tiştîye.

Dawîya boyqotê xwendevan hatin dibistanê, lê hin grub nahêlin xwendevan bikevin hindur ew dixwazin boyqot bidome. Me hemû mamostan hewl da wan qane bikin. Me ew qane kirin ku, eger çend rojên din jî boykot dom bike, hemû xwendevan dê ji bê dewamîyê sal wenda bikin, dawîyê ew qane bûn û boykot qedandin.

***

Dawîya sala perwerdê, wezearetê, piranîya mamosteyên pêşverû û welatparêz ji lîsa Dersimê hatin sirgûn kirin.

Tayîna min jî derketibû Erzorimê. Piştî dibistan hatin girtin divîya bû ez bi çûma Erzorimê.

Erzorim bajarekî Kurdistanê ye lê partîya faşîst li wir xwedî hêzek xurt e. Kesên welatparêz, pêşverû li wî bajarî xwedî bîranînên nebaş in.

Xortek bi navê Mistefa di tib a Erzorimê de xwendevan bû. Bona cinazê hevalê xwe ya ku ji teref faşistan ve hatîbû kuştin bigirin, ew tevî grubek hevalê xwe çûbû nexwaşxanê, faşîstan bi kêrê çavikî wî anî bûn der. Salêkê şûnda Mistefê neqil kir hate zanîngeha Dîyarbekirê, me li wir hevûdû naskir.

Ez difikirîm, herim an nerim Erzorimê, di wê demê de ji şaredarîya Dîyarbekir alîkarê şaredar Mehmet Yokuş û Kemal Ezber ji min re telefon kirin ez herim li şaredarîya Dîyarbekirê, wek Midûrê Îqtisadê bişixulim. Bi vê banga wan, min biryar da, dev jê mamostetîyê berdim û herim Dîyarbekir.

Di dawîya meha Hezîranê de li Lîsa Hunerê a Keçan a Dêrsimê azmuna xwendewanan hebû. Di dibîstana wan de mamoste kêm bûn ew wazîfe dabûn min. Ez di sinifê dabûm, min azmun çêdikir. Midûra dibîstanê Zekîye Erkanli hat xeber da min ku du mufettîş ji Enqerê hatine di oda wê de rûniştine û dixwazin min bibînin. Saet dora 17.00 an karê min qedîya, ez çûm oda ku muffetîş lê rûniştîne. Xwendevan û mamostên din hemû çûn mal, em sê kes tenê li wir in.

Ji muffetîşan yek navsal e, yê din jî gelek ciwan e. Ciwan bi şiklê simbêl û tîpê xwe nîjadparêstîya xwe dide dest. Meriv hîs dike ku ew du kes xasima ji bona Dêrsimê hatine bijartin û şandin.

Yê xort bê sebir got:"Em berê çûn Lîsê, lê bona ku tu li vir î em hatin vir. Ew çi hale lise têda ye, hemû diwarên lîsê bi sloxanên komunîstî û yên cudaperestîyê ve hatiye dagirtin. Meriv dibêje hela lîse ji alî leşkerê bîyanî ve hatîye dagir kirin."

Xuya bû ew bi enformasyonên xirab ve hatibûn pîj kirin. Min di serê xwe de mihasebek kir, xwedî fikir û raman im, mamostetîyê jî nekim, 32 salî me, azeb im, ji her rewşê ra amade me. Êdî çima ji wana ra stuyê xwe bitewînim. Min biryara xwe da bi wêrekî bersîva wan bidim û ji wana re serî daneynim. Min got, *"Em jî usa difikirin, dibêjin welatê me ji alî hêzên kolonyalîst ve hatîye dagir kirin uyd ziman, çand û dîroka me hatîye qedexe kirin. Dewlemendîya sererd û binerd a welatê me tê talankirin. Dibistanên we, qereqol û mehkemên we bona pêşî li pêşketina me ye (... )"*

Yê kal daktîlo li ber xwe rast kir bi zimanekî xapînok *"başe mamostê min em vana binivîsin."*

Min got,*"Dixwazî tu binivîse lê ez îmze nakim."*

Wan kir, min kir, min got na û qebul ne kir. Mecbûr man, gotin baş e, em nanivîsin tenê bipeyîvin. Piştî saetikê em bi hev re derketin. Li ber derî gotin tu me nabî em bi hev ra çayekê vexwin.

Min jî got *"li Dêrsimê bi merivên mîna wek we re ger bê şerefîye"* û min xatir ji nexwast û ez ji wan veqetîyam. Min roja din bawula xwe girt û berê xwe da Dîyarbekirê. 30 Hezîran 1976 de ji ber şertên sîyasî min dev ji mamostetîyê berda li şaredarîya Dîyarbekir bûm midûrê îqtisadê.

Meha pêşin wek karker, di 11.08.1976 de jî wek midûrê îqtisadê dest bi kar kir û namek ji wezerata perwerdê ra rêkir û ji mamostetîyê veqetîyam. Di nama xwe de hikûmata Cepha Nîjatperest (MC ) hişkayî rexne kir. Min di dawîya nama xwe de nivîsî ku "*... rojê li her koşekî pêşverûyek, welatparêzek tê kuştin. Hikûmata faşîst li bûyeran temaşe dike. Di vê rewşa han de memurtî kirin ji hikûmata we û rejîma faşîst re payande bûn e.*

*Ji ber vê yekê ez naxwazim ji hukometa faşîst ra bibim alîkar û ji mamostetîyê îstifa dikim, bila îstifa min bê pejirandin."*

Piştî vê namê wezerat har û dîn bû pê min ket. Koma midûran a giştî biryar girtîn ku: " ... *îstifa Kazim Budak hatîye pejirandin û eger rojekê ew bixwaze vegere mamostetîyê, mamostetîyê nedinê û ev êdî nikare mamostetîyê bike."*

Min ew biryar bi rîya parêzerên TOB-DER ê bir Daniştayê lê Daniştayê jî biryara wezaretê di cîda dît û ew erê kir.

Salekê şunda hevalekî mamoste, di wezereta perwerdê li midûrîyeta navîn de navê midûrê hiquqê, parêzger, sosyaldemoqrat, da min, got: "*Gulay Xanim sosyaldemoqrat e, ew dikare ji te ra alîkar be."* Ez çûm ba Gûlay Xanim ê, wê dosya min da anîn, kontrol kir got:"*di dosya te de kurtcîtî nivîsîne, zahmete, hikûmata MC tayîna te dernaxine."*

Demek şûnda serokê Partîya Komara Gel "*CHP*"ê partîya sosyaldemoqrat, Ecevît hikumat damezrand ew Gulay xanima sosyaldemoqrat (!) vê carê, bû midûrê beşa ku dosya min li ye.

Ez carek din çûm ba wê, min pirsa xwe bîra wê xist, canikê dosya da anîn, lê mêze kir vê cara jî li ser navê xwe bi bersivek bênekis, bi biryar got; "*na ez çênakim, te cudaxwazî kirîye" min baştir fêm kir, ku tenê navê partîya wan cuda ye, di pirsa Kurd de fikir û zîkira wan hemûyan yek e. " Kuçik kuçike, çi reş çi sipî..."*

Mebesta min ne vegera mamostetîyê bû, min dixwest biryara midûran biçirînim.

Wezareta perwerdê namê li ser namê, ji min ra bi rê dike, ew iddîa dikin, ku min, "*kîsê dewletê xwendîye û qasî ku qanun dixwaze ez memurtîyê bikim, min ew nekirîye, levma jî ez dêndarê dewletê me, divê ez çend hezar pere bidim dewletê."*

Min bi namekê ew bersivandin ku, "*li gorî destûrê bedêlê sê salan leylî xwendinê 4 sal û nîv memurtî ji min dihate xwestin, lê min şeş sal di qisma navîn de mamostetî kirîbu"* dengê wan hat birîn. Min pere neda lê piştî derba faşîst a 12 Îlona 1980 an ez derketim dervayî welat, ew pere bi ne heqî ji bavê min girtin.

Sala 2004 an de ku ez vegerîyam, bi rîya hevalên xwe yên qedîm ya li Dîyarbekir min tayîn derxist Qeyserîyê û şeş mehan şûnda jî teqawîd bûm.

**Sibat 1977an de li Dîyarbekirê dijî faşîzmê xwepêşandan**

Wek navenda TOB-DER, TUM-DER û hin komelên din ên demokratîk li hin bajaran, wek; Mersîn, Denizlî, Dîyarbekir, Bursa, Gîresun û hin bajarên din biryara xwepêşandanan hatîbû girtin.

Sibat 1977 an de li Dîyarbekirê jî li dijî zordarîya hikûmatê bi rîya baskê komelên ku me li jor navê wan nivisî xwepêşandinek pêkanîn. Bona ku di xwepêşandanê de grub xwedî giranî bibin, hêzê xwe yê herêmî li Dîyarbekir civandin ser hev.

Girse ya gel li navenda îstasyonê kom bibû. Pir cure flama û sloganên ku li ser karton û cawan hatibûn nivîsîn di destê xwepêşandanan de mîna alekê bûn.

Ji bo xwepêşandanê eleqeyek balkêş hebû. Komelên navendî yên ji bona xwepêşandanê destûr girtîbûn, di qontrol û rêvabirina xwepêşandanê de jî ew xwedî maf bûn. Ji bona ku Maoyî li hin bajaran bibûn sedemê hin alozîyan, qomîta rêvabir ne dixwest ew di xwepêşandanê de cî bigirin.

Maoyî ji ber dîtin, slogan û xebatên xwe yên çewt ji grubên din hatîbûn tecrît kirin. Hêzên li dijî Maoîyan bona ku ne hêlin ew tevî refê gel bin û bimeşin li himber wan diwar çêkirin. Maoîyan bi êrîş xwestin dîwar rakin û bimeşin, lê usa ne bû, şer derket. Gruban li himber hev ew duxdarên ku pê slogan û flama rakirîbûn, wek amorekî şer bi karanîn.

Lê mixabin gruban li himber hev çek jî bi kar anîn. Qasî ku tê bîra min tenê ji gruba Maoîyan yek xortekî[40] Dêrsimî ji destê xwe birîndar bubû.

Grubên Maoyî, bo xwepêşandanê ji gelek der û doran hatibûn, lê li gorî girse ya gel grubek piçûk bû. Dawîyê Maoyîyan nekarîn di xwepêşandanê de cî bigirin û belav bûn.

Meşê ji Îstasyonê dest pêkir, Ofîs, kolana Qesaban, kolana Elazîzê hat navenda Derê Çîyê. Di meşê de girse ya gel maf û daxwazên xwe yên demoqratîk û ekonomîk anîn ziman û faşîzm protesto kir.

---

[40]Di rojên hatîda li ser bîrîndarîya wî kesî hin pêşketin çêbûn. Mehan şûnda gundîyêkî min mifettîş C. Şahîn bi rîya bavê min ji min ra agahîyek şandî bû. Ez hay ji xwe hebim.
Pêşta, min tu mane ne da wê balkişandina wan. Dûra pirs ronîtir bû. Maoîyên ku ji Dêrsimê hatîbûn xwepêşandina Dîyarbekirê, xasima provakatorekî bi navê Hesênê Entebî, îddia kirîye ku hevalê wan min birîndar kirîye.

Gruba Maoîyan li gundê Basu yê civînek çêkirine û ji bona tolgirtinê biryar girtine. Kesên ku di hedefa wan da ye jî ez im. Gundîyê min mufettîş C.Şahîn wê rojê li wir bûye û haya xwe ji biryarê çê dibe. Nîvrojekê li lokala TÖB-DER ê rûdinîştim, xortekî xwe nêzikî min kir, got ew ji Dêrsimî ye û xwestîye min nas bike. Li cem me rûnişt, piçikê me sohbet kir, demekê şûnda ez çûm karê xwe. Ew xort jî dû min tê cîhê karê min, li wir min wenda dike, ji hindikan, dipirse, hevalên li wê derê ji hereketin wî dikevine şikê, wî ji wê derdixinin dibine derva. Zekî Atsiz û Bozan Erdem vê ra dipeyîvin.

Dema ku ew bi hev ra hatine loqala TOB-DER ê saet dora 20-21 ê şevê bû.

Li ruyê xort reng ne ma bû. Bi kelecan xwe nêzikî min kir got "*hevalan ez pir tirsandim.*" Ji tirsan diricifîya. Dîsa dixwast pişta xwe bide min, ji min alîkarî dixwest. Çimkû li wê derê yê herî nêzik dîsa ez didîtim. Ew birayê xortê birîndar bû. Hevalan li ser şeşagirek çardehxur dîtîbûn. Bona pêkanîna biryara ciwîna Basuyê ew hatîye hilbijartin. ''*Piştî ku em naskirine dev ji jî tolgirtinê berda ye.*'' Min ew qane kir ku, nekeve nava fikaran, tu zerar wê neyê wî.

Bi enformasyonên vir xapandina xwe qebûl dikir û poşmanîya xwe dianî ziman. Ji me xwest ku heger em bikarin şeşagira wî bifiroşin ew kêfxweş be û dev ji karên usa jî berde. Dora roja din Emekçî Tahîr şeşagira wî firot û perê wî danê û ew şande bajarê wî.

**Komcivîna TÖB-DERê ya liqê Dîyarbekirê**

Naveneda Komela Mamostên Tirkîyê TÖB-DER li Enqerê di 3 ê meha Îlonê sala 1971 hate damezrandin û sala 1980 de hate girtin. Lê salek berî girtinê, ji hêla îdara orfî de kilît li derî xistin û xebata komelê hat cemidandin.

Li Erxenîyê di sala 1971-72 an de ji bo damezrandina TÖB-DERê me çend mamostan wek damezerger hewl da, lê ji me mamosteyan hindek hatin sirgun kirin, li Erxenîyê damezrandina TÖB-DER ê bi ser neket.

Li Dîyarbekir mamoste bi navê Komela Mamostan di Komelekê de dihatin ba hev. Komelê bersiva pirsên civakî ya rojane ra derê xwe girtî bû, ji sîyasetê dûr disekinîya. Di vir de li ser pirsên polîtîk, semînerek an civînek çê nedibû. Tu xebat û hewldanek xwe ya kulturu û ekonomîk tune bû. Ew der mîna qehwexanekê bibû cîhê lîstikê. Halbûku di Tirkîyê û Kurdistanê de bûyerên mezin diqewimîyan. Mamostên ku divîya temsîla ronahî û pêşengîya civakê bikin, di komelê de bi lîstika îskambîlê xwe ditevizandin.

Li gorî demê ew rewş li mamostê Kurd, mamostên pêşverû û welatparêz ne dişikîya. Li ser gelê me dewleta dagirker zilm û zordarîyek neditî kardianî. Li hemû derê cîhanê ji bona mafê netewî û çandî berxwedan û tekoşîn he bû.

Lazim bû gora rojê momostên welatparêz û pêşverû jî xwe dîzayn bikira. Divîya rewşa heyî bihatana guhartin, lê yekitîya mamostan neyê parçe kirin û avahîya loqalê ya heyî jî ji dest neyê derxistin. Ji bona wê berê bi destxistina komîta karger me xebat kir. Di hilbijartina Komela Mamostan de xebata qadroyên welatparêz serket. Ez, Ganî Sungur, Cavît Ceylan, M.Kahraman û M.Yalçin bûn komîta karger. Piştî çend mehan şûnda me biryara kongra awarte girt û me Komele bir kongrê.

Bi xebat û awantajên komîta me di kongrê de biryar hate girtin û komela mamosteyan derbazî TÖB-DER ê bû. Navê Komela Mamostan bû TÖB-DER, lokal û hemû hebûna komelê jî me bi biryara kongrê dewrî TÖB-DER ê kir. Sal 1974 bû.

Hemû endamên komela berê, bûn endamê TÖB-DER ê. Fuat Marangoz bû serokê yekem a TÖB-DER ê liqê Dîyarbekir.

Di sala 1975 Sibatê min tayîn derxist çûm Lîsa Dêrsimê. Li wir TÖB-DER hatibû damezrandin. Li wir jî min di kar û xebatê TÖB-DER ê de cî girt.

Car din ku ez vegerîyam Dîyarbekirê, hejmar û qalîta endamên komelê gelek bilind bibû. Li Kurdistanê li gorî grubên polîtîk, sazî û komelên wan jî şikil girtibû. Di nava mamostan de jî gora hêzên sîyasî beşbûnek hebû.

Di hilbijartina TÖB-DER ê ya sala 1977 an de li Dîyarbekir em endam û dilxwazê PSKT ser navê gruba Rîya Azadî ketin hilbijartinê.

Di kongrê de gruban mafê axavtinê girtin û dîtinên xwe anîn ziman. Ser navê gruba Rîya Azadî maf û daxwazîyên aborî û meslegî (pîşeyî), dîtin û prensîbên polîtîk a grubê min anî ziman.

Di Kurdistanê de mixalefeta civakî gîhîştîye astek bilind. Di nava hêzên welatparêz de yekbûnek tunebe jî berxwedan û tekoşîna girse ji demên berê pir li pêş e.

Rojekê berî hilbijartinê, endam û dilxwazên partîya me hatin şîyar kirin ku kes bê bersîyarîyê neke û ne be sedemê provakasyonan.

Navên ku di lîsta komîta karger de cî girtîbûn ew bûn: Kazim Budak, M.Kemal Ok, Necmettîn Karakoç, Nazîf Saruhan û Sîracettîn Sari.

Atmosfera hilbijartinê ne baş e, tansîyon gelek bilind e. Hevalên Şoreşgerên Demoqrat (Devrimcî Demoqrat) naxwazin Komele ji destê wan derkeve.

Encamên hilbijartinan eşkere bû, bi piştgirîya Demoqratîk merkezîyetçi TSÎP û TKP ê lîsta me, gruba Rîya Azadî serket.

Hevalên ŞD encam hezim nekir, bi pêşengîya Vedat Aydin[41] grubek ji hevalên ŞD bi kufur êrîşî ser gruba Rîya Azadî kir. Du otobos polis jî derva benda şerê Kurda bûn.

Xasima hevalê Vedat Aydin hesinê soba komirê di dest de li hevalê Kenan Bulut û Mehmet Yokuş xist. Şer zêde mezin nebû hate sekinandin lê cam û pencirê loqalê, mase û sandelye hemû hatin şikandin.

Dora roja din komîta komelê civîya rojeva xwe tespît kir. Karê ku divîya lez bihata kirin guhartina cam û pençiran bû. Ji bo wî karî me 10 hezar lîra da.

Çend rojê din şûnda Vedat hatîbû li komelê rûdinişt. Kenan Bulut hate ba min û ji min pirsî.

-Ma ew ne Vedat e li wir rûniştîye?

Min got: - Belê, Wedat e.

-Lazime ew neyê vi ra.

Lê min Kenan[42] da rûniştin û qane kir ku her roj em nikarin şer bikin.

-Li Dîyarbekirê gelek welatparêz û pêşverû ne endam in, lê ew tên TÖB-DER ê, Vedat jî endamekî TÖB-DER ê ye. Em çawa dikarin nehêlin?

Vedat jî ji kirinên xwe poşman bû, em zêde nêzî hev bûn.

---

[41]Vedat piştî zindan û êşkencan li Dîyarbekirê bû serokê partîya (Halkin Emek Partîsî) Partîya Ked a Gel. Lê pir mixabin Wedat jî wek gelek evladên gelê Kurd ji alî hêzên dewletê ve hate şehîd kirin. Ew di 5 ê Tîrmeha 1991 an ji malê hate birin û 7 ê Tîrmehê da li bin pira Madenê da meyîtê wî hate dîtin.

[42] Kenan Bulut midûrê Lîsa Zîya Gokalp bû. Meriveki welatparêz, pêşverû, wêrek û mert bû. Ew ji xelkê Sîweregê bû. Kenan ji ber bîr û bawerîyên xwe sirguni gelek bajarên Tirkîyê hat kirin. Di sala 1980 ê da ser navê Demoqratên Şoreşger li bajarê Wanê bû namzetê Senatoyê.

Di erdhêja Muradîye de, tevî hevalê xwe Mehmed Aslan hat, paltoyê min ji min xwest girt û çû Muradîyê. Dora mehekê şûnde hat. Got:

-Welle me şelag-bar kişandin paltoyê te dêrs bû, wî bide min ez ji te ra yekî nû bikirim.

Min got:Na, ne lazime, tu çû li wir alîkarîya gelê me kir, spas ji bo xebat û berpirsîyarîya te. Kêfxwaşim ku palto kêrî te hatîye.

**Kuştina Endamê TOB-DER ê Şêxmus Hacıyusufoğlu**

Şêxmus Hacıyusufoğlu ji Hîlvanê bû û li wir mamoste bû. Lê ew ji ber bîrûbawerîyên xwe yên pêşverû ji karê xwe hatîbû dûrxistin. Şaredarê Dîyarbekir Okay Qalfagîl wek me gelek mamosteyan, Şeyhmus jî di Şaredarîya Dîyarbekirê de girtîbû kar. Ew di daîra zabita de wek amîrê zabitayan dixebitîya.

Şêxmus endamê TÖB-DER ê bû, ji ber wê jî him di şaredarêyê de him jî di xebatê TÖB-DER ê de em tim bi hev ra bûn. Têkilî û havaltîya me baş bû.

* * *

Xalê min Zilfî filma rontgenê ya pişikê di dest de hate TÖB-DER ê cem min. Ew ji ber nexwaşîya xwe ji Elmanya dihat. Li gorî wî li Elmanya ji ber ziman û rewşa maddî, zêde îmkan nedîbû ku ew tedawî bi be. Lewma hatîbû vir, wî xwestîye ew li welatê xwe, ji nexwaşîya xwe ra çare bibîne. Hema di loqala TOB-DER ê de Dr. Xalît Karakoyunlu çawa film girt destê xwe, got "Ew pir dereng ketîye." Dizîyan ji min ra navê nexwaşîyê jî got: qansêr. Rastî jî di filmê de pişika wî mina bendê girê hawîrdor bi kulan va hatîbû dagirtin.

Dora roja din Ruhî Koç bi ereba xwe em girtin ku herin nexwaşxanê. Li Derê Çîyê, rîya ber bi Fîsqaya, rîya ku diçe nexwaşxanê, me dî ku xebatkar û karkerên şaredarîyê û gel li hev kom bûye . Usa xûya dikir li wir bûyerek qewimîya bû. Me ji hin nasan pirsî ka çi qewimî ye? Wan dane zanîn ku faşîstan, ji avahîya himber, ji Dibistana Mamostan gule baran kirine Şêxmus Hacîyusufoxlu li ser kar hatîye kuştin. Dibistana Mamostan hîn jî di destê Faşîstan de bû. Êdî min nexwaşê xwe spart hevalê Ruhî û ez ji meyîtê hevalê xwe ra mijûl bûm. Me meyît rakir morga nexwaşxanê. Hevalên mamoste, komelên demoqratîk, mirovên welatparz û demoqrat hatin li ber derê nexwaşxanê kom bûn. Me amadekarî kir, cinaze bibin welatê wî Hîlvan ê.

Ji morgê me cinaze girt bi sloxanên,"*Bimre Faşîzm, Turkeş Kûçikê Reş, Qetil MC, MC Îstifa!, Kurda ra Azadî!, Bimre Emperyalîzm!, Bimre Qolonyalîzm Bijî Azadî!, Şêxmus namirin, Şehît Namirin!*". Protesto û xwepêşandinê dest pêkir. Endamên

TÖB-DER ê, hêzên pêşverû demoqrat û Şaredarê Dîyarbekir parêzer Okay Kalfagîl jî di nav de hemû xebatkarên şaredarîyê tevî meşê bûn.

Di meşê de bi têlsiza polês walî, Şaredar Okay Kalfagîl, alîkarê wî Kemal Ezber, Mehmet Yokûş û serokê TÖB-DER ê liqê Dîyarbekirê Kazim Budak (ez) dawetî wîlayetê dikir.

Em bi erebekê çûn, walî û midûrê ewlehîyê li cem hev bûn. Walî bi nazikî(!) sersaxî da me û vexwarinek sar îkramî me kir, lê wek protesto min îkrama wî red kir.

Walî dixwest cinaze bêdeng ji Dîyarbekirê bê şandin. Bi hin temî û sozdayîna *"girtina qetîlan!"* şûnda em ji cem wî derketin. Me xwe gihand meşê, pêşta me cinaze bir bexçê TÖB-DER ê li wir, rêzgirtin û axavtinek kin kir, ji wir jî me bir ber derê şaredarîyê. Li wê derê girsa gel zêde bû, min li wê derê jî naveroka xwe nêzikê nivîsa jêr axavtinek kir.

"Şêxmus mamoste bû, mamostê gelê xwe bû. Ji ber dîtin û bawerîyên xwe ev bû qilçixê çavê karbidestan. (.....)Rehetî nedan wî, ew ji mamostetîyê hat durxistin, neçar ma hate li şaredarîya Dîyarbekirê, bû amirê daîra zabita.(.......)Di kuştina wî de ne tenê kesê tetikkêş, karbidestên ku faşîstên Dibistana Mamostan diparêzin jî xwedî parin. Karbidestên ku ew ji maostetîyê durxistin, kesên ku xwîna gelê me dimijîn jî xwedî parin.(.......)

Gelê me ewladekî xwe yê welatparêz wendakir. Serê gelê me sax be. Serê malbata Şêxmûs sax be. Şehîd namirin..."

Ji şaredarîyê me otobosek girt û hin erebeyên xisusî jî tevê me cinaze bir Hîlvanê. Li Hîlwanê jî gelek kes beşdarî pêşwazîya cinaze bûn. Di nava gruban de reqabeta slogan û nîqaşan hebû. Lê bi hewldana dermanfiroş Fevzî Paydaş û bavê wî (şaredarê Hîlvanê) da pêşî li derketina astengîyan hat girtin.

Em şev dereng vegerîyan Dîyarbekir, lê min rewşa xalê xwe jî mereq dikir. Çend rojan şûnda piştî hin tehlîlan ji me ra gotin ku nexwaşîya wî qansêr-şêrpençe ye û sê mehan jîyana xwe maye. Bê ku nexwaşîya wî jî wî ra bêjim, min ew ji nexwaşxanê derxist anî mala xwe. Ez li taxa rezan li malek bi bexçe û piçûk dimam. Çend rojan ew li wir ma. Piştî ku piçek teqat hatîyê dîsa bi taksîya Ruhî Koç tevî Fevzî Paydaş, Kemal Ezber, me xalê min bir Dêrsimê gûndê wî Kotaricê.

Xalê min dixwast vê têkilî û nêzikîya hevalan bê bersiv nehêle. Wekî tê zanîn xwarina goşt di nava Kurda de xwedî qîmet e. Li gundan yên aborîya xwe li cîne, mîvanên xwe yê bi rûmet ra pez serjêdikin. Xalê min jî usa kir. Lawê xwe bi lez şand, ji nava pez berxek anîn da, ser jê kirin û bi kêfxweşî em ezimandin.

Şev me li Haysivê cem me derbaz kir. Dayîk û bavê min bi dîtina me kêfxweş bûn. Dora roja din min heval birin ber çemê me, li gola Sêgirdîn[43] em ketin avê, me avjenî kir. Piştî çend saetan em ji çêm birçî vegerîn, heval difikirîn ka ew çi bixwin. Lê bavê min jî ji me ra berxek serjêkirîbû. Dayîka min, goşt qelandîbû, sawar û hin xwarinên din jî ber çêkirîbû ango xwarin li benda me bû. Dayik û bavê min jî tevî me, dixwazin heta Pira Seyîdan bên, ji wir jî herin Kotarîcî dîtina xalê min. Em hemû bi hev ra, peyatî heta gundê Karêçûn, bo ku rê tune, do me erebe li vir hiştî bû. Dê û bavê min li Korpîyê erebek girtin, çûn Kotarîcî, me jî berê xwe da Dîyarbekirê. Di nava rojên ku doxtoran jê ra birîbûn xalê min çû ser dilovanîya xwe. Ez li gund bûm, agahîya mirinê ku hat min dîya xwe jî girt, em hev ra çûn ser cinaze û me ew spart axê.

**Zewaca min**

Min û hevala min Nazliyê li Dêrsimê hevûdu naskir. Wekî min li jorê gotîbû, ez li Lîsê, Nazli ji di Lîsa Keçan de mamoste bû. Lê min îstifa kir hatim şaredarîya Dîyarbekirê, ew li Dêrsimê ma. Piştî ku me biryar da em bizewicin me dê û bavê xwe agahdar kir. Her çiqas ez serokê TÖB-DER ê bûm û salona TÖB-DER ê ji bo me bê pere bû jî, em her dû bi hev ra gîhaştin wê encamê ku, dawet ne lazim e. Şevekê Dîyarbekir li bexçê mala me de tevî grubek heval, bi şahîyek mutewazî Kenan Bulut gustîl xist tilî yê me. Kenan di peyva xwe de aşkere got ew bi alîkarîya min, bi Kurdbûna xwe şîyar bûye. Bi kurti ji bo min tiştên şanazîyê anî ziman.

Ruhî Koç, Fewzî Paydaş, Kemal Ezber, Ganî Cansever, Şahîn birayê Nazlîyê, xwîşka min Husnîye û brayên min Dîyar jî amade bûn. Bona ku Mehdî Zana namzetê şaredarîyê bû. Her gav xebat dihat kirin, dîsa jî wext dît, tevî grubek haval hat beşdar bû.

Ganî Cansever bi helbestên kurdî cîvîn xweş kir. Ji bo nîkaha lez hin formalîte lazim bûn, em pêk bînin. Di vê navberê de rîya me çû, ba qadiyek jin. Wexta ku qadîyê, kaxiza di dest de navê min xwend vegerî got,*"Kazim Budak di binê her kevirîkî de tu derdikevî..."*

Min got,*"Hakîme xanim di binê keviran de karê min tune, ez li ortê me, serokê TÖB-DER ê me û nuha jî dixwazim bizewicim."*

Kaxiz îmze kir da min û ez derketim. Xûya bû ku polês propaxanda dijî min gîhandîbû hakîme xanimê jî.

Hefteke ji roja nîşanê şunda, ez xwîşka min Husnîye û brayê min Dîyar me erebek girt û em çûn Çolîgê.

---

[43] Di havîna sala 2014 da baraja Gundê Teteran ava bû, pêşî li avê hate girtin. Nuha ew gol neman hemû bûne behrek tarî.

Wê şevê hevalên me yên DHKD ê û TÖB-DER ê hatin mala bavê Nazlîyê me hev ra xwarin xwar.

Heta derengî şevê sohbet û şahî kir, dora roja din tevî Nazli û hin hevalên din em vegerîyan Dîyarbekirê.

Mala min li himber Yek Derî (*Tek Kapi*), nêzî Sosyal Sîgortayê apartimana Yunus Emre, qatê 7an de bû.

Me çente û barên xwe avit malê, min ji Nazlîyê îzîn xwest herim buroya ku bona hilbijartinê hatîbû kirê kirin, hevalan bibînim û bêm.

Saet 20.00ê şevê bû, lê gelek heval li wir kom bibûn. Kifş bû ku problemek hebû. Ez jî rûniştim, ji pirsê agahdar bûm. Li lîsa Zîya Gokalpê gruba Şoreşgerên Demoqrat (ŞD) nehiştine hevalên Rîya Azadî rojnama Roja Welat belav bikin û di nava wan de şer derketîye. Nuha jî ser pirsê dipeyîvin ku ew çibikin. Nîqaşê dirêj kir, her yek tiştekî dibêje nagîhîjin hev. Endamên DHKDê dixwastin şûn ve gav neyê avitin, Roja Welat bê belav kirin, lê hevalên din ev yeka şaş didîtin û li himber derdiketin. Guftugohan dom kir, ez jî ketim nava nîqaşê û min mal û Nazlî bîra kir. Dîtina min jî belavkirina rojnamê bû. Dawîyê min pêşniyar kir ku, sibê saet 8an de em hemû heval li komelê bin û rojnamê belavkin.

Hevalê Yokuş li himber dîtina min dîsa bi tedvîr got:

-Ma li vir provkasîyonek çêbe û kesik bê kuştin, berpirsîyarîya wî kî digire ser xwe?

Min ew pirsa wî bi gotina, "*Ez tenê berpirsîyarîya xwe digirim ser xwe, her endam mesûlê xwe ye.*" Hevalên DHKDê ji encamê kêfxweş bûn.

Em belav bûn, çûm mal, saet 24.00 û şevê ye. Nîv saeta min bibû çar saet. Nazli gelek bê huzur bibû. Wê ne cîranek nas dikir, ne jî bajar nas dikir.

Lê ez jî piştî ku difikirim şaşitîyek gelek mezin. Ew serborîya her tim romana Yaşar Kemal a çîroka *Xezela Sorbelek*[44] tîne bîra min. Di wê de jî Alîyê zava, bûkê di paş perîyê de dihêle bi du dengê xezalê tere çiyê, carek din jî venagere mal.

Dora roja din cî û wexta ku me belû kirîbû, hemû heval hatin rojname belav kirin. Hevalên DŞ re hate peyvandin problem çareser bû.

**Şeva piştgirîya gelê Kûba û Filistînê**

Em wek komîta TOB-DER ê bi navê Kurd û Kurdistanê nikarin şev an jî civînan çêkin. Ji ber wê em li hindik rêyan digerin. Bo ku bal nekişîne em navê şevê,"Şeva piştgirîya Gelê Filistînê" an jî "Şeva Piştgirîya Gelê Kubayê" datînin, lê di naverokê de em cîhê pir didin doza Kurd.

[44] Ew çîrok Yaşar Kemal ji destana gelê Kurd Sîyabend û Xecê ilham girtîye û nivisiye.

Wê wextê ji bona çêkirina şevê, civîn, xwepêşandin an jî belavkirina belavokê lazim bû ji cîhê fermî îzîn bihata girtin.

Me komîta TÖB-DER ê biryar girt, bê îzîn, bê ku polês agahdar bikin, şevekê "Şeva piştgirîya Gelê Filistînê" li darxinin.

Di şevê de granî bi zimanê Kurdî hat bi kar anîn. Koroya Rîya Azadî hemû stranên xwe bi Kurdî gotin. Cara yekem bû ku 200 kesê bejdar bi hev ra merşa netewî, ya Kurda "Ey Reqîb û Herine Pêş" gotin. Şevê di nava endam û gel de deng da.

Hin kesên ku partîya me wek,"çepê Tirkan"didît in, an jî propaxende dikirin ji ber rojeva şevê fedî kirin. Gelek hevalan dîtinên xwe yê li ser partîya me wê şevê test kirin.

Yêk ji wan jî rahmetîyê Wedat Aydin bû, di cîhê xwe de bi balkêşî proxram dişopand. Ji ber ku hilbijartina TÖB-DER ê de wexta ku hevalên DŞ şer derxistin, êrîşê ser me kirin bi slogana "çepê Tirkan bavêjên derva" bang dikirin.

Di şevê de polês bê kêys hatîbû zeftkirin. Dora roja din polêsan êrîşî ser komelê kirin, komîta rêvabir birine qereqol, xwestin îfadên me bigirin. Lê di destê wan de ji bo şeva ku hatîbû çêkirin tu belgeyek tune bû. Me jî gora daxwazîya xwe pirsên wan bersivandin.

Komsêr Bulentê qetîl[45] bi vê yeka qayîl ne bû. Wî emir da polêsê xwe li ser belavoka ku hefteke berê me belavkirîbû jî îfadê me bigire.

Komîta rêvabira komela TÖB-DER ê ji 5 kesan pêk dihat. Lê ji bo ku hemû endamên komîta karger ji ber her belavokê ceza negire, biryara her belavokê piranîya komîtê, me sê kesan tenê îmze dikir. Ew belavok jî sê kesan îmze kirîbû.

Polês ji min pirsî; di belavokê de hatîye nivisîn ku "ser erd û bin erdê welatê me ji alî dewleta qolonyalîst ve tê mijandin" hun dixwazin bêjin ku Emerîka Tirkîyê kirîye qolonîyê xwe û ew me dimije, ne usa?

Me hevalan piçikê li hev mêze kir, min got na, rastîya belavokê ev e; welatê me, Kurdistan, hatîye perçe kirin, perçek jî di binê îdara Tirkîyê de ye û Tirkîye welatê me dimije.

[45]Komser Bulent di 26 ê Mijdar a sala 1976 an da li Dîyarbekirê di êşkencê da bi navê Îsmaîl Gokhan Edge endamekî Dev-Genç THKP ê kuşt. Gelê Dîyarbekirê agahdar bû ku şoreşgerek hatîye kuştin, di pêşengîya sazîyên demoqratik da kişîya ber derê nexwaşxana Nimunê. Hezaran gel mil bi mil ji nexwaşxanê, ber bi derê Çîyê û ber bi Melik Ahmedê bi sloganên Qatîl MC, MC Îstifa, Kurdara Azadî, Ji Gelanra Azadî, Bimre Kolonyalîzm bijî Azadî, Bimre Emperyalîzm, Bimre kolonyalîzm, faşîzm û feodalîzm, Ji Qetîlan Hesav bê Pirsîn meşîya. Li Melîkehmedê bûyerek xirab qewimîya. Nunerên sazîyên xwendevanan li ser mînîbusê ji xîtabê girse gel dikirin. Serokê DYOKD (Komela Xwendekarên Dibistanên Bilind a Kulturê) Şefik Epozdemir û xwendevanekî ji fakulta TIP ê li hev nekirin û hevdu tandan, Şefik ji ser mînibusê ket erdê. Serê xwe li conta eraba nêzik parq kirî xist, giran birîndar bû. Du rojan şûnda Şefiq jî çû ser dilovanîya xwe. Wê demê wek kujirê Îsmaîl Edge komsêr Bulent dihat zanîn.

Lê tenê dixwazim tu naveroka belavokê bizanî, em naxwazin tu vana binivîsî. Polês belkê jî cara yekem ew tişt dibîhîst, soro moro bû, hin tiştên glover me go wî nîvîsî em derketin. Piştre, ji ber wê belavokê me sê hevalên ku îmze kirîbû her yekî sal û nîv ceza girt. Lê ji bona ku piştî 12ê Îlonê êz derketim dervayî welat min nekarî dêynê xwe bidim!

* * *

Rojên pir bi hereket û bi heyecan bûn. Di nava gruban de minaqeşe, reqabet şer kêm nedibû. Di komela TÖB-DER ê de grub, li kêmasî û li qelsîyên hev digerîyan. Rojekê du kesên ne nas hatî bûn li loqala TÖB-DER ê rûniştî bûn. Hin hevalan dane zanîn ku ew polês in. Wê demê li himberi polês û leşker em xwedî hukmî pêşin bûn. Me bawer nedikir ku di nava wan de jî pêşverû, welatparêz hebin. An jî zanîn û bawerîya me tune bû ku meriv dikare di nava wan de jî bixebite û ji xwe ra hevalan çêke. Hêzên me nû bûn, bê tecrube û kêm zanîn bûn. Gruban, bûyerên usa li himberî hev dikarîyan wek rexne bi karbînin, ango em ji bi rexna, *"bi polêsan re têkilîyên xwe hene"* ditirsîyan. Wek serokê komele ez nêzikî wan bûm, min ji wan pirsî, gelo ew kîne û çima hatine vir? Wexta ku gotin ew polêsin, min got, polês nikarên bêne komela me, gavekê zû vir biterikînin. yekî bi tinaz got, *"Em hatin, bona damezrandina POL-DER ê ji we alîkarî daxwaz bikin, lê tu me davêjî derva."*

Piştî wê gotinê min ji ber pirsa xwe fedî kir, ew girtin odekê, bang du hevalên din kir, ew jî hatin em bi hev ra rûniştin me çay vexwar û li ser daxwazîyên wan peyîvîn. Li ser destûr, rêbazê komelên demoqratîk hin materyal jî me dan wan ew rêvî kirin. Demekê şûnda wan TÖB-DER vexwendin kongra xwe ya yekemîn. Wek serokê TÖB-DER ê ez çûm kongra POL-DER ê a Dîyarbekir de amade bûm û min mesajek jî da wan.

Piştî 12 Îlonê mîna hemû hêzên pêşverû, welatparêz endam û karbidestên POL-DER ê jî gelek lêdan û êşkence dîtin. Qasî ku min se kir serokê POL-DER ê Husênê Dêrsimî jî di zîndana Dîyarbekirê de tevî girtîyên din êşkencên giran dîtîbû.

**1ê Gulana 1977an**

1 ê Gulanê roja piştgirtî û yekitîya karkerên cîhanê ye. Di sala 1891 an de di Enternasyonala 2em de 1 ê Gulanê wek roja berxwedan û yekitîya karkerên cîhanê hatîye pejirandin. Ji wê rojê vir de 1 ê Gûlanê li gelek welatên cîhanê li himber burjuvazîyê wek roja berxwedanê, roja cejna karkeran tê pîroz kirin. Li Tirkîyê kevneşopîya 1ê Gûlanê xwe dîgîjîne sala 1912. Encax piştî îlankirina cumhurîyetê û piştî hereketa Şêx Seîd bi destûrên nû ve qedexe kirina 1 ê Gulanê hatîye şidandin.

Lê hemû van zorbetîyan nekarîye, pêşîyê li tekoşîna çîna karkerên Kurdistan û Tirkîyê bigire. Piştî qedexeke dûrûdirêj cara pêşin di sala 1976 an de bi pêşengîya DÎSK ê li meydana Taxsîmê 1ê Gulanê wek cejna karkeran hat pîroz kirin. Ji ber vê coş û heyecanê burjuvazî kete nava tirs û xofek mezin.

Di sala 1977 an de jî dîsa bi pêşengîya DÎSK ê wexta ku kedkaran xwestin cejna xwe pîroz bikin, hêzên dest bi xwîn MÎT û Qontrgerîlla êrîş birin ser girsa gel û xwîn rijandin. 35 kes hat kuştin gelek kes jî birîndar bû. Girseya gel belavela dibe ew roj li Kurdistanê, *"1ê Gulana Xwînî"* hat bi nav kirin.

Dilxwazên tevgera me birayê min Dîyar ji di nav de, ji Dîyarbekir ji bo yekê gulanê bi otobosekê çûbûn Stenbol ê.

Ji ber ku di meşê de tevî Maoîyan hin problem derketîbû, grubên dijî Maoîyan ev cerîme kirin ser wan.

Bona wê jî bi Maoîyan ra li gelek cîyan pevçûn û alozî derket. Lê dûre derket holê, ku ew qetlîama Qontrgerîllayê pêk anî bû. Lê pêşverû û welatparêzan şunda gav navitin 1978 an de dîsa li Taksîmê kom bûn cejna 1 ê Gûlanê pîroz kirin. Ji Dîyarbekir dîsa em grubek bona pîrozbahîya 1 Gulana 1978 an çûn Stenbolê. Di bin flama DHKD, Rîya Azadî û Roja Welat de dora 5000 kesî meşîya.

Eqrebên ku li Îstenbolê bûn me hemû kom kirin, ser hev em 19 Budak tevî korteja Rîya Azadî meşîyan.

Di sala 1979 an de hikûmatê bajarên ku desthilata awarte (îdara orfî) lê danîbûn pîrozkirina 1`ê Gulanê hatibu qedexe kirin. Ji ber vê yekê karker û welatparêzên Kurdîstan 1 ê Gûlan a 1979 an li bajarê Betlîsê pîroz kir.

Zerûk Wakifahmetoglu rêvebirekî (Partîya Karkerê Kurdistan-Partîya Dr. Şivan) KÎP ê bû, ser navê partîya xwe ji me ra pêşniyarek anî. Pêşniyar ev bu, wan ji bona pîrozkirina 1 Gulan a 1979 li Betlîsê destûr girtî bûn, dixwastin tevî Partîya Sosyalîsta Kurdistana Tirkîyê PSKT pîroz kin.

Partîya me ew pêşniyar pejirand û me li Dîyarbekir dest bi amadekarîyan kir.

30 ê Avrîlê saet êvarê jin û mêr 2 otobos tujî ketin rê, herin Betlîsê. Lê li Seyrantepê polîs rîya wan birî, flamayên rengin, afîş, atlêt û kefîyên sor ên ku li ser xortan bûn dest dane ser û otobos vegerandin.

Me dî ku ji Seyrantepê derbaz bûn zahmet e, saet 22 an de me rêyek din ceriband. Vê carê otobos ji Derê Mêrdînê bi pira Dehçavî ra derbaz bûn di rîya Zanîngeha Diclê ve ket ser rîya Sîlvanê û ber bi Betlîsê rêketin.

Me polîs bypas kirîbû, haya xwe jê nebû. Wê rojê li Betlîsê tevahî nêzî pênc hezar kes meşîya. Meşa 1ê Gulana 1979 an him daxwazîya hevkarîyê û yekitîyê xurt kir him jî em grubên Kurda nêzî hev kirin.

Derba cunta faşîst a 12 Îlonê 1980 carek din 1`ê Gulanê qedexe kir. Ew sal li ser gelê Kurd bû destpêka peryoda zulm û zordestîyê. Cunta faşîst ji feqîrî, êşkencê û mirinê bêtir tişt nanî.

Burjuvazî û berdevikên wan helbesta demoqrasîyê dibêjin, lê ew demoqrasîya totik li ber çavan e. Di demoqrasîya heyî de mafê gelê Kurd cî nagire. Kurd bi navê xwe nikarin partî û sazîyên xwe damezrînin, bi zimanê Kurdî perwerde bin û qedera xwe bigirin destê xwe.

Îro jî li himber qolonyalîzmê tekoşîna gelê me berdewam e. Li Tirkîyê Avrîl 2008, 1 Gulan ê fermî wek cejn hat pejirandin.

**Komcivîna perwerda demoqratîk 4-11 Sibat 1978 de hat darxistin**

Di navbera 4 û11 Sibata 1978 an de li Enqerê ji alî Komela Mamosteyên Tirkîyê TÖB-DER ê Komcivîna Perwerde ya Demoqratîk hat li dar xistin.

Kesên ku di komîta karger de dixebitîyan û nunerên ku ji bajarên din hati bûn bijartin di ciwînê de amade bûn. Ji der va jî gelek nunerên partî û sazîyên demokratîk, polîtîkvan pispor û ronakbîr amade bûn.

Piştî axavitina serokê TÖB DER ê Gazî Gultekinoglu, serokê Federasyon a Sendîkqa Mamostanên Cîhanê (FÎSE), Daniel Retureau jî di komcivînê de axavitenek kir.

Nazîf Kalelî ser navê TÖB-DER a Bilanixê, Remezan Adiguzel ya Çolîgê, ez jî tevî du hevalên[46] din ser navê TÖB-DER a Dîyarbekirê başdarî komcivînê bûn. Di komcivînê de gelek mamoste û pispor li ser babetên cuda dîtin û nirînên xwe anîn ziman, daxûyanî hatin pêşkeş kirin û nîqaş kirin.

Nazîf jî li ser kolonyalîzmê û bandora wê ya li ser perwerdehîya koloniyan daxûyanîyek pêşkêş kir. Di daxûyanîyê de gelek mesaj hebûn, lê hin tişt vekirî ne hatîbûn navkirin. Wî dîrek nedikarî nav bide, bêje Kurdistan koloniye û li wir sîstema perwerdê a ha ye, di cîhê wê de dibêje *"Li welatên kolonyalîst perwerde aha dibe,* û uyd."

Helbet hin tişt vekirî nedihatin navkirin, çarçova gotûbêjan hebû. Ew sînor ji alî TÖB-DER ê ve jî dihate îşaretkirin. Ji ber ku gotina hin ditinên dervayî zagonê dikarîya bibûna sedema girtina komelê. Ew yeka jî tenê bi serê xwe berpirsîyarek bû.

Di rêvebirina navenda komelê de ango di komîta karger de kadroyên TSÎP û PSKT cî digirin. Herdu sîyasetên li ser kar bûn bi hassesîyetek nazik gav davitin û nedixwestin, bibin sedemê provakasîyonekê. Dadgehê dikarîya hin gotinan ji xwe

---

[46] Nunerên ku ji Dîyarbekirê çûn Komcivîna Perwerda Demoqratîk :Kazim Budak, Şevket Saner û Cumalî Eşsizoxlu bûn.

re bike sedem û komelê bigire. Ji ber vê hemû kesên ku diaxifîyan, bi berpirsîyarî tevdigerîyan, nedixwestin bibin sedemê girtina TÖB-DER ê û peyv û nivîsên xwe qontrol dikirin.

Piştî pêşkêşkirina daxuyanîya Nazîf, dor hat pêşniyar û rexnan. Nunerek ser zimanê daxuyanîyê sekinî û Nazîf bi tirsonekî û bi oportunîstîyê gunehkar kir.Nazîf bi zimanekî nerm û qerfok got *"Em çi bêjin. Donkîşot jî qehremanek e!"*Guhdaran ser vê gotinê ji Nazîf re çepik lêxistin. Ew heval jî ji Bilanixê (navê wî nayê bîra min) tevî Nazîf[47] weka delege hatîbû bijartin û ji gruba Rizgarîyê bû.

Komcivînê li ser mafê mamostan yên ekonomîk, yên sendîqayî, nîqaş kir û biryar girtin. Di komcivînê de sîstema perwerda burjuva şoven û kolonyalîst hate rexnekirin, perwerda demoqratîk û şoreşger hate pêşkêş kirin.

Dîsa di komciwînê de ji bona zextên li ser ronakbîr, medya pêşverû, xasima zextên li ser rojnama Kurdî, Roja Welat hatin protesto kirin û li himber van kirinên hikûmatê komcivînê piştgirîya xwe pêşkêş kir.

Li Tirkîyê ji bona hemû kesan perwerdeyek wekhev hate xwestin. Ji bo azadkirina kultur ji dîtin û ramanên şowenîst û ji polîtakayên kolonyalîst xebat hatin pêşkeş kirin.

Di fasil-civîna duyem de ser navê MMOB Oğuz Turkyılmaz *"Jı Bo Xebatên Sendiqayi Metodên Tekoşînê "* danezanek-teblîxek pêşkêş kir. Li ser teblîxê dîtinên gruba Rîya Azadî min ew dîtinên jêrin anî ziman.

**Kazim Budak[48] (nunirê Dîyarbekirê)**

1-*Civakên ku xwedî cuda çîn û tebeqe ne, sendîqa ji bona mafên ekonomîk û demoqratîk hacetin girîng in. Lakîn bona ku sendîqa bikarin xebata xwe de serkevin lazime rind organîze bin. Ji bona wê jî divê ew îdeolojîya karkeran ji xwe ra bikin rêber. Ew yeka di teblîxatê de natîye îşaretkirin.*

*Navnekirina van tiştan dikare bibe sedemên hin şaşitîyên din. Çimku, dewleta ku ji cure netewan pêk hatine, ji bo pek anîna yekitîya karkeran û damezrandina sendîqayên*

---

[47]Welatparêzên ji nifşê wî ji dewletê neheqîyên pir mezin dîtin. Hepis razan, êşkence û zulm, sirgûn bû para wan. Ew tişt bûne sermiya welatparêzên Kurd. Nazîf ji zilma dewlêtê zêde zêde para xwe girt. Avrîl 1980 da hate girtin. Dizîndana Diyarbekirê dabû mixatabê cure êşkence û zilmê. Di sala 1986 an da azad bu.

[48]Lê di pirtûkê da bi şaşitî navê Remezan Adigûzel di cêhê navê min da hatîye nivisîn. Hevalê Remezan ji di civînê da peyîvî lê ev gotin a min e. Ji xwe **Oğuz Turkyılmaz** jî di bersiva xwe da dibije,*"**Hevalê Kazim BUDAK** çend rexnên di cîda anîn ziman."* Sendîqa şoreşgerên nava sendîqan tu şik tune ku, dive di nava çîna karkeran da organize be û li gorî îlma çîna karkeran bixebite. Heger ku vê îfadê di teblîxê da cî negirtîye kêmasîye. "û wê şaşitîyê jî rast dike.

*xurt, divê li hember şovenîzmê nava karkerên netewa serdest de têkoşîn bê dayîn, û di rîya pêkanîna yekitîya karkeran de jî lazime rastî jî sendîqa demoqratîk bin.*

*Ji ber vê sedemê em slogana tenê, "Serxwebûn, di rîya demoqrasîyê de tekoşîndayînê" kêm dibînin, naecibînin. Ew bi şiklê serxwebûn, demoqrasî, aşitî û azadî bê formîle kirin.*

*2-"Encax lazime neyê birakirin ku, welatê serbixwe û demoqratîk, demoqrasîya gel a kedkaran hatîbe damezrandin, divê dervayî tora emperyalîzm û qapîtalîzmê be."ji vê nîşankirinê ra pêşniyara me heye. Jo bo ku welatek wek demoqratîk bê nasîn, divê maf û daxwazên demoqratîk yê netew û kêmnetewên wî welatî hatibin çareserkirin. Û ew maf û daxwaz li gorî pîvanên îdeolojîya karkeran, pratîkên demoqratik bêne cî anîn. Ji ber van sedeman gotina "demoqrasîya gel a ketkar" em napejirînin.*

*Welatekê demoqratîk, ew welate ku demoqrasîya gelên kedkar damezrandîye. Bi vê armancê, "helbet sendîqa bi çalakî û xebatên xwe piştgirîya tekoşîna dijî emparyajîzm û dijî faşîzmê dike." kêm dibînin; Divê di cîhê wê de"sendîqa arîkarîya tekoşîna dijî emperyalîzm, kapîtalîzim, faşîzm, feodalîzm, kolonyalîzm û dijî şovenîzmê dike." bê gotin.*

*3-Bi navê sernivîsa îşaretkirina "Di welatê me de organîzebûna xebatkaran" di cî de dibînin. Lakîn di welatên klonyalîst de bo ku keda karkeran erzan bê kirîn û ew wek depoya kedê bêne karanîn, li dervayî bajaran, organîzekirina wan deran paşve ye û bi zanetî paşve tê xistin. Bo ku ew yeka netîye dîtin, texlîlên derheqê organîzebûnê de kêmasî heye, divê ew lê bê zêdekirin.*

*4-Em piştgirîya tesbîtên ji bo "xebatên cîhêkar" dikin, ew di cîhê xwe dane.*

*Pêşniyara me ew e:Îdeolojîya nasyonalîst, netewperest nekine nava xebatkarên fabrîqa û cîhên kar de dixebitin û ew neyne jarkirin. Em li himber wan hemû kirinên îro ne. Divê em li himber ew fikrên netewperest, asîmîlasyonîst,şoven û çewsandî, di cîhê kar de têne kirin rawestin. Li gorî rêbazên îdeolojîya karkeran em bitekoşin. Ew pêşniyara me lê bê zêde kirin.*

**Oğuz Türkyilmaz (TMMOB):**

*Hevalino, ez jî dixwazim hin rexnên hevalan bibersivînim.*

*Hevalê* ***Kazim BUDAK*** *çend rexnên di cîda anîn ziman.*

*Sendîqa û şoreşgerên nava sendîqan tu şik tune ku, dive di nava çîna karkeran de organize be û li gorî îlma çîna karkeran bixebite. Eger ku vê îfadê di teblîxê de cî negirtîye kêmasîye.*

*Hevalan îşaret kirin, welatên mîna Tirkîyê ku pirsa netewî çareser nekirîye, demoqrasîya gel a, demoqrasîya gelên kedkar e.*

*Dîsa hevalan da zanîn, ku gerek di xebatên tevayî û gerek di xebatên di nava karkeran de têne kirin li himber netewperestî, şovenîstî û asîmîlasyonê rawestin wezîfekî*

*sereke ye. Ez jî piştgirîyê dikim. Lê di axavtinên heval de nixtên ku piştgirîyê nakim jî hene. Wî da zanîn ku ji bo serxwebûn, demoqrasî, aşitî, azadî serkeve xebat bêne kirin.*

*Min di axavitina xwe de serxwebûn, demoqrasî û sosyalîzm gotîbû. Prensîbên xebatên sendîqan antî faşîst, antî emperyalîst hatîbûn işaretkirin, lê hevalê me, dixwaze, antî kapîtalîzm û antî-feodalîzîm jî lê bê zêdekirin.*

*Me li Tirkîyê bê ku antî-kapîtalîst me antî-kolonyalîstî jî kirîbû ser, li Tirkîyê meriv li dijî kapîtalîzmê nebe, nikare li dijî emperyalîzmê be û rastî jî li Tirkîyê meriv antî-faşîstekî rasteqinî be, divê antî-kolonyalîst antî-feodal be.*

***Di fasil-civîna 3.em*** *bi serokatîya* ***Alî Bozkurt, Îbrahîm Aydînoglu û Ahmet Baran*** *ve hate rêvabirin.* ***Zekî Gûrsoy*** *li ser problemên Kedkarên Perwerdê ya Özlük û Meslegî danezanek pêşkêş kir. Lê nivîs serî heta binî bi gotina "Tirk" hatîbû dagirtin. Min mafê axavtinê girt û ew dîtinê jêrê anî ziman.*

*Hevalên Hêja,*

*Mamostên şoreşger yekem karê xwe ew e ku, di komcivîna Perwerda Demoqratîk de, polîtîka perwerda ya asîmîlekirinê rexne bike, wê polîtîkayê raxine ber çavan û ji bona çareserîyê pêşniyaran bike.*

*Lê em dîbînin ku heval, daxûyanîya xwe, bi hin gotinên ku şovenîzma netewê serdest tahrîk dike, wek gotinên "mamostê Tirk, perwerda Tirk" dagirtîye.*

*Ew yeka bi realîta Tirkîyê naşikê, çimku li Tirkîyê yên ku zimanê xwe yê dayîkê ne tirkî ne jî hene. Ew kavramên şaş in, heval ew bi şaşitî, an bi zanetî kar anîne?*

*Gotinên usa em protesto dikin, dixwazim ew ji daxuyanîyê bêne derxistin. Di cîhê wan de gotinên,"Mamostên Tirkîyê, sîstema perwerda Tirkîyê" bê bikaranîn.*

*Du, min ra Huseyîn Doruk, Yildiz Kurtuluş û Dûzgûn Kaya ji ew îfade şaş dîtin û rexne kirin.*

*Di fasil-civîna 10 an bi serokatîya Prof. Muammer Aksoy, Kazim Budak û Xelîl Uslu bi hev re civînek îdare kirin. Osman Nurî Kuçturk û Silêman Kaynak daxuyanîyên xwe pêşkêş kirin.*

1980 12 Îlonê de ku hukma faşîst a leşkerî dest da ser desthilatîyê wek gelek komelan, komela mamostan TÖB-DER jî hat girtin endam û rêvebirên wê hatine zîndan kirin. Axavtin û belgên komcivînê di du cîld pirtûk de hatîbû kom kirin. Navê pirtûkan Demokratik Egitim Kurultayi cild 1-2 bû.

Herdu cîld li ba min jî hebûn, lê piştî derba leşkerî avitin ser mala min tevî bavulek pirtûkên din ew jî birin.

Pirtûka ku li ser dewa Dev-Gençê baskê Enqerê hatîbû amade kirin dora 800-900 rûpelî bû.

Pirtuk ji îddîa û îfadan pêk dihat, dadgeha leşkerî ew çap kir û li kesên ku dihatin mehkemekirin belav kirin. Bona ku ez jî di wê dewa de hatim mehkeme kirin pirtûk dabûn min jî. Polês di mal sekirinê de ew jî bir.

**Li Tirkîyê hilbijartina parlementoyê (5ê Hezirana 1977an)**

Di sala 1977 an de li Tirkîyê hilbijartina Parlamenê çê bû. Berî hilbijartinê Kemal Burkay hat Dîyarbekirê. Li taxa Rezan di bêkarxana min û brayê min Dîyar de dima. Wê demê ew bi endamên partîyê re yekû yek li ser sedemên alîkarîya CHP ê peyîvî. Digot,"*Heke CHP bibe hikûmat, li ser me zor û teda kêm dibe, em Roja Welat û Rîya Azadî rehet derdixinin, him jî bi wî avayî pêşî li pêşketina hêzên faşîst tê girtin."*

Di wê hevdîtinê de min ji sekreter ra got ku ji xwe em bi zimanê ezop hin tiştan dinivîsin bingeh pir caran fêm jî nake, li himber propaxende û xebatên grubên din bingeh dihêje. Divê meriv hin tiştan vekirî binivîse kovar jî tê girtin bila bê girtin. Lê sekreter ew gotina min bîrnekir 10 salan şûnda ji li Elmanya civînek Komîta merkezî de derxist pêşberî min.

Partîya Karkerê Tirkîyê, TÎP jî diket hilbijartinan, li Dîyarbekir ji Tariq Zîya Ekînci namzetê wê partîyê bû. Ekînci weka şexis, weka malbat pêşverû û demoqrat bû.

Tariq Zîya hat TÖB-DER ê ji me alîkarî xwest, ez wê demê serokê TÖB-DER ê liqê Dîyarbekir bûm. Lê me jî wî ra got partî ya me biryar girtî ye dê ew alîkarîya Partî ya Komara Gel (CHP) bike.

Me wek partî piştgirîya tarik Zîya Ekîncî nekir, di cîhê wî de Partî ya Ecevît, CHP destek kir,ango; di Kurdistanê de xurtbûna CHP re gruba Rîya Azadî alîkarî kir.

Di hilbijartina Senato ya1980 de du hevalên ji Şoreşgerên Demoqrat, ku berê hevalê me bûn, Kenan Bulut û Ganî Sungur di lîsta TÎSP ê de bibûn berendam. Ji bona sedema,"*TÎSP li Kurdistanê xurt nebe*". Partîyê dîsa biryar girt ku,"*dengê xwe nede wan, bide welatparêzên serbixwe.*" Bûyer û pratîkên usa têkilî û bawerîyên nava hêzên welatparêz qels dikir ew jî hev dûr dixist in. Halbuku, du sê mehan berê jî di navbera Rîya Azadî, Şoreşgerên Demoqrat û Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistan de yekitî, UDG ê hatîbû damezrandin. Me dengê xwe neda berendamên Kurd. Di hilbijartina şaredarîyê de bona ku Şoreşgerên Demoqrat berendamê CHP parêzer Mehmet Yahyaoxlu destek kir me ew yeka şaş dit û ew rexne kir. Lê me jî vê carê, bi piştgirîya CHP ew şaşitîya dubare dikir. Eger ku şaş e, herdu polîtîka jî şaş in, eger raste, herdu polîtîka jî rast in. Di nava guruban de li himber hev hesûdîyek ber bi çav hebû. hemû grub jî, gurubî difikirîyan, piçûk difikirîyan menfaetên netewî bêtir ya grubî digirtin ber çavan.

* * *

Di hilbijartina 5 Heziran 1977 an Partîya Ecevît CHP ê gelek deng girt, ew bû partîya yekem, lê hikûmata ku danî nekarî ji parlamentoyê bawerî bigire.

Dîsa di binê serokatîya Demirel de, AP, MHP û MSP ê, sê partîyên kevneperest cara duyem hikûmata Cepha Nasyonalîst ava kirin.

Hilbijartina mahalî ya ku di 11 ê meha Çilê Pêşin a 1977 de çê bû, partîyên ser hukim xwîn wenda kirin, di nava şirîkan de problem derket û hikûmata MC ê ya duyem nekarî berxwe bide, îstifa kir.

Ecevît bi soza wezîrtîyê ji partîya Demirel, a (AP) Partîya Edlahî yê 11 parlamenter girtin hikûmat avakir û ew 11 kes jî kirin wezîr.

Şerafettîn Elçî jî yek ji wan 11 kesan bû, ew bû wezîrê Bayindirlixê.

Ser pirsa rojnamevanan wezîr Şerefettîn Elçî got:"Ez Kurdim û li Tirkîyê Kurd hene." Ew gotina wî li Kurdistanê deng da.

Di wê wext û rewşê de gotinek usa bi qîmet bû.

Demikê şûn de Şerafettîn Elçî wek wezîr hat Dîyarbekir, Şaredar Mehdî Zana li şaredarîyê zîyaret kir. Rojnaman semivîsên xwe "Êlçîyê Rojhilatê tê Dîyarbekir" nivisîn.

Şaredarîya kevn li himber Xana Hesen Paşa li kêleka Ulu camîyê bû. Şerafetîn li şaredarîya Dîyarbekirê xîtabi gel kir. Gelê Dîyarbekir pêşwazîyek germ nîşanî Şerafettîn Elçî da. Hatina wî ya Dîyarbekir di nava gel de kelecanek mezin çêkir. Ez jî wî wextê di Şaredarîyê de midûrê iqtisadê bûm.

Hêzên faşîst ku îktidar wenda kirin êrîş û provakasyonên xwe zêde kirin. Bi her cure propaxande û polîtîka dixwastin hikûmata Ecevît bihêrifînin. Meriv dikare bêje ku di dema Ecewît de li seranserê Tirkîyê, xasima li Kurdistanê rewşa sîyasî ji berê xirabtir bû. Kontrgerîlla ku wê demê pir nedihat zanîn hevsar girtîbû destê xwe tewî hêzên faşîst li her derê êrîşî kes û hêzên demoqrat, pêşverû dikir. Di zanîngeha Stenbolê de bombe hat teqandin 7 xwendevanan can da, kiryarê bûyerê nehatin girtin. Hêzên provakator li Mereşê jî pêşta bombe avitin camîyê û ev cereme kirin ser hêzên pêşverû û Kurdên Elewî. Di roja 24ê meha 12 an êrîş birin ser malên Kurdên elewî û pêşverû, ji sedî zêtir meriv kuştin.

26 Berçile sala 1978 serê sibê li Enqerê-Kizilayê nêzî buroya THY li restorana Pîknîkê min taştê dixwar û dûra jî bi teyerê diçûm Dîyarbekir.

Di tv.na restoranê de nişkeva li 10 bajarên Kurdistanê û Stenbol, Enqere û Edene jî di nav de nûça êlankirina îdara orfî hate dayîn. Li wan bajaran şubên komelên TÖB-DER, TÜM-DER, POL-DER, TÜS-DER, DHKD, DDKD jî hatin girtin.

Kovara Rîya Azadî û Rojnama Roja Welat jî di nav de gelek weşanxanên welatparêz û çep hatin girtin, dest dan ser pirtûkên wan.

Li Dîyarbekir wek komîta Partîyê em hatine ba hev, di rewşa nû de li ser wan paşketinan "em dikarin çi bikin?" rawestîyan.

**Di 11ê çileya pêşin 1977an de hilbijartinên şaredarîyê hatin çêkirin.**

Bê biryara partîyê Mehdî Zana ji bo şaredarîya Dîyarbekir berendametîya xwe eşkere kir.

Ji xwe Mehdî di dukana xwe ya ku têda çek diduran propaxanda zûda dabû destpêkirin.

Mehdî Zana endamê komîta merkezî ya Partîya Sosyalîsta Kurdistana Tirkîyê û serokê komîta Dîyarbekir bû. Danûstandina komîta merkezî navenda partîyê wî dadanî.

Em endam û dilxwazên partîyê ya wê herêmê dema ku ji daxwaz û xebata wî haydarbûn me jî piştgirîya wî kir. Lê me nedizanî ku di namzetbûna Mehdî Zana de biryara komîta navenda partîyê tune, ew bi însîyatîfa xwe bûye namzetê şaredarîya Dîyarbekirê. Lê berendamtîya Mehdî li gora şert û mercên bajar û îdeolojîya wê demê bû. Lewma jî em serkevtin.

Hosta û hevparê Mehdî Nîyazî Tatlici hin caran namzetîya wî di cî de nedidît ew rexne dikir. Bi henekî digot; *ez ê dengê xwe bidim, faşîstan nedim, Mehdî.*

Nîyazî hosta nexwaşê pençeşêr-qanserê bû, me heval û dostên wî di nava xwe de 40 hezar lîrê wê demê kom kir ji bo tedawîyê ew pê çû Çekoslowakyayê. Lê tu fêde nedît, berî ku hilbijartin çêbe, ew çû ser dilovanîya xwe. Piştî hilbijartinan hin heval çûn ser gora Nîyazî hosta bang kirin û gotin "Mehdî bû Şaredarê bajarê Dîyarbekir." Mehdî jina Nîyazî Hosta girt kar û li zarokên wî jî xwedî derket.

Di hilbijartinan de hemû endam û aligirên Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê xebat û fedekarîyên mezin kirin. Komela xortan a grêdayî yê Partîya Sosyalîst DHKD ê xebatên hêja kirin. Bajar bi afîş û suretên Mehdî Zana ve hat xemilandin, belavok li ser belavokan belavkirin, grubên xortan tax bi tax, mal bi mal gerîn û propaxende kirin. Di weşanên partîyê de bi nivîs piştgirî û propaxanda Mehdî hat kirin. Xort di daliqandina afîş û belavkirina belavokan de pir caran bûn hedefa êrîşên polîsan.

Carekê saet 01 ê şevê derê me hat lêxistin min derî vekir, Tahsîn Dîken e. Got wan, endamên DHKD ê derva afîş daliqandine polês êrîş anîye ser wan, sîleh teqandine birayê min Zinar hatîye girtin. Bona ku Zinar li ba min dima, ew fikirîye ku polês dikare bavê ser malê, tiştik heye ez derxinim haya min ji min hebe.

Min li der û dorê çavê xwe gerand, mal sekir, ji hin pirtûkên suçdar! bêtir tiştek tune bû. Ez qane nebûm, carek din çûm oda ku birayên min radizîyan min qontrolkir. Di binê textê nivînê de torbek dît, kişand anî mêze kir ku çi bibînim, çar şeşagirên çardexor, extra jarjor û hin tiştê din, wek cebilxanekî.

Mala min li qata heftan e. Apartimana kêleka me jî tamîrata îskele li ber e. Wê şevê her çar birayên min jî nehatin mal. Ez di oda wan de, torbê çekan di destê min de di nivîna ber pencirê de razîyam.

Di fikirîm eger polês bona malsekirinê bê, ez ê torbê çekan di pençirê de berdim jêr.

Destê sibê saet navbera çar û pêncan ji îskela bîna kêlekê yek ber bi pençira min dihat, hindek ma bû ku torbe berdim jêr, min bekçîyê bînê naskir. Min pencire girt, çûme mitfaxê av wexwar, pir nema bû, derva roj derkeve. Hatim li ser cilê vezelîyam, lê xewê ez negirtim.

Sibê hîn ji mal derneketîbûm brayên min hatin mal. Polês ku gule baran dike, Zinar hildikişe, dikeve balkonek- şaneşînek ê û xwe li wir vedişêre. Xwedîyê malê ew li balkonê dîtîye lê dengê xwe nekirîye. Polês û leşker ku ji ortê dikişin ew jî derdikve tê.

Ji Dêrsimê, Xarpitê, Mêrdînê, Rûhayê, Sîveregê, Bîtlîs û ji gelek cîhên din dilxwazên partîyê û velatparêzan alîkarîya maddî komkirin şandin, an jî kadroyên xwe hatin di xebata germ de cî girtin.

Şoreşgerên Demoqrat, tenê alîkarîya berendamê Partîya Komara Gel (CHP) ParêzerYahya Memetoğlu kirin.

Ji xeynî ŞD hemû parti û hêzên demoqrat, welatparêz jî alîkarîya Mehdî Zana kirin.

Li Dîyarbekir xwepêşandanên mezin hatin darxistin. Di xwepêşandanekê de 20 hezaran zêtir mirov meşîya. Hezaran bejdaran bi hev ra sloganên "Bijî Azadî bimre koletî, Bimre qolonyalîzm, emperyalizm, faşîzm û feodalîzm, Ji gelan re azadî" davitin. Dîyarbekir rojên dîrokî dijîya.

Êvarekî ji Taxa Rezan piştî civîna qehvan spontane meşekê destpêkir ber bi Derê çîyê bû lehî û hat. Rih û şikilê kitlê bibû yek, te digot ka laşê meriveki ye. Piştî ku meşa 5 kîlometeran qedîya min se kir ku panîya sola min ketîye.

Di hilbijartina 11 ê Çilê Pêşin 1977 an de bi coşek mezin Mehdî Zana wek şaredarê Dîyarbekir hat bijartin.

Gelê Dîyarbekir di Kurdistanê de tiştekî nû dicêriband. Kesekî ne dewlemend, ne xwedî dîplomayên zanîngehan, terzîyek, kedkarekî welatparêz ji xwe re kir şaredar.

Mehdî karê pêşin çawa ku hilbijartinan de soz dabû, bekçî û lamba sor a ber derê şaredar rakir. Lê sera pir roj derbaz ne bû, ew cardin zeximtir nûve kirin.

***

Wek min li jorê jî gotî bû ez di wexta Şaredar Parêzer Okay Kalfagîl de bibûm midûrê îqtisadê û min karê xwe dom kir.

Di vir de dixwazim li ser Kalfagîl jî hin tiştan bêjim. Kalfagîl merivekî xwedî vijdan, demokrat, mitewazî û kibar bû. Tenezulê pere û malê dinê ne dikir, şexsîyeta mirovan re rêz digirt.

Gelek mamoste, endamê TÖB-DER ê pêşverû û welatparêz ji alî hikûmatê ji kar hatîbun dur xistin, an jî sirgun kirin û di wexta wî de şaredarîyê de hatin bi cî kirin. Kemal Ezber, Mehmet Yokuş, Kazim Budak, Latif Kaya, Şeyhmus Hacîyusufoglu, Îsmet Altun, Ganî Sungur, Kenan Bulut hin ji wan kesan in.

Rojekê Okay bang min kir, ji min xwast ez bibim alîkarê şaredar, ango alîkarê wî. Du alîkarê wî Kemal ezbar û Mehmet Yokuş he bûn. Dixwast M. Yokuş ji kar bigire, ez têkevim dewsa wî. Min got tu çima Yokuş ji kar digirî?

Got:

- Nabêjim, tu dixwazî di cîhê wî de kar bigirî an na?

- Ez serokê TÖB-DER ê me, Yokuş endamê me ye, hevalê min e, bê sebeb ez cîhê wî naxwazim.

Ez hîn li cem rûniştîbûm, bang Ganî Sûngur kir cigiriya şaredarîyê teklîfî wî kir.

- Got Kazim naxwaze tu çi dibêjî?

Ganî dixwest bona bersivê wext qazanç bike. Got

- Ganî serê xwe mexurîn e, erê an na?

Ganî jî ew kar qebûl nekir.

Lê Okay Begê qet dilê xwe negirt.

Dîsa di hilbijartina Şaredarî ya Dîyarbekirê de ji min xwest ku em dikarin ji partîya wî ra alîkarbin an na?

Me got hevalê me Mehdî Zana namzet e, em alîkarîya wî dikin.

Got spas ji te ra ku tu ha vekirî dipeyîvî, hindik heval soz jî didin lê nakin.

* * *

Çend roj li ser hilbijartinan ra derbaz bibû, serokê DHKD Mesut Başturk û hevalê wî Aydin Hasar gotin ku serok Mehdî gazî min dike.

Ez çûme qatê jorin. Oda Mehdî, derî vekirî bû, ji ber derî heya masa Mehdî kî li erdê rûniştîye, kî li ser çongane, kî jî li ser lingan ode bi mirovan ve dagirtîbû. Di wê qelebalixê da Mehdî ji min re got ku ez bibim alîkarê şaredar, "Ez te alîkarê xwe tayin dikim here li cîhê xwe rûne."

Li himber vê pêşniyarê ez mat mayî mam. Ez difikirîm ku hevalên me di nava xwe de civînekê çêkin û kar jî ew di nava kadroyan de beş bikin. Min got "na ez naxwazim bibim alîkarê şaredar" û derketim derva. Aydin û Mesut pê min hatin, gotin te çima qebûl nekir, te bikira rind dibû.

Lê pêşniyara min ew bû, bila kadroyên TÖB-DER, TÜM- DER, TÜS-DER, DHKD ê, Partiya Sosyalista Kurdistanê bên ba hev, hev ra kar beş bikin. Kî dikare kîjan karî bike hev ra bihatana bijartin. Ji ber ku gelek sazîyên sîvîl de em xwedî desthilat bûn û wan sazîyan di hilbajartinan de xebatên hêja kirîbûn. Me hilbijartin bi hev ra qezanç kir, divê kar parve kirin jî bi hev ra bê kirin.

Lê di cîhkirina qadroyan de partî jî dereng ma, bê însîyatîf mabû. Mehdî wê rojê kadroyên xwe tenê bi serê xwe bijartin.

Piştî dabeşkirina kar, mehêkê şûnda êvarekê Kemal Burkay derket hat Dîyarbekir. Em hev ra çûn mala Mehdî. Li malê ji jina wî Leyla û birayê wî Nusret bêtir kes tune bû.

Li ser kar dabeşkirinê hat sekinandin.

Mehdî got, *min ji Kazim xwest ew bibe alîgirê min, lê ji ber ku ez terzîyekî bûm, wî nexwast, tenezûl nekir. 127 kesî dixwast bibe alîgirê min. Min xwe ji xelkê xilas nekir ji ber wê kar di nava kadroyan de belav kir.*

Min hin tiştên şaş ku dihat kirin got û hin pêşniyar kirin. Partî jî bi dereng ketinê rexne kir. Nusret piştgirîya min kir, got, *"tiştên ku Kazim dibêje rast in, ez wan gazinan ji gel dibihîsim."*

Xebata bi proxram û kolektîf me çiqasî pêşniyar kir jî xebata şexsî dom kir. Lê Mehdî dixwest her tiştî xwe bike. Me di nava xwe de nekarî xebatê kordîne bikin.

Pir wext derbaz nebû di nava gel de propaxanda *"ruşwetgirtinê"* belav bû. Gel hêdî hêdî berê xwe ji me diguhart. Di nava me de ji şiklê xebatê de cudabûn hebû.

Havîna 1978 an de me li ba Mehdi Zana civînek çêkir di civînê de Nazîf Kalelî, Mehmet Yokuş, Kazim Budak, Zekî Atsiz amade bûn.

Ji ber ku ez serokê komela mamostan TÖB-DERê bûm, hevalên mamoste, pir rexne û gazinên xwe ji min ra digotin. Di civînê de min rexne û pêşniyarên wan jî anî ziman.

Li ser bê plan û popîlîzmîyê, li ser şiklê karkergirtina kar, propaxanda ruşwet girtinê hate nîqaş kirin. Bi hezaran nameyên de gazîyên kar tên. Me pêşniyar kir ku komîtak wan naman kontrol bike li gorê pêwîstîya wan bike dorê.

Li gorî daxwazîyên meclîsa şarederîyê gelek kesên ne layik diketin kar, lê welatparêzên ku muhtac bûn û hilbijartinan de fedekarî kirîbûn derva diman. Gora cîhê ji dayîk bûnê tefrîqat dihat kirin, halbu ku di hilbijartinan de alîkarîya wan jî hatibû pejirandin.

Di nîqaşê de demikê em ji hev dûr ketin min got," *tu dixwazî li ser pişta me 1980 de herî parlamentoyê, lê ew parî di ber te de dîmîne."*

Wî ji xwe ecizkir û hin tişt gotin. Xasima karta terzitîya xwe bi kar anî. *"bona ku ew terzîye min tenezul nekirîye bibim alîgirê wî. Ruşwet jî kesî nedigirt lê tenê kesên mixalefet û ajanan ew propaxande dikir."*

Lê piştî civînê ez tê gîhîştim ku dilê Mehdî tune ku metodê biguherîne û em nikarin bi hev re bixebitin.

Evarê kê ez ji kar derketibûm ber bi mala xwe dimeşîyam.

Nişkeva araba Chevrole li ba min sekinî Mehdî Zana û çend hevalên midûr di erebê dabûn.

Ji min re gotin li Otela Turîstîk dawetek heye sîyarbe em terin wir. Ez jî sîyar bûm em çûn otêlê.

Mehdî carek din ji min pirsî *"ez çima xwe ji wan dûr digirim?"* Tiştê ku ji derva li ser ruşwetgirtinê dihate gotin min dubare kir. Lê bersivên wî wek hercar bû. *"Bona ku ew terzîye min tenezul nekirîye bibim alîgirê wî. Ruşwet jî kesî nedigirt, tenê kesên mixalefet û ajanan ew propaxande dikir."* (...)

Sibehê ez çûm, min îstifa xwe danî ba muşawîrî Mehdî, Nazîf Kalelî. Nazîf pir hewl da ku ez îstifa xwe şunda bigirim, lê min negirt, got *"madem usa ye mehekê here îznê."*

Mehekê çûm Dêrsimê gundê xwe, vegerê min 5 ê meha 12an 1978 an de îstifa kir. Di şaredarîyan de fonên usa hebûn ku ji bo kesên ku 8 saetan zêtir dixebitin zêde mesaî, ango pere dihate dayîn.

Mesaî ji kesên ku qadroyên karker dabûn dihate nivîsin. Memuran ev mafê xwe tune bû lê pir caran li ser navê karkeran dihate nivîsîn û pere jî memuran digirt.

Ew yeka ser kaxizê maf xuya bike jî hin caran di destê midûr û mesulan de şaş dihate bi kar anîn û di nava personel de nerehetî pêda dikir.

Min xasima kar û têkilîyên xwe pir hesas girt. Bi serbilindî dikarim bêjêm çend salên ku ez di şaredarîyê de xebitîyam, min ceht kir nekevim nava şaşitîyan.

Bawer dikim min şaşitîyên mezin jî nekir. *"Menfaet mîna kursîyekî ye, eger tu wî bidî binê lingê xwe te bilind dike, bi dî ser serê xwe jî te nizm dike."* Kê ew kursî da ser serê xwe, kê da binê lingê xwe, gelê Dîyarbekir ew dit.

**Li lokantê ...**

Sala 1974 an bû. Li zîndana Dîyarbekirê , gelek welatparêz rastî cezayê gran hatin. Hîn ji gelek welatparêz di zîndana Dîyarbekirê de zîndankirî bûn. Em 4, 5 heval bi hev ra çûn lokanta nêzî Minara Çarling xwarin bixwin. Nîyazî hosta jî bi me ra bû. Wexta ku em çûn lokantê me dît, ku heyeta dadgeha leşkerî, tevî serokê dadgehê Hemdî Sevinç li wir rûniştibûn û kevav dixwarin. Em kesên ku li wir bûn, me hemûyan ev kadro nas dikirin. Ji wan êşkence dîtîbûn û cezayê zîndanê girtîbûn. Moralê me gelek xirav bû, lê em dîsa jî rûniştin. Nîyazî Hosta, got, gelî hevalino, xwe aciz mekin. Gelê me hîn jî der û dora me çi deqewime ew nizane. Lazime em hîn pir bi xebitin. Divê van qetîlkarana nekarin, bê tirs, heta vira bên û rehetî xwarin bixwin, kurdên welatperwer jî di zîndanan de bi helisin.

Nîyazî Hosta bi çavê xwe ew yeka nedît, lê nuha wek daxwazîya Nîyazî Hosta bûye.

**Li Dîyarbekirê ...**

Rojekê em çend heval li dukana terzî Nîyazî rûniştîbûn Edîp Karahan jî li wir bû. Me sohbet dikir weka her wext. Edip bi navê xwe di nava welatparêzan de dihate nas kirin. Lê wî hin kesên wê derê nas nedikirin.

Hevalê Bedo[49] jî nave wî bihistî bû ew ji durve nasdikir, lê kekê Edîp ew nas nedikir. Bedo wexta ku Edîp li wir dî kêf xweş bû, weka sûrprîz jê re çê bibû. Dem nazik bû, gelek kes ji hepsê hîn derketîbûn, polês li pê şopa welatparêzan bû.

Bedo bê sebir dest bi hin pirsên xwe kir. Qala başûr kir. Serokê şoreşê û hin tiştên din bê navber jê pirsîn. Lê kek Edîp xwe li nebîhistinê da ji ber ku ew nas nedikir.

Ew pirsn ku wî pirsîn jî wê demê pirsin bi tehlûke bûn. Kekê Edip bê ku bersiva pirsan bide berê xwe da Nîyazî usta, yahu, Nîyazî Usta û bi çavê xwe Bedo îşaret dikir.

Lê Nîyazî Hoste jî mexsus xwe li nebîhistinê dida û binê lêvan re dikenîya.

Bedo israr dikir, K.Edîp israr dikir. Dawîyê K. Edîp deyax nekir û bi dengekî bilind, *"yahu Nîyazî Hosta wa kîye, wa çi dibê je?"*

**Kongra navenda TÖB-DERê ya 4.emîn (21- 24 Tebax 1978)**

Kongra navenda TÖB-DER ê ya çaremîn di 21 ê Tebax 1978 an de li Enqerê di salona (Dewlet Su Îşlerî) Dewletê ya Karê Avê de dest pêkir.

Nunerên TÖB-DER ê, gelek mîvan û berpirsîyarên partîyên sîyasî, sazîyên demoqratîk û rojnamevan civînê da beşdar bûn. Delegên TÖB-DER ê ya ji hemû herêman, hatîbûn di civînê de amade bûn.

Hêjmara me delegên Rîya Azadî nêzî 70 kesî bû. Ser navê gruba Rîya Azadî bi gruban ra têkilî û hevdîtinên tifaqan ez û Nazîf Kalelî hatin erkdar kirin.

Berî kongrê nivîskarê rojnama Cumhurîyetê Yalçin Dogan li ser hilbijartina TÖB-DER ê agahîyek vir weşand. Di nivîsa xwe de gotîbû, gruba Rîya Azadî tevî grubên Maoyîyan hevkarî û tifaqê dike.

Yalçin Dogan wê demê dilxwazê TKP ê bû, bi zanebûn derew dikir, av şolu dikir. Him nêzîkbûn û têkilî di navbera grubên Maoîyan û me de tune bû, him jî xasima li Kurdistanê dijberîya herdu gruban pir xurt bû.

Maoyîyan li Dîyarbekir bi navê A.Selam Aydin[50] endamekê DHKD jî kuştin.

Hevalên delege ji vê xebara rojnamê gelek aciz bûn. Mamostên Rîya Azadî li buroya kovara Rîya Azadî di nava xwe de civînek çêkir, biryar girtin ew herin

---

[49] Bedo ji Qulpê bû û kurapê Hîkmet Buluttekîn(Çeko) bû.

[50] Me cinaze Abdulselam Aydin 3 ê çileyê Paşin 1979 da bi bejdarîyek xurt bir li gundê wî Kabê kire gorê. Mamoste Yaşar Alagunduz li ser gorê bi zimanê Kurdî axavtinek kir.

buroya rojnama Cumhuriyetê vê xebera ne rast rexne û rûreş bikin. Em dora 25-30 mamoste çûn buroya rojnama Cumhurîyetê ya Kizilayê. Tesaduf Yalçin Dogan li wir tenê bû.

Dogan wexta ku grubek mamostêyên Kurd li himber xwe dît ew gelek tirsîya. Hevalan bi ciddîyetek balkêş ew rexne û rûreş kir û em derketin hatin.Ew ji ber derewa ku wî kirîbû ferş bû û li himber rexnên me nekarî, çi bêje...

**Hilbijartina serokê dîwanê**

Gruban ji bona tifaqkirinê di nava xwe de danûstandin dikirin. Du blok derket holê.

Yek tifaqa nava TÎP, TKP î û CHP yê bû. Ya din jî tîfaqa navbera Rîya Azadî, TSÎP, Kurtuluş, Dev-Yol (Mamostên Şoreşger) bû.

Dev-Yolê bo ku ji hevdîtinan hin tavîzan bi dest bixine, xwe ji tîfaqê dûr girt û ser navê xwe bona serokatîya dîwanê berendamek pêşkêş kir.

Bona ku dengê bloka me parçe bû, serokê dîwanê bi alîkarîya delegên TÎP, TKP û CHP ê Silêman Ustûn hat hilbijartin.

Serok Silêman Ustûn, civîn bi şiklekî demoqratîk rêva nebir û alîgirî kir, delegên bloka Rîya Azadî, TSÎP, Kurtuluş, Dev-Yol ê bi hev ra bêbawerîya xwe anîn ziman û serokê dîvanê xistin, berendamekî din hilbijartin.

Ser van pêşketinan hin delegên nava tifaq a TKP ê, TÎP û CHP ê civîn terikandin.

Gruba Rîya Azadî û TSÎP ê ji komcivîna 1976 an virda di komîta rêvabir a TÖB-DER ê de bi hev ra kar dikir in.

Bona mafên ekonomîk, demokratik xebatên hêja pêkanî bûn. Xasima pêkanîna Komcivîna Perverda Demoqratîk serkevtinek baş bû. Van serkevtinan tifaqên herdu gruban xurttir kir.

Xebatên komcîvînê dom dikir. Reqabet, heyecan û dijayetî ya gruban li himber hev germ dibû. Ji bona tifaqan di nava gruban de hevdîtinan dom dikir. Xasima me li ser girtina nunertîya TÖB-DER ê ya herêma Kurdistanê israr dikir, dawîyê nunertîya hemû bajarên Kurdistanê nunerên Rîya Azadî hatin bijartin. Vê israra me manek xwe ya polîtîk hebû, me dixwast di welatê xwe de em desthilat bin.

Ser navê Dev- Yol ê jî di dibistana Gazî Egîtimê hevalê min Îbrahîm Sevîmlî di hevdîtinan de bejdar dibû. Em bi hev re di dewa Gazî Egitimê de jî hatibûn mehkemekirin û ceza kirin. Nêzda naskirina me ya hevûdû hevkirina me hêsa dikir.

Di cepha Kurdîstanî de wê demê ji gruba Rîya Azadî xurttir, alternatif grup tune bû.

Ji ber ku di Kurdistanê de gelek komelê TÖB-DER ê di destê hevalê Rîya Azadî dabûn, delege piranê ji wê grubê bûn.

Ya din komîta karger a merkeza TÖB-DER ê TSÎP û Rîya Azadî bi tîfaq rêva dibirin vê jî avantajek dida herdu gruban ku di nava mamostan de hêza xwe xurttir bikin.

Bi navê "Şoreşgerên Demoqrat" grubek delegên Kurd dilxwazên ŞD ê jî hebûn lê wan dengê xwe tevî gruba himberî me kirin.

Hilbijartinê de lîsta tifaqê, Rîya Azadî, TSÎP, kurtuluş û Dev-Yol ê qezenç kir. Lê hêzên din (TKP, TÎP, Maoyî û CHP) bi alîkarîya burokrat û polîtîkwanên CHPyî ji dadgeha burjuvazîyê biryar derxistin, bo çend mehan dest dane ser hesav û defterên TOB-DER ê. Sedemê ku nîşan didan ew bû: serokê dîwanê li gorî destûrê, bi sisîyan dudo dengan nehatîye xistin. Ew yek bê destûrî ye."

Bi piştgirîya CHP ê, gruba ku ji TÎP, TKP, Maoyî û CHP yan li TÖB-DER ê bûn desthilat. Dora sê mehan şûnda dadgehê bi biryara dawîn mafê rêvabirina komela TÖB-DER ê de tîfaqa Rîya Azadî, TSîP, Kurtuluş û Dev-Yolê, tifaqa ku di hilbijartina komcivînê de dengê zêde girtî bû.

28 ê Tebaxê em ji Enqerê vegerîyan Dîyarbekirê.

Berî ku herim mal min rîya xwe li dikana pirtûkan, Tanê xist. Dikan li Derê Çîyê li ber sûrê di nava parqê dabû. Piranî dilxwaz û hevalên me li vê derê bûn. Min li wê dere ji xwîşka Mehdî Zana bihîst, xanima min li nexweşxanê ye û jê ra zarok, keçek çê bûye.

Hevalan pirsî ka navê wê em çi deynin.

Di wê demê di Şaredarîya Dîyarbekir de dixebitiyam û serokê TÖB- DER ê bûm. Min got navê keçikê an dibe Beledîye (şaredarî) an jî dibe TÖB-DER. Heval bi vê gotinê kenîyan.

Di cîh de çûm nexwaşxanê min xanim û keça xwe zîyaret kir. Piştî çend rojan şunda ew hatin mal û me navê keçikê danî Cîran.

**Girtina Zekî Adsiz, hilbijartina sendîqa Genel Îşê Liqê Dîyarbekirê** (14ê cotmeha 1978an)

Dema ku ez jî Dêrsimê hatim Dîyarbekir û min di şaredarîyê de dest bi kar kir, Zekî ji hat Dîyarbekir. Wî li Çolîgê ji ber belavkirina belavokekê nêzî salekê cezayê xwe yê zîndanê hebû û polês lê digerîya. Ew hat em bi hev ra demikê li mala me ya taxa Rezan man. Havînê dibistan hatin girtin birayê min yên xwendevan çûn Dêrsimê, jina wî Şadîye û lawê wî Filinta jî hatin dîtina Zekî, hefteke li ba wî man.

Wexta ku kekê min Mistefa li Solxanê hat girtin Zekî Atsiz hemû tehdîtên faşîstan girt çavê xwe çû, zarokên wî ji Solxanê anîn li mala xwe, kirin mîvan. Difikirim îro jî dora min e, ez fêdekarîyê bikim.

Zekî di pêvajoya propaxanda hilbijartina şaredarîyê de li buroya Mehdî Zana hat girtin. Li qereqolê poles, nehişt kes wî bibîne, gotin sibe ew wî dibin edlîyê û wî

dişînin girtîgeha Çolîgê. Ji bo dîtina wî dora roja din sibe da ez çûm edlîyê hîn ew nanî bûn. Demek şunda ew tevî du polêsan anîn edlîyê, li wir jî nehiştin em hev û du bibînin. Karê wî temam dikirin ku wî bişînin Çolîgê.

Me xebera girtina Zekî da malbata wî. Çend rojan şunda Zekî birin zîndana Çolîgê.

Zekî li Çolîgê cezayê xwe radizîya, li Dîyarbekir hilbijartin çêbû, namzetê Partîya Sosyalîst a Kurdistanê Mehdî Zana bû serokê şaredarîya Dyarbekirê. Karkerên şaredarî ya Dîyarbekir endamê sendîqa Genel- Îşê bûn. Genel – Îş girêdayî Konfederasyona Sendîqên Karkerên Şoreşger, DÎSK ê bû. Karkerên şaredarîyan, dergevanên apartimanan, karker û hostên qalorîferan dibûn edamê sendîqa Genel- Îşê. Sendîqê Genel Îşê ya Dîyarbekir dora du hezarî endamê xwe hebû, lê endaman tenê perê endametîya xwe didan.

Sendîqeyan divîya bû karkerên xwe perwerde bike, di hîşê wan de pêşketin û guhartinan çêke. Bi rîya semîner û perwerdê karker, xwe nas bike. Di xebatê de bi mijandina keda xwe haydar bibe. Karker mafê xwe yê wek maaş, îzîn, şertên xebatê, mafê sosyalî û berpirsîyarîya karmendan çine? bizane, rê û daxwaza wan mafan fêr bibe.

Rêvabirên sendîqê pir caran li gorî serokê şaredarîyê tewir distendin. Ew ji semîneran, grevan û ji mafê karkeran ya ekonomîk û sosyalî bê xeber bûn. Karbidestan çi layiqî wan bidîtina wan ew dipejirandin. Li bajar û welatê me gelek bûyerên sîyasî û civakî diqewimîyan. Di pêvajoyê de wan li şîyarbûna karkeran jî tesîr dikir. Piştî hilbijartina şaredarîyê di bingeha sendîqê de li himber berpirsîyarên sendîqê mixalefetê destpêkir. Qadroyên sosyalîst û welatparêz jî dixwastin vê nerazîbûna karkeran di rêyek rast de rêz bikin.

Êvarekê di şaredarîyê de di nava hevalên Partî Sosyalîst a Kurdistanê de li ser rewşa sendîqe ya Genel- Îş ê civînek hate çêkirin. Ji TOB-DER, TUM-DER, TUS-DER, DHKD û ji partîyê ji hin berpirsîyar amade bûn. Ew komelên min nav nivisîn, di bin rêvebirîya Partî Sosyalîsta Kurdistan dabûn.

Li ser hilbijartina sendîqê dihate peyvandin. Di civînê de Îhsan Aksoy ji bona serokatîya sendîqê Mistefa Budak pêşneyar kir. Mistefa wek mamoste demikê berê ser daxwazîya partîyê tayîna xwe ji Îzmîrê girtîbû bajarê Edenê. Lê ji bo sendîqayê bersiva Mistefê na bû.

Hin hevalên endamê sendîqê li himber komîta rêvabir a sendîqê bona mixalefetê dest bi xebatê kiribûn. Lê bona ku wek serok kesek nehatîbû navkirin, xebat giran dimeşîya.

Zekî ji girtîgehê azad bû, hat Dîyarbekirê. Bi wî ra li ser rewşê hat peyîvîn, ew ji bona serokatîya Sendîqê karkerên şaredarîyê hat pêşniyar kirin.

Bona ku Zekî û Mehdî di yek partîkê dabûn, hin kesan belavkirina bêbaweriyê hewl dan. Piştî hin xebat û lebatê karker qane bûn, di hilbijartina 14 Cotmeha 1978an de Zekî bû serokê Genel-Îş a liqê Dîyarbekirê. Parêzer Ziya acar jî bu parêzerê sendîqên girêdayî DÎSKê yên li Kurdistanê.

**Greva firinciyan**

Beri ku Mehdi Zana bibe serokê şaredarîyê em gelek heval wek midûr di şaredarîyê de dixebitîyan.

Mehmet Yokuş alîkarê serokê şaredar, ez midûrê iqtisadê, Latîf Kaya midûrê zabita, Îsmet Altindag midûrê daîra paqişîyê, Ganî Sungur û Kenan Bulut midûrê muhasebê bûn. Gelek kadroyên din jî cuda cuda kar û cîyan de dixebitîyan. Yê ku nû bû, Mehdî bi xwe bû. Ji ber wê, mekanîzma şaredarîyê çawa dixebitîya me rind dizanî. Lê ticcar û tefecîyan di derheqê qadroyên ku di şaredarîyê de dişûxûlîyan bi propaxanda komînîstî û kurtçîtiyê, xebatê şaredarîyê hin caran kirin xeterîyê.

Demekê hemû tişt ji bazarê hat kişandin. Ne şekir û çay, ne rûn, ne xaz ne jî tûb tu tişt di pîyasê de xuya nedikir. Ew tiştên ku me li jor lêvkirî bû, di dikanan de hebûn, lê bi dîzî bi buhakî bilind dihatin frotin. Xelkê ku ew li sukê nedidîtin pêwîstîyên xwe tedarîk nedikir, dihatin şaredarîyê û gazin dikirin. Her tişt ketîbû suka reş. Bi fîş qismek mirovan pêvîstîyên xwe tedarîk dikir, lê piranîyan nedikarîn. Mirov wê demê baştir dibîne ku sermayedar çiqasî xwedî hêzin. Mal hebû lê malfiroşan ev depo dikirin û bi bûha ku wan dixwest difirotin.

Daîra zabita û îktisadê li himber malfiroşên fêlbaz xebata xwe xurt kir. Bi alîkarîya gelê Dîyarbekir depoyên ku tişt têde hatîbûn berevkirin, tesbît kirin û şaredarîyê dest da ser wan. Tiştên depoyên vêşartî bi bûhayek normal li gel hat belav kirin. Hêdî hêdî rewş hat guhartin.

Ji bo şaredarîya nû azmuna ydarîyê sedî sed zem xwestin. Komela firinciyan di havîna 1976 da, di dema şaredar Okay Kalfagîl de jî bi daxwazîya zemek pir bilind grevek darxistî bû. Vê demê jî me dest dabû ser hin firinan û me xwe ew dabû xebitandîn. Ji hin bajarên ciran (Batman, Sêert, Mêrdîn, Silvan, Erganî, Urfa, Entavê jî nan anî bû, û gel bê nan nehiştî bû. Ji bona wê em xwedî tecrube bûn. Firincî yên ku ketîbûn grevê jî eynî kes bûn.

Vê carê jî me usa kir. Ji bajarên ku li jorê navê wan derbazdibin, me jê nan anî û gelê xwe bê nan nehişt.

Him endamên DHKD, TOB-DER, TUM-DER, TUS-DERê ya Dîyarbekirê him jî yên bajarên din xebatek mezin kirin. Welatparêzên dervayî me jî xebat û piştgirîya me kirin.

Gava yekem wek me, daîra Îqtisade bi ziman û naverokek zelal belavokek derxist û li gel belav kir. Me di belavokê de da zanîn kû, "Komela firincîyan dixwaze

loqma gelê me piçûk bike. Ew daxwaza wan ne dicîda ye, bi vê daxwaza xwe ya ne heq dixwazin ji gelê Dîyarbekir tola hilbijartinê bistînin (.........)"

Gava duyem bi firincîyan re me li şaredarîyê civînek pêk anî. Bona ku nîqaş di nava gel de rast bê fêmkirin ya baş ev bû ku gel bikare pêvajoyê bişopîne. Lê wek îro derfetên tv. tune bû. Bi pêşniyariya min me ji salona ciwînê hoparlor der va danîn ku gel bizane di civînê de ka çi tê gotin.

Çend rojin daxwazîya firincîyan a zemê û greva wan bibû yekem nûçe ya bajar. Daxwazîya xwedî firinan zêdekirina buhayê nan di nava gel de nerazîbûn anîbû holê. Dema ku di hoparlorê de hate bihîstin, li şaredarîyê tevî komela firincîyan civin heye girseya gel mîna lehîyekê meşîya hat li navrasta ber şaredarîyê kom bû. Di demek kin de hejmara wan xwe gîhand hezarî.

Civînê dest pêkir, gelê der va hemû nîqaş û ditin zindî dişopand. Firincîyan ku daxwazîya zemê dianîn ziman girse gel dihate kelecanê, bi carisî, slogan û qêrîn ew protesto dikirin. Li himber daxwazîyên zemê derdiketin û piştgirîya şaredarîyê kirin.Her gav tansîyon bilind dibû, slogan, protesto û qêrîn, rewş ber bi şidandinê di çû, polês hat li ber derê şaredarîyê tedvîr girt. Hêrs û qehra gel li himber nunerên firincîyan heta cîhê civînê dihat. Ji ber nerazîbûna gel firincîyan ji daxwazîyên xwe jî, ji civînê jî dev berdan û bi alîkarîya polês û zabita derê paşve bazdan û xwe ji hêrsa gel xilas kirin.

Wê rojê dawî li grewê hat, buha nan ne hat guharandin, firin hatine vekirin dest bi xebata xwe kirin.

Di pêvajoya grevê da, gel li ba Şaredarîyê cîh girt, tewrê gelê Dîyarbekir ji bona şaredarê nû bû piştgirîyek.

**Şerê navbera Yekitîyê û Qiyade Muwaqet**

Di sala 1975 an bi peymana Cezayirê dewleta Îranê bi dewleta Iraq ra li hev hat. Alîkarîya ku Partî Demoqrat Kurdistan (PDK) ji dewleta Îranê digirt hat rawestandin. Tevgera Kurd li himber dewlata Iraqê balans wenda kir. Hêzên çekdar hatin belav kirin. Qismek ji wan xwe di sînorê Tirkîyê de di nava eşîrên Kurd da, cîh kir. Qismek ji wan hêzên çekdar jî Kurdistan Başûr terikandin çûn Kurdistana Rojhilat, nava Îranê. Piştî ku PDK hêza xwe ji Başûrê Kurdistanê kişand Îranê, Mistefa Barzanî ji ber nexweşîya xwe derbazî ABD ê bû.

Pir wext sera derbaz nebû, herdu hêzên Kurdîstanî, Yekîtîyê jî PDK ê jî xwe amade kirin, ser cîh û warê xwe û têkoşîna xwe bidomînin. Di mêj de navbera Yekîtî û PDK de alozî hebû. Talabanî ji 1966 an de li himber serokatîya Mistefa Barzanî derketî bû û du ra jî, ji PDK veqetîya bû. Piştî wê jî hin caran tevî dewleta Îranê, hin caran jî tevî dewleta Iraqê têkilî danî li himber şoraşa Kurdistanê rawestîya.

Herdu lawên Barzanî Îdris û Mesut Barzanî cîhê bavê xwe girtin û partî nû va reorganîze kirin. Di cîhê PDK de bi navê Qîyada Muaqet organîzasiyonek

damezrandin, Samî Rahman[51] bû sekretrê wê. Gora wextê, guhartin û dîtinên ku di proxrama KDP ê de çêbûn, bi navê "KDP-Stratejîya Nû" di pirtûkekê de hatin belavkirin. Nivîskarê Kurd M. Emîn Bozarslan jî ew pirtûk wergerand zimanê Tirkî.

Talabanî, xwe ji Kurdistanê kişandina PDK ji xwera firsend dît û xwest hêza xwe darbazî Behdînan bike. Lê ji ber qontrola hêzên dewletê di nava sînorê Iraqê de Yekitîyê nedikarî derbazî Behdînan bi be.

Derbazî wir tenê bi rîya Kurdistana Bakûr bi rîya, Çolemêrgê ve dikarî bihata kirin. Divîya bû ku, ew hêza xwe derbazî Çolêmêrgê bikin, ji wê jî derbazî Behdînan bikin.

Lê Behdînan her tim di binê qontrola Barzanîyan dabû. Vê cara jî wan nedixwast hêzên Yekitîyê li wir ciwar bibin.

Yekitîyê di sala 1978`a de bi serokatîya Elî Eskerî, dora 900 pêşmergê xwe ve ji Kurdistana Başûr derbazî Çolemergê kir. Ji wir jî dixwest derbazî Kurdistana Başûr be.

Lê dewleta Tirk, ji vê planê haydar bû, bona ku hêzên Kurdan şerê hev bikin hewl da. Partîya Karkerê Kurdistanê (KÎP) ê (bi rîya endamê komîta merkezîya xwe Necmettîn Bûyukkaya) bona ku Yekitî bikare derbazî Başûr be xebat û fedekarî kir. Lê pir mixabin wan jî nekarî alîkarîyek zêde bikin, hêzên Yekitîyê[52] ketin dafika PDK. Hêzên PDK, rêya pêşmergên Yekitîyê birîn di nava wan de şer derket li gorî gotinê 200-300 pêşmergê Yekitîyê hatin kuştin.

---

[51] Rojekê ez û hevalek ji Komîta merkezî ya partîya me çûn serdana Partî Demoqrat Kurdistan-Partîya Gel. Ew partî ji Partî Demorat a Kurdistan veqetiya bu, Samî Rahman serokê wê bû. Samî Rahman qala Belavoka ku hêzên Kurdistanî hev re derxistibûn kir. Belavokê êrîşa PDK ser maqarên wan û dîl girtina hevalên Samî rahman bû. Bo ku belavok ne gora dilê wî bû, wî serokê KUK ê sucdar dikir. Di nava peyvê da got:"Ez ê gûhê wî bikişînim. Ez li hember derketim. Min got; em tevî wan hevalan di hevkarîyê da bi hev ra dixebitin, tu çima usa dibêjî?
Hun hev re di nava xebatê siyasî dane, lê ez jî peran didim wan." Hember wê gotin û nirînê wî em şaşûmetal man. Di aqlê min da mînyatorê diktatorekî piçûk hişt. 2 Sibat 2004 an da li Kurdistan-Hewlêrê di bûyerek intixarî da Samî ji di nav da 100 kes hatin kuştin.

[52] Di vê navberê da bi navê Melle Mihemmed merivek hat şaredarîyê ba min. Kurdêkî Mêrdînî bû. Xwe dostê Partî Demoqrat Pêşverû Kurd li Sûrî da naskirin. Ji partîya me, Partîya Sosyalîst a Kurdistana Turkiyayê ji bona Yekitîyê alîkarî dixwest. Dixwest partî ya me bikare pêşîya li şer bigre û ji pêşmergeyên Yekîtîyê re alîkarîyê bike ew derbazî Kurdistana Başûr bibin. Min ew daxwaza M. Mihemed gihand merkeza PSKT. Lê bona ku îmkanê me tunebû, partîyê tu hêvî neda wan bersiva partîyê ne musbet bû. Li wê derê qasî ku bikarin alîkarîya wan bikin hêza me tunebû. Bona bersivgirtinê hefteki şunde carek din hat ba min. Bona ku em pê bawer bin vê carê ji bo min dîvana Cîgerxwîn a 3.em, "Kime ez!" bi îmze Reşit Hemo ji min ra dîyarî anîbû.
Li ser rûpela pirtûkê slav û îmze Reşîdê Hemo hebû. Heya ku ji welat derketim jî pirtuk di nava refên pirtûkan dabû. Sala 1980 da ku em derbazî Sûrîyê bûn me Reşîd Hemo ji nêz ve naskir. Min ew ji Resit Hemo pirsi, wî bûyer piştrast kir.

Rojnama Roja Welat di sala 1978 an de hêjmara xwe ya Tebax û Îlonê de bûyer şirove dikir. Ji KDP ê dixwest ku ew şerê Yekitîyê neke, qadroyên ku dîl hatine girtin, neyne kuştin û ew bên azad kirin.

Lê mixabin KDP ê guh neda gotinên dostan, fermandarê bi navûdeng Elî Eskerî û hevalên wî yên dîl hatîbûn girtin kuştin. Hindek pêşmergên birîndar jî ketin destê dewleta Tirk.

Çend birîndarê Yekitîyê anîbûn girtîgeha Dîyarbekirê. Ji wan yekî navê xwe Ehmed bû. Ehmed dora 18,19 salî bû. Lingê wî şikîya bû di zîndana Dîyarbekir de girtî bû. Tibbî tu midaxele ne hatîbû kirin, Ehmed bi birînên xwe ve di girtîgehê dabû.

Hevalê me Dr. Bozan Erdem jî, li zanîngeha tibê xwendevan bû, li ba wî girtîgehê dabû. Dr. Bozan him bi zimanê Tirkî, him jî alî dermankirina birînên wî û moraldanê ve gelek alîkarîya Ehmed kir. Çend caran em jî çûn zîyaretîya wan. Ehmed bona ku wî teslîmî Iraqê nekin xwe wek Kurdê Sûrî dida nasin.

**Karê minê nû**

Min ji karê şaredarîyê îstifa kir. Karê min ê nû Perwerdekarîya Herêma 7an a sendîqa Genel-Îşê bû. Perwerdekirina karkeran karê sendîqê bû. Bi rîya perwerdê sendîqe li ser pêyan dimînin, demdirêj dibin û karê serkevtî dikin. Perwerde jî bo wê tê kirin.

Sendîqa, wezîfa xwe li dîroka têkoşîna çîna karkeran xwedî derketin e, ji karkeran ra pêşengî kirin ê. Li dijî mijandina keda wan derketin û parastina sengerên heyîne. Bona ku sendîqa bikare wan karan pêk bîne divê sendîqe mezin be, xurt be.

Perwerde xebatik e, ku tiştên nû hînî mirovan dike û di mirovan de guhartinan çêdike. Her sazî gorî pêwîstî û mafê xwe, gorî dîtinên xwe yên sîyasî perwerdê pêk tîne. Ji ber wê jî perwerdehî motîfên îdeolojîk dihewîne. Armanca perwerda sendîqan jî ew e, karker xwe nas bike, çîna xwe nas bike. Têkilî û dijitîya navbera çîna karker û karmendan bizane. Di roja îro de karker, li ser kaxizê be jî çi mafê xwe yê zagonî hene wan fêr be û bikare kar bîne. Bi rîya sendîqan giranî û tesîra karkeran li himber karbidestan zêde dibe.

Îro zagona sendîqeyan, perwerda endaman bi hin mijaran ve sînor kirîye. Perwerda pîşeyî, pêşxistina zanebûn û qabîlîyeta endam destûra perwerdê ye. Zagon dixwaze berhema karmendan zêde bike. Di mantika perwerda karbidestan de mijandina keda karkeran û bilindkirina para xwe heye. Lê me ne tenê çawa ku zagonê de nivisîye her usa di çerçova çînî û netewî de jî perwerde kir.

Wê demê me şev û roj di nava gel de xebatên polîtîk dikir. Hin caran heta saet yekê şevê xebat û têkilîyên me dom dikir.

Li ser mile me her yekî çend karên partîyî û berpirsîyarîyên saziyên demoqratîk hebû. Min him karê xwe yê sendîqê dikir, him serokê TÖB-DER ê û him jî endamê komîta partîyê ya herêmî bûm.

Şemî û yekşemî jî li Dîyarbekir ji bona karkerên sendîqa şaredarîyê, karkerên Rîyan (Karayollari), karkerên karê daîra avê,(Su işleri), karkerên Şayaxê ji bona karkerên endam û dilxwazê Partîya Sosyalîst a Kurdistan min peryodîk semîner dida.

Bona ku wek perwerdekarê sendîqên li Kurdistanê ez dixebitîyam, hin caran, diçûm bajarên ku sendîqe lê hebûn û min li wir semîner dida karkeran. Li bajarê Dêrsimê, Betlîs, Mêrdîn, Dîyarbekir, Wan û Şirnexê semîner da karkerên şaredarîyê. Dema ku şaredarîya Wanê û ya Mêrdînê daxwazîyên sendîqeyan nepejirandin, grev hat darxistin. Wek wezîfedar ez 14 rojan li şaredarîya Wanê, 12 rojan jî li şaredarîya Mêrdînê mam û min bi civîn û semîneran greva karkeran de alîkarî ya wan kir. Di encamê de li herdu bajaran jî karkeran mafê xwe girtin û grev bi serkevtina karkeran dawî bû.

Li Wanê piştî ku karkeran daxwazîyên xwe girtin dawî li grewê hat, tevî Tayyar û çend hevalan em çûn kela Wanê. Dû re jî bi qayixek piçûk em çûn girava Axtemarê, dêra Ermenîyan a xirave.

***

Li Mêrdînê jî 12 rojan mam û grewê de ji karkeran ra bûm alîkar, dawîya grevê karkeran daxwazîyên xwe bi dest xistin. Di rêya Mêrdînê da, sekirina polîsan de min nekarîbû nasnama xwe bibînim û pêşkêşî wan bikim, me ew bi çetinayî qane kirîbûn.

Ji Dîyarbekir bi telefonkirina Zeki Atsiz ez pê hesiyam ku min nasnama xwe xistî ye. Du xortan, xwendewanên minê kevn li Derê Çîyê tevî nasnama min 17 000 lîre pere dîtine birine teslîmi polîs kirine. Lê piştî wê jî, ji bo ku ji polîs bawer nekirine, çûne agahî dane sendîqê ku wan pere û nasnama min danîne ba polîs.

Wexta li erebê sîyar bûm min cakêt derxistîye, ew ketine erdê. Du heftan şunde piştî ku karkeran mafê xwe girtin û grev qedîya, hatim Dîyarbekirê. Tevî Dr. Ruhî Koç em çûn qereqol û min pere û nasnama xwe ji wan girt.

1979 li Balikesîr -Orenê li tesîsên Genel-îş ê du heftan min him gudarî kir him jî semîner da.

Serokê Giştî ya Genel-îş ê Abdullah Başturk jî bejdarî semînerê bû û axavitinek kir.

Di destpêka serê sala 1980 an de ji alî merkeza sendîqêyê ve li Edene, Mersîn, Îskenderun, Tarsus û Antakyayê semîner hatine çêkirin.

Ez jî tevî grubek perwerdekar tevî semîneran bûm û min ser, *"Dîroka Têkoşîna Çîna Karkeran"* semîner de sedan karkeran.

**Mehdî Zana ji Partîyê hat durxistin**

Pir wext ji ser serkevtina şaredarîyê ra derbaz nebû, navbera Mehdî Zana û partîyê xirab bû. Mehdî, bi serkevtinê sermest bibû, hin tiştên ne rast û bê bingeh digot. Mehdî nedixwest partî ji xebat û kirinên wî haydar be, ango hesav jê bipirse.

Wî xebat û fêdekarîya qadroyên partîyê û dostan zû bîr kir, ket nav ezitîyê. Îddîa dikir ku hilbijartina şaredarîyê wî û jina xwe qezanç kirine. Lê jina wî Leyla Xanim, wê demê xanimek ciwan û analfebet bû. Bi polîtîkayê ve tu zanîn û têkilîyê xwe tunebû. Mehdî her çiqas di polîtîkayê de kevn bû jî, hilbijartin karê ku meriv tenê bi serê xwe bikare bike ne ew kar bû.

Aborîya Mehdî jî ne baş bû, me hin hevalan her meh di nava xwe de pere kom dikir ji kirêya buroya wî û ji mesrefên hilbijartinê ra alîkarî dikir. Piştî ku ew bû şaredar, xwe ji partî û hevalên xwe dûr girt. (...)

Piştî destpêka şaredarîyê çend mehan şunda Mehdî, li nêzî gola Wanê ersek girtîbû. Meclîsa şaredarîyê ku jê dipirsîya, digot min bo şaredarîyê girtîye. Endamên komela DHKD ku jê dipirsîyan jî digot; min ji bo komela we girtîye. Lê ya rastî bo xwe girtîbû. Di nava gel de jî her roj paştagotin û dijayetîya li himberî şaredarîyê xurt dibû.

Di merkeza partîyê de navbera partîyê û Mehdî Zana de cûdabûnê destpêkirîbû. Piştî hin probleman Mehdî Zana ji Partîyê hat durxistin. Wî jî hin hevalên ku xebata sendîqa û partîyê de aktîf bûn ji kar derxist.

Muşawîrê wî Nazîf Kalelî, nunerê sendîqê Zinar Budak, endamê komîta karger a sendîqê Xalê Mehemed, Mistefa .... û dora 25-30 karkerên din jî ji kar hatin dûr xistin. Têkoşîna me berê xwe dabû hindur.

Hevalên partîyê jî li himber Mehdî polîtîkake rast nekarîn bimeşînin. Xasima qadroyên partîyê, yên Dîyarbekirê bi tesîra hin propagande û rexnên ji derva, êrîşî Mehdî kirin. Bi wî awayî sengereke têkoşînê ku bi hezaran fedekarî û xebat hatîbû dest xistîn, bi polîtîkake şaş me ji dest derxist.

**Grewa karkerên Şaredarîya Dîyarbekirê (8 Tebax 1979)**

Şaredarî ya Dîyarbekirê dêyndarê karkerê xwe bû. Hin karkeran bi mehan bû, maaş û bi salan bû jî îkramîyê, tazmînat û mesaîyên ku mafê wan bû negirtîbûn. Dikanên ku karkeran jê dêyn dikirîn, êdî wan jî, dêyn nedidan, defterên xwe ji wan ra girtî bûn.

Sendîqa di destê hevalên partîyê dabû. Lê şaredar Mehdî Zana ji partîyê veqetîyabû, bona ku bi sendîqayê ra li hev neyê hewl di da. Wî dixwast ji partîyê tol bistîne û serokê sendîqê biguharîne. Sendîqayê jî ji bona ku xeleka bi heq zeft kirîbû, dixwast vê firsendê bî serkevtinê dawî bîne, bawerîya karkeran bigire. Mehdî bike xeterê. Ji ber wê yekê sendîqe bibû navenda şer.

Eger usa nebûna bi dilekî paqiş, bê ku grev bibe, ewqas karker ji kar bêne durxistin, pirs bi xwînsarî, polîtîka ke adil û rast, dikarîya bihata çareser kirin. Pêla ji kar derxistinê dom kir. Mehdî jî hevalên ku li hêla wî cîh negirtin, ji kar derxistin. Wî ew kesên ku ji kar derdixistin piranî endamên partîyê bûn û di hilbijartina Mehdî de keda xwe hebûn.

Ew deynê karkeran, ne tenê dêynê wexta Mehdî bû, gelek deyn jî ji salên berê de mabû. Karkeran çima heya wê demê dengê xwe nedikirin? Karkeran bona ku bi salan zam û ucreta ku nekarîbûn bigirin, îro bi dijitîya navbera serokê sendîqê Zekî Adsiz û Mehdî Zana ji bo xwe şans didîtin û bona wê jî ew ji hemû çalakîyan ra amade bûn. Tiştê ku îştiha karkeran vedikir û ew ji bona grevê motîve dikirin şîyarbûn û pêşketina çînayetî nebû, hêwîya girtina perên berhev ketîbû.

Karker ne ji bona şuûra çînayetî, xebat û qezanca îdeolojîk, ji bona perêyên ketibûn ser hev bigirin berxwe dida. Daxwazîyek miştêrek karker weka qulmekî anîbûn bahev. Di navbera sendîqê û şaredarîyê de rêyek navîn nehat dîtin û karkerên şaredarî ya Dîyarbekirê di 8 Tebaxê 1978 an de neçûn ser kar û dest bi grevê kirin. Karkeran bi dahûl û zirnê li ber derê şaredarîyê, li meydana ber Ulu Camîyê goved girtin û doza xwe parastin. Gel li daxwazîyên wan xwedî derket. Rojê sedan kesî ew der zîyaret kir tevî karkeran govend girt û sedêmên grevê guhdarî kirin. Dîlana karkeran bala turîstan jî dikişand, hinekan ji wan jî xwe ranedigirtin û diketin gowenda karkeran.

Moralê karkeran bilind bû û şahîya wan jî bi coş bû. Lê kuçe pir qirêj û bi bîn bûn. Rojan bû kolan û kuçên bajar ne hatibûn, paqiş kirin, der û dor di binê gemarîyê dabû. Li hin cîyan çop û bermayî ku komî serhev kirîbûn mîna sergûyan bibûn lod. Demsal jî havîn e û germ bû, meyve û sebzeyên helisî bermayîyên xwarinê bîna xirab pêyda dikir.

Şevikê hin karkeran çop li ser merdîvana şaredarîyê û li ser ereba şaredar jî rijandî bûn. Wê provakasîyonê di nava me de nîqaş pêyda kir. Xûya bû ku hin kesên armancxirab dixwastin berê grevê biguharînin.

Piştî berxwedanek 35 rojan karkeran hemû pere û mafê xwe girtin, grew bi serkevtina karkeran dawî bû.

Sendîqê ew karkerên ji kar hatibûn derxistin, bikarin vegerin ser karê xwe, hin xebat kirin lê serneket. Mehdî karkerên ku ji kar derxistî bûn şûnda negirtin kar.

Karkeran piştgirîya komîta sendîqê nekir, ew qasî ku li mafê xwe xwedî derketin, li hevalên xwe xwedî derneketin.

Hin kesan çêkirina şoreşa sosyalîzmê tenê karê feqîr û cahilan didîtin. Bona wê jî kesên belengaz, feqîr di têkoşînê de bi eleqeyek dalqawuxî dihatin mezin kirin.

Zekî hin caran barê giran dikir ser karkerên belengaz yên şaredarîyê. Te digot hela şoreşa Kurdistanê bûye para karkerên daîra paqişîyê.

Her çiqasî ku zanistîya çîna karkeran mafê çêkirina şoreşê kirîbû para çîna karkeran, dîsa jî şoreş çêkirin karê her cure karkeran nebû. Karkêrên welatên pêşketî, karkerên fabrîqan û endustrîyê tiştekî din, karkerên şaredarîya me tiştekî din bû.

Karkerên me heya êvarî li sûkan digeriyan, bi şertên pirimitîv bi bêr û saqolê toz û pintitîya bajar paqiş dikirin. Li ber pozê wan dismalek jî tune bû, her roj toz û pintitî li mêjo, lêv û pozê wan dihêwirîya û mêjoyê wan genî dikir.

Gelekê karkeran lingekî xwe li bajar lingekî xwe lî gund bûn, ziraet dikirin. Zar û jinên xwe li gund bûn. Ango ew ne tam gundî, ne jî tam karker bûn. Piranîya wan bi rîya torpîlê, alîkarîya mabeycîyan ketibûn kar, kesên ku ew girtbûn kar ji sendîqê bêtir li wan tesîr dikir.

Ji wan karkeran çend kes ketibûn komîta sendîqê jî. Me dizanîya eger ku Şaredar li wan zor bike, berî her kesî ew nunerên usa ji sendîqê veqetin. Rastî jî piştî ku navbera sendîqê û Şaredarîyê de problem derket, hindek karker ji kar hatin derxistin, hinek ji komîta rêvabir, berî hemûyan sendîqe terikandin û çûne ba Şaredar.

Zekî ji bo rexnê min ya diji qadroyên usa, di pirtuka xwe de dibêje ku (Kazim Budak) M.Alî bi karkeran bawerî nedianî.

Ez di nava karkerandabûm, bi wan ra semîner çêdikir, ji ber wê bawerim min ew rind nas dikirin. Dîtina min ew bû ku sewîya zanîn û babeta karkerên şaredarîya Dîyarbekir nedikarî ji şoreşa Kurdistanê ra pêşengî bikira.

Herkesê navê xwe karkere em nikarin rol û wezîfa çêkirina şoreşê bidinê, an jî ji wan şoreşê bixwazin.

Karkerê herî baş ew bû ku kar û zerara xwe bizane, ji çîna xwe ra îxanetê neke, bibe miroveki baş, dê û baveki baş, hemwelatîyeki baş.

Dêrsim ne di nav de li Kurdistanê di nava endamê sendîqê de karkerek jin jî tune bû. Ne di civîneke da, ne jî di semînerikê de yek jin jî bejdar ne dibû.

**Hilbijartina nunertîya DÎSKê ya Herêmê** (6ê Gulana 1979an)

Ez perwerdekarê herêma 7an a Genel-İş ê (Genel-İş 7.bölge eğitim uzimanlığı), Zekî serokê Sendîqa Genel-Îş ya Dîyarbekir, Nazîf jî nunerê sendîqa Genel-Îş ê bû.

Em hersê heval jî di yek cîh de dixebitîyan û em hersê di komîta herêmî ya partîyê dabûn. Ji ber wê em wek komîta sendîqê dixebitîyan.

Wexta ku nunertîya DÎSK ê ya herêmî hat rojewê di komîta herêmî de heval li ser rawestîn. Ji me her yekî dîtina xwe anî ziman. Zekî ji bo nunertîyê xwe pêşniyar kir.

Zekî serokê sendîqa Genel-Îş ê bû û gelek waxtê xwe li sendîqê bi xebatê derbaz dikir. Xebata wî jî têrê nedikir, me hevalên din jî alîkarîya wî dikir. Lê gora bawerîya min karê du sendîqan ji wî re gran dihat, ber wê min jî Nazîf Kalelî pêşniyar kir. Lê wan dane zanîn ku herdu kar jî, xîtabi yek herêmê û karkeran dike, ji bo wê nabe asteng û berendametîya hevalê Zekî hat pejirandin.

63 nunerên sendîqên girêdayî ya herêma dehan, ya DiSK ê ji bajarên Dîyarbekir, Mêrdîn, Rûha, Dêrsim, Van, Muş, Bêtlis, Sêrt, Adiyaman, Xarpêt, Çolîgê, 5ê gulanê 1979 an hatin li Dîyarbekir civîyan. Sendîqa karkerên şaredarîyê (Genel-Îş) pêşwazîya wan kir û ew kirin mîvan.

Hilbijartin bi atmosferek demoqratîk de hat çêkirin. Zekî di helbijartina 6 Gulan 1979 an de bi piranîya dengan hat bijartin û bû nunerê DÎSKê ya herêma 10 an.

**Bîranîna 15-16 Hezîranê**

Piştî hilbijartina nunertîya DÎSK ê, komîta sendîqê biryara civîna Bîranîna 15-16 Hezîranê girt. Li bajarê me halê awarte (îdara orfî) hebû. Ji ber wê sedemê ji ciwînê ra cîh dîtin gelek zahmet bû. Midûrê Merkeza Perwerda Gel (Halk Egitim merkezî) mamostekî demoqrat bû. Bi rîya wî me Salona Perwerda Gel girt, ew astengî me derbaz kir.

Kesên ku hatibûn civînê gelek bûn. Sekreterê Dîsk ê Fehmî Işiklar, Serokê sendîqa Cam–Îş ê A.Riza Gûlkaya, (ji gundê Karê-Dêrsimê), ji Dîyarbekir gelek nuner û serokên sazî û komelên demoqrat di civînê de cîh girtin. Helbet têra xwe polîsên sîvîl jî hebûn. Ji bona rêvabirina civînê Sendîqaci M.Emîn Kardeş hate bijartin.

Berbi dawîhatina civînê polês dev ji guhdarîkirinê berda. Zekî Atsiz, Fehmî Işiklar, Atilla Budak (nuner), A.Riza Gulkaya, Parêzer Zîya Acar û hinekê din serhev 15 kes girtin û birin. Ji ber ku polês tepkîya kîtlê nekişine ser xwe, qurbanên xwe gelek bê deng kom kirin.

A.Riza rêza li pêş min rûdinişt. Polîsek hat di navbera rêza min û wî de sekînî. Polîsê din hat milê Alî Riza girt û ew bir. Dawîyê me sekir ku wan A.Riza bi şaşitî, di cîhê min de birin e. Li gorî gotina hevalê ku di civînê de nêzî polîsan rûdinişt, şef ji polîs re gotîye Kazim Budak bigirin, polîs dibêje ew kîjane, ez nas nakim, şef dibêje ez terim nêzî wî disekinim û tê li nêzî min disekine. Lê polês şaşitî wî digire. Bi henekî min ji A.Riza re di got "ha tu, ha ez em herdu jî ji Dêrsimê ne."

Civîn gîhiştîbû dawîyê, me dî ku dora girtinê tê hevalên din me civîn qedand û heval belav bûn.

Min ji merkeza sendîqan re telefon kir ji rewşê ew agahdar kirin.

Ji Genel Îş`ê cigirê serok Îsmaîl Hakki Onal hat Dîyarbekirê ji rewşa girtiyan re bû alîkar. Di navbera 10-15 rojan de xeynî Zekî hevalên din ji girtîgehê hatin berdan. Zekî nehat berdan û ew birin girtîgeha leşkerî.

Lê hevalê girtî bibûn, mixatabê êşkence û lêdanên hovane. Bi şahadîya Parêzer Zîya Acar gava ku wan digirin bin çavan polêsê sivîl bi qundaxa keleşkofê bê ku haya wî ji xwe hebe ji para li Atîlla dixine. Atîlla demek dûrûdirêj, ew jan tim di laşê xwe de hîskir.

Zekî ji bona ku li himber kirinên zîndancîyan derdiket êşkencên giran dît. Wî astsubayê ku lê heqeret kirîbû, toqat kiribû. Wan jî ew carek din girtî bûn êşkencê. Di zîyaretîya wî de, di suret, lêv û qorê wî de derbên êşkencê min bi çavê xwe dît. Wî bi xwe jî got diranekî wî jî hatîye şikandin.

Bi vê bûyerê em him xemgîn bûn, him jî bona azadkirina wî me xebat bilindtir kir. Me ser navê sendîqê belavokek belav kir, êşkencên ku li girtîgehê dibûn rusva û protesto kir.

Ez û Nazîf bi karkerên endamên sendîqa Genel Îş ê re peyîvîn, ew her roja Duşemîyê, roja hevditinê, sedan karker herin girtîgehê, dîtîna Zekî. Li ber derê girtîgeha leşkerî kom bibin, navê xwe binivîsin û wan bêzar bikin. Kesên ku bo dîtina girtîyan diçûn girtîgehê nav û navnîşana wan ji hêla leşker va dihat nivisîn. Di roja destpêka eylemê wazîfederên girtîgehê hîn negîhandîbûn navê hemû zîyaretçîyan binivîsîn wext temam bibû. Sedan karkeran ew berxwedana pasîv pêkanîn. Katib û rêvebirên girtîgehê ji navnivîsînê û ji tevliheviyê bêzarîya xwe dianîn ziman.

Partîya Komara Gel (CHP) hikûmat bû û va zilma di dema wan de diqewimîya. Me tevî karkeran li ser berpirsîyarên liqê Dîyarbekir ya Partîya Komara Gel têkilî û propaxanda zêde kir. Ji wan xwest ew bi merkeza xwe re têkilî deynin û pirsê çareser bikin. Hewldana me serket, Partîya Komara Gel du parlamenterên xwe Erol Tuncer û yekî din(navê wî nayê bîra min) şandin Dîyarbekir. Wan di civîna karkeran de cîh girtin li gotin û gazinan guhdarî kirin. Axavitvanan di peyva xwe de him hikûmat rexne kir, him jî rîya rast rava wan kir. Dora roja din ji liqê Dîyarbekir ya Partîya Komara Gel (CHP) ji me re xeber hat. Ez çûm partîyê. Parlamenterê kevn Hesen Deger[53] û çend kesên din tevî heyeta CHP ê- Erol Tuncer li wir bûn.

[53] Hesen Deger ji Çolîgê û Kurdê Zaza bû. Mêj ve hatibû û li Dîyarbekirê ciwar bibû. Di nava Zaza yê Dîyarbekir da xwedî giranî bû. Wek gelek Kurd wî jî îmkanê perwerdê û xwendinê ne dîtîbû. Ji ber ku Tirkîya xwe kêm bû, di derheqê wî da hinek pêkenî jî çêkirî bûn.

Destpêkê li ser hin çetinahîyên li ber hikûmatê û problemên gelemperî hat peyvandin. Xasima parlamenter Tuncer ji sazîyên demoqratîk (TÖB-DER, POL – DER û TUM – DER) gazinên xwe anî ziman. Piştre axavitina xwe anî ser kakilê hevdîtina me.

Wan ji mehkemê soz girtî bûn, Zekî çend rojan şûnde wê bê berdan. Rastî jî ew roja ku wan dabûn me, Zekî hat berdan.

**Deklarasîyona Hevkarîya Demoqratîk a Netewî (UDG)**

Hêzên Kurd ji pirsa hevkarîyê û enîyek netewî dûr bûn. Li himber hev di nava reqabetekê dabûn. Ne digotin ku ew rojekê di enîyekê de cîh bistînin, ji ber wê jî li himber hev bi tolerans û tehamul tevbigerin.

PSKT di weşanên xwe de bi rexnên bêwext û hişk sînor da navbera xwe û hin hêzên din. Lê bo hevkarîyê gavê pêşin jî dîsa PSKT ê avit. Bi pêşniyara PSKT- Rîya Azadî hevdîtinin HEVKARÎYA DEMOQRATîK A NETEWÎ (UDG) ê berê di navbera Rîya Azadî û Şoreşgerên Demoqrat (ŞD) de li Dîyarbekirê destpêkir. Ser navê Rîya Azadî min û Nazîf Kalelî tevî du hevalên Şoreşgerên Demoqrat ji bona pêkanîna yekitîya hêzên netewî dest bi guftûgoyan kir.

Piştre bona xebat zutir pêşkeve hêjmara nuneran daxistin yekê, ser navê Rîya Azadî Nazîf tenê beşdar bû.

Tevî hevalên ŞD tiştên me yên hevpar gelek bûn, lê partîya me dixwast tevgera Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistan (KUK) ê jî di vê xebatê de cîh bigire. Herdu hêzan li himberî hev rexne û dîtinên xwe hebûn. Ji ber wê ŞD tevî tevgera KUK ê xebatê ra ne amade bû. ŞD têkilîyên KUK ê ya bi KDP ê-Qîyada Muvaqet ra şaş didît, KUK girêdayîyê KDP, kevnepereset û bi emperyalîzmê va têkildar dîdît.

KUK ê jî bona bi hev ra xebatê dixwest ŞD dîtinên xwe biguhare, ji ber wan dîtinan xwe rexne bike û têkilîyên xwe yê bi Yekitî û TKP ra jî biqedîne.

---

Di salên 70 da di polîtîka Dîyarbekirê da xwedi granî bû. Di Partiya Komara Gel dabû parlamenter. Di sala 1977 da rojekê tevî çend merivên xwe hat komela mamostan (TOB-DER ê) zîyaretiya me. Yekî ji du wî 3 berxên pir jar dajot, berx anîn kir bêxçê komela maosteyan a li Yek Derî.
Ew berx Hesen Deger ji bona komelê wek dîyarî anî bûn. Berî hilbijartinan wî dixwast dilê mamostan xwaş bike. Me jê ra spas kir berx girtin. Lê berx pir zeîf bûn ku bihatana firotin, goma me jî tunebû ku em wan xwedî kin. Di cîda Mamoste Fîkrî Olmez hindek pere da komelê, me hev ra berx bir gundê wî.

Lê Hesen Deger meriveki welathez bû, di bûyera sala1975 an da ku Tirkeş ne karî li Dîyarbekirê mîting darxîne û ji bajar hate qewirandin Hesen Deger tevî hêza xwe aktîv cî girt.
Rojekê ser navê CHP ê tevî hin sazîyên demoqratîk wek TOB-DER, TUS-DER, TUM-DER ê beşdarê civînikê bibû. Di got "topder, tozder, tomder, sizder, bizder, hepsî der wek hevin."

Lê pir derbaz nebû cehd û xebata hevalan berhem da. Herdu hêzan jî rexnên xwe li himberî hev nerm kirin û bi hev ra xebat pejirandin.

KUK ê jî biryar da û ket nava xebatê. Lê gorî protoqola hevhatinê ŞD, qebul kir ku ji ber dîtinê xwe ya ser KUK ê, bi nivîskî xwe rexnebike. Lê ŞD ê ew yeka pêk nanî.

Piştî hevhatina li ser proxram û destûrê Sibata 1980 de Deklarasyona Hevkarîya Demoqratîk a netewî (UDG) li ser navê Şoreşgerên Demoqrat, Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistan û Rîya Azadî hat belav kirin. Bi vî awayî ji raya giştî ra hate êlan kirin ku sê hêzên Kurdistana Bakur li ser proxrameke hevbeş tifaq kirine.

Li Kurdistanê welatparêz bi vê agahdarîyê kêf xwaş bûn, gel piştgirî nîşanda û dilxweşîya xwe anî ziman. Lê prensîbên ku hatîbûn tesbîtkirin hêzan pêk nanîn. Ew jî bû sedemê bê bawerîyê.

Bingehên tevgeran ji bona hevkarîyê ne amade bûn. Bingehê KUK ê li Dîyarbekir ji deklarasyona UDG ra, digot "dalevêrasyona UDG ê". Li gorî hevhatinê lazim bû ŞD, xwe rexne bike û hin dîtinên xwe yên li ser KUK ê şûnde bigire. Lê wan ew yeka nekir. KUK ê bi nivîskî ŞD rexne kir û xwe ji UDG ê kişand.

Ew yek ji bona KUK ê ne sedemek bingehîn bû, di esle xwe de KUK ji xebatê ra ne amade bû. KUK ji rexnên Rîya Azadî[54] ya li himberî PDK-Iraq jî nerehet bû. Wê nerehetîya jî di xebata Hevkarîyê de rola xwe bû. Her wext PDK-I li sîyasetên KUK ê tesîr kir.

Hêzên dervayî xebatê li himber UDG ê propaxandên ne baş kirin.

Şoreşgerên Demoqrat, xwe nêzî Yekitî ya Nîştimanî Kurdistanê, Rizgarîya Neteweyî ya Kurdistanê jî xwe nêzî KDP-Qiyade Muvaeqet didît. Bi kurtî şer û nakokîya navbera KDP-Iraq û Yekitîya Nîştimanê Kurdistan- Yekitîyê û li cem wan cîh girtin herdu hêzên welatparêz anîbûn himberî hev. Xasima di sala 1978 de li Colemêrgê şerê ku di navbera Yekitîya Nîştimanî Kurdistan û Qiyade Muvaqet de derket, herdu hêzên bakur ji hev dûr xistin.

Di civîn û hilbijartinên sazîyên demoqratîk de jî em dibûn şahadê rexne û sucdarîyên usa.

---

[54] Di sala 1977 an da Barzanî di rojnamek Îngîlîz da, wezîrê karêder yê Amerîka Yekbûyî Kissinger rexne dike. M.Barzanî dîsa di nameya ku ji Carter ra nivisîbû behsa têkilîyên xwe û Nîkson dikir. Kissinger û Nîkson (serokê Amerika yekbûyî wê demê) di destpêka şerê Iraq û Kurdan da Kurd ber bi şer dehf dane, bi rîya dewleta Îranê soza alîkarîyê dane wan.

Lê piştî ku Îran û Iraq li Cezayirê hev hatin, Îranê alîkarîya Kurdan qedand.

Nameyên Barzanî û bersivên rayedarên Amerîkî di kovara Özgürlük Yolu da hatibû weşandin. Kovar bi şirovek giştî bûyerê tahlîl dike û rayedarên PDK ê bi îxanetê sûcdar dikir.

Wê demê ji Emerîqê alîkarî xwestin û ew dost dîtin cerîmeke mezin bû. Le nuha hemû lîder û serokên Kurdan dixwazin ji Emerîkê ra têkilî daynin, lê dest nakeve.

Wek di hilbijartina TOB-DER ê a Dîyarbekirê ya sala 1978 an peyîvdarê ŞD an bi gotina "Ma hun dixwazin Kurdistanê bikin eyaleta Amerîka ya 58 an" Axavtevan nameyên M. Mistefa Barzanî bi bîr dianî. Bi van gotinan PDK û KUK hev ra rexne dikir.

Komîta UDG ê ji hin xebatên rojane bêtir nekarî xebat bike.

Di wê wextê de di nava KUK û PKK ê de şer derket. Ji herdu alîyan dora 100 kesî mirov hat kuştin.

Ji ber bûyera sînema Dîlanê jî polês êrîş anî ser qadroyên Rîya Azadî, ji ber wê gelek qadroyên me bêgav bûn ku xwe biparêzin.

Dawîyê UDG belav bû, lê pê xwe şopik jî hişt. Ji ber wê şop û mînakbûna UDG, li gorî rewşa nû li Sûrîyê tevgerên Kurdistana Bakur ji bo hevkarîyê ketin nava hevwdanek nu.

**Kongra (PSKT) Partîyê ya yekem (1ê Çilê Paşin 1980)**

Merkeza (navenda) partîyê ji bona beşdarîya kongrê ji her herêmê serokê komîta herêmî jî di nav de sê nuner daxwaz kiribû.

Em nunerên Dîyarbekirê êvara 30 ê Çileyê Pêşin bi taksîya sendîqê rê ketin, dora roja din sibê da me xwe gîhand Enqerê.

Salona mala ku cîvîn lê dihat çê kirin şiklê pîroz kirina serê salê hat dayîn. Mase bi xwarin, alkol, fîkî hatin dagirtin, lê kesî alkol venexwar.

Li qatê ser me jî qadroyekî partîya faşîst Avnî Çarsancaklî rûdinişt.

Hêjmara me ne zêde bû, yên ku beşdar bûn 23 ê kes bûn, du kes FaruqAras û Ayhan Kutlay jî ne amade bûn.

Nuner hemû mêr bûn, jinek jî di nava me de tune bû. Wê demê me hîn jinên xwe nekirîbûn endam! Yên ku me sira xwe jê vedişart herî zêde jinên me bûn. Me jîyana xwe bi wan ra di malekê de derbaz dikir, lê ew ji gelek xebatên me bê xeber bûn. Dîtin û pêşniyarên wan girtin jî qet nedihat bîra me. Şoreşgerî û welatparêzî tenê di binê tekela mêran dabû.

Sekreter Kemal Burkay rapora xwe pêşkeşî kongre kir. Hema hema kesî tiştek negot. Heval him bê tecrube bûn him jî di şertên îllegal de bê hazirî bûn. Wekî din jî me tenê civandina kongre serê xwe wek karekî serkevtî didît.

**Hin biryarên ku kongre girtin ew bûn:**

* Hêjmara komîta merkezî (navendî) ji 9 kesan bû 11 kes û sê kes jî wek cîgir hatin bijartin. Polîtburo jî ji 3 ê kesan derxistin 5 kesan û ji bo wan xebata profesyonelî hat pejirandin.

* Li gorî pîvanê destûra partîyê di nava xort û karkeran de qadroyên layiq bona endametîya partîyê bêne bijartin. Hêjmara endamên partîyê bê bilind kirin.

* Komîtên herêmî li cîhên ku pêwîstî hebe li gorî destûrê bikare komîtan damezirîne.

* Navê partîyê û proxrama partîyê bê eşkere kirin.

* Di bin qontrola partîya illegal de ji bo damezrandina partîyek legal bê hewldan.

* Partîyê di kongra xwe ya yekem da, di biryar û tesbîta xwe de agahdarîya hatina faşîzmê dide û tedbîrên ku bêne girtin jî îşaret dike.

(... meyla daxwazîya faşîzmê ku di salên dawî de bilind bûye, îro pirtir bûye. Sermaye, bi rîya hikûmata Demirel, eger ku, ew bêcemeke, raste rast bi rîya darbeyek leşkerî berê xwe daye damezrandina dîktatorîyek faşîst.)

Lê çi heye ku meriv nikare bêje partî, li gorî biryar û tesbîtan tevgerî û tiştên ku lazim bûn pêkanîn. Bûyera ku li sîneme qewimîya êrîşên bêwext anîn ser qadroyên partîyê. Piçekê jî bê tecrubetî, di cîh guharandina qadroyên deşîfre, wezîfedarkirina kadroyên nû, parastina qadroyan de partî bi plan û serkevtî nebû.

* Kongrê girîngîya kar û xebatên leşkerî û îstixbaratî destnîşan kir û wezîfên ku divê bê kirin tesbît kir.

* Kongre polîtîka partîyê ya ji bo hêzên Kurdîstanî û hêzên Tirkîyê tesbît kirîye û rêva dibe pejirand.

* Kongre îdara otonomi ya ku di navbera Baxdad û Kurdistana Başûr de hate îmzakirin û serneket wek paş ketin dibine. Sedema vê paşketinê jî polîtîka PDK ya bi emperyalîzmê ve girêdayî û polîtîka ya hikûmata Iraqê ya şoven û durû ve girêdayî dibine.

* Kongre, Federasyona Komkarê slav dike. Karker, xwendevan û ronakbîr xebatên ku li Ewrûpa ji bo doza Kurd dikin girîng dibine. Ji ber xebatên komela Komkarê, komelên karkerên Swêd, Danmarq û cîhên din û komela xwendevanên li Ewrûpa - AKSA yê kêfxweşîya xwe tine ziman.

* Kongre, li himber emperyalizm, kolonyalîzm û faşîzmê serkevtina gelê Vîetnam, Qamboçya, Angola, Gîne, Rodezya, Nîkaragua, Afganîstan û Îranê bi can û dil slav dike û di meşa rîya sosyalîzmê de piştgirîya wan dike.

* Kongre piştgirîya xwe ji bo hêzên pêşverû yê cîhanê, yên ku ji bo dinyake bê şer û bê çek ditêkoşîn kir.

* Hin kadroyên ku ji alî porovakator, faşist û maoiyan va hatibûn kuştin, hatin bîr anîn.

***

Wexta ku dor hat hilbijartinan, delegekî pêşniyar kir, ku kesên di hilbijartinan de bibûn berendamê (namzetê) Partîya Komara Gel (CHP) di komîta merkezî de cîh negirin. Ew pêşniyar daxwaza gelek nuneran bû. Hilbijartina komîta merkezî wext girt. Nuneran ji bona komîtê hin kes pêşniyar kirin, hinekan erê got, hinekan na gotin. Mistefa Budak û ez jî hatim pêşniyar kirin lê me nexwast di komîtê de cîh bigirin.

Xasima Zekî û hin hevalên din pir dixwestin em herdu bira jî cîh bigirin. Lê min xwe amade ne didît, Mistefê jî ne dixwest. Ji ber wê di serî de me na got. Wext derbaz dibû lîsta Komîta Merkezî temam nedibû. Lazim bû hîn sibe ne bûye em ji wir biçûna.

Min dî ku bêyî me temam kirina lîstê çetine, min pêşniyarek anî. Min got: mîna Barzanîyan di Komîta merkezî de cî girtina du biran ne baş e. Wekî din jî rîskên xwe hene. Bila Mistefa di Komîta Merkezî de cîh girtinê qebul bike, ez jî cihgirîyê qebûl dikim. Mistefê got "Ez naxwazim, tu çima ser navê min dipeyivî, dixwazî tu cîh bigire" Hevalan piştgirîya pêşniyara min kirin û wî şiklî lîste temam bû.

Lê li ser kongre ra pir wext derbaz nebû li Dîyarbekir bûyera sînema Dîlanê qewimîya. Kuştina serbazekî Tirk êrîşek bêwext anî ser kadroyên partîyê. Bona ku partî bikare qadroyên xwe ji operasyona dijmin biparêze hemû hêz û enerjîya xwe bona wê xerc kir.

Lê partîyê hîn ew êrîşa dîjmin derbaz nekirî bû, di 12 Îlona 1980 de bi darba leşkerî ya faşîst ra rûbirû ma.

**Li Dîyarbekir bûyera sinema Dîlanê**

Di roja 20 ê Adara 1980 ê di sînema Dîlanê de spontane bûyerek qewimî. Dema temaşekirina fîlmê navber tê dayîn, grubek welatparêzê Kurd dixwazin belavoka UDG ê ji beşdaran ra bixwînin. Lê kesek, naxwaze guhdarî bike û derdikeve derva.

Lê li derketinê, bi yên ber derî ra nîqaş dike û dest li xwe digerine. Li gorî beyanên kesên wê derê wî xwastiye şeşagirê bikişine. Wê demê endamêkî DHKD ê O. T. sîlah dikişîne û wî dikuje.

O, çend salan berê di dibistana Baxlerê de xwendewanê me bû. Berî ku ev bûyer biqewime ew û endamekî (DHKD) Komela Çanda Gelê Şoreşger, Alî Atilgan hatibûn Sendiqê, cihê ku em le dixebitiyan. Wan ji berpirsîyarê Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê ji Nazif silah dixwast.

Maoyîyan ew tehdit dikirin û şeşagir nişanî wan didan. Li gorî wan, "Partiya me çima ewqas pasiv bû û tu çekên xwe tune bû."

Me pir qala giringiya xebata demoqratik û zerara xebitandina sileh kir li tu niyeta wan tune bû, ku ew qane bibin. Dîtin ku em tawiz nadin rabûn çûn. Lê psîkolojîya ku ew tê dabûn diviya bû ku wan bûyerek bikira.

Wê rojê mivanê min hene, ez li mala xwe me û ji bûyerê bêxeberim, dora roja din haya min ji bûyerê çê bû. Me xwast gavekî zû O. ji Dîyarbekir bê dûrxistn.

Bûyer girîng bû, êrîşên polês dikişand ser partîyê. Polês jî hîn bê zanîn û bê tedbvir bû. Hîn rê û dirb nehatibûn girtin diviya ew ji Dîyarbekirê bihatana dûrxistin.

O..... li gundê Sêbîran-Uçkuyular xwe vêdişart. Ji bo Xarpitê du hevalan û O..... ra, bilêtên otobosê hat girtin. Plan ew bû du kesên li Dîyarbekirê otobosê sîyar dibin, li ser rîya xwe li gundê Sêbîran, O. jî bigirin herin Xarpitê. Ji wir bi rîya Dêrsim -Erzorim ber bi sînorê Îranê herin.

Lê çend saetan şunda wan du hevalan ji Xarpitê telefon kirin ku pakêt, ango O. negirtine. Serokê DHKD ê Kenan Kizil çû "pakêtê" ji gund bigire, rê bike. Lê piçikê şunda ew destvala vegerîya. Cara duyem me ew şand gund. Lê ew hîn venegerî bû, xortek hat cem min. Wî xwe da nas kirin ku ew ji Dêrsimê ye, dilxazê grubek Tirk Kurtuluşê ye û mamosteyê gundê Sêbîran-Uçkuyularê ye. Hevalê me O. li gundê wan, li ba eqrebên xwe ye. Gundî ji bûyerê agahdar bûne, gavikê zû ew ji wê bê girtin wê baş bibe.

Bo wî karî saetêkê berê me serokê DHKD Kenan Kizil şandî bû, min bi xwe bawer got; tu qet mereq meke heya tu herî gund, ew ji wir çûye jî. Mamoste çû, gavikê şunda hevalê Kenan hat dîsa "paket" neditî bû. Em li ser gund rawestîn, tê gihîştin ku du car bû, ew diçû gundê Şilbê û dihat.

Cara sêem min Kenan şîyand gund û ez jî çûm sendîqê min lambe tefandin, derî ser xwe de kilît kir û li benda vegera wî mam. Saet dora 10 Kenan vegerîya hat, vê cara wî pakêt şandîbû Xarpitê.

Çend rojan şûnde polîs bi agahdarîyên xwe, fêr bû, kê serleşker kûştî ye. Hêzên polîs û leşker ew yek ji xwe ra kirin mane û dest bi terorê kirin. Komele, sendîqa, qehve, mal têne sekirin û kê dixwazin digirin binê çavan. Şev û roj êriş dibin ser mal, sendika û Komelen nêzi tevgerê. Di sekirina komelê da, lista endaman, pirtûk, afîş û pere çi dît polês dest da ser. Hemû aligir û dilxwazên PSK bûn hedefa dijmin. Kesên ketin destê wan bi rojan êşkencê û zilmê re rûbirû man.

28 ê Adarê polîs û leşker hev ra avit ser sendîqê. Gelek heval li wir dixebitin an jî tên û terin. Wê rojê polês berpirsîyarê Partîya me ya Dîyarbekir û endamê komîta Merkezî Nazîf Kalelî û hin hevalên din girtin bin çavan. Ez û Zekî jî di nav de polês li hin hevalan jî digerî.

Lê wê rojê Zekî li Enqerê bû, ez jî tevî mivanê xwe Parêzer Ezîz Qehreman li nexweşxanê bûm. Di rê de rastî birayê Nazîf, Azmî Kalelî hatim. Wî got, " kekê haya te

jê tune, polîs avit ser sendîqê û Nazîf girtin birin. Li te jî digerin, nevî ku tu herî sendîqê. Polîs der û dor girtîye binê qontrola xwe."

Min rewş ji mîvanê xwe re behs kir û em ji hev veqetîyan.

Ez di rê û kûçeyên talde ra çûm sendîqê. Lê bêje hema hema kes li wir tune bû. Parêzer Weysî Zeydanli li himberî avahîya sendîqê li qehwê rûniştî bû, heval ji rewşê haydar dikir. Ez jî şîyar kirim ku dernekevim sendîqê. Lê ez bi lez çûm hindur, hin tiştên nivîskî hebûn min girtin û ji wir derketim.

Lambe hatîbûn tefandin, ew sixletîya mirovan nema bû. Li sendîqê pozxinîyek, serreşîyek hebû. Yek du kes û hin xortên ku ji pirsê haya xwe tunebûn li vir bûn. Ew jî li ber derketinê bûn. Alî Atilgan û Yilmaz Odabaşi hatin ba min, ew jî di şevê de amade bûne, çi bikin?

Piştî ku ez ji sendîqê derdikevim polîs du carê din tê sendîqê. Wê şevê û piştî wê jî çend rojan ne çûm mala xwe, ne jî çûm sendîqê.

Lê roja 30 ê Adarê êvarî saet 18.00 de min rîya xwe bi sendîqê xist. Birayê minê piçûk Cengîz û hevalekî xwe li wir tenê bûn. Piçekê şûnda Dr. Saleh ERDURAN jî hat. Ew jî di komîta partîyê herêmî dabû. Em li ser lingan piçekê axifîn şûnde min xwest em ji wir derkevin û şîyar bin.

Dr. Saleh zêde girîng ne digirt:

-Meriv netirse, polês her derê nikare qontrol bike uyd" Min got: Hevalê Saleh bi nav li min digerin, divê ez xwe biparêzim. Eger mumkîn be em xwe nedin dest û karê dijmin hêsa nekin. Gelek hevalên me hatin girtin, lazime karê heyî jî em bikin. Lê îro karê girîng ez paraztina me dibînim. Ji bo xwe bêjim, tirsa min tune, lê eger meriv tedbîr negire û bê girtin karê dijmin rehettir dike.

Me dirêj nekir, em ji sendîqê derketin. Derva baran dipekîne. Ez û Dr. Saleh bi hev ra dimeşin. Birayê min Cengîz û hevalê xwe dû me tên. Em ji Yek Derî – Tekkapi derbaz bûn me dî ku erebeke reş, li pê me ye.

Dr. Saleh bi stres û kelecan got: Polîs du me ye û ewê te bibin.

Min got, bila bibin.

Me bazneda, hemû xwînsarî û ceserata xwe komî ser hev kir û meşa xwe domand.

Erebê polêsan hat li ber derê bexçê TOB-DER ê li duşa me sekinî. Di navbera me de çar metre rê hebû. Çavên me hatin beranberî hev.

Polêsên erebê da, pênc kesên qelew bûn. yek ji wan li pêşîyê erebê rûdinişt, ji erebê derket desteki xwe li ser erebê li me mêzand, tu tiştek negot û dîsa ket erebê, ajotin û çûn. Min tu mane neda vê yeka, madem li min digerîyan çima ez negirtim?

Wexta me tune bû, em li ser bipeyîvin. Dr. Saleh mala xwe ji ya min ewledar didît. Daxwazkir ku ez herim mala wî. Lê bona ku polês em li ba hev dîtin, çûyîna

mala wî ne maqûl bû. Mala min li himber yek Derî, şêst metre li pêş me, di Ap.na Yunus Emre li qatê 7 an bû.

Ji Dr. Saleh veqetîm ber bi mal çûm, heta qatê dûem derketim, lê şunda vegerîm û min berê xwe da taxa Rezan. Sê rojan li taxa Rezan li mala dostekî mam. Li ser rewşa polês fikirîm, gîhiştim wê encamê ku polês dixwast şev bavêje ser malê gora dilê xwe operasyonekê çêke.

Di malê de li ba endamên malbatê min bigire, wan jî bike êşkenceke pîsîkolojîk. An jî wan dixwast ez rehet tevbigerim, bibînin ku ez tevî kê didîm û distînim, tevî wan bigire. An jî di erebê de ji bona min cîh tune bû lewma ez negirtim!

Min cîh guharî, nuha mala ku lê dimam 200-300 metre dûrî mala min e. Ji bo demek kin min rîya xwe bi mal xist. Hîn ketibûm hindur, li derî xistin, min bawerkir ku polês e, bi tirs derî vekir ku Kemal Burkay û Nîzamettîn Kaya ne. Gotin nexweş bû, lê ew der cîhekî bê ewleh bû, divîya ew li wir nemana. Min bi lezikî ji wan ra behsa bûyerê û rewşa xwe kir û ew şandin mala Alaettîn Înce.

Alaettîn di su Îşleri yê de mendîz bû. Ew di lojmanê de dima, kesên ku di lojmanan de diman memur û qadroyên wê daîrê bûn. Him cîyekî fermî bû, him jî zêde nas lê tune bû. Heta wê demê Alaettîn jî deşîfre ne bibû ji ber wê ew der cîhekî ewlehdar bû.

Burkay dixwast sînorê Rojava ve derkeve, dervayî welat, ji bona wê hatîbû Dîyarbekir. Ji ber opersyonên himberî partîya me gelek endamên partîyê xwe vêdişartin. Kesê ku bi sekreter ra eleqeder bibûna tune bû. Ji bona ku di gelek bajarên Kurdistanê de îdara eskerî hebû, gelek kesî xwe avitîbû bajarê mezin Dîyarbekirê. Ji Axriyê, ji Çolîgê, ji Sêertê, ji Çolêmêrgê... kesên ku lê dihat gerandin, an jî cezayê xwe hebû, li wir kom bibûn. Lê hindek hevalên me yê Dîyarbekirê mîvan hez nedikirin. Li Dîyarbekir kesên ku mîvan digirtin pir hindik bûn, lê malê me hinekan bê mîvan nediman. Hevalên ku ji derva dihatin hin caran derva diman. Ji bona karekî N. Basut û Saleh hatîbun Dîyarbekir karê wan ne bû, heta mehekê li mala min û Alaettin man.

Rojekê ez çûm mala xwe min dî ku tevî wan du kesên din jî hatine li malê rûniştîne. Gotin, "welle derva îdara orfî heye hemû heval çûn van hevalana li qehwê tenê man, me jî ew bi xwe ra anîn."

Herdu heval ji Heqarîyê bûn, di komîta şevê de cî girtîbûn û hatîbûn cezakirin, li wan dihat gerandin. Ji Bîngol du kesên ku lê dihatin gerandin bi mehan li Dîyarbekirê man. Ji wan ra pêydakirina mal, xwarin û çareserkirina problemên wan em gelek westandin. Hin caran jî wan mala ku lê diman begen nedikirin, TV. Daxwaz dikirin.

Ez û Alaettîn Înce bi hev ra li rêyan digerîn ku çawa sekreter bê problem bibin Cîzrê. Dawîyê Alaettîn bi hevalê xwe mendîz Ahmet Kasimoxlu ra peyîvî, wî bi

ereba fermî Kemal Burkay, ez û Alaettîn birin Nûsaybînê. Bi nav li min tê gerin, bona ku neyime girtin li mala xwe ranazêm, lê terim Cîzrê! Helbet ew yeka şaş bû. Ji ber ku li gelek bajarên Kurdistanê Dîyarbekir û Mêrdîn jî di nav de îdara orfî hebû û li ser rîyan, pir cîyan nixtê qontrolê hebû.

Ji Nusaybînê em çûn Cîzirê, bûn mîvanê Ata Wesek. Birayê wî yê mezin Sabrî Wesek şaredarê Cizîrê bû. Malbata Wesekan malbatek welatparêz e û di herêmê de naskirî ne. Wan xwast K. Burkay bi rîya trênê derbazî Rojava bikin. Lê wê şevê pir baran barî, ji ber baranê trêna ku ji Entavê divê bihata, nehat. Eger ku trên bihata wan bi rîya memurên gumriga Nusaybînê ew li trênê sîyarkira û derbazî Sûrî bikira. Me ji wan soza carek din kîngê here Cîzirê girt û em her sê bi hev ra vegerîn Dîyarbekir.

Berî ku em ji Cizîre veqetin li ser rîya xwe me gora Memê Alan û Zîna Zêdan ji zîyaret kir. Lê wek gor tiştek li ortê tune bû, kurmek ax bû. Der û dora wê jî ne paqiş bû. Ew gora, îşareta dereca hestên netewî ya Kurda bû.

Li Dîyarbekir ez û Burkay çûn mala mamosta Nuran ew ji Dêrsimê gundê Karê, cîranê min bû. Têkilî û dîtinên me baş bûn. Me bi hev ra ji TV ê nûçên êvarê guhdarî dikir, orfî îdara Dîyarbekir resim û navê tetikkêşê ku serleşker kuştîbû, eşkere kir. Didan zanîn ku kûjêrê bûyerê endamekî DHKD ê dilxwazê PSKT ê O..... e. Me ew ji Dîyarbekir mêjve der xistîbû. Lê li min dihat gerandin, tewî sekreterê partîyê di male kê de mayîna me şaş bû. Dîsa me K.Burkay bi taksîkê şand mala Alaettîn Înce.

Roja ku me ji Wesekan wek randevû girtîbû, Burkay çû Cîzêrê û ji wir derbazî Kurdistana Rojava bû. Lê Burkay di pirtûka xwe de ew yeka nenivîsîye.

* * *

Jina min ducanî bû, rojên xwe nêzik bû. 15 ê Avrîlê bona bizanim rewşa wê çawa ye, saet 5 ê sibê, min rîya xwe bi mal xist. Li sûkê tu kes tune bû, tenê raste endamekî DHKD hatim. Me bi çavan hev slav kir em derbaz bûn. Min mereq dikir ji Nazliyê re zarok çêbû an na. Lê mal vala bû, kes tune bû. Wê gavê ne îdara orfî, ne li min gerandina polês nat bîra min. Min berê xwe da nexweşxanê.

Li Nexwaşxana ku jin zarok tînin dinê li qatê dudoyan û di oda sêhem de min Nazli razayî dît. Rûken û kêfxweş bû, keça me ya dûem jî li nêzî wê bû. Çend saetan berê zarok çê bibû. Ew cara dûem bu ez di çêbûna zarok de ne li ba wê bûm. Min ew pîroz kir û jê lêborîna xwe xwast. Wê ew yeka tiştekî xezayî didît,çûyîna minê nexweşxanê jî di cîh de nedît ez rexne kirim.

Lê vêşartî xemgînîyek jî li ser dihate xûya kirin. Ji bo ku dîsa ji wê ra law çê nebibû hîssek feodalî ew nerehet dikir. Derketim herim derman bikirim, rastî, hevalê Selîm Atak hatim. Wî ez vegerandim û xwe çû derman kirî anî.

Êdî divê ez ji wir herim, min xatir xwast.

Carek din min firsend nedî, ez herim ba wan û navê keça xwe em bi hev ra deynin. Nazli yê navê wê danî Bejna.

**Dixwazim ji Dîyarbekirê derkevim**

Rojên xwe bi piranî di hindur de derbaz dikim. Sebra mirov namîne. Her roj çend heval têne girtin, li gorî rewşê va dewa pir bi kudîne.

Êrîşê polês bi hovîtî dom dike, Komele, sendîqa, qehve, mal têne sekirin, kî dikeve destê wan digirin bin çavan. Xeberên ku ji hevalên girtî tên îşkence û lêdan bê sînor e. Hevala mamoste a ku ez li malê dimînim eleqa xwe bi min ra baş e, lê di hindur de girtî mayin çetin e.

Di vê navberê de nûçek ne baş me girt. Li Faqulta Fenê, di nava xwendevanên ŞD û Maoyîyan de şer derketîye, bi navê Yaşar xorteki Maoyî hatîye kuştin. Yaşar, ji gundê cîran, ji Karê bû. Me hev û du rind dinasîya, ew hin caran dihat cîhê kar ba min. Ez pir ber kuştina wî ketim lê, min nedikarîya herim cinazê wî. Min ji Nuran a gundîyê wî xwast ew here cinazê Yaşar û ji bona şandina cinaze alîkar be.

* * *

Di sendîqa Yol-Îş ê de hilbijartin heye. Hevalê ŞD û Özgurluk Yolu dixwazin bi hev ra, bi yek lîstekê bikevin hilbijartinan. Lê li ser lîstê li hev nakin. Rojekê gotin hevalê ŞD ê hatine li sendîqê li benda min in, divê em hev û du bibînin. Ez çûm du hevalên ŞD ê M.Alî Çilgin û hevalekî xwe va hatine li wir rûniştine. Min got heya saetikê wexta min heye û me dest bi hevdîtinê kir lê em negîhiştin encamek hevbeş. Her grubek serê xwe kete hilbijartinan.

Lê piştî belavbûna me polês carek din davêje ser cîhê sendîqê. Hevalan xeber şandin ku ez carek din nerim wir û eger îmkan heye derkevim dervayî Dîyarbekirê.

Li mala heval û dostan dimînim, lê xwedîyê malan jî hêdî hêdî cîh û dilê xwe teng dikin. Rojekê partîyê ji min ra biryara xwe şand ku " ez ji Dîyarbekirê derkevim". Min bajar bêdeng terikand. Hevalekî bêtir jina min jî di nav de kesî haya xwe pê çênebû.

Hevalê Alettîn bi ereba fermî ez heta Erqenî yê birim , ji wir jî min otobos girt, çûm Xarpitê, Depê û Dêrsimê. Dora 15- 20 rojan li wan deran mam. Min 8 û 9 ê Gulanê li gundê xwe, li Haysivê derbaz kir.

Yêkem car bû ku di vê demsala de li gundim û xwaşikiya xeza-tabîat ê dibînim. Kelemê, dara mazî nû pel dida, ji nêzve mûyên ser wan û rengê wan mîna nermayîya qedîfê bû. Li pir cîyan palangên-komên daristanan bi comerdî tirşo û kifkarek rawa şivanan dikir. Çîm û sirmokên ku di mêrgan de bejn dabûn xwe digîhandin nava mirovan. Leylegên nîkûldirêj di cîhê mêrg û çîman de digeriyan, bi malok û mêşan xwe têr dikirin. Bayê biharê li gorî hêza xwe, genimê axpîna ya yekbejn di yek alî de gêr dikir. Dara behîvan der û dora gund mîna çarçoveke ji tobloya nava xwe hêjatir mezra me xweşik dikir. Behîvên gundên alîyê dinê çem jî der û dora xwe seranser bi rengên xweşik ve xemilandîbû. Heta 10 ê Gulanê li gund mam, lê daha zêde nikarim li vir wext derbaz kim. Dixwazim bi hevalên merkezî ra têkilî deynim.

Îro, min kurxalê xwe, Kazimê Piçûk şand Dêrsimê, bo ku nivînên Kemal Yukselê girtî bîne Dîyarbekirê, min jî da rîya Enqerê.

Kemal Yuksel li bajarê xwe, li Bîngolê, mamoste bû. Kuştina faşîstekî kirin ser Kemal û ew hat zîndan kirin. Di zîndana Xarpitê da, ji ber êrîşê faşîstan birîndarî filitî, hevalê li ba wî hat kuştin. Bi rîya Qazî Turabî Erdogan, Kemal berê neqlê zîndana Dêrsimê, dûra jî neqlê zîndana Dîyarbekirê bû. Dûra mîlîtanekî PKK îtiraf kir ku faşîst wî kuştiye. Piştî zîndana şeş salan Kemal azad bû.

Li Enqerê jî piranîya hevalan xwe vêdişartin, ji alî dewletê ve li wan dihate gerandin, dev ji kar û dibistanên xwe berdabûn, xwe ji polês diparastin. Polês, ji bûyera ku 20 Adarê li Dîyarbekirê, di sînema Dîlanê de qewimîya, hevalên PSKTê berpirsîyar didît. Ji ber wê li seranserê Tirkîyê berê xwe dabû wan.

Hewalên ku binçavkiribûn jî di derheqê partîyê de hin agahdarî dabûn polês, an jî gotinên polês bi zora êşkencê qebûl kiribûn. Polês di derheqê partîya me de xwedî hin agahî bû. Li Enqerê di nava endamên partîyê de tirs û belavbûnek hebû. Ji qadroyên merkezî kesî xûya ne dikir.

Heval Pîltan Erdogan û Bîlal Aksoy tu caran dostayetî û fedekarîya xwe texsîr ne kir in. Min nedikarîya li Enqerê bi nasnama xwe li otêlan bi ma ma. Şevikê ez û Bîlal bi hev ra çûn mala Metîn Çîçek. Çîçek ji Dêrsimê bû, ew him hevalê min, him jî endamekî partîyê bû. Hin caran ku ez diçûm Enqerê wî ez daweta mala xwe dikirim jî, me îro firsend dît, em herin bibin mîvanê wî. Wexta ku wî derî vekir û em li pêşberî xwe dîtin, rengê wî çû. Ew di navbera me bigire hindur a negire da ma. Xûya bû em demek ne rast da hatîbûn malê.

Me dî ku ew xwe pir nerehet dike, min got: saet 24 ê şevê ye, piştî vê saetê li gorî îdara orfî qedexeye ku mirov li derva be, ji xwe li me jî tê gerandin, usa ne bûna em nuha biçûna.

Tawrê wî hevalî em êşandin lê tiştê ku me bikira tune bû. Dora rojê dî ku şev bê qeza derbaz bû, piçek ken hat ruyê wî. Me xatir xwest û carek din jî ew qet nanî bîra xwe.

Hevalê Celal Doxan, ji Qersê ye, me di sendîqa Genel-Îş ê de hevûdû naskir. Me hev ra wek dersdar li bajarê Edenê, Mêrsînê, Hatay,Tersus û Îskenderunê semîner da karkerên şaredarîyan, endamên sendîqê Genel- Îş ê. Ew dixwaze, ez çend rojan li mala wî bîmîn im. Ew xwe Kurd, Elewî û pêşverû bû. Wî şevikê xwest em bi hev ra herin Golbaşiyê nêçîra masîyan.

Hin hevalên wî yên din jî, xwe amade kirin û em bi hev ra çûn.

Masîvan bi tedbîrin, wan kincên qalin li xwe kirine. Lê çekên ser min tenikin, herçî wext derbaz di be, hewa sar dibe. Em li himber serma û avê berxwe didin. Masîvanan agir û çira bi kar ne dianîn. Hemû tişt di tarîya şevê de bi sebir pêk dianîn. Bi dengê nizm bi hev ra dipeyîvîyan. Min ew yek mereq kir û ji wan pirsî, gotin ew li vê derê bê îzîn masîyan digirin. "Kesên ku ji kooperatîfê îzîn nestînin, nikarin li vir nêçîrê bikin. Jendirme jî hin caran tê û golê qontrol dike." Ji durve lambên ku ber bi me dihatin, nêçîrvan ditirsandin, digotin nebe jendirme bin, hazirîya xweya bazdanê dikirin. Ez wê demê bi hatina xwe ya vira pir poşmam bûm. Lê tiştê ku min bikira tune bû. Saet 3 ê sibê bû, masîvanan di nava xwe de masî parve kirin. Masîyê herî mezin dora 10 kîlo dane min, lê min masî negirt. Ji ber ku min tiştek nekiribû, tenê tevî wan serma xwarî bû. Ya din jî min çûyîna xwe ya wir pir şaş dît. Heke li wir bihatama girtin, ew li himberî partîya min bê berpirsîyarîyek mezin bû.

Sibê re em hatine mal, me bê qeza derbaz kiribû lê vê bêtedbîrîyê li ser min bandorek negatîf hişt. Min tu caran bawer nedikir ku girtina masîyan ewqas zahmet be. Masî girtin çiqas ked û wext dixwaze cara yekem min ew li vir dît. Ji bona wê jî min soz da xwe ku meriv caran bazarîya masîyan neke, beranberî vê zahmetîyê bi çi buhayî bidin jî li gorî min ew hêja ye.[55]

Dora 15 rojan li Enqerê mam. Piranîya qadroyên partîyê îllegal bûn, kes nizane çi bike, çawa bike? Divê ji vir herim, lê herim kîderê? Bi serê xwe biryar dayîn dikare, probleman derxine, berpirsîyrekî partîyê jî li ortê xûya nake. Sekreter çend mehan berê bi rîya Sûrî ve derketîbû derva. Hin qadroyên din yên merkezî jî dû wî derketin. Kesî ku bersiva pirsên endaman bide li ortê tune. Piştî çend rojan şûnde bi rîya Bîlal ji partîyê agahîyek û namek ji min ra hat. Partîyê dixwast ez herim li Edenê bimînim. Name ji endamekî partîyê re hatîbû nivisîn. Bi namê endam dihat agahdar kirin ku ew ji partîyê hatîye dûrxistin. Li min dihat gerandin, lê partîyê bi rîya min belge dişand. Ew yek neket serê min, lê hevalê ku name gîhandîbû min, got; ew nikare carek din xwe bigîhîjîne wan. Mecbûr mam min name girt, terim Edenê. Di rîya navbera Enqerê û Edenê de gelek qontrol hebû.

[55]Îro li Swêd jî hin caran bi ereban digerin li derîyan dixinin û masîyan difiroşin. Ji ber wê serborîyê pir caran wan destvala naşînim û jina xwe ra qala wê rojê dikim.

Nasnama minê vê carê, me li Enqerê derxistî bû, navê min Bekir bû û bajarê ji dayikbûna min Nîgde bû. Di sekirinêkê de polês nasnama min girt bir, li ber lambê erebê xwend. Tirs û kelecana min bêsînor bû. Min nama bêrîka xwe derxist di binê qoltixa ber xwe de vêşart. Piştî ku tiştek derneket min name girt, bê qeza min xwe gîhand Edenê. Nama ku bi min ra bû, min gîhand edrêsa wê. Min dixwest çend rojan li Edenê bimînim. Lê hevalên wê derê li wir mayîna min xeter didîtîn. Gotin, tu û kekê te Mistefa hûn pir dişibîn hev. Polêsê Edenê li pê şopa Mistefê ye, ji bo te jî xeter e. Pir rehet dikare te tesbît bike.

Birayê min Mistefa li Edenê mamoste bû, lê dihate gerandin û wî Edene terikandîbû. Li Enqerê haya min çê bû ku ew ber bi sînor çû bû ku derbazî Kurdistana Rojhilat be.

**Ez li Alanyayê mîvanê M. Nûrî Gorkey me**

Dora roja din ji Edenê derbazî Alanyê bûm. Li wir 40 rojan li mala M. Nurî Gorkey mam. Hevalê me yê kevn mele M. Nurî Gorkey nêzikayîyek germ nîşan da. Li Alanyê dukanek wî hebû, bataniye, çentê û tiştên ji çerm difirot. Mehmed Nûrî ji Sirûcê bû û melayê Çolîgê yê kevn bû. Nasî û dostanîyetîya me digîje salên 60 î. Dema ku birayê min Mistefa li Enqerê xwendevan bû, bi Mehmet ra heval bû, min jî bi rîya wî ew naskir.

Ew li Hacettepe di xanîyekî yekqat de rûdinişt îro ew cî komplexa zanîngeha Hacettepe ye. Dema ku ez jî çûme Enqerê, dibistana bilind me hevûdu six didît, hevaltîya me dom kir.

1972 an de dadgeha orfî ya Enqerê li min digerîya demikê li ba wî jî mam. Wê demê Mehmed li -Enqerê- Ulusê melê mizgeftê bû. Bi henekî digot were, di mizgeftê de xwe veşêre, hevcedarîya te heye çend xalîçan jî bibe bifiroşe. Lê min got tu min dixapînî ku qizilbaşekî bibî mizgeftê.

M. Nûrî Gorkey di salên 1973-75 an de çû li Bexdayê û Qahîrê ser meletîyê ders girt. Dema ku li Bexdayê bû, ji min ra name dişand, dixwast ez ji hin karên wî ra mijûl bim. Çend pirtûkên Ezîz Nesîn ji min xwestibû, min jêra şandin. Di nama xwe de nivîsî bû ku "pirtûkên Ezîz Nesîn li Bexdayê pir tên xwendin, carekê di otobosê de kesê ku dixwend bi dengekî bilind, teq teq dikenîya."

Wexta ku M. Nûrî Gorkey ji Bexdayê vegerî Enqerê. Wî ji Halfîn, Mînorskî û M. Emîn Zekî hin pirtûk ji Erebî wergerandîbû zimanê Tirkî û ew bi xwe ra anî bû. Ji ber hevaltîya me xwe nêzikî Rîya Azadî didît.

Ew werger dan min û xwest bi rîya weşanxana Rîya Azadî ew bên çap kirin. Min wergera Tirkî bir ba hevalan, K. Burkay usa ser lingan rûpel wergerand "na em pirtukên usa çapnakin" got û şunve da min.

Hevalan wê demê nexwestin wan çap bikin. K. Burkay[56] bi Erebîya Mehmet bawerî nanî, weşanxana Komalê ew pirtuk çap kirin. Lê başe ku Komalê ew kara kir û pirtûkxana kurdî bi wan dewlemendtir bû.

Cara dawîn havîna 2010 an de em malbatî çûbûn Alanyê betlanê. Min dizanîya Gorkey li wê derê dimîne, jêra telefon kir edrêsa wî girt çûm malê. Derê malê wekirî bû, ew di kursîyê bi teker de rûniştîbû. Nedikarî bigere, kut bibû. Birazîyê xwe girtîbû ba xwe. Qala rojên kevn, qala pirtûkên ku ji erebî wergerandîbû Tirkî û çawa anîbûn Tirkîyê, kir. Digot ji Iraqê derxistina wan gelek zahmet bû, eger li ser min bihatana girtin ez di cîda dihatim wenda kirin. Rojên xwe yê li Sirûcê wexta ku HEP de serokatîya liqê partîyê kirîbû, berxwedana gel û hovitîya neyar kir.

Çend carê din jî çûm zîyaretîya wî. Ji bona fedekarîyên wî yên kevn min jê ra alîkarî kir, zorê ew qebûl kir.

Hîn ez li welat bûm lawê min Bengîn ji Stockholmê telefon kir, got "hevalekî te telefon kir û ew nimara telefonê da min." Ez lê gerîyam yê ku telefon kirîbû, M. Gorkey bû, wî da zanîn ku ew nuha li huzurewî- aramxana Alanya bû. Çend caran em bi telefonê peyîvîn. Rojekê telefona wî bersiv ne da. Demikê şunda hemwelatîyê wî Ferîdun Kaya da zanîn ku ew çûye ser dilovanîya xwe.

**Vedigerim gundê xwe**

Bê şixul û bê kar ne dibû ez zêde li Alanyayê bimînim, bal dikişand. Ya din jî lazim bû ez bi partîyê re pêwendî deynim. Min rîya xwe bi Entavê xist, birayê xwe Atîlla û hevalên din dît. Ew di Enstîtûya Perwerdê de xwendewan bûn. Du mamostên nas Nîyazî Yaşar wek midûrê Enstitûyê û Îbrahîm Şahîn jî wek mamoste li enstîtûyê dixebitîyan. Çend rojan li cem xortan mam. Dora sîh-çel xortê ku li Enstitûyê xwendevanin li otelekê dimînin. Otel jî tim di binê qontrola polês de ye, kîngê li bajêr bûyerek diqewime, polês cara yekem davêje ser vê otêlê.

Piştî van agahîyan min cesaret nekir ku ez li otelê bimînim. Şevikê ku li mala mamoste Îbrahîm Şahîn bûm li derva du xort têne kuştin. Polês otêla ku xort lê diman jî di nav de gelek cîyan digire binê qontrolê û se dike. Şansê min hebû ku ez wê şevê ne li otelê bûm. Êvarê min biryara xwe da, ez ber bi Dêrsimê ketim rê. Otobosa ku min bilêt girtîye dîrek tere Xarpit, Dêrsim û Erziromê. Saet heyşt an jî

[56] Dîsa di sala 1986 an da bi minasebetekê li Hollandabûm. Gûndîyê min D. Îzolî ve me hevûdû dît. Îzolî Kurdî- Tirkî, Tirkî- Kurdî ferhengek amade kirîbû, ji min xwest ku ez bi hevalên partîyê ra bipeyîvim, ew dikarin ferhenga wî çapkin an na? Min ew pêşniyar gîhand hevalan, lê dîsa hevalan got "Kî bixwaze ni- kare ferheng binivîse." Lê D. Îzolî bi imkanên xwe Ferheng çapkir û ferheng di nava xwendevanên Kurd da belav bû û eleqe dît. Di sala 1991 an da di nava weşanên Deng da ferhenga Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî ji nuve hate çapkirin him jî bi pêşgotina K. Burkay. Di pêşgotina xwe da ew dinivîse ku" Bi ferhenga Îzolî ya Kurdî- Tirkî, Tirkî- Kurdî, cara yekê ye ku ferhengek xweşik hatîye weşandin."

nehê sibê li Pira Seyîdan ez peya bûm. Wê wextê li vê derê qereqola leşkerî tune bû. Piştî 12 Îlonê wek gelek cîhê din li vir jî qereqol hat danîn. Îro jî li wê derê ew qereqol hîn li cîhê xwe ye. Dora 100 leşkerê li wê derê di çûyin û hatinan de hemû ereban radiwestînin, bi saetan rêwîyan û çentên wan sedikin.

Ez li pirê peya bûm û min rêya rast, rêya erebê, rêya ku diçû nehya Moxindîyê cî hişt. Ew rê kintir bû, lê ji nava gundan ra derbaz dibû. Min nedixwest ez rast nasekî bêm. Min rê ya din girt, berçem berçem ber bi Kurkanê, Lemperê, Îsnîs û Axkilêsê ve ber bi Haysivê meşîyam. Neketim nava gundan, cîhên ku rêç pêneketine ji gundan dûr terim. Lê dem nîvê meha Tîrmehê ye roj bi tîn e, û pir tî bûm. Hin caran dadikevim ber çêm avê vedixwim dest û rûyê xwe dişom û rîya xwe terim. Wê demê hîn av bi şûşan de nedihat firotin. Başûr sînorê nava Axkilîs û gûndê meye. Êdî min rê nêzik kirîye. Ji Pira Seyîdan dora sê çar saetan de min xwe gîhand dîyarê Dara Şanan.

Wextê ra karmendên dewletê yên hatîne gundan û ji bo dewletê bac berev kirîne, ji wan ra gotine Şane. Şane ji wî alî ve hatîye û li binê wê darê bîna xwe girtîye. Lewma dibêjên dîyarê Dara Şanan.

Ez li binê sîya dara gîjokê rûniştim û min li mal mêzekir. Cîhê ku ez lê me gund ji kêlekêve xuya dike. Li bênderê yek gamê digerîne. Dîya min li ser banê xanî karek dikir. Hin zarok zû zû ji dêrî der dikevin derva û tên hindur. Navbera min û malê de 300 metre ma bû. Lê dîsa jî min lez nedikir. Nebe ku li pêşîya min dafikek hebe.

Kela kela germa havînê ez çûm gundê xwe.

Jina min Nazlî tevî keçên me Cîran û Bejna li gund in.

Jin û pênc zarokên Mistefê jî ji du mehan berê hatine, ew jî li gund in.

Ew bi hêwî ne ku di derheqê bavê xwe de ji min agahdarîyekê bigirin, lê sê mehê ku ez li vir û wê me min ew nedîye. Tenê dizanim ew ji bo ku derbazî Kurdistana Rojhilat be ji Enqerê veqetîye.

Berê ku me salê carê rîya xwe bi gund dixist nuha ji Gulanê vir de cara duyeme tême gundê xwe. Endamên malê bi dîtina min kêfxweş bûn.

**Min agahî girt ku tîmekî polês hatiye Xarpitê.**

Mamaoste Mehmet Alî Kaya bi zorê girtine cem xwe li hin qehwe û edrêsan li min gerîne. Mehmet Alî zanîngeh li Dîyarbekir xwendîbû, polês ew naskirîye. Çend polîs jî di qilixê çerçîyan de çûne li Dêrsimê Kotarîcê gundê xalanê min. Gotine ew ji Dîyarbekir, ji sendîqê min nas dikin û hevalên min bû ne. Dawîyê ew xwe didin dest. Xwedîyê malê Goral pê dihesê, çerçîyên nasê min!, dizîyan binê textên odan jî sedikin.

Lê gûnd jî ne cîhekî ewle ye. Dosya malbatê ya cem dewletê, ya ku hal û rewşa malbatê têde hatîye tomarkin ne baş e. Nuha jî em pênc bira li gorî sazîyên dewletê sûcdar têne dîtin. Ji ber vê yekê her tim mezra me di binê qontrola wan ye.

Kûçikên me şev û roj karê xwe rind dikin, ew, ji kesên ku tên gund me agahdar dikin. Hîşarbûna kûçikên me avantajek e, lê em nikarin tenê bi wan bawer bin. Pir bi plan û têkûz ne be jî her çar malên me gora xwe nobedarîyê jî digirin. Arebek, rêwîyek ber bi gund bê, kûçik bihewite, hema bala xwe didinê û me hîşar dikin.

Sîdar agahîya ku ji Dîyarbekir anî malbat xemgîn kir. Li Dîyarbekir polês avitîye ser mala me, birayên min Atîlla û Fîkret girtine.

Tiştê ku em dikirin fikaran ne girtina wan, êşkence û lêdanên ku dihate kirin bû. Ji girtîgehê kî sax û saxlem derkeve ne belû bû. Li gûnd rûnim û benda encama bûyeran bimînim karê kolonyalîstan hêsantir dike. Ez nikarim xwe bi qederê va girêdim û li himber bûyeran bêçare bim.

Ji mezrê derketim, bi hevalên gundên der û dorê ra têkilî danî. Çend rojan şûnda ez vegerîyam mal, min malbat dîsa tengezar û xemgîn dît. Rojekê berî vegera min grubek polês û jendirme avitiye ser mala me. Hin xortên mîvan û birayê min ji mal bazdane, çem derbaz kirine çûne wî alî. Lê polês mîvanê me lawê xalê min Cafer girtiye û biriye. Cafer li Depê ji ber kuştina komsêr hatîbû girtin, dûra hat azad kirin. Gruba polês û jendirman bavê Cafer jî ji Depê tevî xwe anîne. Bûyerê em ne rehet kirin, em fêrbun, sedema hatina tîmê polêsan ne em bû ne, lê cîhê me deşîfre bibû, grubek xort jî ji malê baz dabû, ew yeka dikare polês bike şikê û bala xwe zêde bidin ser malbatê.

Şev li mal razan xeter bû. Hin şevan tevî birayên xwe hin şevan jî tenê çûm, li deşt û gelîyan gerîyam, rûniştim sibê hatim mal.

Şevikê ez û Yavuzê birayê xwe hev ra çûn, em li gelek cîyan gerîyan, bi sibê ra hatin Mêrgêhespan. Her çiqasî demsal havîn bû, jî şev heva gelek sar bû. Roj hîn ji aso derketî bû, me xwe bo germ bikin dabû ber rojê. Nişke va me dît grubek dora 6-7 kesî ber bi me dihatin. Me ji bo bazdanê xwe amadekir, lê ji durve biriqandina dasê dest wan û bi Kurdî peyva wan em pê hesîyan ku, ew heval û dostên me ne. Ji gundê Karê, Nurettîn Coşkun, Dizgun, Alîqîya Gûltekîn, Hesen Husên, Ezîz Eziman, Dizgun Gul, ji gundê Canigê Reşît Aksoy. Ji bona çinandina genim hatine alîkarîya me bikin. Heta êvarî ew him şuxilîn him jî bi henek û peyvên xweş roja me xweş kirin. Sîpîkerîya Dizgun Gul, bi henekên Nurettîn, Eziman û Dizgunê Namo roj zû bû êvar.

Roj radikevim, tevî Mamoste Welî û xortên din em terin ber çêm, soberîyê dikin, masî digirin. Hin caran terim gundên cîran (Mankirag, Kar, Rîçik, Muxindî, Dawalî, Mastan, Kotarîç, Lemper). Lê dawî li rojên me nayên. Kîngê çi dibe, wê çer bibe ne eşkereye. Ji partîyê jî tû agahîyek tune. Bê biryara partîyê bi serê xwe naxwazim tiştekî bikim. Lê li van deran jî ciwar bûn dikeve zorê.

Birayên min Fîkret û Atîlla ji zîndanê hatin berdan û ew hatin gund. Ji halê wan xûya dike ku wan êşkencên giran dîne. Bi çekdarî li gundan gera grubên Maoyî û PKK yan gundîyan nerehet dike. Gel êvar de dikeve hindur, di şevên germ de jî ew ceseret nakin derva razên. Ji ber hin kirinên wan yên şaş, hêzên pêşverû ji gel piştgirîyek xurt nagire.

Li gund bira û pismamê min heta razanê nobedarîya min dikin. Bo ku derva wext derbaz kirin çetine, şev dereng terim derva. Îşev jî saet 24ê şevê ye, hin li mal im. Li qatê duyem ser xanî der û dora gund dimêzînim. Ji me dûr li ser rîya gundê Karê û Hûlmanê erebeke hat, dûra li cîyekî bi farê pêketî sekinî. Gavêkê şûnda dengê sîleh û dengê mirovan hat. Mereq dikim ka li wir çi diqewime? Bi balkêşî li wê derê sêrdikim. Piştî dengê sîlehê erebe çû, wendabû. Pir wext derbaz nebû, li daristana nêzî mezra me lambek pêket. Kûçikan ber bi wan êrîş kirin. Hemû kes li ser pîyan e. Me bawerkir ku leşker û polês dixwazin dora gund bipêçin. Bi lez min cakêtê xwe girt û ji mal derketim. Temî dikim ku kes du min neyê. Şev tarîye, xozan û çîmên çinandî de ber bi jêr, ber bi çêm daketim. Li tapikê Kevirê sor nêzî çêm di nava daristanekê de rûniştim. Nîv saet derbaz bû nebû, bi dengekî veceniqîyam. Bi aso-berrojkî min li nêzî xwe bi parqe û di destê yekî de tifang du kes dît. Şika min a li ser êrîşa polêsan temam bû.

Por û pirça laşê min pîj bû, hemû laşê min dilerizîya. Min şeşagira ji teqandinê ra amade, dirêjî wan kir, bi lehzake kin de fikirîyam ku, çawa û berê li kîjanî xinim. Bi tirs û kelecan deng li wan kir, ew kîne?

Hindek ma bû ku tetigê bikişînim û ferq dikim ku kesê ku min derba pêşin de lêxistana birayê min Fîkret û Alîqîya ne. Bi dengekî nizm; "emin kekê, te em nasnekirin?" Bi hatina wî şikilî şaşitî kirîbûn.

Di vê navberê de em bo ku bikarin operasyona gund jî bişopînin, me cîhek bijart, lê li gund tu hereket tune. Çûn mîvanê ku li mal bû jî anîn, em bûne çar kes.

Sar e, lê bo ku cîhê me kifş nebe me nexwast şev agir vêxinin. Ber bi sibê serma zêde bû, bi êzingên ku me berev kirin pê agir dada. Wê rojê em daketin ber çêm, me soberî kir û masî girtin.

Dûra agahîyên ku me ji mezra jorin girtin, sira paş bûyerê zelal kir. Ereba bi far traktor bûye. Xwestine êzingan qirkin û bibin, xwedîyê daristanê sîleh teqandîye. Lê êhtimale, cîhê ku xwestine êzingan qirkin xortên qaçax lê hebûne. Ji ber dengê sîleh û lamba erebê qaçaxan cîhê xwe guharîne û ber bi me hatine. Bona ku cîhê ku hatine jî nas bikin, lamba destan vêxistine. Çira ku me dîye ew bûye .

**Hatina cunta faşîst a leşkerîya 12 îlona 1980**
**Em sloganan dinivîsin**

Tevî hin hevalan em peyîvîyan û me plan kir ji bona propaxanda tevgera xwe ji Kovancîyan ber bi nehîya Moxindîyê bi seranserê rê li hin cîhên balkêş li ser diwarên derûdoran, sloganên tevgerê bêne nivîsîn. Me boyax, firçe girt, slogan, roj û heval tesbît kirin. Sloganên me, "Bijî Rîya Azadî","Bimire Koletî, Bijî Azadî!", "Bimre emperyalîzm, qolonyalîzm, faşîzim û feodalîzm!", "Bijî Roja Welat!", "Dengê Roja Welat Nayê Birîn." "Bijî DHKD!" Êvara 10 ê Îlonê 1980 de hevalên Gazî Çalbay, Adnan Ozdemir û A.Kemal Ozcan bi traktorekê ji Kovancîyan destpêkirin, li ser diwarên kanî, pire û dibistanan, li ser tankerên zîftê û lewhên trafîqê, li ser cîhê munasîv sloganên tesbît kirî nivisîn. Piştî 33 salan şûnve îro ji (2013) li gundê Karincê, slogana li ser tankera reş ya li rexê rê û slogana ser diwarê dibistana gundê Hêwedan wê şevê hatin nivisîn. Cunta faşîst slogan bi rengekî din reşkirin, lê dîsa jî ew têne xuyakirin.

Roja 12 ê Îlonê, saet 06ê sibê ji derva hatim mal, min radyo vekir, li nûçan guhdarî bikim. Sîpîker nav û cîhê qomutanên bajaran dixwend, destpêkê de fikirîyam ku tayîna wan derketîye, an jî proxramek bona rojên derbazbûyî ye. Lê hate zanîn, ku ne usa ye, di saranserê Tirkîyê de îdara awarte ya leşkerî hatîbû êlan kirin. Fermandarê giştî yê leşkerî Kenan Evren û serokên hêzên leşkerî yên din hikûmat ji hole rakiribûn û dest dabûn ser hukim. Apê min Alî jî radyo portatîf di dest de hat, bi pozxinî got; Kazim te bîhîst derba leşkerî çê bûye ! Te digot ew sloganên ku me du şevan berê nivisîbûn, bibûn sedema derba leşkerî.

Rewş ji bona hemû hêzên pêşverû fiyasko bû. Parlamento hat girtin, partî, sendîqa û Komele hatin qedexe kirin. Di seranserê Tirkîyê de derketina kolanan hate qedexe kirin.

Hin hevalên me yên ji gundê der û dora me hatin em li ser hatina derbê sekinin. Partî vê derbê çawa nav bike, em nizanin lê gorî hin pîvanên zanistî, teşhîs û tesbîta me li ser faşîzmê digîje hev. Me di nav xwe de ew derba leşkerî, wek faşîzm bi nav kir. Hin grubên ku ji bona îdara berê digotin faşîzm an jî dîktatorîya olîgarşîk ji bona vê wê çi bigotina?

Usa xûya dikir ku di mercên faşîzmê de têkoşîn wê zahmettir be.

Li bajar û bajarokên din li himber cûnta faşîst çi berxwedan têne kirin, haya me jê tune. Ji bo nûçe û şiroveyên cuda em bikarin bigirin ji radyo bêtir tu amorekî me yê din tune, ew jî di binê qontrola cûnta de ye.

Di vê pêvajoyê de armanca partîya me ew bû, di gavê pêşin de qadroyên xwe ji vê bahozê biparêze. Tevî hevalan şert û mercên nû me berçav ra derbaz kir, li gundan cî bûn her roj çetintir dibû.

Dû rojan piştî hatina cûnta faşîst birayê min Dîyar dixwaze here Dîyarbekir. Ew di Zanîngeha Dîyarbekir di beşa pijijkê de xwendevan e. Li dij derketina min fêyde nekir, ew dibêje azmunê min hey e û çû. Lê dora roja din agahî hat ku polesan ew girtine, nuha di girtîgeha leşkerî ya Dîyarbekirê de ye. Dora sal û nîvê di girtîgehê de ma, dema ku hate berdan carek din dîsa hate girtin. Dawîyê 8 sal ceza zîndankirinê girt, mecbûr ma Dîyarbekir jî, dibistan jî terikand û derket Sûrîyê, ji wir jî derbazî Londrê bû.

29 ê Îlonê Nazli yê du keçên me Cîran û Bejna girt û ji gund çû Dîyarbekirê. Ez heya serê Karê, tevî wan çûm. Wê wextê erebe nedihat mezre û gûndê me. Min ew rêwî kirin şûnva çûm nahîyê, mala Mamoste Ehmed.

Dîya Ehmed tengezarîya xwe derva bi cîranê xwe ra tine ziman. Derê malê vekirîye dengê wan tê min, ew bi cîranê xwe ra qala lawê xwe dike:

*"Ehmed piçik bê tedbvîr e, di van şert û zûrifan da, hema kî hat ber te, tû bînê mala xwe û bikî mîvan, ne karê baqilan e.*

*Kesê ku nuha anîyê di malê de rûniştîye, kîye, ji çi kesî ye? Belkê yek qaçaxê hikûmatê ye. Belkê kuroyê Dîyarbekirê ye. Em ji van tiştan êdî bêzar bûne. Xelk ji Apoyîyan, Maoyîyan gazin dikin, lê rastîya xwe jî heye, dîya min."* Min xwest hema ji malê derkevim; bêjim ma canikê tu çi zû bêzar bûyî? Ez jî çend kîlometer dûrî te ji gundê cîranim.

Lê ez xwe li nebîhistinê didim. Min ji Ehmed ra tu tişt negot, du heval hatin me hevûdû dit û ez rabûm ji wê çûm.

1980.09. 07

Şev min li dervayî gund derbaz kir. Pîyê sibê ji dûrve dengê tifangê dihat. Li xûrnîyan rêwîyê ku ji mezra me ra derbaz dibû da zanîn ku endamê PKK Delîl Doxan li gundê xwe, Teman hatîye kuştin. Vê nûça dayîka min û amoja Fatoş kir tirs û fikaran. Tirsa wan ji bo me bû, min her çiqas dîyax dida wan jî, ew tesellî ne dibûn.

Di eynî êvarê ber bi gûndê Rîçikê mezra Bûdan terim. Dixwazim ji bûyera Teman agahîyên fireh bigirim. Ji bona ku kes min nebîne şevê dikim ser xwe. Saet 21ê min li derê Îbrahîmê Hesê Hûsên xist. Îbrahîm ji malbata Budakan e û mêrê meta min, Emînê bû.

Demikê dêrî venekirin û ew pê hev dipirsin, tu kîyî? Ez dengekî nizm navê xwe dibêjim lê ji dengê kûçikan ew fêm nakin. Dawîyê derî ji min ra vekirin.

Meta min Emînê ku ez li pêşberî xwe dîtim, dest bi girîyê kir. "Dewleta kafir we bikûje, îro Delîlê lavê Kazê Bayê kuştin. Mixtar li gund êlan kirîye ku kê mîvanê xwe bê, divê agahîyê bidin mixtêr." Min rewşa xwe ji wan ra da zanîn tiştê ku ew jê

bitirsin tune ye. Aram û rehet bin. Xalê min Husên jî li wir bû. Ew ji Kotarîcê hatîye li mezra Bûdan çend rojan çilo dibire.

Temî û nesîhetên wan min eciz û bînteng dike. Kuştina Delîl gel tirsandîye. Ew sibê de zû terin karê xwe, êdî em radizên.

Du rojan divê ez li vir bim. Roja sisîyan ez jî li Korgîjê li cem wan im. Paş nîvro birayê min Fîkret û Gazî Çalbay derketin hatin, me ji wan xatir xwest û ji wê derê veqetîyan. Fîkret vegerî mal, ez û Gazî jî çûn Gundê Gazê mala Seyîd Mistefa. Bi hewtina kûçikan keçek ciwan derket ber derî. Lê bê ku me ji kûçikan qorî ke wê tenê li me sêr dikir. Me mala Mistefê pirsî û em bê dawet ketin hindur.

Xwedîyê malê Mistefa dora 45-50 salî, simbêlboq û ji sed kîlo yê zêtir, wek palwanekî bû. Lê bi zorê silavê me girt û piştî wê jî tu peyvek ji devî wî derneket. Ne miroveki li gorî qalibê xwe bû. Bona ku em bikarin pê ra bikevin têkilîyê, qala hevaltîya lawê wî û keça wî dikim. Nefîle tu gotinekê jî nake. Gotina ku dike jî em bi cimbizê ji devê wî dikişînin. Êvar de cil danîn, dixwaze me bike xewê û ji me xilas be.

Saet dudo û nîvê şevê bi parazîta radio em şîyar kirin. Bi kibarî dixwaze me rêwî bike. Min got: ma xêr e, tu me vê saetê çima şîyar dikî?

Got: Ez sêvan dibim Xarpitê, lewma em zû rabûn. Em jî rabûn ji wê derê derketin, ber bi Moxindîyê terin lê hîn şev e, em vê saeta nikarin li derê kesî jî xinin. Em çûn di nava rezan de rûniştin, sibe bû, roj derket me hindek heval agahdar kirin hatin em bi hev ra rûnûştin me sohbet kir. Êvarê ra em çûn mala nasekî, heya saet 20 rûniştin. Em rabûn, herin sole me xuya nakin. Jina malê bona bal nekişîne ew ji rastê rakire, xwe jî çûbû ser banî nobet digirt. Em wê şevê çûn gundê Karê mala Nûrettîn Coşkun. Me ew der jî sibê zû terikand. Heya ku sibe bû roj derket em gelek cî gerîyan.

Derengîya şevî ez terim Lemperê, mala xaltîya xwe, mala Ezîzê Gêdûg. Vê gavê rojê 10-15 kîlometer rê çûyîn ji min ra bûye adet.

29 ê Cotmehê ji ber cejna salvegera êlankirina Komara Tirkîyê daîre têne girtîn. Difikirim ku ji ber cejnê li ser rêyan sekirin wê kêm be. Biryar didim di roja 29 an de ji gund herim. Malbat xemgîn e, histêrên çavê dayîka xwe ra tehammul dikim. Dibêjim bo min mereq mekin ez rîya xwe derdixinim. Sibe zû ji mal derketim, şofêr Dersîm Xozat, li ser rîya Gundê Karê, bi pîqabê, ez girtim birim, Pira Seyîdan. Lê nasên ku ji otobosa Îskenderonê peya bûn, gotin îro, li ser rîyan ji her wextê zêtir sekirin û qontrol heye. Bê nasname ji çûyînê poşman bûm û vegerîyam mal.

**Gund û welatê xwe di terikînim**

Piştî darba faşîst a leşkerî 12 ê Îlon 1980 de êrîşên ser gel û kadroyên partîyê zêdetir bû, derketina dervayî welat ket rojevê. Hin qadro derbazî Kurdistana Rojhilat, ba

Partî Demoqrat Kurdistan Îran, hin kes jî bi pasaportên ku dest xistin derbazî Elmanya bûn. Qismek ji me jî derbazî Sûrî bûn.

Şeva 22 yê Mijdarê min li gundê Canîgê li mala Reşît derbaz kir. Sibê de ku hatim mal, li odê du kes razayî bûn. Dîya min got ew Alî Kemalê kurap û Cengîzê bira ne. Şev Atîlla yê bira jî tevî Goral hatine, lê ez nedîme şûnda vegerîne, Kotarîcê. Wê wextê ne rê hebû, ne jî erebe pêyda dibûn. Hatin û çûyîna rîya wê şevê en hindik 30 kîlometre bû.

Têgîhiştim ku ew ji bo min hatine, ji bona min agahîyek anîne. Min ew şîyar kirin, sedema hatina wan pirsî. Cengîz da zanîn ku, du heval tevî wî ji Urfayê hatine, li Kotarîcê ne. Êvarî saet 22 an ew li pirê Seyîdan li benda min bin.

Demikê şûnda bavê min ji gundê karê hate mal. Xûyaye ne rehet e, dixwaze sohbet bike, tûrikê xwe vala bi ke.

Got; "Li Karê min Rizo dît, Rizoyê Ceman. Ji Kuweytê hatîbû. Rizo digot xort pê çi ketine, çi dixwazin? Ji dewletê ra dewlet lazim e. Zarokên te xwedî kar in, rehetîya xwe li cîh ne, çima di cîhê xwe de nasekinin?"

Bavê min piştî wan gotinan xwe bê deng kir, li benda min bû ka ez çi bêjim?

Min got, lê bavo te jê ra negot zarokên min jin revandine, banqe şelandine, dizî kirine, esrar firotine çi kirine? Me çi kirîye ji bo welatê xwe û ji bo gelê xwe kirîye. Di vir de bavê min deyax nekir; gelê me kî ye biko? Eger ku gelê me ...ê me ye, Memê diz e, Sadoyê beradayî ye, Rizê Ceman e ...?

*"Goşt bê hestî nabe bavo"* tu kesên usa dibijêrî ku... Bila ew jî hestî yê nava goşt bin. Di hemû civakan de kesên ku neyne pejirandin hene û hebin. Ew jî bila yên me bin. Bavê min dawîyê yê dilê xwe got: biko biko[57] ne yek ne dudo hûn pênc[58] bira bûne qaçaxê dewletê. Xwedê neke, lê, sibe ji we yek kes bê lêxistin, emê çibikin, emê çawa deyax bikin? Me bi çavê xwe dî, di sîh û heyştan de çi anîn serê me.

Dîya min bê deng û xemxînî li me guhdarî dikir.

Ji ber gotinên bavê xwe, min nexwest zêde tişt bêjim. Ew bav bû û bi wî çavî li bûyeran dimêzand.

Lê em êdî ne aîtê wan, aîtê partîyê bûn. Gotina dê û bavê têrê ne dikir, ku me qane bike. Min ne dixwest roja dawîyê gotinek şaş an jî hişk bêjim û dilê wan bişkînim.

---

[57] Biko; tê mana lawê min, kurê min.

[58] Li ser kevirê gora wî me gotina wî nivisî. Di vir da qala 7 lawên xwe yî xerîbîyê dike.
SILÊMAN BUDAK (1918 -30.08.1984)
Mixabin ku li benda vegera we sekinandin vala ye,
Heger dilê min bê qelişandin û lê bê nêrin,
Di dilê min da şopa heft birînan heye.
Heta ew sax nebin, wê kirîzên dilê min ber dewam bin..

Bê deng rabûm, derketim derva, çûm kanîya gund dest û rûyê xwe hunik kir û ber bi daristanê meşîyam. Min di serê xwe de çûyîna xwe ya êvarê pilan kir. Çente an jî tiştê ku bigirim ba xwe tune bû, sol û çekê ser min ... Fikirîm ku ji dê û bavê xwe ra qala rêwîtîya xwe û planê xwe bikim an na. Lê min biryar da ku tu kesî ra tiştekî nebêjim.

Wek her derê Kurdistanê li Dêrsimê jî cunta faşîst cîhê lingê xwe xurt dikir. Çembera dora welatparêzan hêdî hêdî dihate şidandin û teng dibû. Me yeko yek baz dida, lê me dayîk û bavê xwe di cîhê xwe de rehîn dihiştin.

Min dizanîya ku leşkerê ku bê gund di cîhê me de li wan êşkencê bike. Dawîyê agahîyên ku me salan şûnde girtin ew jî pêk hatibû.[59]

Min ne xwest bavê xwe bibînim û xatir bixwazim. Ez ber bi rêyek ne dîyar diçûm, me dikanîya zaefkê nîşandim, hestê xwe nekarim qonrtol bikim. Wî, ji min bipirsîyana ka ez terim kû, çi dikim, bersiv dayîn çetin bû. Êvarê, bê ku ji dîya xwe ra tiştekî bêjim, min jê xatir xwest û ji mal derketim. Saet dora 22.00 ê şevê hatim, pirê ku me li ser hev kirîbû. Di tarîya şevê de li rexa rê erebe-tankerk mezin a petrolê park kirîbû. Li pêşîya erebê cîhê şifêr de du heval ji Urfayê Ferîdûn Kaya û Mehmûd Ekmez rûniştîbûn û li benda min bûn. Herdu jî endamê PSKT yê bûn. Erebe ya Mehmûd bû, wi bi tankera xwe ji Batmanê ji şaredarîya Urfayê ra mazot dikişand. Cîhên ku qontrol lê çêdibûn, bo ku ji wan ra astengîyan dernexinin û karê petrolkişandinê rehettir bikin, ji serleşkerê garnîzona Urfayê kaxizek îmzakirî jî li cem wan bû.

Lê vê carê wan ne mazot ez dibirim Urfayê. Dora 6 mehane, me ji navenda partîyê tu agahî negirtîye. Agahîyên ku ji girtîgehê tên ne başin. Tê gotin heval rastî êşkencan tên û bi cezên giran va têne darizandin. Ji ber wê yekê ew dixwazin hevalên ku lê tên gerandin hay ji xwe hebin.

Fêrîdûn got me hindurê tankerê paqişkirîye, batanîyek raxistîye, bîdonek av jî li wir danîye. Ew dixwazin ez bikevim hindurê tankerê. Xwedanek sar hat min, ji xwe min ji çekên teng, ji cîhê teng xû dikir. Min red kir neketim hindurê tankerê, li cem wan taxa şofêr rûniştim. Erebe kete rê, ber bi Kovancîyan hereket kir. Bi ken û kêf em rê terin.

Heval bi tirs in, dibêjin, eger tu bê girtin, dikarin dest bidin ser tankerê. Mehmûd ji xwe feqîr e, bi erebê debara zarokê xwe dike. Lê tiştik bê serê erebê, ewê çi bike? Me heta çate rîya Xarpit û Dîyarbekir pêşîya xwe sekir û em çûn. Nêzî çaterê me dî ku polês qontrol çêdike. Li wir ez peya bûm, erebe çû, ji qontrolê

[59] Leşkerê ku avitibûn ser gund, bavê min, Bayrem û xortên ku ketine destê wan, Orhan, Şergir hemû li ser bêndere kirine falaqan.

derbaz bû, çerixî ser rîya Dîyarbekir, li pêş sekinî. Ez ji rîya erebê derketim, ji nixta qontrolê dûr çûm, min xwe gîhand wan.

Li wir hevalan xwastin ez bikewîm tankerê, ji ber ku li ser rîya Dîyarbekir û Sîweregê sekirin zêtir bû.

Hevalê Mehmûd qapaxa tankerê vekir, di tarîyê de depoya tankerê wek şikeftek kûr xûya dikir. Tecruba yekê rind neçû, qula tankerê ji min ra teng hat. Bo ku bikarim têkevim min cakêtê xwe derxist, bi kevîyê qula tankerê girt xwe berda jêr, her dû destê xwe berjor rakir piçikê zor be jî ketim ê. Qapaxa depoyê li ser min girtin. Bilindîya depoyê dora 2 metran bû. Çimku bejna min 1,78 cm, bû, li ser lingan serê min lê nediket. Min pê lambeya ku dan min der û dor raçav kir. Depo rind paqiş e, lê dîsa jî meriv xwe neparêze dikare çekên ser xwe qilêr bike. Serda jî çekê ser min qatek sipî, ya havînê ye. Min berê naylon, ser naylonê ra jî batanye raxist pişta xwe dayê. Lingê xwe avit himber bona ku balans çêkim di sîlîndira erebê da nerim û neyêm. Mîna nivînên ranzên otomatîk yên di nexweşxanan da, gora nexwaş nîvqatkirî û pişt tê ayar kirin. An jî min xwe di hêlkanê da xeyal dikir.

Hevalê Mehmûd erebe giran dajot. Demikê şûnda bang kirin ku em hatine gola Golcixê. Min anî ber çavê xwe, eger erebe qezakê çêke, ango bikeve golê ez ê xwe çawa xilas bikim? Bîna min teng bû, xwêdanekê ez girtim, min çend pîn li dîwarê himber ya sîlindirê xist. Lê wan nezanî ku ez ji wan çi dixwazim. Demikê şûnde ez xewve çûme. Lê herçî erebe dilive, gora meyîla rê paş û pêş, çep û rast gildî dibim. Bona ku serê xwe li derikê nexinim min ew girtîye nava herdu destê xwe, balansa xwe zorê çê dikim.

Difikirim şefên êşkencekir çawa metodek usa pêk nanîne, girtî di nav sîlindireki de bi erebekê bê kişandin. Bi vî awayî rêwîtîya xwe dikenim, bo ku ew metod tê bîra kêm kesî. Cengîzê bra ye xwedîyê vê dîtinê.

Bi firên kirina erebê ez ber bi pêş çûm, lê min xwe ragirt. Derva deng tê, min xwe nêzikî pêşîya erebê kir, guhê xwe dayê. Tişt fem nekir.

Yekî bi cisîmekî hişk du caran li tankerê xist, bona ku ji erebê deng dernekeve min xwe qet nelivand. Erebê hereket kir, lê pir neçû dîsa xwe giran kir û sekinî. Yekî bang dikir, min dengê Mehmûd nas kir.

*"Me Dîyarbekir 30 kilometere paş xwe ve hişt, nuha em li ser kanîkê ne. Li Seyrantepê serleşker em dane sekinandin û qontrol kir, lê me derbaz kir. Ew serleşker bû, bi çovê destê xwe li tankerê dixist. Wî dixwast bizane ka tanker vala ye, an tijî ye?"*

Jina min û keçên min hatin bîra min, ew li Dîyarbekir in û vê saeta di xewdabûn. Bê silav û pirs ji wan derbaz dibim û terim. Difikirim ma gelo sûcê me çîye? Çima em nikarin di welatê xwe de di nava aramîyê de bijîn?

Sûcê me ev e; ku, ji bona azadîya gelê xwe li himber zor û zilma kolonyalîstan radiwestin. Sûcê me ev e; ku ji bona gelê Kurd jîyanek azad û bi rûmet dixwazin.

Gelê me zû an dereng, wê nîrê qolonyalîzmê bişîkîne û hemû mafê xwe bidest xine. Xebata ku di vê rê de tê kirin wê vala neçe. Gelê Kurd li têkoşer û şehîdê xwe xwedî derkeve.

Di cîhê xwe de dubare dikim. Bijî gelê Kurd û Kurdistan. Bijî têkoşîna gelê Kurd. Hevalên girtî hatin bîra min. Difikirîm em wan di girtîgê de dihêlin û baz didin. Lê dibêjim, emê vegerin. Bona ku bikarin em bi xurtî vegerin û wendayî yên xwe bigirin ba xwe em terin. Em cîh diguherin. Bona dayîk û bav zarokên xwe têr hez bikin, di milên dost û yarên xwe de azad govend bigirin emê bên.

Şiq şiqa baranê ye, baranek xurt dibare. Dilopên baranê pê hev li tankerê dixinîn, rîtma baranê di hindur de ji min ra xweş tê.

Dîsa tiştên xirab têne bîra min. Çima ez ketim vê depoyê, eger qezayek bibe... erebe biqûlupê, ez ê çawa ji vir derkevim? Ji xwe dipirsim, ma gelo ez ji leşkerên ku bên cîhê qezê, alîkarî bixwazim? Bêjim ku ez di tankerê de me min derxinin?

Sibê ra em çûne Urfayê. Li qereja şaredarîya Urfayê qapaxa tankerê vekirin, min berê cakêtê xwe û tiştên din dane jor. Dûra jî min herdu destê xwe gîhand hev, dirêj derva kir û xwe kişand şor.

Derketin rehettir bû, ma di şevikê de min kîlo dabû?

Şevaqa sibê, saet çar pênc bû, tu kesî em nedîn. Ferîdûn di şaredarîya Urfayê de dixebitîya, nêzikî karê wî odak xwe hebû, em çûn mala Ferîdûn. Dora roja din evarikê çûm mala Husnîya xwîşka xwe.

Ew di Lîsa Keçan de mamoste bû, salekê berê ji Sîweregê sirgûnê vira kirîbûn. Heval û dostên Urfayê têkilîyên germ nîşandan.

Ezîz Bazencîr ji Dîyarbekirê hat, ez dîtim. Ji partîyê, biryara minê derketina dervayî welat anî bû.

Di pakêtê cixarê de belovaka partîyê jî bi xwe ra anî bû. Bi navê PSKT ê ew belovaka yekem bû, hat belav kirin. Partîyê bi vê belavokê navê xwe deşîfre kir.

**Bê tedbîrîya me hindik mabû ku me bide dest**

Li Urfayê piştî çend rojan, di hindur de rûniştinê ez bêzar bûm. Em derketin çûn, dora Kelê û Gola masîyan gerîyan. Di vegera rîya malê de em rastî qontrola polês hatin, hema cîda em vegerîn. Piştî qontrol xilas bû em zivirîn, Zîya ez birim, mala xwe li wir hiştim û ew çû kar. Di malê de ez tenê me. Gava Zîya derdikeve derva hema li ber derî rastî tîmê leşker tê. Di seranserê bajar de leşker apartimanan mal bi mal qontrol dikin. Lê astegmenê serokê leşker bo ku di apartimana me de rudinişt, apartman nedaye sekirin. Eger sekirin çêbûna ez ê bihatama girtin.

Berî ku derkewîm dervayî welat dixwazim jina xwe bibînim û xatir jê bixwazim. Min ew agahdar kir, ew hat Urfayê, em li mala mendîz Nîzamettîn Melîk û jina wî Muxlîseyê bûn mîvan. Min li gorî xwe kar û wezîfên kesên welatparêz, jîyan û

xeteriyên li ber wan, berpirsîyarî û erka hevjîna merivan, ji Nazliyê ra got. Ango meriv çi bike û çi neke jê ra îzah kir. Lê ew bê problem xûya dike. Min hîn jî daxwazîya xwe ya ji welat derketinê jê ra negotî ye. Dema ku ew pirsek usa ji min dike, dibêjim "ez ne ew mêrim ku bazdim.". Em dikenin. Lê dibêje, "*rev jî taktîkek şoreşgerî ye, eger Lenîn baz nedana ew ne dibû Lenîn. Dixwazim tu derketina derwayî welat bifikirî. Çimku birayê te Dîyar ez tirsandim. Dema ku min ew di girtîgehê de zîyaret kir "got tu jî di nav da, hin heval dikarin bi cezê darvekirinê bê darizandin. Wî got Kekê Kazim divê neyê girtin.*"

Em li rû hev dinêrin. Bi şik benda bersiva min dimîne. Bi henek dibêjim "*ma em xwedî ewqas serî kî bi qimetin?*" Naxwazim ew planê min bizan e, pir zanîn pir belan tîne serê mirovan.

Min jê ra got, dema ku ez bixwazim derkevim, ez ê agahî bidim te. Hin caran meriv ji jina xwe ra jî derewan dike!

Roja din ew vegerî Dîyarbekirê, em jî xwe amade dikin derbazî binê xetê bin.

**Derbazî Rojava dibim**

1980.11.15

Bi hevalan ra me pilan kir em herin Akçeqelê, trêna ku ji Mêrdînê tê û ber bi Entebê tere sîyar bin. Berî trên bigîhîje Firatê, li Karqamîşê trên dikeve nava axa Sûrî, li wir em ji trênê xwe bavêjin û derbazî Rojava bibin.

Bona em bal nekişînin ser xwe, rehetî heya Akçeqelê herin, hevalê Zîya jin û zarokên xwe jî girtin ba xwe. Şikleki usa me dayê ku, em diçûn Akçeqelê mala xezûrê Zîya. Ez, Zîya, Xanima Zîya, Ferîdûn, Şofêrê erebê û du zarokên Zîya, 6-7 salî jî hebûn.

Me erebe kirê kirîbû, Ferîdûn dajot. Demikê min got Ferîdun tu erebê nasnakî, şofêr bajo, wê ne baştir be?

Wî jî got, ma tu ditirsî?

-Min got; wele ez naxwazim, beleş bimirim. Eger usa be ji alî cunta faşîst bêm girtin baştir e. Qet nebe girtina min kêrî propaxendekê tê." Hîn gotin di devê min dabû, pêşîya erebê rabû, berî da nava zevîya şûvê. Toz û duman ser me ket. Qêrîn û zîvin li hev qelibî. Erebe ser alîkî de wergerîya. Mirin hat ber çavê min. Ber mirinek ûsa beleş ketim.

Di pir demek kin de hemû jîyana min, zarok û jina min, dê û bavên min hemû dost û hezkirîyên min mîna fîlmekê di ber çavê min ra derbaz bûn.

Zarok ji pencira erebê ketin nav zevîyê.

Ez li paşîya erebê paş şofêr de rûniştî bûm. Min nekarî serê xwe ji esreqê erebê biparêzim. Jî serê min xwîn dihat. Me alîkarîya hev kir û ji erebê derketin, çûn ser rê. Ya giran xanim û zarokên Zîya bûn.

Du taxsî hatin rawestîyan û em girtin birin Akçeqelê mala xezûrê Zîya. Serleşkerê qereqolê Akçeqelê jî li wir rûniştîbû. Wexta ku em di vî halî de dît, xwest me bibe qereqolê, em rûneniştin, ez û Fêrîdûn hema ji wir derketin çûn îstesyona trênê.

Li îstesyonê du polês dewrîye digeriyan, derva heva sar bû. Fêrîdûn bi ziman nermîya xwe memurê garê qane kir, odek da vekirin û em ketinê. Bona ku em xwe ji polês biparêzin, me çira vemirand, derî li ser xwe girt û di odê de li benda hatina trênê man.

Trêna ku saet 22.30 ê şevê bihatana saet 06 ê sêbê hat. Planê me hemû ser û bin bû. Armanca me ew bû, ku şev wexta ku trên kete axa Rojava em bikarin ji trênê xwe bavêjin.

Trên hat em sîyar bûn, Ferîdûn pê kondoktor ketîye ku bi ruşwetê wî qane bike, cîhê ku em dixwazin xwe bavêjin, hêza trênê giran bike. Kondoktor bi pênc hezar lîrayê Tirk qane bû.

Em ketin erazîya Sûrî-Rojava Kşrdistanê kondoktor işaret kir ku hêza trênê gran bûye , êdî deme, ku em xwe ji trênê bavêjin. Em çûn ber derî min derî vekir, lê trên mîna birûskê diçû, eger tiştek ji trênê biketa wê perçe perçe biba.

Roj ji trênê xwe avitin çetin bû, di pencirên trênê da, cendirman di dest de tifing li sînor çavnêrî dikirin. Di pençirên kompartimanan de me namlîyên tifangên cendirman didît. Ferîdûn xwast em xwe bavêjin, lê min qot trên gran nebûye, eger em xwe bavêjin, dê parçe ji me nemîne. Eger ku me bikarîya xwe ji trênê bavita jî leşkeran emê bikuştina.

Ferîdûn çû pere yê ku dabû kondoktor şûve girt. Ew li xwe mikûr hat ku mufettişê rîya hesin di trênê de ye, ji ber wê nekarîye, çûyîna trênê giran bike.

Me çemê Firatê derbaz kir, li Qarqamişê peya bûn. Em çûn li qehwekê rûniştin me çay vexwar. Ferîdûn çav li der û dora xwe digerand ku nasekî pêyda bike. Me dixwast em roja xwe di malekê de derbaz bikin, him bîna xwe bigirin, him jî xwe ji polês biparêzin.

Ferîdûn xelkê Urfayê bû, dawîyê bi hin têkilîyan, yek bi zorê kire nasê xwe. Wî em birin mala xwe. Me pere da wî ew ji me ra xwarinê amade bike û me jî derê odê kilît kir û em razan.

Em ji xew şiyar bûn me xwarina xwe xwar, ji xwedîyê malê ra qala pirsgirêka xwe kir. Li gorî çîrokê, min kerîyê pez firotibû, wî alî xetê, nuha jî min dixwast herim perê xwe bigirim. Xwedî malê çû nava bajar, demikê şûnda hat, ji bo derbazbunê têkilîyek danî bû.

Ji me sere meriv 5 hezar lîra dixwastin. Saet 19.00 ê şevê em çûne wê malê. Mal di ber diwarê sinor de mina qluba leşkeran, an jî derê gomrîgê bû. Du leşker çep û rast ber diwar ra diçûn û dihatin, nobet digirtin.

Gotin wan leşker qane kirine, para wan jî wê ew bidin, lê li wir rayiş bilind kirin, serê meriv bû 7 hezar lîra.

Min îtiraz kir lê Ferîdûn bi tecrube bû, wan dikarîya hîn bilindtir bikirina. Me perê wan da û em ber bi diwarê sînor kişîyan.

Herdu leşker, ji me dûr ketin. Lê ez ji bêbextîyek leşkeran bi guman bûm. Me ji romanên Bekir Yildiz pir bîhîstîbû, leşkeran perê xwe digirtin û mirov jî dikuştin.

Çêrme avekê di ser dilê min de dilop kir. Bêhna min çikîya, te digot mirin qasî du gavan li pêş min di sengerdabû. Berê ez ber bi diwar û têlê meşîyam. Diwar dora du metran bilind bû. Bi lez hilkişîm ser diwar min xwast hema xwe di ber diwar de berdim jêr.

Lê min dî ku qasî diwar bilind û nêzî metrekê ji diwar dûr çepera têlên bi dirî heye. Min zor da xwe ku nekevime navbera diwar û têlê. Lê li bazdanê çakêtê min bi têlê ket astar çirand bir.

Min Ferîdûn ji kemînê agahdar kir, ew bê zerar daket xarê.

Dafikek usa bû ku eger mirov biketa wê derê ne mimkun bû, bikare bi serê xwe ji wir derketana. Em jî 16 ê Mijdar 1980 de saet 7.00 ê êvarê derbazî axa Sûrî bûn. Êdî em ne li Tirkîyê ne, mîvanê Kurdistana Rojava ne.

Me berê xwe da lambên bajarê Crablûsê û bi bazdan ji sînor dûrketin. Me bala hev dikişand ku em bê deng bin, nebe, leşker pê me kevin.

Di nava zevîyên bi dar û rez de em ber bi bajar çûn. Em nizanin herin ku û çi bikin? Bo ku em bê pasaportin li vir jî rîska girtin û ketina girtîgehê heye, teslîm kirina dewlata Tirkan heye.

Em bi çavtarî-çavgirtî terin. Nişka va me xwe li ber avahîyek fermî, avahîyek der û dora xwe bi lambên elektrîgî hatî ronîkirin û bi ala Sûrî ve hatî xemilandî dît. Ji nivîsên tîpên erebî me tu tişt jê dernexist. Lê ji derva xûya dikir ku ew avahî, cîhekî dewletê, cîhekî fermî bû. Piştre em fêr bûn ew der qereqol, îstasyona polês bûye. Bi lez em vegerîyan, ber bi jor ber bi taxa dervayî bajar çûn. Hatin ber xanîyên wek vagonên trênê bê navber, bi hev ra hatine avakirin em sekinîn. Her çiqasî bajarê Kurdan bû jî dikarîya Ereb jî hebin. Saet li dora 21 e, hevalê min li derîkî xist. Xortekî bejnzirav, esmer, pozpîj û fîstanekî dirêj lê, derî vekir. Me jê pirsîya ew Kurdî dîzane, ango Kurd e. Bersiv erê bû, me jê xwest ew, me bike mîvan. Bi germayî em ezimandin hindur. Çend cîranê ku li mala wan bûn em pê dane nasin. Me ji wan re behs kir ku em dixwazin herin Kobanîyê.

Dora roja din em çûn meydana gerajê, cîhê ku erebe lê disekinin. Di nava çekên - ebayên erebî de çend mêr û jin li ser lingan sekînîbûn û di nava xwe de sohbet dikirin. Di tenişta wan de jî mêrek di cîhê xwe da ebayê ser xwe freh li dora xwe çêkirî bû li ser çongan disekinîya.

Lê ji wê grubê bînek dihat. Piçekê şûnda, merivê çok dayî ra bû ser lingan, di cîhê xwe de sepetek g.. hiştî bû. Dûra me fêm kir, wan kesên li der û dorê bo çi çong dane. Em fikirîn eger mîza me bê, em çi bikin? Eba û fistanê me jî tune bûn.

Me ereba Kobanîyê pirsî, gotin ava Firatê rabûye, rê nade ew herin. Em çend saetan li wir sekinîn, grubek mirov bi traktorê ber bi wî alî diçûn gundekî, sersaxîyê. Em jî girtin cem xwe, bi traktorê me pire derbaz kir. Ava Firatê zêde bû, ser pirê ra diçû, ereba ne lê traktor derbaz dibûn.

Li cîhê sersaxîyê jî kesên ji Kobanîyê hatîbûn tazayê em bi ereba xwe girtin birin.

Li Kobanîyê me dixwast bi hevalên Partî Pêşverû Demoqrat Kurd li Sûrî ( PPDKS) ra têkilî deynin. Partîya me û wê partîyê bi hev ra di nava têkilîyan dabûn. Lê gava ku me behsa navê partîyê û sekreterê wê Hemîd Dewrêş kir, nasê Ferîdun got, *"mana xwe hûn hatine cem Mixaberata Sûrî."* Serokê partîya Pîşverû wek şefê mixaberatê ji me ra tarîf kir. Moralê min xirab bû, difikirîm ku em çi bikin. Ferîdûn got va gotinên usa hemû partî û şexis ji hev ra dibêjin, ew gotin li vir ji usilê ye, ne ciddîye. Em çûn gundê Şêran mala eqrebên Ferîdun, Xalê Osman.

Ji partîya Pêşverû Saleh Qetî hat, em ji Şêran girt, bir mala xwe. Dora roja din Ferîdûn vegerîya Tirkîyê. Li Kobanîyê hevalê Mistefa, Omer, Ehmed Qaso, Xelîl û hin hevalên din jî hatin me hevûdu naskir.

Êvarekê Kemal Burkay ji Şamê hat. Li ser rewşa welat û hevalan me sohbet kir. Bo ku li ba Filistînîyan ji min ra nasnamekê derxinin, du fotoxrafên min girt û dora roja din ew vegerîya Şamê. Çend rojan şunda ji min ra nasname hat, di wir de navê min bibû Mehmed Alî.

Di nava ereban û misilmanan de ew nav pir dihat karanîn. Min navê xwe yî nû eciband, navê din hema hema sê salan zêtir li Sûrî mam qet kar nanî, heval û birayê min heta jina min jî bi navê nû bang min dikirin. Îro jî hevalên ku li Sûrî em bi hev ra mane û jina min jî pir caran bi wî navî ban min dikin. Hevalekî xort navê min bîhîstî bu lê ez nasnedikirim, ji min dipirsîya kekê M. Alî, bi navê Kazim Budak hevalek hebû, ew hatîye girtin an na?

Qasî du heftan li Kobanîyê li ba qadroyên Partî Demoqrat Pêşverû li mala Mistefê, çend rojan jî li mala Ehmed Qasim mam.

Kobanî bajarokek grêdayi Helebê ye. Dora 40-50 hezar hejmara xwe heye. Ji alî bajarvanîyê ve şûnda hatîye hiştin. Gelê bajar hemû Kurd e.

Roja 27 ê meha Mijdarê saet 13.30 an de hevalê Saleh Qetî erebe girt ez û wî em terin Qamişloyê. Li gundê Qermîn em bûn mîvanê Hemîd Dewrêş. Dora roja din Saleh Qetî vegerîya cîhê xwe. Wê şevê û rojek din jî ez li wir mam. Roja 29 an, ez û birayê Hemîd Dewrêş, Saleh Dewrêş çûn Qamîşloyê mala Hemîd Dewrêş.

Li wir rastî hevalê Alaettin Înce û Mistefa Cizirî hatim.

Wê şevê em bi hev ra man, dora roja din Weysî Zeydanli û Bedîrxan Epozdemir jî hatin. Em bûne pênc kes, hêjmara me dikare hîn zêdetir bibe. Ji me ra mal divê, lê me nedikarî li Sûrî bi navê xwe mal kirê bikin. Bi alîkarîya Partîya Demoqrat a Kurd Pêşverû li Sûrî em wê rojê derbazî mala Seydayê Kelêş bûn.

Seyda di xortanîya xwe de her çiqas wek melê mizgeftê hatîbû perwerde kirin jî li cîhanê cuda mêze dikir. Li gorî nifşê xwe ew gelek li pêş e. Ji bûyerê cîhanê ra bîhîstok e. Ew endamê Partiya Demoqrat a Pêşverû Kurd li Sûrî (PDPKS) bû. Seydayê Keleş bi şêîr û nivîsinê ra mijûl e. Wî dîwana xwe ya yekem qedandîye, Cîgerxwîn ji jê ra pêşgotinek nivîsîye û ew li benda çapê ye. Lê tu îmkanê xwe tuneye ew pirtûka xwe çap bike. Partîya wî jî xwe nade ber. Piştî ku em derbazî Ewrûpê bûn, me ew dîwana wî ya yekem, **Em û Dijmin** sala1986 an da, di nav Weşanên Roja Nû de çapkir. Hindik be jî me xebata Seydayê Kelêş, xist ber destê xwendevanan. Di sala 1992 de bi navê B. Dersîm min bi Seydayê Keleş ra hevpeyvinek çêkir. Kurdîya hevpeyvinê di kovara Roja Nû hêjmara 35 an da, Tirkîya wê jî di rojnama Azadî hêjmara 30ê de hate weşandin.

**Mala me ya nû**

1980.12.8

Piştî ku me li Qamişloyê ji xwe ra malek pêda kir min defter û pênûsek girt, dixwazim ji îro pêva hin caran binivîsim.

Di nava hewşê da, du mal hene. Di navbera mala me û Seyda de dîwarekî ji brîketan heye, ew diwar malên me ji hev vediqetîne. Ji derê der de ketina hevşa me du rê hene. Rîya çepê te dibe mala Seydayê Keleş. Rîya rastê jî te tîne sê odên me. Sibê em di hewşa 60 m2 de digerin. Nêzî derê derva muslixa avê, li alî çepê, li kenara gûlîlikan jî bîdona mazotê heye. Qanala ava mitbaxê a pintî, ya herdu malan dikevin ser hev terine qanalîzasyonê. Dema rojên germ de ev der wê bîn bide.

Li oda alî rastê hevalên cixarekêş radizên, roj jî em tê de rûdinin, oda duyem me kirîye mitbax, ya sêem jî ez û Alaettîn têde radizên. Bîna ji axê ye, germ e û bona tenduristîyê baş e, lê ji bona paqişkirinê ne baş e. du karyolên jengarî û li ser wan karyolan du doşegên piçûk, nîvîkî ranzê cîh digirin hene. Nivînek ji mîndera kerê piçekê mezintir e. Li naverasta odê li ser çar tuxlan sobek a gazê hatîye danîn. Ji Seyda çend kursî, qoltixekî dirî û dîsa misînekî kevn -vê gava Alaeetin wî bi kar tîne - mobîlya oda me hemû ev in. Torbek şekir jî wek amadeyî li paş derê meye.

1980.12.9

Sibê de me tebîet cuda dît. Heva bi mij û bi ba bû. Îşaretên destpêka zivistanê heye. Di malê de Televîzyona me tune, lê radîyoke me heye, em li Qamişloyê nûçê Tirkîyê ji radyo guhdarî dikir. Hin caran me li mala Seydayê Keleş TV Tirkan jî sêr

dikir. Li gorî agahîyên radyo li Tirkîyê berf barî ye. Di vê hevayê de jî li çîyan kesên ku ji ber hikmê cunta faşîst bazdane xwe dane alî, kesên ber xwe didin hene. Ew yeka wek şirîta filmekê li ber çavê min derbaz bû.

Meriv dibêje hela hewa jî piştgirîya Dewleta Tirk dike. Lê şert çiqasî xirab bin jî hin kesên camêr, ber xwe didin û ji dijmin ra serî natewînin hene.

Heya nuha me nekarî bi welat ra têkilî deynin, ew yeka me nerehet dike.

Baranê zêde kir. Em terin mala ozanê Kurd Cîgerxwîn. Ew, xwe li Swêd dimîne. Di mala wî de bi navê Ezîz Dawê,[60] berpirsîyarekî Partîya Pêşverû dimîne.

Ezîz meriveki xweşgotin û bi henek e. Wek xwedî malê ew rehet tevdiger e. Ji alî polîtîka û rewşa herêmê de zana ye. Bi têkilîyên xwe yên germ atmosferek rehet diafirîne. Henekên xwe piranî li ser jinan û zewacê ye. Dora çil salî ye hîn ne zewicî ye.

Em pênc heval in. Me biryar da em pirtûk bixwînin, wexta xwe, vala derbaz nekin. Ez pirtûka Jean Lafitte *"Eylem Adamlari- Merivên Çalakîyan"* dixwînim. Nivîskarê pirtûkê, bi xwe qomunîst e. Ew di pirtûka xwe de behsa jîyana qomunîstên Fransiz, yên ku di şerê Cîhanê ya duyem de ketine destê Nazîstê Elman û di qampên wan de hêsîr mane dike.

Serleşkerên Elman demekê destûr nadin, girtî name binivîsin. Paşê ew êlan dikin ku girtî dikarin ji mala xwe ra name binivîsin. Bi gotina nivîskar di namê da, tenê qasî ku dayîk û jin jê fêm dikin, vêşartî lê gotinên dirêj hene. *"Di qampekê de me, dijîm. Bi hêvî me."*

Dîsa di derheqê rewşa hevalên xwe yên girtî de jî usa dibêje. Kesê ku hatîye girtin, ji bo me kesê wenda ye. Ne mimkîne ku em ji bo wan wext wenda kin. Di qonaxa duyem de em ê li wan vegerin û ji bona xilaskirina wan bi xebitin.

Faşîstên Elman heya dilê Frensê hatîye. Ji bo komunîst û welatparêzên Frensiz ya girîng ew e, ku ji bona azadkirina welat li çareyan bigere.

Min jî hewalên xwe yên wendakirî, girtîyên zîndana Dîyarbekirê bi bîr anî. Difikirim, lê em kîngê li wan vedigerin, çawa wan ji destê dijmin xilas bikin? Em kîngê wek hemû milletên azad di welatê xwe de bikarin raya xwe, bi xwe rast bikin?

---

[60] Ezîz DAWÊ ji partîya xwe veqetîya Partiya Wekhevî ya Dêmokrat li Sûriyê, avakir û bû Sekretêrêwê partîyê. Di 11/4-2013de, ew çû ser dilovaniya xwe. Partiya Wekehevî ya Dêmokrata Kurdî- Li Sûrî- Rêxistina Swêd, bi alîkariya Encûmena Kurdên Sûrî li swêd û Rêxistina Encûmena Niştimanî Kurdî li Swêd, li Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêd, Şemî 20/4-2013 da bi vê munasebêtê ciwîna ser saxîyê pêkanîn.

Lê çi çare ku em ji seha xebatê, ji welat dûr ketin. Hêvî dikim ew dûrketin ji bo wextek demborî be.

Wek Dîmîtrof jî dibêje *"ji bo ku em ji nû ve di têkoşînê de cîh bigirin li dervane."* Lê şik tuneye ku di vî şera de bi hezaran kes bê wenda kirin jî wê dîsa jî berdewam be.

1980.12.11

Barana ku ji do êvar de dibare, bi roj jî dom kir. Li gorî agahîyên TV ê li Tirkîyê pir berf barîye û trafîq ser û bin bûye .

Ji bo ku em nikarin derkevin derva, îro jî me di oda xwe de piçekê spor kir. Ew yeka bo ku laşê me xam nebe me wek çare dît. Piştî taştê xwarin û paqijîyê me dest bi pirtûkxwendinê kir.

1980.12.12

Îro ji rojan Înî ye. Li Sûrî ji bona Îslaman roja betlaneyê ye. Lê kesên xwedî olên din normal dixebitin. Betlaneyên wan jî di rojên din de ne. Şemî ji bona Ermenîya, Yekşemî ji bona Cuhuyan betlane ye.

Di bajarê Qamişlo da, hemû kes azad e, ku gorî bawerîya xwe tevbigere.

Lê divê di roja îşaretkirî de dukan girtî bin. Memurên şaredarîyê qontrol dikin. Ermenî roja Şemîyê dikanên xwe digirin, ji ber ku hemû ticereta qehwê di destê wan de ye, wê rojê me nekarî bû qehwê bikirin,

Li Sûrîyê firin yê dewletê ne. Êvaran heya 24 ê şevê, an jî heya saet 1- 2 şevê jî dixebitin. Polês, leşker xwedî hin mafên taybet in, ji bo nankirînê ew nakevin dorê. Me xebata xwe ya rojê normal domand. Ez û Alaettîn Înce bi hev ra derketin bajar, lê baranê qet mecal neda.

198.12.13

Îro xwarin çêkirin û paqişîya mitbaxê dora min e. Lê bona ku heval bikarin xwarinek xweş bixwin hevalê Bedirxan alîkarîya min dike.

Ew di çêkirina xwarinê de gelek hosta ye. Alîkarîya xwe jî ji hevalan kêm nake. Min di jîyana xwe de qehwa xwe, ya yekem îro çêkir.

Piştî nivro Hemîd Dewrêş hate ba me. Xwest bona serşûştine em herin mala wan. Di mala me de îmkanên serşûştinê tune.

Barana ku ji do va dest pê kiribû, bi hin navberên demkin dom dike. Me şemşe û kurkê Seyda yê Keleş jî girt û ji mal derketin. Ji ber xwedîyê xwe kurk li ba me hevalan xwedî qîmetek taybet e.

Em li mala Hemîd Dewrêş in. Xwarin, vexwarin û peyv dom dike. Di vê navê de Mistefa Cizirî çû serşokê, ku xwe bişo. Serşok li rex oda ku em lê rûniştine. Dengê ocaxa xazê û dengê ava muslixên vekirî me dibihîst. Heval li ser dengê muslixan dipeyîvîyan, me her yekê tiştek got, lê gotina paşin sipartin hevalê mihendiz.

Ji nişkeva ji serşokê deng hat, dengekî dagirtî. Wek çawalekî tijî ji qatê jorin bê xwarê, çawa deng derdixine mîna dengekî usa bû. Em hilceniqîn, me li hevûdû mêze kir. Me hin jê tu mane dernexistî bû, jina malê; Leyla Xanimê got, *"Mistê, ew ji bîrve çû, ket"* me hemûyan ber bi serşokê lezand. Mistê!, Mistê! Me ji banga xwe bersiv negirt.

Derî ji paşve hatîbû kilît kirin, me nedikarî em derî vekin. Derî hesin bû, ji sera jî cam bû, camê qalind û mij, piêt camê xûya nedikir. Me dixwast em camê bişekinin. Lê em ditirsîyan ku zerarê bidin hevalê xwe.

Pêşta me di camê de qûlek piçûk vekir. Ji qûla camê, dû û bîna xazê derdiket. Me dî ku Mistefa li erdê bûye berete. Piştî wê me hemû cam şikand û derî vekir. Me ew avite derva, piştî çed deqan ew li xwe hat.

Oda serşokê 2X3 m2 ancex hebû. Li goşekî soba av germkirinê, di teniştê wê de jî ocaxa gazê hebû. Ocax hîn ji dişewitîya dû û bîna xwe ya qirêc berdida holê. Li jorê, di dîwar de pencirek piçûk hebû, ew jî vekirî bû.

Heval li ser şirove dikin, pencire vekirî be çawa ew yeka çê di be? Xûya bû ku pencire du ra vekirî ye. Ocaxa gazê, oksîjena odê qedandibû, jarbûn lewma çê bibû.

Hevalên din cîhê ku hiştîbûn sohbeta xwe domandin. Her çiqas em ji bona serşûştinê çû bûn jî min û Alaettîn me dev jê berda. Wek moral em nerehet bûn. Ya din jî bi van îmkanan pir wext dixwest ku ewqas kes bikare xwe bişo.

Saet 20.00 an de cîranê ku ji derva kete hindur da zanîn ku ji dûrva dengê sîlehan tê bîhîstin. Kes nizane ew çîye, deng ji kîderê tê ?

Şev, Bedirxan li ba M. Cizirî ma, em hersê din jî vegerîyan mala me.

Dema şikandina cama derê serşokê perçek piçûk a camê pekîya bû çavê min. Nuha ew çavê min diêşîne û min ne rehet dike. Di xewê de misdan an jî xûrandin dibe ku çavê min xirabtir bike. Lê em digîhîjin wê encamê ku sibê ez herim doxtor.

Dora roja din salnaman 14 Çile yê Pêşin 1980 nîşan dida. Saet dehan de hevalê M.Cizirî û Bedirxan hatin mal. Cizirî baş bibû. Xwedîyê mala me, cîranê me Seydayê Keleş bi xeberek ne baş ve hat ba me. Gorî gotina wî li nêzikê sînorê Tirkîyê, leşkerê Tirkan êrîşek anî bû ser malek Kurd û gelek kes hatîbûn kuştin. Bûyer do êvarî di saetên ne dereng de hatîbû holê.

Dengên sîlehan ji dur va hatîbû bîhistin. Gotinên ku duhî mala em lê mîvan bûn, hatibûn gotin hat bîra me. Li naverastê bûyerek hebû.

Lê çi bibû û çi qewimî bû, li kîderê û kê kirîbû kesî nedizanî. Em li benda hevalên partîya dost, Partîya Demoqrat a Pêşverû Kurd Li Sûrî man. Êvarî hevalê ku hat cem me, ew bûyer eşkere kir.

Li Cirnixê, êrîşek çekdarî birîbûn ser mala Remoyê Kavreş. Hin ji endamên malbatê, hin jî endamên tevgera Kawayê û tevayî 15 kes hatibûn kuştin. Kesên ku êriş pêkanîne der û dora malê rind kifş kirine. Li der û dora xanîyê Kawreş 700

qovanên vala hatibûn kom kirin.Tê gotin ku ev qowanên vala ji tifinga G1ne. Ev yeka me bi guman dibe ser rêça dewlata Tirk.

Li ser pirsê û bona girtina hin tedbîran me gelek wext li ser guftogo kir. Encama bûyerê ya zelal ew e ku, kesên welatparêz, kesên dijî rejîmên dijmin her wext û li her derê lazime tedbîrên xwe bistînin, hesavê dijminê xwe rind bikin. Vê bûyerê li ser jîyana me jî tesîr kir. Piştî bûyerê me jî derketina derva hema hema da sekinandin.

1980.12.15

Di nava cîhê xwe de bûyera Cirnixê, mirovên ku hatine kuştin difikirim. Zar û jinên di mala xwe de rûniştî, ji hemû tiştî bê xeber, bi destê qetilan hatin kuştin.

Zarok bi emrê xwe yê kin, cîhan nenasîn, ji hezkirina dayik û bavê xwe têrnebûyî, dinya terikandin û çûn. Çawa ku wan dinasêm. Çawa ku navê wan Cîran, Bejna û Bermal e.

Hêvî û daxwaza min ew e ku xwîna 15 welatparêzên Kurd, têkoşîna azadîya gelê me xurttir bike.

Di nava nivîna xwe de dûr, heya Haysivê, heya dê û bavê xwe terim. Li himber zilma dijmin, li himber zivistana çetin ew çava berxwe didin tînim ber çavê xwe.

Hevalên girtî difikirim. Brayê min Yavuz jî di nav da. Ew çawa emrê xwe yê xort di zîndanan de diborînin?

Di rêya tekoşîna azadîya welat de berxwedan û fêdekarîya Kêkê Mistefa tînim ber çavê xwe. Ew wek endamê komîta merkezî di welat de xebata partîyê rêz dike. Mirovên ku lê tê gerîn, cîh dike, an jî derketina wan a dervayî welat organîze dike. Ji bona hevalê xwe ji destê cunta faşîst xilas bike hewl dide.

Xwîşk û birayên xwe yê din bi bîr tînim. Zarok û jina min têne bîra min, lê fedî dikim, ji vê bîranînê zû dev jê ber didim. Kesên welatparêz, şoreşger lazim e zêtir pêt bin. Lê meriv çavê xwe bigire jî, tiştên heyî tune nabin. Li Rojava mîvantîya min mehek tujî kir. Emê çiqasî li vir bimînin ne xuya ye.

1980.12.20

Jenosîda ku li himber malbata Kawreş hatîbû kirin, hêzên ku ji Tirkîyê bazdabûn û li Sûrî diman kirin tengezarîyê.

Em jî di nava xwe da, şev di malê de nobedarî girtin û hin tiştên din peyîvîn û hin biryar girtin. Em heval dudo, sêsê di du odan de radizên. Her şev odek heta sibê bi kileşkofan nobet digire. Her çiqasî mala ku em lê diman li gorî rewşa xwe ji mala Kawreş cudatir bû, dîsa jî tedbîr girtin pêwîst bû. Bi taybetî firina kêleka mala me heya sibê vekirî bû û kolan bi mirovan ve tujî bû.

Îşev nobedarî dora min û Alaettîn e. Bona ku em xewa xwe birevînin, me saet 2 û mîvan an de çay çêkir.

Ji derva dengê lingan û kûxika kesên terin firinê tê. Hevalên oda din jî hîn raneketine, dixwînin.

Derdikevim pêşîya derî, li der sêr dikim. Eziman çîk sayî ye, heva ne sar e. Demsal li zivistanê ne çû ye. Hişê min çû gûndê min, nuha li wir kêmasî metrek berf heye. Li gorî nûçên radyo îsal li Kurdistan û Tirkîyê zivistan pir çetin derbaz dibe.

Ji der û dorê dengê dîkan dihat. Bi dengekî nizm ji Alaettîn dipirsim *"em dikarin çi bixebitin?"* Bi dengekî nizm, çimku, dengê me ji derîyên Seyda yê textê bi navber dikare ji derve bê bîhîstin. Hevalên oda din pir caran di vê babetê de bala me dikîşînin. Lê dengê wan jî yê me kêmtir nîne.

Sova me ya gazê dişewite û oda me germkirî ye. Demikê şûnda cardin derdikevim derva. Di oda din de xûrinîya hevalekî heta der dihat. Dikenim, dibêjim herhal hevalê M.... e. Di destpêkê de min 3 şevan zor tevat kiribû ku tevî wan di odekê de razêm. Hevalên cigarekêş di odekê da, yên ne cigarekêş jî di odekê de me cîhê xwe par ve kir.

Ji bajar saet 04,45 de wek koroyek dengê ezanê bilind dibe. Hin mele ji bo şûva nemînin dilezînin. *"Allahu ekber!, Allahu ekber!"* Der û dor ronî bû, êdî wext e, ku em jî razên. Dengê ji kolanên derva heya me tê, dijware ku meriv razê. Lê hevalê oda min nefesek kûr dikişîne, xûyaye ku ew xev ra çû ye.

Saet 09.30 ê de bi derîlêdanê şiyar bûm. Du xortan mala cîranê kêleka me dipirsin. Êdî xew ji bo min qedîya, rabûm.

Xortê me yê kal, Seyda ji gera çarşîyê hat.

Bedirxan jî dixwaz e, ez û wî tevî Seyda herin çarşîyê. Em hersê li cem hev rê ker dikin, yên ku ber me ra derbaz dibin, bin çavan ra li me mêze dikin. Kîloyê me hersîyan jî têra xwe he bû. Em bê armanc, di kolanan de piçekê jêr û jor gerin. Seyda em birine bazara kevnefiroşîyê jî.

Nûçên Tirkan yê êvarî, ji zamkirinê bêtir tişt tune bû. Li Tirkîyê di navbera % 9 û 20 an de zam hatîye ser petrolê.

Ji ber bêxewmayînê, li ser min tevizandîn û xewarîyek heye. Heval li mala Seyda TVê sêr dikin. Ji bo ku ez razêm hewl didim, lê min nekarî razêm jî. Li ser zimanê kurmancî hin tişt nivisî û xwend saet 1 de raketim.

Sibê de Alaettîn bo mada xwe ya nexwaş divê bi peryodîk hin tiştan bixwe. Lê bo ku mitfax li hêla oda hevalên din e û ew jî hîn ranebû ne, lazim e, piçekê din sebir bike.

Min li bexçe gorî cîhê heyî cîmnastîk kir. Di malê de îmkana ava germ tune, mecbûr bi ava sar dûş girt û li ber tavê rûniştim.

Seyda bi pêşniyarekê hat ba me. Gavekê berê jinek parsek bi pirsa *"malê kî li mal e?"* hatibû ku savar bifiroşe me. Ji ber bersiva me ya neyînî ew çû bû. Lê nuha Seyda dixwaze em wê savarê bikirin. Wî dît ku ez bê biryarim, li Bedirxan pirsî. *"Ma Bedirxan li ku ye, ew ranebûye? Emê wilo bikin, 25 wereqe ye"*

Bedirxan jî rabû hat. Lê bulgir-sawar- tenîke tijî derneket, Seyda ew kir 20 lîra û tenîkê savarê girt anî.

Nûçên Tirkîyê ya saet 13.00 an em guhdarî dikin. Tê gotin ku qetîlê Umît Qaftancioxlî jî di nav de li Stenbolê 8 teroristên faşîst hatine girtin.

Faşîzm her wext û li her derê rûyê xweyî rasteqinî vêdişêr e. Wek li hemû cîhên din li Tirkîyê jî faşîzm armanca hatina xwe ya ser hukim vêdişêr e. Ji bo ku di nava gel de ji xwe ra bingeh çê ke, ew derewan dike. Bi propaxanda dixwazin bi gel bidin qebûl kirin ku ew him li himber hêzên çep, him jî li himber hêzê faşîst in. Lê ew yeka ne rast e, bi gotinên ûsa dixwazin hedefê biguhurînin û armanca xwe vêşêrin. Faşîzm welatê ku têda bûye desthilat, tu li derikê nimune tune ku di têkoşîna çîna karkeran de li himber sermayedaran bêalî maye, an jî hakemî kirîye. Ji xwe sedema hebûna faşîzmê, ji emperyalîzma tekel ra bekçîtî ye. Burjuvazîya yekdest di îdarekirina karê welat de gora wext û zeman hin caran grub û şexsan dikare tercîh bike. Hin kes û gruban dikare ji çav derxine. Ew taktîga faşîzmê ye. Girtin û mehkemekirina hin qadroyên faşîst, wek girtina Tirkeş û hin qadroyên partîya MHP ê nikare isbat bike ku MHP an jî cunta ne faşîst e.

Faşîzm qadroyên ku hatine nas kirin, kevn bûne, di xulamtîyê de hatine dereca dawîn, bi qadroyên jêhatîtir û bi qadroyên nû ve cîh diguharine.

1980.12.22

Tevî Heval Alaettîn em derketin çarşîyê, dixwazin piçekê der û dora xwe nasbikin, lê Alaettîn nerehet e. Ji bona wê ji xwe ra hin xarin girt em vegerîn mal. Mada xwe ne baş e, ew her xwarinê nikare bixwe, gora xwe xwarinê dikire yan çêdike.

Veysî Zeydanlioglu sibe tere Şamê. Nama ku 15 rojan berê min bo Swêdê nivisî bû, îro dişînim. Piştî xwarin û çayê em dîsa pirtûk dixwînin. Saet 3. 30 şevê ye, em dîsa nobedarîyê dikin. Mal bê deng e. Sova me dişewitî, Alaettîn pirtûk dixwîne, ez van notan dinivîsim. Ji her alî dengê melan tê, ew bi lez dixwazin gawekê zû ji karê xwe xelas bin.

Em usa pêşwazîya roja 23 ê Çileya Pêşin dikin. Saet 5.30 ê sibê ye, heva germ e. Hevalên din jî her çiqasî ji bêduzenîya razan û rabûnê gazin dikin jî îşev ew ji heta sibê ranezîn. Veysî çû, em hewl dikin ku razên. Saet 10 ê sibê, em rabûn, hevalên oda din di xewê de ne. Lakin bona ku nebêjin, em zû rabûn, kêm raketin em wan hîşar nakin.

Piştî ku me xwe amade kir, dest pê kir em pirtûk dixwînin. Bi lêdana zengilê derê der Bedirxan şîyar bû, lê usa xûya dike, wî hîn xewa xwe negirtîye.

Saet 15.00 ez û M.Cizîrî bi gerek kin, çûn kolanê û vegerin.

Tevî Seydayê Keleş li ser melê Kurdistanê dipeyîvin. Seyda bi hişkayî melê Bakurê Kurdistanê rexne dike. *"Melên cem me welatparêzin, ji bona şîyarbûna gelê xwe xizmet dikin. Lê melên cem we tenê q... mirîyan dişon."*

Min bi alîkarîya Bedirxan xwarina xwe ya yekem, xwarina fasûlyê çêkir. Ne ji malbatên me, ne jî ji havalên me tu agahî tune. Em li vir tenê û îzole ne. Va rewşa hanê me bîhnteng dike, em ji welat ji bona girtina nûçekê hewl didin.

Derengî şevê, saet 23.30 Seyda li derî xist hat. Derva tê gotin ku PDK jî mîna Yekitîyê tê li Sûrîyê meqar vedike, cîh dibe. Seyda bi gumane ku hatina wana Sûrî di navbera partîyên Kurd de dubendîyê çêke. *"Li vir, Barzanîyî tunin, lê îdeolojîya wan heye. Barzanî, kesên ku bi wî bawerîya xwe dianîn jî stuxwar kirin."* Keleş, çek danîn û çûyîna Mele Mistefa Barzanî ya Îranê û Amerîqayê rexne dike.

Partîya Pêşverû ji ber problemên wexta berê ji PDK-I dûr disekine, têkilîyên xwe zêtir bi Yekitîyê re ne.

1980.12.25

Dikan, bazar her cîh girtîye. Ji bo Xaçperestan fermî betlane ye. Em dixwazin piçikê heva bistînin, lê Alaettîn nerehet bû, em bi alîkarîya Kurdekî çûn doxtor. Doxtor bi hin derman û vîtamîn em rêwîkirin.

1980.12.26

Em hemû jî ji bê planîya xwe ya razan û rabûnê, ji xebatê ne razî ne. Her şev ji herdu odan yek nobedarîyê dike. Heya saet 5an 6an şîyar dimîne, piştî wê jî lazime, 6-7 saetan razê. Wê wextê jî saet dibe 13-14.

Em bi hev ra pirtûk xwendinê didomînin. Pirtûka Dîmîtrov a *"Li Himberî Faşîzmê Enîya Yekgirtî-Faşîzme karşi Birleşik Cephe"* me xwend qedand.

Dîmîtrov dibêje, "çîna karkeran ji bo serxwebûn û azadîya neteweki hêza herî bawer e. Kûçikên ku toza cîzmê faşîstan dalês dikin ji pelixandinê xilas nabin. (...) qampanya ku li himberî welatên sosyalîst tê meşandin, şerê himberî armanca çîna karkeran a pîroz, sosyalîzmê ye"

*"Eger ku mirov bi dil û can û bi ezîm li cem welatên sosyalîst cî negire, ne tenê sosyalîst, meriv nikare bibe demoqrat jî."*

Li derva baran dibare. Em rûniştine kovarên ku ji Şamê ji me ra hatine şandin, Komkar, Roja Nû û Roja Kurdistanê dixwînin.

1980.12.27

Baranê hêza xwe zêde kir, dilopên ku li camê dixinin pê hev dişemitin wenda dibin. Alaettîn xwe rind hîs dike, vê yekê bi başîya ixlamurê ve girê dide.

Ji derva dengê ba û baranê heta sibê, heta êvara dora roja din jî dom kir. Me nekarî derkevin derva. Em ji radyoyê nûçên Tirkîyê guhdarî dikin. Li Dîyarbekirê di meter karekê de bîst kîlo baran barîye.

Buhabûna xwarinê û zem dom dike. Serokê DÎSK ê Ahmet Îsvahan tevî 67 kesan hatîye girtin.

Li Agriyê di operasyonan de 254 kes û tevî hin sîleh ve hatine girtin. Îhtimale ku ew dilxwazên PSKT ne.

Nexwaşîya Alaettîn dîsa bi hiş çûnê û made tirşbûnê xwe de xûya kirin. Têkoşîna pêşin ew e, divê berê em zimanê xwe, ango zimanê dayîkê fêr bibin. Min biryar da ku bi plan û proxram zimanê Kurdî bixebitim. Divê rojê 2-3 saet xwe bidim vî karî. Li Tirkîyê Kurdbûn û Kurdî peyvandin qedexe ye, bi zimanê Kurdî, di xwendin û nivisînê de li paş e.

Di destê me de ji pirtûka,*"Rêzimana Zimanê Kurmancî"* bêtir çavkanîyên nivîskî tune. Pirtûk di sala 1956 an de nivîskarê Kurd, Reşîd Kurd nivîsîye.

Hemû roj ji min ra wek rojên betlaneê, Şemî û yekşemî tên. Çimku; bi derva têkilîyê me tune û em her roj di nava çar diwaran de jîyanek monoton, yekrengî dijîn. Meriv dikare bêje ku têkilêyê me yê bi derva tenê ji dikana taxê, bi kirîna xwarinê ve sînorkirî ye. Em ji hereket û xebata civatê bê xeber in, dûr in. Ya baş ew e ku navê rojê jî di deftera xwe de binivîsim.

Ji derva dengê Ozanê Kurd Seîd Gebarî tê. Li himber hemû tengasîyan jî, bersiva dilê me ew dide. *"Ez ne poşmanim ji vî karî."*

1980.12.28

Yêkşemî

Me li Rojava 40 rojên xwe temam kir. Li Qamişloyê bona ku Kurdên Bakur terin lê rûdinin navê hin qehvexanan, kirine qehvexana Dîyarbekir, Çamlica, Kiratxana Baxlarê. Lê em pir bi tedbvîr in. Bilî çend gerên kin bêtir em naçin bajar.

Partîya dost jî hesas e. Ew me şîyar dikin ku îstixbarata Tirkan li vir pir xurt e. Helbet em nehatine gera turîstîk, lê gerê em cîhê xwe jî teng nekin. Li vir jî meriv tabloyên herî reş çêke û bi êhtimala hin bûyeran xwe bike psîkolojîyek xirav ne karê me ye.

Alaettîn şevek xirab derbaz kir, heya sibê nekarî razê. Zêde zêde ixlamûr vedixwe. Di nava cîyan de ye lê nikare razê.

Vaye dîsa sibe bû. Lê bê xew im, dixwazim razêm. Razîyam û saet 10 an de rabûm. Piştî taştê çûm sûkê ji Alaettîn ra hin xwarin; mirîşk, mûz, sêv û derman anî.

Li dermanxanê bi Kurdî dipirsim,*"li ba we alfasîlîn heye?"* dermanfiroş bi Erebî, dixwaze, ez Erebî bipeyîvim, bi ken dibêjim, *"Erebî mefî, mefî... "*

Emanetên Alaettîn min teslîm kir, bi henek dibêjim,*"bîra meke, ez te bi mûz û mirîşkê xwedî dikîm."*

Şiîra Nazim Hîkmet tê bîra min:*"Mirov nan nabînin, masî qehve vedixwin, Xiznîran bi patatês, mirovan bi gotinan xwedî dikin."*

Mistefa Cizirî derva li ber rojê rûniştîye cehd dike şiêr binivîse. Beyîta ku nivîsîye û rawî min dike, em ser dipeyîvin.

Dibêje,*"min xwest li ser rojnama -Roja Kurdistan- tiştekî binivîsim, lê va derket, nizanim çava ye? Lê gora min ne bû."*

Moral didimê; *"di eslê xwe de hemû kes dikare şiîr binivîse, hemû kes, qasî ku hîs û armanca xwe tîne ziman, şaîr e, şaîrê hestê xwe ye. Di şiîrê de her mirov dikare tiştekî bibîne, lê xwedîyê nivîsê jî tiştekî dibîne."*

Li himber dîtinên Alaettîn ew xwe aciz dike û dibêje *"tu herkesî rexne dikî, lê tu çi dikî?"* minaqeşeke piçûk di navbera wan de derbaz dibe.

Ji ber nexwaşîya mada xwe Alaettîn gelek bê teqet e. Dibêje min cemidandîye, lê bona ku necemide tedbîr nagire.

Divê ew perhîz bike, lê dibêje tişt nabe, dûra jî pê hev girpika wî heltê.

Ji xwe ra nabîne hêk an jî patateskî bikelîne bixwe, xwarina amadekirî dixwe, ew jî lê nayê. Dibêje lazime ew du sê saet bi navber xwarin bixwe, lê heya saet 12.00 an bi zikê birçî dimîne.

Di cila xwe de bona ku cakêt ne qirmiçî, navêje ser pişta xwe, pişta xwe dide karyola hesinî, lê nayê bîra wî ku ew wê torê jî dikane sermê bigire. Bi kurtî nerehetîya wî hîn pir dom bike.

Di xewnê de terime gundê xwe, dê û bavê xwe dibînim. Bi hevalan ra qala xewna xwe dikim. Guhê min li ser heval û endamên malbatê ne, yên ku li himber êrîşên faşîzmê rû bi rû ne.

Seyda yê Kelaş ji me ra xwarin amade kirîye. Camêr di ber me de ewqas zahmetî dikişîne ser de jî bona xwarinê ketîye zehmetan. Em bi vê yekê ne rehet dibin. Angorî ew, xwedî sê çar zarokan ne û aborîya xwe jî ne baş e, dîsa jî comerdîya xwe didomîne.

1980.12.29

Dûşemî

Ji durva mîna bakî gur, dengê erebe û ji dengê dîkan bêtir li ortê tu tişt tune. Saet 2 û nîvê şevê ye, derê me hat lêxistin. Bedirxan e...... Nekarîye şev razê, dixwaze li cem me rûne. Ji deftera destê xwe şiîra *"Hoho Jînê"* dixwîne.

Me çay dem kir û dest bi galegalê kir. Em çûn rojên derbazbûyî, rojên kevn. Me şehîd û mêrxwasên xwe bi bîr anîn.

Yek û yek li ser bîranînên xwe yên hevpar, xebat û hevalên xwe, tiştên ku me dizanî, em li ser peyîvîn.

Saet 06 ê sibê, *"şevek jî me aha, derbaz kir"* got û dawî li galegala xwe anî.

Lê saet 10.30 em rabûn.

Em naxwazin mîvan û hevalên ku tên û terin me di nava nivînan de bibînin. Lê li oda din Mistefa hîn di xewê de ye. Ew do êvarê saet 18.00 razîya îro saet 13.00 an de rabû, me bi zanetî ew şîyar nekir. Xortê me ev e. Pirtûka 10 Rojên Ku Dinya Hêjand *"Dunyayi Sarsan 10 Gün"* dixwînim. Em nûçên êvarê guhdarî dikin, li Kurdistanê, gundê Kaynarpinar a Kanîreşê -Karliovê bi nave Hesen Alî Tekîn yek hatîye kuştin. Li gundê Pinarlar a Pêrtag a – Dêrsim ê jî çar kes hatine girtin, yek ji wan giran birîndar e. Duh li Entavê serleşkerek hatîye kuştin.

1980.12.30

Sêşemî

Hevalên oda din tevî Seydayê Keleş heya sibê rûniştin. Alaettîn şev nerehet bû, çend caran derman girt. Sibê dîsa zû rabûm, naxwazim fêrî teralîyê bibim.

Ji saet 10 an haya 15 an pirtûka di destê min de ye dixwînim. Derva baran dibare, hin caran zêde dike. Bona ku hevalê oda din, heta sibê rûniştine, ew jî saet 17.00ê evarê rabûn. Wan jî rekorek nû girtin. Îro dora xwarinçêkirinê ya min e. Çûm dikana taxê, hin tişt girt û vegerîm.

1980.12.31

Çarşemî

Me bi hev ra paqijîya malê û mitbaxê kir. Ji bona şeva serê salê heval dipeyîvin. Seydayê Keleş tevî Bedirxan lîsta pêwîstîyê dadigire.

Ez kincên xwe dişom. Alaettîn bi çekşûştina min henekê xwe dike. Dibêje tu, *"çiqasî bêçare dişoyî."* Em carek din fêdekarî û zehmatîya dayîkan, bi bîr tînin.

Seydayê Keleş li gorî lîstê kirîn kirîye, hatîye. Seyda kar dabeş dike, Mistefa bi baweşînê agirê kivavê gur dike, Bedirxan goşt dipêje. Ez saletê çê dikim, Alaettîn ji bo ku her xwarinê nikare bixwe, xwarina xwe çêdike. Dû û bêhna ku ji goştê ser manqala komirê tê, kebabcîyên Dîyarbekirê anî bîra me.

Seyda li ba me bi qedir û qîmet e. Dîwana xwe derxistîye, ji me ra şîêrên ku bi kurdî û tîpên erebî nivîsîne bi zahmetî dixwîne. Ferqîya roja îro jî ji rojên din cudatir ne bû. Sala 1981 an jî em ji dost û hezkirîyên xwe dûr in. Saet 24.00 şevê me nûçên Tirkîyê ji Televîzyona Seyda guhdarî kir. Li derva hezaran çek hat berdan, li Sûrî pir caran şahî bi vî tehrî tê nîşandan. Saet 1 Veysî ji Şamê vegerî. Me dîsa bi sohbetê dest bi sala 1981 ê kir. Saet dora 04 an em razîn.

Li ser sala nû, li ser salên derbaz bûyî difikirîm. Heta nuha min pir caran tenê û bê deng 37 car sersalên nû derbaz kirîye, ango ketime 37 salîya xwe. Lê difikirim ez, dê di çend salîya xwe de bikarim vegerim, welatê xwe?

Di rastîya xwe da, roja serê salê jî ji rojên din cudatîyeke xwe tune. 364 roj xirab derbaz be tenê roja serê salê baş derbaz be çi qîmeta xwe heye? Ma di serê salê de dijmin dijmintîya xwe nake?

Civak, bona rojikê be, jî problem û tengasîyên xwe bîra bike, deşarj bibe, ji xwe ra hin sedem pêyda kirin e. Hin roj bijartin e, pîroz û qîmet bi nav kirine. Xwestine yek roj be jî, derd û xemên xwe bîra bike. Pîrozkirina hatina sala nû jî ji pêwîstîyek ûsa tê. Bo ku gotina,*"ji merivên dînik ra her roj cejne"* heq nekin, hemû rojên xwe nekirine cejn.

Di welatê me da, îro faşîzm rojê çend can digire, li himber gelê me her cure ne heqî tê kirin. Mafê mirovahî û hemû normên navnetewî tên pelixandin, meriv dikare di şevikî de dilgeş bibe?

Di Kurdistanê de tu nikarî malbatekê bibînî ku, ji faşîzmê zerar nedî ye. Me û sedan Kurdên din çima, welatê xwe terikandiye, li Sûrî û li welatên ewrûpa em belav bû ne?

Jîyanek usa birîndar û qehır bi şeva sere salê dikare bê guhartin, hemû neheqî û zerarê bide bîr kirin. Dê û bavên ku zarokên xwe hatine kuştin an jî di zîndanan da, di binê zilma dewletê de ne, dikarin ji vê şeva serê salê kêfê bigirin?

Sersala 1980 bi bîr tînim, me ew sal jî dîsa ji malbata xwe dûr li Enqerê derbaz kiribû. Ji bo kongra PSKT ev roj minasiv hatîbû dîtin. Di kongre de li ser rojên hatî tişt hatin gotin. Li ser dema derbaz bûyî tenê bo ku jê ders bê girtin, hate rawestîn. Dîrok dema derbazbûyî di rûpelên xwe de vêdişêre û şaşî û serkevtinên civatan eşkere dike.

Civat û mirov hewl didin ku bi wesfên baş di wan rûpelan de cîh bigirin. Em dizanin ku her jîndarek roj bê bimir e, meriv ku vê rastîyê dizane çima ji bona kar û barên baş nexebite? Dibêjin ku li tabîatê qertal jî, kusî jî dijî, yek bi erdê ra kaş dibe, yê din fir di de.

Wekî şaîr Sitki Taranci dibêje,*"sal ku bû 35, emir dibe nîv"* mirovan ku ew nîv derbaz kir, hedî hêdî ber bi dawîyê dimeş e. Lê mirovatî hewl dide, jîyana merivan dirêj bike.

Di rojên xirab de min jî pir caran ji jina xwe ra di got, *"êdî ji bo mirinê amade me, di salê mirinê de me, eger tiştek bi min bibe, tu şîn naxwazim."*

1981.01.3

Şemî

Di serê sala nû de jî tiştek nehat guherandin. Endamê Polît Buro Partî Komonîst a Sûrî Bavê Cengo li mala me ye. Ew, miroveki kedkar, kamil e. Emrê xwe ji 50 salî zêtir e. Qala çûyîna xwe ya Bulgarya û emelîyetbûna xwe dike.

Îro me di malê de dest bi qursa zimanê erebî kir. Em her pênc heval jî bi hewes û kelecan in. Mamostê qursê Cemîl e. Xwe mamosteye û ji endamê, Partîya demoqrat a Kurd Pêşverû li Sûrî ye. Ew jî nizane ji çi û çawa dest pê bike.

Em bona ku bikarin hin dengên ecêp derxinin, devê xwe xwar dikin, zimanê xwe di tewînin û li gewrîya xwe zor dikin. Di wî emrî de fêr bûna zimanê erebî zahmet e. Qet nedihat bîra min ku ez rojekê bêm vî welatê û bona fêrbûna zimanî Erebî herim qursa zimanê Erebî. Xasima tîpên Erebî ji min ra gelek bîyanî ne. Hevalên din di zaroktîya xwe de pir an hindik çûne qursa Qûranê ew tîpên erebî nas dikin.

Êvarî em çûn, ba cîran û xwedîyê malê Seydayê Keleş, nûçên telewîzyona Tirkan guhdarî kir. Hewa ne baş e. Baran dibare. Baranê di şev de dest pêkirîye û roja din jî heta êvarî barî.

1981.01.05

Duşemî

Tişteki balkêş tune û jîyanek yekrengî berdewam e. Ji welat agahdarî tune, bê dengî... Bi vî awayî wê çiqasî bidome em nizanin. Radîo ya BBC yê di xeberên xwe da, da zanîn ku li Enqerê nêzî 20 akademîsyen, doçent, dersdarên Akademîya Bazirganî û Aborîya Zanistî yê ji alî îdara orfî ve hatine zîndan kirin.

Li Elmanyê bona protestokirina kirinên cunta faşîst grubek Kurd û Tirk dest bi rocî ya mirinê kirine. Hin Elmanên demoqrat jî piştgirîya xwe nîşan dane. Di rodîyo û telewîzyona Tirkan de xeberên ha cîh nagirin.

Şev em dereng raketin. Nobeta şevê roj û şeva me tevlîhev kirîye. Hevalên ku nobedarî kirine dereng rabûn. Em bi hev ra pirtûka Toglîattî a "Dersên ser Faşîzmê" dixwînin.

1981.01.06

Sêşemî

Ez û hevalê Alaettin Înce terin, ba doxtorê Kurd, Kasim. Piştî miyaneke baş, me derman girt û em zivirîn mal. Li Tirkîyê baranê zerar daye gel.

Ez Toglîatti dixwînim. Musolonî vê dîtina xwe dike formîl. *"Partîya faşîst bi kadroyên ku hukim dest dixine, nikare dîsa bi wan qadroyan hukmê xwe bidomîne."*

1981.01.10

Şemî

Mamoste Cemîl dixwast em xwarina navrojê li ba wan bixwin. Baran mecal nade û em jî di vê hewa yê de naxwazin derkevin derva. Em pênc heval rûniştine di nava xwe de sohbet dikin û di pencira oda me de li baranê sêr dikin. Nişke ve telîsê ku di cîhê derî hewşê de hatîbû daliqandin rabû û du kes ketine hewşê. Em bi mereq li wan dinêrin. Ji wan yek me nas kir, hevalê partîya Pêşverû Îbrahîm e. Yê din yekî

bejnzirav û direj e. Ji bo ku xwe ji baranê biparêze pêsîra palto rakirîye, şewqe heta ser guhê xwe daxistîye. Em derî vedikin, ew bi ken ber bi me tên.

Di şêmûga derî de em hevûdû hembêz dikin. Kekê min Mistefa, (Apê Selîm) e. Piştî ewqas bê dengîyê hatina wî moral da me. Bi lez em li ser agahîyên welat didin û distînin. Ew rewşa welat şirove dike. Li gorî agahdarîyên wî 150 alîgirên PSKTê hatine girtin û di girtîgehê de ne. Ewqas kesî jî lê tê gerandin. 50 heval jî derketine dervayî welat. Hin hevalên din jî amadekirîya derketina derve dikin. Em bi hev ra çûn mala Mamoste Cemîl.

Lê me tewat nedikir, em li wir dirêj rûnin, rabûn. Me dixwast bi Apê Selîm re hûr û kûr bipeyivin. Em bi dirêjahîya şevê peyîvîn.

Apê Selîm di Hezirana 1980 de derbazî Kurdistana Rojhilat bibû. Li wir li cem Partî Demoqrat Kurdistan Îran meqer avakirine, hin heval li wê cih bûne. Ew jî rojek an du rojan berî derba 12 ê Îlonê ya leşkerî derbazî Kurdistana bakur bûye. Ew hin kar û barên partîyê dirust dike, ji bo xebatê komîtekê saz dike, piştre bi rîya Helebê tê Qamişloyê.

Mirov dikare bêje ku me şev û roj gûhartîye. Ji bo ku ahenga razan û rabûnê xira bûye, hin tiştên me jî pê re xirab dibin. Di hesasî û xûyên me de jî gûhertin çê bûne.

1981.01.12

Dûşem

Rojek pir xweş e, mîna roja biharê ye. Saet 10 e, roj li ezman dibiriqî û hewa germ e. Hevalên oda din heya sibê sohbet kirin e. Sibê jî çûne çarşîyê ji bo xwarinê tişt kirîne.

Qursa zimanê Erebî rind tere. Hêjmara xwandekaran pênc e, a mamosteyan dudo ye. Sinifek pir modern e…

Hevalê Mistefa Cizirî derketîye çarşîyê, heta derengîya şevê ew nehat. Me Seyda agahdar kir. Ew, şev saet 24.00 de hat, dibêje ew çûye mala apê xwe. Em bê tedbîrîya wî rexne dikin.

1981.02.21

Bona 15 rojan li ser navekî bîyanî ji min re nasnameka Filistînî (adem taarut) hatîye dagirtin. Di rîya Helebê de me, terim Kobanîyê. Saet 9.30 min zar û zor di otobosa Kobanîyê de cîhek dî. Hevalê teniştê min Kurd e. Otobîsê de rêwî li ser hev rûniştin e. Di cîhê du merivan de sê meriv rûdinin. Erebe gelek kevn e. Camên pencerê hemû şikestî ne, rûyê qoltixan dirîyane.

Ji ber tirsa tevgera Birayên Bisilman li ser rêyan esker sixlet sekirinan dike.

Li ser rê leşkeran dan zanîn ku ava Feratê rê na de em ji pira Cerablusê derbaz bin. Ji ber vê yekê jî lazim e, ji pira jêrên ra derbaz bin. Ew jî zêde wext digire. Rîya me gelek dirêj kişand.

Du care ku ava Feratê li Cerablûsê rê neda em derbaz bin. Ji pira jêrin derbazbûyînê de li alî çepê avahîyek fermî û ala Tirkan li ser daliqanî me dî. Ew Kela Caber e.

Gora Silêman Şahê bapîrê Osman[61] Begê, damezerkerê dewleta Osmanîyan li wê derê ye. Grubek leşkerê Tirk jî li wir dimîne.

Li Kobanîyê bûm mîvanê Mistefa. Ji gundekî nêzik hevalê Xelîl me zîyaret kir û bûne mîvanê wî jî. Karê ku ez li bendê bûm ne bû û ez 28 ê Sibatê vegerîyam. Li Helebê rastî kekê xwe Mistefa - Apê Selîm hatim, em bi hev ra vegerîn Qamîşlîo yê.

1981.03.13

Gelek hatin û çûyîn çê bû. Rêwîtî, mîvantî û cîgûhertin ûyd. Min navber da nivîsandina xwe. Ji ber ewlehîyê me mala xwe guharî. Nobet girtin, bêxewmayîn, nereheti, bêduzenî, telaşkirin û miskînî her tişt kêm bû.

Em derbazî taxa mamostan bûn. Mala me ya nû yek qat û sê ode ye. Di mala me ya nû de serşok û kîler jî heye. Xanî yê nû yê mamoste Alî ye, dilxwazê Partîya Pêşverû ye. Xwe li Siûdîyê mamosteyî dike. Xanî malê kooperatîfê ye.

Hikûmata Sûrî nuha ji ber ku piştgirîya Birayên Bisilmanan kêm bike giranî daye xizmeta gel.

**Civîna Şamê**

1981.03.19

Ji hevalên Şamê xeber hat, em hevalên li Qamişloyê herin Şamê. Lê li ser rîyan gelek sekirin heye, tenê bi rîya balafirê yek an jî du caran qontrol çê dibe.

Hevalên pasaportên xwe hene bi otobîsê, yên bê nasname ne jî dive bi balafirê herin Şam ê. Em sê hevalên bê pasaport ez , Alettîn İnce û Yaşar Alagunduz in. Me sê bilêtên balafirê girt, li Qamîşloyê bê ku qontrol çê be, li balafirê sîyar bûn û li Şamê peya bûn. Li peyabûnê, ji derê derketinê leşker bi zimanê Erebî ji me nasname xwest. Ez li pêşîya hevalan bûm, min jî ji bêrîka xwe nasnama xwe ya sendîqê ya ku ji Tirkîyê anî bû nîşan da û derbaz bûm. Hevalên din jî çi li ser hebûn nîşan dan û em derbaz bûn.

Leşker tîpên latînî nedizanî, şaş û metal li me nihêrî û tiştek negot. Me baver dikir, ku hevalên me yê li Şamê têkilî danîne, leşker jî ji pirsê haydar e, bo henekî ji me nasname dixwaze. Em derbaz bûn çûn. Hevalê ku li malê benda me bûn, bawer nekirine ku em ji wê derê bifilitin. Wexta ku em bê qeza li pêşberî xwe dîtin kêfa wan hat.

---

[61] Piştî tehdîd û êrişên DAÎŞ e, hikûmata Tirk, 2015 an da, gora Silêman Paşa anî nava axa Kurdistana Rojava

Di navbera 18 Adar û 5 ê Avrîl a 1981 de li Şamê komîta merkezî tevî hevalên amade civînek hevbeş pêkanî.

Di nava van rojan de li ser xebat û rewşa partîyê hat rawestin, gelek rexne û pêşniyar hatin kirin.

-Kongra sala 1980ê, di demik nêzik de hatina faşîzmê ser hukim rast tesbît kiribû, lê partîyê li gorî wê nekarîya bû, tevbigere û tedbvîran bigire.

-Piştî hatina cunta faşîst partîyê nekarî bû, xwe nû va organîze bike, kadroyan biparêz e.

-Partîyê kar û xebatên demoqratîk zêde derxist pêşîyê û hemû qadro di van xebatan de hatin deşîfre kirin, ji şunda qadro nema.

Lê hin pêşnîyar hatin kirin û biryar jî hatin girtin:

-Bi navê Rîya Azadî rojnamek partîyê li dervayî welat bê weşandin.

-Lîsta navê hevalên girtî û yên revî hat çêkirin û li gorî hin pîvanan ji jin û zarokên wan ra alîkarî hat tesbît kirin.

-Biryara têkilî û xebata k udi nava (PSKT, Yekitî, KDP-Î û Partî Pêşverû) çar hêzên Kurdîstanî de heye bê xurt kirin. Di nava hêzên Kurdistana Bakur de jî xebata hevkarîyê bê kirin. UDG çima nemeşîya? Li ser hat peyvandin.

-Li ser îfadên hevalên girtî hate ravestin. Komîta Navendî bi dengê piranî rewşa hevalên girtî wek îxanet, an jî li xwe mukirhatin nedît. Lê gorî îfadên di dest de helwesta wan hevalan wek kêmasî, qelsî hat pejirandin. Partîyê dîsa biryar girt ku ji bona hêjakirina îfadên wan neyê lezkirin, heta ku bi wan hevalan ra jî bê peyvandin û rewş zelal be, carek din ser bê rawestin.

Biryarek jî di derhaqê di dadgehan de parastinên sîyasî hat girtin: Nazîf Kalelî û Yilmaz Çamlibel partîyê, Kenan Kizil DHKD ê, Yavuz Budak jî komela zanîngehê ku nunerê wê ye, biparêz e.

Di dabeşkirina kar de heval zêde nepeyivîn. Di destpêkê de ez û hevalê Bedirxan li Sûrî û Beyrûdê hatin wezîfedarkirin. Tevî hêzên Filistînî têkilî danîn û di qampên wan de perverdekirina qadroyên ku derbazî Sûrî dibûn bû karê me. Farûk Aras jî berpirsîyarê Şamê bû.

Lê divîya bû, yek, an du kesên merkezî jî biçûna Kurdistana Rojhilat. Li wir jî grubek endam û dilxwazên partîyê hebû. Ji komîta navendî, xeynî me sê kesan, 6 kesên din, wek Kemal Burkay, Husên Beysulen, Ayhan Kutlay, Zîya Acar, Bayram Ayaz, Mistefa Budak amade bûn. Mistefa çend mehan berê ji wir hatî bû, dixwest hevalekî din here. Lê kesî ne xwe, ne jî kesekî din pêşniyar nekir.

Hevalên Komîta merkezî te digot lal bûne. Hevalên ku ji Ewrûpê hatîbûn îltica wan hatîbû pejirandin, pasaporta xwe girtîbûn, ji sosyalê mafê xwe yê alîkarîyê jî hebûn, lê dilê wan tune bû ew ber bi Kurdistanê herin.

Li himber vê bêdengîya, ez di derheqê partîyê de cara yekê ketim fikaran. Heta min ew li wir jî anî ziman.

Min got,*"ma çima hûn ewqas bi tedbîr in? Partîya ku me di ber de xwe feda dikir, a va ye? Îro tabloya vê civînê, li himber partîyê di serê min de bê bawerî anîye holê. (...)"*

Dawîyê kesî nexwast here Kurdistana Rojhilat, ew kar ji bo biryara dawîn spartin polît bûroya partîyê.

Hin êvaran ku wext hebe em derdikevin bajêr, digerin. Şam bajarekî kevn a Osmanîyan e. Caddên fireh û bînayên xweşik hene. Hêjmara bajar mîlyon û nîv e. Hewayê xwe li gorî demsalê ne germ e. Hin caran bayê ku tê jî gelek sar e. Ji behrê bilindîya bajarê Şamê 700 metro ye. Bajar modern e û ji alî civakî û ekonomîk ve pêşketî ye.

Kesek ji me zimanê Erebî nizane, dan û standina me çetin e. Hevalên ku terin tişt dikirin pir caran bi kaxiz û pênûs terin û sûretê tiştan çêdikin. Sûretê masî, îsot, hêk, an jî nan.

Rojekê hevalekî gelek qelev tere dermanxanê ji bo qebizbûna xwe derman bikire, nikare ji dermanfiroş re bi de, zanîn.

Dawî de di cîhê xwe de xwe xûz dike, zorê dide xwe, xwe tirş û tal dike, jinik pozê xwe digire û pakêta derman dirêjê, dike.

Hewalê qelew bi ken qala çîroka xwe dikir û digot *"kanê te ji min fêm ne dikir?"* Heval ji ewrûpê hatine di xerçkirina peran de rehet in. Ew bala me hevalên Qamîşlo dimînin dikişîne. Heval dibêjin, *"li Şamê mesrefa xwarina rojekê, em li Qamîşloyê mehekê nakin. Apê Selîm dibêje partîya me feqîr e û rojan pincar bi me dide xwarin, lê hevalên vi ra çi rehet mesrefê dikin."*

Me nekarî careke din bi balafirê vegerin Qamîşloyê. Ez, Apê Selîm û Yaşar bi otobosê çûn Helebê û ji wê jî çûn Afrînê.

Ji Meraşê du kes Okeş Karagoz û Nûrî Goçmen derbazî Afrînê bibûn, me ew ditin. Em şev li wir man, dora roja din me hevalê Okes jî girt bi trênê derbazî Qamîşloyê bûn. Nurî du salên ku li Sûrî ma li malê nasên xwe de ma, hin caran mîvantî hat li mala partîyê ma.

**Mirina Apê Alî**

1981.4.27

Seydayê Kelêş ji min ra namek anî. Name ji Swêdê ji birayê min Sîdar hatîye. Tarîxa şandina namê 1981.04.19 ye. Wî di nama xwe de nivîsîye ku apê me Alî li Enqerê çûye ser dilovanîya xwe. Wî jî bi rîyên din ev agahdarî bihîstîye. Usa xûya dike, ku apê me nêzî mehekê ye mirîye, lê em hîn pê dihesên.

Apê Alî, li gorî xwe usilek jîyanê dabû ber xwe. Di nava nifşê xwe de merivekî ber bi çav bû. Ji der û dora xwe bi dostî û comerdîya xwe ve dihate nasîn. Ew ser 70

salî ra bû. Marangoz û hostê avahîyan bû. Li gundan xanîyên ku wî çêkirîbûn nîşana hostatîya wî bûn.

Di sala 1976 an de ku di çêkirina çardaxa xanîyê xwe balansa xwe wenda dike û ji qatê dudoyan dikeve xarê. Gelek wext di nav nivînan de ma, lê dîsa ew rabû ser lingan.

Radyo di stuyê wî de him ji Radyo Erîvanê kilamên Kurdî guhdarîdikir, him jî cot dikir an jî gam digerand. Her roj di radîyoya Erîvanê û radîoya Tehranê guhdarîya helbestên Kurdî dikir. Roja 12 Îlonê radyo di dest de hatîbû ku agadarîya derba cunta leşkerî bide min.

Ew di şefaqê sibê de radibû li kera xwe ya reş sîyar dibû diçû, bexçê fîkî û qewaxan av dida, gîya diçinî. Lûlê fistixê li dara benîşt (qizvan) ê dixist. Lê hin caran jî bi rojan derê wî venedibû. Di rojên usa de me dizanî ew, ne rehet e. Min pir caran rîya xwe pê dixist û heta derengî şevê me sohbet dikir. Zaroyên xwe jê dûr bûn. Lavê wî yê mezin Ezîz li Elmanyê, Adil jî li Enqerê dima. Nîyaz îyê lavê wî jî 1976 an vir de li Xarpitê di nexweşxana dînan dabû. Jina wî Altun Xanimê zû wefat kir. Piştî mirina jinê problemên xwe zêde bûn. Hemû karê malê wî bi xwe dikir. Paqişî, xwarin çêkirin, xwedîkirina pez û dewar, di hemû karî de ew tenê bi serê xwe bû.

Wî hin xisûsîyetên feodalî ji ser xwe qet ne avitî bû. Havînî zarokên min hatîbûn gund payîzî vedigerîyan Dîyarbekirê. Em çûn malê, xatirê xwe jê bixwazin, wî çapek nîsk bi zorê dabû destê me.

Di xwest bi vî rengî bersiva hin alîkarîyên me yên piçûk bide. Lê wexta ku em xwendevan bûn, betlane ya ku em dihatin mal, li vegera dibîstanê wî pere dikire bêrîka min û xwendevanên din. Wî xwendin û xwendevan hez dikir. Apê me rastî jî camêr bû.

1981.05.3

Piştî mirina Apê Alî, bavê min zêde tê bîra min. Hin caran dibêjim kalê malbatê bavê min e, êdî vê carê mirin dora wî ye. Çend rojin nikarim xwe ji hin xeyal û fikaran xelas kim. Şev min bi bîntengî derbaz kir. Pir caran bav û dayîka min ketin xewna min. Min dî ku ji gundên dorê gelek kes li zevîya me ya Mêrgahespan ciwîyan e. Hin erebên fermî jî hene. Ji wan dipirsim bona çi hatine û ew çi dixwazin? Kesên ku bersiva min didin xeydok in.

Piştî hatina Apê Selîm me jîyana xwe ya malê baştir bi plan kir. Wexta razan û rabûna me, wexta xwarin û xebata me belû bû.

Saet 10.00 sibê em dest bi xwendina pirtûkê dikin. Xwendina me ya pirtûka *"Polîtîka Ekonomî"* dom dike.

Hewayê sîyasî jî, ya atfosferî jî bi mij e. Em dernakevin derva, lê pir caran nûçe û belavokên derketî Seydayê Keleş ji me re tîne. Seyda guh û çavê me, ya der e. Îro ji

Seyda bi belavoka gruba Baasî ya baskê çep! hat ba me. Belavok li ser Barzanîyan e. PDK-Iraq bi Şamê ra di nava têkilîyan de ye. Dixwazin bên li Sûrî ango, li Qamişlo û Şamê meqer vekin. Ewên ku ji xwe ra dibêjin *"Baasîyên Çep"* li himber derdikevin û nivîsîne ku *"Parastin bi Mosade ra di nava têkilîyan de ye."*

Ez û Alaettîn çûn ba doxtorê Kurd Îsmaîl, eleqek baş rawa kir. Ew miyane kir derman nivisî pere jî negirt.

Çend rojin êvaran ez, Okeş, Qasim, Ciziri û Silêman terin li dervayî bajar mêrgek heye li wir dibezin. Ji ber ku bala xelkê nekişîne em dereng terin. Her roj mesafê zêde dikin. Lê hevalê Silêman pir caran nayê. Îro jî em çûn me beza xwe kir û em hatin mal.

### Dîkê te firdaye

1981.05.09

Hevalên Şamê li ser navê Tevgera Cepha Demoqratîk ji me ra nasname derxistine. Gorî nasnamê em Erebin û ji Filistînê ne. Bi wê nasnamê em dikarin di nava Sûrîyê de bigerin. Em jî wê firsendê bi kar tînin.

Îro em pênc heval tevî hevalê rêber, Ehmed-bavê-Kamo- bi hev ra di rîya Helebê de ne, terin Şam ê.

Şev saet 24.00 an de me xwe gîhande Şamê. Mala me li taxa Rukneddin e, adresa malê ez û rêber Ehmed dizanin. Du taxsî ji me ra lazim bûn, lê me yek pêyda kir û sê heval tevî Ehmed sîvar bûn çûn. Ez û hevalekî jî bi peyatî ber bi malê rê ketin.

Mala me zêde ne dûr bû, dora çil û pênc deqîqeyan me xwe gîhand mal. Em çûn ber derî, derî girtî bû. Hevalên ku berî me hatîbûn, çentên wan li pişta wan di sûkê de diçûn û dihatin.

Leşkerê nobedar ji wan pirsîye; *"ka, ew li çi digerin?"* hevalê rêber, Ehmed dibêje edrêsa ku em lê digerin resimê dîk li ber daliqandî bû. Leşker resmê reklamekî dîk pê nîşan dide, rêber dibêje, *"na va dîka piçûke, ew mezin bû. Leşker deyax nake dibêje dîkê te fir da ye."* Me xwe gîhand wan û min ji wan pirsîya:

- Mal li vir e, hevalê Ehmed hûn li çi digerin?

Wî li min vegerand:

- Raste, mal li vir e, lê suretê dîkekî mezin li ser histuna ber derî bû, ew tune. Min got, *"mal ava tu li dîk digerî an li malê digerî? Mal a va ye, lê heval ne li mal in. Eger tu dizanî ew li kî derê ne em herin kilîtê bînin."*

## Li Qampa Cepha Demoqratik

1981.06.05

Di roja 5 ê Hezîranê em grûbek heval çûn qampa Cepha Demoqratik ya Mînen. Grûbek ji hevalê Rizgarîxwazên Netewî Kurdistan (KUK) ê hatin.

Çend roj şûnde hevalekî me yê din hat. Rojên me çetin derbaz dibin. Şixûlê fizîkî gelek e. Ji bo cîhê razanê baraqayek divê bê ava kirin. Ji bona perwerda leşkerî hin cîh bêne çêkirin. Ji bo spora sibê wek saha futbolê meydanek bê kolandin. Bona perverda leşkerî, hin cîhên xisusî lazim bû bên amadekirin. Havuza çamûrê, saha qûmê ya têlkirî, bo cîmnastîgê saha pendeltonê uyd. Van karana jî em gelek diwestandin. Berî ku em herin qampê ji me ra qala wan xebatan kirî bûn. Hevalekî bi henekî digot, *"Kurd herin kîjan welatî karê giran para wan e."*

Di qampê de mehrûmîyet gelek e. Pir caran ji bona çayvexwarinê qedeh, ji bona xwarinê çetel an jî kevçî tune. Ji avê tama mazotê tê, li wir meriv tasek ava sar jî nabîne. Ew tişt li ser xortan tesîrên ne baş dike.

Hin caran me ji kesên Filistînî ya berbirsîyar ra behsa probleman dikir, lê wan zêde guh nedidan gazinên usa. Digotin; *"em bi mirinê ra rû bi rû ne, kîngê û li kî derê dimirin em nizanin, di jîyanek usa de gelek kêmasî dibin, her tişt têkûz nabe."* Ji wan hinekan ew, tiştên me rexne dikir, parçek ji perwerda leşkerî dihesiband.

Hevalên KUK ê ji bona hin kêmasîyên usa xwestin xwarinê nexwin, boykot, protesto bikin. Lê me piştgirîya dîtinên wan nekir. Me got: em bi daxwazîya xwe hatine vira, kîngê em bixwazin dikarin herin. Mafê me tune, cîhê ku em lê mîvan in probleman derxin in. Me welatê xwe berdaye hatine, li vir bona parîk xwarin çalakîyan bikin, bêjin Filistînî heqê me dixwin, ne di cîhê xwe de ye. Bi rexne û li himber derketina me wan jî dev ji fikra boykotê, xwarin nexwarinê berdan.

Li welat bi tevgera KUK ê ra têkilîyên me ne xurt bûn, ji ber wê me bingehê wan zêde nas ne dikir. Lê li vir me jîyanek hevpar dijiya û me zêtir hevûdû nas kir.

Rojek şemîyê grûbek keç û xortên Filistînî hatîbûn qampa ku em lê diman. Hevalekî tazî li ber rojê wezelîya bû.

Hevalên KUK ê ew yeka xeta herî mezin dîtin û gelek rexne li me kirin. Li gorî wan hevalan li serê wî çîya yî jî tazî xwe dana ber rojê ne di cîh dabû. Ji me xwastin, ew hevalê me, ji ber vê kirinê bê ceza kirin.

Derva bakî gûr tê, di vê demsala de hevakî usa ne normal e.

Dawîya heftê çûm Şamê, bi birayê xwe Sîdar ra bi telefonê peyîvîm. Li gorî agadarîyên wî li Rûhayê Cengîzê bra û xwîşka me Hûsnîya jî di nav de 17 dilxwazê partîya me hatine girtin. Hûsnîya li Urfayê mamoste, Cengîz jî di Fakulta Ziraatê de xwendevan bû.

Filîstînîyan li gorî perwerda leşkerî meşek şevî amade kirin. Navbera Mînen û Melûle yê dora 45 kîlometre ye, em 9 saetan de çûn.

Grub, ji Kurd û Filistînîyan pêk dihat, tevahî em 30 kes bûn.

Li Melûleyê em laqî grûbek Kurdê Başûr, hevalê Samî Rahman hatin. Me heftek bi hev ra derbaz kir. Li ser rewşa welat me agahdarî da hev û guhdarîya hev kir. 9ê Tebaxê em dîsa wegerîyan cîhê xwe yê berê, Mînenê. Xwedîyên qampê êvara 10ê Tebaxê şevik şahîyê li darxistin. Beşdaran bi Erebî û Kurdî stran gotin û govend girtin.

*"Çekê pêşmergan reş e,*
*Ber bi şeran dimeş e,*
*Lo lo gîdîno pêşmerge,*

*Çekê pêşmergan sor in,*
*Lo lo gîdîno pêşmerge,*
*Va pêşmerge çi mêr in.*
*Lo lo gîdîno pêşmerge,*

*Filistînî biran e,*
*Lo lo gîdîno pêşmerge,*
*Filistînî çi mêr in,*
*Lo lo gîdîno pêşmerge"*

Ew çarîna dawîn bona xatirê xwedîyê malê, hevalan wê gave lê zêde kirin. Di nava Kurd û Ereban de li ser zanîna leşkerî û polîtîk pêşbirkî hat çêkirin. Herdu gruban wekhev puan girtin, ango beranbere man.

Dora roja din me xatirê xwe xwest û em ji wir veqetîyan. Bi wî awayî me peryoda perwerda xwe qedand û vegerîyan Şamê.

* * *

Didanê min dihêş e, lê ji bona ku em zimanê Erebî nizanin nikarin kîngê bixwazîn herin doxtor. Evdirrehman Ehmed - bavê Goran soz da ku bi min re bê û tercumanîya min bike, lê got îro û sibe dem dirêj kir. Dawîyê bi alîkarîya xortekî Kurd em çûn ba dixtor û wî didanê min kişand.

Doxtorê min jî Kurd e, lê ji Erebekî zêtir Ereb bû. Yek gotin Kurdî nedizanî. Di vê navberê de hin bûyerên balkêş qewimîyan.

Balafirên Îsralê di nava Îraqê de li avahîya Reaktora Atomê xist. Li Îranê jî bombeteqînikê Serokwezîr Behîştî, 70 parlementer û tevî kesên din100 mirov hatin kuştin. Balafirên Îsralê li Beyrûdê li qampa Cepha Demoqratîk û buroya PLO xist. Bi sedan kuştî û birîndar hene.

Tirkîyê, wezîrê karê derva yê Sûrî dawet kir. Ew dixwazin li ser sînor û li ser kesên polîtîk, yên revîyane hatine Sûrî yê bazarîyê bikin. Di navbera Sûrîye û Tirkîyê de poste naçe û nayê û telefon jî tune. Ji ber wê nameyên ku em dixwazin ji malbata xwe ra bişînin, berê dişînin hevalên ku li Ewrûpa dijîn, ew heval jî wê namê ji wê dişînin edresa malbatan. Min jî nama xwe dişand edrêsa birayê xwe yê li Swêd. Namên ku ji min re diniwîsin jî dişandin Swêd, birayê min jî ji min ra rê dikir.

Îro 23 Tebaxê ye, rûniştim ji bavê xwe, ji jina xwe Nazê re, xwîşka xwe Husnîyê ra, Sevîm û Nevînê ra name nivisî. Qasî ku ew jê fêm dikin, vêşartî û bi gotinên dirêj!

1981.09.06

Gorî agahîyên ku Sîdar ji Stenbolê girtîye û di nama xwe de nivisîye, xalê me Hûsên wefat kirîye. Mirov nikare vê yeka bawer bike, lê çi ji dest tê. Ew rûkenî, espirî û henekên wî, dosthizî û comerdî ya wî yek û yek ber çavê min re derbaz bûn. Ew gundiyekî haltenik bû, lê loqma xwe ya heyî jî tevî dost û hevalên xwe bi merdî par ve dikir.

Jîyanek navîn dabû ber xwe. Ji mirovan hez dikir, qasî dostên wî neyarên wî jî hebûn. Lakîn dost jî dijmin jî li ser camêrtîya wî digîhîştine hev. Ji xortên gund kê keç birevandana dibirin mala wî. Xeynî zerarê, tu mafekî xwe jî tune bû. Pir caran di rûbarî wan şûxulan da, di navbera wî û cîranên wî xirab dibû. Dîsa di bûyerek hanê de şer derketî bû û du gundî birîndar bibûn. Çûyin û hatina qereqol û dadgehê ... gelek xir û cir....

Min got: Xalo çima kî qîz direvîne tîne mala te?

Got; *"Kew bo ku xwe ji baz biparêze, dikeve çeperê sincê. Madem mala min wê bawerîyê dide xortên me, ji bo wan canê min feda be."*

Bawerî û dilsozîya wî ya ku di nava gundîyan de hebû, cesaret dida xortan. Wî qandî zarokên xwe ji me xwarzîyên xwe jî hez dikir. Cara dawîn min ew li Rîçikê mezra Bûdan dîtî bû, li wir çilo dibirî. Du rojan li ba wî û Apê Îviş mabûm. Wan ji bo rewşa me ya sîyasî gelek xem dixwarin. Wexta ku min xatir jê xwest, demik dirêj stuyê min hembêz kir, hin temî li min kir.

Wek dixwest tişteki dizî ji min re bêje. Te digot, ew dizanî carek din em hevûdû nabînin. Li gundê Teman kuştina Delîl Dogan, (endamê-PKK-Partîya Karkerên Kurdistan) çavê gel tirsandî bû. Hemû kes ji bona zar û nasê xwe di nava tirs û xofê dabû.

Piştî ku ez derketim dervayî welat min slav ji xalê xwe ra şand. Ji ber mirina xalê xwe min ji jinxala xwe ra, kurxalê xwe Fadil û Goral ra û ji bavê xwe ra name nivîsî. Fadil û Goral li Swîsrê ne, nama wan dîrek davêjim postê. Lê ya din divê bişînim Swêdê brayê min ji wê bişîni Tirkîyê.

1981.09.10

Spora sibê min ji xwe ra kirîye kar. Her roj saet 4-5 ê sibê terim dibezim, hewa paqiş û derûdor bê deng e. Ji bo karê din jî wext dimîne. Li Şamê gelek bîyanî jî, digerin û dibezin. Xasima hemwelatîyên Sowyet li vî welatî gelek in.

Piştî nivro saet, 15.15an de ez û Mistefa Cizirî rêwîyê Helebê ne. Di Otobosa Karnakê de rêwîyên qora dawîn in. Êvarî saet 20.30 de em li Helebê peya bûn, çûn bûn mîvanê Reşît Hemo. Reşît Hemo kedkarekî doza gelê Kurd e. Endamê komîta merkezî ya Partî Demoqrat a Pêşverû Kurd li Sûrîyê bû. Roja din min karê xwe qedand û ez vegerîyam.

1981.09.11

Xebata ku ji bo hevkarîyê di nava PSKT, KUK û Ala Rizgarî de sê alî tê meşandin encam nade. Xebat xitîmî ye, KUK ê ji bona ku mixalefeta nava xwe çareser bike meh û nîv îzîn xwast ku ew tev li xebata Hevkarîyê nebe, xebat bê wan dom bike.

Du tevgerên Tirk TKP-B û TKEP jî dixwazin gavekî zû hevkarîya nava tevgerên Kurd çêbe ew jî bikarên bi hevkarîyê ra bikevin nava xebatê.

1981.9.12

Îro salvegera derba 12 Îlon ê ye. Salike ku cunta faşîst ser gelê Kurd û Tirk çerxa êşkencê û lêdanê kar tîne. Lê grûbên ku mixalefetê dikin li ser miştêrekên sereke jî nikarin bên ba hev. Her hêz, ji asoyê xwe bêtir naxwaze derik din bibîne.

Li Ewrûpê û li Sûrî hevkarîya hêzên Kurd û Tirka rind şikil negirtîye jî wek sê grûp têne beş kirin.

- PSKT, TKEP, TKP-B, KUK, Ala Rizgarî
- TKP, TÎP, TÎSP, KÎP
- PKK, Dev Genç, Kurtuluş û grubên Maoî

Gruba yekem bi minasebeta protestokirina 12 ê Îlonê bi Kurdî, Tirkî û Erebî belavokek belav kir.

Nivîskarê Elman a bi nav û deng Goethe dibêje,"*kesê ku malê xwe wenda dike hindek, yê ku haysîyeta xwe wenda dike pir tişt wenda dike. Lê yê ku cesareta xwe wenda dike hemû tiştê xwe wenda dike.*" Dîmîtrov jî lewma dibêje, cesaret, cesaret, cesaret...

1981.10.6

Me salek bi bûyeran va dagirtî derbaz kir. Enver Sedat serokkomarê Misirê di merasîmekê de ji alî serleşkerîkî ve hate kuştin. General Husnî Mibarek li cîhê wî rûnişt. Şerê Iraq û Îranê berdewam e. Li Îranê pê hev serokkomar têne bijartin. Kî

tê kuştin, kî jî ji ber mellan baz dide. Serokkomarê Îranê, Benî Sadir bazda xwe avit Frensê, yê ku cîhê wî girt Recayî jî hate kuştin. Behiştî ku ket cîhê wî ew jî hat kuştin. Gelek mele, xocatullah, ayetullah û fermandarên rutbebilind her yek bi qomployekê hatin kuştin.

Kemal Burkay ji Kurdistana Rojhilat vegerîya. Li gorî agahdarîyên wî Partî Demoqrat Kurdîstan- Iraq, partîya ku Mesud û Îdrîs Barzanî jê ra serokatîyê dikin, tevî pastaran êrîş birine ser PDK- Îran (Partî Demoqrat Kurdistan- Îran), Kurdê Rojhilat. Şino, Makû û hin cîhên din ji destê PDK-Îran derketîye û ketîye destê dewleta Îranê.

PDK-I sedema şerê xwe vedana gora Mele Mistefa Barzanî nîşan dide. Ew ji ber gorvedanê Partî Demoqrat Kurdistan – Îranê gunehkar dibînin. Provaqasîyonên dijmin digîhîje armanca xwe. Gelê Kurd li himber kirinên KDP-I ne rehet e. Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê (PSKT) di derheqê êrîşa KDP-I bi zimanî Erebî, Kurdî û Tirkî belavok belav kir. Di belavokê de kirinên PDK-Iraqê bi îxanetê tê sucdar kirin.

Hêzên Kurdistana Başûr li himber hev şer dikin. Yekitî bi ÎKP, PSKI û PDK-I re di nava şer de ye. Roja 21 ê Îlonê birayê me Fikrî jî di nav de grûbek heval ji welat derbazî Sûrî bûn.

Mala me ya nû ya Şamê li Mesakîn Berzê ye.Taxa me nêzî taxa Kurdan e û herdu taxan jî pişta xwe dane çîyê. Lê ew çîya ne mîna çîyayê Kurdistanê bilind û asê ye. Li himber çîyayê me ew der gazik an jî girek e.

Rîya bajarekî piçûk ji wir ve derbaz dibe. Lê hin cîhê wî çîya di germa hawînê de ji bo rûniştewanên Şamê dibe cîhê seyrangehê. Li wir qafeterya û restorant hene û bajar di binê qontara çîyê de dirêj dibe tere. Di der û dora çîyê de depo û cîhên leşkerî hene û li wan deran ji alî leşker û polês ve 24 saetan nobet tê girtin.

Tenduristî û moralê min baş e, ez beza xwe ya sibê ber bi çîyê didomînim. Li wî bilindahîyê ji aso derketina rojê temaşekirin, manzareke gelek xweş e. Saet çarê sibê roj ji aso derdikeve, ew mîna dilekî di xwînê de lewîtî û perpitî li aziman daliqayî xuya dike. Li wir hewakî hunik bi nermî li sîngê merivan digere.

1981.11.09

Îro li Sûrî hilbijartina parlamenê heye. Partîya Qomunîst a Sûrî (PKS) vê cara ji ber ku di lîsta Baas de li gora daxwazîya xwe nekarîn cîh bigirin bi serê xwe dikevin hilbijartinê. Navê xwe hilbijartine, Baas dixwaze lîstê jî cîyê namzetên partîya qomunîst jî, xwe tesbît bike. Baas ji hevparê xwe yê kevn PKS aciz e. 138 merivên PKS girtin bin çavan. Gelek endamên wan jî xwe vêdişêrin.

Partîya Pêşverû Demoqratê Kurd li Sûrî jî hin berendam nîşan da. Lê wek dihate zanîn hemû (195 heb) parlamenter ji lîsta Baas derket.

Erebên Paşverû, dixwazin Sûrî xwe ji sengera pêşverûyan şûnda bikişîne. Partî Qomunîst têkilîyên xwe ji welatên Sosyalîst qut bike.

**Namêyên ji welat**

1981.11.14

Demike ez û Yaşar Alagunduz terin qursa dersê zimanê Erebî. Me xwe amade kir, ji mal derkevin, herin qursa zimanê erebî, hevalê ku ji derva hat zerfek qalind dirêjî min kir, ser zerfê dixwînim ji Upsalayê tê.

Du namc ji bavê min, yek jî ji Nazlîyê û Nevînê, sê name ji zerfê derdikevin. Cara pêşine ku ji jina xwe, Nazlîyê namekê digirim. Di namê de xûya dike ku wan rewş girtiye xwe, gazincan nakin.

Ew bi stîla xwe ya taybetî dibêje *"hevî dikim, bi vê zivistanê dawî li hesreta me bê (...)"*

Gotina, *"Li ser muzigê dîtina taxima bando ya şaredarîyê çî ye, dîtina leşkeran ya ser demoqrasîyê jî ew e"* girtîye.

Wê, generalên ku di derheqên "bê welat" an de demecan didin rexne kirîye. Dibêje li gundan qereqolên leşkerî hatine danîn, kesên ku divê herin di zevîya xwe de bi xebitin jî lazime ji qereqol destûr bistînin.

Xwîşka min, Mamoste Husnîye sirgûnî Qeyserî yê kirin e. Silavên keçên me Cîran, Bejna û Bermal jî nivîsîye.

Bavê min di nama xwe de bêçaretîya xwe tîne ziman. Drama malbatek ji 20 kesan pêk tê, lê bêkesîya xwe, tenê mayîna xwe tîne ziman. Namên wî min xemgîn dikin.

*Lawê min ê hêja;*

*Nama ku te bi rîya Sîdar û Goral şandî bû min girt. Çend rojan berê min rîya xwe bi Dîyarbekirê xist. Yavuz çûbû Mêrsînê, Nazli jî çûbû Bîngol (çolîg) ê. Ji wir derbazî Sîlwanê mala xinamî bûm. Ji Sîdar ra telefon kir, lê min nekarî rewşê jê ra şirovekim. Carek din zivirîm Dîyarbekirê, Nazli zivirî bû. Nama ku te ji edrêsa Abdullah ra şandî bû ket destê min.*

*Dibistan vebûn, Ş... ... di sinifê de maye. Herdu piçûkên din li Urfayê ne, terin dibistanê. Kekê te (Mistefa) heta nuha tu kesî (hêzên dewletê qest dike) ji min nepirsî. Tu û du piçûkên te (Zinar, Dîyar) ji min sual kirin.*

*Rewşa min li gor berê baş e. Lê nikarim kar bikim, çavên min pir xirab bûn, nabînim. Erazîya me bor radizê, xwest dewar bifiroşim, kes nagire.*

*Gotinek pêşîyan heye "eger mixtac jî dibî mixtacî dijmin be, nebî ku mixtacê dost bî".*

*(……)*

*Dîya te her roj tere ber dewar, kesî me tune, Fikrî jî ne li mal e. Welhasil rewşa me ji her alî ve pir xirab e. Ez her roj li Moxindîyê me (bona îmze dayînê tere qereqol). Bi hezkirinê silav dikim çavê te û çavê birayê te radimusim. Bavê we.*

*(Nama bê tarîx e, lê nama yekem e ku min ji bavê xwe girtîye.)*

**Ji brayên xwe Cengîz, Dîyar û Sidar ra name dinivîsim**

1981.11.15

*Brayê delal Cengo;*

*Min nama bavê xwe duhî girt, tiştên ku nivîsîne ez pir xemgîn kirim. Ew dê û bavên me bûn, wexta ku serê me biêşîya, xewa şevan li xwe dikirin hesret. Tilîyê me li kevir ketana çavê wan pêra derdiket. Ji bona rojên me yên hatî, baş be, bi gundîtî, dilpaqişî fidakarî dikirin. (…)*

*Dema wan a dawîyê ye, divê hûn wan tenê nehêlin. Eger mimkune yek ji wa here gund li ba wan bimîn e. Çima em nikarin dev ji hin berjewendîyên xwe berdin û ji wan ra alîkar bin?*

*Divê meriv bê wefa û bê berpirsîyarî nebe. Îro dora me ye ku em li dê û bavê xwe xwedî derkevin. (…)*

*Xasima ewladekî mîna te, xwedî şexsîyetek bê leke, bi hin xwestekên piçûk nikare xwe ji wê berpirsîyarîyê dûr bigire.*

*Lê vê yeka jî dizanim, eger ku tu herî gûnd, divê girtin û êşkence, gelek rîsk jî bigirî çavê xwe....*

*Lê dîsa jî lazim e tu herî. Wan kokiman zivistanî tenê nehêlî. Wexta ku ew bimirin qet nebe tu dikarî ji wan re gorekê vedî. (…)*

*Kekê te*

*Brayê Dîyar;*

*(.....)*

*Tu gerek karê ber lingan ji xwe ra nekî karê esasî. Gelek wext te ew tişt kir û çiqasî ji te ra fêde û zerara xwe bû, tu ji min baştir dizanî. Eger tu mîna berê dom bikî, karên girîng wê şûnda bimînin. Hin kar hene herkes dikare bike, hin kar jî hene hindik kes dikarin bikin. Eger mirov ji wan hindik kesan be, divê ew wî karî bike.*

*Tu ji girtîgehê hatî berdan lê çavê wan li ser te ye. Ez bawer nakim ku tu bikarî dibîstanê-zanîngehê biqedînî. Ji xwe dîya me roja ku tu ketî zanîngehê got: "baver nakim Dîyar bibe doxtor. Samê çi bela bê serê wî."*

*(......)*

*Tu ji bo zarokê min xem nexwe. Di cîhê wan de hûn ji dê û bavên me ra alîkarbin, wê baştir be. Eger hûn wan li gûnd tenê bihêlin, mana we çibe jî di dilê min de hêrifandinek mezin pêk bînin.*

*Nameyên te bila mîna reçetên dermanan ne kin bin. Dilê we piçûk ne be. Bo ku di rojên hatî de mirov bikare serê xwe bilind bigire, li himber dost û dijmin stuxar nebe, divê di rojên teng da, di rojên usa de berxwe bide. Bûha wê gran be jî divê mirov vê yekê bêcer bike. Slav. Brayê te*

1981.11.16

Par di vê roja de min cîh û warê xwe terikandî bû. Ji wê rojê vir de bi rîya name û masmedya cîhanê çê, xirab; pir an jî hindik hin agahîyên welat digîhişin me. Generalên faşîst jî nikarin Tirkîyeyê îdare bikin. Ew ne dikarin pêşîyê li enflasyon û buhabûnê bigirin, ne jî dikarin gavên demoqratîk bavêjin. Her roj bûhabûn zêde dibe, perê Tirkan jî bê qîmet di be. Wek Îtalya ya Musolînî, memur bi çentan terin maaşên xwe digirin. Xwedîyê malan ji bo kirê bi çewalan terin ber derê kirêcîhê xwe.

Cunta faşîst piştî hatina xwe ya ser hukim propaxande dikir ku ew *"şerê birakûjîyê rawestîne!"* derewek hişkûkol e. Îro li Tirkîyê û Kurdistanê rojê çend kes bi destê leşker û polês tê kuştin. Hemû gelê Tirkîyê di hedefa guleyên faşîzmê de ye.

* * *

Wezîrê Parastinê yê Amerîkaya Yekbûyî Casper Weînberg hat Tirkîyê. Casper bi cunta faşîst ra peymana du alî, ya ku bi navê SÎA tê zanîn xurttir kir. Li ser gelek xebatên leşkerî jî li hev kirin. Di derecek bilind de bi navê *"gruba parastina bilokek miştêrek a leşkerî"* ava bibe, biryar hate girtin. Sîstema Amerîka ya casusîyê ku bi navê Awacs tê zanîn li Tirkîyê tê cîh kirin. Ordîya Tirkan a beşa 2em dikişînin Meletyê. Ji Amerîka û welatên endamê Nato jî hin hêzên din yên leşkerî bînin û li Meletyê cî bikin. Wekî li himber Sowyet balans çê dikin. Hêzên lez li Tirkîyê cîh dikin. Eger ku di herêmê de ji welatekî ra midexale pêwîst be, heya hêzên Amerikî xwe bigîhîjinê, divê Tirkîye bi navê *"parastinê"* midexale wî welatî bike.

Di senatoyê de butca Amerikê bi 85 dengan hat erê kirin, tenê 5 deng li himber derketin. Butca ABD ê ya leşkerî ji bo sala 1982 an, 209 mîlyar dolar hate nîşandan. Butca Tirkîyê ya sala 1982 an 185 mîlyar dolar e. Butca Tirkîyê ya salane bi qasî butca Amerîqa yê ya leşkerî jî nîne.

Amerîka yê îsal ji bona Tirkîyê 704 mîlyon dolar alîkarî pêşniyar kir. Tirkîya di hêla alîkarîyê de piştî Îsraîl û Misirê di cîhê 3 em de cîh digire.

**Ozan Enver Gökçe mir**

1981.11.21

Ozan Enver Gökçe mir. Lê ji ber ku faşîzmê gel bi zora tifêngê bê deng kirîye û girseyê gelê pêşverû, bi faşîzmê re mijûl e, zêde nekarî li ser mirina Ozanê dilpola raweste.

Gökçe ji Erzinganê ye. Ew di dewra M. Kemal û Înonû de pir caran bûyê mixatabê zordestî û êşkencan. Wek gelek ronakbîr û pêşverûyên din hepis û sirgûnî jîya ye. Lêwma dibêje "azadî di gîrtîgehan de ma." Lê wan kirinên hovane jî nekarî, Ozanê mezin ji doza xwe wegerîne. Ew bû şahadê zilma 12 Adarê. Li ser şoreşgerên 12 adarê jî şêîr nivîsin.

Ez parçek ji şêîrê wî ji Tirkî werdigerinim Kurmancî.

**Kesên dilcewahîr**

*"Dema ku me ji ala zulmê re kûfir dikir.*
*Ferat diherikîya, Minzûr dinalîya.*
*Parçên cegera min û Dilcewahîr*[62] *hîn sax bûn.*
*Û li çîyayê Meletîyê û newala Gebanê de min tevî pezkuvîyan baz da.*
*Bûm xwarina gur û têyran. Ez netewa gel bûm.*
*Ji nû ve hatim dinê, yanê. Nuha ez bûm sitirêyê kelenga ronî, mor bi jar.*
*Ez di gewrîyan da, (bûm e sitirî yê kelengê) û qilçixê maran,*
*Dizivirim û dizivirim.*
*A nuha li ser hestîyê sîng wek baz û şahîn.*
*(...)*
*Tu wextekê, nebêje, ve nake, nikare veke,*
*Va kûlîlîka hinar ê, wê veke.*
*Helbet di caddên me de jî wê cejn bibin,*
*Namlîyên faşîst di ser serê gel de rabin jî.*
*Dawîyê da, yên ku yek û yek tên şikandin destên namerdan in."*
E. Gökçe

Gökçe ji şaîrê Şîlî yê Pablo Neruda jî hin şîêr wergerandîye zimanê Tirkî. Gokçe, di nava feqîrtî û bêkesî yê de mir. 1978 an de hevalekî li wê herêmê mûtahîdî dikir. Li Kemahê ew rastî Enwer Gökçe hatîbû, digot *"ew gelek feqîr û bê xwedî bû."*

---

[62]Di vir da Husên Cewahir hatîye nav kirin. Husên tewî Mahîr Çayan li Îstenbolê 1 Heziran 1971 an da malekê da dor lê hat girtin hat kuştin. Mahîr Çayan jî birîndar hat girtin.

1981.11.29

Roj yekşemî, saet nêzî 12.00 an e, derva germ e.

Li welatên Ewrûpê û li Tirkîyê yekşemî roja betlane ye. Lê li vir roja xebatê ye, daîre vekirîne, tenê fileh naxebitin.

Serokê PPDKS Hemîd Dewrêş li Şamê mala me ye. Heval bi hevre di sohbetê de ne. Nişke va dengê teqînê hat. Teqînek xurt, camên pençêrên mala me hêjand. Li ser bûyerê şirove cûr be cûr in. Giranî li ser *"Brayên Bisulman"* tê rawestin. Ber bi êvarê em çûn cîhê ku teqîn lê çêbûye, me bi çavê xwe dît.

Erebek, dînamît lê barkirî li paş Banqa merkezî li ber bînayek leşkerî hatîye teqandin. Çar apartimanên nêzik, ji cephê pêşî ve ji jor bigir heya jêr hemû hêrifîye. Merivên sivîl gelek zerar dîne. 150 mirî û bi sedan birîndar hene. Bûyer *"Hereketa Ji Hêzên Bîyanî Azadkirina Lubnan ê"* girt ser xwe.

1981.12.25

Ji welat hin kesên nû hatin. Ji rewşa wan derdixinim ku ew hin tiştan ji min vêdişêrin. Kê dipirsim hin bersivên revok didin.

Dora roja din eşkere kirin ku xwîşka min Husnîye û brayê min Dîyar 30 roje hatine girtin û di êşkencê de ne. Hevalan ne xwestine ji min ra bêjin û ez pê biêşim. Lê di rewşek ûsa de meriv dikare çiqasî tehammul bike, min jî ewqas tehammul kir.

Lê cara pêşin ku Dîyar hatîbû girtin, bavê me hatîbû Dîyarbekir û çû bû girtîgehê ew dîtî bû. Dora roja din jî bavê me qirîza dil derbazkirî bû. Dîyar çend mehan berê ji girtîgehê derketîbû lê ew nuha dîsa hatîye girtin.

Rewşa dîya min û bavê min hat ber çavê min. Çar lawên xwe firarin li derva ne, yek keç û lavekî xwe jî di hepsê de ne.

Min wê gavê got; *"Bavo, te lewma dîyax nekir, qirîza dil derbaz kir?"* Lê rewş her çiqasî dijwar be jî divê em berxwe bidin.

Ez carek din bîr tînim ku kesên girtî, kesên wendayî ne, divê em piştre li wan vegerin.

* * *

Îsraîlê Girên Golanê, yên ku di şerê 1968 an de ji Sûrî girtîye fermî girt nava sînorê xwe.

Li Beyrûtê di balyozxana Iraqê de teqîn çêbû, 25 kesan jîyana xwe ji dest dan. Li Tirkîyê dewa TOB-DER ê de biryar hat dayîn. Gelek kes bi ceza zîndanê hat ceza kirin. Hin berpirsîyarên komelê 9 sal ceza girtin.

KÎP jî hate nava xebata Hevkarîyê. Lê ji bona çareserkirina hin pirsên xwe yê hûndirîn meh û nîv wext xwestin.

1981.12.31

Ji ber xwîşk û birayê xwe û hevrêyên girtî em bi bîntengî ketin sala 1982 a. Me sersal di mal de bi galegalê derbaz kir.

Meriv kêmasîyên partîyê roj derbaz dibe zêtir dibîne. Mirovên xort di malê de mîna girtîyan in. Çi bikin, wê heta kingê li van dera bin, ne eşkere ye? Ji bona perverda leşkerî, polîtîk, ekonomîk û ziman divê hin projên partîyê hebin. Ji bo kesên ku nikarin vegerin welat divê planek hebe. Jin û zarokên wan çi bibin, çawa bikin? Qadroyên ku li welat di binê metirsîyê dane çawa bêne parastin? Zar û jinên girtîyan ra çawa dikarin alîkar bin?

Lê carek din ferq dikim ku bi mirîyan ra nayê mirin û ji bona mirine jî hîn zû ye.

1982.01.05

Sibê de Duzgun Kaya, ji kesî ra tiştek negotîye, ji malê derketîye çûye. Me taştê xwar, saet derbaz dibin ew xuya nake.

Hevalên berpirsîyar ketin fikaran. Me got gelo ew çû xwe teslîmê balyozxana Tirkan kir? An jî polêsê Sûrî ew girt. Piştî nîvro saet dudo yan de ew derket hat mal. Hevalê berprsîyar jê pirsî, ku ew heya nuha li kîderê bûye.

Duzgun; *"Wexta ku hun terin ji min ra dibêjin, ku hun terin kîderê, ez jî nabêjêm. Têkilîyên xwe bi partîyê re dicemidînim."* got û bi lez ji malê derket çû. Ez pê derketim û heya cîhê otobosê çûm. Li wir pê re peyîvîyam. Min xwest wî qane bikim, vegerînim mal. Lê ew ji kira xwe daneket.

Got,*"ez terim qampa Cepha Demoqratîk, piştre jî bi eqrebên xwe yên li Fransê re têkilî deynim û bi rîya wan dixwazim herim Fransê."*

Bi bezê xwe gîhand otobusa ku birêketî bû û çû. Ez tenê vegerîyam mal. Moralê hevalan ne baş e. Ji ber ku cara yekem bû ku ji mala partîyê hevalek vediqetîya. Berpirsîyarên partîyê nedixwest yek heval ji mala partîyê here û li xerîbîyê pêrîşan be. Em du heval cardin pê wî çûn çarşîyê, ji bo wî qane bikin û bînin mal. Lê me ew li tu deran nedît.

Di veqetandina wî de kêmasîyê hevalên berpirsîyar tune bû. Çûyîna Duzgun ji malê bi plan bû, wî dixwest gavekê zû here Ewrûpê. Em dû ra pê hesîyan ku ew zûda nava vê hazirîyê de bûye. Berî ku ji mal here, ji eqrebê xwe yên li Fransê ra name nivîsîye. Di namê de tiştê ne rast û mezinkirî nivîsîne. Kesê ku nama wî dixwîne pir berdikeve û nama wî digîhijîne merkeza partîyê.

Êvarê saet di 20.30 de sekretêr ê TKEP (Partîya komunîst a Ked a Tirkîyê) Teslîm Tore û pîreka xwe hatin mala me. Wan ragîhand ku Duzgun li mala wan e. Dora roja din bi daxwazî ya hevalan ez dîsa çûm, bi Duzgun ra peyîvîyam ew vegere mal. Lê wî dîsa ew pêşniyara min red kir, li wê malê ma. Ji xwe qonsolosa Fransiz re

qontax danî bû û îhtimalek mezin, ew biçûna Fransê. Wê roja ku bê agahî ji malê derketîye ew çûye konsolosa Fransiz.

Duzgun di wextek kin de xwe ji hevalan dûrxist. Hîn çend mehên wî çênebibû ew kete bîntengîyê. Roja ku ji welat derketî bû derva, çûyîna Fransê ji xwe ra kiribû armanc. Partîyê jî ew daxwaza wî pejirand, ji bo plankirinê dixebitîya. Ji ber ku gelek pirs û karên din jî hebûn. Tenê li ser pirsa wî rawestin ne rast bû. Lê wî sebir nekir çû.

Em hevalên ku li Şamê bûn di nava xwe de civîyan. Hemû hevalan di çûyîna Duzgun de ew xwedî kêmasî û zaaf dît. Lê ji bona nazikî ya rewşê jî, hemû havalan dane xûyakirin ku, heval li himber hev zêdetir bi tolerans û alîkar bin. Lê ew îşeret bû, ku va jîyana nava çar diwaran nikare mirovan demik dirêj bextiyar bike. Partî heke hedefekê nede ber endamên xwe encam wê ne baş be. Di sal û rojên hatî de gelek endam çûn tu kesî jî xem nexwar. Berpirsîyaran êdî ew girtîbûn xwe.

1982.01.07

Ji ber roja dayîkbûna Pêxamber Mihemmed çarşî girtîye. Sibê saet 05 an de hevalê Faruq Aras tere Elmanya yê. Divê çend name binivîsim, bona ku ew li Elmanya yê bide poste, bişîne Tirkîyê.

Duh ji Dîyar name hat, ew ji girtîgehê hatîye berdan, lê Husnîye hîn girtî ye.

*Ji kekên Minên Ezîz ra*

*Em çiqasî ji hev dûr bin jî dilen me ji bona yek armancîkê lê dide.*

*Kekê nama te ya dawîyê me girt û em pir pê şa bûn. (...) Û ji bona ku em xemgîn bin, ewqas zêde sedem hene ku em jî nizanin çi bikin?*

*Aghdarîyek nû bidim we, dawîyê li Urfayê xelekek bizdîya, çend kes hatin girtin, wan jî navê me de ne. Li Urfayê avitin ser mala me ez û xwîşka me Husnîye girtin birin. Ez nû hatim berdan, xwîşka me hîn di bin zilma wan de ye. Li piçûkê me jî diğerin. (Cengîzê bira- nav nenivisîye)*

*Me berê xwe wenda kirîye, alîkîve xwendevanî, ji alî din ve rewşa zarokan, rewşa gund û girtina me ya bin çavan me pir nerehet dike.*

*Bo ku kare zivistanê ra alîkar be min ji Cengoyê bira ra rapor girt ew şand gund, a va tengasîya derket. Va rewşa (lê gerandina) wî me pir nerehet dike, ji ber wî, me jî her wext dikarin bibin. Herwext em dikarin bên girtin, pir ne rehet terim zanîngehê û têm. Hela va bûyera Urfayê. Ew êşkencên ku bi hezeran kes tede derbaz bû, seqet bû, sere xwe xwar me jî derbazkir. Dikarîya encamên pir xirab jî bidana. Cengîz bê girtin, êşkence bibine dikare depresyon derbaz ke. Ji ber wê em dikarin çi bikin lez bersiv bidin.*

*Lê rewşa min jî ji ya wî cudatir ni ne. Qet nebe di derheqê vê yekê de rê nîşanî me din, em hin caran di nava pirsan de dimînin. Ji bona rewşa vê dere bi rîya Fîkret min*

*hin tişt gîhandîbûn we, lê min hîn jî bersivên wan negirtine. Yanê dixwazim bejim ku eger ku rewşa wêderê jî wek rewşa girtîgehekê ye, em qet denge xwe dernexinin, zîndanê bigirin çavê xwe û vira neterikînin. Eger ne usaye birayê piçûk jî derbazî wir bikin. Û ez tene li vir bimînim, ji xwe wek ewladekî gel a ku her cure zilmê ra berxwe dide, ji polîtîka rojekê di girtîgehê de rojekê derva re erê bêjim. Û hindik be jî kar rêva bibim. Di wî warê de agahîyên fireh bidin me.*

*Keke di nama xwe de te piçikê ji me ra sitem kirîye. Belkê tu bi heqî, lê şertên heyî rastî jî me ji belakê, ber balake din dikişine. Tiştên ku li gund dibin bila bîna te teng neke, bavê me ji ber nesaxîya xwe, xasima ji ber dûrketina we pir hîssî bûye. Wekî din em eleqeder dibin. Ez du caran çûm gund, lê bo ku pir gur (eskerê romê) hebû, ji Xarpitê vegerîm.*

*Meriv dikare beje bavê me, hemû pezê hur firot. Hemû çilo kişandîye gund. Êzingê pêvîst be, me temam kir, sîyax kir.*

*Wek biyolojik li gorî hêza xwe ji bona çareserkirina hemû pirsgirêkan hewl didim. "Bi yek can û yek serîkî" me. Bawerdikim hun jî hin kêmasîyan divê normal bibinin. Terkkirina min ya vira û çûyîna min a gund tê mana tene bi sere xwe bi pirsgirêkan ve hiştina jinbiran e. Ew ne mimkun e û bawer mekin ku ez bona pirsgirêkên xwe yên şexsî li vir dimînim. Lê eger ku bi israr dixwazî, ez herim binivîs hema herim. (...)*

*Helbet ez her cure pirsgirêkên jinbiran parve dikim û hewl didim wan çareser bikim. Ew hissek pir xurte ku ji hezkirina biratîyê tê, ji bona min ew karekî pîroz e jî. Divê hun jî usa bizanin û hun bê qisawat bin, ji bona wan çi fêdekarîyê pêvîst be ez ê bikim.*

*Min bavê xwe bir ba profesore dil, miyane kir, rewşa xwe her roj baştir dibe, mereq mekin. Herdu jinbirayê min jî başin, ji we, bona kêm hatina namên we gazinan dikin. Dersen Şero ne başin, wî dişinim qursê jî dîsa jî ne baş e. Bona koleje ra amade be, Bejdilê jî dişinim qursê.*

*Lakîn Kekê Mezin (Mistefa) hin caran bi mana agahdarîyê name binivîse wê baş bibe, him jî zarok teselî dibin.*

*Kekê pirsek din, bê şik hun jî difikirin, di wextek dirêj de hunê çi bikin? Ji bona birina jinên xwe xebatek we heye? Bawer dikim, amadekarîyekê bikin wê pir baş bibe.*

*Min rîya xwe bi Parêzer xist. Wekaletname jî derxist da yê, lê parêzer F. Gumuş lîf dide got wê ew teqîp neke.*

*Em karê kooperatîfê didomînin.*

*Kekê di wextek kin de tu bersiva vê nama min bidî wê pir baş bibe.*

*Dawîyê de slav dikim destên te radimusim, Kekê Mistefa ra rêz, Fîkret maç dikim.*

*Kekê Sîdar ji te û jin bira xwe ra rêzên xwe dişinim. Wê nama hema ji Kekê me ra bişîn, ji we hemûyan ra hatîye nivîsîn. Malbata Mendiz (Alaettin) İnce wî mereq dikin.*

*Têbinî; Kekê Sîdar tu paşnavê xwe jî biguharî, an bi edrêsek nû bişînê wê pir baş bibe. Slav û rêz. Brayê we zuvay = (Yavuz)*

Li Cengîzê bira jî tê gerandin. Min ji Nazliyê re namek nivîsî, gotinên ku bêjim gelekin. Lê rewş dest nade. Divê naverok zerarê nede xwedî namê. Ji ber ku hemû name têne qontrol kirin. Bêjeyên di cîh de bijartin û karanin hostatîyê dixwaze. Tu dibêjî bi tonan granî serê pênûsa min ve hatîyê girêdan û ew nayê livandin.

Cehd dikim hin tiştan bi şikleki çivdayî binim ziman. Lê hevoka,"*... onura xwe mîna kulmekî şidyayî pêt û bilind bigirin.*" Bû naveroka namê.

Di nava ewqas tiştên ku li Tirkîyê diqewime çiqasî meriv bikare xwe ji tesirê wan dûr bigire. Saet yekê şevê ye, em radizên. Saet di 05 an de hemû heval li ser pîyan in. Tu dibêjî hela hevaleki xisûsî ew şîyar kirine. Hemûyan nameyên ku nivîsîne, dane Faruq. Piştî ku me hevalê Farûq rêwî kir, em hemû raketin.

Derva hevaki xweş heye, mîna hewayê biharê ye.

Bona ku Îsraîl Girên Golan îlhaq kir li Sûrîyê hemberî Îsraîlê xwepêşandin û protesto hene. Serokkomarê Sûrî, Hafiz Esed ji bona piştgirîyê derket gera welatên Ereb.

1982.01.11

Dewleta Tirk li ser sînorê Sûrî qontrola xwe zêde kir. Hêzên Kurdistanî xebata hevkarîyê didomînin. Hin caran xebat bêne rawestin jî dîsa dom dike.

Alîgireki ŞD (KÎP) ê li Qulpê bi navê Remezan Çankaya, dilxwazeki PSKT ê kuştîye. Xwendevanekî ji kovara Dengê Komkar ra ser vê bûyerê namek şandîye, name di kovarê de hatîye weşandin.

ŞD ew nama ku di kovara Dengê Komkar de derketîye li himberî xebata hevkarîyê kir asteng û mehane beşdarî xebata hevkarîyê nabe.

PSKT ji bo kuştina dilxwazê xwe ŞDê rexne dike, lê li himber xebata hevkarîyê nake asteng. ŞD tinazên xwe dike, ango ew him sucdar, him jî zorker e. Lê ew çiqasî wê namê ji xwe ra bikin sedem jî, sedema bingehîn mixalefeta nava partîyê ye, polîtîk e. Ew bi vê namê dixwazin rê li ser problemê hindurîn biguherîn. ŞD ser navê gelê Kurd gotinên mezin dike, lê ji bo bi hev ra xebatê ra sedemên ûsa yên erzan jî nîşan dide. Ma gelo dîrok wan xeletîyan dê nenivîse?

Hikûmata cunta faşîst li gorî agahîyên- raporên berpirsîyarên leşkerî ya bajaran cîyê mamostan diguharine. Li Tirkîyê sirgunkirina mamosteyan ber dewam e. 36 hezar mamoste ji ber raman û dîtinên xwe yê pêşverû û welatparêz hatin sûrgûn kirin. 40 hezar mamostên din jî tayînê dixwazin, tayîna wan dernakeve.

Bajarê Sêrtê ku di nava daristanê daye tonê êzing ji 4 hezar û pêncsed lîrayê derketîye 7 hezar û dusedûpêncê lîrayê Tirkan.

1982.01.15

Hewa gelek sar e, zivistan a Şamê xwe dide hîskirinê ku ew êdî hatîye. Civîna xebata Hevkarîyê ya çaralî li mala me çê bû. Civîn wek prensîp her car li mala grubekê çê dibe.

Êvarê li Sîteya kûltûra Sovyet me fîlmek sêrkir.

Pirtûka "Notên Ji Sêdar ê" dixwînim. Pirtûk ji alî Julîus Fucîk ve hatîye nivîsin. Fucîk bi xwe rojnamevan e, lê rexnevanekî lîteraturê û xebatkarekî aktîf a polîtîkayê ye. Ew di şerê cîhanê ya duyem de ji alî Nazî yan ve dîl tê girtin. 8 ê Îlonê 1943 an de li Berlînê tê darve kirin.

Wexta ku di kampê nazîyan de girtî bû notên xwe bi rîya gardîyanekî ve derdixine derva. Pirtûk ji wan notan hatîye amadekirin. Zabitên SS yan dibêjin *"tû dibînî ku em hemû tiştî dizanin. Bipeyîve! Hîşê xwe topî serê xwe bike."*

Fucîk jî dibêje,*"li gorî ferhenga wan bi hîşî bûyîn îxanet e. Ez ê tu caran wê, bi hîş nebim. (...) em ji bo hêvîya bextewarîyekê jîyan, di vê rîya de me şer kir û em di vê rîya de têne kuştin. Tu caran bila keder bi navê me ra neyê ziman. Lîstika min jî ber bi dawîyê tê. Dawîya lîstika xwe nikarim binivîsim, ji ber ku çawa bibe ez nizanim. Va êdî ne lîstik e, jîyana rastî, bi xwe ye. Di jîyana rastî de temaşevan tune, hemû kes di nava jîyanê de ye. Perda sahnê vebû. Dostên min, min hûn hemû hezkirin. Nobetê teslîm dikim."*

Ji ber ku jîyana Fucîk û welatparêzên Kurd dişibandin hev. Ser daxwaza min di sala 1975 an de li Dêrsimê bi navê Rabîya El xwendevanekî lîsê, ya sinifa dawîn pirtûka Fucîk *"Notên Ji Sêdarê"* xwendî bû û çîroka wê ji ji hevalên sinifê re behs kiribû.

1982.02.28

Piştî şevek bi ba û bahoz baranê lêkir.Li gorî agahîyek nû Husnîye ji girtîgehê derketîye. Xebata Hevkarîyê gran dimeşe. PKK, Dev- Genç, TEP û TVP di nava xwe de bi navê "Dîreniş Cephesi","Enîya Berxwedanê" blokek anîn holê. Dîyare ku hêz li rîya çareserîyê digerin.

Di Enstitûya Perwerdê a Dîyarbekirê de di navbera alîgirên ŞD û Rîya Azadî de şer derketiye. Ji herdu alîyan dora 150 mirov hatiye girtin, hindik jî xwe vêdişêrin. Ew yeka li serê çîyan pevçûna pezkuvîyan tîne bîra min. Şêr, piling û keftar xwe di nava gîyayê de telizandine, nêrîyên pezkuvî ji metirsîyê bê xeber bi îspatkirina mêranî û serokatîya xwe bi hev ra şer dikin. Herdu alî jî dibin xwarina keftaran.

* * *

Partî, nikare ji hin tiştan ra midaxale bike. Gelek tişt bi serê xwe dimeşê. Ew kesên ku qedera xwe bi vê partîyê ve girê dane wê hesawê hin tiştan jî bipirsin.

Ew bingehê ku kar dide kesan wê hesaw jî bipirse. Eger ku qadroyên ku lê tên gerandin, tu wek berpirsîyar lê xwedî dernekevî, eger dengê xwe negîhîjînî kesên girtî, qadroyên ku di mala partîyê de ne, nekarî perverde bikî, di rojên pêş me de ew nikarin barê partîyê bigirin ser milê xwe.

Kesên ku welat terikandine hatine, kêmasî li dijî faşîzmê ne. Hin tiştên maddî, wek mala xwe, zar û jina xwe, eger hebîye karê xwe, îlla jî welatê xwe berdane û hatine.

Lê meriv nikare bêje hemû qadro bê qisûrin û xisûsîyeta çîna xwe ji ser xwe avitine. Ji ber wê jî, wê hin kêmasîyên xwe hebin. Partî, berpirsîyarên partîyê, kêmasîyên wan bibîne û ji wan ra alîkar be.

Laşê partîyê bûye kûlav, li himber bûyeran ne hesas e. Di nava kadroyên partîyê de dubendî xwe nîşan dide

Di bingehê partîyê de hin kes ji ber valabûn û nezanîya xwe, bi şexsîyeta hin kesan henek dikin, ji xwe re wext derbaz dikin. Partî lazim e, qadroyên xwe bigire binê dîsîplînê, wan bike binê berpirsîyarîyêkê û şikilekî bide wan. Bingeh ne li gorî berpirsîyarê partîyê, divê li gorî dîtin û ramanên partîyê form bigire. Li himber kêmasîyan meriv rawestê, pêşniyar û şaşitîyan vekirî bîne ziman.

Tu kes partîyê di binê tekela xwe de nebîne. Tu kes cîh û postê xwe nikare di nava partîyê de bi kar bîne û partîyê wek malê xwe bibîne. Xasima hevalên berpirsîyar li himberî endaman divê, zêtir, hesas û nazik bin.

15 hevalên me ji 15 Sibatê vir de li Beyrudê, li qampa Cepha Demoqratîk in. Em dixwazin herin Beyrutê havalên qampê bibînin. Bi vê sedemê 29ê Adarê ez, Bedirxan û birayê min Fîkrî birê ketin. Fîkrî rêwîyê Swêd e, bo ku ji Beyrutê derketin hêsantir e, ew ji wir tere.

**Li Beyrutê**

Bajarê Heleb, Şam û Beyrûdê di stran û çanda Kurdî de xwedî cîhekî ber bi çav e. *"Ez herim ji Helebê û Beyrutê, ji tera doxtorekî bînim."*

Ewîndar pir caran tere ji Beyrudê doxtor tîne ser hezkirîyê xwe yê birîndar. An jî ji Helebê dîyarîkî tîne, dide hezkirîyê xwe. Lê hin caran jî ji ber zilma dewleta zorker, Kurd heta Beyrudê jî hatine, li wê derê star bûne. Îro jî li Lubnanê dora 250 hezar Kurd dijî. Ji ber dîmenên xwezayî ya Beyrudê meriv serxwaş dibe.

Bajar ji sedan metre bilindahîyan dest pê dike, hêdî hêdî ber bi behrê dadikeve. Darê çamê, mazî, akasya û bexçê meyve sîng û berwarên hemû giran xemilandin e. Sekuyên meyve û bostanan, bax û bexçê ku îşareta keda mirovan in, ji alî çep û rastê bi seranserê rê, ji te ra havaltîyê dike. Vîlla yên ku li serê çîya û gran, di nava daristanan de hatine çêkirin dilê mirov dibijîne.

Rîya ku tere navrasta bajar li ser girekî dibe du beş. Rêya rastê tere mintiqa ku di binê qontrola Keteîban de ye.

Ya milê çepê jî tere mintiqa ku di binê qontrola hêzên pêşverû de ye. Şofêrê me jî rîya alî çepê girt. Rê ser bi jêr û çivan dide xwe ber bi Behra Sipî de dikeve. Li vir Behra Sipî, zêde sipîtir e. Rêyek li ber min rast dibe û min nişkeva dibe Îskenderûnê, Dîyarbekir û Dêrsimê.

Min di serê xwe de ji gelek heval û dostan re têkilî danî. Lê şofêr hatîbû dawîya rîya xwe, rêwî êdî peya dibûn.

Beyrut di nava guruban de hatîye parve kirin. Her grubekî hin cîh kirine bine qontrola xwe. Bi şaşitî tu ji *"sînor"* derbaz bî, bedilê xwe pir caran mirine.

Li qiraxê behra sipî avahîyên 10-15 qat bilind hene û ji wan gelek vala ne. Di pencire û diwarên wan de qula gulan û roketan hene. Avahî bi seranser di nava dûyê barût û şewatê de lewitî ne. Li ber derî û şaneşînan de torbên qûmê dane ser hev û leşkerê Sûrî di paşde nobet digire. Êvarê tu zu xwe nevê malê, wê çi bê serê te kes nizane. Di nava dengê roket û çekên otomatîk de dîsa jî jîyan berdewam e.

Taxa Fakhanî ku Tîrmeha 1981 de bibû hedefa êrîşa Îsraîl, hîn jî şopa derbên şer dikişîne. Qomutanekî filistînî bi navê Bavê Fadî em birin Namê qampa ku hevalê me lê ne. Cîhê qampê nêzikî bajarê Sur, di gelîyekî kûr de ye. Alîyekî gelî daristanek bê ser û bê ber e. Mîna çangil e, ne mimkune ku meriv bikeve nav û bikare jê derkeve. Em hin heval piçekê digerin lê cesaret nakin herin pêş, vedigerin. Wekî din jî xeter e. Ji ber ku gelek grubên bîyanî tevî Filistînîyan li van doran dimînin. Êrîşa Îsraîl jî tim û tim di rojevê de ye.

Heval di nava xofa êrîşa Îsraîl de ne.

Lê alîyê dinê gelî ne ûsa ye. Zevî, bexçê zeytûnê, pirtiqal, hinar, turinc û lîmonê hene. Ji ber ku li jorî ser gir gundekî Cûhî yan heye. Wan ji bo çandinîyê ci vekirîye.

Êvarî me bi hevalan ra di çadirê de civîn çêkir.

Brayê min Fîkrî jî li derva bi sîleh nobet girt. Civînê dest pê kir nekir ji derva dengê Fîkrî û piştre jî giminîya tifingê hat. Me hemûyan baz da der. Me dî ku havalê Nedîm, aşpez, li kanîyê fereq şûştine, lezkirîye xwe bigîhijîne civînê. Hevalê ku nobedare jî nizane ew li kanîyê ye , dibêje va meriva dixwaze zerarê bide me. Bang kirîye ku, ew bisekine, hevalê Nedîm jî,ji bona civînê lez dike nesikinîye û nobedar gule berdayê.

Bi hîsek psîkolojîk heval li benda êrîşek Îsraîlî bûn. Di civînê de jî ew yeka pir kesan anî ziman.

8 ê Avrîlê em ji qampê vegerîyan Beyrudê. Me ji malekê ji Swêd ra telefon kir. Xwedîyê malê di postê de dixebite. 100 lîrayê Lubnanî me da jina malê, wê jî xeber da mêrê xwe ê. Li wir telefona me girêdan û em bi Swêdê Sîdar ra peyîvîn. Bi vî awayî tu ji kîderê ra û çiqasî bixwazî dikarî bipeyîvî. Ew pere diket bêrîka malê.

Li gorî agahdarîya Sîdar di zîndana Dîyarbekirê de nav ne eşkere bûn, lê gelek kes hatibû kuştin.

Fîkrî di 9ê mehê de bilêta xwe hebû ku here Swêd, lê wê rojê polîs nehişt ew sîyar be. Roja 12 Avrîlê li balafirgeha Beyrûdê wî carek din çûyîn ceriband. Lê vê cara jî polês dest da ser nasnama û kopîya dîploma wî. Fîkrî negotî, *"wî sakuyê xwe de eşkîyan, lê xwe xilas kir."* û çû.

Nama ku Fîkrî ji min ra şandîye Şamê.

*18 Avrîl 1982*

*Kekê minê birêz,*

*Ji we veqetîyam şunve heya balafirgehê bê problem hatim. Wî merivê ba min dixwast gavikê zû kare min xilas bike. Heval pasaport û bilêta min ji min girt û çû ku vîzê bigire, du polêsan xwe nêzikî min kirin û pirsin ez kî me? Wexta ku min got ez ji Tirkîyê me, pasaporta min xwestin min got heval biriye, ez banêkim bila bîne gotin na û ji wêderê dûrketin.*

*Heval vegerî min jêra got, wî jî go ne muhîm e. Kare min qedîya bû, derbazî salona transîtê dibûm, ji wan polêsan yeke dû min bang kir, tiştên ku min di telefonê de ji tera gotin qewimî. Nasnama min û kopya diploma min li qereqola polêsan ma. Derengî çûm, hemû rêwîyan cîhê xwe girtîbûn, balafir derengî rabû, ew li benda min mabû. Normal hatim cîhê xwe.*

*Ji xwe heval eleqeder bûne, Sîdar îddîanama min û nivîsa ku di derheqê girtina me de di kovara Komkarê de derketîbû, da polês, di cî de ez berdam. Duşemîyê dest bi qursa ziman dikim. Tevî Sîdar em baz didin, li vir gelek îmkan heye, em ê bidomînin.*

*Di derheqa vira û rewşa Sîdar de jî hindek agahî binivîsim.*

*Heta ku keke Weysî bê, li vir xebatek bi sihat tunebûye. Gelek bêserî, bêkêrî hebîye. Meriv nikare beje rewş tam ketîye duzenê. Ji ber ku hîn pir kêmasî û kar heye. Sîdar jî ser xwastina havalan ji Upsalayê hatîye Stockholmê.*

*Sîdar yek ji wan havalên bijarte ye û di nava hevalan de xwedî giranîye. Li ser hin pirsen gelemperî wî ra peyîvîm. Di hemû babetanda em wek hev difikirin. Ser navê xwendevanê Kurd, ji Swêd çûbû Elmanya. Armanc ew e, ku yekitîya xwendawanên Kurd ya Ewrûpê pêk bînin. Di xebatên xwe de serkeftine. Wek tu jî dizanî AKSA damezrandin. Di nêzik de bi navê "Roja Kurdistan" û bi tîpên latînî û erebî kovarek Kurdî derdixinin.*

*Wî li Elmanyayê xalê me Mihemmed û Enwer jî dîtîye. Xalê me pir xebitîye kare xwe jî zahmet bîye. Enwer jî di komela Komkar de dixebite û rewşa wî baş bûye. Wekî din tişt nayê bîra min ku binivisim. Pêşketin hebin ezê ji we ra binivisim. Gotin dîtinên*

*te û kekê Bedirxan min ji Weysî ra got. Em her sê ji we ra silavê xwe rê dikin û ji hevalan ra silav.*

*Têbinî; merivê Alaettîn ne li vir e. Serdar(Fîkrî)*

Em li Beyrudê li mala welatparêzekî ji Kurdistana Başûr, Newzat, endamê Yekitîya Niştimanî Kurdistan, dimînin.

14 ê meha Avrîlê em dixwazin vegerin Şamê, lê rê girtî ne. Di navbera hizba Emel û tevgera Filistînî de şer heye. Ji 100 î zêtir kuştî û birîndar hene. Hizba Emel, hizbek olperest, grêdayîyê partîya Xûmeynî ye. Di qontrola rê de sekriterê grubek Kurd, Mihemed Miho ji alî Emelê ve hatîye kuştin.

17 ê Avrîlê em ji Beyrûdê derketin, saet 17,00 hatine Şam ê.

Rêwîtî û di hindur de rûniştin, bê hereket mayîn em westandine. Hevalê Alaettîn ji partîyê veqetîye û ji mala partîyê çûye. Roja ku em hatin Beyrûdê ez bi Alaettîn ra peyîvîm. Min got dizanim ji bo te piçekê zahmet be, lê heya ez bêm sebir bike. Ji ber ku Alaettîn nexweş bû. Ji zarokên xwe xeber nedigirt. Serda jî em 6 kes li ba hev diman ji wan 4 kesan ra navbera xwe ne baş bû. Yên ku têkilêyên xwe pê ra baş bû ez bûm. Ez jî ku çûm di malê de kesê ku wî ra bipeyîve nedima.

Êvara ku em ji Beyrudê vegerîyan, ez çûm min li taxa Kurda, li Rûkneddîn Alaettîn dit. Ew û Dizgun bi hev ra li ba hin xwendevanên Kurd diman. Dilê min bi vê rewşê şewitî, min pir hewl da ku wan qane bikim wegerin mala partîyê, lê ew venegerîn.

Piştî çend rojan ji Beyrudê vegera me, 21ê avrîlê Îsraîl Başûrê Lubnanê bombebaran kir. 27 kûştî û 60 birîndar hene. Du balafirên Sûrî jî xistin. Me ji qampê hevalên xeber girt li ba wan şer tune.

Konsolosê Îsraîlê yê Londrê, hat birîndar kirin. Îsraîlê ew yek ji xwe ra kir sedem û ji çar alîyan ve êriş bir ser tax û qampên Filistînîyan. Îsraîl her roj êriş û şerê xwe firehtir dike. Bajarên Seyda, Sûr, Damê, rîya Beyrûd û Şamê heya 15 kîlometrê ket bin qontrola Îsraîl.

Berpirsîyarekî hikûmata Sûrî di radîya BBC de anî ziman ku Îsraîl rîya Beyrûd û Şamê girtîye binê qontrola xwe, *"ew tê wê manê ku bi 40 hezar esker û bi hezeran dilxwazê me yên li Lubnanê ra têkilîyên me tên qût kirin. Em ji vê yekê ra nikarin bê deng bimînin."*

Herçiqasî serokvezîrê Îsraîl, Begîn got *"heya leşkerê Sûrî, êrîşî me neke em jî êrîşî wan nakin."* Îsraîl bi taktîk dixwaze hêzên Ereban li himber wan, tifaqa xwe pêk neynin. Lê Sûrî nikare li şerê ku di sînorê wê de dibe lê sêr bike. Dawîya şerda Îsraîl dikare leşker ê Sûrî ji Lubnanê derxine.

Êrişên Îsraîlê freh û zêde dibe, bi 90 balafirê êriş bire ser fuzeyên Samê, yên ku Sûrî li Gelîyê Beqeayê cîh kirîye.

Di şerê balafiran de 19 balafirên Îsraîlê û 16 jî balafirên Sûrî hatine xistin.

Em hewl didin lê nikarin ji 15 hevalên me yên ku li qampa Filîstînê Namê, dimînin agahî bigirin. Rî ya Beyrudê di binê qontrola Îsraîl de ye û telefon jî tune. Em bi rîya hêzên Filistînî dixwazin herin, lê leşkerê Sûrî çûyîna Lubnanê qedexe kirîye.

Êrîşên Îsraîl xwe gîhandîye qampa ku hevalê me lê dimînin. Daxwazîya partîyê ew e ku heval li ba Filistînîyan cîh bigirin û şer bikin. Lê heval însîyatîfa xwe çawa kar bînin em nizanin. Lê wek şexis dilê min ne pêra bû. Wexta ku em çûn qampê bi hin hevalan ra sohbetê de min gotî bû ku ya baş *"ne ji bo welatekî din, mirov ji bona azadîya welatê xwe şer bike."* Gotinên enternasyonalî yek alî nabe. Wexta ku em bi Filistinîyan re ketin têkilîyan me dît, ew çiqas egoîst û şoven in.

Ji êvar de heya sibê dengê ambulansan nehate birîn, birîndar kişandin nexweşxana Şamê. Di cîvîna Yekbûyî ya Miletan de bona ku Îsraîl şer rawestîne Îspanyayê pêşniyarek kir, lê Amerîqa li himber derket û ew nehat pejirandin.

Fîlîp Habîb (Mişawirê Serokkomarê Amerîqê Ronald Regin) hat Şamê, bona ku Şamê qane bike û ew li himber Îsraîlê nekeve Şer.

Saddam Husên Serokê Iraqê propaxande dike ku Sûrî tevî Îsraîl dixebite, lewma jî nare alîkarîya PLO. Sûrî sînorê xwe ji bo petrola Iraqê girtîye, li dijî Saddam piştgirîya mixalefeta Iraqê û dewleta Îranê dike.

Eger Sûrî li himber Îsraîl bikeve şer, Iraq wê piçekê rihet bike. Îsraîlê şerê xwe dijwartir kir. Min li jor gotibû ku ji hevalên me yê li Namê xeber tune. Lê îro ji qampê du kes Avdirrehman û Mihemmed hatin Şamê. Ji bona ku wan xeber nedane hevalê xwe, bi serê xwe hatine, ew ji partîyê hatin dûrxistin.

Hevalên ku li qampê ne ji ber êrîşên Îsraîl belavela bûne, kesî xebera xwe ji yê din tune. Yek, dudo bi serê xwe tên Şamê.

Kesê sêyem ku hat jî Silêman bû. Ew jî bi tesîra şer gelek hêjîya û ji partîyê qetiya.

Dora roja din sê kesên din jî hatin. Ji ber ku sîleh, çek û nasnama wan ya Filistinîyan bû, wan kincê leşkerî ji ser xwe derxistine, tewî sê klaşînkofan dane malek Kurd, ji wan jî sol û kincên kevn, sivîl girtine li xwa kirine, nasnama xwe avitine û hatine Şamê. Ew fikirîne ku, di qontrolan da, tevî nasname, çek û kinc ew bihatana girtin leşkerê Sûrî dikarîya ew vegerandana enîya şer.

Partî bi vî şikilî hatina wan aciz e. Ez çûm ba Cepha Demoqratîk, min ji wan ra got sê silahên wan, li nêzikî Şamê li edresekê ne, eger ew bixwazin em dikarin herin wan bînin. Berpirsîyarê Cepha Demoqratîk piçekê xwe aciz kir lê tîştê ku bikira jî tune bû.

Di rewşek usa de dîsîplînek leşkerî xwestin jî zêde îdeal bû. Di ordîya dewletan de jî kêmasî û şaşitî dibûn. Bê haya hevalên xwe, bi vî şiklî hatina wan ra îtiraza min

jî hebû. Lê di axa Filistîniyan de şer kirin û mirin ne mafê me Kurdan bû. Ya rastî mafê tu hêzik Kurd ne bû ku xortê Kurd li ser axa bîyanî bide kuştin. Îro baştir dibînim û dibêjim baş e, ku di wî şerî de pozê hevalekî me xwîn nebû.

Pê wan hevalan du hevalên din Qasim û Esed jî bi rîya Filistînîyan hatin. Me di malê de civînek çêkir. Hin heval ji xwe berê de li himber hev nerehet bûn, şer û bi wî avayî ji qampê hatin jî bû sedemek din. Sê hevalên ku çekên xwe avitîbûn ji partîyê hatin durxistin.

Ji hevalên qampê mayî jî me agahî girtin, ew paşve kişîyane hatine li Beqea-Hilwê ne.

Tenê ji du hevalan xeber tunebû. Nêzikî mehekê şûnda, ji ser Ewrûpê ra em agahdar bûn ku ew li Beyrûdê di mala dostekî – Bavê Azad de dimînin. Me ji wan ra pere şand wan taxsî girt û hatin Şamê. Şerê Îsrael moral û hêjmara me ya li vir daxist. Êrişên Îsraîlê seranserê meha Tirmehê jî dom kir. Şerkarên Filistînîyan hêzên xwe ji Beyrudê derxistin, li welatên Ereban belav kirin.

1982.06.10

21ê Adarê di zîndana Dîyarbekirê de qadroyekî PKKê, Mazlum Dogan, ji bona protestokirina zilm û êşkenca ser girtîyan xwe şevitand. Ji bo protestokirina qetlîam û terora dewleta Tirk 17 grubên Kurd û Tirk li Elmanyê bi hev ra di 8 ê Gûlanê de xwepêşandanek lidar xistin. Li gorî agahîyên ku gîhîjtin me di xwepêşandanê da10 hezar kes beşdar bûye.

Dîktatorê faşîst a Arjantînê bona ku mixalefeta hindur bêdeng bike girava Folklandê dagirt. Bersiva Îngîlterê hişk bû, leşker şand û bi Arjantênê ra ket şer. ABD piştgirîya Îngîlterê dike. Di roja 8.06.1982 de Reagen axavtina xwe ya di Meclîsa Avam de got:*"Mirovên ter û teze ji bona parçek çîya şer nakin, ji bona ku mantiqekî ji holê rakin şer dikin."*

Sowyet, polîtîka Îngilîz a di derheqê rewşê rexne kir. 9 û 10 ê Hezîranê de li Elmanya civîna serok û vezîrên karênderva yên welatên endamê nato heye. Ji Tirkîyê şefê cûnta faşîst Kenan Evren çûyîna xwe ya Elmanya betal kir. Di şuna xwe de serokwezîr Bulent Ulusoy û vezîrê karê derva çûn civînê. Xwepêşandanên li dijî Nato û Reagin li Elmanyê, Îngîlîzistanê û li Swêdê xurt dibe.

Biryara partîyê ya li Kurdistana Başûr bicîhbûnê, di nav hevalan de nerehetî çêkir. Hin kes ji ber vê yekê veqetîyan. Hin kesan jî, ji partîyê veqetandina Zekî ji xwe ra kirin sedem û dev ji partîyê berdan.

Dîyar, nama ku bona daxwazîyên xwe bigîhîşine min ji Turgut ra nivisîye, ji hevalên welat, ji hin berpirsîyarên partîyê gazinan dike. Dibêje polês rehetîyê nade wî, ew nizane çi bike?

*19.5.1982*

***Kekên minên ezîz;***

*Nama xwe ya dûem dinivîsim. Dîsa bînteng û pozxînim. Xasima ji birayê xwe yê piçûk, ne razî me. Dema ku ew ji vir derket min pir temî lê kir, ku ji min ra hindek agahî bişîne. Lê xûya ye wî ew bîra kirîye. Carek din dixwazim bîra wî xinim. Ji xwe kî tere usa dike, ez jî wê yeke hêdî hêdî digirim xwe.*

*Mehane dixwazim herim cem apan (kekan), lê tu agahî tunin. Tenê dibêjê tê bila bê, li tû îmkanan nager e. Û min jî çiqasî cehd kir nekarî serkevim. Heval dixwazin ez herim cem Atîlla yê bira (Rojhilata Kurdistanê), ez jî wê derê naxwazim. Kêkê Kazim divê ji vê yeka agahdar be. Êdî em mecbûr dibin ku bi şexsî bi vî karê ra mijûl bibin. Wê rojê li ber têla sînor em bi mirinê ra rû bi rû man, baş e ku me kanî em şûnve vegerin.*

*Vê şopa ez li vir im, û xasima li benda agadarîyên wî me. Berpirsîyarên vir li himber me di nava têkilîyên ne dostane dane. ( ... ... ... )*

*Namên ku em ji Kekê me yê mezin (Mistefa) ra dişinin, tu bersivan jê nagirin. Ewqas îllegalîte jî dikare zerar bîne. Em di kûçek rêderneketî de ne, ji me ra bila binivîse. Alîkarîya ekonomik nayê, bila bizane.*

*Bavê min duh li vir bû, me bir dixtor, miyane bû, rewşa xwe baş bû. Kêkê Turgut, kin dibirim, eger tu dikarî bi telefonê kekê Kazim agahdar bike, daxwazîya derketina min çûyîna cem wan jê ra bêje. Ew çi dibêje rê heye bila bêje, Aksoyê Xarpitî nikare rê bibine.*

*Ji te, xanima te û Fîkret begê ra silav dikim.*

*Têbinî: di nava 15 rojan de dikarim ez herim, Apê (keke) Kazim bila bîhîstok û li benda min be.*

*Name bê nav e, li binî tenê îmzek nerast heye, lê em dizanin ku name ya birayê me Yavuz- Dîyar e. Wî pirsa apê di cîhê keke, birayên mezin de bikar anîye.*

**Civîna Komîte ya Navendî** (Merkezî)

1982.07.04

Sekreter û hin endamên Komîta Navendî yên ku li Elmanya dimînin ji bo civînê hatin Şamê. Civîn li Şamê Mesakîn Berzê di mala partîyê de çê bû û civîna komîta merkezî seranserê meha Tîrmehê girt.

Endamên Komîta Merkezî Kemal Burkay, Zekî Adsiz, Husên Beysulen, Ayhan Kutlay, Bayram Ayaz ji Elman yê, Zîya Acar ji Kurdistan a Rojhilat hatîbû. Ez, Bedirhan Epozdemir, Hazim Kiliç û Faruq Aras jî li Sûrîyê, tevlê bûn. Xeyni Mistefa Budak, (ew li Kurdistana Rojhilat e) hemû endamên din amade bûn. Di

destpêkê de Faruq Aras ji ber tenduristîya xwe ji Komîtê îstifa xwe xwast. Îstifa Faruq hate pejirandin, civînê bê wî dom kir. Rojeva jêrin hate tesbît kirin.

**Rojew**

1-Axavitina sekreterê giştî

2-Li ser xebata komîta merkezî bê rawestin

3-Xebatên partîyê ya li Tirkîyê, Îran, Iraq, Sûrîyê (Kurdistan Bakûr, K. Rojhilat, K. Başûr, û K.Rojava ) û li Ewrûpa yê hatine kirin ji ber çav ra bê derbaz kirin.

4-Rewşa endamên partîyê û wazîfedarkirina wan,

5-Pirsa Hevkarî yê,

6-Xebat û qontaxên ji derva

7-Pirsa Ekonomî yê,

8-Amadekirina Kongrê an konferansek ê,

9-Dîsîplîn

Lê di vê navberê de endamê Komîta Merkezî Zekî Adsiz bi nivîskî hin dîtinên xwe pêşkêşî komîtê kir. Ser wê, komîtê nivîs kir xala rojevê, ya pêşên û deh rojan li ser hate rawestîn. Xasima minaqeşe di navbera du endamên komîtê de derbaz dibû. Zekî Adsiz û Huseyîn Beysûlen. Zekî û Husên dûrûdirêj dîtin û tiştên ku wek problem didîtin, anîn ziman. Wan gelek têkilîyên prîvat ji xwe ra kirin bingehê rexnên îdolojîk.

Sekreter û endamên komîtê yên ku ji Elmanya hatî bûn, dîtinên xwe gotin. Me endamên din jî bi piranî gorî dîtin û agahîyên wan raya xwe afirand. Lê dûra li Swêd[63] ez bûm şahadê bûyerekê, min dî ku Husên malumatên nerast dabû komîtê.

Herdu heval li bîrîma Elmanyê diman, Husên dereca yekê de berpirsîyar bû. Di sêrî de Zekî bawer dikir, ku Husên ji ber hin şaşitîyên xwe tê rexne kirin û ji berpirsîyarî ya Elmanya tê dûrxistin. Lê ûsa nebû di nîqaş û gengeşîyên bi rojan Zekî ji partîyê dûr xist.

Tevgera azadîxwaz a Kurdistanî di revşek nazik de derbaz dibû. Parastina yekitîya partîyê girîng bû. Metod û rîyên qanekirinê serneket. Di nîqaşan de îqnanebûna Zekî zerar gîyand partîya me. Di rexnên Zekî de ji bona cudabûnê

[63] Di salên 90 dabû li komela Komkar a li Stockholmê grubek endam rûniştine tevî Husên Beysulen sohbet dikirin. Husên gotin anî ser macerayên xwe û Zekî. Got "*min bi gotinekê fît dida hemwelatîyê xwe (Zekî ) ew dîn dibû, nedizanî çi bike.*" Peyv û gotinên civîna Şamê hat ber çavê min, min zanî ku Husên komîta xapandî bû, bûyer serbijêr kiribû. Min got lê "*te di ciwînê da usa nedigot. Te li Elmanyê fît da Zekî, li vir fît da O…., nuha dora kê ye?*" Ew jî, kesên ku li dora wî bûn û bi serboriyên wî kêf digirtin jî sar bûn. Bi zane bûn ew bi hasasîyeta Zekî listîbû, Zekî anîbû provakasyonê ku ew li himber wî şaşitîyan bike.

sedemên ku mirovan qane bikira, motîfên îdeolojîk, polîtîk tunebû. Lê partî bi *"oportunîzma, baskê rastê"* ve dihate sucdar kirin. Zekî ji kêmasîyên yek û yek kesan xwe digîhand encamek usa. Di minaqeşan de li ser hin herêman jî hin dîtinên şaş anîn ziman. Zekî, li himber partîyê û qadroyên di girtîgehê da, di nava endaman de bi rexnên tûj bêbawerî dianî holê. Qadroyên partîyê gora herêman dikir dû beş; ji alîkî, *"enîya ku serê xwe dida û sir nedida, alî din jî enîya ku liberxwe nedidan."*

Girtîyên ji Bingol û Agirîyê wek nimûnên berxwedanê, hevalên girtîgeha Dîyarbekirê jî xwedî zaaf nişan dida. Qadro û xebatên hin herêma jî *"dervayî enîya şoreşger"* nişan dida.

Komîtê ew nirxandin şaş dît û rexne kir. Li gorî herêman beşkirina hevalan nerast bû. Di nava girtîyê hemû herêman de kesên ku di girtîgehan de sistî kirîbûn, berxwe nedabûn jî hebûn kesên ku berxwe dabûn jî. Lê tiştekî pir xwezayî ye, moral û bawerî di herkesî de eynî derecêda nexurt e.

**Zekî;** (.....)

Îro di vê nîqaşa me de ez dixwazim sekreter bê alî be, ew nekeve nava nîqaş û guftugoyan. (....)

Nivîsa ku min nivisîbû Husên nehişt di kovara Dengê Komkar de bê weşandin.

Di civînê de Husên got ku: "(...)

Di seri de Husên jî reorganîzekirina partîyê de wek wî difikirîya, lê wî dipirsîya, ki bibe sekreter[64]?

Ew hevalên ku navên xwe di axavitina Husên de derbaz dibin tu caran min tevî wan pirsgirêkên partîyê nanîye ziman. Heya vê dema jî tu nîyeta min a xirab tune ku ez zerarê bidim partîyê. Hin heval bi zorê dixwazin mixalefetekê derxinin holê. Husên derî li ser min de cî, pîn avit derî ..., Ew xwe şef dibîne, dibêje *" tu nikarî bi minre usa bipeyîvî"*.

Li ser îfadê Nazîf jî bi Mahmût Ç. û hevalên din re ez nepêyîvim. Ez nabêjim ku Nazîf îxanet kirîye. Lê hin zaafen xwe hene. Gorî Husên, Enver jî min li himber partîyê pîj kirîye. Husên van şaşitîyana bi zanetî dike.

**Husên;** li gorî rexnên ku Zekî ji bo min tîne, ez ne oportunîstek, xaînek im. Lê bona ku nuha ew vekirî nabêje, xwe oportunîstîyê dike. Ez bawerim ku hatina Zekî ji Îranê bi plan e. Ji malê çûyîna wî û Mahmut... jî plan e. Ez têkilîyên bi Mahmut ra ketim nava rewşek bêrûmet

Zekî, karîyerîst û bînteng e. Biryara dengdana lîsteya Komkarê Zekî ji Mahmud girtîye. Karê M.... ê û di AKSA de wezîfe girtina Enwer, Zekî ji kê fêr bû? Di

[64] Vê gotinê K. Burkay kire nava şik û fikaran, qet ew bira nekir. Husên ji xwe ra kire raqîp.

derheqê komelan de gelek tiştan dizan e, rapora ku Mahmud ji bona matbaayê nivîsîye Zekî ji min ra anî, ew deşîfrasyon e. (çi agahîyên girîng û vêşartî hatine deşîfre kirin!)

Zekî dibêje "di partîyê de karê Mur….. çîye? Ew ji dizane ku Mur…. endamê partîyê ye?"

Serokê komîta partîyê jî, serokê komîta Ewrûpê jî ezim, lê Zekî têkilîyan ne bi min ra, bi Komkarê ra datîne, ew jî şaş e. Di vegera Zekî ji Kurdistana Rojhilat min û Zekî li ser rexnan li hev dikir, lê li ser organîze kirina partîyê li hev nedikir. Zekî li cem hevalan polîtîka partîyê rexne dikir, dixwast bide zanîn ku têkilîyên me ne baş in.

Zekî vekirî mixalefetê dike, eger ku partîyê berpirsîyarîyek bidana wî ez li himber derdiketim. Dibêje tu çawa nivîsa min qontrol dikî? Ez berpirsîyarê komîta rojnamê me, mafê min heye ku hemû nivîsan qontrol bikim, yê Zekî jî di nav da.

Ez bi, *"yekperistîya bêderman"* *tême sûcdar kirin, ser vê yekê jî tesbîtek bê kirin dê rind bibe."*

Sekreter li ser nivîs û weşandinê dîtina xwe got:

Wek pirensîp qontrol kirina nivîsan di cîhê, xwe de ye. Nivîsa hevalê Zekî be jî divê bê qontrol kirin. Encax, Husên zêde midaxela nivîsê kirîbû. Min hinek midaxele bêmane dît, ji Husên ra jî got. Ew midaxelekirin, min di cîh de ne dît û Husên rexne kir.

**Kazim**: Em hemû endam û dilxwazên partîyê xwedî maf in, ku xebat û qadroyên partîyê rexne bikin. Hevalê Zekî jî bi vê nivîsê, ew mafê xwe bi kar anîye. Mafê rexnekirinê mafekî xwezahî ye, ew partîyên ku mafê rexnekirinê qadexekirine orxanîzmayên rizîyayî ne. Lê divê meriv çarçova rexnê rind dayne. Di rastîyê de mirov nikare partîyên ku di pirtûkan de teorik hatine tarîfkirin bibine, ew yeka îdealîzm e. Jîyan tiştek, teori tiştekî din e. Mirov bûyerêkê an miroveki bigire dest û ji şaşitî û kêmasîyên wî partî û komita wê ya merkezî bi oportunîzmê sucdar bike, şaş e. Zekî di nivîsa xwe de ew şaşitî kirîye.

Mirov çima rexnan dike û divê mebesta rexnê çibe?

Eger ku em pizikekî suretê xwe bi rik bi xurînin dikarin wê bikin kulekî mezin. Dijminên gelê me tim dixwazin me parçe bikin û me daqurtînin. Divê em bi berpirsîyarî û xwînsari li ser pirsan rawestin.

Neweşandina nivîsa Zekî û Mahmud de Husên[65] şaş e û ew yeka wî bi zanetî kirîye. Husên pîn li derî xistîye, gotîye *"tu nikarî bi min re usa bipeyîvî"* hevalê Zekî tahrîk kirîye.

---

[65] Husên li Swêd jî ew çewtîya xwe domand. Ji bo piştgirîya rojnama Azadî ya ku li Stenbolê çap dibû li Stockholmê komitek hebû. Ji kesên din nivîs, belge, materyal di civandin ji rojnama Azadî ra rê

Hin hereketên ku ser navê partîyê hevalê berpirsîyar kirine şaşin. Husên dîsiplînê li himber qadroyan xirab kartîne, û pir îdealîze dike.

Kî li kîderê bû, çi peyîvî, çawa peyîvî? Wek dedektîf li ser disekinî. Di peyvên hevalan de xasima di ya Husên da, bi hin endamên jin ra zêde mijulbûn heye. Car..., Ut...., Tah...., Ka...., Kez..., uyd. Meriv hin têkilîyên xisûsî demek usada bike rojevê û partîyê pê mijul bike şaş e.

Herdu heval ji kêmasî û şaşitîyên hin kesan dixawazin ji dîtinên xwe re bikin piştpal.

Usa xuya dike ku endamên Komkarê di biryargirtinan de zêde neaktîf in, partîyê zêde midaxaleyê xebat û liva wan kirîye. Hin endamên Komkarê navê proleterîyê li ser wan be jî, ew ji gundîtîyê tên û hin xisusîyetên gundîtîyê ji ser xwe neavitine.

Hevalê Zekî got; *"ez nabêjim ku Nazîf îxanet kirîye. Lê hin zaafen xwe hene."* Em jî dibêjin, hin zaefê xwe hene. Moral û bawerî di herkesî de ne wekhev e. Lê ez şahadim ku hevalê Zekî, te di derheqê Nazîf de hin tiştên şaş jî gotin. yekem tişt Nazîf di binê êşkencê dabû. Ya duyem, partîyê di derheqê Nazîf de biryarek xwe tunebû. Ya seem jî, dema ku tu wek nunerê DÎSK ê di bîranîna 15-16 Hezîranê de hatî girtin Nazîf bo ku tu azad bî pir hewl da. Erol Tuncerê CHP î tevî qadroyekî din hatin Dîyarbekirê, tevî Hesen Deger alîkarî kirin û tu hatî berdan.

**Bedirxan:** Li himber Nazif qampanyek heye, ew neheqî ye. Em ji hepsê bona berdana Nazîf torpîl an jî li çareyan negerîyan.

Bûyerên Ewrûpa û Kurdistana Rojhilat de zîhnîyetek hevpar heye.

Herêma me çawa dervayî enîya şoreşgerîyê ye? Madem usaye çima organîzekirina çapkirina rojnama azadî dane me? Şeva Newrozê ya UDG ê çima li Bitlisê çêbû? 1 ê Gulanê, çima li wir hate pîroz kirin?

Di hilbijartinên herêmî de me çawa karîya alîkarîya dost û hevalên xwe yê Agirî û Dîyarbekir bikin?

Hevalên wê derê jî wek cîhên din, him xebata herêmî kirin him jî bi mîlîtan û bi alîkarîya maddî ji herêmên cîran ra, xasima ji hilbijartina Dîyarbekir û Agirî yê ra

---

dikirin. Husên jî di wê komîtê dabû, lê ew bi mana qontrolkirine bi nivîsan dilîst, hin caran jî nivîs nedişandin. Xwe dikir cîhê komita weşanê rojnamê.

Min jî rojekê bo ji rojnamêra bişînin nivîsek da komîtê. Husên nivîs ji komita Stenbolê ra şandîbû, lê li ser nivisîbû *"... bi însîyatîva xwe nivîsîye."* Min got "ma lazime tu ha binivîsî, bi vê gotinê armanca te çîye?

Çend nivîs ji min xwe nivîsî û şandin. Lê ya ku li ser ziman nivîsî bû wext derbaz bû nehat weşandin. Piştre me sekir ku Husên ji hevalan ra telefon kirîye, gotîye nivîs bê îzna wî min şandîye, bila ew neyê weşandin. Di civînê da jê hate pirsîn, înkar kir. Lê sekreter xwe ji hevalên welat bihîstibu. Wexta ku da ruyî wî û got "tu derewan dikî" min fedî kir.

alîkarî kirin. Piştî ku cunta faşist hate ser hukim, gelek welatparêz kirin girtîgehan û heta ku partîyê xwe negihandîbû malbatên wan, bi mehan alîkarîya maddî wan bi xwe organîze kir.

**Bayram Ayaz:** Zekî dîtinên xwe ji hevalên din ra parve kirîye, va yeka bê dîsîplînî ye. Ji dîtinên Urfan Alparslan fêm dikim ku ew di tesîra Zekî de maye.

Li Elmanyayê organek partîya me heye. Hevalê Zekî bi vê organa partîyê ra têkilîyek baş dananîye, ew bûye teref. Zekî berî ku dîtinên xwe bîne komîta merkezî, ew bi hin hevalan ra parve kiriye, adeta ew bûne grubek. Grubê jî xwe nêzikî hizîpbûnê kirîye. Rewşek xeter e, Mahmut Ç. jî hatîye cîyekî nebaş, ew ji rubalî hevalê Zekî de ye. Zekî divê di vê peryodê de yekitîya partîya me ber çavan bigire, bi berpirsîyarî tevbigere. Ez jî, komîta me jî, hevalê Zekî şaş dibînin.

**Hazim Kiliç:** Hevalê Zekî bê bingeh rexna oportonîzma ya rastgir" tine ziman. Ew gotina wî ya bê îsabet hin rexnên wî yê bi heq, jî ji ortê radike. Ji şaşitîyên yek û yek kesan xwe digîhîjîne wê encamê, ew yeka neheqîye.

Mixalefeta Zekî ne hizîb e, hîzîp xwedî motîfên îdeolojîk in. Wî piştî ku rexne anîye, ketîye nava bêdîsîplînîyê. Zekî li gorî fêmkirina xwe pratîka xwe jî şaş e. Zekî dixwaze di nîqaşan de sekreter bêalî be, ew daxwaza li gorî partîyek Lenînîst şaş e.

Zekî bûyer şematîze kirine, piştî ku rexnên xwe anîne, bêdîsîplînî ji xwe ra kirîye usil. Yek bi yek bi kesan ra têkilî danîye û ketîye nava xebata gurubî. Nave min jî tevî vê mixalefetê derbaz dibe. Bîlal Aksoy jî li Qamişloyê hin tişt gotine. Derbazkirina nave min bi mane ye. Ji hevalê Zekî dipirsim, te qet li derikê nave min da, ku ez jî tevî te me? (Bersiva Zekî na bû.)

Navê min jî tevli mixalefetê tê gotin, ew yeka bi nîyetek nebaş hatîye kirin. Bingehê partîya me hesas e, li ser bê rawestandin wê baş bibe.

Li meydanê belgên min tunin, dibêjim gelo li hepisxanê Nazîf navê min tevî hîzîbê kirîye? Agahîyên min yên ber biçav tunin, tenê şika min heye.

1982.07.13

**Zekî Atsiz:** Hevalan di çerçeveke teng de û agahîyên nerast dane sekreter, li vir darazandina min neheqîye. Di wê bawerîyêda me, ku serokê komîta partîyê, ya Avrupê agahîyên rast nedane sekreter.

Hin kesên oportunist û buroqrat li vir jî xwe didin nîşandan. Li ser rexnên min nayê sekinandin, rexne daketiye qora duyem. Tê gotin ku min hîzîp çêkirîye û ez ji bo wê têm darizandin, ew yeka neheqîye.

Di derheqê hin qadroyê Komkarê de dîtinên min nehatine guharandin. Ew kesên ku mesulîyeta partîyê bikarin bigirin ser xwe ne ew kesin. Eger rexnên yek alî nehatina kirin min dikarîya ji dîtinên xwe feregat bikira.

Li ser pirsên giştî tevî Mahmut Ç. me sohbet kir, li ser xebata partîyê em nepeyîvîn. Bona ku em bêne himberî hev, nave sekreter jî tê karanîn

Li Dîyarbekir komîta partîyê ya herêmî nedikarî kar rêva bibe, ji ber wê min dixwast îstifa bikim. Hevalê Kazim jî digot, *"Ji karkêrên daîra paqişîyê tiştek dernakeve."* Min got, *"kesên ku serê xwe dan, sir nedan"* û kesên ku peyîvîn. Min ne got kesên ku *"wek bilbil xwandin-peyîvîn"* îlle ku tê israrkirin ku min usa gotîye wê jî qebul dikim.

Herêma Çolîgê, ji alî belavkirina weşan û alîkarîya madddî de serkevtîye. Deşîfrebûna têkilîyên min û Husên piştî ji malê veqetandina min nine. Husên bînfireh û xwedî tahammul e, ez ne usa me. Ez sedî sed qane me ku di nava partîyê de di elehîyê min de propaxande hatîye kirin. Husên dixwast min bide peyvandin.

Li himber hevalên hepse, bi humanîstî tê tevgerandin. Bi humanîstî parastina Nazîf û Xelîl bêfêyde ye. Di deşîfrkirina îfadan de li sucdaran gerandin nerast e.

Parêzer Zîya Acar ji îfadên wan haydar bû. Parêzer Yucel jî fotoqopî anîbûn. Grubên dervayî me hin deşîfrasîyon kirin. Hevalên Bitlisî ji deşîfrasyona Dîyarbekirê ji me zêtir xwedî agahî bûn.

Di derheqê Nazîf de dîtina min ew e; Nazîf berxwe neda, ji hev ket, sist bû. Helwesta wan ya parastina sîyasî jî li ber çavan e, nîşandana hin sedeman jî nerast in. Komîta merkezî divê ser vê jî biryara xwe bide.

Wexta ku min rexnen xwe nivisî li ser pir fikirîm, lê min ew bi mantixa hîzibî, nenivisî. Bûyerên ku li Kurdistana Rojhilat qevimîne divê di nava şertên xwe de bêne minaqeşe kirin. Pirsên wê derê ji hevalên ku pêşîyê çûne destpêdike, di pirsgirêkên wê derê de para şertên dijwar û qalîta kesan heye. Du hevalên ku ji Rojhilat şûnda hatine şandin, ser daxwaza hevalên Bitlîsî bû.

Eger bi rastî yekitîya partîyê dixwazin, ez jî dibêjim bila hin heval kêmfirsendîyê nekin. Wexta ku min ew rexne nivisî, di partîyê de min cîhê xwe dizanî. Dîtina min ew e ku oportunîzm partîyê dikuje. Heta roja îro parastina yekitîya partîyê fikirîm.

Li himber dîtina komîta merkezî divê ez jî helwesta xwe tesbît û eşkere bikim. Qampanya li himber min ji girtîgehê bigir, ji Ewrûpê û ji Kurdistana Rojhilat tê îdare kirin.

Rexnên min li himber xebatên partîyê, xebatên pratîk in. Helwesta komîta merkezî eşkere bûye.

Heta ku bi serokatîya sekreter komîtek ava nebe û hin pirsan nîqaş neke ez xwe rexne nakim. Eger ku di minaqeşan de rexnên min bingeh bihatana girtin, min dikarîya fêdekarîyê bikim.

Ji alî oportunîst û buroqratan ve têm tecrît kirin. Endamtîya xwe ya partîyê û ya komîta merkezî dicemidînim. Têkoşîna min ya 8 salan îro li vir dawî lê hat. Piştî wê divê ez civînê biterikînim.

**Kemal Burkay (sekreter):**Di wê babetê de komîta merkezî divê bigîje encamekê. Kesê ku dîtinê xwe hebe heye?

**Zîya Acar:**Hevalê Zekî rexnên xwe anîn komîta merkezî û li ser wan minaqeşe hate kirin, ew yeka helwesteke baş e. Lê bi serê xwe endametîya xwe cemidandin şaş e, ew yeka li dijî dîsîplîna şoreşgerîyê ye. Hevalê Zekî qeneat û dîtinên xwe yê şexsî ji bona fêyda giştî divê feda bike. Berê gotîbû ku ew li himber biryara partîyê wê rêzdar be.

Zekî pesna sekreter dide, lê dibêje îro jî di komîta merkezî de kesên oportunîst hene, me dixwast ku ew bi wêrekî navê wan kesan jî bide. Ji ber ku tevayîya partîyê ji sekreter pêştir e.

Hevalê Zekî di civînê de beşdar be û biryara ku di derheqê wî de tê girtin, guhdarî bike û jê ra rêz nîşan de.

**Sekreter:** Gorî min hevalê Zekî hatîye asta avitina pirên navbera xwe û partîyê. Min pir hewl da ku ew neyê vê niqtê. Di derheqê partîya me de gihaştîyê wê qenaatê ku bi vê malzemê ew nikare pirsa xwe çareser bike. Wî li K. Rojhilat jî ew dîtina xwe eşkere kirîbû. Li wir jî şaşitî û bê dîsîplînêyên mezin kirîbû.

Dema ku hate Ewrûpê me jê ra eleqe rawî kir, bo ku bûyerên li Rojhilat qewimîya bûn nedihatin zanîn, me kar da wî. Wî bi duristîyek şoreşgerî dikarîya şaşitîyên xwe qebûl kira û pirs bihatana çareser kirin. Ez ku ji K. Rojhilat wegerîyam min ew di nava şaşitîyan de dît. Rexnên xwe kirîbû ser kaxizê. Dema ku min ew xwendin, min dî ku wî ji partîyê veqetandinê xwe amade kirîye. Di bingeh de propaxande kir, bi mantiqa "ya di nava partîyê de tême astek baş an jî ji partîyê vediqetim,"hereket kir. Li himber komîta partîyê ya Ewrûpê xwe kir teref. Wî dixwast di cîhê Husên de ew bibe berpirsîyarê partîyê.

Gor min Zeki dixwast komîta karger a Komkarê bigire alî xwe. Di nava bingehê partîyê de propaxande dikir. Ji bona ku ji şaşitîyên xwe vegere me derî jê ra vekirî hişt. Ew ji ber ked û enerjîya xwe di partîyê de cîhekî cuda de ye.

Eger ku ji gavên şaş vegerîyana me bi cesaret dikarîya bajotana ser şaşitîyên din jî. Va civîna, ji bo partîya me gavekî dîrokîye û dema dîrok vê yekê binivise, gavekî şoreşgerî neavitina, hevalê Zekî jî binivîse.

Şert çiqasî dijwar dibe bila bibe divê em ji bawerîyên xwe tiştekî wenda nekin. Lê di hevalê Zekî de ew bawerî qels bûye. Meriv biryarên kongrê bipejirîne û carek din jî rexne bike, ew opurtunîzim e.

Zekî di nava lezkirinikê de ye, ew jî maceraperestîya burjuvazîya piçûk e. Pirsa partîyê pir îdealîze dike. Ez ber hevalê Zekî dikevim ku ew ketiye rewşek usa. Belkê ew ji xwe ra tevgerekê saz bike, belkê jî bikeve nava hêzek din. Di tekoşîna sîyasî de rê ya mirovan dikare veqete. Veqetandina wî partîya me birîndar bike, lê eger ku

biryara veqetandinê daye rîya wî vekirî be. Bona ku partîya me serkeve ez ê birikînat bitêkoşim.

Hin kes dikarin tevî Zekî herin wan wendayî dihesibînim, lê partîya me, wê, vê jî derbaz bike.

Ew di partîyê de bê ku kar bigire, dikare beşdarî kongrê bibe. Eger mixalefeta xwe bidomîne ji partîyê bê durxistin û bingeha partîyê bê agahdarkirin.

**Zekî:** Di vê peryodê de dixwazim bi tenduristîya xwe ra mijûl bibim. Endametîya min bê cemidandin lê ji bingeh ra tu tişt neyê gotin û em herin kongrê. Biryara kongrê ra, (kongra ku ji endamên li ser lingan mane pêk tên) rêz nişan didim û dipejirînim. Wê wextê wek endamekî di partîyê de mayînê jî dipejirînim.

Zekî nexwast civîna ku di derheqê wî de biryar tê girtin de amade be, civîn terikand. Komîta merkezî xebata xwe domand, bi yek dengî ew biryara jêrin girt.

***Hevrê Saleh** (Zekî ev nav bi kar dianî.)*

*1)Di rexnên te ya nivîskî ku di roja 5.7.1981 da, te ji organîzasyona partîyê ra û fikra xebat û piratîga wê ra sucdarîya oportunîzmê, ciwîna ku tu jî amade bûyî 10 rojan hate minaqeşekirin, Komîta me ya Merkezî bi dengên tevayî ew rexnên te ji dijî rastîyan, ne objektîv û neheq dît.*

*2) Wek endamekî Komîta Merkezî di nava Komîta Merkezî da, di kongre de minaqeşekirin mafê te ye. Encax me tesbît kir ku te, li dijî usilên destûrî, dijî prensîbên xebata demoqratîk a merkezî dîtinên ku nivîskî anîne ziman, berê li Îran û Ewrûpê di nava endam û sempatîzanan de belav kirîye û di bingehê partîyê de propaxende kirîye. Vê yeka di nava partîya me de li hev nekir in, di nava hevrêyan de bê bawerî, îşaretên beş bûnê û grub bûnê ra rê vekirîye. Li cîh bi cîh di xebatên nava partî û komelê de paşketin anîye holê û yekitîya partîyê kirîye rewşek ne baş. Bi vê sedemê Komîta me ya Merkezî bi yek dengî biryar girt ku tu bi nivîskî xwe rexne bikî 14.07.1982 Komîta Merkezî*

Wezîfa biryargîhandina Zekî jî dan min. Wê êvarê wexta ku ez çûm ew tewî Faruq Aras bû. Henekî ji min ra got, ez mîvanim tu, qet bi min ra eleqeder nabî. Min jî got na, ne usa ye. Ez di civînê de bi te re pir eleqeder bûm, Tu namê bixwîne wê bibînî.

Kenîya, *"bê xwedê, tu dixwazî çi bêjî?"*

Berî ku nama partîyê bidimê, min hin ditînên xwe yê pirîwat vê ra parvekir. Zekî havalê min ê salan bû. Ked û xebata me derbazî hev bibû. Wek malbat jî em dostên hev bûn.

Min dixwest ku ew qane be, Komîta Merkezî organa desthilate, ji biryara wê ra rêz bigire û ji partîyê veneqete. Partîya me û tevgera azadîxwaz birîn negire. Lê wî ya xwe kir.

Wê demê em jî piranî kitabî difikirîyan. Propaxanda şerê sar em jî yek alî dîzayn kirîbû. Gotin û diîtinên Marksîst û Lênînîst me ji xwe ra zêde dikirin belge. Qalibî difikirîyan, ne pratîk û sosyalî. Halbu ku ew dîtinên ku Zekî dianîn ziman dikarîya nerm û bi berpirsîyarî bihatana çareser kirin. Partîyê jî tu zerar neditina. Xwe rexne nekirin sucê herî mezin bû. Ew di her sucî de cezayî herî pêşin bû. Kesê ku ew nedikir, ji partîyê çûyîn heq dikir. Dîtina min Zekî psîkolojîk di partîyê de mayîn û çûyînê de tengasîyek derbaz dikir. Di partîyê de hewesa xebatê wenda kirî bu. Bi partîyê, nunerên kongrê û kongrê jî bawerîya xwe nema bu.

Zekî rojekê şûnda niviskî bersîva Komîta Merkezî da. Xwe rexnekirin red dikir, bersîva wî, "na" bû . Ser nama Zekî Komîta Merkezî rawestîya: Di komîta merkezî de dîtinên Zekî yên nu nehatin pejirandin. Dawî bi dengê piranî biryar hat girtin ku endametîya Zekî salekê bê cemidandin. Eger ew li dijî partîyê propaxande neke, dikare bê kongrê û li wir dîtinên xwe biparêze. Ew biryara jêrin hat dayîn.

***Hevrê Saleh:*** *Li gorî encamên hin têr lêkolînan Komîta me ya Merkezî ji te xwe rexne kirin daxwazkirî bû. Lê himber wê me dî ku te di nivîsa xwe ya 15.7.1982 de xwe rexne nekirîye û bona ku prensîba merkezî ya demoqratîk bipejirînî ji te hin mercên pêşin pêşkeş kirîye. Va jî tenê bi serê xwe pê lê kirina biryara organa rayedar, pêknanîna dîsîplîna partîyê û nimuneka nû ye û ji helwesta ji mîlîtanî bazdane.*

*Li hemberî wê rewşê komîta me ya merkezî li gorî madda 27. Benda c û benda dawî a destûra me endametîya te ya partîyê û* ***Komîta navendî yek salekê bi dengê piranî dide cemidandin.***

*Ji îro şunve têkilîyên te yên bi endaman ra dawî lê hatîye. Di vê pêvajoyê de tu nikarî xebatek partîyê bikî û li himber partîyê jî tu şaşitîyan nekî. Eger ku tu li gorî vê biryarê tevbigerî, dikarî di kongra partîyê ya pêş me da cî bigirî û dîtinên xwe bînî ziman.*

*Sê endamên Komîta Navendî ku tevî biryarê nebûn, ew biryar kêm dîtin wan ji partîyê dûrxistin dixwest. 17.7.1982 Komîta Merkezî*

Zekî bi wan encaman çend rojan şunda vegerî, Elmanyayê. Rojekê ji sekreter ra telefonek hat, ku Zekî li dijî partîyê propaxande dike, ser vê yekê Zekî ji partîyê hat dûrxistin.

Komîta Merkezî 10 rojan li ser vê xalê sekinî û nîqaş kir. Nîqaş di atmosferek demoqratîk de çêbû. Her kesî çiqasî dixwast ewqas peyîvî, dîtinên xwe anî ziman. Lê berî civînê endam bi *"parastina yekitîya partîyê"* hatin manîpule kirin. Ew yeka ne demoqratîk bû. Berî civînê sekreter em qane kirin ku *"Zekî biryara xwe ya*

*veqetinê daye, lê em nehêlin ew zêde zerarê bide partîyê"* bona wê jî em li himberî dîtinên Zekî neobjektîf bûn, di destpêkê, em qane bibûn ku Zekî li dijî partîyê ye.

Hin hevalên ku nêzî wî difikirîyan jî bona *"yekitîya partîyê(!)"* li dijî wî cîh girtin. Heta hin hevalan glasnost êlan kir, rexnê û şaşitîyên himber hev jî şûnda girtin. Lê vê taktîkê salekê fêda xwe bû. Piştî wê pirsa Bayram û Hazim derket holê.

Komîta Navendî, bi endamekî kêmkirî, gorî rojevê xebata xwe domand. Komîtê li ser xebata komîta navendî, ser rewş û bûyerên Kurdistana Rojhilat û parçên din jî rawestî xebat ber çav ra hatin derbaz kirin. Wê demê berpirsîyarên wê derê Hazim Kiliç û Zekî Adsiz bûn.

1982.10. 12

Di roja 12 Îlonê 1982 an de li Elmanyayê û hin welatên din salvegera cûnta faşîst ji alî hêzên Kurd û Tirk ve hat protesto kirin. Dîyar jî derket dervayî welat, hate Sûrîyeyê. Derbazbûna xwe bi macera bûye. Ew jî çû nuha li qampa Hilwê ye.

Îro radîo Sûrî de zanîn ku Îsraîl êrîşek nû anîye ser Libnanê.

Li gora biryara Komîta Navendî ya partîya me grubek heval divê herin Kurdistana Başûr. Lê yên ku bona çûyînê hatine bijartin, gelek ji wan bêdil in. Çimku, armanc û bername çîye, li ortê tiştek tune. Adeta partî dixwaze kadroyan meşxul bike. Yên ku li Kurdistana Rojhilat in, ne rehetin, dixwazin ji wir derkevin.

Çûyina Kurdistanê jî problem bû. Lazime tu ji Dîclê derbazî axa Kurdistana Bakûr bi, ji wê jî derbazî Kurdistana Başûr bî. Başûr cîhê ku derbaz dibin, di bin qontrola PDK- Iraq de ye. Bi PDK ra jî têkilîyên me ne başin. Partî Komunîst a Iraq bi PDK-I ve di yek enîyekê de ye. Em dixwazin bi rîya PKI derbazî Kurdistana Başûr bin. Partîya Komunist a Iraqê soz dabû me, di derbazbûna Başûr de ew alîkarîya me bike.

Lê bo ku PSKTê, êrîşa PDK-I ya ser Partî Demoqrat Kurdîstana Îranê bi hişkî rexne kir, teffiqê PDK, Partî Komunîst Iraqê jî nuha naxwaze alîkarî bike hevalên PSKT ê derbazî Kurdistana Başûr bin. Ew ji me ra vekirî naynin ziman lê naxwazin em tevî wan derbazî Kurdistana Başûr bin. Lêwma ew îro di şevaqa sibê de rabûne çûne Kurdistanê û xeber nedane me.

Piştre PKI ji me ra gotin ku navbera PSKT û PDK-Iraq ê ne baş e, ew nikarin ji me ra alîkar bin. Divê berî her tiştî em bi PDK-Iraq re problema xwe çareser bikin, ûsa nebe çûyîna me bi rîsk e. Di derbazbûnê de ew dikarin zerarê bidin we. Lê ji bona çûyînê, partîyê xwe amade kirîbû, bo malzemên leşkerî jî gelek mesref kirî bu, ew hemû vala çû.

**Cunta faşîst makezagona xwe dike dengdanê**

1982.11.07

Kenan Evren ji bona dengdana Makezagona nû axavtina xwe ya dawî di televîzyonê de roja 5 ê Mijdarê kir.

Dengdan di 7 ê Mijdarê de hat kirin û bi hêjmarek bilind makezagon hat pejirandin. Hêzên dijî cunta faşîst nekarîn giranîk ber bi çav nîşandin.

Encamê dengdanê me li Qamîşloyê di weşanên televîzyona Tirkan de guhdarî kir. Dengê erêkirinê % 69 derket. 18 mîlyonî zêtir mirovan ji destûra bingehên ra erê got. Yên ku gotîbûn na dora 1 mîlyon û nîvê bû. Lewma Ezîz Nesîn digot gelê Tirk % 70 exmeq e.

Kenan Evren gora destûra nu bu serokkomarê Tirkîyê a 7. emîn. Heta 9 ê Mijdara 1989 an ew karê xwe bidomîne.

Li Tirkîyê li himber Makezagona Cunta faşîst cîhê ku heri zêde dengê na derket Bîngol bû. Ji sedî 90 jî, na got û ji cunta ra qerta sor nîşan da. Tê bawer kirin ku li wir hêzên olperest li encamê tesîr kirîye.

Nazli di nama xwe de qala dengdana makezagonê dike û usa dibêje.

*Hevalê minê delal*

*1982.10.19*

*"(... ...) Min qala zordestîyê kir, dixwazim li ser çend dîmenên Tirkîyê jî rawestim.*

*Bûyera rojan e, Makezagon e. Makezagonê dikin, dengdanê. Ya ku Profesor Aldikaçti amadekirîye û bi dest û rûyê xwe herimandîye, Çiqasî di referandumê de "herê" an jî "na" derkeve jî, duweroja Tirkîyê nikare biguhare. Û tu wextekî bi vê makezagonê di bexçên Tirkîyê de gulîka demoqrasîyê venake. Beranberî vê jî ew bi qêrîn, bo dengdanê bangî gel dikin. Yên ku deng nedin bi cure cezan têne tirsandin. Dibêjin yên ku li dijî makezagonê ne, li dijî 12 Îlonê ne jî.*

*Bi vî şiklî ji bona parlamenteri yê 5 sal, ji bo serokkomarîyê jî 7 salan muhlet dixwazin, xwe digirin garantîyê û dixwazin, iktidara xwe heya 1990 bimeşînin planan çê dikin. Lê nizanim, hesavê pêşketinên li dijî xwe jî dikin, nakin?*

*Di vî welatê de manzareke din jî zilma girtîgehan e, ku qet dawî lê nayên. Hezaran kes di bin çavda, girtî an mehkum in. Lê ew kesana ne li gorî delîlan, li gorî daxwaz û şikan têne dad kirin, encamê de jî ya cezên mirinê an jî bi şiklê wek qedera xwe mirîye, dikujin û xebera reş dişînin dayîk û bavan.*

*Bele, evîndarê min di welat de jîyan gelek dijwar e, her kes ji derva azad tê xuya kirin, lê di rastîyê da, li himber bûyeran wekî hatîye zincîr kirin, bê denge. (... .) ji nama Nazlî yê 1982.19.10)*

Kovara Economîst dibêje li Tirkîyê destûra bingehîn a nû gelek hêz û maf dide serokkomar û hikûmatê. Ew zagonên De Guel bir tîne. OCÎDÎ 800 mîlyon, ABD 600 mîlyon dolar alîkarîya ku ji Tirkîyê ra dikirin, cemidandin.

* * *

1982.11.10

Serokê Yekitîya Komara Sovyeta Sosyalîst (SSCB), Leonid Brejnev di 10ê Mijdarê de bi kirîza dil mir. Ew di sala 1932 an de dibe endamê Partîya Komunîst. 1964an virde serokatîya Yekitîya Komara Sovyet a Sosyalist dikir. Di cîhê Brejnev de serokê KGBê yê kevn Yurî Andrepov hat bijartin.

Wezîrê Amerîkî ya karûbarê derva Alexsander Heîg got *"Andrepov 1956 an de li Macar vek êlçî kar dikir, polîtîkvanekî baş e."*

Serokê Amerîkî Ronald Reagin bi gotina *"ji alî aşitîyê ve karên me yên girîng hene."* Mesaj de Andrepov.

Serokê dadgeha leşkeri ya Golcixê hakim Eyup Menteş (birazîyê vezîrî Dadê, Cevdet Menteş) ji ber sedema ku ji gruba Kurtuluşê 4 mîlyon û nîv lîra rûşvet girtîbû hat girtin.

1982.12.14

14 ê Çileya Pêşin 9 heval jî ji Kurdistana Rojhilat hatin. Di rê de gelek çetinahî dîne, hatina wan 53 roj girtîye. Gorî agahdarîyên wan PDK-I li himber Kurdên Rojhilat û partîya wê KDP- Îran ê, şer didomîne.

Apê Selîm (Mistefa Budak) ji ber nexweşîya xwe ya bêderman derbazî Fransê bûye.

**Cara yekê ye ez telefonî Dîyarbekirê dikim**

1982.12.28

Di navbera Sûrî û Tirkîyê de hin têkilîyan destpêkir bi rîya telefonkirinê, hatin û çûyîna postê vebû. Kûrxalê min Göral ji Swîsra pir caran telefon kirîye lê me nekarî em bipeyîvin. Min jê ra nivisî ku ew di 28 ê mehê de telefon bike, ez li wê malê li benda telefona wî bim.

Min bi namê ji bo wê rojê randewû dabû jina xwe jî. Nazli, Cîran û Şergir li Dîyarbekir li mala dostekî, Selîm Atak li benda telefona min bûn. Dixwazim piçekê zû telefon bikim, 0090831 198 ... reqema telefonê pêhev dizivirînim, lê telefon dernakave. Piştî gelek ceribandin telefonê lêda.

-Rojbaş, çawayî, te ez naskirim?

Hevalê hêja Selîm Atak, ji xwe bawer û germ bersiva min da.

-Belê, min tu naskirî, Tu çawa yî? Telefonê didim ...

Bi xanima xwe ra dipeyivim. Bi germî slav lê dikim û piştî pirsa hal û demê, dibêjim jina delal, rojên han kinemir in, bona ku rojên hatî de meriv bikare serbilind bigere, lazime hin tiştan bigire çav xwe û berxwe bide. Emê bi hev ra wê dawîya van rojan bînin, meriv hêvîya xwe wek qurfekî bilind bigire. Ew ji xwe baver û bi ken li min vedigerîne: *"Tu li kêfa xwe mêze ke em pir başin."*

Morala wan a baş ez kêfxwaş kirim. Wan pir nêzik his dikim, dibêm eger ez destê xwe dirêj kim wê bigîjim wan.

Cîran bersiva min nade ... Saet 10 ê şevê ye, vê wextê lazime ew di xewa şîrîn de be. Lê ewli benda telefona bavê xwe maye û raza ye. Nuha jî ew ji bona xewa xwe ya parçekirî digîre. Tenê digîre, dengê min jî qet naçe wê. Bi Şergir re jî peyîvîm. Ji bavê xwe bixeber bû. Ji dengê wî xûya bû ku ew êdî xort bû.

Du salan zêtire, cara yekêye dengê wan dibihîsim. Lê min bêrîya wan kiribû. Piştî telefonê dinivîsim.

*Em ê vegerin,*
*Bi xwîn be jî, bi mirin be jî em ê bên.*
*Dayîk û bav şad bibin, zarok têr bikenin.*
*Heval û hevrê yê birîndar, bi hesinê jingarî ve girêdayî,*
*Azad bibin, govend bigirin, em ê bên.*
*Bazdan vê cara, bila bibe para wan.* 29.12.
Nazli di nama xwe de peyva me ya telefonê usa şirove dike.

*Delalê ... ...,*

*1983.01.28*

*Gelek wext bû, min ji te ra nenivisî, bawerdikim ji ber kar û barê minê heyî ye, tu min bi bexşînî. Nebe tu bêjî min êhmal dikî, ez çiqasî te hezdikim ji te bêtir kes nizane. Ji ber wê ne mimkune ku ez te êhmal bikim. Lakîn, bo ku berê, me dengê te nedibihîst, bi naman teselli dibûm.*

*Wexta ku min denge te xeyal dikir, tam ew wext bû, telefona te hat, lê ez nefikirî bûm ku ewqas kelecanî bim. Cara pêşin ku min telefon girt destê xwe mîna xwendewanekî keç, a dibistanê kelecanekê ez girtim, deste min lerizî, tiştên ku min xwastin bêjim di gewrîya min dabûn gire û man. Lê te carek din bi dengekî bilind ken û*

*moralek bilind, hêzbûna xwe de xuya kirin, tiştê ku min dixwast bibîhîsim jî ew bû. Wek her wext dibêjim "ez bi te serbilindim."*

*Vê gava hewa pir sar e, six six firtina radibe, çi, kî dikeve ber digire dibe. (di virda qala kirinên cunta faşist dike.) Di vî welata de hemû meqanîzmên din rawestîne, yê ku rind dixebite tenê meqanîzma zilm û êşkencê ye. Kurapekî min jî ber didanên vê meqanîzmê ket û hate xwarin (kuştin). Tu wî nasnakî, meriveki usa bû ku A, B, C nasnedikir, di cîhê îmzê de tilî pêda dianî.*

*Ji alî din ve zanîngeha (girtîgeha) ku doxtor jê dîplom girtîye gelek kes hat qeyit kirin. Berê hemwelatîyê min Sari C. Pê wî mîna goreyê werşîyayî kesên ku tu texmîn dikî û doxtor Can.*

*Berî ku va firtina zerarê bide min tayîna min derkeve, (derkevim dervayî welat) û dawî li van rojên hêjmartî bê ez ê xwe bi şans nav bikim û gelek kêfxwaş bim.*

*Nuha bêm ser keçên me, ew pir nerehetin, ez nikarim wan bidim sekinandin, dikarim bejim ew asi ne. Sedemek vê jî tunebûna te ye, eger rojên hêjmartî biqedên bawerdikim ew jî baş bi bin.*

*Em baş in, îro rewşa Şergir fêr bûm, ... ... xwe hene, wî soz da ku bixebite û wan serast bike. Pêra peyîvîyam dibêje hîşê min pir belawela ye, tiştê ku dixwînim fêm nakim.*

*Ders û tenduristîya zarokên din başin, dayîka wan jî baş e, ji we ra silav dişine. Mexpule û zarokê wê jî baş in û ew jî ji we ra slav dişinin. Piştî ku Cengo çû gund ji ber rewşa hewayê me agahî ji gund negirt. Bi telefonê Husnîyê ra dipeyivim, baş e. A nuha Cîran dixîskê, jê dipirsim, keça min çi bû? Dibêje bavê min di dil min de ye û bi min re dipeyîvî.*

*Herê ..., ez li ber qedandina nama xwe me, ji doxtor begê û yên din ra slav û hezkirina min bêje.*

*(... ... ...)*

*Li welatê me berfa sipî ya ku sembola paqişî û xweşikîyê ye; bi comerdî hemû xweşikîya xwe pêşkêş dike. Zivistan, lê zivistana reş berdevam e.*

*Bi dile tujî slav û hezkirin. îmze (Nazli, ji bo ewlehîyê nav tune.)*

*Benda telefona te me.*

*Numira telefonê: 81811...*

* * *

1983.01.14

Îro sibê de em ji xew şîyar bûn berfê der û dor sipî kirîye. Min di oda xwe de xwe cemîdî hîs kir.

Li gorî agahîyên radîyoyê li Dîyarbekirê hewa sar e, di binê sifirê re – 19 derece ye. Li Dîyarbekirê apartimanek jî hêrifîye, sê mirî, gelek jî birîndar hene.

Di vê hewayê de kesên ku derwane, bona ku nekevin destê dijmin xwe diparêzên, yên di zîndanan da, lêdan û êşkencê de ber xwe didin jî hene. Min xwe kire cîhê wan ez zêtir cemidîm.

Fikra min çu gundê min, rojên kevn. Nêçîra kewan, lîstika bi go yên berfê, di kaşan de xwe xijkirina ser berfê, hat bîra min.

Roja ku berf gelek dibarî hemû xort û mêran ji êvar de xwe ji bo nêçîra kewan amade dikir. Di şefaqa sibê de gundîyan cot çoyên xwe digirtin bi hayleme, di ser çem de diçûn. Çemê Gêxîyê-Pêrê ji herdu alîyan ve bi nêçîrvanan ve dihate dagirtin.

Kewên ku jî alî me radibûn diçûn himber, pir caran nedikarîn carek din firdin, li wir dihatin girtin.

Yên ku ji himber firdidan dihatin jî û li alî me dihatin girtin. Di berfa nerm de kewê nedikarî xwe li ser berfê bigire û di berfê de diçû xar. Yek du firdanan şûnve per û baskan alîkarî nedikir.

* * *

Duh Dîyar û Avdila tevî hevalê Saleh Qitî çûn Kobanî yê. Partîyê Dîyar û Avdila ji bona li dervayî welat bixwînin perwerda xwe biqedînin bijartin. Avdila di zanîngeha Edenê ya mendizî, Dîyar jî di zanîngeha Dîcle de ya bijijikê dixwend.

Di navbera 1 û 9 Sibatê li Qamîşlo û Hasekîyê derbaz dikim. Li herdu cîyan jî malê partîyê heye û heval lê dimînin. Bi wan ra cîvîn çêkir û li ser rewşa welat em peyîvîn. Agahîyên ji welat tên, nebaş in. Gelek heval û dilxwaz hatine girtin. Di girtîgehan de êşkencên ku li girtîyan tê kirin bê sînore.

Hin berpirsîyarê partîya me jî ji karê nava welat bêtir, hevalên ku xwe avitine dervayî welat ceza dikin, vê cara jî Dîyar û Bîlal Aksoy kirin, hedefa xwe. Ji bona ku Dîyar û Bîlal wexta ku derbazî Qamîşloyê bûne, bi raporekê, rewş û xebata partîyê ya li welat û dîtinên xwe nivisîne, dane partîyê. Wan di raporê xwe de nivisîbûn ku "li welat xebat tune, hin kesên ku partîyê berpirsîyarî dayê, bi xebat û qadroyan ra têkildar nabin, perê partîyê di cîhên tarî û xerab de xerc dikin. Hin endamên komîta navendî jî mesajên şaş ji bingeh ra dişînin û bin dest ra dijitîya partîyê dikin."

Bîlal Aksoy ji Şamê şûnda hat şandin, ew vegerî welat, li wir hat girtin û bi êşkencên giran ra rû bi rû ma.

Bi welat ra têkilîyek durist tune, ji sedî zêtir endam û dost di zîndanê de şerê mirin û jîyanê didin, li hinekan jî tê gerandin. Lê, ev endamên komita navendî ji bona wan kesan tiştekî naynin rojevê, di dora pêşin de pirsên şexsî tînin rojevê û bazarîya şexsîyeta xwe dikin. Ew, hin kesên ku xwe ji zilma faşîzmê xilaskirine, hatine wan ceza dikin.

Lo berpirsîyarên partîyê, hûn, hîm jî ji cezadayînê têr nebûn e? Hewildanek bêîsabet û xebatek bêkêr. Têkoşînê berê xwe daye nava partîyê

1983.3.5

Piştî nîvro ji şirketa otobus a Qamakê min bilêtek girt ji Şam, terim Qamîşloyê. Hewa gelek germ e. Otobosê li Dêrazor navber dayê, rêwî peya bûn pêwîstîyên xwe bi cîh anîn. Çemê Feratê ji vî bajarî ve derbaz dibe. Çemê ku ji çîya yên Kurdistanê bi coş diherike û tê li vir ser nerm dibe. Ji ber ku besterobara xwe freh dibe, ew, gran gran dikişe. Çûm, li ser pirê sekinîm û min li çemê welatê xwe sêr kir. Min nekarî, dakevim, kiraxê çêm û ji ava welatê xwe mistek av bigirim û pê sûretê xwe hunik bikim. Lê ji bo ku bi şiklekî xwe bigînim ava Feratê dismala bêrîka xwe derxist, wek dîyarî berda nava avê.

Ji dûrve konên ereban, kerîyê pezê wan xûya dikir. Li ser rê, kal û pîran xwe dabûn ber rojê. Piştî rojên sar li ber roja Adarê xwe germ dikirin. Bihara vir zû tê. Him hewa germ bû, him jî, bo heywan xwe têr bike, çêre hebû.

Derbazî Dêrikê bûm, li wir bona ku heval bikarin, herin, Kurdistana Bakur û bên di sînor de li rêyekê digerim. Kesên ku rêberîyê dikin, bo alîkarîyê soz dan.

Gola ku li Dêrikê hatîye çêkirin, dîmenê bajar guhartîye. Refê ordegan ji golê kêm nabin, yek radibe, yek tê.

Keçên xweşik û bedew bi çekên xwe yên mor, sor û zer tevî lavan li dora golê kubar kubar digerin. Ew tablo destana Mem û Zînê tine bîra merivan.

Ji Dêrikê çûm Qamîşlo û Hasekîyê, çend roj bi hevalên wê derê ra derbaz kir. Ji wir jî vegerîm Şamê.

1983.04.1

Îro 8 heval ji bona perverda yek sal û pênc salan rêwîyên Sofyayê ne. Lê balafira ku divê saet 7.30 ê sibê de rabe, ranebû, ew ma 18.30 êvarê. Heval vegerîn hatin mal. Balafir wê saetê de jî ranebû, saet 24.30 de ango dora roja din 2 yê Avrîlê rabû. Di rojhilatanavîn de ew tişt normal in.

Li vir wext ne bi saetan û bi deqîqan bi rojan bi heftan tê dayîn. Wek mînak dibêje "em sibê hevûdû bibînin." Bi gotina "sibê" ji sibê heya nîvê şevê îhtimala we ya hevdîtinê heye.

Di encamê de hevalên rêwî çûn. Ez jî hatim Helebê. Şev li ba Mamoste Mehmed mam. Ew bi xwe ji Dêrikê ye û li zanîngeha Helebê de dersdar e, merivekî welatparêz û dilsoz e. Karê min li Kobanîyê heye. Dora roja din jî çûm wir. Wê êvarê hevalên ku diçûn Bakurê welat derbaz bûn.

Ez û hevalê Avdila çûn Efrînê. Efrîn li himber Entavê ye. Ji dervayî hin memûrên Ereb, gelê xwe, hemû Kurd e. Li gorî Amûd, Qamîşlo, Kobanîyê û Dêrikê, Efrîn, erdê xwe yê çandînîyê kêm e. Lê ji alî hêşnayî û meyve ve gelek dewlemend e. Bexçên zêytûnê, hêcîr û rezan ji derên din pirtir in. Cîhê xwe jî bilind, havîna xwe li gorî derên din hunik e. Şeva pêşin me li mala Îbrahîm- eqrebê Avdila derbaz kir. Dora roja din me Îsmaîlê Hesinker û Mihemed Qazixliyê arzuhalcî, naskir. Herdu jî piştgirên Partîya pêşverû ne. Îsmaîl merivekî haltenik, kedkar û mûtevazî ye. Bi têkilîyên xwe yên germ û dost bawerîyê dide merivan. Em heya nehîya Şêxhedîd çûn. Şêxhedîd 700 mal e, pişta xwe daye sîngekî ku havîr bi baxçe û bostanan ve hatîye xemilandin. Navbera Şêxhedîd û sînorê Tirkan 5 kîlometre ye. Lê gundê herî nêzikê sînor Kirmetlix e. Dora roja din em ji Şêxhedîd bi ereba dawetê ber bi Efrînê, heya Cendersê hatin. Şev me li Efrînê cem Îsmaîl derbaz kir.

Saet 7.30 sibê em terine Helebê. Roj derketîye, dilopên barana ku êvarî barîye, di binê tirîjên rojê de li ser pelên daran û gîyayê dibiriqin. Navbera Efrîn û Helebê 60 kîlometre ye. Saet li dora 9 an li Heleb ê nezî parqê em peya bûn. Avdila çû hevalê Şêxmûs ji male bîne.

Ez ji nêzî derê parqê li ser qanepekê rûniştim li benda wan im. Qenepên din jî hemû tujîne. Hin kalepîr bîna xwe distînin, hin kes rojname dixwînin. Lê angorî ku do baran barîye dîsa heva germ e. Parq qelebelix e, li pêş dengê muzîka Kurdî tê. Min guhê xwe dayê M. Arif bi dengê xwe yê xweş kilama *"ay ay li min, li min li min, rebenê dîn ê"* distirîya. Di navenda vî bajarî de va qêrîn, min li himber dagirkeran wek serî rakirina gelê xwe dît. Bi vê yeka kêfa min pir hat. Di vê navberê de min Sûrîye û Tirkîya, jî nasîna mafên Kurda da, de berhev. Tirk ne hebûna Kurda ne jî çanda wan qebul nake, lê li Sûrîyê muzîga Kurdî azad e.

Heval hatin em çûn îstasyonê, lê me xwe negîhand trênê, ew saetekê berê rêketî bû. Ji ber ku ji duh va saet hatine guhartin, saetek girtine pêş û haya me jê tune. Me bilêtên xwe ji bo dora rojê, saet 06 ê sibê guharî û em çûn mala Kurdekî. Malbat nasê hevalê Avdila bû. Mal li taxa feqîran bû û ji bajar gelek dûr bû. Dora roja din saet 5 ê sibê em rabun ku xwe bigîhînin trênê.

Me rêwîtîyek rehet derbaz kir. Di tirênê de rêwî bi solên xwe li ser qoltixan dirêj dibûn, tu kes tiştekî nabêje. Mirov li himber hev dostin.

Em ji Dêrazor pira ser Ferat ê derbaz bûn. Ferat li vir pir giran diherike, belkê naxwaze ku gavekê zû hebûna xwe tevî behrê ke, di wê de wenda bibe.

Em îro 14 ê meha Avrîlê li Qamîşloyê ne. Min nama Nevînê ya ku 22 yê Sibat a 1983 an de nivisîye , 54 rojan şûnda, girt.

***

*1983.2.22 Kekê min ê Delal,*

*Bawer bike ku bi nama te gelek şa bûm. Di her namê de te li min pirsîye, ez pê agahdarim. Lê min nekarî ez ji hebûna xwe te agahdar bikim. (... )*

*Ji bo Nazlîyê tu dibêjî, "cîye xwe ku sar e bila biterikîne." Nuha ji bo terikandinê sedem tune ye, lê dikare bibe jî. Çimku, mehekê berê ba û bahozek gelek sar ji Çolîgê, destpêkirîye û hîn jî didomîne. Sedema serma ya wê derê Sari C. ye. Tê gotin ku wî kesê dizanî, nedizanî, şaş û rast gelek tişt gotîyê. (... ) Vê bayê sar heta Stenbolê tesîr kirîye.*

*Wekî din jî apê me li gund bo lêpirsînê birine heftekê şunda laşê wî yê pêrîşan, bê can, cinazê wî teslîmî malbatê kirin. Vê yeka em pir xemgîn kir. (... )*

*Ji bo telefonkirinê te ji min nimare xwastîyê, lê nimara ku bikarim bidim te tune. Bi şertê ku tu rojê belu bikî û bikarî şev telefon bikî, ez ê numerekê bikarim bidim.*

*Li vir bi kurapên te ra têkilîyên min hene. Fadil 10–15 roj bû hate girtin. Rewşek ne ewqas ciddîye, dikare derkeve. Nevîn,*

1983.04.17

Em hin heval terin mala me ya Hasekîyê. Kesên berpirsîyar hatîye danin nikare di heqê wî karê bêder, heval jê destxweş ninin. Hevalekî din Vahap Karahan di dewsa wî de kar girt.

Li Hasekê mala ku me kirê kirîye, xanî ji axê ye, yek qat e û gelek kevn e. Hewşa xwe ji kerpîçan bi diwarek nezî du metran ve hatîye girtin. Hin heval sibê sibê li bexçe spor dikin, lê piranîya hevalan xewê dibijêrin. Li Hasekê tevî hevalan rojên me tijî derbaz dibin.

Casim Urun nîvrojê, ji Nîseybînî sînor derbaz bû hat Qamîşloyê. Wî ji Gazî ji bo min parçek name ji xwe ra anîye. Gazî û zarokên min li Nîsybînê ne, wan nekarîne derbaz bin. Ew, pere dixwaze û behsa kêmfirsendîya qaçaxçîyê Nusaybînê dike. Yên ku soz dane, wan ji sînor derbaz kin, ew derbaz nekirine.

Partî yê biryar girt ji hevalê welat re nivisî, ku jina min Nazli derkeve Sûrî. Ev nama sekreter di sekirina mala berpirsîyarê partîyê de ket destê polês.

Ser vê ez zêde nerehet bûm, çimku polîs li ser wê namê dikare jina min bigire bin çavan. Bona wê min dixwest gavikê zû ew derkeve derva.

Min xeber girt ku Nazli tevî sê keçên me hatîye sînor, lê nikarîye derbaz bibe. Kesên rêber jê xwestine, ku du zarokan li welat bihêle, wê wextê derbaz bûn rehettir bibe. Xeberek nebaş, difikirim gelo kîjan zarok wê li welat bimînin, wê kîjan zarok jî dayîka xwe veqetin? Bermala du salinî, Bejna sê salinî an jî Cîrana 5 salinî?

Lê xûyaye ku ev pîyango li zarokên piçûk xine. Her çiqasî ew zêtir mixtacê dayîka xwe bûn jî destûra veşartî derbazbûna sînor, dest nedida.

Min ji Şamê telefonê Stockholm kir, bi hevalê Weysî ra peyîvîm. Kekê Mistefa, li Stockholmê di nexweşxanê de bû.

1983.05.16

Îro barana ku li Qamîşloyê barî, firtina ku li vir rabû gelek kesên ku li vir dijîn, dibêjên wan di temenê xwe de ew yeka nedîtine. Cîranek nikare here mala cîranekî. Şev birûsk dijenî (lê dide), der û dorê mîna rojê ronî dike. Ba û bahoza ku tê, tu dibêjî, wê sîwanê-esraqê xanî rake.

Dora roja din bi telefona Xanima Hemîd Dewrêş, Leyla ez çûm mala wan mîvanên ku ez li bendê bûm, Nazli û keça min Cîran, li pêşberî min bûn. Tu nabêjî di firtina şeva duh da, ew di rêdabûne. Cîran ji der û dora xwe xamîyê dike. Qet nahêle ez destê xwe bidimê.

Ez û Nazli yê dûrûdirêj sohbet dikin. Gelek tişt heye ku em ji hevre bêjin. Li piranîya peyva me li ser rewşa zindan, lêdan û êşkencê ne.

Cîranê seranserê şevê xwe aciz kir û nikarî razê. Agirê xwe jî heye. Em difikirin ku doh rêva xwê cemidandîye. Sibêda me bir ba doxtorê Kurd Îsmaîl. Piştî miyaneke, wî da zanîn ku keçik nexwaşîya sorikan ketîye.

1983.05.27

Li gorî ragîhandina radîo û TVên Ereban leşkerê Tirk 30 km. kurahî ketîye Kurdistana Başûr. Me êvarî radîo ya BBC guhdarî kir. Wan jî şirovekirina wezîrê karê derva ya hikûmata Tirk da. Ew îddîa dike ku operasyon, li ser daxwaza hikûmata Iraqê û bona ku sînorên xwe bigirin bin ewlehîyê pêk anîne. Ew bi kurayî 30 km. ketine axa Iraqê û ji wan ra tu astengî çênebûye.

Dewleta Tirk ketina axa Kurdistana Başûr ji xwe ra maf dibîne. Wê demê mana “şerê li dijî terorîstan” jî li ortê tune bû û PKK jî ne li Qendîlê li Beqayê bû.

Gotin cûrbecûr in. Li gor qeneatê gel û agahîyên ku di nava gel de belav bûne, hêzên pêşmergen Başûr berî êrîşa dijmin herêm terikandine.

Di nava hêzên Kurd (yên ku li Qamişlo ne) de hevdîtin û civîn têne çêkirin. Li ser tesîr û encamên êrîşê leşkerê Tirk tê peyvandin.

1983.07.09

Îro ji Kurdistana Rojhilat dilxwazên PSK-T, Ala-Rizgarî, Partî Komunista Iraq û Yekitî Niştiman grubek mezin hat Qamîşloyê. Ji bo xêrhatina hevalên ji Kurdistana Rojhilat em li mala Ala- Rizgarîyê ne. Heval di şertên pir dijwar de hatîne û rê dora

du mehan wext girtî ye. Hevalên me yên ku ji Kurdistana Rojhilat hatîbûn me li du malên Hasekî û Qamîşloyê beş kirin.

Ew kesên ku ji Rojhilat hatine nakokîya nava xwe li kesên din jî gerandin. Ew nerehetîya ku di nava hevalan de hebû, bi hatina wan zedetir bû. Mirov eşkere dibîne ku di nava endamên partîyê de du bendî heye.

## Komîta Navendî ya partîyê dest bi civîna xwe kir.

1983.09.21

Endamên Komîta Navendî bo civînê ji Ewrûpê hatine, li Şamê ne. Ez jî li Qamîşloyê me, tevî Nazli û Ciran ê em terin Şamê. Di roja 1983.09.21 civîna Komîta Merkezî dest pêkir, 1983.10.10 de dawî lê hat. Di civînê de li ser gelek xalan hat peyvandin, lê piranî li ser problemên nava partîyî bû. Civînên komîta merkezî bê problem derbaz nedibûn.

Gora min di nava partîyê de hîzip hebû. Du endamên komîta merkezî cîhê xwe yê partîyê li himber polîtîka partî û endaman xirav bikartînin. Nîfaqê dikin nava endaman, bi zanetî qadroyan ji partîyê dûr dixinin, kesên nêzikî xwe diparêzin. Min dîtin û rexnên xwe yê ser vê yekê bi niviskî pêşkêşî partîyê kir. Qismek ji rapora ku min pêşkêşî Komîta merkezî kir li jêrêye.

**Ji Komîta Navendî ya PSKT ra**

Naverok: Di partîyê de hîzîp heye. Li ser kirinên Bayram Ayaz, Hazim Kiliç û hin kesên din.

Burjuwazîya piçûka ku xisusîyetên xwe yî çînayetî wenda nekirîye bi zanîn an jî bi nezanî hin daxwazîyên xweyî çînayetî derbazî nava partîyê dike. Partîyên pêşverû, welatparêz bona ku qadroyên xwe ji vê çavkanîya burjuwazîya piçûk digirin divê gelek şîyar bin. Qasî ku li himber dijminên derva ditekoşin, divê ew li himberî nexwaşîyên nava partîyê jî bê vestan bitêkoşin.

Partîya me ku li Kurdistanê çîna karker û gundîyên haltenik û feqîr rêz dike, di şerê azadîyê de çavkanîtî ya bawerî û rêbertî ya xwe didomîne û li himber hîzîp û kesên ji rê derketî jî divê wextê de raweste. Va rawestin, parçek ji berxwedana dijî faşîzmê, qolonyalîzmê û emperyalîzmê ye.

Oportunînîzima her welatekî hin xisusîyetên xwe hebin, jî yê hemû welatan xalên xwe yên hevpar jî hene. Ev jî ev e, ku, oportonîzim ji hevûdû ders digire, ango hevûdû taqlît dike û ji marxsîzmê ra neyartîyê dike. Oportunîzim, dijminê îdeolojîya çîna karkeran e û di nava berxwedana karkeran de wek du cure, oportunîzma *"çep"* û *" rast"* derdikeve holê.

Oportunîzma rast, hêza proleteryayê piçûk dibîne, hêza dijmin mezin dike, histuxwarkirinê û qanaatkarîyê tawsîye dike. Îktidara karkeran red dike û reforman bilind dike.

Oportunîzima çep jî di polîtîkayê de sekter e û maceran hezdike. Şertên objektîf tehlîl nake û bûyeran bi mantikek tenik şirove dike. Wek Dîmîtrov jî dibêje,*"ji bona wan behr heya panîyê e."*

Ew, şert û rewşa heyî nagirin ber çavan, hêzên dijmin piçûk dibînin û yên xwe jî pir mezin dikin. Gotinên şoreşgerî û sloganên tûj pir kartînin.

Gelemperî, qarekterek oportunîstî bêtarîf kirin ev xisûsîyetên hevpar têne ber çavan: Çavên xwe ji xwe bêtir kesî nabînin, xwedîyê hemû berxwedan û tekoşînan ew in. Egoîst, qûrnaz, menfaetperest û qaypaxin, (durûne). Malokên bêhestî, bêsoz û bext, bê prensîb in. Li ser Marksîzm û Lenînîzmê pir dipeyîvin, lê bi hin baxşîşên erzan xwe difiroşin, têne xesandin. Kêmfirsendin û li himber rastîyan tirsonek in. Ji ber ku sedemên ku wan amade dike, wan derdixine holê, yek jî sedemê civakî û aborîye.

Di Kurdistanê de burjuwazîya piçûk piranîye û her roj bi qadroyên ku derbazî partîyan dibin, nexwaşîya oportunîzimê jî bi xwe ra tînin. Dîroka tekoşîna şoreşan û Îlma Lenînîzmê nîşan dide ku, heya ku li himber oportunîzimê û ajanên burjuwazîya piçûk a nava partîyê têkoşîn neyê dayîn, partîyên pêşverû û demoqrat nikarin serkevin.

Demikê berê partîya me, li ser hin problemên nav xwe rawestîya, lê hin oportunîstan xwe qelizandin, mîna baçermokan li benda tarîya şevê man. Destpêkê de bi zanistî cudabûna xwe ya îdolojîk veşartin, berê xwe dan rexnekirina kesan. Va taktîk kevneşopîya hemû oportunîst kes û gruban e.

Hin şaşitî û kêmasî bi tezebûna partî û qadroyan va hate girêdan. Divê partî yekitîya xwe girîng bigire û li himber şaşitî û dijitîyan bi biryar tevbigere.

Îro partîya me di nava gel de kok berda ye û ji çîna ku temsîl dike piştgirtîyê digire. Lê li himberî wê jî şerê li dijî faşîzmê û qolonyalîzmê dijwartir bûye, xebat nêzî çembera agir dibe.

Di Tîrmeh û Tebaxa 1982 an de organa partîyê li ser pirsên partîyê yên der û hindur rawestîya hin biryar girtin. Mixalefeta Zekî jî yek ji wan pirsan bû. Partî bi bînfrehî li ser pirsê sekinî û ew çareser kir. (…..)

Eger partî bi biryar nebe, xwedî dîsîplînek merkezî nebe û bi prensîp nebe, bi dijmin ra şer binketinê tîne. (…..)

Wexta ku li ser mixalefeta Zekî hat nîqaş kirin, partîyê wek taktîk nexwast enîyê fireh bike. Ji kesên ku navê xwe li Kurdistana Rojhilat û Bakur bi mixalefetê derbaz dibûn ra çavê xwe girt. Wan kesan jî xwe veşartin û wek dizê jêhatî nuha jî derketine, xwedîyê malê gûnekar dikin.

Ew, di cîhê ku navê wan wek mixalefet derbaz dibe, hesavê wê nadin, ew nîqaşên ku li ser hîzbê tê kirin derdixinin pêş. Bi kurtasî pirs tê serberjêr kirin. (…….)

Têkoşîn, berxwedan bi qadroyan bilind dibe û tê domandin Ji alî kî ve hindek hucre xwe nûva dikin û alî din ve jî wek nêynûg û nasir hin hucre jî dimirin. Hin kesên ku di partîyê de paşgotinî dikirin, mixalefeta Zekî jî, xwe ra kirin sedem dev ji partîyê berdan çûn. Rewşa demê, dijwarîya şertên bîyanîtîyê, propaxande û kirinên kesên berpirsîyar ji di veqetandina wan kesan de sedemin. (…..)

Wexta ku em li welat, ser kar û barê xwe bûn, xwedî maaş bûn û kîngê jî dilê me dixwast me" şoreşgerî dikir" helbet rehet bu. Lê piştî ku têkoşîn pêşket, şert hatin guhartin, berxwedanê xwîn û fedekarî xwest, wê demê jî ji partîyê veqetandinan dest pêkir. Di wan şertan de van tiştana jî normalin.

(….)

Partî, di fikra xebatê, ya hevpar da, pêkanîna prensîpan da, rexne û biryaran de divê paşve gav nevêje û dîsîplîna nava partîyê û yekitîya partîyê bilind bigire. Gorî bawerîya min di veqetandina hin hevalan de jî berpirsîyaran bi zanebûn karê xwe nekirin. Ji ber ku Siddiq Bozarslan Li Qamişloyê 1982.09.09 an de 6 rûpel nivîs daye Bayram Ayaz, bona ku ew wan bigîhîjîne Komîta Navendî.

Lê Bayram nivîsa Siddiq nanî bû ciwîna roja1982.09.17 an. Di wê civînê da, li ser moral, berxwedan û qabîliyeta qadroyan hat sekinandin û kar li wan hat beş kirin. Lê Bayram ew nivîsa Sidiq nanî bîra xwe jî. Halbuku ew heval di derheqê partî û qadroyan de xwedî rexne û dîtin bu. Berî wezîfedarkirina wî lazim bû rexnên wî bihatana bersivandin.

Ji rexnên Siddiq bêxeber komîtê ew li Kurdistana Başûr wezîfedar kir. Dema ku jê ra hat gotin, wî ji partîyê îstifa kir.

Di vir da, bi zanetî çerxa partîyê tê sabote kirin. Bayram hin tiştan mîna dedektîv dişopîne, lê rexnê endamekî, ku li ser tê peyvandin bîra dike! Eger ew ji komîta navendî re bêje "*nivîs û rexnên wî hevalî jî hene, berî wezîfedarkirinê bi wî ra bê peyvandin.*"

Ew çima wê nivîsê bîra dike? Di nivîsa Siddiq de tiştên ku têkilîyê Hazim û Bayram xirav dikin hene.

(……)

Dawîyê dibêje ku: "*Hazim, ji ber kirênên xwe lazime ku bê ceza kirin. Lê ez dibînim ku ew girtine Komîta Navendî ya partîyê, va min dike fikaran.*"

Di navbera endamên komîta navendî de bawerî, kêm e. Hazim û Bayram têkilêyên xwe germin, li hev tesîr dikin, li himber bûyeran ne objektîfin. Herdu dikarin li himber hevalekî bi hev ra neyartîyê an jî dostayetîyê bikin.

Ji bona çûyîna Kurdistana Başûr em hatin Qamişloyê xwe amade bikin. (….) Li gorî biryara partîyê ez û Hazim li Kurdistana Başûr wek mesulê partîyê hatîbûn wezîfedarkirin.

Hazim ji çûyîna min nerazî bû, got *"eger tu bê ez narim."* Hin sedemên ne di cîda anîn ziman. (……)

Hazim dixwest ku li Kurdistana Başûr an jî li Rojhilat tenê be, *"qomutanîya xwe"* bi kesî ra parve neke. Daxwaza wî ew bû ku, berpirsîyarê partî ya yekem ew be, derfet û otorîta partîyê ji bona malbat û eşîra xwe karbîne. (… …)

Sedeme ke din jî ew bû, di civîna 1982.07.4 da, komîta navendî, ji ber hin şaşitîyên wî ya li Kurdistana Rojhilat, biryar girtîbû ku *"Hazim tenê bi serê xwe nebe berpirsîyarê malî û têkilîyên sînor"* Lê wî dixwast bi tenê çûyîna xwe biryarê jî pûç bike.

Bayram jî bîrima ku lê dima teref digirt. Rexnek Gazî ji xwe ra kir sedem, ji bo tolgirtinê hewl da û sekinî. Li gorî xwe hin kes sucdar navkirî bû û dixwest, yên mayîn jî wan, wer bibînin. Bayram, hevalên ku bi partîyê ra girêdayîne, dilsozin bona ku ji partîyê durxine gelek taktîkên qirêj bikar anî. Ji hin kesên ku ji partîyê veqetîyabûn, an jî kesên ku di bin tesîra wî dabûn li diji wan hevalên dilsoz, raporên sexte digirt.

Çîye pirsa Bîlal Aksoy, salane hûn ji Bîlal çi dixwazin? Bîlal wexta ku derbazî Qamişloyê bûye gotîye ku,*"li welat tê gotin ku Zekî serkêşîya mixalefetê dike, Hazim û Bayram jî pêra ne."*

Ji ber ku wî dîtin û rexnê xwe dabu partîyê jî, di nava hevalan de spontane belavkirîna wî, partîyê, şaş dît û Bîlal ji ber vê yekê hat cezakirin.

Lê bona ku wî ceza û zerar girt çavê xwe ew tişt belavkir, fêyda xwe jî bû. Hin hişyarî anî û lîstikên hin kesan deşifre kir. Di nava mixalefetê de navên Bayram û Hazim jî derbaz dibû. Yek alî li ser Bîlal paştagotinî tê kirin, lê li himber kesên ku di nava partîyê de neyartîyê dikin çi tê kirin?

Hin kesên ku ji partîyê veqetîne, kîngê dixwazin têne mala partîyê û terin, bi hin endamên din ra têkilî datînin û propaxanda dikin, Bayram li wê derê yekem berpirsîyar e, ji van ra çavê xwe digir e.

Ew cot standardîya bala hin endaman dikişîne. Bayram bi zanetî hin kesan ji partîyê dûr dixine, dike nava mixalefetê, dîsa bi zanetî ji xebat û organîzebûna mixalefetê ra çavê xwe digire.

Hin kesên ku ji partîyê veqetiyan derbazî Bakûr bibûn, yek ji wan roja 11 Îlon ê 1983 an de tevî sê endamên partîyê vegerîya Qamişloyê. Wê rojê ez li ba hevalê Hasekîyê bûm, berpirsîyarê Qamîşloyê telefon min kir got: "ji welat heval hatine û A.O jî tevî wan hatîye malê, ew çi bike?"

Saet 24.00 şevê trênê sîyar bûm çûm Qamîşloyê. Ji hevalên ku ew bi xwe ra anîbûn ra peyîvîm, wan li gorî xwe sedem nîşan dan.

Gotin eger ew bihatina girtin zerar dida partîyê, lewma me ew bi xwe ra anîye. Lê ez bi wî ra jî rûniştim peyîvîm. Min got, *"te him li Sûrîyê him jî li Bakûr dijî partîyê gelek propagande kir. Di nava endamên partîyê de li dijî te reaksîyonek xurt heye. Eger di dîtinên te de guhartin çênebûne, tu nikarî di mala partîyê de bisekinî. Îşev ne lê sibê divê tu ji vir herî."*

Wî jî got ku dîtinên wî nehatine guhartin ew ji xwe naxwaze di mala partîyê de bisekine û dora roja din jî çû.

Piştî çend saetan ji malê çûyîna wî, Bayram hat Qamîşloyê. Bi hêrs got, *"Te çava hevalê A.... ji malê qewirandîye, tu li benda min bi mana... Piştî hin qelebelexa Bayram"min got hevalê Bayram, berpirsîyarê vira ez im, min va rast dît û usa kir, eger tu şaş dibînî dikarî di komîta navendî de vê yeka rexne bikî."*

Bayram di cîda xwe gûhart got "welle te ya rast kirîye, tewrê te tewrekî şoreşger e, te baş kirîye." Nizam ew çima ewqas zû îqna bû?!

Bayram li gorî xwe hin tasarufan dike. Ew di komela mamostan de xebîtîye, hin caran xebata partîyê û xebata komelê dişibîne hev.

(... ...)

Gazî li Qamişloyê berpirsîyarê partîyê bû. Piştî ku Gazî ji gotin û kirinên Bayram ra na got, ew ji berpirsîyarîya partîyê a Qamişloyê hat girtin. Dawî yê jî bo ku navê Gazî di nava kesên ku herin Ewrûpayê bixwînin da derbaz dibû, Bayram dîploma Gazî çirand avit. Qadroyên ji partîyê ra girêdayî dehf dida dixwastin ji partîyê dûrxinin. Nazim, Gazî, Yavuz, Abdullah û Bîlal bibûn qilçixê çavê Bayram. Bi kurtî, mirovên ku karê welatperwerîyê ra mijûl dibin, divê bi ewqas tiştên piçûkra mijul nebin û zêtir bi şexsîyet bin. (... ...)

Bi bawerîya min ew nexwaşîya ku li Îranê, li Ewrûpê û li Sûrî di nava partîyê de xwe nîşan dide yek e, vîrusa hîzibîyê ye. Bayram û Hazim bi tirsonekî di rêça Zekî de terin. Di ziman û fikir ramanên wan de têgîhiştinek hevpar heye. Di têkoşînê de mirov dikare şaşitîyan jî bike, lê ya girîng ewe ku şaşitîyên mezin neke. Dibe ku me jî hin şaşitî kirine. Lê bi rê û rêbazên şoreşgerî em hevûdû bikarin rexne bikin û dev ji wan berdin. Tu, him mîna Papaz Gapon provakatorîyê bikî him jî di mistek av de firtone û bahozan derxinî, ew tişt hevûdû nagire. (... ...) Navê partîya me sosyalîst e lê herdu endamên komîta navendî û hin*"zarokên eşîrê "* li dora xwe komkirine bi tawrekî eşîrî tev digerin.

***

Partî Komînîst a Iraqê li himber Yekitîyê di nava şaşitîyan de ye. Ji dijitîya navbera PDK-I û Yekitîyê ew fêde dibîne.

Divê Partî komînîsta Iraq ji ber şaşitîyên xwe bê rexnekirin, rexnekirina partî komînîst nayê mana antî-komînîzmê. Dalqawuxî kirin, xeletî û şaşitîyan ra çavê xwe girtin oportunîzm bi xwe ye.

Ji bo ku ez li himber tevgera Kurd kêmasî û şaşitîyên Partî komînîsta Iraqê rexne dikim, *"zarokên eşîrê"* li dijî min propagende dikin ku têkiliyên me ya bi *"hêzên dost"* ra qels bûne!

Di roja îro de yên ku partî komînîst pir diparêzin El Partî ye! (El Partî di eslê xwe de li dijî dîtinê çep e, lê bona ku Partî Demoqrat Kurdistan- Irak tevî Partî Komînîst -Iraq, tifaq çêkirîye, Partî Demoqrat Kurdistan- el partî jî, ji ber wê tifaq ê destek dike.)

Oportunîstên me jî bi têkilîyek usa, têkilîyek ya bi eşîrî partî Komunîst ve girêdayî nebin? Çim ku li Kurdistana Rojhilat civîna ku mixalefeta PDK-Î ê û PDK-I raq pêk anîbû, Hazim jî ser navê partîya me bejdar bibû. Halbuku wê demê PDK-I tevî hêzên Îranê êrîşî ser PDK-Îran dikir. PSK-T ew êrîş bi îxanetê sucdar kiribû.

Ne antîkomunîzm, ne jî, ji şaşitîyên partî qomunîst ra çav girtin nerast in.

Ne *"oportînizma baskê çep"* ra, ne jî *"oportunizma baskê rast"* ra em çave xwe negirin, polîtîka partîyê rast e, divê em li wê xwedî derkevin.

Azad, Şahîn, Xelîl, Hesen û hin kesên din ku îro li himber partîyê ketine bêbawerîyê, Bayram û Hazim xwedî parek mezin in. Ketina nava sergêjî û tevliheviya wan de dehfdana herdu endamên komîta merkezî he ye. Her dû endamên komîta navendî, him di bin pêkirina dîsîplîna partîyê da, him jî bi derev û paştagotinan, ji partîyê sarkirina hevalan de xwedî parin.

(… …)

Li himber endaman cotstandardî tê karanîn. Kesên ku bi partî yê ra têkilîyên xwe tune û lê naye gerîn, yên ji ber leşkerîya Tirkan bazdidin, yên ku bona tendurîstîyê, yên ku bona xwendinê ji sînor derbaz dikin, tên û rewşê naecibînin jî şûnda vedigerin. Lê endamên partîyê, yên ku lê têgerandin nikarin rê bibînin derkevin. Bayram û Hazim ji bona têkçûna partîyê çi ji destê wan tê dikin. Bi mantixqek komplo nêzikî partî û endaman dibin.

(… …)

Dixwazim partî li ser mixalefeta vêşartî, frehî raweste û nakokîyan derxine holê. Bayram ku li himber hin endamên partîyê bi neyartî propagande û bêbextîyan dike, hemû wext û hêza xwe li dijberî van hevalan kartîne, di gavê yekem de ew ji komîtê bê durxistin.

1983.09.21<br>Kurmanc<br>Berpirsîyarê Qamişlo û Hesekê

Tesaduf rapora ku min nivisîbû, Bayram xwend komîtê jî guhdarî kir. Piştî xwendin qedîya Bayram bi ken got *"..... rastî te gelek xweş nivîsîye"* min jî got *"rastî te jî xweş xwend."* Hevalên din bi vê espirî yê kenîyan.

Di nivîsê de min Hazim Kiliç û Bayram Ayaz, ew herdu endamên komîta merkezî wek serkêşê mixalefetê dest nîşan dikirin. Lê ew wêrekî derneketin holê, xwe bêdeng kirin, vêşartin. Dixwastin wext qezanç bikin, di demik minasiv de xwe eşkere bikin. Mîna mîkrobên ku li benda laşê jar bin. Di nîqaşê de partîyê jî taktîk bikar anî, ser niximand. Ne gotin mixalefet heye, ne jî gotin tune ye. Ûsa dane xûyakirin ku ne di navbera wan û partîyê da, navbera min wan hevalan de hin problem heye.

Piranîya komîta navendî ew wek, "şika" min tesbît kir. Ji bona wan hakemtî kirin rehet bû. Ew ji Elmanyayê di destê wan de çentê wan wek mufettîşê partîyê, dihatin, piştî civînê jî teyera xwe sîyar dibûn, şûnve diçûn, lê em bi problemên dehan kesan ra diman. Hevalên Ewrûpê gorî hevalên li Surî, di şertên baş de bûn. Wan li Ewrûpê mafê îlticayê girtîbû, her kesî pasaport, mal û karê xwe hebûn. Ya herî baş herkesî nivînek xwe hebû.

Eger di wê civînê de li ser pirsê bê taktîk bihatana rawestîn, ew kesana dikarî bûn îkna jî bibûna.

***

Civînên Komîta merkezî li Şamê di odek 20 metrekareyê da, ji sibê heya derengî şevê û rojan dom dikir. Di wan civînan de sekreter jî di nav de 6-7 kesan bê navber cixare dikişand. Her gav li ser lêvê çend kesan cixare hebû.

Ji ber dengê ji derve pencire jî nedihatin vekirin. Bi duyê cixarê em gêju dibûn. Ew civîn rastî jî êşkence bi xwe bûn. Min deyax nedikir, çend caran xwest ji komîta merkezî îstifa bikim, lê dîsa ji min nekir.

Qet xema wan nebû vê yeka li min çiqasî tesîr dikir. Demoqrasî, mafê mirovahî tenê gotina li ser ziman bû. Ez ku hevalê wanî nêzik bûm wan dengê min nedibîstin, çawa dengê dûrî xwe bibîhistana?

Di van civînan de bawerîya min bi hevalê min dihate şikandin. Carekê jî min got *"hevalino, va çawa demoqrasî ye, hun me jardarî dikin, ez nikarim li himber we, mafê xwe biparêzim em çawa mafê gel biparêzin?"* lê vê gotinê li wan tu tesîr nekir. Bi dor cixare kişandin jî qebûl nedikirin. Her yekî cixare pêdixist ji cixarekêşên din ra jî îkram dikirin. Hewa odê ji ber dûyê cixarê mij dibû. Ji bona ku pir caran waxtê îdare nedikir navber jî nedihat dayîn, ku cixarê wê demê bikişînin. Em hemû bê kar û bê şûxul bûn, li mala partîyê bûn, lê dîsa jî wexta me tûnebû! (Behsa 3 sal û nîv ê ku me li Sûrî derbazkir dikim.) Rastî jî tenê xwe difikirîyan, ji bo kêfa xwe kesên ku cixare nedikişandin

diêşandin. Ji bona ku sekreter jî cixare dikişand wî jî tu rêz nîşan ne di da, serda jî hêrs dibû û digot, *"... ..tu, çima ewqas mezin dikî, çi bûye?"*

Sekreter bîhîstî bu ku li Elmanyê endamekî partîyê nahêle kes di ereba û mala wî de cîxarê bikişîne, wî ev rexne dikir û tinazê xwe pê dikir. Piştî ku em hatin Ewrûpê me dî ku di cîhên girtî da, di malan de cixare nayê kişandin. Kurd jî fêr bûn, dervayî malê cixarê bikişînin û kesên din nerehet nekin.

Sipas ji Ewrûpîyan re ku dersa yekêm dan me û bi saya wan me xwe ji duyê cixara hevalan xilas kir.

Çend salan şûnde sekreter jî wek gellek kesî cixare kişandin terikand, di got*"... heq didime te, kesên ku cixarê nekişîne, gelek zahmete tehamulla dû û bîna cixarê bike. Nuha ez, qet naxwazim ku li nêzî min cixare bê kişandin."*

Lê pir wext derbaz nebû Yaşar Alagûndûz ji partîyê ra raporek şand. Di wir de ew îtiraf dike, ku xwe jî di nav da, Bayram Ayaz, Hazim Kiliç û grubek endam di nav partîyê de mixalefetê dikin. Bi gotina wî *"ew di nava îxanetê de bûne."*

Piştî wê raporê Hazim Kiliç namek şand û ji partîyê îstifa kir û nehat civina Komîta navendîî ya 19 Çileya Pêşin 1984 an.

Komîta Navendî dosyayên lêpirsînê ya Danmarqê, belge û agahîyên dawîn tevî nama Hazim nihêrî. Komîtê ew sedem û sucdarîyên ku Hazim di nama xwe de anîbûn ziman bêbingeh dît û red kir. Komîte gîhîşt wê encamê ku esas Hazim, bo hesavê xeta û şaşitîyên xwe nede nehatîye civînê. Partîyê biryar girt ew ne tenê ji endamtîya komîta navendî ji endametîya partîyê jî hat dûrxistin.

Bayram hat civîna komîta navendî wî jî daxwaza ji partîyê veqetandina xwe kir rojevê. Bayram îddîa dikir ku, " ne li himber îdeolojî û polîtîka partîyê, lê di organa partîyê de xebitandinê de bawerîya min nema" ye. Komîtê li ser sedemên ku wî ji bo îstifa xwe nîşan dida rawestîya. Lê xeynî wî hemû endamên din, ew rexne û dîtinên wî red kir.

Komîta ji bo Bayram gihaşt wê encamê ku; wî tefrîqat kirîye nava qadroyan, li himber bêdîsîplînîya Hazim, dîsa jî ew parastîye. Biryar hat girtin; Bayram ji Komîta Navendî bê girtin, endamtîya wî ya partîyê bê cemidandin û mafê xweparastinê bê dayîn û ew bê kongrê. Lê Bayram jî di 25.12.1984 de îstifa kir, ji partîyê veqetîya.

* * *

Bi sedan rupel îfadên hevalên girtî, ya li qereqolê polês, li dozgerîyê û di dadgehan de hatîbûn girtin di destê me dabûn, kêm kesî ew xwendin. Hevalên berpirsîyar bona ku qadroyên xwe nasbikin, dabeşkirina kar de qadroyan rast bibêjêrin zêde ne hesas bûn.

Di civînê de ji bo rojnama Azadî ya ku li Tirkîyeyê bihatana çapkirin li ser keseki bibe berpirsîyar dihat sekinandin. Navê H. Ç derbaz bû, lê min li notên xwe mêze kir, îfadeyên wî ya li polês, yên di dosyê dabûn ji hevalan ra xwend. Ew xirab bûn. Burkay got,*"ma te wek kompîtûr ew ji ku derxistin?"* Min got di dosya partîyê di îfadên polês de heye. Wan jî ew xwend, Burkay got tu rast dibêjî, meriv nikare kar bide yekî usa. Li çend mehan şûnda cîwîneke da, dîsa ew nava kirin berpirsîyarê rojnamê. Lê pir wext derbaz nebû wî kesî di nava partîyê de xeletîk kir ji partîyê hate dûrxistin. Dûra jî derket derwayî welat bû hevalê PKK ê.

**Şiîr nivisîn an jî xîyar firotin?**
Hevalekî xort hin caran şiîr dinivisîya û ji hevalan ra dixwend. Piştî wê jî dixwast tu dîtina xwe bêjî.

Lê şiîrê wî dervayî sînorê Kurdistanê û Rojhilatanavîn bû. Che Guwerayê me hemû cîhên ku şer û berxwedan hebû diçû, li wan deran şer dikir, di nava şer de rasti hezkirîya xwe ji dihat. *"Delala dilê min, ezê te bibînim, li Kubayê, li Wîetnamê, belkê li Kamboçyayê, an jî li Angolayê, .... Hemû welatê cîhanê di hêjmart lê Kurdistan nedihat bîra wî. Min got ma tu çima usa dûr terî, tu çima li Kurdistanê rastî hezkirîya xwe nayê? Tu çima li welatê xwe şer nakî, bo şer ewqas dur terî? Bi ken got; wele kekê ew qet nehatî bû bîra min, te ez şermezar kirim."*

Rojek germa havînê Seydayê Keleş ji Qamişloyê hatî bû, li Şamê mîvanê me bû. Em li şaneşînê rûniştibûn û me gelgal dikir. Hevalekî şaîrê xort işaret kir û got; Seyda ew xort jî şiîr dinivise, lê bi zimanê Tirkî dinivise. Seyda xwast bizane, ka ew ser çi dinivise û çava dinivîse. Hozan şiîrê xwe bi Tirkî xwend, hevalê din jî wergerand zimanê Kurdî. Seyda qet neket paş, tu hessasîyet neda ber çavan, gotina xwe zêde dirêj nekir raste rast nerazîbûna xwe jê ra got: bi tilîya xwe dûrva qûncikê çaterê îşaret kir û got; *"ya baş ewe ku tu çawalek xîyar bigirî li wir rûnî û xîyar bifiroşî."*

**Osman Sebrî**
Em çend caran çûn dîtina Şaîrê Kurd Osman Sebrî. Me jê ra weşanên partîyê ji dibir û guhdarîya wî dikir. Emrê wî gelek pêşketî bû. Piranîya wexta xwe di mal de derbaz dikir. Hin caran qursa zimanê Kurdî jî dida kesên daxwazkirî. Di malê da ew û jina xwe tenê bûn. Jina wî çerkez bû û zimanê Tirkî dizanîya. Qadroyên polîtîk yên ku ew nasdikirin, pir pesnê wî didan. Di zîndanê de wî pir berxwedaye, li himber zorkeran qet sere xwe netewandîye. Bi ewînek qewîn wî bawerdikir ku ew Kurdistanek azad bibîne.

Apê Osman ji mera qala serborîyên xwe dikir. Dema ku gotin hat ser nivisîn û berhemdayînê. Got ez jî wek Cîgerxwîn derketama Ewrûpê min jî dikarîya gelek pirtûk çapbikira. Lê min alîkarîya gelê Kurd ji bo xwe bes dît.

Got ez ji wera qala çîrokekê bikim, hûn ferqîya min û Cîgerxwîn derxinin. Rojekê aşiq tevî gundîyan şer dike û zora wan dibe. Di dadgehê de hakim ji yê aşiq dipirse, wî tenê çawa zora van çend gûndîyan birîye? Aşiq bersiv dide; begê min *"ew dixwin nanê sêlikê, em dixwin nanê êlikê."*

**Keça min Cîran dixwaze here dibistanê**

Payîze, li Sûrîyê dibistanan dest bi perwerdê kir. Taxa ku em lê dimînin li Mesakîn Berzê nêzî mala partîyê dibistanek heye. Sibê de zû xwendewan di nava formayên xwe de tên terine dibistanê. Cîran li Dîyarbekir diçû hêlîna zarokan, li wir gelek hevale xwe hebûn û li wê dere wê wexta xwe rind derbaz dikir. Nûha wê pênc salê xwe derbaz kirîye û di malê da, heta di bajêr de bê hevale. Bona wê heves dike here dibistanê. Lê em li Şamê vêşartî dimînin. Çûyîna wê ya dibistanê an jî hêlîna zarokan nemumkune. Emê çawa bikin hîn ne belûye. Cîran jî her roj sibê de radibe tere dibistana taxê, dora bîna dibistanê çend caran dizivire û tê mal. Ew yeka me dike fikaran, em nizanin ku çi bikin?

Keçikê hevalê xwe jî tunin. Ew tevî mezinan di malê de hevaltîyê dike. Tevî wan radibe rûdine, dixwe vedixwe. Wê zarokatîya xwe bîra kirîye. Di nava duyê cixarê de jîyana xwe didomîne. Hin caran li himber telewîzyonê derdikeve ser masê û li gorî muzîka telewîzyonê dilîze.

Her çiqas ji me hindek kes mamostene jî di nava şertên heyî de em nikarin tiştekî bikin, em jî hatine guhartin. Me psîkolojîya zarokan, hezkirin û toleransa himber wan zuve bîra kirîye.

Em Cîranê jî mezin dibinin. Tu caran wê wek zarok nahesibînin û xwarin û vexwarinê de ferqîyekê nakin navbera wê û mezinan. Em bijên şîr, fîkî, çikulata tiştekî taybet, an pêlîstokek zarokan bona wê girtin nayê bîra me. Mezin çi dixwin ew jî wî dixwe. Nuha difikirim ku ew têkilîyên min bi wê ra çiqasî xam bûye. Heyf ... dora sê salan min ew nedîtîye hatîye dîsa jî em ji hev dûrin. Yek pêlîstoka heyî û oje ya lêvan jî Saleh Qitî ji Cîranê ra girtîbû.

Rojekê li çarşîyê muz dît û xwast. Me pirsî kîloyê muzê 8 lîrê Sûrî bû. Tenê bi kilo difirotin. Lê ez berpirsîyarê partîyê bûm, qêmîş pere partîyê nebûm. Me perê xwe rihet bikar danî, lê yê partîyê berpirsîyarîyek giran dikir ser me. Ew bûyer tu caran ji bîra min naçe û her car ku tê bîra min jî, ji min ra xemgînîyê çêdike.

**Necmettin Büyükkaya**

Tevgerê Kurda nikarin an jî nizanin li kadroyên xwe xwedî derkevin. Necmettîn Bûyukkaya bi tecrube û zanîna xwe, dilsozî, bawerî û fedekarîya xwe layîqî pêşengîyê bû. Le partîyê Kurda wek endamekî nekarîn wî bigirin nava xwe. Di sala 1981 an de li Surî em çend mehan bi hev ra çûn qursa zimanê Erebî. Digot; min ji hevalê wera pêşniyar kirîye ku; eger partîya we heye min bigirin nava xwe, eger partî tune jî em partîyekî damezirînin. Lê hevalan bersivek pozîtîf nedan min. Li Şamê jî têkilîyên nava grubên Kurdî kêmin. Carek li Dîyarbekirê, min xanima hevalê we Zîya dît. Mêrê xwe ji min pirsî, lê min nikarî çi bêjim."

Çend caran em ber bihev çûn û hatin. Carekê jî ji Swêd hatîbû. Di nava sohbetê de min jê pirsî, nîyeta te heye ku tu herî welat? "Çawa eger ez bêm girtin, wê min bikujin."

Lê piştî demekê xebera girtina Necmettîn hat. Ez çûm mala wan, min ji hevalê wî mamaoste, Xatîp xoce pirsî, xebera wî jî pê tune bû. Tenê got gerê ew neçûna mala xwe. Lê eşkere bû ku ew li mal hatîbû girtin. Demekê şûnda jî xebera kuştina wî hat.

**Mamoste ez nizanim**

Necmettîn li zanîngeha Stenbolê xwendevan bû. Lê ji ber rewşa sîyasî cîhişt çû Kurdîstana Başûr ba Dr. Şvan, tevî xebata veşartî bû. Li Şamê ez û mamoste Yaşar, demikê çûn qursa zimanê Erebî, Necmettînê rahmetî ji dihat vê qursê.

Ji bona kesên ku elifba latînî, xwendine, elifba Erebî nasnakin ji bo wan gelek zahmet e. Lê Necmettîn bi salan bû vê cografîyê de dihat û diçû, zimanê wî baştir bû.

Di dersê da, mamoste li ser textê reş, hin hevok nivisin û cîh cîh vala hiştin. Dixwest ku, xwendevan cîhê vala bi bersivên rast dagirin. Bi dorê destpêkir. Heval rabûn, bersiv rast, xelet nivisîn. Dor hat min. Min li hevokê mêzekir, bersivê de ketim du dilîyê.

Min bi Erebî ji mamostera got: Mamoste, ez nizanim. Mamoste, bi dilşahî li min vegerand. Pir baş e, bersiva te rast e, binivîse. Min xwast ez bidim zanîn ku bersivê nizanim, min bersiva pirsê daye. Necmettîn digot, te lênexist, çûk li kevirê te ket.

**Bi zimanê erebî ez kurd im**

Dîsa di dersê de mamoste li ser lêker a "revê-bazdanê"-erkudu dipeyîvîya. Wî xwast şagirt bi xwe ji vê lêkera nû, dinav hevokan de bikar bînin. Ji bo wê jî bi dor bi dor xwendevanan hevokên xwe ji hevalên ber xwe dipirsîya. Xwedevanekî Tirk ji hevalê

Yaşar bi Erebî pirsî; hel ente terkudu? Ma tu baz didî? Hevalê Yaşar usa zanî ku ew dipirse; Ma tu Tirkî? Ji ber wê bi hêrs lê vegerand. La ena Kurdî- na ez Kurdim.

Rahmetî Neco jî li wir bû. Pir kêfa wî bi bersivê hatîbû. Me di nava xwe de henek dikir, digot; em Kurd heya Şamê, Beyrutê tên lê baznadin.

## Rapora ser xebat û rewşa partîyê

Liqên partîyan di hin wextan de li ser xebat û rewşa partîyê raporên xebatê dinivîsîn û pêşkêşî merkeza partîyê dikin. Ew yeka, prensîbek demoqratîk a merkezî ye. Di 17ê Îlona 1982 an de li Şamê, civîna ku hat çêkirin da, biryar hat girtin ku ez, heta demekê li Şamê, piştre jî li Qamîşloyê berpirsîyarî ya partîyê bikim. Ji wê rojê heya 2 yê Avrîl a 1983 li Şamê, ji 12 Avrîl a 1983 an heya 20 Îlona1983 an li Qamîşloyê wek perpirsîyarê partîyê xebitîm.

Dixwazim di vê peryoda de Çalakî û xebatên ku me li herdu herêman kirine bi kurtî, çend xalan de pêşkeşî komîtê bikim.

**a - Xebatên ji bo hevkarî yê**

Xebata me ya Şamê, civînên "**Hevkarîyê**" û ji çalakîyên wê pêk tê. Xebata hevkarîya hêzên welatparêz ku salekê berî destpêkirîye, ser navê partîyê em du heval ez û Yaşar Alagunduz bejdar dibin. Bi biryar, sebir û bi layiqî mîsyon û berpirsîyarîya partîya me em xebata xwe rêva dibin. Di mal de jî li ser pirs û xebatê, tevî hevalan dicivin, dîtin û rexnên wan jî digirin. Ew yeka me pêşdixine û asoyê me firehtir dike. Civînên Hevkarîyê her 10, 20 û 30 ê mêhê de tên çêkirin. Lê ji bona bûyêr û rojên taybet jî her gav komîte ji bo civînê amadeye.

Hevkarî di civînên xwe de piranî li ser buyêrên rojane radiwest e. Ji bona rojên taybet civîn hatin darxistin û belavok hatin balavkirin. Li ser şerê navbera Îsraîl û Filîstînê, şerê nava Kurdan, referanduma makezagona Tirkîyê û li ser zilma ku li zîndanan tê kirin rawestî, civîn çêkir û belavok belav kir.

Partî Demoqrata Kurdistan-Iraq nedihişt hêzên din di herêma wan de bixebitin. Bona wê êrîş biribû ser meqara pêşmergên Partî Gel, 3 pêşmerge kuştîbûn û çend kes jî dîl girtîbûn. (30 salî şûnda Heziran 2014 an de li Kurdistana Rojava PYD jî naxwaze ji dervayî wan çekdar hêzên welatparêz li wir hebin û xebat bikin.) Hevkarîyê ser şerê navbera PDK-Iraq û Partîya GEL de belavok belavkir, êrîşên PDK-I ser maqarê Partîya Gel û kuştina pêşmergan rexnekir. Me pênc hêzên nava Hevkarîyê, bi hev ra PDK-Iraq IKP, PSK-I û Yekitî zîyaret kir û da zanîn ku şerê navbera hêzên welatparêz, şerê birakujîyê ye. Şerê navbera Kurdan, kêfa dijminên me tîne û ji azadîya gelê me ra tu fêda xwe tune. Kurd jî divê pirsgirêkên nava xwe bi peyv û rexnan bikarin safî bikin. Lê mixabin Partî Sosyalista Kurdistan-Iraq

(PSK-I) û Partî Komînîsta Iraq (PKI) helwesta Hevkarîyê, bi alîgirîyê va tawanbar kirin. Wan, belavok belavkirina me û rexne kirina PDK-I di cî de nedîtin. Di cîhê wê de gorî adetên eşîrî, di malan de zîyeret kirina PDK-I ê zêtir rast didît in û ew pêşniyar kirin. Ango vekirî rexne kirina me dikarîya PDK-I ê agresîv bike û wan bibe nixtê dawîn. *"Serda jî yên ku hatîbûn kuştin çend pêşmerge bûn!"*

Me got, ew ditinana ne dîtinên pêşverû, welatparêz in. Kurdistan divê ji hemû hêzên welatparêz re vekirî be û hemû hêz bikarin li Kurdistanê bitêkoşin. Yên ku hatine kuştin pêşmerge bin jî qîmeta bûyerê kêm nake.

Me wek nunerê PSKT jî da xuyakirin ku partîya me li himber birakujîyê pir hesas e. Ew li himber şerê PDK û Yekitî ya 1978 an, PDK-I û PDK-Îran, ya 1982 an, jî derket û nirînên xwe vekirî nivîsî. Li Kurdistana Başûr şerê navxweyî ewqas pir çê dibe ku meriv wext nabîne hemûyan bîne ziman.

Demekê şunda, gava ku di Gulana 1983an de, di navbera Yekitîyê û CUDê de şer derket Partî Komunîst a Iraq (PKI) û Partî Sosyalîst Kurdistana Iraq (PSK-I) hatin em agahdarkirin û ji me xwestin partîya me bona rawestandina şer aktîf rol bigire. Berpirsîyarê PKI ê ya Şamê digot,*"wexta ku we ji PKK xwerexnekirin dixwest ew helwestekî rast bû. Nuha mafê me ye ku em jî, ji Yekitîyê xwe rexnekirinê bixwazin."*Nunerî Şamê ya PSK-I Abdulxaliq Zengene, li himber êrîşên Îranê xwe parastina PDK-Î û Yekitîyê bi hişkî rexnedike, lê tevî dewleta Îranê êrîşên PDK-I ya ser PDK-Îranê ra jî çavê xwe digirt.

Dîsa êrîşa PDK-I ser Partîya Gel (Partîya[66] Samî Rahaman) dicî de dibîne. Bi van dîtinên xwe ew partî an jî kes, mirovan ditirsîne ku di rojên hatî de ka ew çi bikin?

Hevkarîyê, bi belavokê destûra bingehîn a cunta faşîst û encamên referandumê rexne kir û bi zimanê Kurdî, Erebî û Tirkî belav kir. Li ser roja qolonyalîzmê, li ser roja Newrozê belavok bi sê zimanan belav kirin.

Hevkarîyê, ketina leşkerê Tirk, Kurdistana Başûr belavok belav kir û tevgerên Filistînî zîyaret kir û agahî de wan. Li ser qetlîama Sebra û Ştîlla bi navê hevkarîyê ji serokê PLO Yesar Arafat ra telgraf hate şandin.

Derheqê pirsa Kurd de bi navê Hevkarîyê bi hêzên Filistînî û hêzên Ereb yên pêşverû ra hevdîtin hatin kirin, armanc û prensîbên Hevkarîyê hat şirovekirin.

Propaganda ku hêzên şoven, terorîst û xayîn, li himber xebata Hevkarîyê dikirin, em grubên nava Hevkarîyê bi hev ra li himber rawestîn. Hevkarîyê bi

[66] Piştî şerê ABD li himber Saddam li Kurdistana Başûr rewş hate guhartin, li Iraqê federasyon kete rojevê. Li Kurdistanê jî parlamentoya Kurdistanê saz bû. Îro hemû partîyên ku şerê hevûdû dikirin, bi hev ra dewleta Kurdî ya federe sazkirine û di parêlamento da bi hev ra dixebitin.

minasebeta mirina endamê komita merkezî ya PSK-I Tahîr Welî PSK-I zîyaret kir û sersaxî de partî û malbata Tahîr Welî.

Têkilîyên me bi Cepha Demoqratîk ra kevne. Ji ber şerê Beyrûd ê hevalên me yên li qampê nuha li Hulvê – Beqea yî cî bûne, di hin karên wan de ji wan ra dibin alîkar. Lê roja, 1982.10. 6 de wan jî perwerda xwe qedandin hatin Şamê. Hevdîtinên me ya peryodîk, Cepha Demokratîk ra dom dike. Bo ku heval bikarin li Surî bigerin, em bo wan ji Cepha Demoqratîk nasnama Filistînîyan derdixinin.

Me du hevalan, ez û Bedirhan Epozdemir ser navê PSKT li Beyrûdê El Fethe, Cepha Demoqratîk, Cepha Gel zîyaret kir di derheqê rewşa Tirkîyê û Kurdistanê de dan û standin kir. Di her welatekî de pêkanîna yekitîya karkeran û gel cuda rê digire. Partîya me jî li gorî şertên welatê me rêya, ku hêzên welatparêz dike yek, bi sebir û rik wan di enîkê de bîne ba hev, bihune û serkeve. Tevî çepê Tirkan li dijî faşîzmê avakirina enîyekê me ji Hevkarîyê ra pêşniyar kir. Lê ji wir bersivek çê derneket. Pêşniyara me ya bi hêzên çep yên Tirk ra **"pêkanîna enîyek Tirkîyayî"** di nava hevkarîyê de rast li dijitîya 4 alî hat.

Grup xwepêşandin û mîtîngan de ango di xebatên li dijî cunta faşist de bi hêzên Tirk ra dixwazin bên bahev. Lê ew ji bo **pêkanîna enîyek Tirkîyayî** ra neamade ne, dibêjin, xebatek usa xebata pêncalî- Hevkarîyê pûç dike. Hin caran bi ramanên sabît nêzikbûna hin gruban, civîn tenê dibin cîhê nîqaşê. Partî û tevgerên ku temsîla cure cure çîn û tebeqan dikin, ne hêsan e ku bê problem li ser proxrameke, bêne ba hev û lihev bikin.Li ser destûr û bernama Hevkarîyê me lihev nedikir. Wek "mafê çarenusa xwe", ew tenê slogana Serxwebûnê yek alternatîf dibînin û dixwazin di proxramê de ew cî bigire. Di civînên Hevkarîyê de pir tê peyvandin, lê kêm tişt tê kirin.

Hin caran xebat dikeve rewşa xitimandinê jî, lê bi sebir û nîqaşan bi hev ra çare hat dîtin û xebat ranewestî. Grub pir caran bi hev ra li himber pêşniyar û dîtinên me tifaq dikin.

**Grub çima bi hev ra li himberî nêrînên me derdikevin?**

Di damezrandin û xebata[67] hevkarî yê de PSKT him îdeolojîk him jî pratîkê de xwedî para mezin e. Der û dorên sîyasî propagende dikin ku "*lokomotîfa hevkarîyê PSKT e ye.*" Ew gotinên usa li hêzên din tesîrên negatîf dikir.

---

[67] Encamên xebata Hevkarî yê .
Piştî derba leşkeri ya 12 Îlona sala 1980 ê qadro û serokên tevgerên Kurdistanî derbazî Sûrî yê bûn. Ew li wir di nava xwe da li ser Hevkarî û yekitîyan rawestîn. Him şertên welat him jî pêşniyar û alîkarîyên hêzên dost ew yeka li ser tevgeran ferz dikir. PSKT jî hêzên din jî tevî PKK ê xebatê ra neamade bûn.Ew pirs di civîna Komita Merkezîya partîya me da hat nîqaş kirin. Biryara komîtê ew bû; ji bona bi hev ra xebatê lazim bû PKK ê ji ber xeletîyên xwe, xwe rexne bike.

PSKT hevkarîya hêzên Kurd stratejîk dibîne û xwedî biryar û dîtin e. Ji bo grubên din nikarim bêjim ew jî qasî PSKT ji wê xebatê ra amade bûn.

Hêzên nava Hevkarîyê kirîzên sîyasî derbaz dikin, pirsên hindurîn dijîn û bêîstiqrar in.

Ala Rizgarîyê piranîya bingehê xwe wenda kirîye. Ser navê A. Rizgarîyê du kesên ku bejdarî civînan dibûn, du dîtinên dijî hev dianîn ziman. Kesê ku ser navê mixalefeta wan dipeyîvîya xebata Hevkarîyê bê feyde ditît û îddîa dikir ku *"xebata hevkarîyê, yê ku A.Rizgarîyê li ser lingan digire."*

KÎP di nava xwe de bûye sê perçe, hîn jî veqetandin nezelal e û ji bona hevkarîyê plan û programek wan tune. Wext û enerjîya xwe zêtir ji bo problemên xwe yên hindurîn xerc dikin. Di nava xebata Hevkarîyê de mayîn an çûyîna wan ji nexuya ye, bona wê ew li benda biryara kongra partîya xwe ne.

---

Xebat û hevdîtinên ser hevkarîyê di nava Ala Rizgarî, KUK û PSKT da dom dikir. Demikê şunda KÎP jî ket nava xebata Hevkarîyê. Lê bona çareserkirina hin pirsên xwe yên hûndirîn meh û nîv wext xwestin.

Piştî wê jî KÎP ê nivîsa ku di kovara Dengê Komkar hêjmar 15 Adar 1981 ê da hatibû weşandin wek sedem nîşan da û di 20 ê Gulanê da xwe ji civîna Hevkarîyê kişand.

Nivîsa ku D. Komkar da hatibû weşandin li ser kuştina dilxwazê PSKT Remezan Çankaya bû. Remazan ji teref alîgirên KÎP ê ve li Qulpê hatibû kuştin.

PSKTê kuştina dilxwazê xwe li himber xebata Hevkarîyê nedikir asteng lê KÎP ê dikir asteng. Civîn û xebata ser hevkarîyê bê KÎP ê dom kir. Çileya Pêşin 1981 an da hatin nav xebatê, lê wan 21 ê Çileya Paşin 1982 an da carik din civîn terikandin. Ser vê paşketina di 2 Sibat 1982 an da sê tevgerên mayîn (KUK, TKSP, û Ala Rizgarî) bi belavokekê xebat û nêzikbûna xwe ji rayagel ra eşkere kirin. Bona fireh bûna bihgeha Hevkarîyê bi KÎP ê, Rizgarî û PKK rê têkilî û xebata me dom kir. Dawîyê KÎP şunda vegerî û tevgera Tekoşîn jî ket nava Hevkarîyê.

Her çiqas bi salan civîn û xebatên usa dom kir jî encamek baş jê derneket.

Hin caran AR, KUK û KÎP ê bi însîyatîfa xwe mehan wext girtin û di xebata Hevkarîyê da beşdar nebûn. Ji bo amadekirina destûr û proxramê , komîsyonek hat bijartin vê cara jî KUK ê ji xebata Hevkarîyê damezrandina Partîyek komunîst dixwast.

Me hevalên li Sûrî ne karî dawî li civînên Hevkarîyê binin. Ne jî karî xebata Hevkarîyê bi proxram û destûrekê bibin serî.

28 Gulan 1983 an da xebata Hevkarîyê derbazî Ewrûpê hat kirin, lê li wir jî xebat serneket û hat rawestin.

*Burkay di nama xwe ya di 26 ê Çileyê Pêşin 1983 da dinivîse: "*

*(….) Hevdîtinên ser Hevkarîyê nuve hate xitimandin. KUK "serxwebûnê" diparêze û "têkoşîna çekdarî" jî wek bingeha têkoşînê dibîne û dixwaze ew têkeve programê. Me red kir."*

(…..) Lê Hevkarî yê ji bo xebatek hevbeş rêyek vekir, şopek hişt. Bona ku rîya rast ew e, dîsa jî divê bona hevkarîyê xebat bê domandin

Tevgera KUK ê jî, ji nava xwe bi navê KUK-SE mixalefetek derxist şûnda qelstir bû. Ew, dîtinên ku du salin di platforma hevkarîyê de hatine parastin û ji alî hemû gruban va hatine, pejirandin, nuha ew li himber wan, derdikevin. Nunerên xwe bi pêşniyarên tevlîhev û bi dîtinên nezelal hatin civînan û ketin rewşek nebaş. Di civînê Hevkarîyê de ew li himber xebata Hevkarîyê derdikevin û hin caran di yek partîyê de cî girtinê "yekbûna hêzan" parastin. Digotin "wek grub hebûn û li serpîyan mayîn û nemana me tê nîqaşkirin. Ji bona wê divê berî Hevkarîyê, enîyek sîyasî, lazim e yekitîyek sîyasî bê çêkirin .." Xebata Hevkarîyê ku du sale tê ajotin û armanca xwe avakirina enîyek siyasiye, KUK li dijî wê derdikeve û wê înkar dike. Helbet mafê wan heye, ew rewşa xwe ji ber çavan ra derbaz bikin, çi dikarin bikin û çi nikarin bikin tesbît bikin. Lê belê, ew xebata ku bi armanca avakirina enîyek netewî hatiye destpêkirin înkardikin, li himber xebatê dibin asteng.

Hin caran jî KUK dixwaze partîyek komunîst ava bike. Ew îddîa dike, "eger di welateki de Partîya komunîst tune be, cepha, enîya netewî jî nayê avakirin. Li Kurdistanê bo ku Partîya komunîst tune, ji ber wê jî enî çênabe... Gorî wan îro karê lez û rojane, damezrandina "partîyek komunîst" e. KUK, ji Yekitîya Afriqa Başûr (ANC) û Organîzasyona Rizgarîya Filistînê (PLO) ra çavê xwe digire. Di damezrandina wan herdu cephenda jî partî komunîst tunebû. Mixalefeta nava KUK ê jî bona ku KUK xwe ji xebata hevkarîyê bikişîne hewl dide. KUK ê ji Hevkarîyê meh û nîv wext daxwaz kir û civînan de beşdar nebû. Berî 12 Îlon ê li welat KUK ê tevî hin tevgeran li ser yekbunê- yekitîyê xebat kirîye. Ew xebata wan li dervayî welat jî dom dike. Nuha jî tevî wan gruban (KUK, KÎP, A. Rizgarî, Rizgarî û Tekoşîn) ew di nava xebata yekitîyê de ne. Ew dixwazin bizanin ji vê xebatê çi encam derdikeve, piştî wê jî, di xebata Hevkarîyê de bibiryar bin. Ew bê îstiqrarîya wan li himber xebata hevkarîyê astengîyan derdixine. Dîtin û niqaşên komîta Hevkarîyê li ser vê babetê derbazî tutanaxan bûne.

**b- Têkilî û propaganda**

Ser navê PSKT ê, li Beyrutê, El Fethe, Cepha Gel û hêzên Iraqî yên pêşverû zîyaret kir.

Bona ku em bikarin li Sûrî azad bigerin, Cepha Demoqratîk ser navê Filistînîyan ji me ra nasname dadigirtin. Li ser kaxizê em hemû ji Qudis, Qazze, Nablus û ji Xelîlê ne.

Weşan û belgên partîyê ku bi zimanê Erebî, Elmanî û Îngilîzî ne em digîşînin wan jî. Bi berpirsîyarên wan yên karê derva di hevdîtinên me ya dawîn da, li ser şerê Lubnan, hereketa Filistîn û Kurdistan, li ser têkoşîna li Tirkîyê peyîvîn. Di rojên hatî de di sevîya sekreteran de hevdîtinek pêşniyar kirin. Di tanzîmkirina pasaport û ji derketina Sûrî de soza alîkarîyê dan.

Di pîrozkirina newrozê û di civînan de belavok û weşanên partîya me hatin belavkirin, me mal û partîyên Kurd yên Kurdistana Rojava zîyaret kirin û dîyalog danî.

Ez beşdarî civîna sersalîya PDPKS (Partî Demoqrat Pêşverû Kurd li Sûrî) ê bûm, li ser rewşa herêmê, Tirkîyê û Kurdistanê axavitinek kir û li ser enîya netewî dîtinên partîyê anî ziman.

Bo ku em bikarin hêzên dervayî Hevkarî yê Rizgarî û PKK ê jî bigirin nava xebata Hevkariyê, bi wan ra hevdîtin çêkir û dîtinên xwe me bi wan ra parve kir. Piştî çend hevdîtinan nunerê PKK ê Duran Kalkan anî ziman ku: "xebata Hevkarîyê li himberî wan tê kirin... eger em bi wan ra enîyekê çêkin dikarin bêne ba hev, usa nebe hevdîtinên me bêencam û bê fêde ne. Bi van hevdîtinên du alî, armanca PSKT ê, ew e ku bingehê PKK ê belav bike, PSKT, PKK ê welatparêz nabîne. Ji ber vê yekê di nava PSKT nereheti heye, naveroka mixalefeta Zekî jî ji ber wê ye.

Nêzik de em namên Mazlum yên hepisxanê biweşînin. Di naman de di derheqê PSKT de jî rexne hene. Em bibînin wê wextê hun çi bêjin? Hun dikarin bêjin Mazlum şehîdê me ye jî, an na?" di platformekê de endamekî komîta Merkezî ya PSKT gotî bû "*Mazlum şehîdê me ye jî.*" Duran ew gotin bibîr dianî. Em ji bona şerê çekdarî xwe amade dikin û em dest bi şerê çekdarî bikin. Hun çawa dibînin?

Min bûyerên ku PKK berî 12 Îlonê li Kurdistana Bakur, li Hîlwanê û Sîweregê pêk anîbûn bîra wî xist. Şerê ku li himber KUK ê dabûn meşandin, welatparêzên ku (Ferit Uzun, Mistefa Çamlibel) bi dafikan hatîbûn kuştin, anîn bîra wî. Ji ber wê yekê li ser destê wan xwîna welatparêzan hebû. PSKT ji ber van sedeman, ji PKKê xwe rexnekirin daxwaz dikir. Xebata hevkarî ya pêncalî, ne li himberî PKKê, li himber dijmin hatîyê destpêkirin. Eger ku PKK şaşitîyên ku kirine qebûl bike û soz bide ku carek din destê xwe nake xwîna welatparêzan ew jî dikare bê û di xebata hevkarîyê de cî bigire. Partîya me şerê çekdarî bêwext didît, gorî me gel ji bona şer ne amade bû, hêzên welatparêz belawelane û PKK e bi serê xwe nikare vî barî ragire, ew şer ji bo qirkirina Kurda dikare bibe mane." Di wê demê de namên Mazlum hatin weşandin. Di naman de PSKT, KUK û KİP (DDKD) xaîn dihatin, navkirin.

Lê bi çapbûna pirtûka bi Kemal Burkay a bi navê "*Devrîmcî Mucadele mi Terorizm mi ve PKK*" pêwendîyên me qût bûn. PKK ê navber da hevdîtinan û xwe ji me dûr girt. Li ba partîyê dost naveroka pirtûkê rexnedikirin, mîna zarokên ku lêdan xwaribe bi tinaz lomeyên xwe dikirin.

**c- Xebatên ser perwerdê**

Jîyana rojane ya li mal gori programekê dimeşê. Dema razan û rabûnê, semîner û xwendinê hatîye tesbît kirin. Nobedarîya aşpezîyê li gorî lîstê dimeşê. Hin caran ziyareta hêzên sîyasî û civînên li ser Hevkarîyê xebatên me yên xwendinê şûnde xist. Di rojên usa de jî heval di navbera saet 9-12 de bi tenê xwe, azad xebitîn.

Panzdeh rojan de carekê me di nava xwe de civîn çêkir, li ser nûçe û bûyêrên rojane, li ser xebata Hevkarîyê agahî hat dayîn, dîtin û nêrinên havalan hat girtin.

Nivîs û gotarên sereke yê rojnama partîyê, Rîya Azadî, kovara Dengê Komkar, Roja Nû, broşurên ser partîyê, ser şoreşa Îran ê, Kemalîzm, pirtûka *"Devrimci mücadele mi Terorizm mi ve PKK"* tevî hevalan hat xwendin.

Li Hasekê û Qamîşlo yê van xebatana baştir hatin rêva birin. Di mala Partîyê de kursa zimanê Kurdî jî hate dayîn. Li Hasekê yê deftera xebatê pêydabû; 2 heval di atolyekê da, yek heval di bîçerê da, 3 heval di înşaatê da, 9 heval jî boyax û sipîkirina avahîyan de dixebitin. Xanîyên ku têne boyax kirin 32 daîre ne û boyaxkirina her daîrekê 600 lîrayê Sûrî ye. 32 x 600: 19 200 lîrê Sûrî dike. Heta nuha 7825 lîrê Sûrî gîhaşte partîyê. Li Şamê jî 4 hevalên din di avahîyan de dixebitin.

**d- Xebatên sînor**

Navbera Nisêybîn û Cizîrê de li ser sînor gelek leşkerê Tirk heye. Lê dîsa jî çûyîn û hatina bakur-serxetê kêm nabe. Her wext ji Kurdistana Bakur derfeta derbaz bûna Rojava heye.

Di xeta Afrîn, Kobanî û Serêkanîyê jî rêya me ya derbaz bûnê heye, dervayî vana jî bona rêyên nû divê em hewl bidin. Tevî grup û hêzên din jî bidin û bistînin rê û olaxên heyî bi hev ra parve bikin.

**e- Dîsîplîn:**

Partî jî mîna laş e. Çava ku her organekî mirov karekî xwe heye, lê bona ku hemû bihev re bi aheng bixebite, mêju wan dike duzênê. Di jîyana partîyan de jî, dîsîplîn û normên navnetewî rolek girîng dilîze û hemû endamên partîyê bi hev ra di çalakî û xebatê de aktîf dike.

Eger ku ew dîsîplîn û îtîat tune be, partî nikare li himberî neyarê xwe ya hêztir û tecrubetir serkev e. Wek hostayê şoreşan jî dibêjên partîke marksîst bikare zora burjuvazîyê bibe şertê bingehîn ew e, ku navendek mitlax û dîsîplînek hişk a proleterî hebe. Bê şert û qeyd îtiata prensîp û biryarên partîyê xisusîyeta partîyên proleter e.

Bona ku endam biryarê pêk bîne, ne lazim e, biryar li gorî dilê endam be. Berî ku pêşniyar bibe, biryar, mafê her endamekî heye, ku li dijî pêşniyari bipeyîve, dîtin û rexnê

xwe bîne ziman. Lê piştî ku pêşniyar bu, biryara partîyê şunda, divê ew bê parastin û pêkanîn. Endam îrada xwe tevî îrada grubê dike.

(… …)

Guhnedana dîsîplînê û îtaetnekirin, aheng û yekitiya partîyê xirav dike. Eger ku parti endamê xwe yê ku kar didî yê, bawer nebe, ew çawa yekitîyek bi dil û can e, bi xwestek e? Ew çi şikil merkezîyeta demoqratîk e?

*"Meriv îrada xwe, bi îrada grubê, bi îrada piranîya partîyê ve girê dide û biryara ku partî pêwîst dibîne endam dike."* Soren Soren – rup.43, Li Ser Partî yê, Dersên Lenîn.

Welatê me Kurdistan behra burjuwazîya piçûk e. Her roj ji bûrjuwazîya piçûk gelek kes dikeve nava refê partîyê. Ew kesana bi xisusîyetên xwe yên çînî bi xwe ra derbazî nava partîyê dikin. Kesên ku di nava partîyê de kamil nebûne, natine pijandin di tesîra propagandên nexweşîyan de dimînin. Di hemû partîyan da, kesên cuda difikirin, kesên ku îdeolojîya partîyê hezim nekirîne hene. Ji ber vê li himber van kêmasîyan prensîba merkezî ya demoqratîk divê bê kar anîn.

*"Navê qomunîzmê pir wezîfe tîne, lê tenê mafekê dide mirovan. Kesê qomunîst ew kese ku di şoreşê de şer dike."* Rapora Kongra SBKP: Mîna gotina jorin, PSKT yî bûyîn jî, pir berpisîyarîyê tîne, lê yek maf dide endaman, ew jî xebat û tekoşîn e. Di partîkê de dîsîplîn çiqasî xurt be, kar û bar jî ewqas rind û bi duzen dimeşe. Burjuwazî jî girîngîya dîsîplînê dizane. Ji bona jarkirina wê jî hewl dide. Dixwaze mirovan li himber "girtîgeha" partîyê derxine. Burjuwazîya piçûk di her şert û mercî da, ne pêwîstîya dîsîplînê nayne ziman. Lê ew di binê hin gotinên xapînok da, di binê cuda kiras de li himber biryarên partîyê derdikevin. Wek,*"endam ne mecbûre ku hemû biryaran bipejirîne, endam dikare daha mantiqî bifikire, bîrima filan derê biryarên rasttir girtine"* hwd.

*"Cîh nenîna biryara partîyê suc e, ji partîyê veqetandinê tîne. Yek û yek xira kirina dîsîplînê, ji holê rakirina partîyê tîne. Bolşewîk di partîyê de dîsîplînek xurt mîna hesin dixwazin."* Soren

Piştî van gotinên gelemperî em bên ser bûyerên nava partîya me. Salekê berê 15 kes ji tevgera KUK ê veqetîn, hatin wek mîvan li Qamişloyê li mala partîyê dimînin. Ew di kirin û raya xwe de azad in. Di pêvajoyê de ji wan 5 kes bûn endamê partîya me. Lê ew kesana di nava partîyê de hîn jî wek grup, otonom tevdigerin. Partîyê nekarî hebûna wan ya grubî di nava xwe de bihelîne. Te digot hela ew neketine nava partîyê bi partîyê ra koalîsyon çêkirine. An jî bi dîtinek din ew di nava partîyê de xwedî mafê otonom bûn.

Berpirsîyarê wê herêmê Bayram bi zanebûn ew dervayî partîyê digirtin. Dixwest di rojên hatî de ji wan pişt bigire, lewma jî ew him endam bûn, him jî otonom bûn.

Ji wan du endaman, A. û R. bê biryara partîyê dixwastin derkevin dervayî welat. Wan bi serê xwe pasport û bilêt tedarik kirîbûn û biryara xwe dabûn herin Ewrûpê.

Herdu jî qaşo endamên partîya me bûn. Ew di çûyîna xwe ya Ewrûpayê de bi biryar bûn, dixwestin li Stockholmê havalê partîyê bên pêşvazîya wan. Hin rexne û daxwazîyên xwe jî nivîsî bûn, xwastin bidin min. Lê min, çûyîna wan ya wî şikilî şaş dît, ji wan xwest, ew heta partî biryarekê bide sebir bikin û nivîsa xwe jî bidin hevalê ku têkilîyê xwe pêra ne.

Lê ji wan yekî got:*"Bayram Ayaz bi destê min kîderê dixwaze pere dişîne, (... ) lê malbat û zarokên me jî hene kes eleqeder nabe. Ew, bi pişta hevalên ku ji KUK ê hatine, dixwaze tiştan bike, lê em natin lîstika wî.*

*Di xebatê de jî, ji me bawer nakin, berê dixwastin em herin bi derûdora xwe ra têkilî daynin, nuha jî nahêlin ku em bi dostên xwe ra têkilî daynin."*

(... ...)

Gora min, Hazim demik bû, tevî hin kesên nêzî xwe di nav partîyê de paşdagotinî dikir. Ez û Hazim rûniştin li ser kar û xebatê peyîvîn. Min ji wî xwest, ew paşgotin û bê dîsîplinîyê neke û nebe piştgirê şaşitîyan, ew bi berpirsîyarî tev bigere.

Tevî tiştên ku di berê de ketibûn ser hev, wî bi hin peyvên tuj, ez kişandim nava şaşitîyan. Wek grubî paştagotin û kirinên wan tehammula min qedandî bû. Ji ber rewşa wî, bûyerek nebaş di navbera me de derbaz bû[68].

(... ...)

Herçî diçû têkilîyên nava hevalan xirab dibû. Casim kîngê bixwastana diçû serxetê û dihat, pir caran jî sedema çuyînê xwe îcat dikir. Piştî gelek xirabî Casim[69] ji partîyê veqetî çû nav grûba Zeki. 29 ê Avrîlê ez carek din çûm Şam ê. Bayram ji Elmanya hatîbû. 6 ê Gulanê ez vegerîyam Qamîşloyê, divîya Bayram jî bihatana Qamişloyê li wê derê me hev ra xebat û duzena malê plan bikirina. Bona ku em sê alî rûnin û programekê çêkin li benda Bayram in. Lê hatina Bayram her roj dereng diket.

8 ê Hezîranê ji du hevalan bêtir yên din hemû ji Qamişloyê çûn mala Hasekê. Xelîl, Hesen, Azad, Şahîn naxwazin li Hasekîyê bimînin probleman derdixinin. Li mala Hasekîyê jî têkilîyê hevalan bi berpirsîyar ra nebaş bû. Me li Hasekê komîtek bijart, hevalê Mecît Karahan jî bû berpirsîyarê komîtê.

Şahîn bi kesî ra napeyîve, dikeve odekê derî ser xwe digire saetan tenê li wir rûdine, dibêje heta Çarşemî, Pêncşemî hûn min neşînin Şamê ez terim Tirkîyê. Ji bo ku li

---

[68] K. Burkay di pirtûka xwe da ew tahrîf kirîye û li gorî vijdanê xwe nivisîye. Sedema nîqaşa min û Hazim ji welat derxistina zarokên min nebû, gora min wan di partîyê da hîzîpçîtî dikirin. Lê hemû endamên komîta merkezî a PSKT ê wê demê va rapora xwendin û di bîra wan da ye, an jî fotoqopî li ba wan e. Heger Burkay pirtûka xwe berî ku ez ji partîyê veqetîyam binivîsîna sedî sed bawerim ku wî wê usa ne nenivîsiyana.

[69] Tê gotin ew ji ber têkilîyên xwe li Başûr hatîye cezakirin.

Tirkîyê lê nayê gerandin, tirsa xwe tune. Dibêje ez nexwaşim min bişînin Ewrûpê! Ji me ra problem derdixine. Ez jî naxwazim xortekî Kurd li xerîbîyê ji mal here.

18 Hezîranê li Hasekê berê tevî komîtê, dûra jî tevî hemû hevalan me civîn çêkir. Di civîna komîtê de berpirsîyarê komîtê Mecît Karahan, Hesen (Qasim) bi tundî rexnekir, got; *"biryarên me li ser kaxizê dimînin, (... ...) Casim û Xelîl saet bê saet li malan digerin. Qasim bi serê xwe tim tere hin malan û tê, ew bê prensîb e, ez nika rim bi wî ra, komîtakê de bixebitim. Ew ne xwedî prensibên sîyasî ye ne jî pirestîja partîya me difikire. Bona ku em bi hev ra bixebitin, lazime ew xwe rexne bike, derewan neke û li pêl pirensîban neke. Ji me herduyan yek dikare dı komité de kar bigire. Qasim duh ji Xelîl gomlegekî kevn kirî ji min 25 lîra girt dayê. Xelîl ew pere di çûyîna Qamişloyê de kir xerçlix."*

Hesen di bersiva xwe de got gotinên Mecîd piranîrast in lê divê ew jî xwe ji ber çav ra derbaz bike. Mecît dibêje bi têkoşîna xwe ez hatime vê derecê û reklama xwe dike. Madem tu naxwazî bi min ra bixebitî ez jî naxwazim bi te ra bixebitim. Eger Mecîd derva karekî neke ez jî nakim. Dixwazim tenduristîya xwe qontrol bikim . Daxwazî û pêşniyarên hevalên din hat girtin.

Ji bona aşpezîyê nobedarî, semîner, qursa ziman (Erebî û Kurdî), ji partî û derûdorên polîtîk ra têkilî danîn, li derva karekî de xebitandin peyîvîyan. Ser gazinên hevalan di civînê de biryar hate girtin ku heval kar bibînin û bixebitin.

(... ...)

Bayram û Hazim bi wan ra têkilî danin û ew birin Şamê ba xwe. Meriv dibîne ku hemû nexwaşî ji yek viruseye û ji endamên komîta merkezî belav dibe. Ew bi hin gotinên şoreşgerî, van tevhevî û şaşitîyan perde dikin, dixwazin bi rîya Zarokên eşîrê hin pirsgirêkan derxinin û pê mixalefata xwe vêşêrînin. Ew bi vê tevlihevîyê dixwazin partîyê bê hêz bikin. Dîsa dixwazin bidin xuyakirin ku piştî berpirsîyarî ya wan li Qamişlo û Hasekê di nava hevalan de rewş çiqasî xirab bûye! Lê dawî de jîyan ew perdê ya ku bi derew û desîsan hatîye dirûtin wê biçirîne û rastî jî derkeve holê. Di xebata me de serkevtin daxwazdikim.

1983.9.20

Kurmanc (Kazim BUDAK)

Berpirsîyarê herêma Qamişlo û Hesekê

**Di civîna komîta Navendî de krîz**

Li ser dîtin û raporên berpirsîyarên herêmê, Polît Buro ya partîyê biryar da ku hevalên Kurdistana Rojhilat bikişin bên Sûrîyê. Heval bi rîyên îllegal ji Kurdistana Başûr derbazî Kurdistna Bakur, ji wir jî nêzî gundê Andewerê ji çemê Dîcleyê derbazî Rojava bibûn û roja 1983.07.09 hatîbûn Qamişloyê. Berî civîna Komita

Navendî ya 19 Îlon - 10 Cotmeh 1983an, partîyê hemû qadroyên xwe yê Rojhilatanavîn li Şamê civandî bû.

Partî di rewşek hesas de derbaz dibû. Salan bû qadro di mala partîyêda atil rudiniştin. Nuha jî qadroyan dixwast bizanin di pêşerojê de wê ew çi bikin? Li ber partîyê du rê hebûn: ya ji azadîya xwe fedekarî bike, bi dewletek Rojhilatanawîn ra bikeve têkilîyan, an jî Sûrî yê biterkîne. Komîta Merkezî ya partîyê rîya duyem bijart.

Partîyê biryar girt ku qadroyên xwe ji Sûrîyê derxine û *"li gorî pêwîstîyê"* li welatên Ewrûpa cîh bike. Piştî niqaşkirina *"mixalefetê"* di nava komîta merkezî de ji hev durketin hat holê. Hema hema komîta bibû, du beş. Êdî hin kesan ne gora bawerîya xwe, li gorî hevalê xwe piştgirî an jî li dijitîya pêşniyaran dikir. Li Ewrûpê belavkirina qadroyan de jî hin pirsgirêk çêbun.

Burkay di pirtûka xwe ya Anilar Belgeler cîldê 2. Rûpel 335 an de dibêje: *"Bo ku Bedirxan-Mahmûd di têkilîyên xwe de serkevtî bû me xwast ew here Hollandê. Wî jî ew der begen nekir."*

Dibe ku sekreter usa bi fikire, lê şandina Bedirxana Hollandê dijî daxwazîya wî (Bedîrxan) bû. Çimku Bedirxan dixwast li Almanyê cih bibe, lê endamên komita navendi yên ku li Elmanyê diman di nava xwe de tîfaq kirin. Bi blok li himber derdiketin, bi denge piranî Bedirxan çû Hollandê. Te digot vîza Elmanyê wan dida.

Halbuku bo Hollandê bere navê Husên Beysulen derbaz dibû, lê dûra cîhê wî bû Swêd û şûna wî de Bedirxan çû wir. Gora min Bedirxan ne ji bo Hollandê, ji bo ku hin kesan li himber wî tifaq kirin aciz bû.

Min wê wextê jî dît ku ew naxwazin Bedirxan here Almanyê. Ew ne ji ber fêyda partîyê, ji bo zikreşîya xwe li hember bûn.

Mehan şunda li ser wê pirse me sohbet dikir. Dema ku min ew yeka bîranî û li himber Bedirxan tîfaqkirina hindikan anî ziman, Husên Beysulen li himber derket û iddia kir ku wan tiştekî usa nekirîye.

Lê Ûnal got: Kazim rast dibêje, dema ku hun ji Şamê vegerîn te got;*"pir nema bû Bedirxan bê Elmanyê, me bi zorê pêşî lê girt."* Husên di cîhê xwe de sar bu ma.

Lê îro difikirim, *"gora hin pêwîstîyan û gora hêjmara Kurda li cuda welatan cîhkirina qadroyan"* di eslê xwe de şaş bû. Lazim bû kş kîder dixwast biçûna wir. Çimku welatê ku mirovan emre xwe tê de derbaz dikir divîya bu xwe bibijêre. Ya din ji kadroyê partîyê tenê ne endamên komita navendi bû. Li cuda welatan cîhbunê li cem hin fêydan, hin çetinayîyên xwe jî hebûn. Her civînek dibû sedema gelek wendakirina madddî û wext.

Pasaport piştî miraceatê mehan şunda didan, kesên welatên cuda nedikarîn bên civînan. Hevalên Elmanyê salan bû li li wir xebat dikirin, lê li welatê cîranê wan de rewş çibû, hêjmara Kurdên li wan welatan dijîn çîbû nedizanîn?

Zimanê Îngîlîzî ku di platformên navnetewî de xwedî qîmete, partî ne difikirîya çend kesan bişîne Îngîlterê û li wir ziman fêr bibin.

Metîn Yalçin li Sûrîyê hat wezîfedar kirin, wî jî îstifa kir. Li ser hin nîqaş û îstifa Metîn, Burkay aciz bû, ji sekreterîyê îstifa kir, civîn terikand û çû li oda din tene rûnişt. Min ji kekê xwe Mistefa xwast ku ew here sekreter şunve bîne, heger zêde dirêj bike, wê ew xwa biêşîne.

Mistefa çû ew girt şunda anî civînê. Li ser daxwazîya îstifakirina wî her endamekî komîtê dîtin û rexnê xwe got. Yê ku got, *"na, lazime tu sekreter bî, bê te nabe"* ez bûm. Hevalên din daha xunsarî nêzikî pirse bûn. Heta Husên tiştên xwînsartir jî gotin. Sekreter ji gotinên Husên yên wê gavê, daxwaza wî ya sekreterîyê derdixist. Digot, *"Husên çav berdaye sekreterîyê."* Di civîna komita navendî ya 1982 an de gotinên Zekî, yên, "di sêri de Husên jî reorganîzekirina partîyê de wek min difikirîya, lê dipirsîya, kî bibe sekreter?" jî sekreter dikir fikaran û ser van gotinan, digîhaşt wê encamê ku Husên çav berdabû cîhê wî.

Burkay ew yeka bîr nekir, hin caran gotinên wî dubare dikir û gelek mane jê derdixist. Dîsa rojekê em li ser bûyeran dipeyîvîyan. Sekreter wek hosîyê xwe dikir: *"Husên ne dostê vê partîyê ye. Ew divê tu wextekê nebe berpirsîyarê ya yekem a partîyê, ango sekreterê partîyê. Xeynî wî, ji we yek, wek Zîya, tu, Evdila an jî yekî din dikare bibe sekreter. Tenê Husên bila nebe, ji ber ku ew ne dirust e. Ew wesêta min e, tu bizanî."*

Min jî got: tenê bi serê xwe şahadbûna min dikare ne bes be. Got: *"ez vê yekê wê binivisîm jî."*

Dawîyê komita navendî hevalên ku terin kîjan welatî li ser kaxizê bi nav cîh kirin. Da ku ez li gorê wê hevalan ji Sûrîyê rêwî bikim.

Kemal Burkay bi dest nivîsa xwe ew lîste jêrin nivisî da min.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Sîdar | a- perwerda polîtîk | b- Fransa | |
| Felat | a- Fransa | b- Hollanda | c- Danîmarka |
| Hamza | a- Avusturya | b- perwerda polîtîk | |
| Nazim | a- Yunan | b- gora ceza wî, welat | |
| Azad | a- xwerexne bike | b- Fransa | |
| Şêxmus | a- Yunan | b- Fransa | |
| Selîm | a- Yunan | b- Swêd | |
| Serdar(PKK) | a- Fransa (perê bilêtê û mesrefa rê aîdî wî ye) | | |
| Serdar | a - Îswîçre | | |
| Mecît | a- Swêd | | |
| Haci | a- Hollanda | | |
| Metîn | a- Danîmarka | | |
| Yemen | a- Perwerda polîtîk | b- Fransa | |

Ahmet a- Perwerda polîtîk b- Fransa
Şerif a- xwerexne b- Avusturya
Qedir a- Fransa
Murat 1 a- Yunan
Cemîl a- perwerda polîtîk b- Fransa
Saît a- Awusturya
Cemîl a- Danîmark
Dîyar a- Îngîltere
Kasim a- perwerda polîtîk b- Ew nebû ser bê fikirandin
Murat 2 a- Sûrî
Esat a- Hollanda
Rêzan a- jê bê pirsîn dixwaze derkevî Ewrûpa, an dixwaze li Sûrîyê bimîne.
Dr. Rêzan welatekî Ewrûpê, bikare perwerda xwe biqedîne, dûre jêra bê gotin.
Cafer a- Elmanya
Seyîtxan a- Elmanya
Aram, jê bê pirsîn, li Sûrî dikare kar bibîne û bişûxule, bila bimîne. Rojên hatî de dikare vegere Tirkîyê. Bixwaze dikarin bişînin Swêd, Hollanda, Danîmarka
Muhsîn a- Perwerda polîtîk b- Awusturya (xwendevanî)
Avdila welatekî Ewrûpê, bikare perwerda xwe biqedîne, dûre jê ra bê gotin.
Sabît a- Sûrî
Bengîn a- Perwerda polîtîk b- Awusturya (xwendevanî)

Lê cîhê gelek kesan hat guhartin. Hindek endaman xwe daxwazkirin, hindek jî partîyê ji ber hin sedeman, cihên wan guharî.

1983.10.26

Di roja 26 ê Mijdarê de Dadgeha Leşkerî a Dîyarbekirê dewa PSKT 1. de biryar da. Di biryar de tê gotin ku PSKT, partîyek vêşartîye û dixwaze ji axa ku di bin îdara dewletê de ye, parçekî ji wê axê, bin îdara dewletê derxine. Li gorî Zagona Tirk a cezayê xala 171/1, 93 kes endamê partîyê hatin hesibandin û ceza kirin.

1-Mehdî Zana 24 sal, 2-Cemal Ekren 19 sal, 3-Nazîf Kalelî, 4-Kenan Kizil,5-Orhan Mîroğlu, her yekî 15 sal, 6-Yilmaz Çamlibel, 7-Wedat Erkaçmaz, 8-Ahmet Korkmaz, 9-Tayyîp Kizilyildiz, 10-Osman Topaloğlu, 11-Bozan Erdem, 12-Mustafa Aydin, 13-Yavuz Koçoğlu, 14-Kenan Alabay, 15-Muzaffer Sağlam, 16-Nîhat Yurtkiran 12 salan; 17-Ahmet Çetînkaya, 18-Huseyîn Öksüz, 19-Adnan Odabaşi, 20-Recep Elaldi, 21-Sertîp Karahan, 22-Necmettîn Salaz her yekî 10 sal; 23-Halît Karatay, 24-Abdulkadîr

Aydin, 25-Aydin Hasar, 26-Yavuz Budak, 27-Mehmet Ugur Şen, 29-Zülküf Baran, 30-Salîh Erdur, 31-Görgün Argan, 32-Hasan Temuçîn, 33-Abdulkerîm Ürün, 34-Sadik Arkayin, 35-Abdulcelîl Durmuş, 36-Îhsan Durak, 37-Hüseyin Yaman, 38-Halit Ayaz, 39-Kemal Duran, 40-İshak Ömerfarukoğlu, 41-Mehmet Necmettin Araz, 42-Naîf Kayacan, Cemîl Gülpinar, 43-Mehmet Yükselmîş, 44-Abdullah Çelebî, 45-Erdoğan Geyîk, 46-Mahmut Nedîm Saraçoğlu, 47-Cemallettîn Korkmaz, 48-Mehmet Rüstemoğlu, 49-Yusuf Seyhan, 50-Lezgin Yilmaz, 51-Saît Altürk, 52-Ahmet Siraç Süer, 53-Îbrahîm Tugrul Şermet, 54-Metîn Çîçek, 55-Îhsan Kiliç, 56-Orhan Atak, 57-Mehmet Emîn Aydin, 58-Celal Denîz, 59-Alî Çetînkaya, 60-Mustafa Gündoğdu, 61-Îsmet Yeltekîn, 62-Kutbettîn Arikboga, 63-Ferîdun Kaya, 64-Muzaffer Özturan, 65-Huseyîn Özdemir, 66-Mesut Başturk her yekî 8 sal cezayên giran hatin cezakirin. Yên din jî di navbera 3 mehe û 6 salan ceza girtin.

**Li Tirkîyê û Kurdistana Bakur hilbijartin heye**

1983.11.06

Îro li Tirkîyê û Kurdistanê hilbijartina parlamentoyê heye. Partî ya Demoqrasî ya Netewperest- Milliyetçi Demokrasi Partisi'ni (MDP) Turgut Sunalp, Partîya Gelperest-(Halkçi Part) Necdet Calp, Partîya Nîştiman- (ANAP) Turgut Ozal dikevin hilbijartinê.

Her sê partî jî bi destûra cûnta faşîst hatin damezrandin. Her sê partîyan soz da ku ew di nava sînorê programa cunta de bixebitin. Lê dîsa jî komîta cûntê bi eşkere piştgirîya partîya Sunalp kir. Kenan Evren di civînan de bang kir ku gel dengê xwe bide partîya Sunalp. Ew kevne general, merivê MÎT ê ye û nêzî cuntayê ye. Ew sê partî tenê bejdarî hilbijartinê bûn.

Li gorî encama hilbijartinê partîya Ozal % 45 ê dengan girt bû partîya yekem. Partîya Sunalp ya ku cunta faşîst piştgirî dikir bû partîya sêem. Ew yeka nîşan dike ku li himber cunta faşîst bawerîya gel kêm dibe.

1983.11.14

Amerika Yekbûyî di roja 13 Mijdarê 1983 an êrîşî girava Grenada kir. Hukim ji destê Mauîce Bîshop girt û da general Hudson Austîn.

Girava Grenada yê li nêzî Venezuella li mintiqa Qarayîpê ye. Li wir bi navê Antîlên piçûk gelek girav hene û Grenada yek ji wan giravan e. 106 hezar mirov lê dijî. Grenada heya sala 1974 an kolonîya Îngîlîzan bû.

Di sala 1979 de Maurîce Bîshop bi midaxeleke leşkerî desthelatî ji serokwezîr Erîc Gaîry girt. Bîshop xwe sosyalîst bû, bi welatên sosyalist ra têkilîyên baş danî.

Serokê dewleta Amerîkayê Ronald Reagin, ji wî xwest, ew têkiliyên xwe ji welatên sosyalîst, xasima ji Kûbayê ra qût bike. Digot: *"em li hember vîrûsa komunîzmê, ya ku li Qûba belav dibe ne."* Amerika Yekbûyî di roja 13 Mijdarê 1983 an êrîşî girava Grenada kir. Hikim ji destê Mauîce Bîshop girt û de general Hudson Austîn. Bîshop ji hepsê bazda hat xwest li meydanê bangî gel bike, biaxife, li meydanê hate kuştin. 600 karkerên Kubayî li kêleka Bîshop cî girt, hin ji wan dîl hatin girtin, yên din jî şandin welatê wan.

1983.11.15

Cepha Demoqratik a Filistînî di saet siseyan de li buroya xwe bi hêzên Tirk û Kurd ra civînek darxist. Mijar li ser rewşa tevgera filistînîyan, şerê navbera hêzên filistînî û destwerdana dewletên erebî bû. Di civînê de TSÎP, TÎP, TKP/B, EB, (Yekitîya ked), PKK, pênc grubên nava Hevkarî yê (PSKT, PPKK, KUK, AR, Têkoşîn) amade bûn û nirînên xwe anîne ziman. Piştî axavtina peyîvdarê Cepha Demoqratik min jî mafê axaftinê girt û ev dîtin anîn ziman.

Em tevgera Filistînê, alîkarîya perwerda leşkerî û tecrubên polîtîk ve ji bona şoreşa Rojhilatanavîn, Tirkîye û Kurdistanê mutefiqê xwezayî dibînin. Ji bona wê serkevtina tevgera Filistînê an jî binketina tevgera Filistînî li xebat û pêşketina me jî tesîr dike. Gelê Filistînî jî wek gelê Kurd di bin zilm û terora dewletê de ye.

Tevgera Filistînî di şerê Beyrûtê de zerara leşkerî dît û sengerên giring wenda kirin. Lê wek sîyaset ew serket. Îro Sîyonîzm û emperyalîzm ji bona serkevtineke sîyasî bi taktîkên nû tevdigere.

Bona ku tevgera Filistînî li ser axa xwe nine, ew yeka bi xwe ra hin pirsgrêkan tîne holê. Hin dewletên Ereb ku îro midaxela karê tevgera Filistinî dikin ji ber vê yekê ye.

Yekitîya PLO îro ji her demê girîngtir e.

Di nava hemû enî û hêzên demoqrat de hebûna cuda îdeolojî û cudafikirandinê tiştekî xwezayî ye. Dijitîyên usa bi prensîbek demoqratîk nîqaş û îknakirina di nav xwe de çareserkirin rêya herî raste. Bi alîkarîya hin dewletên dost! û bi çekdarî halkirina pirsgirêkên nava gruban metodek şaş e, kêrî dijminê Filistînê tê. Pirsên navxweyî divê bi rêyên demoqratîk bêne çareserkirin. Îrada kollektîf û biryarên Meclîsa Filistînî ya netewî ra rêz bê girtin. Di eynî wextê de bona ku em bikarin PLO û El- Fethê rexne bikin, kêmasî û şaşitîyên karbidestan û programên wan jî em bizanin. Di derheqê wan de zanînên me kême. Em têkoşîna gelê Filistînê ku bi pêşengîya PLO de tê dayîn piştgirîyê dikin û PLO jî nunerî gelê Fîlistînê ya bi heq dibînin.

(……)

1983.11.18

Polîsê Sûrî ji ber gefên dewleta Tirk 18 ê Mijdarê nişkewa kesên li nêzî sînor ciwar bibûn ango Kurd û Tirkên ku li Qamîşlo û Hasekî diman şevikê komkirin û bi otobosan anîn Şamê. Em bi vê hejmara hevalan ra ne amadene. Wê şevê me çû ew heval ji îstasyona polêsan girtin anîn û li male hin dostan belav kir. Dora roja din li taxa Kurda me malek din kirê kir û heval tê de cîhkirin. Hêjmara me li Şamê gîhîştîye 48 kesan

1983.12.12

Îro gelek heval me şandin Ewrûpa. Hin ji wan terine Swêd, hin jî terin welatên Ewrûpa yên din. Şaredarê Agri yê Urfan Alparslan, jina min Nazli, keça me Cîran û Ötrî terin Swêd. Şev saet 3 û nîvê de balafira wan ra dibe. Em li balafirgehê wan rêwî dikin. Cîran derbazî hindur bû, dî ku ez narim bazda şûnde hat, ez hembêz kirim û ji min dipirse "çima ez narim?" ew ditirsê ku carek din bavê xwe wenda bike.

Piştî nîvro saet 13.30 de jî teyera Dîyar[70] ra bû, ew jî tere Londrê.

**Yilmaz Apaydin xwe kûşt**

1983.12.13

Îro bûyerek xirab qewimî. Saît,Yilmaz Apaydin xwe kûşt. Ew berî demikê ji Kurdistana Rojhilat hatî bû Qamişloyê.

Wexta ku polîsê Sûrîyê hevalên Qamişloyê û Hasekîyê kom kirin anîn Şamê, Yilmaz jî di nava wan de bû. Yılmaz 12ê Îlonê li Wanê ji alî polîs ve hatîbû girtin, îmtihanek baş ne dabû. Wî pêşniyara polîsan a *"bihev ra xebatê"* bona ku xwe xilas bike qebûl kirîbû. Ew piştî ku ji girtîgehê hatî bû berdan, wî ev agahdarî dabû partîyê. Lê ne wî ne jî partî yê ew taktîk (!) baş nedî. Ew bi alîkarî ya partîyê derbazî Kurdistana Rojhilat bû, li wir dû salan di meqerê partî yê de ma.

Wexta ku partîyê hevalên xwe ji wir kişand, ew jî tevî xwe anî Sûrîyê. Bona ku zaaf nîşan dabû, partîyê têkilîyên endamtîya wî qût kirîbû. Lê partîyê dixwast ew

[70] Hevalên ku derketîbûn dervayî welat navê cûda bi kar dianin. Yavuz ji navê xwe kirîbû Dîyar. Min ji kekê Mistefa agahî girt ku Dîyar li Londrê polês ew girtiye bin çavan. Ji ber çi sedemê ye em nizanin, 54 rojan girtî ma.
Salan şunda ez fêrbûm ku sedema girtina wî ji deftera ku li ser wî hatiye girtin bûye. Dema ku ew li qampa filistînê maye, ji dersdarên filistînî hin not girtine. Di defterê da li ser çekan û şerê gerilla hin not hebûne.

nekeve destê dijmin, dervayî welat, Ewrûpê kiderê dixwaze alîkarî bike wî bişîne wir.

Li Şamê Yilmazê ku min dît, bê deng, bê teqet, bê moral û bê hêwî bû. Lê li himber destûrên civakî berxwedan ne rehet bû. Wî eşkere digot ku ewê întixar bike, xwe bikûje. Me pir hewl de wî ji wê pîsîklojîyê xilas kin, lê di dawî de wî ya xwe kir.

Cara pêşin dermanê xewê girt, kete qoma yê. bona ku em li Sûrîyê vêşartî diman, me bi alîkarîya xwendewanên Kurd ew bir ser navê Kurde kî ji Qamîşloyê li nexweşxana Muvasat razand. Li nexwaşxanê jî me hevalek wek bekçî da ber. Mada wî paqiş kirin, piştî çar rojan ji nexwaşxanê derket.

Cara dûyem xwest xwe bi têlê bi xendiqîne, hevalekî dema dawî de ew xilas kir. Bo ku ew bizane rêwîyê Ewrûpaye, min pasaporta wî û bilêta wî ya ji bo Swîsrayê girtî bû pê nîşan da. Min got tu terî welatê Ewrûpa, li wir tu çawa bixwazî usa dikarî bijî. Jin û keça xwe dikarî bigirî ba xwe. Li wir gelek derfet hene ku meriv xwe pêş xine.

Lê tu tiştekî ew qane nedikir. Me dî ku wî întixar kirîye hişê xwe, me bo çavdêrîya wî bike, hevalek wezîfedar kir. Rojekê, kesê ku çavdêrîya wî dikir derdikeve derva. Ew vê yekê firsend dibîne hildikişe qatê pêncan û xwe ji wir davêje jêr. Bi alîkarîya cîran û polisan wî radikin nexwaşxanê lê em nizanin ew birine kîjan nexwaşxanê. Piştî ku em li hemû nexwaşhanên li Şamê gerîn û me cinaze nedî em hatin nexwaşxana Îbnnefîs. Ev nexwaşxane 200 metre ji mala me dûr bû. Cesedê wî di nava torba cawekî sîpî de li morgê bû. Qereqola Rûkneddîn li ser pirsê radiwestîya. Nama ku nivîsîya bû, saet û gustîla wî li ba polês bû.

Di nama xwe de nivisî bû, *"Piştî ku ez ji hepsê derketim, min deh rûpel nivîsî û da sekreterê partîyê. Ew tiştên ku min di wir de nivîsîne rast in. Min îxanet nekir, ez ne xayîn, lê revok im. Revokên mîna min lazim e li Kurdistanê nejîn. Keça min bigirin partîyê. Bila ew kesekî nexweş ra nezewice. Ji jina xwe ra dilgeşî daxwazdikim. Bila Tayîb (brayê jina wî) baş bizane ku min nekarî bibim nunerekî baş a partîyê. Çavê MÎT a Tirkan ronî be. Bila Yemen neye xelat kirin.*

*Bijî Kurdistana Azad, bijî têkoşîna bi biryar." Yilmaz*

Bi alîkarîya hin partî û Kurdên welatparêz ew me li taxa Kurdan bin ax kir. Du Kurde welatparêz, Bavê Loqman û muteahît Bavê Rêzan bi daxwaza xwe gora wî çêkirin. Li ser kevirê gora wî ew nivîs hat nivîsîn:

YILMAZ APAYDIN 1953 –WAN

ÇILEYÊ PÊŞIN 1983 - ŞAM

JI BER HUKMÊ FAŞÎST

JI WELATÊ XWE DERKETÎ BÛ.

Bi rîya hin hevalan me xwast telefona jina Yilmaz bi dest xinin, tiştên ku ji mêrê wê maye em jê ra bişînin. Lê me edrês û telefona wan nekarî bi dest xinin, dawî min saet û gustîla wî teslîmî merkeza partîyê kir. Ji bona roja 18 ê meha Çileyê Pêşin jî wî ra bilêt hatî bû girtin ku ew here Siwîsra yê. Lê di wê rojê de me ew spart axê.

**Li Şamê têkilîyên hêzên Kurdistanî û Tirkîyê**

1983.12.23

Di nav grub û partîyên Kurdistanî û Tirkîyê de yên ku li Sûrî ciwar bûne, têkilîyek germ heye. Nunerên hêzan di nava xwe de dicivin li ser rewşa Tirkîyê û bûyêrên ku li wir diqewimin, radiwestin û xebatan dikin.

Heftekê berî gruban daxwaz kirîbû ku, li ser rewşa Rojhilatanavîn û Tirkîyê hin agahî bên parvekirin, him jî rewşa sîyasî bê şirove kirin. Nunerên PPKK, AR, PSKT, TKP-B, TKEP, Partîzan Yolu, PKK û Dev-Yol li mala Ala Rizgarîyê saet 11.00 de hatin ba hev. Ji tevgera Dev –Yol ê du kes beşdar bibûn, lê herdu beşdaran jî dane zanîn ku ew *"temsîla Dev-Yol ê nakin, dê ser navê xwe bipeyîvin."*

Grubên din ji vê yekê ra îtiraz kirin, wan dan zanîn ku vî awayî prensîba demoqratîk a merkezî tê binpêkirin û anarşîyê tîne holê. Civîn ne ya şexisan, civîna tevgeran e. Kesên amade, ne ser navê xwe divê ser navê tevgerê bipeyîvin. Ser wê wan civîn terkadin. Hêzên mayî li gorî rojevê xebata xwe domandin. Dawîyê bejdaran biryar girt ku, di peryodîk civînan de ew bên ba hev û li ser hin babetan dîtin û ramanên xwe ji hev ra bidin zanin. Ji bona vê hin mijarên (babet) nîqaşê hatin tesbît kirin.

**Ji bo nîqaşê mijarên ku hatibûn tesbîtkirin ev bûn:**

1-a)Rewşa tevger a şoreşger û karên dikevin ser milê wan çi ne?

b)Li zîndana Dîyarbekir guhartinên dawî çi ne?

2-Tevgera şoreşger û Kemalîzm

3-a)Pirsa yekitîyê û enî yê.

b)Di navbera hêzên Kurdistanî û Tirkîyê de enîyek çawa bê avakirin?

4-Faşîzm û li Tirkîyê û Kurdistanê kirinên Faşîzmê

5-Pirsa Filistîn, Lubnan û Sûrîyê,

6-Rewşa Îran û Iraqê,

7-Polîtîka emperyalîzmê ya li cîhanê û li herêma me û vê polîtîkayê de rola dewleta Tirk.

**Di derheqê civînê de jî hin prensîp hatin destnîşan kirin:**

Civîn mala ku lê çê dibe ji alî wan ve tê rêvebirin. Li ser her mijarê 2-3 car mafê peyvandinê heye.

Ji her grubê 2 kes dikare beşdar be, yek dibe peyivdar. Grub nikarin wek gozlemcî-çavdêr beşdarbin. Ji bona rewşên awarte hêza ku ji bo civînê bang dike, cîh û saeta civînê jî dide xuya kirin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| a)Yêkemîn civîn | 15.01.1984saet10 an de li mala, | | TKP-B |
| b)Duyemîn civîn | 29.01.1984 | " " | Partîzan Yolu |
| c)Sêyemîn " " | 12.02.1984 | " " | PPKK, |
| d)Çaremîn " " | 26.02.1984 | " " | PKK, |
| e)Pêncemîn " " | 11.03.1984 | " " | AR, |
| f)Şeşemîn " " | 25.03.1984 | " " | PSKT, |
| g)Heftemîn " " | 07.04.1984 | " " an li mala | TKEP da, |

civandin hat pejirandin.

Roj û saeta ku hatîbû pejirandin grup dîsa civîyan. Li ser xala yekemîn civîn di roja 15 ê Çileya Paşin 1984 an de li mala TKP-B dest pêkir. Beşdaran bi dor û li gorî wextê veqetandî dîtinên xwe gotin. Di civînê de bi dor her kesî 30, 20, 10 deqîqe dîtinên xwe anîn ziman.

Ser navê PSKT ê me da zanîn ku; wek hêz û partîyên Tirkîyê û Kurdistanê em di nava xwe de civînên peryodik pêk tînin. Li ser pirsên herêmî û welat ditinên xwe tînin ziman tişteki hêjaye. Va platforma dikare ji hin hevkarîyan ra, rê jî veke, lê divê wek platformek hevkarîyê an jî enîyekê neyê dîtin, ji ber ku ne usa ye.

Rizgarîyê, bona ku rojev li gorî pêşniyara wan nehat serast kirin civîn terikandin. Kesê ku ji Dev Yolê hatîbû jî dîsa xwest ne li ser navê tevgerê, ser navê xwe bipeyîve. Hemû grub bona ku ev metod nebe kevneşopîyek, li himber derket, wî jî ciwîn terikand.

Cîvîna duyem li ser Kemalîzmê jî 29.01.1984 an de li mala Partîzan Yolu de hate çêkirin. Nîqaş li ser babetê qedîya şûnda hin hevalan xwastin, li ser nivîsa kovara Serxwebûnê rawestin. Di nivîsê de bi sernama, *"xeynî mîstek alîgirên dijmin hemû kurd PKK yî ne."* PKK e di vê nivîsa de bi gotinên giran, hêz û kesî dervayî xwe gunehkar dikir.

Ji hêla nunerên AR, PPKK û PSKT ve ew nivîs hate şirove kirin ku ev gotinên usa ji nêzikbûna hêzên welatparêz ra xizmet nake. Ji hevalê PKK ê hate pirsîn demek usa de ku hemû grub, hêzên Kurd ji bona enîyek Kurdistanî dixebitin, nivîsek usa tesîrek çawa li van têkilîyên heyî bike?

Nunerê PKK ê nivîsa ku di Serxwebunê de hatîbû weşandin parast. Di nava me de nîqaşên hişk hatin kirin. Dawî nîqaşan em gîhiştin wê encamê ku civîn nikarin bên domandin û hat rawestandin. Ji ber vê sedemê navenda ku hin babet bi hev ra dihatin nîqaşkirin dawî lê hat. Piştî wê hêz tenê bo ku li himber hin bûyeran tepkî bidin xûya kirin, an jî belavok derxinin hatin ba hev.

Platformê bo piştgirîya berxwedana girtîyan bike û êşkence û zordestîya ku li zîndana Dîyarbekir, li ser girtîyan tê kirin, protesto bike, biryara belavkirina belavokekê girt. Li ser berxwedan û komkujîya zîndana Dîyarbekir biryar hat girtin ku ji alî PSKT û Partîzan Yolu va belavok bê amadekirin. Belavoka jêrin hat nivisîn û ser navê 10 hêzan hat belavkirin. Kurdîya belavokê li cem min tune, min ji bo xwe ew ji Tirkî wergerand Kurdî.

**Di zindana Dîyarbekirê de berxwedan heye!**

*Di zîndanên Tirkîyê û Kurdistanê de dîsa dengê berxwedanan tê. Di mehên bihurî de ji ber her cûre êşkence, zilm û zordarîyê hevalên me yên girtî di girtîgeha Stenbol, Mersîn, Antakya, Îzmîr, Dîyarbekir û Erzorimê de serî rakirin û cûre cûre çalakî, berxwedan pêk anîn. Dîsa di sere meha Îlonê de di zîndana Dîyarbekir û Erziromê de rocîya birçîbûnê û rocîya mirinê pêk anîn.*

*Evana hemû sê sal û nîve berxwedanên li dijî şertên zîndanên faşîzmê ya bermayîyê qirna navînin. Bo ku gel ji van berxwedanan haydar ne be, cunta Faşîst medya sansûr kir, bi girtîyan ra hevdîtin qedexe kir, çi ji dest hat kir. Girtîyên ku berxwedan dimeşandin-dijraber, rastî êşkencên giran hatin. Di girtîgeha Erziromê de bona ku girtî dawî li rocîya grevê bînin, faşîstan dane zanîn ku daxwazên wan hatine pejirandin. Lê piştî ku berxwedan hat qedandin, wan girtî kirin hucran û dîsa dest bi êşkencan kirin.*

*Li Dîyarbekir jî eynî çerx tê karanîn. Bi berxwedanên Îlonê rocîya mirinê, rocîya birçîbûnê şoreşgeran hin maf bi dest xwe xistin: wexta hevdîtina zîyaretvanan derketîbû 10 deqîqan, hevdîtinan de bi Kurdî dikarîyan bipeyîvin. Girtîyan dikarîbûn bi parêzerên xwe ra hevdîtin bikin. Dîsa rojname, pênus, kaxiz, kinc-çek dikarîya bigirtina girtîgehê. Paqişî û banyo kirin ku berê hima hima tune bû, hatîbû zêde kirin. Wexta derketina bexçe û hevagirtin hatîbû zêdekirin.*

*Lê faşîstan dest xistina ewqas "maf" jî zêde dîtin, bi parêzeran ra hevdîtina girtîyan hat qedexe kirin. Hemû girtîyên ku cezayê êdam û muebbetê girtine kirin hucreyên tek. Zîyaretvanên tên nikarin girtîyan ra hevdîtin çêkin, li ber derê girtîgehan têne lêdan û hatina wan tê asteng kirin. hemû cure êşkencên ku tê hişê merivan li ser şoreşgeran tê bi karanîn.*

*Ew kirinana jî hemû dewama teror û êşkenceyan e, ku bi salane cunta faşîst bi kar tine.*

*Faşîzmê gelê me bi bêkarî û buhabuna herî mezin, mijandina herî bê vijdanra dorpêç kirîye. Ji alî din ve jî ewladên wanî herî hêja, yên ku emre xwe di nava têkoşînê de derbazkirine, nifşek şoreşger di zîndanan de pûç bike, di êşkencexane û sêdaran da, li sûk û çîyan de ji ortê rake. Xortên me yên teze jî hîn ew nehatine rastê, dixwazin bi bosî ya Ataturkcitîyê bêhiş bikin, bi afyon û fuhuşê bikujin.*

***Dîktatorîya faşîst a leşkerî** ne tenê neyarê gelê Tirk û Kurd e. Ew hemû gelê herêmê tehdît dike. Cunta û hikûmatên wê bi kilifa îslamîyetîyê, dostayetîya Eraban, biratîya Filistînê tenê şalê ser vêşartina neyartîya gelê herêmê ye.*

*Cunta faşîst di welat û herêmê de mîsyonek ha girtîye ser xwe, di vê navberê de bona ku raya gelê Tirkîyê û cîhanê bixapîne sextekarîya "Derbazbûna Demoqrasîyê" kar tine. Hilbijartinên 6 ê Mijdarê ji "Takvîma demoqrasîyê" yek rûpel kêmkir, lê hilbijartinan jî nekarî êrîş û destdirêjîya **cunta faşîst** vêşêrîne. Hikûmatên ku bi bijartina," Çil qantir? An çil satir?" ve hatine damezrandin jî tenê dikarin bibin rêvabirên van polîtîkan. Yên mîna Özal nikarin" derbazî demoqrasîyê bin"tenê dibin hacetên "qanunîkirina faşîzmê". Di nava mija "derbazbûna demoqrasîyê da" dengê gurên kevn jî tê gûhên me. Demirelan, Çaglayangîlan, ew sîstema ku hesret dikişandin û ji bo destxistina wê, xwîna hezaran şoreşger rijandin, îro ew di paş Ozalê ku bi deste xwe xwedî kirin pêşkeşî Cuntayê kirin da xwe lehengê demoqrasîyê dihesibînin û ji bo hikim bikin deste xwe hewl didin.*

*Neyê bîrakirin ku ew xwe di mixalefetêda ne, lê fikra wan, programa wan li ser hikim e. Dîsa yên ku duhî li meydanên hilbijartinan de dibûn "gelperest", "demoqrat" lê wexta ku tên ser hikim jî dibin netewperest, piştgirên îdara orfî; gel dawet meydanan dikin lê dema ku sere sungu dibinin, xwe bêdeng dikin, lê bo bibin desthilat dîsa şampîyonîtîya demoqrasîyê ew dikin.*

*Beranberî vê ji ser derba leşkeri ra sê sal û nîv derbaz bûye jî, tevgera şoreşger hîn jî bîrînên xwe nepêçaye, li himber faşîzmê têkoşîn durist nekirîye. Belavbûn berdevam e. Di bin rastîya; bê yekitî, li himber faşîzmê şer nabe, ji dema buhurî ders bigirin, hemû hêzên li dijî faşîzmê anîna ba hev û gav avêtin şert e. Bi wî tehrî em dikarin derse bidin dîktatorîya faşist, xûlamên wê, demoqratên derevker. Em encax bi wî şiklî dikarên rîya gelen me ya serketinê ronî bikin. Ew dengên berxwedanê ku ji zindana Dîyarbekir û zîndanên din, yên ku her yek bûye kela berxwedanê tên vê yeka tîne ziman.*

***Raya gelê pêşverû ya cîhanê***

*Şoreşgerên girtîgeha Dîyarbekir, bi sedema şunda girtina mafên ku bi berxwedanên bere bi dest xistîbûn, carek din ketin berxwedanan. Ji 12 Îlonê vir de di zindana Dîyarbekir de nêzikî 30 şoreşger, welatparêz hat qetilkirin. Lê dîsa jî li himber zulma girtîgehê sirhildana girtîyan berdewam e. Vê carê jî, ji alî leşkeran ve lêdana zîyaretvanan, qedexekirina hevdîtinan girtî derketine ser banî girtîgehê cunta û kirinên wê protesto*

*kirine, slogan avitine, xwepêşandin pêkanîne. Ser wê yeke leşker gulebaran kirîye û birakî me kûştîye. Di girtîgehê de pir birîndar hene. Li Dîyarbekir gel civîyaye ser hev û ber Kolordîya leşkeri meşîya ye, ser rewşa zîndanê daxwaznivîsek pir îmze dane, serleşker. Dîsa ser navê hemû girtîyan bi du îmzeyan îstidayek hatîye dayîn.. de tê zanîn ku ji ber êrîşên faşîstan, ji alî dijraberan ve koxuşek hatîye şevitandin.*

*Birêvebirê faşist a girtîgehê bona ku pêşîyê li berxwedanan bigire, bi sistematik lêdan û her cure êşkencan bi kar tîne, birayên me yên nexwaş û birîndar terkî mirinê dikin. Faşîst bi metodên ku di dezgahên CÎA yê de hatine pêş xistin li ser şoreşgeran diceribînin, dixwazin wan ji bawerî û mirowîyê durxine, wan teslîm bigire, berxwedana wan bişikîne.*

*Lê çi heye ku şereşger yeku yek bimirin jî serî natewînin.*

*Hemû kesên dijberîfaşîzmê, demoqratên rasteqinî, pêşverû, gele Tirk û Kurd a mêrxwas!*

*Gûh bide denge bira, ewladên xwe yên li Dîyarbekir berxwe didin. Ewana ji bona azadî û serxwebûna gele me û bona demoqrasîya rasteqinî berxwe didin. Wahşata ku cunta faşist li ser wan pêk tîne ji ber wê ye. Ew kîn û qara li himber berxwedanan ji bona we ye. Qodamanên xwedîpere û celaddê wanî dest bi xwîn li ser şoreşgerên zîndanan bo qetlîamên mezin amadekarîyan dikin. Divê em her cure îmkanên di deste meda hene li himber wan bisekinin. Hindur û dervayî welat ji bona teşhîrkirina hikûmatê, ya kukla cuntayê xebatên xwe zêdebikin.*

*Bimire dîktatorîya faşist a leşkeri*
*Bijî, berxwedanên zîndanên faşîzmê*
*Bijî yekitîya têkoşîna gele Tirk û Kurd*

Acîlcîler (THKP-C)
Alarizgarî
Emegîn Bîrlîgî
Partîzan Yolu
PKK (Partîya Karkerên Kurdîstan)
PPKK (Partîya Pêşenga Karkeri Kurdistan)
KUK (Kurdîstan Ulusal Kurtuluşçulari)
TKEP (Turkîye Komunîst Emek Partîsî)
TKP-B (Turkîye Komunîst Partîsî Bîrlîk)
TKSP *(Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê)*

*1984.01.18*

Lê wê carê kesê ku ser navê Dev-Yol ê hatîbû civînê dixwast di belavokê de qismê ku ji bo Demirel û Sosyal Demoqratan hatîye nivisîn, ji belavokê bê derxistin. Pêşniyara wan nehat pejirandin, îmze nekirin.

Rizgarî û Kurtuluşê jî nedixwastin di belavokêda tesbîta faşîzmê cîh bigire. Bona ku wan hikmê 12 Îlonê wek faşîzm nedidîtin, pêşniyara wan jî hat red kirin. Ew belavoka jorin ser navê deh hêzan hat belav kirin.

Belavoka dûyem,

**Di zindana leşkerî ya Dîyarbekir de berxwedan dom dike!**

*Mafên ku şoreşgerên girtîgeha leşkerî ya Dîyarbekirê, bi berxwedan û bedêlan bi dest xistîbun ji alî îdara zîndanê ve hate xesipkirin. Ser wê yekê girtîyan di destpêka Çileya Paşin de dest bi rocîya birçîbunê kir û ew hîn dom dike.*

*Qetilkarên destbixwîn a dîktatorîya faşîst ji bo ku berxwedanê têk bibin bi metodên herî wehşî êrîş dikin. Wek tê zanîn 18.1.1984 an de em10 hêzên ku vê agahîya didin, bi ser nama "Di Zîndana Dîyarbekir de Berxwedan Heye" belavokek belav kirîbû. Di wir de êşkence û kirinên karbidestên zîndana Dîyarbekir anîbû ziman û bala raya gel kişandîbu ser êhtimala qetlîaman.*

*Li gorî agahîyên teze, yekineyên leşkerî êrîşbirine ser koxuşa girtîyan, ew gulebaran kirine û koxuşa 3em û 4em jî agir berdanê. Gelê Kurdistanê di vê êrîşa barbar de sê ewladên xwe yê mêrxwas dilxwazê Partîya Sosyalist a Kurdistana Tirkîyê Yilmaz Demir, mîlîtanê Partîya Karkerê Kurdistan Halîl Çatak û Necmettîn BûYûKKAYA ku (di dewa Partîya Karkerê Kurdistan-KÎP –DDKD de dihat mehkeme kirin) şehîd da. Dîsa tê gotin ku hin kuştîyên nasnama xwe ne dîyar û dora 20 kesî jî birîndarên giran hene.*

*Beramberî êrîşên karbidestên zîndanê ya qetilkar jî berxwedan dom dike. Bo bûyer eşkere nebe herêma ku zîndan lê ye leşker girtîye binê qontrola xwe, ketina kesên sîvîl hatîye qedexe kirin. Malbatên girtyan nikarin ji ewladên xwe agahî bigirin.*

***Raya gel a cîhanê, medya pêşverû, şexis û sazîno!***

*Bi mana pêşî li terorê girtinê Cunta faşîst hatina ser hukim vir de li himber hêzên demoqratîk û pêşverû, himber gelê kedkar, li himber gelê Kurd ya ku li himber zordestîya netewî radiweste şerekî har didomîne. Mal, gund navça ku êrîş û sekirin nekirîye nehişt. Hezarî zêtir kes teror, êşkence û zordestîya ku bi destê dewletê tê kirin hatin kuştin. Sedhezaran kes di êşkencan de hatin derbazkirin, sedan kes seqet man. Dîktatorîya faşîst ku Tirkîye û Kurdistan kirîye zîndan bi vê jî qîma xwe nayne, dixwaze ewladên mêrxwas yên gelê me di zîndanan de îmha bike. Hezaran welatparêz, şoreşger şerê jîyan û onura mirovahîyê dide. Îro tiştên ku di zîndana Dîyarbekir de diqewimîn qetlîam bi xwe ye. Malbata girtîyan, gelê Tirkîyê û Kurdistanê di nava jan û*

*gumanêda ye. Em bangî we dikin li Dîyarbekir di zîndanên mirinê de li himber dîktatorîya faşîst piştgirîya têkoşîna bi rumet tê meşandin bikin û qetliaman protesto bikin. 2.2.1984*

*Acilciler (THKP- C)*

*Alarizgarî*

*Emeğin Birliği*

*Partizan Yolu*

*PKK (Partîya Karkerên Kurdîstan)*

*TKEP (Turkîye Komunîst Emek Partîsî)*

*PPKK ( Parti Pêşeng a karkere Kurdistan*

*KUK ( Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistan)*

*TKP(B) Türkiye Komünist Partisi (Birlik)*

*TKSP (Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê)*

*26 Çileyê Pêşin 1983*

*M. Alîcan,*

*Mesaja me ya ji bo 9 salîya partîya me ji we ra rê dikim. (...)Ji bo 9 salîyê li Elmanyê şevek pîrozkirinê fikirîbûn, lê me bo ku program negîhand, ma. Heval vê sersalîya 9.emîn bi civînên herêmî pêk bînin. Ji bo 10 salîyê wê em ê xwe amade bikin.*

*Di 30 ê Çileya Pêşin jî li Stockholmê civînek usa bê plan kirin.*

*Ji bo ji wir derxistina hevalên din jî em hewl didin. Bawer dikim, di nava meha Çileya Paşin de emê biqedînin.*

*Ji bo pirsgirêkên ku li wir derdikevin xwînsar bin. Rewşa hevalên hatî baş in, ji bo çareserkirina pirsgirêka cîh bûna wan em hevl didin. Hîn jî Dîyar bernedan e. Lakîn êhtimala şunda şîyandinê qels e. Dereng agahî dane me. (tarîxa wî ya derbazbûna wê derê em rojekê berê fêr bûn) tesîra wê yekê jî bû.*

*En hindik hefteke, berê ku bilêtê hevalan bigirin, me agadar bikin. Wekî din jî bi kîjan balafirê û kîjan saetê hereket dikin, navê rastî û navê di pasaportan jî.*

*Hevdîtinên ser Hevkarîyê nuve hate xitimandin. KUK "serxwebûnê" diparêze û "têkoşîna çekdarî" jî wek bingeha têkoşînê dibîne, dixwaze têkeve (programê). Me red kir.*

*Rîya Azadî hejmara Cotmeh-Mijdarê çap bû. Hejmara Çileya Pêşin jî amade ye.*

*"Dimdim" çap bû. Roja Nu hejmara 3em jî çap bu.*

*Wekî din me pênûsên partîyê derxistin. Ji we ra bişînin.*

*Kongra federasyonê meh û nîv şunve hat paş xistin.*

*KUK û ... ... (nat xwendin) piştgirîya berendamê dijî me dikin.*

*Slav û serkevtin.*

*Têbinî: Ji mesajê yek nimune ji we ra rê dikim.*

1984.01.15

Li Fîlîpîn dîktator Markus serokê mixalefetê Aquîno, ku ji koçberîyê vedigerîya li balafirgehê de kuştin.

**PDK-I ra têkilîyên me**

1984.02.05

Di civîna Komîta Merkezî ya 1983.09.19 da li ser têkilîyên me û PDK-I jî hat sekinandin.

Bi salan bu têkilîyên me bi Partî Demokrata Kurdistan- Irak ra tune bû. Komita merkezî, di civîna xwe de polîtîka partiya me ya li himberî wan rast dît, lê ew piçekê hişk hatîbû ziman. Ji ber wê yekê, bi salan bû tu pêwendî di nava du partîyan de nehatîbû danîn.

Di vê civînê de komita merkezî gîhaşt wê encamê ku bi PDK-Iraq ra têkilî bê danin. Em bikarin li wan bigerin û dan û standinikê bikin.

Ser wê biryarê me bi berpirsîyarê wan ê Şamê ra têkilî danî. Min û Bedirxan ser navê partîya me, bi du endamên PDK- Iraq ra di roja 1984.02.5 hevdîtinek çêkir. Ew navbera van partîyana de yekem dîtin bû. Ser navê PSKT ez û Bedirxan, ser navê PDK-Iraq jî Gazî Berwarî û Doxtor Cercîs amade bûn. Me li ser civîna duhî û êrîşa PDK-I ya ser Kurdistana Rojhilat sohbet kir. Li ser rexnên me, wan got ku, em naxwazin Kurdên perçê din şer bidin destpêkirin. Ew yeka şerê me yê heyî qels dike. Ser wê min jî got *"ma hun mixtarê Kurdistanê ne?"*Sibê li Kurdistana Bakur tevgerek bixwaze dest bi şer bikê, lazime hûn destûr bidin. Ser vê gotina min a "ne diplomatik" bêdengîyek çê bû, lê ew zû hat derbaz kirin.

**Civîna ser hevdîtinên otonomîyê, yekitî nîştiman û hikûmata bexdayê**

Di meha Çilêya Paşin1984 an de di derheqa hevditinên Yekitî û hikûmata Iraqê li Şamê hin nûçe belav bûn. Li meydanê belgeyek fermî an jî deklarasyonek tune bû. Agahîyên ku hebûn jî, ji Partîya Qomunîsta Iraq û ji partîyên Kurdistana Başûr belav dibûn.

Partîyên Iraqî xasima endamên CUD (enîya demoqratîka welatparêz a netewî li Iraqê) PDK (Partî Demoqrata Kurdistan), PSKI (Partî Sosyalista Kurdistan Iraq), PKI (Partî Komînîsta Iraq) yek alî hin agahdarî belav dikirin. Yekitî ku, wek teref dihat rexne kirin, li ser babetê çê an xirab tiştek nedigot.

Ji xwe Yekitîyê gelek merivên xwe jî ji Sûrî kişandîbû. Ji ber hevdîtinên li Bexdayê ew ji helwesta Şamê ditirsîya. Dewleta Sûrî jî ji çûyîna Talabanî ya Bexdayê ne razî bû. Bin destra dixwast grubên Kurd vê yeka şermezar bikin. Hin hêzan ji ber tesîra dewleta Sûrî ji bo civînê lez dikirin dixwestin li gorî xwe belavoke kê derxinin û pê dilê dewleta Sûrî jî xweş bikin.

Di roja 22.1.1984 an saet 10.30 de, em bi berpirsîyarên Partîya Sosyalist a Kurdistana Iraqê Abdulxalik Zengene, Ednan Muftî û nunerê Partî Komînîsta Iraqê (PKI) Dr. Cewher ra hatin ba hev û me li ser hevdîtina otonomîyê ramanên xwe parve kir. Nunerên herdu partîyan jî di derheqê hevdîtinên Yekitî û hikûmata Bexdayê de agahdarî dan û dijayetîya xwe anîn ziman.

Dîsa pêşniyar kirin ku hêzên Kurdistanî di cîvînekê de bêne ba hev û helwestek hevpar deynin. Belkê ew yeka bikare li Yekitîyê tesîr bike ku ji hevdîtinên Bexdayê şunve veger e. Me ji wan ra got, tenê li gorî hin nirinên subjektîv şirovekirina pirsê kêmasî dihevîne. Bona ku em bikarin dîtin û rexnên xwe bêjin, divê di destê me de hin belge, hin agahî hebin. Ya duyem hêzên Kurdîstanî li himber hev di rewşek nazik de ne, şaşitîya herî mezin ew e ku ji wan grubek *"xaîn"* grubek jî, *"welatparêz"* bê îlan kirin. Bi wî awîyî dabeşkirina hêzên welatparêz zerarek mezin e, divê em xwe ji wan şaşitîyan jî biparêzin.

Dîtina me ji bo civînê ev bû, ku ew, lez nekin, di derheqê hevdîtinan de hin agahdarîyên fermî bi dest xinin û li gorî wê gav bavêjin. Wek partî me li ser *"otonomî"* yê hîn tu agahî negirtîbu û merkezî jî biryarek me tune bû. Lê Partî Komunîsta Iraq (PKI) ragîhand ku wan di 4 ê Sibat ê de biryara civînê girtine.

Em hêzên Kurdistana Bakur yên ku bi hev ra di nava xebata Hevkarîyê de bûn hatin ba hev û me di derheqê hevdîtinên bi partîyên Başûr de agahî da wan.

Em pênc alî gihîştin wê encamê ku: civîn wek civîna agahdarî bê pejirandin. Ji merkezên tevgerên me ji me ra agahî ne hatîye eger di civînê de biryarrek bê girtin, em tevî biryara civînê nabin.

Civîn saet 17.00 an de bi beşdarbûna 16 partî û tevgeran pêk hat. Beşdarvanan yek û yek mafê axavtinê girtin û dîtinên xwe anîn ziman. Di civînê de fermî zabit ne hat dagirtin, lê her yekî ji xwe ra not girtin.

Ser civîna Hêzên Kurdîstanî notên ku min girtin ew in. Ew rapor min ji partîyê ra şand. Kemal Burkay di pirtûka xwe ya bi navê Anilar, Belgeler de di rupela 377 an de behsa vê bûyerê dike. Di pirtûkê da, "Endamên platforma 5 alî nunerê PKK ê rexne kirin û xwestin ku ew civînê biterikîne, dîtin ku wî civîn neterikand, wan ciwîn terikand" daye xuya kirin.

Ew şaş e. Me nunerên 5 alî civîn neterikand, hemû bejdaran bi hev ra nunerê PKKê protesto kirin û civîn terikandin, cîvîn betal bu.

Tarîxa civînê: 4 ê Sibat ê 1984

Cîh:Şam – Cepha Bahreyîn

Hêzên ku bejdar bûn: IKP (Partî Komînîsta Iraqê), IKDP (Partî Demokrata Kurdistana – Iraqê), (IKSP) Partî Sosyalîsta Kurdistana Iraqê, Partîya Gel, Partîya Çep, (PDPK) Partî Demoqrata Pêşverû ya Kurd li Sûrî), (PSKS) Partî Sosyalîst Kurd Sûrî, (PKS)Partî Komunîsta Sûrî, Hevgirtin a Gel, Partîya (PPKK) Pêşeng a Karkerî Kurdistan, (KUK) Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistan, (AR) Ala Rizgarî, (KUK-SE) Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistan-Baskê Sosyalîst, (PKK) Partî Karkerê Kurdistan, (PSKT) Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê).

Banga civînê ji alî CUD[71] ê ve hatîbû kirin. Civînê nêzî 3-4 saetan domkir. Armanca xwedî bangê ew bu ku hevdîtinên navbera Yekitî û hikûmat a Bexdayê de dom dikir bihata gunehbar kirin. Taslaxa belavoka ku wan amade kirîbûn, di civînê de bê pejirandin û belav bikin.

Li ser navê CUDê nûnerê Partî Komînîsta Iraqê Dr. Cewher destpêkê de ji bona hemû şehîdan xasima ji bona şehîdên zîndana Dîyarbekirê yek deqîqe bangî rêz girtinê kir û li ser hevdîtinên otonomîyê agahdarî da. Bi hikûmata Iraqê ra hevdîtin û tifaq kirin ji çira û ji kê ra xizmet dike? Ji pirsa Kurd ra kar tîne an zerar tîne? Em dixwazin va platforma vê rewşa guftogo bike û ronî bike.

Li gorî dîtina me ew hevdîtin kêrî emparyalîzmê û Seddam tê. Îqtidara Bexdayê ya şoven û faşîst, roj bi roj bi emperyalîzmê ra, Kamp-Davîd ra, Nato û bi Tirkîyê ra têkilîyên xwe xurt dike.

Sala 1975 de Yekitîyê ji îqtidara Bexdayê ra faşîst digot, lê nuha tevî wan tifaqan çêdike. Li gorî me hêzên derva jî di vî karî de tilîyên xwe hene. Tiştên ku dixwazin li Lubnan, Filistîn, Sûrî û Kurdistanê pêk bînin hemû girêdayî hev in. Eger ku di vê civînê de em li hev bikin, dikarin bigîhîşin encamekê. Em bi hev ra dikarin bangê kadroyên YEKITÎ yê bikin û wan ji rîya ku ketinê vegerînin. Kesên ku li vir amadene di derheqê hevdîtinan de nêrînên xwe bînin ziman.

**Partîya Çep:** Va encama berhema sîyasetekê ye. Va tifaqa xesaretek mezin digîhîşîne tevgera rizgarîya Kurdistan û hereketên pêşverû yên li herêmê. Bi qeneata me tifaqek pir xirab e û tenê kêrî Seddam tê. Lazim e bê tawanbar kirin.

Lê tifaqên din, ên ku kolonyalîstan ra hatîne çêkirin jî divê bêne mehkûm kirin. Pêwendîyên Qasimlo bi Seddam ra stratejîk e, divê em bi hev ra bala wan jî bikişînin.

[71] Hêzên Kurdistana Başûr di nava xwe da du enî damezrandibûn. Yek Cewqet, yek jî Cud bû. Cewqet di nava (IKSP) Partî Sosyalîst Kurdistan, Yekitî û Partî Komînist Iraq da pêk hatîbû. Lê dûra PKI (Partî Komînîst Iraq), tevî IKDP (Partî Demokrat Kurdistan – Iraq) û (IKSP) Partî Sosyalîst Kurdistan enîya duyem CUD jî damezrandin. Partî Komînîst Iraq û IKSP endamê herdu enîyan bû.

**Ala Rizgarî:** (Îbrahîm Gûçlû) Yekitî û hin hêzên din çima nehatine civînê? Xasima Yekitî ji yek alîyan e, divîya bû ku li vir bûna. Me dikarî ji wan agahî bigirta, hevdîtinan çawa destpêkir, çawa hatin van encaman.

**IKP (Dr. Cewher):** Yekitî ji bo ku li ba Seddam e, lewma ne li vir e.

**Partîya Gel:** Em ji bo civînê dereng hatin agahdar kirin. Va tifaqa lîstikek ji lîstikên emperyalîzmê ye, divê bê mehkûmkirin.

Pênc endamên partîya me li ba Partî Demoqrata Kurdistanê girtî ne. Em dixwazin endamên me bêne berdan, di nava meda dijminatî kûr ne be.

(Wê demê li Kurdistana Başûr KDP ê hin pêşmergên Partî Demoqrata Gel – serokê xwe Samî Rahman bû- dîl girtîn. Bona ku ew neyne kuştin û bêne berdan partîyên Kurdan bi hev ra belavokek belav kirin.)

**Partîya Pêşverû:** (Reşît Hemo): Partîya pêşverû pir vekirî vê îttifaqê nas nake. Otonomî bi demoqrasîyê tê parastin, gelê me li hevhatinên usa pir ceriband. Yekitî tenê bi serê xwe nikare otonomîyê cî bîne û biparêze. Yekitîyê xwe ji hêzên pêşverû dûrxist, ew bûye parçek ji îqtidara Bexdayê.

Divê îttifaq jî ew metod jî bê mehkum kirin. Va îttifaqa ji gelê Kurd ra tiştekî nayne û ew tecruba yekem nîne. Bi vê mantiqê hin hêzên din jî dixwazin bi dewleta Îran û Tirkîya ra bikevin têkilîyan. Ev mantiq û otonomî bê mahkûm kirin.

**Partîya Sosyalîst Kurd Sûrî:** Partîya me pêşniyar dike ku, êrîşên PDK –Irak li ser PDK Îran jî di rojewê de cî bigire.

**Ala Rizgarî:** (Îbrahîm Gûçlû) Divê PKI me ronî bike. Agahdarîyên ku PSKI di wê babatê de daye em dizanin. PKI û endamên CUD ê bi fêde li meselê mêze nekin û polîtîkake rojane nejon. Ew alîkî xayîn, alî din jî merivên zane, bêşaşîtî, merivên mezin, merivên qedir û qîmet îlan dike. PKI nekarîye bê alî bimîne.

PDK-Iraq endamê CUD ê ye, bi dewleta Îran ê ra di nava îtifaqê de ye.

Çima CUD vê yeka nabîne û li himberî wê helwestekî nagire? Çima CUD êrîşên PDK-Iraqê tevî leşkerên Îran ya ser Kurdistana Îranê nabîne?

Çima ew ne kurdin, an jî ew ne mirov in? Divê em vê yeka jî bibînin û rexne bikin. Xwesteka otonomîyê pirsek stratejîk e.

1974 an de jî li Iraqê otonomî hebû. Hikûmata Bexdayê wê demê demoqratîk bû? Partî Komînîst Iraq jî hevparê îqtidarê bû. Ji bona çi Talabanî ra "Cahşê 66 an, xaîn" tê gotin. Bi çi navî, ser çi navî ew yeka tê gotin?

1970 ê de PKI jî li ba îqtidarê bûn. Lazime van problemana hemû bi hev ra bêne minaqeşe kirin. Li vir tê xwestin ku bi lez belavokek bê derxistin. Em vê yeka şaş dibînin.

**IKP** ( Dr. Cewher): Kes bila hewl nede bo ku ders bide kesê din. Her yek mesulê partîya xwe ye û her partî jî mesulîyeta çîna xwe temsîl dike.

Hin grup didine zanîn ku agahdarîyên fermî di dest wan de tune û agahîyên wan kêmin. Em di radyo xwe de şirove dikin, belavok derdixinin, endamên CUD ê di weşan û belavokên xwe de tînine ziman, dîsa jî dibêjin agahîyên fermî. Em gotinên partîke komînîst pîvan û bes dibînin, lê hûn çi pîvan digirin?

**IKSP**:Salekê zêtire di navbera Yekitî û Baxdadê de hevdîtin û têkilî hene. Va tifaqa, tifakek bi şik e, va tifaqa li dijî kurd û Kurdistanê ye. Bangek bê derxistin û bi hev ra otonomî bê mehkûm kirin wê baş be. Lê hemû kes di dîtinê xwe de azad e.

**PDK-I**:Hin kes dixwazin bûyerên derbazbûyî jî li vir bê guftugo kirin, nakokîyên navbera hin gruban bê xûrandin. Li gorî dîtina min ne waxta me heye, ne jî kêrî me tê, tenê dikare alî me yê negatîf zêde bike. Di hin civînên din de van pirsana jî dikarin bêne minaqeşekirin. Di vê civînê de tenê li ser otonomîyê em bigîjin biryarekê.

**Hevgirtina Gel:**Tifaqa bi Saddam ra û ji hêzên welatparêz dûrketina Yekitîyê protesto û şermezar dikim.

**PSKT** (Kazim Budak) Cara yekeme ku ewqas partîyên Kurd tên ba hev û li ser pirsekê radiwestin. Ew yeka gavekî girîng e. Wexta ku meriv bi nîyetek paqiş û bi rexneke rasteqinî nêzik pirsan bibe, çareserî rihettir dibe.

Îro rojeva me pirsa hevdîtinên navbera hikûmata Iraq ê û Yekîtîyê ye. Ew pirs di dereca yekê de hêzên wî parçeyî eleqeder bike jî, li ser têkilî, rewş û xebatên me jî tesîr dike.

Bûyer pir teze ye, di derheqê hevdîtinan de di destê me de tu agahî tune. Bona ku meriv bikare dîtinên xwe bêje, lazim e pirs bi zelalî bê zanîn.

Bi tenê serê xwe bi hikûmata Iraqê ra hevdîtinên çêkirina Yekitîyê şaş e. Otonomî ke demoqratîk bi yekîtîya hemû hêzên welatparêz û demoqratîk dikare bikeve jîyanê û bê parastin.

Partîya me vê pirsê bi hesesîyetek mezin û bi frehî diwezîn e. Lê bona ku merkezî biryarek me tune ye em wek çavdêr dixwazin bejdar bin û ji we agahîyan bigirin.

Wek me ji hevalên xwedîyê bangê re jî gotîbû, bona civînê neyê lezkirin û kesên ku têne civînê bi biryara partîya xwe bên û bikarin li biryarê jî xwedî derkevin. Ji bo civînê we lez kiriye. Ji civînê ra serkevtin dixwazim.

**PPKK** (Riza Polat) Civîn bona ku ewqas hêz amade ne, dîrokî ye. Em pirsên xwe bi şîwekî biratî bikarin minaqeşe bikin û çare bibînin.

Hêzên ku di program û şîarên wan de otonomî heye, tevî faşîstan jî dikarin rûnin û guftûgoyan bikin. Yekitî çima hatîyê vê qonaxê, divê li ser rind bê rawestin.

Heya belgeyek, programek fermî tune be, meriv nikare bigîhîje encamên fermî. Otonomî encame.. lê çi heye ku encam şaş e.

Divê bê rexnekirin û mehkûm kirin. Biryara partiya me tune û wek partî em ne amadene ku di vê civînê de biryarekê bidin.

**KUK-Se** (Şêx Zihnî) Bi serê xwe çûyîna Yekitî yê Bexdayê û bo otonomîyê guftûgo kirin şaş e. Divê bê mehkum kirin.

**El-Partî**: Otonomî parçek ji plana emperyalîzma Emerîka ya Rojhelatanavîn e. Yekitî, ji 1963 ê vir de li hember tevgera welatparêz e. Hevdîtinên bo otonomî yê îxanet e û divê bê mehkom kirin. Êrîşa "Piştî Aşan" jî parçek ji vê planê bû.

**KUK**: (Ridvanê Batmanî) Wek tevger di navbera me û KUK-Se de dijberî heye. Komîta merkezî ya me, wan hîzîp dibîn e û cîvînên ku ew hebin, em tê de da cî nagirin.

Em dixwazin civînên usa bêne zêde kirin.

Otonomî hatîye îmza kirin, lê ne di Iraqê de ne jî di seranserê herêmê de ji gelên me ra xizmet nake.

Ji bo gotina PPKK , " (...)tevî faşîstan jî dikarin rûnin û guftûgoan bikin." dîtinek şaş e, meriv nikare niqaş ji bike.

Madem usa ye em jî herin bi Kenan Evren ra rûnin. Di vê civînê de em biryarekê negirin.

**PKS (Partî Komunîst Sûrî) Bavê Cengo,** Biryara partiya me ew e ku îttifaq şaşitîyek pir mezin e. Qedera gelê Kurd bi gelê Iraqê ve gêrêdayî ye. Şerê navbera hêzên Kurd xirab e, hikûmata Baxdayê faşîst e. Di nava hêzên pêşverû û demoqrat de çêkirina enîyekê pêvistîke mezin e.

**PKK** (Duran Kalkan): Hin hêz di civînê de cî negirin jî, civîneke ha em baş dibînin. Madem civînek usa tê kirin, pirs mezin e. Aşkere ye ku tifaqên ûsa ji gelê Kurd ra xizmet nake.

Belovok belavkirin ne bes e, divê em zêdetir li ser bisekinin û li koka wê bikolin, dikarin çi bikin, wê bikin. Tenê bêjin îxanet ne bes e.

Mantixa otonomîyê têkoşîna gelê Kurd, tevgera hereketa Kurd ber bi ku ve dibe em vê bibînin. Va yeka nîşan dide ku dixwazin pirsa Kurd bi devletên endamên sîstema emperyalîzmê ve çareser bikin.

Divê civîn, mantiqa ku dixwaze pirsa Kurd bi rîya dewletên ku di sîstema emperyalîst û kapîtalîst de cîh girtine çareser bike mehkûm bike.

Tifaqa çaralî" hebu, dixwast tevgera netewî a Kurdistan bike yek. (PSKT, Yekitî, PDK-Î, Partî Pêşverû Kurd li Sûrî) PKI û PKS jî endamên vê tifaqê bûn. Ew çar partîyên Kurd yên ku komîte de cî girtine tevî emperyalîstan li pê çareseriyên emperyalîst gerîne.

Divê em li ser vê tifaqê rawestin. Yekitî endamê vê îttifaqê bû. PSKT, Pêşverû, PDK-Î, PKI, PKS dikarin bêjin ku polîtîka tifaqa çaralî îflas kirîye? Dikarin bêjin ku

xwe ji vê tifaqê kişandine? Tifaqa navbera Seddam û Yekitî yê jî, mantixa çareserîya bi sîstema emperyalîst jî bê mehkûm kirin.

Li Tirkîyê bi yekitîyê ve girêdayî Hevkarî û li Sûrî sêalî yên ku hatine damezrandin, dikarin bêjin yekitîyên wan belav bû ne?

Nûnerê PKK ê di dawîya hemûyan peyîvî.

Wî bawer dikir ku bona cara duyem wext nabe ku nûnerên partîyan carek din bipeyivin û bersiva wî bidin. Ji bona wê jî bê bîvan peyîvî.

Nunerê PKK ê eksê hemû axavtvanan bi Tirkî peyîvî û bû yê herî dawîn.

**PSKT:** (Kazim Budak) Nunerê PKKê bo ku Kurdî nizane, ne çi tê peyvandin fêm kir ne jî, rojev û naverok. Li gorî xwe şemak çêkirîye û bi hêrs êrîşî hêzên welatparêz dike.

Ew îddia dike ku çar partîyên ku dixwazin seranserî Kurdistanê de enîyekê ava bikin, pênc hêzên Kurdistana Bakur û sê hêzên ku li Kurdistana Rojava hatîne ba hev li pê çareserîyên emperyalîst dibezin. Dixwaze bêje ku vana hemû girêdayîyê emperyalîzmê ne.

Di sêrî de bêjim ku em wan hêzên Kurdistanî welatparêz, pêşverû û dost dibînin. Di seranserê Kurdistanê de çêkirina enîyek welatparêz ji stratejîk dibînin. Bi hin tevgerên welatparêz ra têkilî û xebatên me hene. Yekitî jî yek ji wan hêzan e û ew jî di nava xebata çaralî de ye. Têkilîyên me bi Yekitîyê ra têkilîyên sîyasîne. (....)

Wek PSKT me, bona ku di seranserê Kurdistanê de enîyek hêzên welatparêz û pêşverû pêk bê hewl da. Endambûna partîya me ya komîta Kurdistanê rastîyek e.

Ew pêncalî-hevkarî ya ku hûn li ba emperyalîstan buyinê va sucdar dikin, ew ji bona gunehên we, wa nagire nav xwe. Hûn destbixwînin, xwîna welatparêzan ser destê we ye, heya ku hûn xwîna ser destê we ye paqiş nekin, xwe rexne nekin, nikarin bikevin nava Hev. (.........)"

Ser vê rûdanê berê nunerê Ala Rizgarî Îbrahîm Gûçlû, piştî wî jî nûnerê PPKK ê mafê axavitinê girtin û gotinên nunerê PKK ê rexne û protesto kirin. Ji herdu partîyên komînîst hatdaxwazkirin, ew jî dîtinên xwe bêjin.

**Dr. Cewher:** PKK şaş dike, lê em naxwazin nuha derkevin dervayî mijarê."

Nuner ê PKK ê carek din, mafê peyvê xwest lê, grubên din li hember daxwazîya wî derketin û bona ku derkevin derva hemû bi hev re rabûn ser pîyan. Nunerê PKK ê xwest wan qane bike û şûn de vegerine û guhdarîya wî bikin, lê kesî guh neda wî. Bê ku biryarek bê girtin, hemûyan salon terikandin. Civîn bi axavitina nunerê PKK, hatîbû atomîze kirin. Nunerê Partî Komînîsta Iraqê li ser pîyan got ku ew, gorî prênsîbên ku di civînê de derketine pêş, belavokekê amade bike û bîne kê xwest îmza bike.

Çend rojan şûnda di kovara EL HURRÎYE de li ser civînê hatîbû nivîsîn ku "otonomî hate mahkum kirin."

Bi weşandina nûçeka ûsa hêzên Kurdistanî şaş û mat mayî man. Gruban hewl dan ku bizanin agahîyek ûsa kê gîhandîye kovarê, lê tu encam ne hat girtin. Taslaxa belavoka ku bihatana belavkirin anîn ba me jî. Di taslaxa belavokê de du dîtinên sereke hebûn.

1. Bi hêzên kolonyalîst ra danîna têkilîyên stratejîk, bêne mehkûm kirin,

2. Bê gotin ku welatên sosyalîst dost in.

Hin hêzan ji wana ra jî îtiraz kirin, taslax şûnva hate kişandin. Di cîhê wê de yek paraxrafek, ji çend hevokan pêk hat amadekirin, û bona îmzakirinê ji gruban ra hat şandin. Me belavok îmze nekir, lê hin gruban îmze kir û belav kirin.

Tiştê ku di civînê de pêk nehat, rojnama PKK ê Serxwebûnê di rûpelên xwe de pêk anî. Serxwebûnê de nivîsîye, *"nunerê PKK ê carek din mafê axaftinê girt bi û tundî dîtinên xwe anî ziman"* bûyerek ûsa ji nebû.

**Nama Kemal Burkay di derheqê hin bûyeran de agahî dide.**

*M.Alî can,*

*8 Sibat 1984*

*Nama ku te 28 ê Çileyê Paşin de şandîbû me girt.*

*Ez rojnama Rîya Azadî ji Swêdê we ra bidim şandin. Hevalê ku bê cem we hêjmarên dawîn ya rojnamê wê ji we ra bîne.*

*Di bûyera Dîyarbekirê de mirina sê kesan eşkere ye. Necmettin (Buyukkaya), Yilmaz Demîr, (hevrê yê me ye, ji Konyê ye û li wir dane axê) û ji PKK ê Xelîl Çatak in.*

*Lê bi hin cure agahîyan tê gotin ku hêjmara mirîyan bi hindikayî deh kes e. Hêjmara birîndaran pir bûye ; helbet van agahî netine piştrastkirin. Li Dîyarbekirê terorek mezin hebûye.*

*Nûçe ya ku we di derheqa "biryara beraatê"da ji BBC î girtîye bawerim şaş e; heval jî guhdarî dikin; lê nûçeyek ûsa heya nuha nehatîye bîstin. Bibûna baş dibû, helbet! Lê tiştê ku meriv ne li bendê ye.*

*Di derheqê hevdîtinên ser otonomîyê, di çerçewa ku min ji tera behs kir, me nivîsek amade kir, di rojnama Rîya Azadî di hêjmara Sibatê de bê weşandin. Em di encamên hevdîtinan de xweş bîn nînin; lê wek îxanet jî nabînin.*

*Emê agahîyê bigîjînin malbata Yilmaz (Apaydin).*

*Piştî civîna Parîsê, cîvînek duyem çêbû (li Elmanyê), ji 20 an zêtir grub bejdar bûn. Tu encam jê derneket; ji her serîyekî dengek derdikeve. " bi hev ra pêkanîna hin eylemên basît" bû encama hevpar. Ji pênc kesan (TSÎP, DEV-YOL, DEV-SOL, KUK) komîtake hate tesbît kirin bi gruban ra wê pêwendî dayne.*

*Komîta me ya Koordînasyonê ya çaralî, (em, KDP-Îran, Yekitî û Hemît) tu agahî tune. Vê gavê ketine, derdê xwe.*

*Hevdîtinên "Hevkarî" yê, "yekitîya me ya pêncalî" jî ketîye rêyeke pêşî lê girtî. KUK ê ji bo ku" hedefa serxwebûnê û tekoşîna çekdarî wek tekoşîna bingehîn cîh bigire" înad kir. Wekî din jî gelek êtirazên xwe hene. Xasima ji qisma 3em ra. Êhtimal ew e, ku hevdîtinan bibirin û agahdarîyê bidin raya giştî. (Di wê babetê de biryarek me tûne, di rojên hatî de zelal be) (... ... ..)*

*Hûn jî dibînîn vê gavê karê "hevkarîyê" xirab tere, lê ne sûcê me ye. Va hevîra hîn pir av dixwaze.*

*Di derheqê kesên ku di sînor de hatine kuştin, malûmatên fireh ji me ra bişînin wê baş be.*

*Ji vir du avukat me şand Erziromê, ketine mehkeman, raporên wan wê bêne weşandin. Wekî di serokê masa Tirkîyê ya sazîya Efûyê (AF) jinek, çû Dîyarbekir hat, me hîn rapora wê negirt (amadedike).*

*Alî (Remo) hat vir, bi Zekî ra xebat red kir (wî ew anî bû). Bawerîya xwe bi partîyê anîye, rewşa xwe baş e.*

*Di vê navberê de bi destê hevalekî em defteran bigîjînin te. Encax yên .... (Ehmed, Yem.) ne mimkune ku ji bo ..... kar bî ni. Ji bo wan cure defter divê em pêyda kin, (eger ku em bikarin pêyda kin defterê Tirka ya herî baş e.)*

*Cemîl û Qûtbettîn bi wan dikarin derbazî Fransê bin, bila defteran neçirînin, bi rehetî dikarin derbazî hindurî welat bin. Piştî ku ketin hindur defteran em ji wan şuve dixwazin. (Di sînor de bila îltica nekin, heval pirsa îlticayê piştre hal dikin.)*

*Ji bona bursa Wîyanê xebat temam e. Di van rojana agahî bidine me, em jî wê bidine we.*

*Slav û serkevtin.*

*Kemal*

*Tê binî: êhtimal defteran ...... wê bîne. Nama ku min daye wî kevne, pêşniyarên ku min di wê namê de nivîsine (wek; di derheqê kesên ku bo perwerdê biçûna) betal bû. Çûmku ew kar me şûnda avêt.*

**Nexwaşîya kekê Mistefa gran dibe**

Nama Dîyar a ku 25ê Sibatê 1984 an de ji Londrê şandîye agahîyek xirab dide min. Ew dinivîse ku nexwaşî ya Apê Selîm pir giran bûye . Nama Dîyar li jêrê ye.

*1984.2.25*

*Kêke heja,*

*Nama ku te şandîbû min girt û nama li ser hin babetan ez ronî kirim. Xasima li ser hevdîtinên Yekitîya Nîştiman û Bexdayê de dîtinên me çine min nedizanî. Ji bona li hevhatinê, bi hev ra rûniştina wan çiqasî rast e, wext nişan bide. Tirsa min ew e ku tiştê ku 1975 an de hat sere KDPê vê cara jî bê sere Yekitîyê. Otonomîya ku li ser tê sekinandin ne ji bo hemû Kurdistana başûr e, lutuf kirina herêma ku di bine qontrola Yekitîyê de ye. Eger ku di hevdîtinan de hemû hêzên Kurdistanî mixatap neyne girtin, pir eşkereye ku hêzên dervayî hevdîtinan li dijî Yekitîyê hewl bidin. Li gorî paştagotinên polîtîk ku li vir têne kirin, de hevdîtin bi alîkarî navbeycîtîya Fransê hatîye kirin û Fransê himberê vê yekê gelek çek firotîye Seddam. Seddam ku ew sîleh û malzemen şer girtine şunve dîsa kirina xwe bi domîne. Dîsa tê gotin ku agirbes bê xira kirin û pêşmerge dest bi şer bike.*

*Keke, têkilîyên polîtîk li wir gelek qelsin. Xasima ji Kurdistanê û Tirkîyê kêm kes heye. Ji Işçinin Sesî bêtir ji grubên din yek du kes encax hene. Lê " Işçinin Sesî" hêza xwe heye.*

*Piştî qetlîama zindana Dîyarbekirê, organîzasyonên demokratik ên li Ewrûpê bûyer protesto kirin.*

*Min û An Börlü Sekreterê Organîzasyona navnetewî Amnestyê baskê Tirkîyê hevûdu nas kir, daha rastî wê ji min ra telefon kir. Got ew nu ji Tirkîyê hatîye, hatina min a vî welatî ew kêfxwaş e dixwaze min bibine. uyd.*

*Ew di derheqê girtîyên Tirkîyê de xwedî gelek agahî ye. Hema hema di derheqê hemû girtîyan de dosyê amadekirî heye. Fotoxrafên me yên ku di mehkeman de hatine girtin, nivîsên ku di medya Ewrûpayê de hatine weşandin hemû di dosyan de ne. Min jî di derheqê êşkence û girtîgehan de agahdarî dan. Jinek xwe jî heta Dîyarbekir çûye, lê ew nehiştine here girtîgehê.*

*Dawîyê du belavokên wan (Amnestyê) derket, yek di derheqê Nazîf Kalelî da, ya din jî derheqê endamên PSKT, yên ku wê dawê de têne mehkeme kirin. Di nivîsek dirêj de li ser zilma cuntê radiweste.*

*Keke bi jinbra xwe ra hin caran bi telefonê dipeyîvim, rewşa wan baş e. Do jina Turgut- Sîdar- ji Stockholmê telefon kir. Got kekê Mistefa-Selîm li nexwaşxanê razandine, nexwaşîya xwe jî zerik bûye . Guman dikim ku ew wek nexwaşîya duyem musalat wî bûye, di vê rewşa de kezeba wî ya reş têra xwe qels bûye. Rewşa wî di dereca bilind de ciddîye.*

*Kekê, karê min neqedîya polês dixwaze dirêj bike xasima ji wê derê hatina min wan dike şike. Hîn jî ez li cem hevalê ku min berê behs kiribû me. 4 roj in terim qursa ziman û têm.*

*Kasim, Ehmed, Muhsîn û hemû hevalên din ra slavê xwe rê dikim. Nuha ez ne di rewşa ku bikarim ji wan ra binivisînim da me. Encax kare minê li vir qedîya şuva ew mumkun dibe. Lê Kasim dikare ji vê edrêsê ra name bişîn e.*

*Wekî din min ji welat ra jî namek nivisî û şand. Demek dirêj bû ku têkilîyên me hatîbûn dereca birandinê. Di wê bawerîyê de me ku bi Cengîz ra têkilî danîna min wê rind bibe. Ji Kekê Mehmûd – Bedirxan ra slavê xwe rê dikim, şertên ku wî dixwastin amade ne. Dawîyê slav dikim deste te radimusim. Ji hemû hevalan ra slav.*

*Mr.Dîyar,*
*29 TABLEY R.D. London no: 7 ENGLAND*

29ê Sibatê ji Stockholmê li benda telefona Sîdar im. Lê heta derengîya şevê wî telefon nekir. Dora roja din min telefon kir. Dibêje, *"Doxtor bê hêvî ne, tiştê ku em bikarin bikin tune. Li welatên din jî tû îmkan nîne."*

Tiştê ku em jê ditirsîyan dihate serê me. Sekreterê partîya me Kemal Burkay jî li Stockholmê dima. Min got eger îmkan heye sekreter 3yê Adarê, ji vê nimara telefonê bikare li min bigere wê baş bibe, ez dixwazim bêm Apê Selîm bibînim. Xebera han di nav dostan de zû belav bû. Gelek dost hatin mala partîyê xemgînî ya xwe anîn ziman.

Di 3 ê Adarê de sekreter telefon kir, wî jî xwast ku ez bêm Stockholmê. Xûya bû ku nexwaşî ya Kekê Mistafê pêş ketîbû. Min ji bona 6 ê Adarê ji şirketa balafira Sûrîyê bilêt girt. Wê êvarê ez çûm mala grubên Kurd yên li Şamê, min ew zîyaret kirin û xatirê xwe xwast. Balafir saet 8 ê sibê da, vê carê di dema xwe de fir da. Li balavirgeha Şamê rastî Zekî Adsiz hatim. Ew jî vedigerîya Elmanya. Hat li cem min rûnişt, bo nexwaşîya Mistefê xemgînîya xwe de xuyakirin. Piştî ku jî partîyê veqetî bû vir de cara yekê bû em rastî hev dihatin.

Balafirê li Atîna, Bon û Kopenhagê sê caran navber da. En dirêj li Kopenhagê, 2 saetan ma. Saet 18.00 de de ber bi Swêdê fir de û dora saetekê şûnda em li Stockholmê danîn. Ji bo ku pasaport ser navê min hatî bû çêkirin, lê ya min nebû. Min li balavirgehê daxwazîya îlticê kir. Polês du saetan îfadê min girt, ez berdam.

Dûzena balafirgehê, li himber mirovan nazik û têkilîyên polîs dinyake din li ber çavê min raxist. Spontane min polêsê Tirk û polêsê Swêdî de ber hev. Tevî Sîdarê birayê xwe saet dora 24.00 an em hatin mala wî. Nazli û Cîran li mala wî diman, Cîrana keça min jî raneketî bû, tevî dayîka xwe li benda min bûn. Wext dereng bû lê dîsa jî me gelek sohbet kir. Çûyîna nexwaşxanê, zîyaretîya Kekê Mistefa me hişt dora rojê.

**Ez li Swêd im**

7 adar 1984

Roja 7ê adarê, sibê zû, em rabûn, ez û Sîdar çûn nexwaşxanê. Kekê Mistefa bi kincên xwe yê sivîl li ser nivîna xwe rûniştîbû. Bi rûkenî û kêfxweşî pêşwazî me kir. Min tenduristîya wî mereq dikir. Bi baldarî liv û rewşa wî dişopand. Sipîçikên çavan zerikinî bûn. Xeynî wê tu îşaretek taybetî xûya ne dikir. Bi moral û zindî bû. Eger me nezanîna ku ew nexwaş e, nîşanên nexwaşî yê lê tu nebû. Me qala gelek tişt kir. Saet derengî şevê em çûn mal.

8 adar 1984

Dora roja din sibê zû Mistefa ji me ra telefon kir ku em herin ba wî. Ez û Sîdar bi tirs û lez çûn. Got, *"min şevek ne rihet derbaz kir. Çend caran min ji hemşîran xwest ku ji we ra telefon bikin, hûn bên ba min. Hûn çima ne hatin?"* Xûya bû ku hemşîran telefon nekirîbû. Heya saet 22.00 an em li wir ba wî man, Serdar hat cem em jî terin mal.

9 adar 1984

Em dîsa sibê zû li ba Kekê Mistefa ne. Ew rûniştîye sêv û mûz diqeşêre û dide nexwaşê kêleka xwe. Nexwaşê ba wî ji Efrîqa yê, xortekî zencî ye. Lê ne nexwaşekî giran e.

Ez dibêjim, Kekê tu xwe newestîn ez alîkarî bikim. Dibêje " feqîrî bê kese, çend roje li vir e, kesî lê nepirsî. Ez dizanim nexwaşîya min ji ya wî girantir e, lê naxwazim, ku ew ji bo rengê xwe, xwe nerehet hîs bike, ew jî însan e." Nexwaşî, rûyê xwe di de xûya kirin. Her roj ew gav bi gav ber bi nebaşîyê tere.

Roj ez li ba wî mam, şev Sîdar hat li ba wî dimîne. Em dixwazin di qontrola doxtor ya sivê Sîdar li vir amade be. Ji ber ku ew ziman dizane, dikare bi doxtoran re têkilî dayne.

Lê pir wext derbaz nebû, Sîdar jî hat mal. Ji bo ku kêkê Mistafa wexta rihê xwe kur kiriye, lêvê xwe ya jorin birîndar kirîye. Heya demekê nekarîne xwînê bidin sekinandin. Nivîn di xwînê de man e. Hepatît bi rîya xwînê derbazî mirovan dibe. Ji ber wê wan, Sîdar şandine mal, lê bo ku bi doxtorê wî re bipeyîve, dîsa ew sibê de zû çû nexwaşxanê.

Li gorî agahdarîyên doxtor, di derheqê nexwaşê me de hêvî nema ye. Deh roj emrê wî maye. Berî wê jî nexwaş dikare bîrsivik be, vereş e, xwîn jê here û bikeve qoma yê.

10 adar 1984

Îro di qontrola sibê de em hemû li wir bûn. Doxtoran xwestin ku ew destê xwe ber bi pêş dirêj ke û hewa bigire. Piştre şemaya sitêrkê pê dane çêkirin. Bi van hereketan sîstema rehî wî dipîvan.

Doxtoran got encam hîn jî baş in. Nuha şûnda jî ew wan qontrolan her roj bikin. Wan usa xwastin, ku pirkes jî neyê serdana wî û wî newestîne. Çimku, ji her çar parçên welatê me, gelek welatparêz ên li Swêd û dostên Kurdan dihatin dîtina wî. Pêy çûyîna doxtoran, demek şûnda herdu tilîyên wî yên mezin, yên destan û di qorên wî de jan, kûrt bûn û şidandin çê bûn. Bawerdikim ew destpêka encamên xirab bûn. Min xwest moral bidim ê, lê ez bi xwe bê hêvî û bi tirs bûm.

Saet 17.00 êvarê ozanê Kurd Cîgerxwîn û birazîyê wî Zubêr lawê wî Keyo hatin, ew zîyaret kirin. Em seredanan kêm dikin.

11 adar 1984

Di xwarin û vexwarina wî da, di teqat û hêza wî de roj bi roj paşketin heye. Dema ku doxtoran jê re birî bûn, em kirine nava mereqek kûr. Em hêvî dikin ew rast dernekeve. Lê wexta ku nexwaşî lê zor dike meriv bawernake ku ew deh rojan jî tijî bike.

Dost û birayên me her roj li ser telefonan û xeberên wî dipirsin. Zinar li Kopenhagê ye, hewl dide bê Stockholmê. Dîyar ji Londonê rojê 3-4 caran telefon dike rewşa kekê xwe dipirse. Ew di telefonê de bi dengê girî tenê xemgînîyê dide me. Ji bona ku wan hîn pasport negirtine ew nikarin derkevin dervayî welat.

12 adar 1984

Her çiqasî hatîye kêm kirin jî dîsan rojê dehan kes tê. Hin ji wan tenê ji rewşa wî ji me dipirsin, gul datînin û diçin. Gûl û kulîlk ên ku dostan anîne li odê û li derva me wek loda dane ser hev. Tu dibê jî hele bi zora gul û kulîlkan ew dikarin wî rakin ser lingan. Em ji hemşîran dixwazin ku ew wan gul û çîçegan li cîhên din belavkin. Hemşîre ji bo vê eleqa mezin hîssê xwe vênaşêr e. *"Ma gelo hemû kurd li Stockholmê ne?"* Rastî jî dostên me eleqeyek mezin pêşwazî dikirin.

Ji xwe bo ku nexwaşîya xwe di kezeba reş dabû, derman zêde bi kar nedianî. Dermanê wî ya baş moral û têkilîyên germ bû.

Dr. Nacî Kutlay her roj, piştî ku karê xwe diqedand dihat nexwaşxanê. Dr. Nacî rind dizane ku ji vê nexwaşîya xilasî tune. Rewşa wî dipirse. Ew bi sohbet û henekan dixwaze moral bide kekê Mistafa.

13 adar 1984

-Rojbaş Kekê, çawa yî?

Çend roj e, ew yek bersivikê dide.

-Ji duhî xirabtir im.

Doxtor, tû tiştekî nikarin bikin, tenê li benda hin îşaretan in. Lê ew îşaretên ku ew li bendêne, li gorî texmînên wan nabe. Ew yeka herçiqas bawerî dide me jî, ew vê dereng ketinê bi moral û berxwedana nexwaş ve girê didin. Nexwaşîyê mesafe girtîye, tiştê ku em bikarin bikin jî tune.

Moralê xwe bilind e. *" nexwaşî yê ez bê firsend girtim, li sîngê min sîyar bûye, mecal nade min. Piçekê keys bikeve destê min, ez ê tedbîr bigirim û zora wê bibim. Lê .... "*

14 adar 1984

-Ji duhî xirabtir im. Heval çi difikirin? Wexta ku bikevim, komayê, xilas bûn çetin e. Eger min rakin derek din belkê...

-Li gorî doxtorên te, di xwînê de hêjmara hucreyên mirî kêm dibin. Moralê te baş e û awrê te jî zindî ye. Xwarina xwe dom bike....

Ez dixwazim em babetê biguharin, peyvê tînim ser rewşa welat. Valakirina Kurdistanê, hatina qadroyên partîyê Ewrûpê şaş dibîne. Hevalên me yên ku li Kurdistana Rojhilat bûn, xwastin û hatin Ewrûpa, lê çend sal din şûnda ew ji hatina xwe ya vir poşman bibin. Ew têkilî û germahîya welat li van deran nebînin.

Partîya me gotinên xwe baş in, lê piratîk zayif e. Tenê bi gotinan kar nameş e. Rewşa partî yê ne baş e, em tiştên zahmet xwe nadin ber.

Tu çi difikirî nizanim, lê ez naxwazim çarek din di komîta merkezî de cîh bigirim. Hin heval ne samîmî ne, Bayram Ayaz telefonek jî nekir û li min nepirsî. Bi vî awayî hevaltî çawa dibe?

15 adar 1984

Zinar ji Danîmarkê hat. Hîssîyata wî li Kekê Mistefa tesîr dike. Em bira û malbat hemû li ba wî ne. Dîyar bi telefonê dixwaze bi kekê xwe ra bipeyîv e. Lê wî xwest ew şev jê ra telefon bike. Piştî ku em hatin mal Serdar telefona gerok, ya seyar tîne nêzî wî û ew ji Dîyar ra telefon dike. Xûya bû wî nedixwast li ba me hissîyata xwe nîşan bide. Em li mal in û fikir û hişê me li nexwaşxanê ye. Bi hatina her telefonekê em hildiceniqin. Rojê bi dehan mirov telefon dikin rewşa wî ji me dipirsin. Reqema telefona nexwaşxanê 08-1558 18 bû. Me hemûyan ev jiber kiribû. Wexta ku em li mal bûn jî her gav me telefona nexwaşxanê dikir û rewşa wî dipirsîya.

16 adar 1984

Ez, Nazlî û Cîranê li nexwaşxanê ne. Îro dîsa rind xûya nake. Em bi hev ra fotoxraf dikişînin. Hestîyê cênîgê wî derketine derva. Her roj kîlo wenda dike. Dibêje di van rojên dawîn de min heft kîlo wenda kir. Em dixwazin moral bidinê, lê ew rewşa xwe dizane.

Saet li dora 17.00 an e. Me lamba odê vemirandîye, hindur nîv tarîye. Min hêza xwe komî ser hev kir û jê xwest ku berî ku ew bikeve encamek ne baş, ji jin û zarokên xwe ra telefon bike.

Min got,"*bra, rojane tu di nexwaşxanê de yî û te ji mala xwe ra telefon nekirîye. Nuha ew te pir mereq dikin. Nexwaşî ya te çawa encam bide ne xûya ye. Dibe ku tu emelîyat bi bî, an jî bikevî qomayê û carek din mecala te nebe. Ya baş ew e ku tu nuha telefonekê bikî, ew dengê te bibihîzin û rihet bin.*" Min ew gotin jê ra got, lê çawa got, yek ez dizanim.

Him dixwazim bi şikleki xwezayî bêjim wî qane bikim, him jî dixwazim pêşî li hêstir û hîssê xwe bigirim, wî zêde xemgîn nekim. Nikarim pêşî li hêstrên xwe bigirim, lê bona ku ew ji dengê min ferq neke rol dikim. Ez û Nazliyê tenê hêstrên hev dibînin. Lê hin caran nikarim bipeyîvim, disekinim lêv û zimanê xwe gez dikim û dîsa dom dikim. Bi zar û zor min çend gotin jê ra got. Lê wî li min guhdarî kir piştre di cilê de berê xwe guharî û got: eger piçekê baştir bûm wê wextê telefon bikim, ne bûm jî ne lazim e, di vê rewşê de ji wan ra telefon nakim. Lê min dizanîya, ew carek din vê firsendê nebîne, me girîngîya nexwaşîyê dizanîya. Min nekarî di odê de zêde bisekinim. Hêstrên çavê min, bê qontrola min di ser suretên mi de dibarîyan, derketim derva.

Wek her car îro jî em bi trêna dawîn çûn mal. Me di oda xwe ya tarî da, hêstrên ku li nexwaşxanê vêdişart li vir bê ser û ber berda.

Yekê ku dengê me bibîstina bawer dikirin ku, ew ji ber şerê jin û mêr e. Lê halbûkû ji ber bêçaretîya me ya li himber nexwaşîya bê derman bû. Di xwarin û vexwarinê de paşve çûyûnek ber bi çav heye.

17 adar 1984

Her gav bê mecalî û bê teqatî zêde dibe. Encamên taxlîlan bê hêwî ne. Doxtor destûr nadin ku rojê 1,5 lîtir zêtir avê vexwe. Xwarina bê rûn dixwe.

Qasî ku jan û êşa wî mecal dide em sohbet dikin. Dibêje "min nexwaşî li Kurdistana Rojhilat girt. Va nexwaşî bi rîya xwînê derbaz dibe.

Em û pêşmergeyên birîndar hin caran di nava hev de bûn. Me hin caran di dermankirin an jî di cîh gûharandinê de ji wan ra alîkarî dikir. An jî cîhên ku xwîn lê hebû em rûniştin ji wir derbazî min bû. Wekî din jî kalekî nexwaş hebû, ez dure fêr bûm ku ew nexwaşê sîrozê bûye . Dibe ku min ji wî girt.

-Çima, tu ji kal nexwaşî yê bigirî?

-Ez ji wî re bûme alîkar.

-Te eger xwe biparastana, tu neketana vê rewşa, tu bedêla hûmanîstîya xwe, bi canê xwe didî.

-Însan bû, nexwaş bû û bê kes bû, min hewce dî ku alîkarîya wî bikim.

-Eger nexwaşî bi hin têkilîyan derbaz dibe, mana xwe te jî derbazî me hemûyan kir.

-Na nexwaşî bi xwînê derbaz dibe. Ya kalo jî sîroz bû û di merhela dawî dabû.

Min hîs kir ku ew min dicêribîne, li benda bersiva min e ka ez çi bêjim. Pir nema ku ez bêjim ya te jî ew nexwaşî ya bi xwa ye, lê min negot. Min xwe bê deng kir.

Wî nexwaşîya xwe bizanîtî an jî nezanî xefîf digirt. Halbuku nexwaşî ya wî jî sîroz bû û ew rojên xwe yê dawîyê dijîya. Li gorî doxtoran lazim bû heya nuha dawîya temenê wî bihata.

18 adar 1984

Brayê me Dîyar ji Londrê tê, Sîdar çû balavirgehê ku wî bîne. Sibê de ez û Kekê Mistefa tenê ne. Dîsa îro jî dem dem rihet e. Em sohbet dikin, dixwaze hin dîtinên xwe bîne ziman. Piştî 12 Îlonê min pir kişand. Ez di Gûlana 1980 de derbazî Kurdistan a Rojhilat bûm. Li wir me meqer avakir, du rojan berî derba leşkerî jî ez derbazî Tirkîyê bûm. Li Stenbolê bûm, derba leşkerî çê bû.

Di civîna Şamê de te dît kesî nexwast here Kurdistana Rojhilat. Zaafên hin hevalan ji wan ra bû piştgirî, ku ew nerin Kurdistanê. Dibêjin filan kes nikare bi hevalên wir ra derbaz bike, yê din ra gotin nikare şertên wê re întibaq bike.

Hevalên polîtbûro tilî rakirin ez şandim Kurdistana Rojhilat, lê ji bona tedawîya min ji kesî deng derneket. Endamê polîtbûro B. Ayaz li Elmanya di mala partîyê de dimîne, heya nuha telefonek jî ji min re ne kir. Çi bû, bi min bû. Bi vî şiklî kar nameşe. Her yek li gorî xwe di nava partîyê de hesavan dike. Sekreter jî dinivîse, lê tenê bi sekreter û bi nivîsên wî kar nameş e. Ne tenê nivîs û gotinên rast û xweş, divê ew gotin bikevin jîyanê jî.

Ez naxwazim ew nerehet be, gotinê tînime ser zarokên wî. Pir bêrîyên zarokên xwe kirîye. Xasima rewşa ku têda ye, ew zêtir hesas kirîye. Dixwaze derheqê zarokan de bipeyîve. Ken tê rûyê wî, yek û yek wan bi nav û bûyeran bi bîr tîne. Dixwaze demek minasiv de ez herim Kurdistana Rojava û zarokên wî derxinim dervayî welat, bînim Swêd.

Berê got ku Bejdil û Şergir piştî qedandina dibistanê jî dikarin werin, lê carek din dev ji wê dîtinê ber da. *"Heta lazim e dê û bavê me Cengoyê bira jî derkeve derva. Kî yê me li wir ma? Em hemû derketin. Zordestîya dijmin jî wê her roj zêde be. Xasima li wan gomên tek gel aciz bikin."*

Êvarî Dîyar jî hate nexwaşxanê.

19 adar 1984

Em bi dor terine mal û tên. Deh rojên ku doxtoran jê ra biribûn qedîya. Moral û berxwedana wî hêvî dide me. Ew naxwaze jana xwe bide xûyakirin, vêdişêre. Her roj em bi çavên xwe dibînin ku rewşa wî xirabtir dibe. Bona ku doxtoran rojên jê ra birî bûn derbaz bûn û nîşanên ku li bendê bûn dereng diketin doxtor jî ketin gumanan.

Ma gelo tenê moral û tesadûf dikarin mûcize bînin holê? Me çiqas dixwast ku mucîzek pêk bihata wî zora nexwaşîyê bi bira. Lê na, mucîze filan nebû, ne jî dibû. Ji bona encamê xirab lazim bû me çend rojên din sebir bikira.

20 adar 1984

Ew li benda fotoxrafên zarokê xwe ye. Ji me dipirse ew hatin an jî na. Xwarin û vexwarina xwe kêmtir dibe. Dibêje bona ku berxwedana laşê min ra alîkarî bike min cixare kişandin jî cîhişt, lê bê fêyde ye.

Dixwaze em pençirê odê vekin, hewayê paqiş bê hindur. Lê li der gelek serma heye. Roj jî hin caran ji bin ewran derdikeve, rûyê xwe nîşan dide. Lê li ser sermayê zêde tesîra xwe nabe.

Hemşîre hat ji wî pirsî, ku ew dixwaze bikeve serşokê serê xwe bişo an na. Bi henekî bersiv da, got "eger Serdar jî bi me ra be, herê." Min got "çima Serdar bê?" got "bila ew jî bibe şahad." Deh roj berî mirina xwe wî dîsa jî henek dikir.

21 adar 1984

21ê adarê cejna Newrozê ye. Federasyona Kurd li Swêdê bona pîrozkirina Newrozê cîh girtîye. Li Swêdê Kurdên her çar parçeyan Newrozê bi hev re pîroz dikin. Lê bo ku li Ewrûpa pîrozkirina Newrozê destpêk e gel zêde nayê cejnê. Em li nexwaşxanê ne, nikarin, herin, agahîyên ku me girtin, di şevê de dora 300 kesî bejdar bûye. Lê her sal mîna go yê berfê bi girseyên mezin tê pîroz kirin. Îro (2014) Newroza ku ji alî Federasyona Kurd ve tê pîroz kirin 5 hezarî zêtir mirov dicivîne.

Em li ser Newroza ku li Kurdistanê têne pîroz kirin dipeyîvin. Li Tirkîyê Newroz qedexeye. Di parçên din ên Kurdistanê de bi girseyên 100 hezaran ve tê pîroz kirin. (Lê pir derbaz nebû, berxwadana gelê Kurd qedexe çirandin Pîrozkirina Newrozê azad kirin. Ez û keça me Dêrsim jî li Dîyarbekirê bejdarî cejna Newroz a 2011 ê bûn. Li wir ji mîlyonekê zêtir kes kom bibû.) Şev birayê me Serdar hat nexwaşxanê ez terim mal. Me bi telefonê agahî girt ku kekê me şevek xirab derbaz kirîye.

22 adar 1984

Ez û wî dîsa tene ne, peyvên ku wî dikirin min wek gotinên wî yê dawîn famkir û pir mutesîr bûm.

-Hûn her yek ji welatekî derketin hatin, rewşa min jî aha ye. Piçekê baş bûma moral bihatana xortan.

Ez ê ji vê nexwaşî ya xilas bim, lê wext digire, mehek an jî du meh wext divê. Meriv dikare bimire jî, lê hîn karên ku em bikin hene û him jî zû ye.

Gelek jan û êş dide min, tehamulek jana ûsa zor e. Lê ew kesên ku di çerxa êşkencê dane çi dikin?

Ew, him li ber êşkence û zulmê berxwadidin him jî bona parastina şerefa mirowatî yê berxwe didin. "Meriv bi destê vala venegere welat. Li zarokan xwedî derkevin."

Bi wan gotinan xûya dikir ku wî dizanî wê dawîya wî çawa bibe?

-Min got; partî li zarokên te xwedî derdikeve, eger ew xwedî derneket em brayên te, li wan xwedi derdikevin. Gotina dawî min nekarî pêşî li hêstrên xwe bigirim.

23 adar 1984

Her çiqasî awrên xwe zîndîye û bi eşq bi jîyanê ve girêdayî ye jî xwarin û teqat gelek kêm kirîye. Ji bo ku doxtoran jê re deh roj birî bûn em bi tirs û şik li nexwaş dipên. Lê ew roj temam bûn. Dem deman xwe rihet hîs dike û hêvîya başbûnê dide me. Do nîvê şevê got ku ew birçî ye, Sîdar çû jê ra hamburgerek anî û wî ew hemû xwar.

Gelek welatparêzên kurd rewşa wî mereq dikin û têne nexwaşxanê ji me agahdarî digirin û terin. Îro, hevalên me Veysî Zeydanli, Kemal Burkay, ji Partîya Pêşenga Karkerên Kurdistan (PPKK) Saît Aydogmuş û Zîya Avci, ji partîya Komînîst a Tirkîyê (TKP) Şeref Yildiz hatin seredana wî. Êvarî ez çûm ba sekreterê Partî Sosyalist Kurdistan Tirkiya (PSKT) Kemal Burkay li ser rewşa Kekê Mistefa em peyîvîn. Min da zanîn ku rewşa wî her roj ber bi ne başîyê tere, ûsa xûya dike ku ew nêzik de wefat bike. Em dixwazin cinazê wî bişînin welat. Welatê ku wî di rîya azadbûna wê de canê xwe da.

24 adar 1984

*" Ji Dohî Xirabtirim."*

Me kîngê jê bipirsîya, *"tu çawa yî?"* Wî yek bersiv dida: ji dohî xirabtirim. Îro jî bersiva wî ev bû. Bi rastî me jî her roj paşve çûyînek dîdît. Ew li ber çavê me roj bi roj dihelîya. Lê wî her wext êşa xwe di hindurê xwe de girt, xiret dikir ku ew li ba me nenalê. Dibêje çend şev in ku wî nekarî ye razê, nuha dil heye ew razê. Ji min xwest, ez wî tenê bihêlim.

Li derva, salonê rûniştim. Swêdî nizanim, hin kes ku ji min hin tiştan dipirsin bê bersiv dimînin. Pîrejin û kalemêr bi alîkarîya kûrsîyên bi teker an jî di milê hemşîran de digerin. Dilê min bijîya temenê dirêj ya ku wan xwe gîhandîyê. Ew xwedî emrekî dirêj in, hemû ser 70 salî ra ne.

Kekê Mistefa herî gêncê wan e û herî granê nexwaşan e. Ji xwe dipirsim çima mirovê Ewrûpî ewqas emir dirêj in, lê yên welatê me xwe zar û zor digîhîjîne dora 50 salî? Helbet sedem gelek in. Zilm û zordarîya ser gel, feqîrtî û bê karî, bê doxtorî û bê dermanî, sitres û tirs, xwarin û vexwarina ne baş ...

Nexwaşekî din heye, li salonê digere, ne swêdî ye, ser reş e. Xwe nêzikî min kir û bi zimanê erebî rewşa nexwaşê me pirsî. Ji ber ku çend sal bû ez li Sûrî ma bûm min dikarî bi erebî bersiva xwe bidim.

Dibêje ew ji Maraco ye, 15 sal e li Swêd e, bi jinek swêdî ra zewicîye. *"Ez bi brakî te ra hin caran bi swêdî sohbet dikim. Hûn pênc bira li ser nexwaşê xwe hatine ba hev. Hin ji we welatên din hatin e. Ew eleqe û têkilîyên germ adetê welatên me ye. Lê li vir ew tişt gelek kêm e."*

Zengilê telefonê lê dide, radikim Dr. Nacî ye. Rewşa Kekê Mistefa dipirse. Saet 18.00 êvarê ye. Di mabeyna derê vekirî de li Kekê xwe dinêrim, ew raza ye. Bê ku lambê vêxinim û bê deng çûm hindur. Li ber pencirê derva temaşe dikim, berf dibare. Der û dor ji berfê sipî dike. Di pencireyên avahîyên himber de lambên rengîn dişewitin.

Di avahîyên himberî me yên bilind da, ew çi karî dikin meriv dibîne. Hin kes pirtûk dixwînin, hin kes di malan de paqişîyê dikin, hin kes jî di mitbaxê de xwarin çê dikin. Lê qatê herî jorin, li apartimana nêzik jî cot ciwan bi hev û du radimusin. Çavên xwe li pêş, li ser xaçerê digerînim. Lambên trafiqê bi tempoyek kişif vêdikevin û xewde diçin. Li gorî nîşana lamban erebe disekinin an jî terin.

Erebeyên ku li pê hev mîna kerîyê pez rêz bû ne, bi sebir li benda dora xwe ne. Hemû jî li benda îşareteke piçûk in. Wexta ku lamba kesk pêdikeve, rêza ereban livîyan, çûn û wendabûn.

Vê carê jî erebe yên ku ji çeprastê ve dihatin, rawestîn mîna hebên tizbîyê, ber bi paşve rêz bûn.

Seh dikim ku nexwaş şiyar e. Min jê pirsî ew piçekê razî an na. Dibêje raketim lê hîn jî xewa min heye. Şev nikarim razêm ji ber wê nebe, hîn dikarim gelek razêm. Min lambe vêxist û nêzî wî rûniştim. Me qala gelek tişta kir. Lê min dî ku ew di vê rewşa de jî li ser nuçeyên welat li benda hin agahîyan e.

Saet 20.30 Sîdar hat. Êş û jana birînên mirovan pir caran şev zêtir dibin. Êrîşên polês û leşkeran ya ser malan jî saet derengî şevê pêk tên. Ew him ji bê deng bûna şevê fêde dibînin, him jî di vê saetê de qûrbanê xwe bê tedbîr digirin. Ji bona çûyîna

mal berî ku ez jê xatirê xwe bixwazim rewşa wî car din dipirsim. Dibêje îşev ez nahêlim Sîdar razê, hemû organên min bona ku bi êşin, gotina xwe kirine yek.

Nîvê şevê ye, em yên li mal, di mereqandan e. Min telefona nexwaşxanê kir û pirsî, li gorî gotina Sîdar êşên wî zêde bûne, rewşa wî ne baş e.

25 adar1984

Çend roj bû nedixwast Dîyar û Zinar li ba wî bimînin. Digot: ew ji derva hatine, bila herin bajar piçekê bigerin der û dora xwe bibînin. Yek jî naxwazim ew ji ber rewşa min xemgîn bibin.

Lê îro wî xwest ku ew bêne nexwaşxanê ba wî. Ez li mal mam, ew çûn. Dilê xwe hinar dixwaze. Li hemû dûkanên bîyanîyan, ya asûrî, yewnan, tirk, ereb û swêdî yan gerîyan me nekarî hinarekê pêda bikin. Bona ku hin hinar ji me ra bişîne me li Elmanyayê re telefonî pismamê xwe Enver kir. Êvarê ra min dîsa rîya xwe bi nexwaşxanê xist, bi hîş û bîr e.

26 adar 1984

Şev bi alîkarîya Serdar serê xwe şûştîye. Lê nehiştîye Dîyar ruyê wî kur ke. "Dikare destê Dîyar bi lerzê û ew nekare, ji ber wê min tu xwestî." Ez bi îhtimam ruyê wî kur dikim. Ji min re usa tê ku ew amadekarîya xwe dike. Du roj e nare tualet ê, destava xwe tune. Lê demikê berê, roj ê 5-6 caran diçû.

27 adar 1984

*-"Her gav rewşa min ber bi xirabîyê tere. Roja pêşin doxtor gotî, ez dawîya hefteyan de bikarim herime mal û bêm." Lê nuha ez nikarim rabim ser pêyan. Razana min a li vir bê fêde ye. Doxtor midaxele nakin tenê dişopînin. Gavekê zû ez ji vir bêm derxistin wê baş be. Partî çi di fikire?"*

Alîkî ve ji nava hinarên helisî, hebên ne xirabbûyî dibijêrim, didimê, alîkî ve jî li bersivên pirsên wî digerim, difikirim:

-Tu bi xwe jî dibê jî, di nexwaşîya te de rawestanek heye. Li gorî doxtoran jî seyra nexwaşîyê normal e.

Beramberî vê gotina min, porteqala ku dest dabû, nîv portaqal dirêjî min kir. Min bawer kir ku wî bi vê hereketê dixwest dereca nexwaşîya xwe bizan e.

Yanê ez tiştekî ji wî vêdişêrim, an na, ez diceribandim. Eger ez porteqalê ji destî wî nexwim mana xwe nexwaşîya wî ciddîye.

Min bi rehetî ew porteqal girt û xwar. Me dizanî Hepatît B bi rîya xwînê derbaz dibe, jî ew tiştê min kir jî ne di cîdabû. Ji bo moral bidim wî min xwe dikir, binê rîskê, encam jî nedihat guhartin.

28 adar 1984

Sibê de wexta Sîdar ji nexwaşxanê telefon kir, ez bi havalên partî yê ra rewşa Kekê Mistefê dipeyîvîyam.

Sîdar bawer dikir, ku ew êdî bîrsivik bibû. Ez cîh de çûm nexwaşxanê. Piştrê sekreterê partîyê û dostên din jî hatin. Nîşanên ku Sîdar telefonê de gotibûn lê tune bûn.

Hevalên hatîbûn nexwaşxanê çûn mal, ez tenê li wir mam. Qet nedixwest ez ji cî yê xwe bilivim. Hin caran derdiketim derwa ji bona ku ew razê, lê li zengil dixist ez dixwastim hindur.

Piştî ji xew şîyar dibû, dipirsîya min cila wî guhartîye an jî na. Wî usa hîs dikir ku cila wî guharîne.

-Tenê deyax nakim. Êdî naxwazim razêm. Çer çavê xwe didim hev, hemû dost û eqrebe tên ber çavê min.

Bi wan îşaretan demên wî yên dawî yê nêzik xûya dikir. Zikê wî jî werimîya bû. Min Swêdî ne dizanî. Lê bi alîkarîya ferhengê ji hemşîrê xwest ku ew lêmon bîne û ji bona ku perçê zikê wî dakeve jî fitîlkê lêxine. Hemşîrê bi ken guhdarîya min kir, hin tişt got û çû. Lê min fêm nekir wê çi got. Tiştên ku wê gotin, di ferhenga min de tune bûn!. Ji ber ku di ferhengê de hevok ne gotin he bûn. Hemşîre çend deqîqe şûnda hat, daxwazên me bi cîh anin.Saet 21.00 ê êvarê ye agirê laşê wî bilind bûye . Min bi ava sar ling û sûretê wî mist da.

*"A vê deqîqê tu êşik min tune."*

Li gor gotina doxtoran di taxlîla xwînê de êdi rastî hucre yên mirî nedihatin. Belkê jî di kezaba reş de cîhê sax nema bû, lewma. Heta roja îro ji hîş û bîra wî li cîhê xwe bû. Bona bikare xwarin bixwe hewl dide, lê gelek organên wî êdî karê xwe nedikirin, ango êdî wan îtiata mêjo nedikirin.

Wek her şev Sîdar di saeta xwe de hat, ji ber ku lazime ez jî xwe bigîhîjînim trêna dawîn.

29 adar 1984

Destê sibê bi telefona Sîdar min xeber girt, rewşa wî xirabtir bûye. Malbat ji wê yekê haydar nekir û ez rast çûm nexwaşxanê. Kekê Mistefa di nava nivînê de xwe zû zû dizivirine vî alî û wî alî. Çavê xwe nîv girtî dixwaze tişteki bêje, lê belê nikare. Demikê çavê xwe vekir bi awirekî tûj li min nêhêrî, carek din xwe zivirand alî din. Ez tê gihîştim ku bi awrê xwe dixwast bêje *"ka te digot ez ê baş bibim, ava çawa baş bûne?"* min deyax nekir derketim derva. Êdî em qane bûn ku roja wî ya dawîn hatîbû.

Em xemgîn û bêçare bûn. Serdar û Dîyar li ba wî man û em veqetîyan. Kurdên li Stockholmê rûdinin û dostên me bi xebera reş hatin, bona kêmkirina jana me dostayetî nîşan dan.

**Kekê Mistefa (Apê Selîm) çû ser dilovanîya xwe.**

30 adar 1984

Saet 06 ê sibê Sîdar ji nexwaşxanê telefon kir Kekê Mistefa, (Apê Selîm) çû ser dilovanîya xwe. Roj 30 adarê, sal 1984 bû. Malbatê ji ber zilm û zordarîya 12ê Îlonê şehîdê xwe yê yekem da. Mirin tiştekî xwezayî bû. Lê tiştê ku li me çetin dihat û me ne di eciband ev bû ku di emrekî ciwan de ew ji nava me diçû. Li dervayî welat, ji dûrî dayîk û bavê, dûrî zarokîn xwe mirinek bêwext û bêbext bû. Ne tenê ji bona malbatê her ûsa ji bona gelê me jî zerarek mezin bû. Kekê Mistefa, xwedî tecrube, zane û têkoşerikê hêja bû, wendakirina qadroyekî mîna wî ne hêsan bû. Mirina Kekê me li welatê xerîbîyê em kirin xemgînîyek mezin.

Doxtorê wî ji bi girseyê gelê ku li ber derê nexweşxanê kom bibû peyîvîya. Got,*"Ez ji berxwedana wî ya himber nexwaşîyê derdixinim ku rastî jî we qadrokî xwe yê hêja wenda kir. Dibînim ku gelek heval û dostên wî kom bûne, ew ji bo me tiştekî balkêş e. Li cem me siwêdîyan germahîyek usa em zêda nabînin, lê ew germayî û nêzikbûna we tiştekî mîrovahî ye. Serê we sax be."*

Roja ku cinaze bê şandin civînek hate çêkirin. Di civînê de ozanê gelê kurd û endamê komîta merkezî ya Partî Demoqrat Pêşveru Kurd li Sûrîyê Cîgerxwîn, sekreterê PSKT Kemal Burkay û min axavitinek kir. Peyva Kemal Burkay di Rojnama Rêya Azadî de hate weşandin.

**Di cinazê Apê Selîm de min ew gotara jêrin kir**

Xwîşk û brayên hêja!

Endamê Komîta Merkezî ya Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê Mistefa Budak iro Saet 6ê sibê li Stockholmê, ji dûrî welat û zarokên xwe çû ser dilovanîya xwe. Mirina wî ya bêwext di nava refên partîya wî û di nava enîya welatparîzên kurd de xemgînîyek mezin afirand. Ew kesên ku ketine rîya têkoşîna azadîyê, li kîderê, çawa û kîngê wê bimirin mirov nizane. Lê yên ku şunve dimînin têkoşînê di domînin. Wek Che Guevera jî gotîye; *"Eger ku sloganên me yên şer li ser zimanan têne gotin, çekên dest me ji destekî derbazî deste din dibin û bi dengê mîtrîyalozan û banga serkevtinê ji cinazê me ra helbestên şînê têne stirandin, mirin ji kîderê û kîngê tê, bila bê, xêr û sefa hatîye."*

Ji bona hemû jîndaran mirin encama dawîyê ye. Lê tiştê ku jana me zêde dike di civanîya xwe de û di temenekî berhemdar de wendakirina wî ye. Di şertên faşîzmê

de wendakirina kadroyekê pêşeng mîna Kekê Mistefê di enîya demoqratîk de valabunek pêda kir. Lê gelê Kurd wê valabunê dagire.

(……… )

Kek Mistefa ji fikre çep ra di salên sivik de vekirî bû. Belengazîya malbatê, lorik û axitên li ser qetlîama Dêrsimê û hin şertên din yên objektîf ji wî ra bûn çavkanî. Digot ez kurdbûna xwe ji dîya xwe fêr bûm. Çimku dîya min tirkî nedizanî, vê yeka ez dikirim nava fikaran. Di salên hatî de ez tirk nebûna xwe fêr bûm.

Tevgera Netewîya Kurd ya Kurdistana Başûr, mîtîngên Rojhilat yên sala 1967, damezrandina Partîya Karkerên Tirkîyê (TÎP), tesîrên çandî yên zanîngeh û bajarên mezin hemû bi hev ra li ser wî tesîr dike û ew dîgîje wê zanîna çînî û netewî.

Demekê şûnda ji ber şertên aborî derbazî mamosteyî bû. Cara pêşin li gundê Guzelsu ya Bitlîsê dest bi kar kir. Wek Çolîg, Yozgat, Kastamonu, Solxan, Gêxî, Odemîs, Edene li pir cîyan xebitîya. Li pir cîyan mamosteyî kir, li himber nezanî û bawerîyên paşdemayî rawestîya, pir kes perverde û şîyar kir.

Alîkî ve dixebitîya ji alîkî ve jî diçû zanîngehê. Ew li himber neyarê gelê me bê tirs, li himber dostên xwe bi hezkirin û rêzdar bû. Li gorî ziman û rengê çermê mirovan ferq nedikir nava mirovan, ew hez dikirin. Mistefa fêdekar û mutewazî bû. Ji cîhên bilind li mirovan temaşe ne dikir. Qîmet ne dida karyer û ezitîyê. Di xebata legal û vêşartî de xwedî pratîk bû. Qelsî û qabîlîyeta mirovan zû kifş dikir, serafê mirov bû. Di xebata nava gel de serkevtî bu.

Me, biran, jîyan û camêrîya wî ji xwe ra nimune girt. Di xebata welatparêzî û pêşketina şexsîyetê me de li ser me bandora xwe çê bu. Wî tim û tim dostayetî û piştgirîya hêz û partîyan diparast.

*"Wî digot em sosyalîst in, ji bo damezrandina civakek demoqratîk û sosyalîst ketin nava vê xebatê. Tiştê ku em bikarin ji zarokên xwe ra wek mîras bihêlin ew fam û têkoşîne. Ew zilma ku li Tirkîyê û Kurdistanê tê kirin, nikare daha zêde bidome. Eger partî û tevgerên heyî bersiva rojê nedin, gel wê organîzasyonên nû ava bike. Girse ya gel wê biteqê, lakîn hêzên sîyasî yên heyî, bi wê rewşa xwe, tenê dikarên li bûyeran sêr bikin.*

*Li himber faşîzmê serkevtinê de gavê pêşin damezrandina enîyek sîyasîye. Bawer dikim ku eger mixalefeta Tirkîyê ya demoqratîk û şoreşger rast bê rêvabirin serkeftin nêzik e. Wek partî gelek wezîfe dikeve ser milê me jî. Usa nebe jîyana sirgunîyê dawî lê nayê. "*

Heya roja duh jî Kekê Mistefa di nava gel de ji bo Kurdistanek azad û demoqratîk bê westan xebitî, lê îro ew gihaşt dawîya jîyana xwe. Gelê me û partîya wî bîr û bawerîya wî wê bide jîyandin. Serê gelê me sax be!

Cinazê Kekê Mistefa me 10 Avrîl 1984 an de me bi teyerê şand Stenbolê. Ji me biran kesî nekarî tevî cinaze here. Ji wir jî eqrebe, dost û hevalên partîya me cinaze bi erebê birin li Dêrsimê 12ê Avrîlê, li gundê wî Haysivê bin ax kirin.

***

Mamoste Nûran Ozcan di nama xwe ya 14 gulan 1984 an de ji bo cinazê Kekê Mistefa van agahîyan dide:

( ...)

*"Mirina bêwext ya kekê me yê hêja, pir pir jan de me hemûyan!... Û ji bo me hemûyan wendahîyek mezin e! ... Çavê qederê birije, wexta wî û mirinê bû? Ew mirovê ku wî emir de bimire, ew mirov bû?*

*Gelek kûçikên ku mirin heqkirîbûn hene, lê çavê qederê kur be, ku mirinê hat ew mirovê ewqas bi namus, bi qîmet, bi biryar û mirovê payebilind dît.*

*Sond dixwim, eger di cîhê wî de mafê bijartinê hebûna min bi dil û can di cîhê wî de mirin qebûl bikirina. Lê mixabin, bona ku mafekî usa tuneye, em jî çiqasî bigîrin, li xwaxinin û xwe bikûjin jî em nikarin wî şunda bînin. Ji ber wê heta ji destê me tê, li hember dost û neyaran em hîssî nebin, bi îrade û xwînsarî tevbigerin. Lê heta heta roja mirinê wê em jana wî di dilê xwe de vêşêrin, wî bîrbînin û bi tunebûna wî bînteng bibin, lê emê zêtir bêne sûandin û xurt bibin.*

*Li hember bîranîna rûmeta wî hezkirin û hûrmeta me ya herî mezin ew e. ( ... .)*

*Piştî ku min mirina wî bîhîst du rojan şûnda 10 rojan rapor girt. Çar rojan berî ku cinaze bê çûm gund. Helbet berê çûm gundê xwe, fêrbûm ku apê Silêman (bavê Mistefê) haya xwe jê tune. Lewma hema neçûm ba wan. Du rojan şûnda Apê Silêman ra hatibû gotin, ez tevî bavê xwe çûm. Lê rastî jî tiştê ku min hêwî nedikir ji apo û amojî dît. Çimku pir bi sebir, xwînsar û li serxwe bûn. Gelek bi manitiq û îradeke xurt pêşwazî li kesên hatî û çûyî kirin.*

*Xwarin, çay û xizmet bê qisûr bû. Dû ode tijî dibûn vala dibûn, ji hemû gundên dorê, kesên ku bihîstin û nehatin neman.*

*Hela Amoj (dayîka Mistefê) qet ranewestîya, him ji mîvanê xwe ra xizmet dikir, him jî bi wan ra bi xwaşikî sohbet dikir. Wexta ku min got:*

*-Amoj tu rune, emê xizmet bikin.*

*-Qeça min hûn têkil mebin, dawata lawê min e, îro êdî lawê min mala xwe ji me veqetandîye, ez ji mîvanên wî ra xizmet dikim.*

*Di nava sohbetê de wexta wê got "**Ez jî di rîya zarokên xwe de me.**" ez pê usa serbilind bûm ku nikarim bînim ziman.*

*Rastî helwesta wan a bi îrade, mantiqî û zanistî hêz dida me hemûyan. Mîh û beranek serjê kirîbûn, xwarin zêde zêde bû.*

*Cinaze saet 7 ê êvarê hat, êdî tarî ketîbû erdê. Cinaze rast birine mezelan- gorîstan ê. Apo û Amojê pir xwestin ku cinaze bînin malê jî lê him dereng bû him jî, ji ber hin hesavên din nanîn mal. Wê şevê ew spartin axê. Wext dereng bû, lê dîsa, gelek kes li ser*

*gora wî kom bibû. Ji hemû gundên cîran, kê ku bîhîstî bû hatîbûn. Hemû jinên cîranên me jî hatî bûn.*

*Ji mezelan ku vegerîn mal jî Apo û Amoj li oda jin û mêran gelek bi moral û îrade bûn. Amojê jin û zarokên Kekê (Mistefê) tesellî dikir. Gotina wê:"hûn hemû di cîhê bavê xwe de yek û yek lawê min in, li pişt we 6 apê we yên wek çîya hene, qet megîrin û xwe neêşînin."Rastî jî ew yeka mêrxwesîyek usa bû ku herkesî nedikarî bike. Ji ber wê dest û pê yê wan merivên qedirbilind, hêjayî maçîkirinê ne. Hemû kes vê camêrî û merdî ya wan qal dike. Wan meht dikin û teqdîr dikin.*

*Piştî cinaze em li gund çar rojan man. Heta gundê Karê em hev ra hatin zarok û dîya wan derbazî Dîyarbekirê bûn, ez jî dora roja din hatim.*

*(...)*

*xwîşka we Nuran*

Têbinî:

*Ez mesaja Amojê bo we nenivîsim, namê naqedînim, ji we ra silavên xwe usa rêkir. " Eger ku te name nivîsî an telefon kir, pir pir silavên min bêje. Bêje ku dayîka we nedigîrîya, xwedê sebir dabûyê, ew bi sebir û miqawemet bû, hûn jî bi miqawemet bin, hay ji xwe hebin. Ji xwe min dizanî ku 6 lawên min bê qeza venagerin. Rojek usa her dem di hişê min dabû, çi bikin, disa jî xem mexwin, hay ji xwe bin û hûn saxbin. Êdî em çi bikin jî nikarin wî şunve bînin." digot dayîka we ya cesur û ciwanmêr.*

*Ez xwe nikarim pêşîyê li girîyê xwe bigirim, dema ku vana dinivîsim. Bûyerek çetin bû. Carek din bi hurmet...*

*Li benda nûçên we me. Nur*

**Xwîşka me Husnîye jî di nama xwe da, qala merasîma cinazê Apê Selîm dike.**

*1984.06.30*

*Ji Kekê minê hêja ra!*

*Min ji we ra pir name, suret û rojnamên rojane şandin. Xûyaye ku ji wana tu tişt neketîye destê we.*

*Va nama min jî dikare nekeve destê we.*

*Wekî hûn jî dizanin me bûyerek jandar derbaz kir. Vê bûyerê gelek kes hêjand û êşand. Helbet pir zêde jî malbat êşand. Pir çetine ku em cîhê wî dagirin. Lê beranberî wan berketin û janan jî em nikarin tiştekî bikin.*

*Tiştê ku em bikarin bona wî bikin tenê ewe ku, di rîya wî de bin û li zarokên wî xwedî derkevin. Vê yeka jî emê rehetî bikin, ji wê jî bawerim.*

*Ez usa bawerim, ku eger mirin bihatana bijartin di serî de ez û gelek kesê din jî wê fêdakarî bikirina.*

*Me nikarî hêza xwe komî serhev kin û zûtir ji wera name binivîsin. A nûha jî ew yeka min diêşîne.*

*Destpêkê me şok derbaz kir, bawer nekir. Malbatê berê texmîn kirin ku Zinarê apê zarokan e. Çimku, berê di derheqê wî de hin gotinên xirab hebû. 6 saetan berî hatina cinaze min minasiv dî ji zarokan ra got.*

*Zarokan dema ku zanîn bavê wan e, bi kelegirîyek nedîtî rawa kirin. Pir gîrîyan. Bi girîn û zîvina wan hemû mehelle li me hate sêrê. Demek dirêj bi xebat û cehda me nekarî girîna xwîşk û bira bide rawestin. Pêşta her du yê piçûk dengê xwe birandin. Lawê xwe yê mezin û keça wî demek dirêj girîna xwe domandin.*

*Rewşa wan em pir hêjandin. Lawê mezin bi deng û kelogirî hesret û bêrîkirina bavê xwe û carek din nedîtina wî dida xûya kirin.*

*Cinaze piştî nîvro saet 16.00 de hate Xarpitê. Em li xarpitê mala apê xwe bûn. Bi alîkarîya kurapê me Alî Kemal em li otobosa cinaze sîyar bûn û me de rê. Demek dirêj bû em ji hev dûr bûn wê gave em hatin ba hev.*

*Dest li me nedigerîya û zimanê me ne dilivîya. Lê ji dijmin ra înat, me jana giran avite hindurê xwe. Me nexwest em dijminê gelê xwe şad û dostên xwe pozxîn bikin, ji bona wê me hemû cehda xwe bi kar anî.*

*Li gorî şert û mercên rojê me torenek layiqî wî kir.*

*Cane min! di roja pêşin de min fêmkir ku kekê me çûye ser dilovanîya xwe. Vekirî bêjim min li gotina we bawer nekirî bû. Lê min cesaret nedikir wê gotinê bi kar bînim. Lewma jî çendî çend caran min telefon kir, halbû ku -her çiqasî te dîrek nedigot jî-, ji peyva te min fêmkirî bû ku ew mirîye.*

*Lê dîsa jî min nedixwast bawer bikim, di telefonê de min pir terre tûrre tişt gotin.*

*Herê, em bine ser binaxkirina cinaze; li Stenbolê hin xwenezanan hin astengî derxistine, lê di encamê de tiştek nebû. Bi giranîya eqraba û dostan canaze ji wê hate girtin û bi otobosê anîne Xarpitê. Bi min ra têkilî danîn, min jî zarokên wê girtin em hatin Xarpit ê. Di otobosê de em 40 kes bûn.*

*Nava otobosê bû cîhê şîn şîvanê, bi vî awayî em hatine kurpîyê. Grubek mezin li wir benda me bû.*

*Ew jî hindek bi dolmîşa gund, hindek bi traktor û motoran ketine rê. Ereba cinaze di pêşîyê da, otobos dû cinaze, gelek traktor erebên din pê hev ajotin çûne gundê Hêwedan, li wir jî komek mirov li benda cinaze bû, ew jî bi hin wesayîtên din xwe dane paş kunvoyê.*

*Dûra grubek jî li Gundê Mastan tevlî me bû. Gundî hemû li ser rêyan bûn, xemgîn û kelogirî bûn. Hindek ji wan li erebên heyî sîyar bûn. Di ereba û traktoran de millet li ser hev rûnişt.*

*Lê jin û zarok jî di nav de piranî peya hatin. Koma zêde ya mirovan ya ku li gundê dawî yê, li Karê civîyabû wê qet ji bîra min neçe.*

*Ew kalên pişt kuv, pişt xûz, di desta baston li cinaze pêşwazî kirin. Bi dengekî bilind digirîyan û di devê hemûyan de ew gotin: "Wexta wî û mirinê bû? Ew çawa ha zû mir? Lazim bû ew hîn bijîyana."*

*Rê pir xirab bûn û şilî- baran dibarîya, bi wî şiklî çûyîn ne mimkun bû. Li gundê Kar ê bi traktor û motorên heyî cinaze, em hin kesên ji malbatê girtin birin Haysivê. Yên din hemû peyatî hatin. Berî ku em herin gundîyê din, yên ku ji Rîçik, Mankirag, Hulman û ji wî alî çem Kilxir û gundên din hatîbûn li ser gorê bûn. Gelê tevî cinazê bûn, li ser gorê te ax biavitina, nediket erdê.*

*Yanî bi kurtasî hin kesên ku tu tikilêyên me tune bû jî hatîbûn. Gelê me pir ber xwe ket. Digotin: "me ew ne (di tabutê da) mirî, zîndî dixwest. Em çawa dîyaxa vê yeka bikin?*

*Hin kesan ji bo tirsa qereqol û hin sedemên din nikarîbûn bêne cinaze, ew jî hatin sersaxîyê.*

*Cinaze anîn li dîyarî" Zîyareta Qendîl" an danîn, me nikarî em tabutê jî bibînin, tenê sere mirovan xûya dikir. Xasima jinan xwe avitîbûn ser tabûtê û şîn dikirin. Lê dilêşîyek mezin dide mirov, vê sahnê bijî û neqil bike.*

*Tu jî dizanî jîyan û lorandina jinên me yên xemxwûr pir li hev tê. Her du jî bi keser, bi derd û kûl e. Ez wê sahna dilşewat jîyam û hîn jî di binê tesîra wê de me.*

*Em bêne ser dê û bavê me, hemû dost bi wan ra eleqeder bûn. Di milên dostê me de ew hatine ser gore. Karê her merivî nine ku, li hember wendakirina evladekî leheng li ser pîyan bisekine û berxwe bide.*

*Lê angorî êş û kedera xwe wan dîsa jî ber xwe dan. Ji bona ku layiqê mêrxwasî ya wî bin hemû jan û kedera xwe di dilê xwe de vêşartin. Bona dostên xwe xemgîn nekin û dijmin şad nekin, zahmet be jî me hemûyan, usa kir û em ser ketin. Rastî bêjim, yên hatîbûn ji ber şîyarî û berxwedana dayîk û bavê me heyirîn. Xasima dayika me bi cesaret bû.*

*Wexta ku digirîya digot; "ez jî, parçek ji wanim, ez jî di rêya wan de me."*

*Me li dîyarê Qendîlan gora wî kula, berê di dilê xwe de dûra jî, li wir bin ax kir. Ji bona gore kevirên baş tune bûn, mêrê Zeytûna me Nurettîn bi motora xwe ji Hulmanê anî. Du hostan hindurê mezelê amade kirin. Hosta yek kirîvê wî, ya din jî Mistefa Bozay bû. Li ser gorê pir suret hatin girtin. Lê tu yek jî derneketîye. Him baran dibarîya him jî dereng bû, tarî bû.*

*Di nava gel de tirs û bêçaretî jî hebû. Kesî bawer nedikir ku cinaze heta vira bê problem bê.*

*Dê û bavê me pir xwestin rûyê Mistefê bibînin, ji ber wê qapaxa pêşin rakirin û me gelekan ew cara dawîn jî dît, carek din qapax kirine cîhê wî. Eger venebûna hin şik û paştegotin dikarîya pêyda bibûna, him jî dê û bavên me teselî bûn.*

*Wî şiklî me ew mirovê paye bilind, kekê xwe, bavê xwe kire hembêza axa welatê wî ya ku wî jê pir hez dikir. Pir kesan nexwastin gotina sersaxîyê kar bînin, destê me*

*guvaştin û çûn. Digotin; zimanê me nagere em vê gotinê- sersaxîyê- kar bînin. Ji bo sersaxîyê hîn ji hatin û çûyîn heye.*

*Roja cinaze me nikarî em gel bigirin hindur, xanî dikarîya biherife, me piranî ew li bênderan rêwî kirin. Me bi alîkarîya dostan xwarin da.*

*Ji dervayî welat û nava welat de ji me ra pir telgraf û name tên. Cengîzê bira rojekê çû nahîyê telgraf ne di nav de piranî ji dervayî welat 25 name carekê de anîn.*

*Hevalek jin ku di nexwaşxanê de ye, ji mêrê xwe ra nivisîye ku,"ez miroveki metîn im, pir hindek caran digirîm, lê vê mirinê ez pir êşandim, tijî tijî girîyam."*

*Dîsa hevalek min a din ku ji min ra name şandîye usa nivisîye; bawerbike ku va jan û kedera me hemûyan e, dîsa bewerbike ku ew histêrên ku te nekirine xwar min kire xwarê. Encam nayê guharandin."*

*Teselî ya me ew e ku em li zarokên wî xwedî derkevin, bo fikir û ramanên ku têkoşîn da biparêzin. Emê xîret bikin, emanetên wî bidin jîyandin.*

*Zarokên xwe pir xemgînin, lê mafê wan heye, ji ber ku bavekî usa nabe nesîbê her kesî.*

*Bizanin ku me bêrîya we hemûyan kirîye. Bejna û Bermal baş in, em eleqeder dibin. Ji Nazliyê ra dûra binivîsîm. We hemûyan bi bêrî û hesret himbêz dikim.*

*Têbinî: eskerîya birayî minê piçûk hatîye. Tecîl kir, lê wext kêm maye.*

*Husnîye*

Ser mirina Mistefê Komîta Merkezî ya PSKT belavokek belavkir. Li Şamê, Parîs, Kopenhag û li hin bajarên Elmanyê Partîya me û komelên girêdayî civîn darxistin. Bona sersaxîyê li Tensta-Stockholmê salonek hate girtin. Wênekî mezin ya Kekê Mistefê di salona sersaxîyê de hat daliqandîn.

Sê rojan nuner û endamên hêzên Kurd û Tirk hatin em zîyaret kirin û şîna me parve kirin. Di binê weneyê wî yên wesiqalik de jî du sloxanan nivisandî amadekiri, li beşdaran hat belavkirin, wan, ew wek rozet bi derzîyê pêsîra xwe zeliqandin.

Ez, Cigerxwîn û Kemal Burkay bi hev ra li cîhê sersaxîyê rûniştin û me pêşwazîya mîvanan kir. Cigerxwîn bi peyv û serborîyên xwe ve mecal da ku civat wexta xwe xweş derbaz ke. Li ser pirsa nunerê YEKITÎ yê Mehmet Sabir, Cîgerxwîn helwesta Partîya Komunist a Tirkîyê ji bo pirsa Kurdistanê rexne kir û got *"serokê wê, Îsmaîl Bîlen, paşnavê wî bîlen e, lê ew xwe (Îsmaîl) NEZAN e, nezan."*



1940- ......

**Hevrê Mustafa Budak**

**Di dil û şerê me de wê bijî.**

**PSKT**

Hevalê Bedirxan ji Şamê da zanîn ku, bi minasebeta mirina hevrê Mustafa ser navê partîyê civînek darxistine. Dora 25 nunerên hêzên Kurd, Tirk, Ereb û Filistînî di ciwîna partîyê de amade bûne, bi peyîv û mesajan xemgînîya xwe anîne ziman.

Li Şam ê û Stockholmê di cîhê serxsaxîyê de defter hatin danîn, kesên ku xwestin hîs û dîtinên xwe di defteran de nivîsîn. Her du defter jî di arşîva partîyê de ne.

**Li Danîmarqê, ji bo merasîma bîranînê jî Zinar di nama xwe de ew agahî gîhandin me**

"Ji bona bîranîna hevrê û kekê meyê hêja Mustefa Budak li Kopenhagê, 1984.04.8 an de di komeleke xortan de me cîvîn pêk anî. Di civînê de 27 heval û endamên partîyê bejdar bûn. Civînê bi yek deqîqe rêzgirtinê destpêkir. Hevalê Hazim, berpirsîyar civîn rêva bir.

*"Têkoşîna hevrê me Apê Selîm, (Mustefa Budak) di salên 1960 vir de tê. Ji ber bîr û bawerîyên xwe wî gelek tade dît. 12 Adarê de ew hat girtin, lê wî ji wan re serî dananî tekoşîna xwe domand. Li Çolîgê ji ber raman û fikrên xwe bû hedefa hêzên paşverû, ji mirinê filitî.*

*Ew li Edenê di xebitîya, piştî derba 12 Îlonê derket dervayî welat. Li Kurdistana Rojhelat em demekî bi hev ra man. Ew hevrêyekî baş bû. Me ji tecrubên wî gelek îstifade kir. Lê ew rastî nexwaşîyek bê derman hat û çû ser dilovanîya xwe. Ew bi laşê xwe ne di nava me de ye, lê bi fikir û ramanên xwe ve li cem me ye. PSKT wê wî di şerê azadîyê de bide jîyandin.*

*Ez naxwazim dirêj li ser xebatên wî yên li Kurdistan a Rojhilat rawestim. Ji ber ku gelek hevalên ku di ciwînêdane li wir bûn û ew behsa wê yekê bikin. Li ser jîyana wî ya malbatî jî em dixwazin ji birayê wî Zinar guhdarî bikin. Hevalên ku dixwazin bipeyîvin fermo" got û mafê peyvê min, dure jî hevalên din girtin û dîtinên xwe anîne ziman.*

***Zinar:** Min di derheqê jîyana wî de ew daxûyanî da guhdaran.*

*(... ...) dema mamoste bû, li gelek bajar û gundan xebitî. Destpêkê li Bitlîsê wî dest bi mamosteyî kir. Lê ji ber fikir û bawerîyên xwe pir cîh guharî. Li Çolîg, Qestemonî, Çolîg ( cara duyem),Yozxat, Îzmîr û Edene.*

*Dawîyê hikûmatê ji ber sedema,"Kurtçî bûna wî" biryar girt ku li Kurdistanê ew nikare wek mamoste bixebit e." Lê wî ti caran guh nedida van biryar û sirgunan. Çû kîderê xebat û têkoşîna xwe zêde kir. Bajar ê ku lê dixebitîya, di nava tevgera mamostan ya pêşverû û demoqrat de cîh girt, xebitîya. Li pir cîyan damezrandina liqên TOB-DER ê de cîh girt. Hîn di xortanîya xwe de li hember neheqî û bê edlayîyê serî rakir. Ji tevgera Kurdistana Başûr -serhildana Barzanî ra nêzikayî nîşan dida, jê fikirê netewî digire. 12 Adara 1971 an de ji alî orfî îdara eskerî li Dîyarbekir hat zîndan kirin.*

*Piştî ku di refên Partîya Sosyalista Kurdistanê de cîh girt, di xebatê de zêtir bi biryar bû, xebat û propaxanda partîyê dabû yek ji wan kesên pêş.*

*Wexta ku li Edenê mamoste bû Adar 1980 de bûyera Dîyarbekirê qewimî. Li himber partîyê operasyonên fireh dane destpêkirin. Li gorî biryara partîyê, ew derbazî Kurdistana Rojhilat bû. Li wê derê piştgirîya têkoşîna gelê xwe kir. Demekê şûnda dîsa li ser daxwazîya partîyê ew tê Tirkîyê. 12 Îlon 1980 de ku generalên faşîst dest dan ser desthilatî yê ew di welat da, li ser karê xwe bû û bona ku hevrêyên xwe nekevine destê dijmin, hewl dida. Piştî hin xebat û organîzekirina partîyê ew jî derket Sûrî. Çend mehên xwe ku li Sûrî derbaz dike, carek din ji alî partîyê ve li Kurdistan a Rojhilat tê wezîfedar kirin. Wek hindek heval ez ji li wir mam û bûm şahadê xebat û fedekarîya wî. Rastî jî bi xebatek hevpar karên serkevtî kir.*

*Li Kurdistan a Rojhilat, bona starbûna hevalan bi kolektîv meqarek ava kirin. Ji bona zêdekirina tiştên xwarinê di zevîyan de bexçê meyve û sebzan serrast kir. Heyvan xwedî kir. Ew der bibû çiflikek piçûk.*

*Di şertên şer de jî têkilî û pêwistîyên bi ziraetê ra neda birîn. Di pêşengîya wî de ev xebatên me ji bo gelê me yê wî parçeyî bû nimûne. Bi navê "Bexçe û baxê azadî, gelîyê azadî" dihatine bangkirin. Tevgerên ku şerê netewî didin, eger ku ziraet û çandinîyê jî pêra nekin, serkevtin nabe.*

*Di nava wan şertên dijwar de ti caran bêbiryar nebû. Her wext li hember hevalên xwe dirist, fêdekar û li gorî normên eqlakê sosyalîstî tevdigerîya. Rewş û berpirsîyarîya wî prestîj û qîmeta partîyê bilind kir.*

*Di bin berpirsîyarîya wî de grubek hevalên me yên çekdar li hember êrîşên hêzên rejîma Xumeynî rawestîya û hêzên dijmin mecbûr kirin ku xwe şûnda bikişinin.*

*Rojekê nişkeva ew li Kurdistan a Rojhilat nerehet bu, tere doxtor. Gorî doxtor divê ew gavekî zû ji wir derkewe û tedawî bibe. Lê ji ber dorpêça dewletên neyar ji Kurdistanê hatina wî ya Ewrûpê mehan digire. Nexwaşî girtin Tîrmeha 1982 ye, lê nexwaşîyê gelek rê girtîye.*

*Ew nexwaşîy bû, lê dîsa jî xwedî moralek bilind bû. Cesaret dida me biran, heval û dostên ku diçûn dîtina wî. Rojên ku doxtoran jê ra birîbûn ew derbaz kir. Dixtorê wî jî dane zanîn ku wî li himber nexwaşîya xwe berxwedanek xurt rava kirîye. Nexwaşîya wî hemû kezevareş zeftkirîbû, tiştê ku bihatana kirin nema bû.*

*30 ê Adarê 1984 an saet 06 sibê çû ser dilowanîya xwe. Mirina wî ji bona Tevgera Rizgarîya netewa Kurdistan (Kurdistan Ulusal Kurtuluş Hareketî) wendahîyek mezin e. Wî tu caran kar û barên xwe yî şexsî nedikire pêşîya xebata rêxistinî.*

*Nexwaşîya qarîyerîzmê jê dûr bû. Li ser xebata wî ya welatperwerî, fêdekarî û merdîya wî hemû hevrêyên wî hemfikirin. Xisusîyeta wî ya baş zaaf û qabîlîyeta mirovan rind nas dikir. Li himber neyaran bê tolerans bû.*

*Ew di salên berhemdayî de ji nava me çû, jana me giran e. Em çiqasî jî berkevin layîqe, lê em nikarin wî şûnve bînin.*

*Tiştê ku em dikarin bikin, li nirx û xebata ku wî ji me ra hiştîye li wan xwedî derkevin û pêşta bibin.*

*Ew di dilê gelê me de hate gor kirin, tekoşîna wî rîya me ronî dike. Serê gelê me sax be."*

**Yaşar Alagunduz**: *Eger va civîna sersaxîyê ne ji bû Mustafa Budak ( Apê Selîm), ji bo yekî din bûna, minê rihettir bikarîya bipeyîvîyama.*

*Lê îro em ew kesê ku ti caran mirina wî nedihat bîra me, sembola mêrxwasî, gernasî û zîrekîyê civîna bîranîna kekê me Apê Selîm pêk tînin, ji ber vê yekê ez nizanim çi bêjim. Ez û hûn, em çi jî bêjin wê dîsa jî kêm be.*

*Ew komunîstekî mezin bû. Her tiştê xwe kirîbû rîya azadîya gelê xwe. Wek hevalê ku civîn vekir jî di axavitina xwe de got; wî jî hevalên wî jî û* em *jî ji Mistefa Budak pir tişt fêrbûn. Kesên ku nêzik de bi wî ra bû heval , wî rind nasdikin.*

*Wefaata kekê Mistefa him ji bo tevgera me, him jî ji bo tekoşîna azadîya gelê Kurd wendahîyekî mezin e.*

*Di salên ku mamosteyî dikir, ew ji bajarekî dişandin bajarekî din. Ew jî ne bes bû, biryar girtin ku "Mistefa nikare li Kurdistanê wek mamoste bixebite."Ew sirgun û biryarên wan tirsa kulonyalîstan dida xûyakirin."*

*Ew, miroveki, xwe ji nîşandanê dûr, ji qarîyerîzmê pir dûr û mutevazî bû. Mirov rind nasdikirin. Ez fedekarî û zîrekî ya wî, xebat û tekoşîna wî çawa bînim ziman, nizanim.*

*Lê bila rûhê Kekê Mistefê rihet be, ev bila çav wekirî nere, li himber bîranîna wî sedhezar carî bejna xwe ditewînim. Ez ê di rîya wî de bim. Gelê Kurd xebat û keda kekê Mistefa wê bîra neke."*

**Celal Aksoy**: *Min cara pêşin kekê Mistefa li Îzmîrê naskir. Ew li wê derê mamoste bû. Lê gava ku wext didît dadiket nava Kurda. Bi sebir, zanîn û fedekarîya xwe di nava gel de bihngehekî fireh afirandî bû. Ew di nava gel de pir dihate hez kirin û rêz ji wî ra digirtin.*

*Piştî derba leşkerî ya12 Îlonê 1980 de jî, dema ku her kes bo ku bikare xwe ji welat bavêje derva li rîyan digerîya, hevrê Mistefa Budak bê tirs li Tirkîyê ser karê xwe bû. Hevalên ku ji alî polês ve lê dihatin gerandin wî derxistin derva, kesên ku derxistin derva, yek jî ez bûm. Jîyana xwe diavit metirsîyê bo ku hevalên xwe ji pençên faşîzmê xilas ke. Karê xwe jî bi bawerî û serkevtî dikir. Piştî ku hevalên xwe derxistin dervayî welat ew xwe jî derket, li Kurdistana Rojhilat em hatin ba hev. Li wir jî kekê Mistefa ji hevalan ra bû çavkanîya moral û hêvî yê. Ew di liv û rewşa xwe de ji me hemûyan ra nimûne bû. (....)*

**Mehmet Bozgan:** *Min hevrê Mistefa Budak li Kurdistana Rojhilat nas kir. Rastî jî li wê derê ji bona hevalan bibû çavkanîya hêvî û berxwedanê. Wî li wê derê çiftlikek piçûk pêk anî bû.Li her koşê Kurdistana Rojhilat behsa wî dihate kirin.*

*Kekê Mistefa ji ber xebat û fedekarîya xwe li wir, ji PDKÎ re jî bibû nimunekî ber bi çav.*

*Me hemûyan ji tecrube û zanîna wî fêde kir. Diwê em ji zîrekî û duristîya wî, fedakarî û welathizîya wî ji xwe ra ders bigirin. Mirina wî ji bo gelê Kurd wendahîyek mezin e.*

**Okkeş:** *Hevrê Mistefa Budak min jî li Edenê nas kir. Di nava demek kin de mirov nikare xisusîyetên wî bine ziman. Ew girêdayî tevger û xebatê bû. Di nava hereketa pêşverû ya li Edenê de ew xwedî rêzek mezin bû. Daxwazdikim ku heval wî ji xwe ra nimune bigirin. Vefaata Kekê Mistefa di refê partîya me û gelê me de valahîyek mezin hişt.*

Piştî peyvê hevalan, hevalê berpirsîyar jî axivitinek kin kir. Wî jî dîtinên ku hevalan ji bo kek Mistefa anîbûn ziman, piştrast kir. Bi hin gotinên din dawî li ciwînê hat.

**Bavê me 30 agustosê 1984 de wefat kir**

Me hîn xwe ji tesîr û şîna Mistefê xilas nekiribû, xebera mirina bavê me hat. Kurapê me Turan 8.9.1984 de bi telefonê xeber da min. Pişt wî jî brayê min Cengiz ji gund hat Xarpitê, me bi hev ra xeber da. Wê wextê li cîhên din îmkana telefon kirinê tune bû. Gorî agahîyên Cengîz, ji ber germahîyê, bavê me şev, derva li ser banî xanî raza ye. Sibe de pê hîşar bûne, ew di sivîngê de çûye xwar û di cîhê ketî de bê can li erdê bî ye.

Çend rojan berî mirina bavê min, bi mana kuştina Mixtarê Mankiragê Ehmed Korkmaz leşker dîsa avitîye ser mala me, mal ser û bin kirine. Her koşe sekirine, li endamên malê tade kirine. Halbuku Ehmed heval û dostê me bû. Wan di malsekirinê de kaxizên cinazê Mistefê jî dine û ew girtine. Ji wan gelek pirs pirsine.

"Cinaze û çelengê pê ra kê şandîye? Ew kîngê hatîye, ji ku hatiye, kê anîye, kîngê defn kirine? Kî hatîye cinaze?" Xuyaye ku ji mirina wî bê xeber bû ne. Çar mehan şunve ew ji xebara mirinê haydar dibin. Li xort û mêran dixinin, dûra jî wan dikin feleqê. Dibêjin emê dîsa bên, çavê me, wê li ser we be. Çûyînê jî kevirê gora Apê Qîya dişikînin. Ser de jî lawê wî Bayram digirin ba xwe, bo ku ji wan ra rê nîşan de. Lê Bayram îtiraz dike, dibêje "Hûn gora bavê min hildiweşînin ji min jî alîkarî dixwazin ez alîkarîyê red dikim."

Lê bi darê zorê wî bi xwe ra dibin, êvarî ber didin ew tê mala xwe.

**Nurê di nama xwe de di derheqê vê nûça de usa nivisîye.**
(… … …)

*"Nûçeyên teze ji gund nîne, di derheqê wê şewatê de te agahî xastîbûn, wê jî binivîsim. Ez di 30 ê Tebaxê de ji Enqerê hatîbûm, 1 ê Îlonê de jî çûm gundê xwe. Di ketina gund de pê hesîyam ku Apo (bavê min Silêman) mirîye, tebî min ne zanî çi di serê min de hat. Min çentên destê xwe avit hindur, ez û bavê xwe çûn mala we.*

*Gava ku me xwe gîhand wir, gel ji ser mezelê belav dibû. Di demek kin de bûyer belav bibû, dîsa jî ji her alî meriv hatîbûn û pir qelebelix bû. Canê cîran û dostan sax be, rastî jî ew bi dil û can lê xwedî derketî bûn. Mirina apo jî tesadufeke xirab û êşik giran bû, mirina ku em qet ne li bêndê bûn.*

*Çend rojan berê bi mana kuştina mixtarê Mankiragê avitine ser mala we. Her koşê malê sekirine û endamên malê hemû êşandine, wan zarokên hûr bîle lêdan xwarîye. Bi mana"hûn li vir (........) `terorîstan" xwedî namê ew gotin newêrîye binivîse, vala derbaz kirîye,) vêdişêrin û xwedî dikin. Gora kek Mistefê jî pirsîne," ew kê şandîye, çelengê pêra kê şandîye? pirsîne, raporên aîtî mirina wî jî girtine.*

*Gora apê bavê te şikandine. Bavê te, ji ber nexwaşîya wî ya dil zêde li wî nexistine. Sê çar rojan piştî wê bûyerê êvarekê xalê te, lawê wî, kurapê te yê li Xarpitê (Alî Kemal) li mala we bûne. Wê şevê heta saet nîvê şevê rûniştine sohbet kirine, kurxalê te, birarzîyê teyî mezin û bavê te li ser pişta xanî razîne, yên din jî li qatê bini hindur de razîne. Sibe de divê kurxalê te û brayê te (Cengîz) bêne ber erebê. Dîya te sibê zû tere ser banî, dixwaze ku rêwîyan şîyar ke. Dibîne ku cila Apo vala ye, bi şik tere ser sivîngê, li wir dibîne ku ew ketîye xwarê. Bi xwînsarî û bê deng tê xwarê, bi hev ra çûne ser, dest danê ku canê xwe hîn germ e, lê mirîye. Ew bi şiklekî xirav, ser serî ketîye. Di eslê xwe de naxwazim vana binivîsim, lê bona ku hûn rastîyê ji me bibên dinivîsim.*

*Çimku wekî din we şik kirîye herhal, tişteki usa tune. Lê di çavê min de dîsa jî qetil ew kûçikin. Çimku her tim bi tengezarî radiket. Ew êrîşa çend rojan berî jî bû sedem ku ew bi eciz radizîya, bi hewtina kûçikan jî rabûye xwestîye dakeve jêr û ber bi nerdîganê çûye, lê şaş çûye di sivîngê de çûye xwar. Min şiklê cilê cîhê ku ketîye rind lêgerîn kir, gîhaştim wê bawerîyê. Sedemên din tunin. Her roj legan danîne nêzî wî lê tu caran ew şev ranebûye. Ez sê rojan li wir mam, sê rojan jî li gundê xwe mam hatim Dîyarbekirê.*

*Sê rojan piştî hatina minê vir, li mezra-Haysiv a we şewat derketîye. Vê cara ku ez çûm , disa çûm min derên şewitî dît. Meriv ku ji goristana we ber bi jor tê, ji alî çepê şewitîye heta gora kek ê Mistefê. Hemû dar şewitîne, zerar gelek e. Ew yeka wekî hûn jî texmîn dikin dîsa ew (… ..) nokerên … Ji wan bêtir tu kes nine. Hemû xirabîyan ew dikin û dest û milên xwe ba dikin digerin. Dîsa demekê berê şev avitine ser mala mixtarê Mankirag ê, mal dane ber gulan, gotine " me kirîye (ango mixtar me kûştîye) hûn çima gunehên gundîyan digirin? bersiva me bidin, dev ji gundîyan berdin". Ew feqîrana jî di*

*malê de mêr tune, jin tenê bi serê xwe mane, her roj li qereqolan in û rewşa wan pir xirab e. Xemgînîya wan ne bes e, ser de jî, hin gûndî û ew nokerên kûçik wan nerihet dikin. Ji xwe bûyer jî bi destê gundîyan hatîye kirin. Mêrikan meydan vala dîne... tiştên ku binivîsim ewqas bû.*

*Silav û hûrmetên xwe yên bê dawî ji we ra dişînim."*

*(nama Nuran ê 30.11.1984)*

**Cîgerxwîn perê pirtûkên xwe dixwaze**

Çend mehan berî mirina Cîgerxwîn bû, ser daxwaza Kemal Burkay em bi hev ra çûn dîtina Cîgerxwîn. Ew û jina xwe ez û Nazlîyê em hev ra çûn mala wî ya li Tensta. Cîgerxwîn di mala xwe de tevî keç û kurên xwe bû. Keça xwe ya li Iraqê dijî jî mîvanê wî bû.

Piştî hin peyv û laqirdîyan Cîgerxwîn berê xwe da Kemal Burkay û got: ma hûn çima heqê pirtûkên min nadin Kek Kemal? Derva tê gotin, ku hun li benda mirina minin, ez bimirim pere ji we ra bimînin ne usa?"

Kemal Burkay aciz bû, got: na Seyda tu bimirî jî va ye komik zarokên te hene, em çawa perê te bixwin?

Piştî vê peyvê hin tiştên din jî peyîvîyan, lê tama peyvê zêde nema bû, em rabûn.

Wexta Cîgerxwîn hatîye Swêdê bi Komela Karkerên Kurd li Swêd- Komkar ra peymanek çê kiriye. Li gorî peymanê Komkar pirtukên Cîgerxwîn yên tên çap kirin nîvê wan di de nivîskar, nivê din jî divê bifiroşe perê wan jî bi nivîskar ra parve bike. Heqê nivîs û çapê jî li ser komelê ye. Lê komelê ne ji bona qezancê, ji bona çanda Kurdî û xatirê Cîgerxwîn ew yeka pejirandî bû.

Wê şevê Burkay kesê ku bi hesavê weşanxanê ra mijul dibû ra telefon kir. Jê xwast ku gavekê zû hesavê Cîgerxwîn derxine û bigihîjîne wî. Lê roj derbaz dibûn ew hesav nedihat, Cîgerxwîn mir.

Ser wê ez eleqeder bûm. Li gorî peymanê min pirtûkên para wî veqetand bi erebekê şand mala wî. Pirtûkên ku hatîbun firotin jî hesav kir 120 hazar kiron perê Swêdî da lawê wî û kaxizek îmze kirî jê girt. Lê pir mixabin Cîgerxwîn bi çavê xwe ew nedît.

Malbata wî spas kir, gotin "em bi wî pereyî li Qamişloyê gora wî çêkin."

20 Cotmeh1984

Çend rojin ku em nûnerên grup û partîyên Kurdistanî yên li Swêd ê bona protesto kirina ketina ordî ya Tirk Başûrê Kurdistanê hin çalakîyan lidarxinin hewl didin. Lê heya ku li ser hin prensîban em li hev dikin, germahîya bûyeran, derbaz dibe. Wek

her car, vê cara jî di belavokê de dîtina zimanê hevbeş di gengeşî yê de cîhekî sereke girt.

Di îmzakirina belavokê de jî di navbera PSKT û PSKT- Roja Welat de astengî derket, lê dûra hat çareserkirin. Zekî Atsiz hevalbendên wî ji PSKT qetîya bûn û navê PSKT- Roja Welat bi kardianîn, PSKT li himber karanîna vî nava derdiket û bi wan ra karên hevbeş nedikir.

Di rojên 23, 24, 25, 26 û 27 ê mêhê de li Stockholmê, cîyê herî qelebelix li meydana Sergelstorgê, xwepêşandan hatin pêkanîn. Mirovan xwe zincîrê xistin, devê xwe band kirin, ketina leşkerê Tirk Kurdistana Başûr protesto kir. Di roja dawîn, a 27 an de li himber balyozxana Iraq û Tirkîyê meşek hate dar xistin.

Di meşê de hemû grubên Kurd û grubên Tirk yên çep amade bûn. Dora hezar kesî kom bibû, lê girsê gel her çî ku nêzî balyozxan a Tirkîyê bû hêjmar a xwepêşandanan kêm bû, daket. Li ber derê balyozxanê belavok bi ziman ê Tirkî, Kurdî û Swêdî hate xwendin.

Komita amadekar 5 hezar rûpel belavok bi zimanê Swêdî, hezar û pêncsed rûpel belavok jî bizimanê Kurdî û Tirkî belav kir.

## Ozanê gelê Kurd Cîgerxwîn çu ser dilovanîya xwe

22 Cotmeh 1984

Ozanê gelê Kurd Cîgerxwîn 22 Cotmeh 1984 an, saet sisê yê sibê li Stockholmê di mala xwe de çu ser dilovanîya xwe.

Partîya me li Swêd û dervayî Swêd ji gelek cîyan ra telefon kir hêz û welatparêzên Kurd ji mirina seyda agahdar kir. Bi agahdarîya me ji Elmanya, Fransa û hin welatên din Kurd û dostên Kurda hatin, bejdarî merasîma sersaxîyê bûn. Bona ku sersaxî û rakirina cinaze bê proxramkirin, rêk û pêk bê rêvabirin komîtak hate amadekirin. Li Tenstayê, taxa ku Seyda lê rudinişt, salona ku sersaxîya Apê Selîm lê çê bû, hat girtin, jin û zarokên wî li wê salonê sersaxî qebul kirin. Suretê Cîgerxwîn ya mezinkirî û şêîrên wî yên li ser kartonan nivisî di dîwarê salonê de hatin daliqandin. Program, bi vîdeo hate qeyd kirin. Wezîra Qoçberan Anîta Gradîn hat salona sersagîyê, bi peyivek kin sersaxî da malbatê û gelê Kurd.

Ji mala M.Emîn Bozarslan ra jî me telefon kir, ew ji bûyerê xeberdar kir. Lê dema ku hin kesan ew amade nedîn pirsîn, me carik din telefon kir ka agahî gîhîştîye wî an na? Lê dawîyê ew beşdarî seramonî ya sersaxîyê nebû.

Cigerxwîn her wext di nava xebat û têkoşîna sîyasî dabû. Tu caran ji xebatên gelêrî, xebatên ji bona welat dihatin kirin kêm nedima. Di rojên şahî û şînê de jî li ba heval û dostên xwe bû.

2 yê Mijdar a 1984 an de cinaza Seyda yê Cîgerxwîn me şande Qamişlo yê. Li Qamişlo di cinazê Seyda de dora 100 hezar kes amade dibe. Ew di paşila Kurdistanê de hat vêşartin û gora wî ji bo gelê kurd wê bibe zîyaretgahek. Seyda bi bedena xwe ji naw me çû lê bi xebat, nivîs û şêîrên xwe, nêrin, bîr û bawerîyên xwe di nava me de wê her dem bijî.

Di roja 20 ê Mijdarê 1985 an de li Medborgarhuset bi sedema bîranîa Cîgerxwîn civînek hat darxistin. Dora 700 kesî beşdar bû.

Nunerên partîyên Kurd, ronakbîr û hin dostên wî peyîvîyan. Ser navê Partî Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê[72] jî ez peyîvîyam. Ew peyva min bi sernama **Cîgerxwîn Nemir e ..** di kovara Roja Nû-1986-hêjmara 11 an de hat weşandin. Tirkîya wê axavitinê jî bi hin zêdekirinan di Rîya Azadî de hate weşandin. (Rîya Azadî Cotmeh-1985-hejmar-40)

*"Cîgerxwîn nêzik de rewşa Kurdistanê û gel şopandîye. Ew daketîye nava gund û taxan, gundî, şivan û gavan naskirîye, ji wan ra bûye cîran û heval. Guhê xwe daye, derd û belengazîya wan û ew di şêîrê xwe de anîne ziman. Seyda, li himber neheqî û neyaran qelama xwe, mîna şûrekî kar anîye. Ew di şêîrên xwe de rewşa gel û welat radixine ber çavan û rê ya xebat û têkoşînê rê ya çareserî yê jî rawa dike. Cîgerxwîn dibistan û medrese yên bilind nexwendîne, lê wî bi xîret û xebat a xwe, xwe pêş xistîye.*

*Mirina wî ne tenê malbat û partî ya wî, her ûsa hemû kurdên welatparêz û kesên aşitîxwaz jî xemgîn û dilêş kir. (.....)"*

**Îndra Gandî hat kuştin**

1984.10.31

Li gorî daxûyanîyên telewîzyonan serokwezîra Hîndê, Îndra Gandî saet 09 an de ji alî parêzgerê xwe yê Sîkh ve hate kuştin. Kuştina Îndra Gandî aşitîxwazên cîhanê xemgîn kir. Hînd di sal a1947 an de ji bin lep ê îngîlîzan xilas bû. Îndra keça serokwezîrê yekem a Hîndê, Nukruma ye. Ew di sal a 1917 de ji dayîk a xwe bûye. Piçûkatîya xwe di nava avûhewa (îklim) polîtîk de derbaz kir.

Wexta ku Nehru li girava Seyşelê di zîndanê dabû, di nama ku ji keça xwe Îndra Gandî re dişîne dibêje ku; di rojên hatî de wê Hîndîstan azad be. Li ber me 2 nimûneyên serkevtî hene. Yek Mistefa Kemalê ku cumhurîyeta Tirk damezrandîye, ya din jî lîderê Yekitîya Sovyet e. Her du lîderan jî qedera welat û gelê xwe guhartin. Lê wexta ku em wan her dû lideran ji xwe re nimune digirin lazime xetayên wan jî bigirin ber çavan. Li Tirkîyê dewleta modern û netewî hate damezrandin, lê kadroyên kevn û mafê kêmnetevan nehatine parastin, ji ortê hatin rakirin.

[72] bona ku wê demê me ne navê xwe yê rast, navên vêşartî kardiani. Nivîsa sernama Cîgerxwîn Nemir e .. min jî navê Munzur karanîye.

Lenîn jî bi mana damezrandina dewleta proleteryayê kadroyên kevn ên karê xwe rind dizanîn bona ku burjuvane hatine tesfiye kirin. Halbuku di wan ciwakan de amadekirina kadro yên ku ticaretê, îdarê û cîhanê dizanin en kêm 2 û 3 ber, nifş lazim e. Ji ber vê Tirkîye jî Sovyet jî heya kadroyên xwe yê nû amade bike û bikeve leca navnetewî jê ra 50 sal dixwaze. Me ku Hîndistan azad kir xeta yên usa nekin. M. Barlas yeni şafak - Glimpses of World History.

Neyartî ya navbera Sîkh û Hîndû yan kevn e. Mîna ku Tirk, hebûna Kurdan napejirînin û wan Tirk dihesibînin, destûra Hîndistanê jî Sîkhan Hîndû dihesibîne. Ya din jî çend rojan berê Îndra Gandî destûr de ku esker bikeve cîhê wan, Îbadetxana Zêr în. Serokê Sîkhan Bîndranvale tevî 1300 kesî hate kuştin. Bona tolgirtina vê bûyerê Îndra Gandî hate kuştin.

Sîkhîyan hêjmara xwe ya li Hîndê % 2 ye. Bîr û bawerîyên xwe ve ji Hîndû û olên din cûda ne. Li gorî bawerîyên wan, bi heywan û tiştên bê rûh bawerî anîn şaş e. Li hember fikra "pir Xuda" ew bi yek Xud a bawerî ya xwe tînin. Di cîhê Îndra de lawê wê Rajîv Gandî bû serokwezîr. Lê xortên Sîkhyan bang dikin ku wê wî jî bikûjin. Di roja 21 ê Gulanê sala 1991 an de ew jî hat kuştin.

**Pîrozkirina 10 salîya PSKT**

Partî ji bona pîrozkirina 10 salî ya PSKT li bajarê Kolnê şeva şahîyê li dardixine. Ji bo ku pasaporta min tune, ez nikarim herim. Bona piştgirîya şevê ji hin partîyên Swêdî û yên din bo ku em mesaj bigirin Burkay ji Elmanyê tevî nama jêrin ji min ra hin dawetname şandine.

*"Kazim can,*

*1984.10.13*

*Dawetnaman (ji bo partîyên Swêdî û yên din) ji tera dişînim. Bona ku navê wan şaş nenivîsîm min cîhê navê Sosyal Demoqratan vala hişt. Hûn ser zerfê û dawetîyê navê wan binivîsîn û bidinê. Yê hindikan jî zerfê xwe tunin, wan jî temamkin bidinê.*

*Dawetîyan dereng nexinin, bigihîjînin cîhê wan.*

*Cîhê ku ciwîn çêdibe ji bona ewlehîyê me li ser dawetîyê nenivîsî. Kesên ku dixwazin bên, bi wera dîyalogê kevin. Şev li Elmanya ye. Em wan dibin cîhê şevê, vê ya em plan dikin. Edrêsa bo mesajê me nivîsîye, bi dest jî dikarin bidin we.*

*Bo ku li wir (Stockholm ê) jî şeva me heye, Cîgerxwîn bona hatina vira bila hewl ne de, zahmet dibe.*

*Baldarî: Dawetnama ku nav li ser natîye nivîsin ya Sosyal Demoqratan e.Dawetnamên ku ji tevgerên bîyanî (VPK, APK û Sosyal Demoqrat) ra hatine şandin bi zimanê Almanî hatine nivîsîn û edrêsa şevê jî li ser heye. Ne hevceye ku ji bona cî ji wan ra tişteki bêjin.Edrêsa*

*cîhê şevê medin tu rêxistinekê. Ji hevalên me ra jî mebêjin. Tenê kesên ku dixwazin bên hene jê ra bêje, bi tera dîyalog deynin. Tu jî bi min ra datînî. Wê em usa haldikin. Slav.*

*Têbinî: ew mesajan bi dest bidin te wê baştir be.*

* * *

1984.11.17

Di roja 17.11.1984 an de li Stockholmê bi minasebata 10 salî ya damezrandina partîya me şevik şahîyê hat darxistin. Cîhê şevê li Medborgarplats (Malawelatîyan) bû. Dora 600 mirovî beşdar bû. Koro û koma govendê ya komela Komkarê bala temaşevanan kişand. Ji Kurdistanê dîmenên balkêş yên li himber faşîzmê, berxwedana gelê Kurd hatin pêşkêş kirin. Ji partîyên Swêdî, Tirk û Kurd nuner beşdar bûn û mesajên xwe yê piştgirîyê pêşkeş kirin.

1984.12.17

Xanima Nazîf Kalelî Seweral Kalelî bi telefonê dide zanîn ku di zîndana Dîyarbekir de zilm gihaştîye astek pir bilind. Hemû girtî di binê tehdîda kuştinê de ne. Nazîf ji ber sîyatîk û nexwaşîya gûrçikên xwe pir diêşe.

Li derva berfa salê ya sifte dibare. Wek tê zanîn Swêd li Qûtûba Bakûr cîh digire, lê îsal berf dereng barî. Daîra Bîyanîyan a Swêdî 10 mehan şûnda pasaport dane me. Bi navê xwe yekemcar pasaport digirim.

Min li Tirkîyê mamosteyî, memûrtî kir, leşkerî kir, vêrgî da, hepis razîm, lê min nikarî pasaport bigirim. Cara pêşin sala 1975 an de min xwastîbû pasaport bigirim, lê ji ber dîtinên sîyasî pasaport nedan min. Sala 2004 an de ez vegerîm welat li Stenbolê polês ez girtim bin çavan û derxistim pêşberî dadgehê. Li wê derê agahdar bûm ku di sala 1975 an vir de ji bo min "*pasaport girtin û derketina dervayî welat*" hatîye qedexe kirin.

**Xebatên li Swêdê**

Piştî rêkirina cinaza kek Mistefa, min dîsa di liqê partî yê de dest bi xebatê kir. Li Swêd bûm berpirsîyarê partîyê û serokê komîta herêmî. Komîta me ji pênc kesan pêk dihat. 15 rojan de carê (dû ra me ew kir mehê carê) komîta herêmî di civîya.

Kar û xebatên ku hatibun kirin me berçavra derbaz di kir, ji bona xebatên partî û komelê plan û program çê dikir û pêşniyar dikirin.

Berpirsîyarîyek usa bu, ku xebatên demoqratîk an jî polîtîk çi xebat, çi civîn çêdibûn, tu wek berpirsîyarê partîyê beşdar dibî an jî têkildar dibî. Di pêkanîna xebatekê de kesê perpirsîyar bizanî an nezanî bi şiklekî dîtina wî dihat girtin. Wê formalîtê jî di xebatê de giranî û bê berhemî danî holê.

Komîte û hemû endamên partî û komelê di binê çavderîya berpirsîyar dabûn. Hin xebatên ku endam bikira jî dîsa bi şikilekî berpirsîyar têkildar dibû.

-Komelê komîta xwe ya karger hebû, lê hemû xebatên komelê di binê qontrola partîyê de dimeşîya. Hin hevalên ku çend rojan ser hev nedihatin komelê dibû sedema lêpirsînê. Komele bibû cîhê Hec ê, Meke û Medîne.

-Komîta partîyê, komik û endaman ra civîn çêkirin û belge xwendin.

-Hilbijartina komîta komelê, program kirina, xebatên demoqratîk, polîtîk û çandî,

-Tevî hêzên din xwepêşandan, civîn û di xebatan de beşdar bûn.

-Semîner, belavok, mesaj amadekirin,

Xeynî komîtan jî hin endam ku dervayî Stockholmê, li bajarê Goteborgê, Upsala, Bollnas û Oslo diman bi wan ra têkilî danîn, telefon kirin, bi wan ra hevdîtin, xwendina belgeyên partîyê, girtina dîtinên wan jî kareki din bû. Vê yeka jî pir wext û enerjîya me girt. Va merkezîyetîyeka bêmane bû. Ew sîstema xebatê ya ku me dimeşand şaş bû. Wek komîta herêmî 6 mehan de carekê me di derheqê xebatên xwe de rapor amade dikir, dida komîta merkezî ya partî yê. Li jêrê du raporên li ser navê komîta Swêd min amadekirine û komîta herêmî jî pejirandîye û me gîhandîye Komîta Merkezî.

Di eynî wextê de ez serokê komîta kovara *Roja Nû* û *Weşanxana Roja Nû* bûm. Komîta me ji sê kesan pêk dihat, bona ku em hêjmara komîtê bikin pênc kes me pir hewl da, lê me nikarî. Civînên komîta kovara *Roja Nû, Weşanxana Roja Nû* jî gorî pêwistîyê, hin caran heftê de sê çar rojan pê hev hin caran mehê de carê çêdibû. Lê tesbîtkirina naveroka kovarê, dabeşkirina kar, daktîlokirin û serastkirina pirtûk û nivîsan, mîzanpaja weşanan, çapkirina kovarê û belavkirina weşanan divê tu wext bidî hemû karan. Di hemû karan da tu aktîf ne bî jî wek berpirsîyarê komîtê lazime tu amade bi, raya xwe bêji.

Usa nebe garis dikare bibe dar. Komîta kovara Roja Nû biryar girt ku, di hêjmara 36 an de li ser navê darê Kurdistanê em lîstekê derxinin û di kovarê de biweşînin. Roja civînê me du hevalan lîsta amadekirî bû, de berhev û teslîmî hevalê ku nivîsan daktîlo dike kir. Kovar çap bû hat, me dî ku garis jî, di bêşa daran de hatîye nivisîn. Min ji hevalê ku serastkirî bû pirsî, wî got; *ez garis nasnakim, we çi anîye min ew nivisîye.* Xûya bû ku me lîste têr qontrol nekirîbû.

* * *

Sekreterê partîyê jî li Swêd dijî. Tenê bi wî ra mijûl bûn, jî gelek tişt e. Ew jî him Swêdî nizane, him jî bo ewlehîya wî em hesasîyet nîşan didin. Ji bo her karê wî lazim e, tu tercumanekî an şofêrekî pêda bikî.

Ji bona sekreter erebek hat girtin. Ji hevalekî bêtir kesî ehelîyeta xwe tune bû. Birin û anîna sekreter a balafirgeh, birina ser doxtor, birina sosyalê, ji rehetî û wexta xwe fêdekarî yê dike. Erebe ji xeynî karê sekreter bêtir nedihat karanîn û vêşartî

dihat girtin. Vêrgîya-baca erebê ya salane, buha ya qontrolkirina erebê, heqê sîgortê, girtina benzînê, kirîna tekerê zivistanê jî ji alî sekreter ve wek mesrefek zêde dihat dîtin.

Unal digot; xwedê ji hevalê ku erebê bi kartînî ra alîkar be, sekreter naxwaze perê benzînî jî bide. Piştre gelek kesî eheliyet û erebe girt, êdî erebe zêde bûn, partîyê erebe firot. Lê vê carê jî ji bo her çûyîn û hatina sekreter, wek berpirsîyar lazim bû ez ji çend kesan ra telefon bikîm, yekî bibînîm ku ew bikare sekreter bibe balafirgehê an jî bîne. Hin kesan jî bona ku nerin, ji xwe ra kar derdixistin. Digotin "min birîye, bila yekî din jî bîne, an jî ez nexwazim, ez dişûxulim." uyd.

Lê sekreter ji van karan bê xeber bû, kesê ku endaman ra, rû bi rû dibû, saet û bê saet nerehet dibû wek berpirsîyarê partîyê ez bûm. Sekreter ji Elmanyê telefon dikir, "ez saet 22.00 de peya dibim." Tu êdî çend kesan ra telefon dikî, bo ku yekî qane bikî, ku ew here sekreter ji balafirgehê bîne. Ji ber ku carek dudo, her car wan nedixwastin bê pere herin û sekreter bînin.

Bi salan ew kar bi amatorî hat meşandin, êdî kesên xwedî erebe jî bi dilxweşî ew kar nedikirin.

Xwendawan dikarin vê yeka piçûk an jî bêmane bibînin lê bi salan bi vî şiklî, amatorî, meşandina kar, mirovan bêzar dike. Eger ku ereba partîyê hebûna û ew kar bi profesyonelî bihata kirin ew serêşana jî çê nedibûn.

**Li Kurdistanê heywanên me jî bi tirkî deng derdixinin**

Piştî demekê hatina Swêd min li dibistanekê qeyda xwe çêkir dest bi xwendina zimanê Swêdî kir. Lê ji ber xebatên partîyê pir caran ez nikarim herim qursa Swêdî. Piştî ku min pasaporta Swêdî girt êdî ez diçûm civînên dervayî Swêdê jî. Hin caran civînên me 2-3 hefte wext digirt, di vegerê de min nedikarî di eynî sinifê de dom bikim. Ji ber wê me her car sinif diguherî.

Di sinifan de ji cure cure welatan mirov hebûn. Dema ku me welatê xwe, welatê ku jê hatine Kurdistan dianî ziman ji alî hemwelatîyên ji welatên ku Kurdistan di nava xwe de parve kirine rastî dijitîyan dihat. Wan jî wek dewleta xwe Kurd û Kurdistan înkar dikirin. Sinif jî dibûn cîhên nîqaş û guftugoyan.

Rojekê usa piştî nîqaşê mamoste ji xwendevanan xwest heywanên welatê wan çawa deng der dixinin em wan teqlît bikin. Ker çawa dizire, kuçik çawa diewite, dîk çawa ban dide, ga çawa diqurê? Uyd. Xwendevanan bi dor destpêkir. Piştî xwendewanê Tirk dora xwe derbaz kir, dor hat min.

Min got mamoste bo ku li Kurdistanê bi zimanê Kurdî peyvandin qedexeye, heywanên me jî bi Tirkî deng derdixinin. Ew jî hevalê Tirk nîşan da. Xwendevan pê kenîyan, ew henek xweşa hevalên Kurd çu.

**Civînên ser hilbijartina Federasyonê**

Nunerên partîyên ku sala çûyî di Komîta Rêvabir a Federasyona Kurd de cîh girtine PPKK, PSKT, YEKITÎ, KOMELA, PÊŞVERÛ di roja16.10.1984 an de hatin ba hev û li ser kongra bê û li ser xebata federasyonê ya sala çûyî peyivîn.

***PSKT** (Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê): Komîta Rêvabir a Federasyonê di xebata xwe de serneketîye. Ew bê proram xebitîye, durve li bûyeran mêze kirîye û nekarîye ji wan ra pêşengîyê bike. Di nava komîta rêvebir de divê dîtinên hevpar û îstiqrar hebe. Bona ku xebat baştir bê kirin, bingehê Komîta Rêvabir a federasyonê freh bê girtin. Hêzên ku di komîta rêvebir de cîh nagirin, jî divê ew alîkarîya xwe kêm nekin. Ji bo xebata salewext proxram bê çêkirin. Komîta, bawerîyê bide me ku ew dikare bi aheng û demoqratîk dixebite, em di nav de nebin jî dikarin, piştgirîya komîtê bikin. Di komîta nu de cîh girtin ji bo me pêvîst nîne.*

***PPKK:** Kêmasîyên Komîta Rêvabir a federasyonê yên me ne jî, me baş xebat nekir. Partîyan xwe rind neda ber xebatê. Divê destûra federasyonê bê guharandin. Ne tenê endam û dilxwazên partîyan kesên serbixwe jî bikarin di komîta rêvebir de cîh bigirin. Hevkarîya me ne tifaqe ke sîyasîye. Divê komîta karger serbixwe bixebite, ji derve, ji hêzên sîyasî midaxele çênebe. Yekitî sala çûyî nexebitî.*

***YEKITÎ:**Hêz, komele, kesên ku wek delege destnîşan dikin, divê dema ku xwastin bikarin wan biguharin. Ji bona wê jî lazime destûr bê guhartin. Ji bo guhartina destûrê jî divê komîtak bê amade kirin.*

***KOMELA:**Divê federasyon bi xwe, ji bo xebatê xwedî qudret be. Ji komîtê re alîkarî bê kirin, lê tedexul tune be. Destûrê de ceza hebe. Kesê ku karê xwe neke lazime bê ceza kirin.*

***PÊŞVERÛ:**Em jî, ji xebata Federasyonê ne razîne. Di nava komîtê de danûstandin tune. Em biryarên ku li vir bên girtin qebûl dikin.*

*Bona ku 25 ê meha dehan saet çaran de bicivin biryar girt û belav bûn. Lê karê hin hevalan derket di vê rojê de me nekarî bicivin.*

Di vê navberê de me wek PSKT, KUK û PPKK ra hev dîtin çêkir û li ser rewşa federasyonê sekinîn.

***KUK:**Ji bona federasyonê hazirîke me tune ye, federasyon ji xwe enkaz e. Em jî dixwazin komîta revebir freh bê girtin, kesên jîr di komîtê de cîh bigrin, ji bona ku di federasyonê de bikare bixebite merivê me jî nuha tune.*

*Divê em li ser xebata federasyonê bisekinin, hilbijartina par ji mera nimune ye. Eger ku dîsa usa çêbe em nikarin bi hevre bixebitin. Me hewl daye ku normên demoqratîk bên xebitandin. Federasyon ji çerçova xebata xwe derketîye. Di kongra sala parinî de PSKT ê alîkarîya YEKITÎ yê kir, karên federasyonê %70 ji Yekitî yê re bû piştgirî. Yekitî ji nava hêzên welatparêz derketîye, li dijî wan e. Em nikarin li cem Yekitîyê cîh bigirin.*

*Em ji hevalên PSKT dipirsin di îttîfaqê de Yekitîyê, an KUK ê ango me, kê tercîh dike? PSKT ji bo hilbijartina par divê xwe rexne bike.*

***PSKT:**Derva tu hêz nayn û vî karî nakin, ev kar li ser pişta komelên endam in. Ji xebata berê em armanc û fikrên hev dizanin, bona wê em dixwazin hev ra xwe bidin ber vî karî, û li ser hin normên demoqratîk li hev bikin.*

*Wek partî jî em di komîta karger de cî bigirin an jî negirin di hemû xebatên federasyonê de wê aktîf bin.*

*Li ser lîstê konkret pêşniyarek me tune û lê em ji tu gruban ra veto danaynin. Hevalê KUK ê gotinên lez û îthamên neheq dike. Yekitî hêzek Kurdistana Başûr e, û welatparêz e. Par jî usa bu, nuha jî usa ye. Qasî her Komelek endam mafê wan jî heye di komîta rêvebir de cî bigire.*

*Eger hevhatinek çêbe û Yekitî bixwaze di navda cîh bigre, em dixwazin hebe. Lê dervayî Yekitîyê alternatîfek derkeve holê em nabêjin "îlla Yekitî tune be em jî tune ne." Hevalê KUK ê dipirse PSKT, Yekitî an KUK? ji me kê tercîh dike? Eger ku em di vê hilbijartina da, navbera KUK û Yekitîyê de tercîhekê bikin, em Yekitîyê tercîh dikin.*

*Gorî me ji bo Yekitîyê veto danîna KUK ê şaş e. Em vekirî ditinên xwe bêjin lê divê tu grubên endam ra veto daneynin.*

*Wekî din jî kesên ku ji bona komîtê tên bijartin li ser xebatê çê an jî xirab tesîr dikin. Hevceye ku grup kesên xwe yên layik û jîr bidin komîta karger.*

***PPKK:**Em xwe di nîqeşên îro de nefetisînin. Va kara jî girêdayîyê sîyasetê ye. Em sê hêz li vir in, nirînên xwe ji hev ra vekirî bêjin. Me di hilbijartina komela xwe de hin biryar girtin. Serokê federasyonê divê di kongrê de bê bijartin. Xala ku destûra federasyonê de cîh digire dibêje, "Komele bi biryarê dikare delegetîyê delegê xwe fesh bike" em dixwazin ew xal bê guhartin. Delege ji alî komelê ve neyê guhartin.*

*Redaksîyona kovara Federasyonê ya Berbangê lazim e li hember komîta rêvabir a federasyonê mesûl be. Kesên ne nunerê komêlên endam jî bona redaksîyonê bikarin bêne bijartin. Me di kongra komela xwe de biryar girt ku em di komela Komûn de cîh bigirin.*

***KUK:**Em nirînên xwe dibêjin. Gotinên me ne gotinên lez in. Em Yekitîyê usa dibînin. Eger ku ew hebin em tunin. Hevalên me yên ku bikarin di komîta karger a federasyonê de bixebitin jî tune. Yê ku zimanê Swêdî dizane Ş.... e, ew jî naxebite.*

1984.12.10 saet 14.30 de li Kultur Huset de ji bo civînê me li hev kir. Lê hevalê PPKK ê nekarî bê, civîn çênebû. Me ji bo civînek sîyasî pêşniyar kir lê ew jî semeket. Du alî, sê û çar alî hevditinên me bi hêzên endamê federasyonê ra dom kir.

Komelêyên ku federasyon damezrandîbûn (9)neh Komele bûn. Di civîna roja 1984.12.13 da, me ji bona hemû komelên endamê federasyonê civînek pêşniyar kir, lê civîn pêk ne hat.

1985.01.06 an de Yekitî, partî Pêşverû û PSKT ê di nava xwe de civînek çêkir. Me ji bo kongre û xebatên hilbijartina federasyonê, di derheqê civînên ku bi hêzên din ra çêkirîbû, agahdarî de wan.

***Pêşverû:*** *Em di komîta rêvabir a federasyonê dane, lê me çawa ku dil dixwast xebat nekir. Nuha jî divê em pêşîyê lê negirin, hevalên ku dikarin bixebitin bila bikevin komîtê û bixebitin. Em nebêjin ku "îlam em di komîta karger de cîh bigirin." wek partî Pêşverû, îsal em naxwazin di komîta karger a federasyonê de cî bigirin.*

*Hevalên Yekitî yê ji ber hevdîtinên otonomîyê hatine hêjandîn. Ji bo federasyonê plan û pêşniyarên xwe tune ne. Guhê wan li ser xebata sîyasî (bi Bexda re hevdîtinên otonomîyê) ye, ew li bendêne ji wir çi der dikeve.*

*1985.01.10 de em carek din bi PPKK re hatine ba hev. Me di derheqê ciwîna sê alî de agahdarî de wan.*

***PSKT:*** *Ji bo hilbijartinê kêm wext maye, ji bona kongreke rêkûpêk. Hemû komelên endamê federasyonê xwedî mafin ku bikevine hilbijartinan, li himber tu hêzan veto neyê danîn. Helwestê KUK ê şaş e. Wek hemû komelên endamên federasyonê, Yekitî jî xwedî mafe ku bibe namzet, tîfaqan çêke û deng bide. Divê komîta karger jî freh bê girtin. Encama hilbijartinan li gorî daxwazîya me nebe jî divê em jê re rêz bigirin.*

***PPKK:*** *Em jî helwesta KUK ê şaş dibînin, lê em jî naxwazin, Yekitî di komîtê de cîh bigir e. Him sala çûyî ne xebitîn, him jî gelek grub li himberin. Civîna sibê em binêrin, Yekitî dikare bi dilê xwe cîh negire. Çim ku di kongra AKSA de biryarek usa girtine. Eger hûn jî (PSKT) pêşneryar bikin Yekitî di komîta kargerda cîh negire dikare xwe şunda bikişîne.*

***PSKT:*** *Em wek prensîp pêşneyarê şaş dibînin. Ji ber ku qasî me hemû endamên din, jî xwedî mafin. Em dikarin di komîta kargerda cîh negirin û lîste ka maqûl piştgirîyê bikin.*

Me li hev kir ku di sibê roja1985.01.11 bi nunerên komelên endamên federasyonê ra civînekê çêkin. Lê mixabin bona ku piranîya komelan nehatibûn civîn çênebû. Ser vê carek din em û nunerê PPKK ê di 1985.01.16 an de hatin ba hev û dûalî hevdîtinek çêkir.

***PSKT:*** *(Me her yekî dîsa dîtinên xwe dubare kirin.)*

*Em komiteke bingeh freh dixwazin, bi biryarên sîyasî nêzikbûna organîzasîyonên demoqratîk ne rast e.*

*Divê KUK dev ji dîtina xwe ya sekter berde. Dîtina we jî ne zelal e ew jî cesaret di de hevalan. Hun dibêjin KUK şaş e, lê pêşniyara we jî ji wê dîtinê re alikarîyê dike. Madem usa ye kî şaşitîyê dike bila ew dervayî komîtê bimîne.*

*Eger ku Yekîtî nexwaze di komîta karger de cî bigire, kes nabêje, îllem bila ew cîh bigirin, lîsteya ku yekitî tê de tunebe em dikarin tê de hebin.*

*Lê dîtina ku KUK tine "Yekitî ne welatparêz e, derva bimîne" em li himber vê dîtinê ne. Encamên negatif xasima me herdu partîyan dike binê berpirsîyarîyan. Em dixwazin tevî PPKK ê bi xebitin, naxwazin blokên ku hûn têda nebin em cîh bigirin. Eger ku em nikarin bigîhîjin encamekê hun lîstekê çêkin em piştgirîyê bikin.Dive em piçikê lez bikin hilbijartinan re pir nema.Gotina xwe ya dawî yê hun bêjin wê baş be. Di 2yê sibatê de hilbijartin heye. Ji bona komciwînê jê hin amadeyî lazime bêne kirin. Ji bona ku komcîvin piçikê rêk û pêk derbaz be dive hin prensîb ên hevpar bêne tespît kirin.*

***PPKK:*** *Em listeke bê Yekitî dixwazin. Dîtinên me KUK ê ne wekî hevin. Dîtinên KUK ê di nava xwe de dijayetîyê dihewîne. Em wan dîtinan naparêzin û li himberin. Lê di komîtê de cîh negirtina Yekitîyê daxwazîya me ye jî, ew herdu nayne yek manê.*

*Em jî naxwazin lîsteya ku hun têda cî negirin em hebin. Lê hûn jî li himber Yekitîyê nerm pê digirin. Em Yekitîyê xaîn nabînin, lê naxwazin di lîstê de cî jî bigire. Li gorî me ji di encamên negatif de para mezin para PSKT ye.*

* * *

Lê civînên bi rojan me nekarî em bigîhîşin encamekê. Ewqas ked û wexta me berhem neda, vala çû. Komelên girêdayî hêzên sîyasî bê tifaq û bê biryar çûn kongra 1985.02.02 an. Di kongrê de li ser guherandina şiklên komelan biryarek hat standin. Li gorî biryarê Komeleyên ku di binê sîya hêzên sîyasî de hatîbûn damezrandin dawî li hebûna xwe bînin, bona komelên komunan gav bavêjin. Ji bo wê xebatê komîtek hat bijartin. Komîtê tevî Komîta Karger a muvaqet a Federasyonê, tewî 15-20 delagan li Folkethusê civîya û li ser destûrê nîqaşan dest pêkir. Di civînan de ji bo komelên ku li gorî komunan bêne avakirin taslax destûrek hat amadekirin. Gora destûra nu komelên homojen, komelên girêdayî hêzên sîyasî nedikarîn bibin endamê federasyonê. Lazim bû Komele xwe betal bikin. Ji nûve kê xwest, kesî xwedî cuda dîtin jî bikare di yek komelê de bibe endam. Wexta ku kesên xwedî cur be cur dîtin bûn endamê komelê, êdî komelê nedikarî wek berê piştgirîya hêzek sîyasî bikira.

Derî girtina komelên heyî, dihat mana rawestandina xebat û lebata hêzên sîyasî. Çimku xebata partîya me bi rîya endamên komela Komkarê ve dihat kirin. Şik ew bu ku kesên bê sîyaset, an dijî sîyasetên Kurd jî di federasyonê de cîh bigirin, bi îmkanên federasyonê li himber hêzên xwedî sîyaset hewl bidin, xebatên wan asteng bikin.

Komela Komkarê bi endamên xwe ra civîn çêkir li ser pirsê rawestiya. Di encamê de endaman, betalkirina Komkarê û damezrandina komelên komunan şaş dît. Komkar wek prensîp ne li himber komelên komun bû. Lê di wê bawerîyê dabû, ku nuha şertên komelên komunan tune bûn.Ser biryara endaman nunerên Komkar

– Swêd di kongra federasyonê ya 6.emîn de di navbera 5-6 Avrîl 1986 an de çê bû amade bûn, dîtinên xwe anîn ziman û xwe jî endamtîya Federasyonê kişand.

Ji bona avakirina komelên komunan ew sedem dihatin pêşkêş kirin. Komelên berê bi sîyasetê va girêdayî hatine damezrandin. Kesên ne xwedî sîyaset ber ku endamê tu komelan ninin dervayî federasyonê dimînin. Ev yeka jî rê li ber firehbûna Federasyonê digire û girtina hezaran nava xwe ra dibe asteng.

Federasyona komun ji kesên jêhatî, xwedî qabîlîyet ê serbixwe jî dikare alîkarî bigre. Komelên komun welatparêzan ji belavelabûnê xilas dike, kesên xwedî sîyaset an, ne girêdayî sîyasetekê hemû Kurdan tîne ba hev. Komela Karkerên Kurd li Swêd – Komkarê carek din bi nivîskî ji Kongra federasyona ku di roja 28.1.1989 de hate kirin de daxwaz kir ku ew wek komela Komkar bibe endam. Kongrê pêşniyar girt rojewa xwe û li ser gengêşî hate çêkirin. Hin delegan anî ziman ku endamê Komkarê xwedî bawerîke homojene, ji bona wê li gorî destûra federasyonê nikare bibe endam. Lê hin (23)delegan jî piştgirî kirin ku Komkar dikare wek Komele bibe endam. Bi dengê piranî daxwaza Komkarê ya endamtîya federasyonê hate paşvexistin.

Di destpêkê de xebata komelên komunan wek, li himber xebatên sîyasî, hate ziman. Ji komelên heyî dihat xwestin ku hemû xwe fes bikin. Halbuku, hemû kar û barê rêxistinan di *rîya* wan komelan dihate meşandin. Girtina komelan, dihate mana girtina tevgeran û rawestandina xebat û lebata sîyasî. Ber wê yekê em weka Komkar- Swêd li himber wê pêşniyarê derketin.

Di pêvajoyê de wan hevalan rastî dît û hin prensîp nerm kirin, an jî tetbîq nekirin. Endamên Komkarê jî rewşa nu berçav ra derbaz kirin, Komkarê xwe fesnekir, lê hin endamên xwe kirin endamê komelên komun, pirs hat çareser kirin.

Eger destpêkê de maqûl nêzikayî bihatana kirin û ji komelên girêdayî hêzan kilît lêxistin nehatana xwestin, Komkarê sêrî de ew biryar bipejirandana.

Bona yekitîya hêzên welatparêz li Swêd, damezrandina Komeleyên Komun bû nimunekî baş. Federasyon û komelên grêdayî wê ji çar perçên Kurdistanê mirovan tîne ba hev. Ziman û çanda me de nêzikayîkê çêdike û standardbûnekê tîne holê. Şikil û psîkolojîyek hevpar pêda dike, bal û raya Kurdên hemû parçeyan dikişîne ser problema Kurd û Kurdîstanê.

Îro li Swêdê girseyeke mezin a Kurd heye. Piranîya vê girse ya gel û statûya welatê xwe û Kurdbûna xwe hişyar e. Ji ber wê jî li himber welatên dagirker him xebatên polîtîk dikin him jî li ser kultûr û ziman dixebitin.

Li Swêd Azadîya nivîsandinê û toleransa demoqrasîyê heye. Nivîskar ji ber xebatên xwe, ya çandî li gora raporên teqdîrkirinê pisporên kurd, ji daîra Kulturrâdetê (alîkarîya Kûlturê) alîkarîya maddî jî digirin. Penaberên Kurd, yên li Swêd, li ser ziman û çanda xwe ne bes be jî, hin xebatên baş dikin.

Lê hin caran ew teqdîrkirin bi kîjan pîvanan tê kirin mirov tê nagîhîşe. Wek nimûne weşanxana Roja Nû Dîwana Meleyê Cizîrî cara yekem ji tîpên erebî wergerand tîpên latînî û çapkir. Bona dîrokîya pirtûkê û bona, paraztina wê, ji alîkarîyê ra bi qîmet nate dîtin, tu alîkarî nehat kirin. Lê pirtûkên ku nû derdikevin alîkarî digirin. Alîkarî divê armanca alîkarîyê ew be, ku berhemên ku ji kuraya dîrokê tên derxistin ji wendabûnê têne xilaskirin ra bê kirin.

**Enver Ata li bajarê Upsalayê hat kuştin**

1984.06.23

20 Hezirana 1984 an de Enver Ata li bajarê Swêdê Upsalayê ji alî endamên PKKê ve hat kuştin. Kuştina Enver di nava gelê Swêd û di nava rûniştevanên Kurd yê Swêd de xemgînîyek pêyda kir.

Enver Ata 1957 an de li Batmanê ji dayîk bûye. Di derba leşkerî ya 12 Îlonê 1980 de ew tê girtin û êşkence kirin. Piştî ku ji girtîgehê tê berdan ew derdikeve dervayî welat.

Ser kuştina Enver 23 ê Hezîranê berpirsîyarê çar hêzên Kurd, PSK, KUK, PPKK û Rizgarî hatin ba hev, dîtin û rexnê xwe anîn ziman û ji bo protestokirina bûyerê pêşniyarê xwe jî gotin.

**Encam:**

-Bi îmza pênc hêzan belavok hate weşandin, kuştina Enver hat protesto kirin. (Tekoşîn di civînan de amade nebû, lê belavok îmza kir.)

-Çar partîyên Swêdî yên ku di parlamento de hebûn ji wan randewû hat girtin û bi wan ra hevdîtin hat kirin.

-Da ku ew PKK ê nas bikin û li himber şaşitîyên wan tedbir bistînin. Pênc tevgerên me merkezî civîyan li ser êrîş û kuştinên PKK ê belge û dîtinên xwe di dosyakê de civandin.

-Bi PKK ra têkilî û xebatên sîyasî û demokratîk hat birin. Êdî ne di pîrozkirina Newrozan de ne jî di xwepêşandanên rureşkirina cunta faşîst de tevî PKK ê çalakî nedihatin dar xistin. Herçî çû, di navbera PKK ê û hêzên din yên Kurdistanî de durketin zêtir bû. Lê PKKê dawî li kuştina welatparêzên Kurd û Tirk nanî. Li Ewrûpê her roj hêjmara kesên ji alî PKK ê ve hatin kuştin zêde bûn.

Hercar hêzên Kurd û Tirk bi hev ra belavok belavkirin ew kuştin şermezar kirin û ji bingehê PKK xwestin ku ew çavê xwe vekin li ser PKK ê û kirinên wê rind bifikirin!

PKK ê ji dervayî xwe rê nedida hêzên din çalakîyan darxinin û Newrozê pîrozkin. Pîrozkirina Newrozê tenê ji bo xwe maf didît. Li Londrê, li Kolnê, li Swîsra û Hollandê êrîş birin ser PSK ê û hezên dinên Kurdîstanî. Komkar, Rizgarî û

PPKK ê hemûyan ji êrîşên PKKê para xwe girtin. Têkilîyên navbera PKK ê û hêzên din hatin birîn.

PKK e dixwaze bi rîya teror û tirsê nehêle hêzên din xebat û sîyasetê bikin. Di vê atmosfera sîyasî ya tevlîhev de hêzên tarî, jî ser navê PSKT û Komkarê belavokên sexte belav kirin. Wan dixwast şerê navbera PKK ê û PSKT ê gûr bikin. Lê him PSKT û him jî Komkarê di wextê de û bi berpirsîyarî, rayagel şîyar kir, ku ew belavok ne ya wan e, ya MÎTa Tirkan e.

PKK ê ser navê Marksîzim-Lenînîzmê û welatparêzîyê ew kuştin dikirin. Lê em dizanin tevgerên ku şerê azadîyê dikin, metod û hacetên dijî îdeal û normên mirovahîyê qedexe dikin. Kesên ku ji rexnekirinê û cuda fikirandinê ra tehemul nakin, nikarin ji gelan ra azadî û serxwebûnê jî bînin, tênê koletîyê tînin.

**Resul Altinok**

Meriv dikare bêje, PKK ê li dervayî welat bi kuştina endamê Komîta Merkezî ya xwe Resul Altinok sezona kuştina kesên dijî xwe de destpêkirin.

Resul ji Çolîgê bû, di salên 70 ê de di lîsa Çolîgê xwendevan bû. Tevî çend hevalê xwe ew cîranê Mustefa Budak bûn, di yek bînakê de rudiniştin. Resul yek ji wan kesan bû ku, Mustefa Budak pêra tikilî danîbû û ew kişandîbû, nava refê şoreşgeran. Piştî xwendina lîsê Resul li Enqerê di wezereta Bayindirlixê de dest bi kar kir. Li Enqerê bi Ocalan û hevalên wî ra ket nava têkilîyan.

Resul xebatkar û fêdekar bû. Piştî derba leşkerî ya 1980 ê ew jî derket Sûrîyê. Di konferansa PKK ê ya yekem de Resul polîtîka partîyê rexne kir. PKK ê pir hewl da ew rexnên xwe şunve bigire, lê wî usa nekir.

Rojekê ez û hevalê Okeş li Efrînê çûbûn mala PKK ê zîyaretîya wan. Osman Ocalan, Resul û 5-6 xortên din li wir diman.

Di vê navberê de Resul firsend dît û got, ew li wir girtîye, ji me xwast partîya me bona rizgarbûna wî hevl bide. Me ew yeka gîhand hevalên me yên Şamê, bo ku ew bikarin bi navenda PKK ra têkilî deynin û pirsê çareser bikin. Li Şamê, nunerê partîya me di civînek fireh da, ya hêzên Kurd û Tirk tê de amade, anî ziman û daxwazkir, Resul bê azad kirin.

Nunerê PKK ê pêşda bûyerek usa înkar dike, dûra dibêje "ew pirsa me ya hindurîn e." Hewldanên hêzan nekarî Resul rizgar bike. Dûra Resul birin li Helebê û qontrola ser wî hişk kirin. Kesê ku ji wan veqetîyabû digot "Resul nuha jî li Helebê di mala partîyê da, di odekê de girtîye. Kurd û mîvanên ku girtîyê wê odê mereq dikin dibêjin "ew nexwaş e, wî serê xwe xwarîye." Dûra Resul birin li Kurdistana Başûr kuştin.

**Cara yekemîn e terim Elmanyayê**

Cara yekemîn e di 18.12.1984 an de terim Elmanyê. Lê em di rojên hatî de wê pir herin û bên. Saet 23.00 şevê trênê hereket kir dora roja din saet 20.00 ê êvarê li bajarê Kolnê peya bûm. Hevalên din jî hatin e. Civîna me êvara roja 19 an dest pêkir. Ji Danîmarkê hevalê Yaşar Alagunduz raporek gîhandîye partîyê. Di raporê de qala mixalefeta nava partîyê dike. Navê du endamên komîta navendî di nava mixalefetê de derbaz dibe. Ew ji bo min ne tiştekî nû ye. Di civîna Şamê de min bi raporekê mixalefeta nava partîyê anîbû ziman. Endamê komîta navendî Hazim Kiliç xwe nehatîye, îstifa xwe şandîye civînê. Bayram jî di civînê de îstifa kir. Komîta navendî ji bo kongrê biryar girt. Ez 28 ê Çileya Paşin saet 19.30 de li Stockholmê peya bûm. Deh roje min qursa zimanê Swêdî cihiştîye. Nuha şûnda ew çûyîn û hatin Elmanyê û cîhên din wê pir wext bigir e. Zinar ji Danîmarqê hatîye Swêd. Ji Cengîzê bira telefon û name hat. Ew qala girtina xwe ya bin çav dike. Lêdan û kutekan ew çavtirsayî kirîye, cesaret nake ku here gûnd.

Dîya me li gund tenê ye. Hefteké berê jî li gundê Depê, Badiran serbazek û du leşker hatin kuştin. Li wan der û doran pir leşker û operasyon heye.

Gelek endamên partîyê baweriyên xwe bi partîyê nemane û dev ji partîyê berdan. Di nava wan de endamên komîta merkezî ya kevnare û damezirkarên partîyê Farûk Aras jî heye.

**Rêwîyê bajarê Oslo me**

1985.02.7

Îro rêwîngîyê bajarê Oslo me. Saet 17.45 ê êvarê trêna me bi rê ket, lê saet 02.00 şevê me xwe gîhande wê.

Em çûne mala hevalekî, lê heya saet 05 ê sibê em peyîvîyan. Piştî xewek demkin em çûne komelê. Li ser *"Pirsa Hevkarî û Enîyek Neteweyî"* min seminerek da.

Yên ku di civînê de amade bûn dora 30-35 mirov bûn. Beşdar endamên Komela Komkar û hin nunerên hêzên çepê Tirk bûn.

Endamên Komkarê hemû Kurdên ji dora Konya bûn û hemû jî mêr bûn. Te usa dizanî ku dê û xwîşkên wan an jî jinên wan tune bûn. An jî polîtîka kirin tenê mafê mêran bû.

Zêtir, gotin û dîtinên çepra entresê xwe hebûn, têkilîyên xwe ji pirsa Kurd ra qasî yekî Norweçî, an jî Swêdî bû.

Welatê ku di emrê xwe de ne çûne û ne dîtine ji bo wan wek xewn e. Lê eger partî ji xwe ra bike armanc dikare ji nav wan jî qadro derxine.

Li Oslo yê cîh û war ên gerê hebû an jî tune bû, firsend çênebû, em bigerin û bibînin. Bajar di bin berfa sipî dabû.

Di 10 ê Sibatê saet 23.00 ji Oslo veqetîyam, dora roja din saet 8.30 de xwe gîhand mal.

Nazli ducanî ye û ew li ser roj û seatane ku jê ra zarok çê be. Hêwî dikim ew dem ne îşev be. Saet 02 ê şevê Nazli cehd dike, min ji xewa kûr şîyar ke. Wê gavê min gotîye "ma tu piçekî din nikarî sebir bikî?" Cîranê me, keçên dostekî min, du xwîşk Nebahat û Sebahat Karabulut hatin alîkarîya me. Me telefon kir ambulans hat Sebahat tevî min û Nazlî yê hat Uplands Vesby, xwîşka din Nebahat jî li mala me li ba keça me Cîranê ma.

Saet 3.30 şevê roja 12 Sibatê keça me ya çaran Dersîm hate dinê. Her çiqas em li benda lawkî bûn jî, bi hatina Dersîm jî em kêfxwaş bûn.

1985.08.09

Gelek waxte, min navber de nivîsandinê. Gora Swêd îro, rojek germ û xweş e. Ji bona 5 rojan ji komelê dora sîh kesî, jin û zarok jî tevê, em terin Lars Backen-Girava Zarokan. Bi otobosa şaredarîy terin Norrteljeyê, li wir diwê em erebê biguharin. Hatina me ya wir, dora du saet û mîvan wext girt. Piştî nivro saet 15 de me xwe gîhand cîhê qampê.

Cîhê ku em lê dimînin bînake du qat, mezin û mîna çiftlixikê ye. Der û dora xwe bi dar û kûlîlikan û gîya ve hatîyê xemilandin. Ji vê mintiqê re dibêjin *"Girava Zarokan"*. Piştî ku me cîhê xwe rastkir, derketin gera dorê. Li nêzî me golek mezin heye. Em xwe davêjin avê û gelek wext me avjenî kir. Serdar û jina xwe li vir hev û du rind naskirin û biryara zevacê dan. Di roja 4.9.1985 an de bi şahîyek qelebelix me nîşana wan danî.

27 Îlon1985

Piştî heft mehan şûnda 27.9.1985 de carek din terime Osloyê. Li komelê min bi navê "Dîroka Têkoşîna Kurdistanê" semînerek da. Tevî endamê partîyê jî hin belge û belavokên partîyê me xwend û şirove kir. Ji Oslo yê derbazî bajarê Swêdê Goteborgê bûm.

Bi hevalên wê derê re li ser rewşa partîyê sohbetek pêk anî û dora roja din vegerîyam Stockholmê.

**"Bimre Cûnta Faşîst Bijî Kurdistan"**

23 Cotmeh1985

Îro li Goteborgê di navbera taxima futbolê ya Tirkan Fenerbahçe û taxima Goteborgê ÎFK de maça şampîyonîyê hat lîstin. Em li telewîzyonê temaşe dikin.

Ji maçê bêtir em li benda çalakiyanin. Hevalê PSKT û hin welatparêzên Kurd bona raya gelê cîhanê bikişînin ser pirsa Kurd û zordestîya ser gelê Kurd protesto bikin çend rojan vir de xwe amade dikirin. Nişke ve, grubek xortê Kurd bi afîşa " bimre cûnta faşîst, bijî Kurdistan" û bi ala Kurdistanê daketin qada lîstikê. Lîstika goyê hat rawestin, navber hate dayin. Sîpîkerê telewîzyona Tirkan bi qîr got, "Terorîst ketin sahê, cîhêxwaz tên!" û televîzyona Tirkan weşana xwe dan sekinandin, ekrana xwe reşkir. Telewîzyona Swêdî ew bûyer çend caran rawa kir.

Me di nava çalakvanan de hevalê Gazî Çalbay û Hamza naskir. Lîstikvan û karbidestê kluba Fenerbahçê gotin " *bi al û afîşan cihêwaz daketin qada lîstikê û li himber me slogan avêtin. Ew bûn sedema binketina me.*"

**Çetîn Gungor hat kuştin**

2 Mijdar 1985

Partîya Pêşenga Karkerên Kurdistanê bi munasebeta pîrozkirina 10 Salîya xwe şevek amade kir. Cîhê şevê li Medborgarplatsen, (Medborgar Huset) li Mala Gel bû. Di şevê de 700`î zêtir kes beşdar bû. Ez û Nazlîyê jî di şevê de amade ne. Piştî peyva sekreterê partîyê M.Alî Çilgin gelek kes ji bona cixarekişandinê derket derva. Keçika me ya 9 mehînî Dersim ji bi me ra ye, ew hêdî hêdî xwe nerehet dike, ji ber wê em jî rabûn ber bi derî meşîyan ji bo derkevin derva, herin mal. Me hîn xwe gîhandibû entrê dengê sîlehê derbû. Bi deng ra kesên li entrê bûn ji hev belav bûn, ber bi salonê bazdan. Lê sîlehê li ser hev çend dengên din jî derxist. Di navbera me û qetîl de 3 metre hebû, tune bû. Piştî ku qetil nêçîra xwe avit erdê, bê hedef hemû fîşeng berdan. Li gorî dîtina min piştî qirşûna pêşin şûnda qetîl xwe şaş kir. Dawîyê berik qedîyan şeşagira vala, meqarîzma xwe şûn de mayî, di destê wî de ew mîna kevirekî, bê ku xwe bilivîne, nêzî deqekî usa ma. Pişt ra ji pencira 3-4 metre bilind de xwe avit xwarê. Li jêr jî alî Kurdên ku li der va bûn hat girtin û teslîmî polîs kirin.

Kesê ku hatîbû kuştin Çetîn Gûngor (Semîr) bû. Çetin ji Dêrsimê bû û Ermenî bû. Me di sala 1975 an de li Dêrsimê hevûdû naskir. Wî li gundekî girêdayî Dêrsimê li Kurêsipî mamosteyî dikir.

Miroveki jêhatî û PKK yî kî fanatîk bû. Piştî ku ket nava PKK ê hevdîtinên me kêm bûn. Di 1980 de li Enqerê em rastî hev hatin, li me herduyan jî dihat gerandin. Em bi hev ra nepeyîvin û em her yek çûn rêya xwe. Piştî çend salan me li Stockholmê hevûdû dît. Ew ji PKKê veqetîya bû. Du caran hat malê, ba me. Em li ser bûyer û polîtîka welat peyîvîn. Ew ji hin kirinên xwe û partîya xwe poşman bû. Ew westîyayî, nerehet û bi stres bû. Cara dawîn saetkê berî kuştina wî di şevê de me li hevûdû pirsî.

Hevalên wî Bakî Karaer û Seher jî pêre bûn. Gava ku min got "em hevûdû bibînin" got "çawa?" min got "*telefon bike.*" Lê êdî ew nikare telefon bike. Ji ber ku cîhê nuha ew lê ye, telefona xwe tune.

Piştî Çstîn derket dervayî welat, PKK e rexne kir û jê veqetîya. PKK ê li Kolnê ew girt û di malekê de hepis kir. Çetin ji wê bazda hat li Swêd îltica kir li himber PKK ê mixalefeta xwe domand. Wî di belavoka ku di sala 1984 an de belavkirîbû digot:*"Rêvabirên PKK ê tiştên ku kêrî wan tê şoreşgerî, tiştên ku kêrî wan nay jî dijî şoreşgerî bi nav dikin. ... Ez vê duzenê begen nakim û şoreşger nabînim. Lewma ew nîşana mirinê layîqî min dibînin.(...) Apo bo ku wî rexne dikim ew li rîyên min cezakirinê bigere.(... ) piştî min dît ku di PKK ê de qadro bi maddî û manewî di binê zordestî yê de têne girtin, serî ranekirina min ne dirust bû. PKK ji ber rexnên min "madalya mirinê" layîqê min bibîne jî, ez dîsa bi zanistî li himber şoreşgeran û gel wezîfa xwe ya dîrokî dom bikim."*

Ji belavokê meriv têdigîhîşe ku Çetîn dizanê wê çi bê sere wî. Xûyaye ku PKK kesên dervayî xwe û mixalefeta nava xwe bi wî şiklî berteref bike. Bûyerên ûsa merivan dike fikaran. Bawerkirin zehmet e, hêzê ku ji bona xilasîya Kurdistanê ditêkoşê, kesên welatparêz qetil bike.

Di vê bûyerê de eger ku kesê tetikkişandî nehatana girtin, kesî bawernedikir, ev ji alî PKKê ve hatîye kirin. Wexta ku li ber çavê me qatîlekî, bi çek mirovek kuşt, kîtle çavtirsayî kir, ez fikirîm ku, MÎT ê dîsa em bê firsend girtin. Ew bûyer bi çi hawî dibe bila, bibe li dijmin dişikîya. Yekitîya Çep (PPKK, TÎP, TKEP, TKP, TKSP) belavok belav kir, bûyer şermezar kir. Di belavokê de tê gotin ku; *Li Swêdê di şeva pîrozkirina 10.salîya PPKK de kuştinek çê bû. Va kuştin ne bûyera PKK ê ya yekem e û ne jî yê dawîn be. Bo ku PKK ser navê têkoşîna polîtîk xeta terorê ya şexsî û metodên mafîyayê kartîne. PKK qadroyên ku jê vediqetin bi "xaîntîyê" nav dike, fîzîkî ji ortê radike, tê zanîn ku hêzên çep û welatparêz yên dervayî xwe jî bi "oportunîstî, rewîzîyonîstî, pasîfîstî" gunehkar dike bi hêzê qeba, êrîşên çekdarî jî di nav de bi wan ra ketîye şer.(.....) Em bûyera ku li Swêd qewimî bi tundî protesto dikin. Bi çi sedemê dibe bila bibe, kuştina beşdarekî şevê, bi şoreşgerîyê ve tu têkilîya xwe tune. Şev bi kuştinek polîtîk hatîye provake kirin. Bûyer îşareta berî dayina hemû hêzê pêşverû, demoqratîk û welatparêzan e. Em bi berpirsîyarî bona pêşîgirtina bûyerên usa çi ji destê me bê emê bikin. Bona ku metodên usa ji nava xebata polîtîk bê kolandin û avitin bi biryar bi têkoşin.)*

Gelek bûyer pê hev qewimîn. Hîn cinazê Çetin nihatî bû şandin, 4`ê Mijdarê li Kopenhagê xortekî Kurd bi navê Mustefa Tangûr, dilxwazê Partîya Pêşeng a Karkerên Kurdistan hat kuştin. Roja 12 Mijdar 1985 an de liqên 13 partî û hêzên Tirk û Kurd li Stockholmê hatin ba hev bi navê **"Werin Em Êrîş û Provakasyonan Vala Derxinin"** belavok belav kir û herdu qetlîam protesto kir. Di belavokê de dininivîse, "... *piştî êrîşa Stockholmê du rojan şûnda roja 4`ê Mijdara*

*1985 an li Danîmarkê kuştina dilxwazê PPKK ê Mustafa Tangûner jî em bawer dikin ku ji alî PKK ê ve hatîye plan kirin. ... Tevgerên me herdu bûyeran jî wek êrîşa ser têkoşîna rizgarîya netewa Kurdistanê dibîne. Van êrîşên dijminane li himber xebata piştgirîya navneteweyî ya ku bi têkoşîna gelên me hatîye bilind kirin wek provakasyon dibîne. ...*"

Çend rojan şûnda dîsa li Kopenhagê bi navê Eyûb Kemal dilxwazekî PPKK vendabû. Meyîtê wî di behrê de hate dîtin. Piştî miyana doxtor hate zanîn ku ew berê hatîye xendiqandin pişt ra jî avitine behrê. Kuştina vî kesî de jî şik li ser PKK ye.

Li Fransê jî xwîn rijîya. PKK ê bi çekdarî êrîşek bir ser hêzên demoqrat û şoreşgerên Tirk. Di êrîşê de mîlîtanekî PKK ê hat kuştin. PKKê ew yeka kir sedem êrîşên xwe li ser çepê Tirk zêde kir.

Li Swîsrê endamekî Kurtuluş ê, 25'ê Sibat 1986 an de li Hamburgê bi navê Kurşat Tîmuroglu endamekî Dev-Yol ê, 3'ê Gulana 1987 an de li Hanoverê endamê PSKT Remezan Adiguzel û dîsa 16 ê Hezirana 1987 ê de li Fransê endamê PSK ê Husên Alî Akagunduz hatin kuştin.

PSKT li ser kuştina endamê xwe (Remezan Adiguzel) bi ser nivîsa "PKK ne Welatparêz e ne jî Serbixwe ye" belavok belav kir. Bi sedema kuştina hevrê me Remezan Adiguzel me Roja 23 ê Gulanê li Stockholmê civînek amadekir. Belavoka partîyê hate belav kirin û li hin cîyan afîşên hevrê me hate daliqandin.

**Serokwezîrê Swêd Olof Palme hat kuştin**

28 Sibat 1986

Îşev heta derengîya şevê ez li Rînkebyyê li mala hevalekî bûm. Saet 23.30 de hatim mal.

Saet 2 û nîvê şevê, telefonekê ez hişyar kirim. Telefonên vê saetê pir caran xeberên reş tînin. Çend carên din jî em bi telefonên ûsa yên bêwext xemgîn bibûn. Telefonê bi tirs radikim. Birayê min Dîyar e, ji Londrayê telefon dike. Ji me dipirse ka me kuştina serokwezîrê Swêdê **Olof Palme** bîhîstîye an na.

Em telewîzyonê vedikin, TV bê navber kuştina Serokwezîr Palme dubare dike. Saet 4an de di telewîzyonê de hin sûretên ku texmînî hatine çêkirin jî hatin weşandin. Ez û Nazlîyê heya saet 5 û nîvê sibê li ber televîzyonê rûniştin û me li nûçeyan guhdarî kir. Sibê de keça min Cîran bi bez hat oda me. Ez şîyar kirim û got,"*bavo rabe di nûçan de tê gotin Olof Palme hatîye kuştin.*"Li gorî şirovên telewîzyonê şikilê qetîl dişibîne kesê ne Swêdî. Em bi kuştina Palme gelek pê êşîyan. Sibê rabûm, terim kursa zimanê Swêdî. Li dibistanê xwendevan tevî mamoste Anders em li ser bûyerê gelek peyîvin. Hemû kes di nava şokekê de ne.

Polês dest bi sekirin û rêç ajotinê kir, lê di dest de zêde belge tune. Polês şika xwe zêde li ser PKK ê ye. SEPO, îstixbarata Swêd çend mehan berê 1200 rûpel raporek

amade kiribû dabû parlamentoyê. Di wir de dihat nivisîn ku PKK wê Olof Palme bikuje. Xuya bû ew senaryo bû. Lê li beranberî vê metirsîyê jî polês parastina Serokwezîr ji xwe ra nekiribû kar. Hans Holmer midûrê ewlehîya Stockholmê PKK sucdar îşaret dikir. MÎT û masmedya Tirkan bona ku li ser PKK ê bimîne pir cehd kir. Polês avit ser komela PKKê, hindek ji wan girtin bin çavan. Polês komela me, Komkar jî sekir, dest de ser lîsta endaman.

Gruba Baader-Meînhof kuştin girt ser xwe, lê pê nehat bawerkirin.

Cîhê ku Palme hatîbû kuştin, ji gul, gulilîk û gulçîçekan girek hatîbû avakirin. Di Stockholmê de kesê ku mîna zîyaretekê ew der ziyaret nekir û gulek danani nema. 15 ê meha Adarê seramonî çê bû. Bona ku serokwezîrê xwe, Olof Palme rêwî bikin nêzî mîlyonekê mirov di sûk û kolanan de rawestîyan. Ji welatên din jî gelek der û dorên polîtîk di seramonîyê de beşdar bûn. Di nava axavitvanan de Vîllî Brand, Racîv Gandî jî hebûn.

Yekitîya Sovyet di kongra xwe ya 27 emîn de rawestina giramî nişan da. Hîndîstan, Nîkaragua û hin welatên din reş girêdan.

Bi kuştina Olof Palme him gelê Swêd û him jî gelên din piştgirekî aşitîyê, yê hêja wenda kir. Olof Palme di şerê li dijî kolonyalîzmê û nijadparazîyê de her tim li pişt gelên azadîxwaz û aşitîxwaz bû. Ew her usa dostê gelê Kurd bû jî.

Olof Palme di sala 1980 de ji bo gelê Kurd usa digot;*"Kurd netewek e, ji ber wê yekê divê di rêvabirina karê welatê xwe de azad bin. Lazim e ji gelê Kurd ra piştgirî bê nîşandan, ji ber ku ew gelek eza û cefa dikişînin."*

Olof Palme kê kûşt? Hîn jî bersiva wê pirsê ne eşkereye. Olof Palme şev, dema ku hat kuştin tevî jina xwe Lîsbet Palme ji sînemê dihat. Ji jina wî bêtir kesî li cîhê bûyerê tûne bûye . Lîsbet Palme wek kûjêrê mêrê xwe Chrîster Pettersson îşaret kir. Petterson, yekî eraqxur û mêrkuj bû. Ew çend mehan girtin girtîgehê, lê ji ber kêmasîya delîlan ew hat berdan û li himberî zerarkişandina wî pere jî dane wî.

**Civîna bîranîna şehîdên Kurdîstanê**

31 Adar 1986

Li ser mirina Apê Selîm ra 2 sal derbaz bû. Îro komela Komkar -Swêd bi vê minasebetê civînek li darxist. Dora 60-70 beşdar amade bû. Zimanê civînê Kurdî bû. Di civînê de Qadi Mihemmed, Apê Selîm (Mistefa Budak), Metîn Aksoy, Mustafa Çamlibel, Yilmaz Demir û hevalên din hatin bîranîn. Dîwarên salona civînê bi suretên hemû şehîdan û bi ala Kurdî ya rengîn ve hatîbûn xemilandin.

Civîn ji alîyê koroya komelê, bi xwendina merşa netewî "Ey Reqîp" hat vekirin. Piştî wê serokê komelê bi axavtinekê giringî û pêwîstîya bîranîna şehîdan anî ziman. Bêşdaran deqekê bi ser lingan rawestinê li himber xebat û fêdekarîya wan rêza xwe nîşan da.

Piştî axavitina serokê komelê û rawestandinê, Sekreterê Giştî ya Partîya Sosyalîsta Kurdistan, Kemal Burkay li ser bîranîna şehîdan û pêwîstîya kar û xebatên nav welat û dervayî welat axavitinek kir. Paşê hevalek li ser jîyan û tekoşîna Qadi Mihemmed deng kir. Û di derheqa Mistefa Budak de Parêzer Weysî Zeydanlioxlu peyîvî.

Di dawîyê de hevalek bi awakî tevayî li ser jîyan û tekoşîna şehîdên Kurdistanê yên wek Mistefa Çamlibel, Metîn aksoy, Yilmaz Demîr û yên bi destê hêzên tarî û polêsan di êşkencen de hatîbun şehîdkirin, deng kir. Du her axavitinekê çend helbest jî hatin xwendin.

Min û hin hevalên din jî li ser şehîdan me dîtin û hîssên xwe anîn ziman. Axavitina min di derheqê Mistefa Budak de bi sernivîsa Hevrê Apê Selîm Jîyana xwe bo Azadî û Sosyalîzmê Da[73] di roja Nu hejmar 1986-12 an de hate weşandin.

Di dawîya civînê de merşa "Ey Şehîdan" hat xwendin û civîn bi vî awayî xilas bû.

## Ji welat Anina Bejna û Bermalê

1986.10.31

Sala 1983 an ku Nazli û Ciran ji welat derketin hatin Sûriyê, nikarin herdu keçên me yên piçûk Bejna û Bermalê derxinin. Ew li Bîngolê li ba dê u bavê Nazli ye man. Piştî ku em li Swêdê cih bûn, ji bo anîna wan me ji sazîyên Swêdî, alîkarî xwest, wan alîkarî nekir, gotin, *"çi rê dixwazin bînin, hûn dizanin."* Me pir hewl da, em wan jî derxinin. Lê dewlata fasist pasaport neda û me nekari em wan bigirin ba xwe. Bermal bibû 5, Bejna ji bibû 6 salini. Bejna yê li Bingolê dest bi dibistana Tirki kiribu.

Dawiye me jinek wêrek, jinek dost di. Wê jî di salên keçên me de du keçên xwe hebûn. Wê 24 .10.1986 saet 20.30 ji Duseldorfê teyere girt çû Stenbolê. Ew çûyînê bê keç çû, hatinê bi pasaportên keçên xwe keçên me derxistin1986.10.31 an de saet18.15 an anî Duseldorfê. Ji Elmanyê jî me bi pasaportên din ew derbazî Swêd kirin. Piştî ku me ew anîn, polêsê Swêd pê ket, ka me ew çawa anîne? gotin eger *"hûn navê kesê ku ew anîne nedin, ewê zarokan şûve bişînin."* Me helbet nav ne da. Piştî demikê şûnda îltica zarokan hate pejirandin.

Ez piranîya wexta xwe di karê partî û komelê de derbaz dikim. Derengî şeve, terim mal zarok raketine. Sibê de jî em hîn ji xewê ranebibûn zarok diçûn dibistanê. Zarok li cem me ne jî, ji me dûr in.

---

[73] Ew nivîs di kovara Roja Nû ya 1986 hejmar 12 da, di rûpela 5 û 6 an da hat weşandin. bona ku me navê xwe yê rastî karnediani, wek niviskarê nivîsê di cihê navê xwe yê rasti da min navê Şemdîn bi kar anî.

## Li Kurdistanê 16 hezar gund têne valakirin

1987.02.23

Li gorî nûçeyên ku di rojnaman de cîh girtine, li Kurdistana Bakûr 16 hezar gund tên valakirin, 9 mîlyon û nîv kes tê sirgun kirin.

Wek peyvdarên fermî ya hikûmata Tirk didin xuyakirin, sirgun ji gundên Dêrsimê dest pê dike, di hemû Kurdistanê de wê bi mîlyonan gundî ji gundan bêne derxistin û ber bi Anatolê bêne şandin. Bona ji raya giştîra bidin zanîn û bûyerê protesto bikin ser navê PSKT liqê – Swêd, me ji bona civînek fireh, bangî hêzên çar perçê Kurdistanê kir. Civîna ku di roja 23 ê Sibatî 1987 an hate çêkirin ew tevgerên jêrin amade bûn.

Partiya Hevgırtina Gelî Kurdî li Sûriyê - Liqê Swêdê,
Yekîtiya Niştimanî Kurdistan - Liqê Swêdê,
Partî Karkerî Kurdistan (KÎP)[74] - Liqê Swêdê,
Partî Sosyalistî Kurd (PASOK) - liqê Swêdê,
Yekitiya Sosyalîsta Kurdistan (YSK) - liqê Swêdê,
KUK – Baskê Sosyalîst - Liqê Swêdê,
Partiya Sosyalîst a Kurdistana Iraq - liqê Swêdê,
Partî Demokratî Gelî Kurdistana Iraq - liqê Swêdê,
Berey Yekgirtûy Demokratî Kurdistanî Îran - liqê Swêdê,
Ala Rizgari - liqê Swêdê,
Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê - liqê Swêdê,
Partiya Demokratî Kurdî ya Pêşverû li Sûriyê - liqê Swêdê,
Partiya Sosyalist a Kurdistan - liqê Swêdê ,
Partî Demoqrat Kurdistan- Iraq

Li ser rojevê hat peyvandin, dawîyê de hin biryar hatin girtin: Ji bo grubên ku nehatine, di civînê de amade nînin, bangek din bê kirin û ji wan bê xwestin, ew di civînan de amade bin, di vê xebata de karê ku dikeve ser milê wan pêk bînin.

1ê Adarê de li Komkarê civîna duyem hate pejirandin. Ji PSK, Hevgirtina Gel û Tevgera Sosyalista Kurdistan TSK komîtayek hate bijartin. Komîtê bona komkirina materyalan, amadekirina belavokê û zîyeretkirina partîyên Swêdî biryar girt. Amadekirina belavokê PSKê girt ser xwe. Dîsa biryar hate girtin ku hêzên ku di civînê de amade nebûne carek din bêne agahdarkirin û amade bûna wan bê pêk anîn. Roja civînê 5ê Adarê saet 13.00 an de dîsa cîhê civînê komela Komkar hate nîşankirin.

Belavoka me amadekirîbû di komîtê de şiklê dawî hate dayin û belavok bi zimanê Kurdî, Tirkî û Swêdî hat amade kirin. Ew belavok di roja 5.03.1987 an de ser navê 13 hêzên Kurdistanî Komîta li dij valakirin û êrîşa li ser Kurdistanê hate belavkirin.

---

[74] PPKK bona KÎP ê, KUK jî bona mixalefta xwe KUK- Se beşdarî civînê nebûn.

Di 9 ê Adarê saet 10 an da, ji hemû hêzên endam, sê grub, her grub ji 15- 20 jin û mêran hatin çêkirin, çûn parlamentoyê û merkeza (SDP, Center, Folk û VPK) çar partîyan. Ew zîyaret kirin û di derheqê bûyerê de agahî, belavok û materyal hat dayîn û ji wan piştgirî hat daxwaz kirin. Serokê Partî center jî da zanîn ku ew li parlamentoyê jî li ser vê pirsê rawestin. Wî soza xwe anî cîh jî. 10 Adarê saet 16.45 an de Radyo Merheba ku li Stockholmê bi zimanê Tirkî weşan dikir, di nûçê xwe de zîyareta partîyên Swêdî wek agahî gîhand guhdarê xwe.

**"KOMÎTA HEVKARÎYA RÊXISTINÊN KURDISTANÎ YÊN SIYASÎ LI SWÊDÊ" tê damezrandin**

Bona ku li çar perçê Kurdistanê her roj bûyerek diqewime. Komîta li dij valakirin û êrîşa li ser Kurdistanê xwast komîtak daîmî KOMITA KURDÎSTANÎ YA DOMDAR hebe û bikare di wextê de bûyeran bişopîne û helwest bigire. Ji bona wê sedemê komîtê di van civînan de damezrandina KOMÎTA KURDÎSTANÎ YA DOMDAR girt rojeva xwe.

Li ser navê *Komîta li dij valakirin û êrîşa li ser Kurdistanê* ji hemû hêzên Kurd ra nama jêrin hat şandin.

*Hevalên hêja!*

*Wek em hemû pê dizanin xebata niştimanî li Swêdê li paş maye. Her çendî rêxistinên Kurdî li gor dîtin û îmkanên xwe bi çalakîyan radibin û hewildanên cûrbe cûr dikin; lê nikarin bi tena xwe vê valayîyê dagirin. Xebata cîhê û bi serê xwe têr nake û di çavê raya giştîya Swêd de qîmet nabîne û qebûl nabe.*

*Ji ber vê yekê û herweha ji ber ku her rêxistinên Kurdistanî hevkarîya navbera hemû rêxistinan baş û girîng dibîne, ji bo lêkolîna vî tiştî pêwîste, ku civîneke freh pêk bê. Hêvî gelek mezin e, ku rêxistinên Kurd li Swêdê dê bi rengekî demoqratî û li ser platformeke niştîmanî li hev bikin û bi hev re vatinîyên (wezîfên) xwe yên dîrokî bi cîh bînin.*

*Hevalên birêz, komîta me ya muveqet ji bo avakirina Komîta Kurdîstanî ya Domkar ji we re pêşniyarîyek bi vê nama xwe re bi rê dike. Eger hûn li ser vê pêşniyarîya me ya ha bifikirin û bi pêşniyarîyên xwe yên hêja û giranbuha ve bêne civînê, em dê gelek kêfxweş û dilşad bibin.*

*Bi slavên biratîyê!* *15.03.1987*

*Komîta Mueqat a li dijî valakirin û êrîşa li ser Kurdistanê*
*PSK (Kazim Budak)*
*Hevgirtina Gel (Saidê Mele)*
*Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê (Ahmet Tigris)*

*Cîh û kata civînê: KOMKAR, Döbelsgatan 16 B, 2 TR Tel: 08-328251*
*Kat (saet) 13.00 T- Rådmansgatan*

*28.03.1987*

Bi vê bangê partî û tevgerên Kurdîstanî hatin ba hev û li ser pirsê rawestîyan. Piştî hin xebat û cîvîn bi navê "KOMÎTA HEVKARÎYA RÊXISTINÊN KURDISTANÎ YÊN SÎYASÎ LI SWÊDÊ" komîtak hat damezrandin. Wê komîta di pêvajoyê de ji bûyer û xwepêşandinan de reng û şikil girt û îro jî bi wî navî xebata xwe didomîne.

**DAXUYANÎ**

Ji hemû rêxistin û kesên pêşverû û demoqrat re!

Her ku diçe, li Rojhilata Navîn, qad û çarçova xebat û tekoşîna gelê Kurdistanê berfirehtir, piralî, tûj û kûrtir dibe. Ji ber vê yekê, doz û pirsa Kurd û Kurdistanê di rojevên netewî û navnetewî de cî digire. Bal û awira raya giştî ya cîhanê dikişîne. Di vê pêngav û pêvajoyaha de vatinî, berpirsîyarî û pêşengî ji rêxistinên sîyasî re dikevin, pêwîst e, ku ew li ser bingehekî nîştimanperwerî û demoqratî bên ba hev dû. Li dij dijmin hêz û dengên xwe bikin yek û hevkarîyê bi dostên xwe re xwirtir bikin. Li Swêdê jî, heta nuha di warê sîyasî de valahî hebû. Em nûnerên rêxistinên Kurdistanî yên sîyasî, ji bo pêkanîna platformeke netewî û demoqratîk ji mêj ve kar û xebat dikin. Ew xebata me ya ha, berhema xwe da. Di roja 11.04.1987-an de em gîhîştin encameke serfiraz.

Me 13 rêxistinên Kurdistanî, le ser armanc, prensîp, plana karûbar, vatinî û berpirsîyarîyên Komîta birêvebir li hev kir; me li ser bingehê niştimanî û demoqratî KOMITA HEVKARIYA RÊXISTINêN KURDISTANI YÊN SIYASI LI SWÊDÊ pêkanî. Vê komîta ha jî, ji bo bi cîanîna karûbarên pratîk ji 5 kesan KOMÎTA BIRÊVEBIR sazkir. Em dê ji îro pê ve, li ser navê vê komîta han hin karûbarên xwe yên sîyasî bi hev re bidomînin.

Yekitîya rêxistin û gelê Kurd, jîyana dijmin kintir dike!

**Rêxistinên sazker ev in:**

1-Partîya Hevgirtina Gelî Kurdî li Sûrîyê - liqê Swêdê
2-Yekitiya Nîştimanî Kurdistan - liqê Swêdê
3-Partî Karkerî Kurdistan (KÎP) - liqê Swêdê
4-Parti Sosyalîstî Kurd (PASOK) - liqê Swêdê
5-Yekitîya Sosyalîsta Kurdistan (YSK) - liqê Swêdê
6- KUK – Baskê Sosyalîst - liqê Swêdê
7- Partîya Sosyalîst a Kurdistana Iraq - liqê Swêdê
8- Partî Demokratî Gelî Kurdistana Iraq - liqê Swêdê
9- Berey Yekgirtûy Demokratî Kurdistanî Îran - liqê Swêdê
10- Ala Rizgarî - liqê Swêdê
11- Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê - liqê Swêdê
12- Partîya Demokratî Kurdî ya Pêşverû li Sûrîyê - Liqê Swêdê
13- Partîya Sosyalîst a Kurdistan - Liqê Swêdê 11.04.1987

KOMÎTA HEVKARÎYA HÊZÊN KURDISTANÊ
NAVÊ KOMÎTÊ: Komîta Hevkarîya Hêzên Kurdistanê ye.

PRENSÎPÊN KOMÎTÊ: Komîta ji hêzên Kurdistanê yên welatparêz re vekirîye. Her hêz azade, dikare beşdarê komîtê bibe û dikare xwe vekşîne.

Komîta bi tenê xwe, yên endam temsîl dike. Komîta propaganda rêxistineke taybetî nake. Her hêz li derê komîtê jî karûbarên xwe yên sîyasî didomîne.

ARMANCA KOMÎTÊ: Di warê sîyasî de li Swêdê Kurdan temsîl dike û întresên tevgerên Kurdistanî di her parçeyî de diparêze.

PLANA KARÛBAR: Komîta li gor pêwîstî û bûyerên li Kurdistanê çêdibin karûbar dike. Di derbarê bûyeran de agahdarî dide û distîne. Gotebêjan vedike. Biryar digre û komîta birêvebir biryaran pêk tîne. Bi meqam û rêxistinên Swêdî û bîyanîyan re têkilîyan datîne. Bi zimanê swêdî bulteneke dertîne. Têkilîyên nav hêzên Kûdistanî xurtir û geştir dike.

KOMÎTA BIRÊVEBIRÎ: Komîta Birêvebirî (K.B), 5 kesan pêk tê. Endamên K.B. ji 6 mehan carekî bi hilbijartinê tên guhartin. Komîta di nav xwe de sekreter û berpirsîyareke aborî hildibjêre. Sekreter banga civînê dike, rojeva wê çêdike, civînan îdare dike û raporan digre. Berpirsîyarê aborî jî, hesabê hatin û çûndinê digre.

## 2 Raporên Xebatê yên ku li Swêd ser navê komîta herêmî min amadekirin û pêşkêşî komîta merkezîya PSK kirîye li jêr in.

### Xebatên me yên li Swêdê çi ne? (rapor-1)

Li gorî welatên Ewrûpa yên din, piranîyên Tirk û Kurdên ku li Swêdê ciwar bûne, ji ber rewşa polîtîk welatê xwe terikandine. Îro li Swêd Kurdan kîtleyeke xwe ya mezin tune, ji hemû perçên Kurdistanê dora 7000 Kurd tê guman kirin.

Qismek ji wan ber sedemên ekonomîk hatine, ji ber wê jî bona ku rewşa xwe ya ekonomîk bikarin baş bikin pir dixebitin. Hinek ji wan rojê 14, 15 saetan fizîgî dixebitin.

Alîyê din ve hinek naxwazin têkilîyên xwe yê bi welat ra bikin xeterîyê û ji ber çewsandina qonsolosê Tirkan di xebatên polîtîk de cîh nagirin. Rewşa kesên ku ser nave sîyasetê hatine û îltica kirine çawa ye? Ew jî, ber ku piranî bi alîkarîya partî û hêzan hatine, di destpêkê de xwedî dîtin û terefin. Gelik ji wan qadroyên partîyan

bi xwe ne. Grubek mezin jî ji kesên partîyan veqetîne pêk tê. Ew xwedî tecrubên polîtîkin, lê hinek ji wan bi nave "serbixwetîyê" li himber xebata partîtîyê ne.

Welatê Swêd ji alî ekonomîk ve baştir e. Alîkarîya Sosyalî û rehetîya vira jî hin kesan dike rehawetê. Ew yeka jî li hin kesan tesîr dike ku sist dibin û xwe ji fêdekarî û xebatê dûr digirin.

Wekî din jî bona ku mirov bikare ji dewletê alîkarîya maddî bigire, dive mirov here qûrsa ziman, an jî bo ku debara xwe bike lazime karekî bike.Tevî van sedemên jorin, li gorî şertên herêma me bijartina hin taktîkên şaş jî, di de xuyakirin ku em çima zêde ne serkevtîne.

Di seranserê Swêd de kesên ku piştgirîya aktîvîtên partîya me dikin ji ser 200 kesî re ye. Lakîn ji ber sedemên heyî em nikarin hemû hêza xwe bînin ba hev û di xebatên kollektîf de kar bînin.

Dilxwazên me yên li Stockholmê di binê ala komela Komkar-Swêd de kom bûne. Xebatên me yê girseyî û xebatên me yê din bi endamên vê komela demoqratîk ve tên meşandin.

Tevgera me ya demoqratîk xebata xwe yê derva û yê hindurîn bi nava çarçovake proxramê de rêva dibe. Eger ku meriv hindikan bi nav bike ew in.

- 30 ê adarê de bi minasebeta şehîdên Partîya Sosyalîsta Kurdistanê civînek hate darxistin. Hevalên ku kar girtîbûn, li ser jîyana Qadi Mihemmed, Apê Selîm (Mistefa Budak), Mistefa Çamlibel, Metîn Aksoy û Yilmaz Demir peyîvîyan.

- Ji terefê destên vêşartî di roja 24 ê Sibatê 1986 an de Serokwezîrê Swêdê Olof Palme, hat kuştin. Ser vê bûyerê bi zimanê Swêdî, Tirkî û Kurdî belavokek hat amadekirin û li weşanxanên û partîyên sîyasî û organîzasyonên bîyanî hat belav kirin.

- Bona rêzgirtina Olaf Palme û protesto kirina qetîlan roja 8 Adar ê 1986 an de federasyonên bîyanî hev ra mîtîngek li darxistin. Em bi flama Komkarê û hêza xwe bejdarî mîtîngê bûn.

- Bi hemû hêza xwe beşdarî meşa 1 ê Gulanê bûn û me xwepêşandanek serkevtî pêk anî.

- Bi cuda sedeman kesên ku mecbûr mane ji welatê xwe veqetîyane hatine û li Swêd daxwazîya penaberîyê kirine, ji bo pêydakirina tercuman û parêzeran komela me alîkarî kir.

- Kesên ku di girtîgehên dewleta Tirk de êşkence dîtine û hatine Swêd bona tedavîbûna wan alîkarî kir. Dewleta faşîst û kesên ku êşkence kirine ber çavê gelê ewrûpîyan hat raxistin.

- Bona ku heval pêşkevin û di xebatê de bikarin aktîf cî bigirin, du meh û mîvan bi gruban ra semîner hatin çêkirin. (Endamên komelê 15 jin,13 ji endamê mêr beşdarî qûrsan bûn.)

- Dîsa 12 heftan du hev li ser zimanê Swêdî û Kurdî qurs hatin çêkirin.

-Li ser du babetan semîner hate dayin:

1- Di civak û têkoşîna me de girîngî ya Jin ê,

2- Li ser Dîroka Kurd û Kurdistanê û zimanê Kurdî semîner hate dayîn.

**Komîta jinan**

Di nav endamên komelê de Komîtayek jinan heye û xebata xwe didomîne.[75] Di xebata folklor, koro, qursa durinkerîyê, kursa ziman (Kurdî, Swêdî), di nava xweda xwendin û nîqaşkirina rojnama partîyê (Rîya azadî), ji komelên jinan yên welatê din ra têkilî danîn, ji hin xebatên wan in. Lê bo ku endamên me yê jin, di xebatê de bi zêdetir berpirsîyar û zanetî bikarin cîhê xwe bigirin wext û xebat dixwaz e.

**Xebata ser weşanan**

Wekî tê zanîn Kovara Roja Nû ya peryodîk li Swêd tê weşandin. Pirtûka Qanade Kurdo Tarîxa Edebîyata Kurdî-2, klasîka Feqê Teyra ya Şêxê Sena, pirtûka şiîran Em û Dijmin a Seydayê Keleş û Daxwaznama Namî hatin çapkirin û belav kirin.

-Hawarî ya Hecî yê Cindî, Nûbar a Ahmedê Xanê hatine nivîsîn û ji çapê ra amade ne.

Hin caran jî rojnama partîyê Rîya Azadî jî li Stockholmê tê daktîlo kirin.

-Ji bo derxistina kovara Roja Nû û Weşanên Roja Nû ji sê kesan, komîtek heye. Lê komîte bi hêjmara xwe, bo çapkirin û belavkirina weşanan û xebatek kolektîfî têrê nake.

-Bo ku kovara Roja Nû di wexta xwe de derkeve û naverok, çapkirin û belavkirin serkevtî bê kirin komîta Roja Nû û Weşanên Roja Nû lazime bê zêde kirin.

**Rewşa Federasyonê**
**(Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê)**

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê kongra xwe ya awarte, ya pêncemîn di navbera rojên 7-9 Hezirana 1985 de çêkir.

Di kongrê de dijî dengê Komkar-Swêd bi dengê piranî derbazî komelên komun bû. Piştî wê jî li hin herêman dest bi avakirina komelên komunan kirin. Ji bona avakirina komelên komunan ew sedem têne pêşkêş kirin; komelên berê bi sîyasetê va girêdayî hatine damezrandin. Kesên ne xwedî sîyaset ber ku endamê tu komelan

[75] Jinên endamên komela Komkar Swêdê xabat û fedekarîyên baş kirin. Bi dor her yekşemî, xwarin çê kirin anîn li komelê firotin û perê yê wê jî dan komelê. 1ê Gulan ê û xwexwepêşandinên din da nan û xwarin çê kirin û firotin û ji komelê ra alîkarî kirin. Jinan di hemû xebat û xwepêşandanin komelê da cîhê xwe girtin. Tevî komelên jinên welatên din daketin kolanan 8 Adar ê roja jinên cîhanê pîrozkirin.

ninin, li dervayî federasyonê dimînin. Ev yeka jî rê li ber firehbûna Federasyonê digire û girtina hezaran nava xwe ra dibe asteng.

Federasyona komun ji kesên jêhatî, qabîlîyet yên serbixwe ji dikare alîkarî bigre. Komelên komun welatparêzan ji belavelabûnê xilas dike, kesên xwedî sîyaset an bê sîyaset hemû Kurdan tîne ba hev.

Lê em dîbînin ku du hêzan, PPKK û KUK ku piştgirîya pêşniyara komelên komunan dikirin, komelên girêdayîyê xwe jî betal ne kirin, hemû endamên xwe jî nekirin endamên komelên komunan. Hin endamên xwe kirine endamên komunan, him damezrandina komelên komunan ra bûn alîkar, him jî komelên xwe yên berê parastin.

Bi vî avayî cîhê ku hemû welatparêzan bînin ba hev, hêjmara komelan kêm bikin, hêjmara komelan zêde bûn gelek ji wan jî ne endamê federasyonê ne. Komelên girêdayî PPKKû KUKê, tenê bi damezrandina komelên komunan neman, bi wê piştgirîya xwe xwîn jî dan fikra bê sazûmanî yê.

Komkar wek prensip ne li himber komelên komun bû. Di destpêkê de xebata komelên komunan wek, li himber xebatên sîyasî, hat ziman. Guman ew bu ku kesên serbixwe, kesên li dervayî sîyasetan, di federasyonê de cîh bigirin, bi îmkanên federasyonê li himber komelên xwedî sîyaset hewl bidin, xebatên wan asteng bikin.

Komkarê bi endamên xwe ra li ser vê pirsê civînek çêkir, di encamê de endamên komelê gihaşt wê bawerîyê ku, nuha şertên komelên komun tunin. Ji ber wê yekê jî endamên Komkar- Swêd nabin endamê van komelan.

Ser biryara endaman nunerên Komkar – Swêd di kongra federasyonê ya 6.emîn ya ku di navbera 5-6 Avrîl 1986 an de çêbû de amade bûn, dîtinên xwe anîn ziman û xwe jî endamtîya Federasyonê kişand. Lê Fîtja, Gotebog û Uppsala) sê komelên komunan ku berê de hebûn endametîya hevalên me li wir dom dike.

**Yekitîya Çep – Sol Bîrlik**

Xebatên komîta Yekitîya Çep a Swêd ji du beşan pêk tê: yek, xebatên li ser bûyerên ku li vir diqewimin, têne kirin. Ya din jî xebatên ku li ser pêşniyar û direktîfên merkeza Yekitîya çep têne kirin.

**Komîta Yekitîya Çep a Swêd xebatên ku kirine (bi kurtasî) ew in:**

Di roja 31 Adar 1986 an de pêşengîya partîyên ku Yekitîya Çep pêk anîne de 10 hêzan bi hev ra qampanyek dane destpêkirin. Qampanya bi şîyara; "Bi efuyek giştî li Tirkîyê û li Kurdistanê girtîyên polîtîk bên azad kirin, dawî li êşkencan bê û cezayê dardakirinê bê rakirin. Zilma ser gelê Kurd dawî lê bê anîn û alîkarîya leşkerî ya ku ji dewleta Tirk ra tê kirin bê rawestin."

Îtirafên polêsê êşkencekirî ku di medya de hatîbû weşandin tevî êşkencên din bi zimanê Îngîlîzî û Swêdî hatin wergerandin ji partî, sendîqa, parlementer, masmedya Swêdî û saziyên navnetewî ra hat şandin û ji wan piştgirî hate daxwaz kirin. Belovoka ku ser vê mijarê hatîbû nivîsîn bi zimanê Swêdî, Tirkî û Kurdî li hin bajarên Swêdê hat belav kirin. Bi vê qampanyê ve girêdayî bo ku ji Parlamento Ewrûpê ra bê rêkirin kampanya îmze komkirinê hat dest pêkirin.

Di wê navberê de li cuda cuda bajarên Swêd da, bi teşhîrkirina cunta faşîst hin xwepêşandin hatin darxistin.

19 ê Avrîlê 1986 an li ber derê balyozxana Tirkan, xwe pêşandanek mezin hate çêkirin. Li cîhê bûyerê bi zimanê Kurdî, Tirkî û Swêdî axavitin hatin kirin, li dijî cunta faşîst û kirinên wê slogan hatin avitin. Kampanyê di masmedya herêmî de cî girt. Radyo-Upland di derheqê kampanyê de weşankir, ji demoqratên Swêd piştgirî daxwaz kir.

Di dîroka berxwedana çîna karkerên Tirkîyê de bûyera 15-16 hazîranê xwedî cîhekî girînge. Bi sedema sersalîya bûyerên Hezîranê bi zimanê Tirkî û Kurdî belavok hate belav kirin û afîş hatine daliqandin.

Komîta me (PSKT) a herêmî li ser rûdanên dawîyê, ya ku nava Yekitîya Çep de derket ser rawestîya. Komîta me xebata nava Yekitîya Çep de tawrê TKP ê sekter û şoven dibîne. Dîtina komîta me ew e ku, TKP li proxrama Yekitîya Çep, ya ku binî îmze kirîye xwedî demakeve. Ew dixwaze proxramê şuva bide, betal bike. Nasnekirina netewa Kurd û welatê wan, şoventîya wan nîşan dide. Bi damezrandina Yekitîya Çep TKP ê xwe ji tecrît bûnê xilas kir. Niha jî li hesavê xirakirina Yekitîya Çep digere. Berpirsîyarîya xirakirinê jî dixwaze bike ser tevgerên din.

Komîta me ya herêmî, di civîna zîrvê, ya Yekitîya Çep da, di cîhê Karkerên Kurdistanê de karanîna gotina 'karkerên Kurd û Tirk" jî gavekî paşve dibîne. Komîta me ya herêmî gîhaşt wê encamê ku; em, bona pêşvebirina xebatên yekitîya Çep bi berpirsîyarî tevbigerin, lê li himber polîtîka TKP ê jî şîyar û hesas bin.

Komîta me ya herêmî naveroka namên ku bi navê hevrê Sekreterê Giştî hatine îmzekirin û ji partîyên endamên Yekitîya Çep ra hatine şandin dipejirîne.

**Dîsîplîn**

Komîta me ya herêmî, hevrêyên dilxwaz û endam, bona ku xebatan de cîh bigirin, enerjî û hunera xwe rast karbînin û wan pêşxinin îtina û xesasîyet nîşan dide. Vê gava problemek ciddî, ya ku bikare komîta me mijûl bike tune.

(... ...)

**Pêşniyarên komîta me ya herêmî**

1- Ji komîta me ya herêmî hatîye pêşneyarkirin ku "roja 30 ê Adar ê[76] ji alî partîya me ve wek roja şehîdan bê pejirandinn."

Bîranînên ser Apê Selîm (Mustefa Budak) û hevrê yên din yên şehîd zindî bên girtin, afîş bêne çêkirin, bo kurtejîyana wan broşûr bêne amadekirin.

2- Hêjmara komîta Roja Nû û Weşana Roja Nû bê zêdekirin.

3- Li ser rewşa hevalên ku ji girtîgehê hatine berdan bê sekinandin. Tenduristî, ewlehî û xasima spekulasyonên ku li ser navê wî tê kirin, hevrê Nazîf Kalelî ji welat bê derxistin, rewşa wî bê zelal kirin.

4- Têkilîya nava hevalên berpirsîyar, yên herêmên cure cure, bi rîya partîyê an jî bi rîya komela demoqratîk bêne organîze kirin.

**Rapora xebtê ya herêma Swêdê (rapor 2)**

Di raporên me yê berê de di derheqê herêma me de hin agahî hatîbûn dayîn. Em carek din naxwazin wan dubare bikin.

Li Stockholmê dilxwazên me di binê bana Komkar Swêd de kom bûne û dixebitin. Em wê jî bidine zanîn ku, biryara berê, ya " *hemû kes ji bo endametî ya komela Komkarê hat mecbûr kirin" şaş e. ew yeka berê qadroyan dide xebatê komelê, xebata partîyê sist dike.*

Wekî tê zanîn di dema bihorî da, di herêma me de hin pirsgirêkên dîsîplînê hatin jîyandin. Piştî kongra duyem ji bona ji ortê rabûna wan pirsan, organên partîyê û komîta me gelek xebitîya.

Çend hevalan xwe ji xebatê dûr digirtin, enerjî û hêza xwe nedidan xebatên welatparêz û pêşverû. Bona ku em bikarin wan di xebatan de aktîf bikin, têkilîyan xwe bi wan ra didomînin. Komîta me bo wan jî bigire nava xebatê hevil dide.

(... ... ...)

**Xebatên ku me di vê Peryoda de Kirin Ev in**

1- Bi minasebata damezrandina 41.salîya Komara Mehabadê civînek hate darxistin. Di derheqê dîroka Komara Mehabadê de agahî hat dayîn. Dîsa bi vê

[76] Roja 30 Adar ê Mistefa Budak- Apê Selîm çû ser dilovaniya xwe. Endamê Komîta Herêmê hêvalê Dursun Belge (Belengaz) bi wê sedemê pêşniyar kirîbû, komîta herêmi ji ew pejirand û ji Komîta merkezîra pêşkêş kir. Komîta merkezî ya partiya Sosyalist a Kurdistan, roja 31 yekê Adar ê wek roja Şehîdên Kurdistanê pejirand. Qazî Mihemed 31-ê Adar a sala 1947 an hatîye îdam kirin. Ji ber wê hevalan ew roj pejirandin.

minasebetê şeva ku PDK-Î amadekiribû, em bi hêza xwe bejdar bûn, bi koma folklor û koroya Dengê Komkar me piştgirîya wan kir.

2- Bi sedema li Kurdistanê vala kirina gundan, sirgûnkirina gundîyan bi banga me partî û hêzên Kurdî 23 sibat 1987 an de civînek çêkir. Em jî di nav de ji sê kesan komîtake hate ava kirin. Komîtê di derheqê mijarê de materyal kom kir, belavokekek derxist. 9 Adarê bi cuda gruban merkaza çar partîyên ku li Parlamento Swêd têne temsîl kirin zîyaret kirin ji bona alîkarî piştgirî daxwaz kir. Pirsê di medya Swêdî de cîh girt û di radyo Swêdî beşa Tirkî de jî wek agahî hate dayîn.

Xebatên ser mijarê bi frehî hat dom kirin. Partîya me jî di nav de ji her çar parçên Kurdistanê 13 hêzên Kurdîstanî hatine ba hev "Komîta Hevkarîyê" damezrandin. Wê komîtê bi minasebeta li Kurdistana Başûr kar anîna gaza kîmyewî dijî hikûmata Iraqê 28 Gulanê xwepêşandanek darxist. Dora hezar welatparêz û pêşverû bejdarî wê aktîvîtê bu. Belavok hate belavkirin û afîş hati daliqandin.

3-Roja 31 ê Adarê ku partîya me roja Şehîdan êlan kirîye, me cîvînek pêkanî. Di civînê de sekreterê giştî jî amade bû, li ser mana û girîngîya rojê û li ser rûdanên Kurdistanê yên dawîn axavitinek kir.

4-Komîta Jinan a Komkar- Swêd di roja Roja Jinên Cîhanê 8 ê Adarê de tevî mîtînga Komela Jinên Aşitîxwazên Swêdî bûn. Bi xebata Komîta Jinan a Komkar Swêd, Komîta Jinên Aşitîxwaz ji Yekitîya Milletan ra telegrafek şand zilm û çewsandina ku li Kurdistanê li ser jin û gelê Kurd tê kirin hat protesto kirin. Di telegrafê de hate daxwazkirin ku Yekitîya Miletan li ser pirsa gelê Kurd raweste.

5-Dîsa belavoka[77] ku ser navê Komîta Jinan a Komkar- Swêd bi zimanê Tirkî- Kurdî ( ji alî Nazli Budak ve) hatibû amadekirin bi frehî hat belav kirin.

---

[77] Di Rîya azadî û aşitîyê da jin û mêr bi hev ra!
Îro li Tirkîyê di bin zilma kolonyalîzm û faşîzmê da ziman û çanda gelê Kurd hatîye qedexe kirin, hebûna wî ya netewî tê înkarkirin û li ber talûkeyek ji ortê rakirinê ye.
Jinên Kurd ji di bin teda kolonyalîzm, dan û standinê kevnare ya feodalîzmê da tedayek du car lê dibe.

Xwendin û nivîsandina jinên Kurd bi zimanê xwe, hîn kirina zimanê xwe ji zarokên xwe ra, hetta bi Kurdî li zarokên xwe nav danîn qedexe ye. Bi sedhezaran jî di bin kontrola doktoran ji welidandinê jî bê par in.

Jinên Kurd, ji ber mêr û zarokên xwe tên êşkence kirin, ji bo teslîmbûna mêr û zarokên wan ji alî cuntayê va tên girtin û hepis kirin, ji kontrola cinsî têne derbaz kirin, bi iddia ku gelo "mêr û jin hatine ba hev yan na!" bê fehêd bi şerefa wan tê lîstikandin.

Jinên Kurd ji ber têkoşîna rizgarîya gelê Kurd, di dadgehên kolonyalîst û faşîst da tên dad kirin û êşkencên nedîtî dibînin.

Dewletên klonyalîst yên ku Kurdistan di nava xwe da parve kirine, bi karbidestîya hemû cûreyî dixwazin têkoşîna gelê Kurd bitemirînin.
Cunta faşîst yê Tirk qîma xwe tenê bi zulm û tedaya ser gelê Kurdistana Tirkîyê nayne, êrîşî gelê me yê perçên din ji dike. Cara dawî 4`ê Adarê (1987) da bi 30 balafiran gundên Kurdistana Başûr bombaran kir. Cardin bi sedan zarok û jin hatin qir kirin.

6-Di binê flamayên xwe de endamên komela me bejdarî meşa 1 ê Gulanê ya ku ji alî VPK (Partîya Komînîst a Çep) ve hatîbû organîzekirin bû.

7-Em bi flama weşanxana xwe bejdarî festîvala rojnama APK (Partîya Komînîst a Karkeran) Norsen Flama bûn. Di festîvalê de stand vekir, weşan firot û di derheqê Komele û partîya me de agahî da beşdaran. Mesaja ku ser navê Partîyê, me dabû festîvalê di rojnama Norsen Flama de hat weşandin.

8-Bi sedema ji alî Apoyîyan ve kuştina hevrê me Remezan Adiguzel me Roja 23 ê Gulanê li Stockholmê civînek amadekir. Belavoka partîyê hate belav kirin û li hin cîyan afîşên hevrê me hate daliqandin.

9-Roja 28 ê Gulanê de xwepêşandina ku ji alî Hêzên Dijî Rasîzmê ve hatîbû darxistin wek Komkar- Swêd em jî bejdar bûn û me piştgirî kir.

**Xebatên ser perwerdê**

Xebatên ser perwerdê wek sê grup dihate kirin, semînera du gruban qedîya, ya sêyem hîn dom dike. Semînerên ku nû hatîne plan kirin hîn dest pênekirîye.

**Xebatên ser weşanan**

1-Rojnama Rîya Azadî para mezin di herêma me tê kirin.

2- Vê peryoda de di nava weşanên Roja Nû de (Dr.Nurî Dersimî) Hatiratim, Nûbar û Mewlûd hatin çapkirin. Tarîxa Kurdistan cilda 2em (Cîgerxwîn), Dîwana Melê Ciziri û pirtûka ku ser êşkencan hatîye nivîsîn jî li ber çapê ne. Dîsa daktîlo kirina pirtûka Cîgerxwîn Folklor jî li ber xilasbûnê ye.

3- Raporên ku bi zimanê Îngîlîzî, Swêdî ji alî partîya me ve hatine amadekirin hatin zêdekirin, ji partîyên sîyasî, sazîyên demoqratîk û ji medya Swêdî ra hat şandin.

4- Weşandina peryodîk a kovara Roja Nû dom dike. Hêjmara 17 emîn li ber çapêye.

---

Ji bili vana, di bin navê "parastina daristanê" da hazirîya valakirina hezaran gundên Kurdistanê tê kirin û hazirîya menfî kirinê ber bi rojava Anatolîyê tê domandin. Ev kiryara kolonyalîstan kiryarek sîyasî ye û kolonyalîst dixwazin vê kiryarê bi darê zorê pêk bînin. Bi vî menfî kirinê jî, wê Kurdistan cardin ser û bin bibe, wê dîsa bi sedhezaran ciwan, pîr, jin û mêr bi vê ser û bin bûnê ra koçemal bibin.

Di Tirkîyê û Kurdistanê da rejîma faşîst kar û barê rêxistinî ya jinan qedexe kir. Lê têkoşîna me dom dike. Em dixwazin di welatê xwe da azad û di nav aşitîyê da bijîn. Ji ber vê yekê, em li dijî bingehên ABD, hêzên êrîşkar, fuzeyên bi serikê atom û menfî kirina gelê me radiwestin!

Di duwerojê da şikandina zincîrên koledarîyê, azad bûna keda mirovan ne dûr e!

8'ê Adarê Roja Navnetewî Ya Jinên Dinê li hemû kedkirên jin yên dinê ra pîroz be!

Bimre Dîktatorî ya kolonyalîst û faşîst!

Bijî 8'ê Adarê Roja Jinên Dinê!

Komîta Jinan a Komkar- Swêd 1987.3.8

5- Kurdistan Înfo ku ji alî Komkar- Swêd ve bi zimanê Swêdî tê amadekirin weşana xwe didomîne. Em ji xebatên we ra serkevtin dixwazin.

1987.07.01
PSK
Komîta Herêmî ya Swêd

**Hîroşîma Kurda Helepçe**

16 Adarê 1988

16 Adar ê 1988 an de li Kurdistana Başûr, li bajarê Helepçe bi gaza kîmyawî hate bombe kirin. 5000 hezar kes mirin, zêdeyî 20 hezar mirov jî birîndar û seqet bûn.

Qetlîamê di rûpela dîrokê de cîhê xwe yê bi xwînî girt. Hûnermendan ew qetlîam kirin tema xebata xwe. Maqale, şiîr, nivîsîn, resim çêkirin. Nalîn û qêrîna dayîk û zarokan bû mûsîka kurdan, resmê cendekê wan bûne afîş li hemû cîhanê belav bû. Hinek bîyanî bi rîya vê bûyerê bi pirsa kurd agahdar bûn, li ser pirsa Kurdî hûr bûn, xwestin bizanin çima ewqas derd û bela di ser wan de dibare. Li himber trajedîya Kurdan raya gelemperî ya cîhanê, reaksîyonek bûyerê heq kirîbû nehat nîşandan.

Rojnama Sovyet Pravda nivisî ku "tu belge tune ku Seddam li himber Kurdan gaza kîmyewî karanîye" di tirajedîya Kurdên Başûr de di Yekgirtîya Milletan de Nunerê Sowyet wek nunerê esil bê deng ma. Bê deng mana wan ji bo Seddam bû piştgirîyek mezin.

Lê wê wextê welatên Îslam li Kuveytê civîna Konferansa Îslaman pêk dianîn. Di civînê de ji bona jenosîda Kurdan tu gotin nehat kirin.

Li paytexta Îsraîl, Tel Avîvê bi xwepêşandinekê bûyer hat protestokirin. Di navnetewî de bo karanîna çekên kîmyewî dewleta Bexdayê hat mehkûm kirin û qedexekirina karanîna çekên kîmyewî hate pejirandin. Ew yeka gavekî baş bû, lê pirs ne tenê ew bû, divê mafê gelê Kurd bê naskirin.

Di vê babetê de berpirsîyarîyên exlaqî û polîtîk dikeve ser gelemperîya cîhanê, Yekgirtîya Miletan û dewletên endam.

Dewletên neyar piştgirîya hev dikin, dixwazin qetlîam a Helepçe vêşêrin. Tirkîyê rê neda sazîyên navnetewî derbazî Kurdistana Başûr bin, pispor û doxtorên wan kûştî û birîndaran qontrol bikin, ka çi cûre gaz hatîye kar anîn, ew tesbît bikin.

Rayedarên dewleta Tirk got, *"çima hûn bi doxtorên me qiyma xwe naynin, ew dibêjin ne gaza kîmyawî ye."*

Divê dewletên demoqrat û aşitîxwaz, pirsa Kurdî bibin pilatforma Yekgirtîya Miletan û ew li wir bêçareserkirin. Pirsa Kurd ku sedemê şer e, di merhela aşitîyê de ew dervayî pêvajoyê tê hiştin.

Me Hîroşîma Kurda Helepçe bîr nekir. Ew di dilê her Kurdîkî de birînek bi xwîn e. Şehîdên Helepçê di her sersalîya xwe de wê bêne bîranîn û dijmin bê qehir kirin. Îsal li seranserê Ewrûpa cîhê Kurd lê dijîn, wan tevî dostên xwe bi civîn, xwepêşandan û bi meş qetlîam protesto kirin.

Li Swêdê jî Kurdan bi hev ra çalakîyên baş li darxistin. Wek civîn, meş li ber balyozxanê Iraqê xwepêşandan pêk anîn. Bi van çalekîyan bûyera Helepçe û li himber gelê Kurd karanîna çekên kîmyewî hate tawanbar kirin.

Komela Karkerên Kurdistan Komkar- Swêd bi alîkarîya Pirtukxana Stat jî bi minasebeta protestokirina çekîn kîmyewî û qetlîama Helepçe di navbera rojên 24 ê Sibatê û 28 ê Adar a 1988 anda pêşangehek darxist. Dîsa li ser jenosîda Helepçe civînek hate çêkirin.

Nunerên sazîyên hûmanîter, hin parlamenterên Swêd, nunerên grubên Kurd cîh girtin û li ser jenosîdê dîtin û ramanên xwe anîn ziman.

### HELEPÇE

Berbanga sibê bû,
Zarok, dayik û bav di xev de bûn.
Xortên civan bûkên teze,
Di ber miraz de bûn.

Demsal bihar, meh Adar bû,
Bilbil bi gûl nu şad dibû.
Mirin, ji eziman de barî,
Pênç hezar dil û can mirin yek car.

Mirin jin û mêr,
Xort û mindal,
Yek roj yek car,
Pênç hezar dil û can mirin yek car.

Deng da newal û çeman,
Hêjandin per û bask têr û tûran.
Ji ezimanê Helepçê dûr çûn
Lê tu bêçare, ketî axa sar wek her car.
Pênç hezar dil û can mirin yek car.

Mirin, bi hev ra,

Yek deng û yek can,
Mirin wek hev,
Pênç hezar dil û can mirin yek car.
Ne dayik û bav in wan zarokan,
Ne xwedî xwarin û nan,
Gulle û şewat bû para wan.
Çiqas zilûm dî lawê Kurd,
Çiqasî berxwe da keça Kurd.

Stockholm-1988

TEVGERA RIZGARÎYA KUDISTAN
(TEVGER) 22 Heziran 1988

Piştî ceribandina UDG, Hevkarî, Yekitîya Çep, ji alî hêz û tevgerên Kurd ve Tevger hat damezrandin. Piştî ku xebata **Hevkarîyê** serneket, Komîta Merkezî ya PSK ê gihaşt wê qenaatê ku: Ji bona xebata hevkarîyê en hindik divê grub xwedî hêz û îstikrar bin. Lê partî û grubên Kurdistana Bakur, piştî derba leşkeri ya 12ê Îlonê perçe bibûn, xwîn wenda kiribûn û bê îstiqrar bûn. Ji ber wê bona hevkarîyê grub ne amade bûn, destpêkirina xebatek nû, ne di cîhê xwedabû.

Rastî jî hin grub, bê bingeh, bê endam bûn û rêxistêna xwe tune bûn. Piştî damezrandina Tevgerê ew rastîya zêtir derket holê. Hêzên endamê tevgerê nedikarîn li welat qadroyekî xwe bidin komîtê. Hêzên Kurd bi hev ra xebatê ra jî ne amade bûn, û ji Tevgerê fêm û daxwazîyên xwe cûdabûn. Tevî wê jî xebatên ku ji bo bûyerên rojane bi gruban ra hatin kirin, damezrandina Tevgerê da, dest pêkirin.

Di daxûyanî ya ku 22 Heziran 1988 an da bi zimanê Kurdî û Tirkî hat çapkirin û belavkirin da, damezrandina Tevgerê, tê destnîşankirin: "Em heşt hêzên şoreşger û welatperwerên perçên Kurdistana bin destê Tirkîyê hatin cem hev û me TEVGERA RIZGARÎYA KUDISTAN (bi navê kurdî TEVGER) damezirand. Armanca me ew e, ku em dawî li (dagirkirina) îşgala bîyanîyan a ser welatê xwe ku bi sedansalane dajo, li nîrê biyanî yê ser hustuyê milletê xwe û li rejîma kedxurî yê giran û zordarîyê binin; li Kurdistanê dewletek serbixwe û demoqratîk damezirînin; civakê ji paştemayina aborî, civakî û kûlturî xilaskin; têxin rîya pêşveçûnê."

Hêzên ku ji bona hevkarîyê hatin cem hev û daxuyanî îmzekirine ev in:

AR (Ala Rizgarî)

KUK-SE (Rizgarîxwazên Netewî Yên Kurdistan- Baskê Sosyalîst)

PARHÊZ (Partîya Hêza Welatparêz a Kurdistan)

PDK-RN (Partîya Demoqratî Kurdistan- Rêxistina Netewî

PPKK (Partîya Pêşeng a Karkerî Kurdistan)
PSKT (Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê)
ŞK (Şoreşgerên Kurdistan)
YSK (Yekitîya Sosyalîst a Kurdistan)

Damezrandina TEVGER ê hêvî da hêz û welatparêzên Kurd. Li hin welatên Ewrûpê komîte û buroyên Tevgerê hatin damezrandin. Bo nasandina bernamê û xebatên Tevgerê şev û civîn hatin çêkirin.

Lê mixabin Tevgerê nikarî xwe di welat de cîh bike. Ew bû tevgerek dervayî welat. Tevgerê him azadkirina gel û welatekî dabû ber xwe, him jî nedikarî di wî welatî de xebata sîyasî bike.

Tevgerê hêz û quweta xwe ji grubên endam digirt, hêza gruban jî qels bû. Bona ko merkez û komîtên Tevgerê li dervayî welat bûn, di civîn û xebata xwe de wexta xwe piranî de xebata derva. Xebatên derva li xebatên welat kêm tesîr kir. Esas xebata nava welat dikarîya li ser dîaspora Kurd tesîrek baş bike.

Têkilîyên hêzên nava Tevgerê jî nebaşbûn û organên tevgerê meşxul dikirin. Bi navê rexnê ji hev ra hin nivîs û gotinên hişk digotin, wê jî li ser bingeh tesîrên ne baş kir, zerar de Tevgerê.

Li ewrûpê komîta weşanan bi navê Tevgerê rojnamek derdixist. Lê rojname du mehan de carê dertê, heta ku diket deste xwendevanan nivîs û nûçên xwe kevn dibûn. Rojname li gorî program û bingeha Tevgerê nebû. Ji ber vê hin endamên komîta weşanê dixwestin rojnama Tevgerê ku li dervayî welat tê weşandin bê rawestin û li welat rojnamek bê derxistin.

Bo ku li welat bikarin kovar, rojname derxinin, pir hewldan hatin kirin. 1990.08.8 de li welat 3 kes ji bo komîta weşanê hatîbû, destnîşankirin, lê ser neket. Xasima piştî ku zagona 412. hate pejirandin, li welat derxistina rojnamê çetintir bû. Tevgerê ji bo kongrek netewî bi hêzên kurdistana Başûr û Rojhilat ra têkilî danî, hewl da lê ew jî serneket.

Komita Merkezî ya Partîya Sosyalîst a Kurdistan civîna xwe ya di 1990.10.27 an de li ser rewşa Tevgerê jî sekinî. Hin endamên Komîta Merkezî ya PSK ê ji ber rewşa Tevgerê ya heyî xwastin Tevger ji holê bê rakirin an jî PSK xwe ji tevgerê bikişîne. Lê piranîya komîtê ew dîtin şaş dît, şîret kir, ku qet nebe, di vê pêvajoyê de ew xebat bê ajotin.

Belavbûna tevgerê di pir alîyan va dikarî zerarê bîne. Kiriza Rojhilatanavîn ko xwe nêzik dike, belavbûna Tevgerê şaş bû. Rewş di civîna kongra Tevgerê de bê nîqaşkirin. Li ser sedemên heyî vekirî bê rawestin. Bi hin pêşniyarên çêker, carek din tevî grubên endam li ser rewşê, bipeyîvin.

Sal derbaz bûn lê li welat merkezî xebatek nehat kirin. Xebata Tevgerê êdî bawerî nade grubên endam jî, di pratîkê de tevger hatîbû xitimandin. Îro guhartina rewşa wê ji

ne mimkun bû. Li derva piştî hin xebatan Tevgerê hêza xwe wendakir, sala 1997 de komîta Tevgerê xwe feshkir û dawî li Tevgerê hat.

* * *

Di Kongra Tevgerê ya 8 ê Avrîl 1990 de em sê kes, Seyîtxan sekreterê-nunerê-KUK-SE (Rizgarîxwazên Netewî Yên Kurdistan- Baskê Sosyalîst), Mahmut Kîper nunerê PPKK, (Partîya Pêşeng a Karkerî Kurdistan), Kazim Budak nunerê PSK (Partîya Sosyalîst a Kurdistan) wek Komîta Rêvabir hatin bijartin. Komîta me 19 ê Avrîlê civîya di nava xwe de kar dabeş kir. Berpirsîyarîya malî ya Tevgerê Mahmut Kîper girt. Serokatîya komîtê bi Seyîtxan destpêkir, lê bi dor tê rêve birin.

Komîtê, belavoka encamê ya komcivîna Tevgerê ji nunerên xwe yê li herêman ra şand.

Rewş û xebata Tevgerê ji berçav ra derbaz kir. Me dî ku dora du salane Tevger ava bûye, kar û xebat tê kirin, kesên ku Tevgerê ra alîkarî dikin hene. Lê hîn jî li gelek bajarên Ewrûpê komîte tune.

PPKK ê li Elmanyê, hevalê ku ji bo komîtê pêşniyar kirîye ji cîhê civînê 250 km dûr rudine, ji ber wê komîta Elmanyê jî, ne temam e, ji çar kesan pêk tê. Lewma ew wek "Komîta Piştgir" dixebit in.

Li welat jî nunerê PSK û PPKK hewl didin lê hîn jî komîtak rêk û pêk nehatîye danîn. Komîta me biryar girt ku:

- Li welat û dervayî welat bona damezrandina komîtan, têkilî dayne û bixebite. Li welat hêzên di nava Tevgerê dane bi hev ra sazîyên demoqratîk û komîtan ava bikin. Nuçeyên welat bi şopanin u helwest bêgirtin.

- Komîta me bi namekê, banga Rizgarîyê, ya bo yekitîyê "Enîya taaruza Netewî" bersivand. Di namê de carek din hat dubare kirin ku ew bên, di nav refê Tevgerê de cî bigirin.

-Hikûmat di dewsa zagonan da, bo derxistina hin "Qerarnaman" hewl dide. Qerarnama ku li ser masmedya yê, li ser sendîqayan, li ser sazîyên ku mafê mirovan diparêzin, li ser weşan û zimanê Kurdî û gelê Kurd, karanîna terorê ferz dike "Qerarnama 412 an" derxist. Bi rîya hêzên endamê Tevger ê têkilî hate danîn ku, bingeh li welat û dervayî welat li himber "Qerarnama 412 an" zagona terorê, bê deng nemîne, çalakîyan li darxine.

- Bona ku ew li himber Qerarnama 412 an û zilm û zordarîya li ser gelê Kurd tê kirin derkevin, ser navê komîta Tevgerê ji parlamenterên Kurd ra namek vekirî hat nivisîn û ji 40 parlamenterî ra hat şandin. Name ji alî Komîta Tevgerê a Karê Derva (serokê PPKK M. Alî Çilgin) ve hat nivisîn.

- Di 22 Avrîl 1990 de serokê Tevgera Sosyalîst a Kurdistan Zekî Adsiz li Elmanyê wefaat kir. Ji bona di merasîmê de ser navê Tevgerê beşdar bibe û bona şandina cinaze alîkarîyê bike, li Elmanyê hevalek hat wezîfedar kirin.

Di civîna komîta Tevgerê ya 26 ê Avrîlê de biryar hate girtin ku, zilma li gelê Kurd tê kirin bi pulên slogan li ser nivisî, bi "pulkirin"ê bê protesto kirin. Ji bona wê jî 8 hezar pul bi zimanê Îngîlîzî hat amadekirin û li hin bajarên Ewrûpa hat belavkirin. Sloganên li ser pulan hatîbûn nivisîn ew bûn:

a ) Ji qetlîamên li Kurdistanê dibin ra bêje bes e..

b ) Piştgirîya têkoşîna gelê Kurd bike!

c ) Ji sirgun û valakirina Kurdistanê ra na!

d) Mere Tirkîyê û mebe piştgirê zilmê!

- Di meha Gulanê da, bi rîya Komîta Karê Derva, ji sekreterê Yekitîya Miletan, serokê Parlamena Ewrûpa û hin kes û sazîyên navnetewî ra namek hate şandin. Di namê de di derheqê "Qerarnama 412" agahî tê dayîn û tê daxwazkirin ku ew li himber vê zagona terorê dengê xwe derxinin.

- Dîsa li ser vê babetê min namek amadekir, (Sertaç Bucak ev wergerand Îngîlîzî) bi navê Mustafa Firatli me ji Sekreterê Yekgirtî ya Miletan Perez de Cuellar ra şand.

- Komîta Tevgerê li ser rudanên Komela Karkerên Kurdistanê- Londra û nivîsa ku di Kovara Yekitîya sosyalîst de hatîye weşandin rawestîya. Komîta rêvabira Tevgerê, nivîs hişk û ji dervayî pîvanê rexnê dît. Bona ku bala Kovara Yekitîya sosyalîst bikişîne, komîtê bi dengê piranî[78] biryar girt, ji serokê Yekitîya Sosyalîst, Îbrahîm Gûçlû ra namek nivîsî.

Di name de tê gotin ku" Yekitîya Sosyalîst di hêjmara xwe ya 23em de li ser bûyerên Komela Karkerên Kurdistan- Londra yê nivîsek weşandîye. "Li gorî bawerîya komîta me di nivîsê de li himber PSKê rexnên neheq hatine kirin. Wek mînak em dikarin bidin: *"Taktîkên ku dijminê me heya roja îro bo ku gelê me parçe bike û îdarebike, bi karanîne, PSK ji bo menfaatên xwe yên gurubî wan bi kartîne", (... ) "Bi zanetî ji Tevgerê ra neyartîyê dike."*

Komîta me di wê gumanê de ye, ku uslubên usa di rojên hatî de dikare têkilîyên navbera hêzên nava tevgerê xira bike, zerar bîne. Ber vê yekê dive em di rexnên xwe de lazime zêtir bi berpirsîyarî û balkêş tevbigerin. Daxwaza me ji we, hun jî nuha pêve di wê mijarê de zêtir haydarbin. Di xebatên we de serkeftin daxwaz dikin û silav.

---

[78] Ez li himber namenivîsînê derketim. Di nava ewqas xebat û pirsan da name nivisîn, me wext wenda dikir. Sedemek din jî ew bû ku PSK teref bû û ser navê PSK ê ez di komîtê dabûm. Dikarîya şaş bihatana fêmkirin. Usa jî bû. Piştî namê di ciwîna yekem da Îbrahîm, xwest nivisîna namê bi min ve girê bide, lê hevalan dane zanîn ku ez li dijî name nivisînê bûme.

-21 Heziran 1990 de serokê Komela Mafê Mirovan a Dîyarbekir Hatîp Dîcle û ya Sêrtê Av. Zûbeyîr Aydar û serok Partîya SosyalîsFerît Îlsever ji di nav de heyetekê gundê Çevrîmlî-Gerê zîyaretkirin.

Heyetê qetlîam û wehşeta ku li gund qewimî ye kirîye rapor û ragîhandîye medyayê. Lê ji ber sansurên ku bi qeramaman ve hatîye xurtkirin rojnaman cîh nedan vê raporê. Me rapora Gerê yê ji hemû nuner û piştgirên Tevgerê yên derva şand, de ku ew wergerînin zimanê welatê ku lê dijîn û belav bikin.

- Kampanya ku li himber zindankirina Îsmaîl BEŞÎKÇÎ bi komkirina îmzan dihate rêvabirin Tevgerê jî aktîv piştgirî kir, me suretek ji îmzên komkirî ji serokkomarê Tirkîyê ra şand.

Wek me jor jî gotîbû, serokatîya komita Tevgerê bi dor bû. Di civîna 12.01.1991 an da, serokatîya komîtê min, karê malî jî Seyîtxan girt.

Komîta me peryodîk,10 rojan de care di civîya, lê pir caran ji bona pêwîstîyê, heftê 2-3 caran jî em diciviyan.

Hin caran gotinekê ku di belavokê de cîh girtîbû dikarîya li ser çend civîn bihatana çêkirin.

Li ser şerê Xalîçê, wek komîta Tevgerê em peyîvîn, ka Tevger dikare çi bike? Tevgerê di civîna 24.01.1991 an li ser du xalan biryar girt:

1. Belavok bê nivisandin.

2. Li Stockholm û welatê Ewrûpê yên din ji gel ra vekirî civîn bên darxistin. Nunerên hemû grub û hêzên Kurdîstanî bikarin di civînê de beşdar bin û dîtinên xwe bînin ziman.

Belavok ji alî me ve hat nivisîn û di civîna 28.01 1991 de bi hin serastkirinên piçûk ve hat pejirandin. Lê endamê komîtê, nunerê PPKK şev telefonî min kir, xwest, ku em hevûdû bibînin. Di hevdîtina me ya 30.01.1991 de li ser naveroka belavokê wî îtarazên xwe zêde kirîbû. Digot,*"şerê li himber Iraqê me eleqeder nake, em ne li dijî şerê Emerîqê û Iraqê ne, ne lazime dîtinên sosyalîstî di belavokê de cî bigirin. hwd."*

Me hevalê komîtê ya sehem jî agahdar kir ku, di 4 ê Sibatê em hevûdû bibînin. Lê wê rojê nunerê PPKK nekarî bê, min û nunerê KUK-SE hevûdû dît û di belavokê de tu guhertin çênebû, ango taslax hat pejirandin. Roja din me xwest em sê alî hev bibînin, nunerê PPKK dîsa nekarî bê. Dawî di 6 ê Sibatê de piştî ku wî jî erê got, me belavok çapkir û belavkir. Hin caran nîqaşên ser şikil ji naveroka pirsê zêtir wext û ked digirt.

Dixwazim bidim nîşandan ku em bi hev ra xebatê de zêde ne xwedî tecrube bûn. Tiştên piçûk dikarîyan gelek wextê me bigirta.

2. Li Stockholmê di 24 ê Sibatê 1991 de jî civînek freh, ji gel ra vekirî hat çêkirin. Di civînê de nunerê Tevgerê, nunerê PDK-Îran û nunerê Enîya Kurdistana Başûr, hin hêzên ji Rojava û Bakûr jî bejdar bûn û nirînên xwe anîn ziman.

- Kovara Yûzyilê, li ser zagona 2932 an de çêbûna hin guhartinên piçûk, ji Komîta Tevgerê *"li Tirkîyê pêşketina demoqrasîyê û azad bûna zimanê Kurdî"* şirovek girt û qismek jê weşand.

Di bersiva tevgerê de hatîbu dest nişan kirin ku, hikûmatê di qanûna 2932 an, (xeynî Tirkî zimanên din qedexe dike) de hin guhartinên piçûk kirîne. Lê ew guhartinên piçûk astengîyên li ber zimanê Kurdî ranakin. Heta ew zagon binve bê rakirin, dîsa jî zimanê Kurdî nikare azad be. Bo ku hîn gelek zagonên din, yên ku bi Kurdî xwendin û nivisandinê qedexe dikin hene. Bona wê zimanê Kurdî azad ne bûye. Kesên ku bi zimanê Kurdî nivîsikê, an pirtûkekê binivise wê bi mîlyon lîre ve tê cezakirin, bi wî awayî mirov dikare bêje ku bi Kurdi xwendin û nivisandin azad e? Ew yeka pêkenîye!

Bona ku ziman azad be, divê ew, bi devikî û niviskî di her alî jîyanê de bê karanîn. Tenê di malan û kuçan de bi Kurdî peyvandin ne tiştekî nû ye û ew nayê mana azadbûna zimanê Kurdî. Ji xwe gelê Kurd tewî zor û zilma dijmin dîsa jî her wext zimanê xwe bi karanîye.

- Piştî şerê Kuweytê, hêzên Emerîqa û Rojava zora Seddam birin, û hêzên xwe şûve kişandin. Seddamê har berê xwe de gelê Kurd, bi tanq û topan, bi fuzeyên scud, bombên fosfor û napalm êrîşê ser gelê me kir. Ji ber tecruba qetlîama Helepçe jî gelê me cîh û warên xwe terikand û ber bi sînoran revî.

Li gorî medya cîhanê li Kurdistana Başûr rewş gelek xirab e û pirs pir aktuele. Wek gelek hêzên polîtîk û sazîyên berpirsîyar komîta me jî 12.4.1991 an de civîya û li ser rewşa Kurdistana Başûr a dawîn rawestiya. Karê ku dikare bike tesbît kir.

1- Bi hêz û partîyên Kurdîstanî ra civînek bê darxistin.

2- Li ber avahîya Yekgirtîya Miletan û li ber derê balyozxana Iraqê xwepêşandan bêne kirin.

3- Ji bona alîkarîya maddî tevî hêzên din komîtak bê damezrandin.

4- Belavokek bê nivisandin û belavkirin. Belavok me amadekir û di civîna 16.04 1991 an de bi alîkarîya endamên komîtê hin serastkirin hatine kirin û di eynî rojê de me mîzanpaja wê çêkir û belavkir.

**BERSIVA PIRSA DENGÊ KOMKAR**[79]

Piştî şerê Kuveytê Seddam Husên bona ku rewşa xwe nebaş bû xwe nêzikî hêzê Kurd dikir. Bona wê lîderê Kurd ra têkilî danî. Di navbera Enîya Kurdistana Başûr û Seddam Husên de hevdîtin çêbû. Ser vê yeke Kovara Dengê Komkar ê ser vê hevdîtinê dîtina Tevgerê pirsî bu, ser navê Komîta Tevgerê min ew bersiva jêr dabû.

*"Hêzên ku di şîar û programên wan de hedefa otonomîyê heye û ji bona wê şer dikin, dema ku lazim be, ji bona pêkanîna otonomîyê ew dikanin hevdîtinan jî çekên. Ji ber vê yeka ser navê Enîya Kurdistan a Başûr bi hikûmata Bexdayê ra hevdîtinê em bi prensîb di cîh de dibînin.*

*Hemû partîyên Kurdistana Başûr bi salane di binê slogana"Ji Kurdistanê ra otonomî, Iraqê ra demoqrasî" berxwe didin. Rejîma Bexdayê îro jî bi vê wesfa xwe ne dikare demoqrasîyê bîne Iraqê, ne jî dikare otonomîyê bîne Kurdistanê.*

*Lê dîsa jî şertên heyî yên objektîf li gorî daxwazîyên hêzên mixalefeta Kurdistana Başûr şansa pêkanîna otonomîke demoqratîk ji her wextê daha mimkûn xûya dike.*

*Çimku, hêzên welatparêz ji alî yekbûn û hevkarîyê ve dema xwe ya en baş dijîn.*

*Enîya Kurdistana Başûr wek merkezî otorîte di asta bilind de tekoşîna xwe rêva dibe. Ew yeka rewşeke baş e û li hember dijmin awantajek e.*

*Beranberî vê yekê hêzê dijmin ji her wextê zêtir bê moral, jar û qels e. Piştî şerê Kuveytê, Seddam bi şertên giran, hêzên Emerîqî ra li hev hat. Leşkerên welatên rojava axa Iraqê naterikînin. Ew yeka Bexdayê dike fikaran, him hela leşkerî, him ji hela ekonomîk û polîtîk ve Bexdayê diçewisîne.*

*Seddamê dîktotor bikare leşkerê bîyanî ji welatê xwe derxine lazim e gavekê zû bi Kurda ra li hev bê.*

*Raya giştî ya cîhanî ya aşitîxwaz û mirovhez jî piştgirîya gelê Kurd dike.*

*Encax, bo hevdîtinan ecele hatîye kirin. Bûyêrên bi xûnî hîn teze ne û gelê me ref bi ref ji welatê xwe tê derxistin ji bo hevdîtinên bi hikûmatê ra demek ne baş e.*

*Raya gelê cîhanê ku li himber trajedîya Kurd ewqas hesas e, hîn jî ji hevdîtinan tu encam derneketiye. Di TV. de weşandina hevdîtinên serokên Kurdan (Celal Talabanî, Mesud Berzan û Samî Rahaman) bi Seddam ra piştgirîya rayagel dikare kêm bike.*

*Vê hevdîtina bi Seddam ra çewsandina raya gelê navnetewî ya ser Seddam kêm kir û propaxanda masmedya li himber wî daxist.*

*Di cîhê Bexdayê hevdîtin di welatekî Ewrûpayê de û di binê çavdêrîya Yekgirtîya Milletan de çêbûna pirs zêtir dibû navnetewî.*

[79] Ew bersiv ser nave Tevgerê min nivîsî, bi zimanê Tirkî di Dengê Komkar hêjmar 131 da hat weşandin.

*Di qarektera rejîma Baas de tu guhartin tune. Ew îro mecbûr bûye lewma, xwe war dide xuyakirin.*

*Heya li Iraqê rejîmek demoqratîk çênebe, li Kurdistanê temînata otonomîyê gelek qels e. Bi vê minasebetê otonomî dive bi hin temînatên navnetewî bê parastin.*

*Mina peymana ku di sala 1970a hatîbû îmze kirin. Peymanên ser kaxizan ji alî dewleta Iraqê ve hêsanî ji hole tên rakir in.*

*Îro rejîma Bexdayê helwestekî erênî nîşande jî, eger otonomî ji alî Yekgirtîya Milletan va neyê parastin, şik tune, Seddam dema ku ortamê kêrî xwe bibîne êrîş bike û wê ji navendê rake.Pir tecrube û belge hene ku meriv bi sozên Seddam bawerîyê xwe neyne.*

### Şehîdkirina Dr. Abddurrahman QASIMLO [80]

1989-07-14

Sibê de zû birayê min Sîdar telefon kir. Telefonên ku bêwext tên, her tim min ditirsîne. Îro jî bi vê telefonê ez ketim nava şike. *"Gelo vê carê çi xirabî qewimî?"* Ji ber ku mirina Kekê Mistefê saet 06 an de, ya Cîgerxwîn saet 07 de bi rîya telefonê em hatîbûn agahdar kirin. Kuştina Olof Palme jî saet 02.30 şefê brayê min ye Londrê Dîyar em xeberdar kirîbû. Telefona îro jî ez gelek tirsandim. Min bi tirs telefon rakir, mixabin agahîya ku min girt ji bona gelê Kurd xeberek reş û bi jan bû. Dr. Abdurrahman Qasimlo û du hevalên wî li Vîyanayê hatîbun şehîd kirin.

Bo ku em pirsê frehî fêm bikin, min hindek masmedya cîhanê qontrol kir. Buyêr hat piştrastkirin. Li gorî agahîyan navbera karbidestên dewleta Îran û nunerên PDK-Îran de di roja 12.07.1989 de hevdîtinan destpêkirîye. Dora roja din 13.07.89 an da, di rûniştina duyem da, saet di navbera 17:00 -19:00 de ew kuştin pêk anîne.

Piştî saet 19:00 an ku hatina Qasimlo dereng dikeve, ew nayê, hevalên wî çûne mala ku cîvîn lê çê dibe. Li wir dîne ku her sê nunerên Partî ya Demoqrat a Kurdistan hatine kuştin û polês berî wan hatîye wê derê û dest dayê ser bûyerê. Li gorî nûçeyan qaşo ji bona çareserîya pirsgirêka Kurd dewleta ayettulehan xwastiye bi qasidên Kurdara hevdîtin çêkin.

Kesên ku hatine şehîd kirin serokê PDKÎ Dr. Qasimlo, dîsa nunerê wê partîyê, ye Parîsê, Abdullahî Qadirî, welatparêzekî ji Kurdistana Başûr- xwedîyê malê Dr. Fazil Mehmed Resûl in. Hikûmata Vîyanê dewleta Îranê wek mucrîm dest nişan kir jî, kes nehat ceza kirin.

---

[80] Kovara Roja Nû da ser jîyana Qasimlo nivîsik min hatîye weşandin.

Lîstikên Ecem û Osmanîyan li ser Kurdan gelek in. Lê Kurd herçiqas xwedî tecrubene jî her car dîsa jî têne xapandin. 50 salî berê Simko jî bi bêbextî nehatîbû kuştin?

Rojên bêyî dc hin tişt wê baştir zelal bin. Çend rojan berî bûyerê, Dr. Qasimlo hatîbû Stockholmê. Berpirsîyarê Partî demoqrat Kurdîstan-Îran Îbrahîm Çorapci ji min re telefon kir û got: "Kek Qasimlo li vir e, îro saet 17.00 de li nêzî balyozxana Fransiz di cafê ... de dixwaze bi berpirsîyarên Kurd ra hevdîtin çêke. Hevalê we jî bikarin bên civînê wê baş bibe."

Lê min di cîh de ji cîhê hevdîtinê re îtiraz kir. Min got: çima civîn di komela me, li Komkarê çê nabe, eger ev der nabe mala min fire ye, em li vir çêkin. Li cafeteryan çawa civîn çê dibe?

Lê tesaduf wê demê K. Burkay, Z. Acar û hin hevalên din, li mala me di civînê dabûn, wan jî li min guhdarî dikir.

Me di nava xwe de guftugoh kir hevalan got: *"bersiva te di cîdabû, em ji bona ewlekarîyê difikirin, lê dikare ku şaş bê fêhmkirin. Bêjin vana çiqasî tirsonek in, em dîsa jî herin "*

Min ji Îbrahîm ra telefon vekir û got; heval di wê saetê de li wê derê bin. Serok û nunerên partîyên Kurd yên li Swêdê du rojan li vê derê, di qehwê de civîyan. Bi bihîstina xebera bi hikûmata Îranê ra hevdîtinê, ez ecêp mayî mam. Ji ber ku çend rojan berê Qasimlo bi berpirsîyarên Kurda ra hevdîtin çêkirî bû. Di hevdîtinê de berpirsyarên cepha Iraqê, berpirsîyarên Kurdistana Bakur (Tevger) amade bibûn. Lê di derheqê hevdîtina bi dewleta Îranê ra ji wan ra tu tiştek negotî bû.

Dr. Qasimlo, K. Burkay, C.Talabanî û H. Dewrêş ji 1978 an vir da, bona di seranserê Kurdistanê de damezrandina enîyek netewî nava hevldanekê dabûn. Lê dîsa jî Qasimlo ji tu lîdrekî re hevdîtina xwe û Îranê parve nekirîbû. Min ji Kemal Burkay jî pirsî Qasimlo, ji wî re jî qala hevdîtinan nekirî bû. Wî têkilîyên xwe yê bi Îranê ji dostên xwe yên Kurd vêdişart.

Di dawî ya 1983 an de Celal Talebanî jî tenê bi serê xwe çû bi dîktatorê Bexdayê –Seddam Husên ra- rûniştîbû. Wî jî xeber neda tu kesî. Halbûku wê wextê Yekitî ya Nîştiman (YN), Partî Komînîst Iraq (PKI), Partî Sosyalîst Kurdistan Iraq (PSKI), û Partî sosyalîst Kurdistan (PASOK) bi hev re di Enîya Neteweyî ya Demoqratîk (Cewqet) dabûn. Yekitîyê agahî nedabû wan jî. Lewma li ser wê bûyerê bi banga CUD ê rêxistinên Kurdistanî li Şamê di 1984.02.4 de civînek li darxisti bûn, çûyîna Talabanî ya Bexdadê protesto kirîbûn.

Tu hêzikê, enîyekê an jî lîderikî Kurd ji hevdîtinên Qasimlo xebera xwe tune bû. Di civîna Stockholmê de jî Qasimlo ji kesîre qala hevditinên bi Îranê ra nekirîbû. Nunerên Tevgerê, yên Cewqet (enîya hêzên Kurdistana Başûr) ê û kesên din beşdari civînê bûn, lê ew agahî nedabû wan.

Lê çawa meriv bikare bêje ku Kurd bi hev bawer in û ew seranserê Kurdistanê de dikarin bi hev re bixebitin, an jî enîyek netewî dikarin deynin? Dijmin dixwaze dîrokê bide dubare kirin. Bi sedan sale ku gelê Kurd di coxrafya xwe de şehîd dide, berxwe dide. Bi hezaran zarok, jin, kal û pîr bi metodên hovane têne qetil kirin. Dijmin wê kingê bi xwîna Kurdan têr bibe? Ma bi destê dijmin kuştin ji bo Kurdan qeder e?

Xûyaye ku dijminê bêbext nikare li çîya û gundên Kurdistanê agirê azadî û berxwedanê vemirîn e. Dixwaze bi rîya hîleyan serkeve. Lê gelê Kurd wê rê nede ku dijmin di daxwazîyên xwe de serkeve.

Li gelêk bajarên Ewrûpa bo protestokirina bûyerê civîn û xwepêşandin hatin darxistin. Li Stockholmê jî li Kîsta Trefê de civînek hate darxistin. Nunerên sazî û partîyên Kurd li wir peyîvîn û bûyer protesto kirin. Bi navê PSK min jî li ser vê bûyera trajîk axavitinek kir.

Qasimlo 20 Tîrmeh 1989 an de li Parîsê li goristana Pere Lachaîse hat binax kirin. Kurdên li Stockholmê dijîn di nava xwe de pere komkirin, balafirek kirê kirin çûn Parîsê cinazê Qasimlo û hevalên wî. Ez û Kemal Burkay jî ser navê partîya me çûn di cinaze de beşdar bûn.

**Civîna dawîn a Komita Merkezî dervayî welat**

Komîta merkezî ya Partî Sosyalist Kurdistan cara dawî 1990.10.27 an de li Stockholmê civîya. Komîtê xwe fes kir hemû wezîfe û berpirsîyarî derbazî hindurê welat kir. Deh sal bû Komîta Merkezî, ji derva alikariya xebata nav welat dikir. Lê di pratîkê de hevalên welat xebat girtibûn ser xwe.

Ji derva îdare kirina partîyê him çetin bû, him jî ne rast bû. Ya rast kesên ku li welat dixebitiyan divîya bû berpirsîyarîya politîk jî bigirta ser xwe. Berê jî çend caran li ser vê yeka hatîbû peyvandin, lê tirsa komîtê ew bû ku atmosfera welat ne munasiv be.

Di vê civîna de jî, li ser hat peyîvîn, ku komita merkezî jî, sekretere komîtê jî, ji nava hevalên welatda bên bijartin. Hin gumanê me hebûn lê hevalên ji kar ra amade bûn jî hebû. Li gorî qabîlîyetê, ji endaman lazim bû komîtek bihatana bijartin

**Zîya**: Komîta ku em dixwazin li welat bê çêkirin ji hin pêwîstiyên bêgav tê. Biryara me bi îsabet e. Lê kesên ku ji welat nu têne bijartin divê kêm bin. Ji min ra usa tê ku em ewlekarîyî zêde nagirin nezerê.

**Memo:** Merhaleke nû ye, divê bo ewlehkarîyê em pir bi tedbir tevbigerin. Li Kurdistanê tevgerek me ya têkûz tune, kar û bar li ser mile hin hevalanin.

**Kazim:** Em hemû dixwazin komite derbazî welat be. Lê şiklê bijartina komîtê şaş e. Komîtê ne em, kongre, an jî platformek freh bibijêr e. Divê ew bêne bijartin, ne tayin kirin.

Kesên ku bûne hedefa êrîşê polês, deşifre bûne di komîtê de neyne wezîfedar kirin. Ez di wê baweriyê de ninim ku hevalên nava welat bikarin xebatek ber biçav organize bikin. Komîta divê li Kurdistanê, Dîyarbekir an jî bajarekî din ji xwe ra bike merkez. Çawa ku demikê li Enqerê, niha jî li Stenbolê xebat tê îdarekirin dawî lê bê. Wek Mistefa Kemal çawa çû li Kurdistanê kongre pêkanîn, serokên Kurdan jî li Stenbolê rudiniştin, dixwastin îdara Kurdistanê ji wir rêva bibin. Eger em jî, îro nerin Kurdistanê, roja ku em bixwazin jî vê dereng be. Eşkîya rîyan bigire.

**Abdullah:** Ji bo sekreteriyê serastkirinek nû ne hewceye, pêşniyarek usa berê hatîbû kirin, lê li welat ew pêşniyar nahatîbû pejirandin.

Komîta ku li vir tê bijartin Burkay, E..... û M........ pêşniyar dikim. Tenduristîya min ne baş e, ez nikarim, berpirsîyarîyê bigirim.

**Husên:** Piranîya komîtê li welat be. Li welat komita cigir jî bê bijartin. Alîgirê sekreter ji nava hevalên welat bê bijartin.

**Unal:** Ez jî di wê baweriyê de ninim ku hevalên nava welat xebatek ber biçav organize bikin. U... û X... li bûyeran sêrdikin. Ji meha Adarê vir de hîn necivîne. Kesên ku ji bo komîtê tên bijartin, ji yek herêmê bin wê baş be. Lê divê komîtak cîgir jî bê bijartin.

Hemû hevalan dîtinên xwe gotin, bi tevayî gîhaştin wê encamê ku, komîta merkezî ji nav havalên li welat bê bijartin.

Dawîyê, komita merkezî ya ku di kongra 1985 an de hatîbû bijartin, komita merkezîya nû bijart û wezîfa xwe dewrî komita nû kir û bi daxwazîya xwe jî dev ji Komîta merkezî berda, tarîx 1990.10.28 bû.

**Konferansa Stockholmê 15-17 adar 1991**

Di van salên dawîn de li welatên Ewrûpa bona ku pirsên gelê Kurd bidin nasîn û bikin rojevê hin konferans hatin darxistin.

Konferansa yekem 1989 an de li bajarê Bremenê hat çêkirin û gelek biryarên pêşketî hatin girtin. Hin hêz û şexsîyetên Kurd, dostên wan ji vê konferansa serkewti ceseret girtin û bona konferansên din hewl dan.

Bi însîyatîfa, "*Komîta Swêd a Mafên Mirovan Ji Bo Gelê Kurd*" di navbera 15-17 Adara 1991 an de li Stockholmê konferansek darxist.

Di konferansê de ji hemû perçên Kurdistanê nêzî 200 nunerên partî, sazîyên çandî û kesên navdar amade bûn. Dora 60 kesî jî nunerên sazîyên navnetewî a humanîter û rojnemevan beşdar bûn.

Di konferansê da, Sekreterê Partî ya Çep a berê C. H. Hermanson, Wezîra Penaberan a Swêd Maj-Lîs Lööv, pisporê hiquqê ya navnetewî Prof. Richard Falk, Wezîra Swêd a kevnare Karîn Söder, serokê komîta ku konferans amadekir û sekreterê kevnare ya Amnesty Thomas Hammerberg, Prof. Norweçî, Johan Galtung, nivîskarê îngilîz Dawîd Mc Dowell, nunerê Enîya Kurdistana Başûr Mahmud Osman, Hoşyar Zebarî, Serokê Partî Demoqrat Kurd Pêşverû li Sûrî Hemîd Dewrêş, serokê Partî Demoqrat Kurdistan Sûrî Kemal Ehmed, nunerê Tevgerê M.Alî Çilgin û Kazim Budak navên serbixwe Îsmet Şerîf Vanli, Omer Şêxmûs, Saleh Muqtedî, Alî Sincarî, Îbrahîm Ehmed, Şêx Îzettin Huseynî, Prof. Şakirê Xido, Prof. Nadirof û hin nunerên Komele û saziyên demoqratîk û rojnamevan beşdar bûn.

Konferansê, bi axaavitina serokê komîtê, Sekreterê Partî ya Çep a berê C. H. Hermanson dest pêkir.

Civîn ji alî wezîra Swêd a kevnare Karîn Söder û serokê Partiya Sosyalist a Kurdistanê Mahmud Osman ve hat rêva birin.

Axavitina yekem Wezîr a Penaberan Maj-Lîs Lööv kir. Ew zêtir li ser rewşa Kurdên li dervayî welat rawestîya. Got; ji wan ra alîkarî bê kirin û ew bikarin ziman, kûltûr û adetên xwe bi parêzin. Û firsend bê dayîn ku welatên kurd lê dijîn bikarin jîyana ekonomîk û sîyasî de cîh bigirin. Bi kurtî bi zimanekî dîplomatîk kar û barên demoqratîk anî ziman, lê ji alî polîtîk ra çavê xwe girt.

Di konferansê de kesên polîtîkvan, pispor û ronakbîr dîtin û dostanîyên xwe pêşkeşî gelê Kurd kirin. Armanca konferansê ev bu ku rewşa gelê Kurd bi çavê pisporên bîyanî bê nîqaşkirin. Lê hêjmara pispor û polîtîkvanan kêm bû.

Ji beşdarwanan yek jî, nivîskarê Îng. Mr. Davîd Mc Dowell bû. Di konferansê de li ser perspektîva pirsa netewa Kurd a polîtîk axavitinek kir. Di peyva xwe de caşên îro û Alayên Hamîdîyê beranberî hev kir û got ew organîzasyonên ku li ser eşîrtîyê têne çêkirin, yekitîya Kurdan û hêza wan qels dike. Alayên Hemîdyê li himberî Elewî û Ermenîyan çawa hatin kar anîn, cerdevan- parêzgerên gûndan jî îro li himberî daxwazên gelê Kurd usa tên karanîn. Karên olî û axîretê li himber gelê Kurd bi xayîntî tê xebitandin. Kamuran Înan axa ye û alîkarê dewletê ye. Gûndîyên Kurd % 80 bê ax in lê, axayên xwedî pir ax jî ji dewletê piştgirî ya eknomîk, krêdî digirin dewlemendtir dibin.

Yekgirtina Milletan û sazîyê navnetewî yên din li himberî trajedî ya Kurdan bê deng in.

Got:*"Eger ku Kurdan hêza xwe bikirina yek û bizanina ku ew çi dixwazin, dikarîyan pirsa xwe safî bikira. Îro jî lazime, biryara xwe bidin ew çi dixwazin. Otonomî an Kurdistaneke serbixwe dixwazin? (...) hîn jî ew ne zelal e."*

Hans Göran Frank parêzer û parlamenterê kevn a Swêd, got ku, *"di nava dîtinên Kurda de tevlîhevî heye. Otonomî an serxwebûn? Dikarin bêjin ku welatê me heye, em*

*dewlet û welatekî azad dixwazin. Cephekî Kurdî çê bikin. Ewrûpî jî bikarin we fêm bikin."*

Dîsa di wê konferansê de Profesorê Norwecî Johan Galtung jî got, *"bîra mekin ku li ruyê erdê 4000 netew heye, lê tenê 150 netewî dewleta xwe heye. (......) Kurd jî, divê dewlet bûnê, ji hişê xwe qet dernexinin. Dostên Kurda nizanin ka Kurd çi dixwazin ?"*

Wek wan sê kesên pispor jî anîn ziman, yekitîya Kurdan girîng e û divê Kurd di dîtin û daxwazên xwe de zelal û konkret bin.

Parlamentera Îngîlîz, ji Partî ya Karkeran Ann Cîvyd de xuyakirin ku polîtîka dewleta Îngîlîz de li himber pirsa Kurdan guhartinên ber bi çav hene. Hemû partî wekhev difikirin û şertên xwe heye ku gelê kurd çarenûsa xwe tayîn bike.

Li ser perspektîva kûltûrî, Prof. Kurdolox Joyce Blau axifî: *Rojeva îro de mafê mirovahî, otonomî û dewleteke serbixwe heye. Lê kîjan maf di platforma navnetewî de bê nîqaşkirin û pejirandin girêdayî yê hêza gelê Kurd e. Hêza gelê Kurde ku rojeva platforma navnetewî tîne holê,(...)"* Girîngî û hêza tifaqê anî ziman.

Roja yekê heya saet 18.00 nunerên sazîyên Kurda peyîvîyan. Sernavê TEVGERA RIZGARÎYA KUDISTAN- tifaqa Kurdistan a Bakûr Tevger ê M. Alî Çilgin peyîvî. Li ser navê Enîya Kurdistana Başûr Hoşyar Zebari, li ser navê Kurdên Rojava jî Kemal Ehmed peyîvî.

Prof. Şakıre Xıdo jî di peyva xwe de anî ziman ku Kurd wek teref di Yekgirtîya Miletan de bikare cîh bigir e. Li Swêd komîtak bê amadekirin û derheqê jenosîda Kurd de belgeyan kom bike û bide sazîyên navnetewî. Konferansa Rojhilata navîn ku nêzik de kom di be, bo ku pirsa Kurd jî bigire rojewa xwe ew komîta hewl bide.

Hin nuneran pirsgirêkên herêmî anîn konferansê ji alî serokê dîvanê ve ew hatin şîyar kirin.

Hêjmara delegên Kurd li gorî delegên bîyanî zêde bû û gelek kes li ser çi navî hatîbûn bang kirin ne dîyar bû.

Hêzên Kurd ji çekirina konferansê xwedî agahdarî bûn, lê dîsa jî bi hin pêşniyarên hevpar nehatin konferansê, bê hazirî bûn. Qismek ji nunerên Kurd îngîlîzî nedizanîn nekarîn ji axavitin û şirovan bi rehetî bişopînin.

Kesên ku dîtinin xwe bi rîya wergeran anîn ziman jî bi balkêşî nehatin guhdarî kirin. Wergerandina peyvan zêde wext digirt rastî rexne û hîşarîyan hatin.

***

Nunerên Kurd, di encama daxuyanîya konferansê da, wek cîh girtina "mafên gelê Kurd yên mirovahî" şaş, kêm dîtin, xwestin ku ew bi "mafê çarenusa gelê Kurd" ra bê guherandin. Ji ber ku pirsa Kurd siyasî û netewî bû û gotina pêşin bersiva wê nedida. Lê komîta ku daxuyanîya konferansê amadekirîbû, di dîtina xwe de israr

kir; gotin ku, ew ziman li gorî platforma navnetewî zêtir munasibe û ew zanebûn bi kar anîne.

Wê demê Seddam Kuweyt dagirtîbû, tevi Amerîkê û dewlet ên Ewrûpî di nava gengeşîyê dabû.

Li Kurdistana Başûr jî gelê Kurd berxwedan xurt kir û % 85 î welat ji dijmin hatîbû rizgar kirîn.

Nunerên Kurdistana Başûr di navber dana civînan de agahîyên teze anons dikirin. Agahîyên wek "ji caşan qismekî mezin derbazî refê pêşmergan bûne û di azadkirina gelek cîhan de rol girtine", an jî "Saddam di axafitina xwe ya TV de soz daye ku destûra bingehîn biguhare û mafê Kurda bide." Agahîyan kelecana beşdaran bilind dikir.

* * *

Roja ku dawî li konferansê hat, delege û berpirsîyarên hêzên Kurd li hev civîyan heta derengîya şevê li ser rewşa Kurdistana Başûr dîtin û pêşniyarên xwe anîn ziman. Mahmut Osman nunerê Enîya Kurdistana Başûr, di axavtina xwe de ragîhand ku: Li Kurdistana Başûr gel dest bi serhildanê kirîye. Enîya Kurdistanî ji vî karî re ne amade bû, lê nuha ew dixwaze gel hêz û rêz bike. Kurdistan % 85 di destê pêşmergeyan de ye, di hêla leşkerî de em serketine. Alî sîyasî de jî xasima ji derve pêşketin hene. Aborî jî, ji derve gelek eleqe heye lê pêwistîyê me jî gelek in.

Ez nikarim di derheqê perçên din de biryar bidim, lê divê di perçên din ra têkilîyên me hebin. Em divê ji bona kongrek Kurdistanî hewl bidin. Komîtake sîyasî hebe û bikare me di civînên navnetewî de temsîl bike.

Dîtinên hevpar yên ku di civînê de hatin ziman ew bûn:

Kurd ne otonomî, divê federasyonê biparêzin. Hevalên Başûr mexrûr nebin, şîyar bin. Listikên dewletan baş bizanin, zextên Tirkîyê û Îranê qebûl nekin.

Hikûmatek nîzamî û leşkerê nîzamî bê damezrandin. Hêzên sîyasî di nava xwe de reqabet nekin.

Ji bo kongra Kurdistanî xebata ku ji alî Tevger, Cepha Kurdistana Başûr û PDKÎ ve tê kirin bê domandin.

Şertên objektîvî hene ku gelê Kurd azadîya xwe bi dest xine. Divê hemû partîyên Kurd xebat û propaxanda û polîtîka xwe de piştgirîya xwe bidin Başûr.

Xeletî û şaşitîyên kevn neyne dubare kirin.

Bona piştgirîyê komîtake alîkarîyê û di demek dirêj de jî lobîyek Kurdî bê damezrandin.

* * *

16 Avrîl 1994 de radyo ya Spånga bi min ra, qasî nîv saetê hevpeyvîn çêkir.

Babeta hevpeyîvînê:

- Li ser rewşa Tirkîyê a siyasî û encam ên hilbijartina mehellî-herêmî ya 27 Adar 1994,

- Sedemên pêşketina Partîya Îslamî li Kurdistanê, pirsa tifaqê.

- Daxwaz û armancên PSK çine?

21 Avrîl 1994 li Hotel Royall de ji alî Federasyona Kurd a li Swêd civînek hate darxistin. Di civînê de nunerên partî û weşanxanên kurd amade bûn. Danîel Mîterrand di ciwînê de amade bû û ji bo gelê kurd piştgirîya xwe anî ziman. Xwarin hate xwarin.

* * *

12 Gûlanê 1994 an de li Parlamentoya Swêd bi navê "Hefta Xortan" civînek çê bû. Di civînê de jina Olof Palme Lîzbet Palme, Danîell Mîtterand û wezîra xortan peyîvîn. Ez tevî keçên me Cîran, Bejna û Bermal amade bûm.

* * *

1995.06.25

Ji do ve roj wenda ye. Ew di binê evrên reş û tarî de ye. Li derva baran dipekîne. Hewa jî ne pir germ e. Li welatê me havîn ne usa ye. Ji german hêk tê patîn. Li zevîyê ber çinandina ceh û genim meriv ji german gêjo dibe. Di 07 ê Hezîranê de Nazli tevî hemû zarokan çûn welat.

1995.07.05

Îro 05 ê tîrmehê ye ez û Alaeddîn Înce çun Girava Kanaryayê. Ew girav nêzî Maraco-Fasê di nava Oqyanosê de ye. Bajar ji otêl û loqantan-restorantan pêk tê. Zivistanê jî van cîyana germ in, gelek kes jî di wê demsalê de tê vir. Li gorî Bulgaryê û Yuwnan li vir ji qumê çîya hene. Bi kilometran cî de tu nikarî kevirekî qandî morîkî bibînî. Hin caran ku ba pêyda dibe cadde û kolanên bajêr bi quma nerm tê niximandin. Cîhekî turîstîk e, di heftê de 10 hezar kes giravê zîyaret dike. Du heftan min li ser qûma paqiş û germ xwe de ber rojê û têra xwe avjenî kir. Her roj sibê saet 7 an de di hawuza otêlê de 2 kîlometre avjenî kir. Hevalê min Alaeddîn di roja yekê de hîskir ku li himber rojê alerjî ya wî heye. Ji ber wê, ew nikare ji rojê fêde bibîne.

23 Tîrmehê de Nazliyê telefon kir, ew başin û rojên wan rind derbaz dibin.

1995.12.6

Dîya min ji Londrayê hat vir. Ez Nazli û Serdar li Arlanda benda wê bûn. Balafir nîv saetê dereng ket û saet di 11.00 ê sibê daket. Jinek îngîlîz pêre ye, alîkarîya wê kirîye. Em ji xanima Îngîlîz ra spas dikin û didin rîya mal.

Li gorî gotina dîya min li gundên der û dora me zêde kes,gundî nemane. Pir caran leşker hatîye malên me sekirine.

Bav û xortên me li ser bênderan kirine falaqan. Li himber zordestî ya hêzên dewletê gel gund û warê xwe cîhiştiye û çûne. Her yek li gorî quweta xwe derikê ve çûye. Mêrsîn, Îzmîr, Îstenbol, Edene an jî Elmanya, Îngîlîzsatan, Holland. Gelek mirovên delal welatparêz ji alî hêzên dewletê ve hatine kuştin. Mala ku qurban ango şehîd an jî birîndar nedaye tune.

Xwedîyê erebe û traktoran hatine mecbûrkirine ku êvar êvaran ew erebên xwe bibin nehîya Moxindîyê bihêlin û ji qereqol kaxiz bigirin, peyatî herin mal. Sibê jî dîsa peyatî bên ereba xwe bigirin û herin karê xwe.

Kesên ku pêwîstîya xwe bi xwarin û çekan- cil û berg hene disa lazime ji qereqol kaxiz bistînin. Gundî ji lazimîya xwe zêtir tiştekî bigire, leşker dest dide ser hemû tiştê te. Û ser de jî li te tade û êşkence dike. Şekir, çay, ard, nan, pirinc, sol, li gorî xwe çi bixwaze dest dide ser. Tirsa leşker ew e, ku ew tişt ji pêşmergên Kurdan ra tê şandin. Di binê van zextan de gundî nikarin bi dilê xwe îdara xwe daynin.

Em dîya min bi dil û can guhdarî dikin, hesreta salan dixwazin kêm bikin.

Sîdar dikana xwe firot Alaettîn Înce, hazirîya xwe dike mala xwe bibe Londrêyê. Lê piştî çend mehan Alaettîn poşman bû, Sîdar carek din vegerî Stockholmê. Dîya min hatîye vir da, bo ku wê tenê nehêlim mîn qursa zimanê Îngîlîzî cîh hişt.

**Di rupela rojnama Aftonbladetê de erdnîgarîya Kurdistanê**

2002.05.13

Li Stockholmê rojnama Aftonbladetê (Rûpelaêvarê) di nava rûpelên xwe de cîh daye reklamek Vezereta Turîzmê ya Tirkîyê û ji bo vê jî ji wezareta Tirk 6 mîlyar lîra girtîye.

Di îlanê de cîh daye nexşe ya Tirkîyê û Rojhilata wê jî bi navê rasteqinî, Kurdistan nivisîye. Ji ber vê hin der û dorên nîjadperest har û dîn bûn. Oktay Ekşî nivîskarê rojnama Hurrîyetê û rojnamevan Emîn Çolaşan sefîrê Tirkîyê ya balyozxana Stockholmê Selîm Kunaralp bi tundî rexne dikin.

Ser van êrîşan sefîr Selîm Kunaralp de zanîn ku, *"mebesta wê nexşe ew e ku Kurd li wan cîyan piranî ne. Nexşê ne sîyasî ne jî hûkûqî tu tesîrek xwe tune. Em ji dijayetî rawakirinê bêtir nikarin tiştekî bikin. Eger nexşe bi armanceke hiquqî û sîyasî bê belavkirin jî em dikarin çi bikin, nizanim? Eger ku pirsê em bibin dadgehê li vir (li Swêd) qîyamet radibe û dadgeh dikare biryar bide ku ew der Kurdistan e."*

Oktay Ekşî di nivisa xwe de cîh daye wan gotinên Kuneralp û carek din jî şiroveyên wî rexne dike. 13 Gulan 2002 Hurrîyet O.E

Çolaşan jî nasnama Kuneralp derxistîye, dibêje *"Selîm Kuneralp lawê Zekî Kuneralp e. Alî Kemalê ku 1922 an de li Îzmîtê hatîye lînçkirin jî bapîrê wî ye."*

Têkilîyên Selîm Kuneralp a bi rîya înternetê ya bi nunerê yekitîya Avrupê Karen Fogg ra jî rexne dike." Vê tekilaya wek xebata li dijî Tirkîye dide xûyakirin.

* * *

**Bi berxwedana hêzên welatparêz û pêşverû pelên zulmê şûnde wekişîyan. Piştî 24 salan şûnde 28 Avril 2004 de ez wegerîyam welatê xwe.**

Rastî jî ji welat ewqas durmayînê êdî mirov deyax nake. Hin dost û eqreban xwastin ez demek din jî sebir bikim, lê min guhdarîya wan nekir, 28 Avrîlê bilêta teyerê girt ez terim welatê xwe. Nazli û birayê min Turgut li balafirgeha Stockholmê ez rêwî kirim.

Di hemû eqraba û dostên ku agahîya xwe bi çûyîna min çêbûn di şik û gumanê de ne, gelo wê polês min bigire?

Tenê Zinarê lawê min a 10 salînî, dema ku ez rêwî kirim got *"here bavo here, ji bo welatê xwe, Kurdistanê bixebite."* Fikirîm di salê wî de me ne Kurd bûna xwe, ne jî welatê xwe Kurdistan nasnedikir. Eger ku zarokên 10 salinî bi vê pirsê şîyarin, êdî azad bûn ne dur e.

Piştî 24 salan şûnde 28 Avril 2004 de ez wegerîyam Turkiyê. Li balafirgeha Yeşîlkoy a Stenbolê polês ez girtim birim daîra Têkoşînê a li Dijî Terorê!

Li wê derê birazîyê min Zana, xwîşka min Ekîle, kurapê min Mehmet û Sebrî, kur xalê min Mehmet hin eqraba, dost û parezerên min Kutbettîn û Arif Ertuxrul hatin ez dîtim.

Şev di hucra qatê binê erdê de me derbaz kir. Di hucrê de gotina Zinar hat bîra min kenîyam ... min got Zinar haya te ji hucra sar jî heye? Lê rastî jî gotina Zinar di her merhalê de moral û hêz da min.

Dora roja din polês îfada min girt, parêzer Arif Ertuxrul jî li ba min bû. Êvarê saet berî 17.00 an ez derxistim pêşberî dadgehê. Dozgerîya leşkerî a Dîyarbekir, dozger hakim yuzbaşi Oktay Yukselê Ereb, di 24.3.1981 an de di îddîaname ku di derheqê PSKT de amadekirî de dinivîse ku: *"Kesên ku biryara girtina wan heye û heta nuha nehatine girtin (navê min jî di nav da) dosyên wan hatîye cuda kirin, lêpirsîna wan li gorî nimira dozgerîya me 1981-450 wê bê domkirin."*

Em kesên ku nehatinbûn girtin, dozger nekarî bu di derheqê me de tiştekî bi ke, ji bo wê dosya me hatî bu veqetandin. Qadi biryara xe da: *"Dozgerîya mehkema leşkerî ya Dîyarbekir, li gorî 1981- 203 esas, û bi 1980-1551 nimara ewraqê lêpirsîn*

*kirîye, dosya Kazim Budak veqetandîye. Dosya wî di 1981-450 nimara û bi biryara 1981- 162 nimara evraqê de hatîye qeyîd kirin. Bo ku ji ser sucra gelek wext derbaz buye û têkilîyê xwe bi sucra tune ye dixwazim ew azad bê berdan."*

Çend rojan li Stenbolê me eqrebe û dost zîyaret kir, dûra rîya Enqerê, Edenê, em çûn Dîyarbekir. Li Dîyarbekir bi alîkarîya Parêzer Xalis Ayçîçek li ba polês û dadgehê tiştên ku pêwîst bûn me kirin, navê min ji lîsta kesên lê dihat gerandin hat derxistin.

14 ê Heziran a 2004 de Zana bi eraba xwe em girtin, çûn Haysivê, gundê me. Di vê rêwîtîya de ez, Zana, Ekîle, Rojhat û Şadîye bi hev re bûn. Meriv bi çavê xwe dibîne ku tabîet çawa birîndar e û li hin cîyan balansa xwe wenda kirîye. Li mezra me zevî wendabûne, dar û sincan hemû zevî dane ber xwe, rê tune, tu têda herî. Her der wek cangil e.

Li gund bo ku kes nemaye, bi salan ne ziraet hatîye kirin, ne jî pez û dewar hatîye xwedî kirin. Ji ber wê sedemê der û dor ji ber darên şîlan, dirik û gîjokan û darê şekok, hermî, tawî, qizwan û dare bizî ve hatîye girtin. Sînorê zevîyan ji ortê rabûne. Di bexçan de gulîyên darên qert di serhev de ketine, derûdor bi darên hişk ve tijîye. Wexta berê buna bi van daran zivistananek germ dihate derbaz kirin.

Em li ber derê xanîyê me rawestîn, derê xwe kilît e. Kilît anîn me derî vekir, em ketin hindur. Çîya yê Silbûsê û daristan bi xweşikîya xwe, wek tabloke di dîwar de daliqandî derket pêşberî me. Te digot em neketine xanî ketine nava bexçekî. Çimku; dîwarê xanî ya li himberî me heta temelê hêrifî bû. Çend salan berê ku Bengînê lawê min hatîbû gund û ew yeka dîtîbû, eceb mayî mabû. Digot *"çi mana xwe heye? Xanî dûwarekî xwe tune, lê derî kilît kirine."*

Dîya min wexta ku gund terikandîye, çend qat cil û hindek fereq li gundê Karê danîye ba Heydoyê lawê Bavo. Xeynê wan tiştên din hemû li mal maye. Lê 20 sale mal li vir bê xwedî maye, di malê de qasî derzî yê jî tiştek tune, mal tazî kirine. Saeta elektrîgî, bişkuvê elektrîgê ya di dîwaran de jî rakirine birine. Talana dema hereketa Şêx Seîd hat bîra min. Hin çetên elewîyan avitîye ser gundên sûnî yên Paloyê pez dewar û tişt anine.

Ew talan îro hatîbû serê me ji. Hin ne camêran hatine di male de li gorî xwe çi dîtine birine. Pismamê bavê min Bayram û xanima xwe jî çend saetan berî me ji Edenê hatine gund. Li ber derê wan jî em piçekê rûniştin, me sohbet kir. Lê em pir neman, hema hema bi bezikî me xatir xwest û em rê ketin. Ji bona li gundmayînê, tu tiştikî me tune bû. Ne nivîn, ne fereq, ne jî tu tişt tune bû. Xanî jî helşîya bû. Ereba me ji gund ber bi jor rêket. Li alîyê minê rastê gora bav û apên min, piçekê li jorê û

alîyê minê çepê gora Kekê Mistefa[81] .... Gora wan di binê gîya û sincan de bê xwedî bûn.

Nêzikî rê kevirê gora Apê Qîya ya ku leşkerên romê di êrîşek ser gund de şikandîbûn, xûyadikir. Ji ber rewşa heyî dilê min dikelîya çavên min bi hêstiran dagirtîbûn. Min bi usul û vêşartî ew zuhakirin. Min nedixwest Zana, Rojhat, Ekîle û Şadîye vê yeka bibînin.

Spontane min ew gor bi yên Ewrûpîyan re de ber hev. Xwedîtî kirina li gorîstanên Ewrûpîyan li gorî goristanên me rastî jî pir baştir bû. Min got welat jî, hezkirina welat jî, ji gundê min dest pê dike û min di serê xwe de biryar da ku ez ê di wextek kin de ji Swêd bêm û li vir xanî ava bikim.

**Me Biryar da ku li gund xanîkî ava bikin**

Piştî ku ez vegerîyam Ewrûpê, bi brayên xwe ra peyîvîyam. Em 6 bira li dervayî welat bûn.

Me di nava xwe de şirovekir û biryar girt ku hemû bi hev ra li gund xanîkî ava bikin. Me agahî gîhand Mîmar Zana ku ew amadekarîya xwe bike. Zana jî ji ber alîkarîya proje û planê xwe bû şîrikê malê. Ser wê biryarê

ez carek din vegerîyam welat.

13 yê meha Tebaxê hatim Enqerê, bûm mîvanê xwîşka xwe Ekîlê. Zana benda mine ku em herin li gund dest bi avakirina xanî bikin. Bo herim gund dilezînim, min ji bona 18 ê mehê bi zahmetî di classa 1 de ji bo Dîyarbekir bilêta teyerê dît, hatim Dîyarbekirê.

Lezkirina mina li Enqerê zêde kêr nehat, karker nehatîbûn pêda kirin em dora hefteki li Dîyarbekir man. Ji bo ku di radyo û tv de Dêrsim qada şer dihat zanîn, karkerên ku jê soz hatibû girtîn, poşman bibûn, nedixwastin bên wê herêmê. Pêydakirina karkeran, kirîn û neqilkirina hesin, çîmento, qûm û pêwîstîyên din ra gelek wext dixwast.

Bi rîya Hesenê Paxnîkî me Hecî Şevketê Zaza dît û hemû malzeme ji kîsî me, li ser 12 milyarî me li hev kir. Dudoyê meha Îlonê de me dest bi temel vedanê kir. Ji zevîyê bêtir di destê me de tu haceteki me tune bû.

Tevir û bêrên me jî tune bû, Bayram bi tevşo cîhê bingeha avahîyê işaret kir. Qaşo wek kevneşopî rûsipîyên malbatê di karê ûsa de destûr didin. Di eynî rojê de bi qirêderê dest bi temel vedanê kir, di çend saetan de metre û nîv kurahî de temel kola.

[81] Lê di roja 16.06 2006 de di qezak trafiqê da me biraziyê min lawê Mistefê Zana wenda kir û ew jî li kêleka bavê spart axê.

***

Li gorî zagona nû kesên ku 15 salan memûrî an kar kirine û 61 sal emrê xwe dagirtine dikarin teqawid bibin. Ez jî bona ku bikarim teqawîd bibim ji min ra çend mehên din lazim bûn. Ji ber wê min ji bo mamostetîyê ji wezereta perwerdê ra miraceet kir, kar xwest.

Demekê şunda Mehmet Yokuş ji Dîyarbekirê şev telefonê gund kir. Wî di înternetê de dîtî bû, wek mamoste tayîna min derketîye Qeyserî yê. Divîya bû, ku ez herim û dest bi karbikim.

7 ê Îlonê çûm Dîyarbekirê, 12 ê yê Îlonê jî çûm Qeyserîyê. Qeyserî bo min cîhekî bîyanî ye, serdajî 24 sale dervayî Tirkîyê mame. Lê li vir min Heyder Teksîn dît. Heyder di sala 1971-72 an de di lîsa Erqanî de xwendewanê min bû. Ez bi eqrebê wî Eskerî Teksîn re jî zû da heval bûm. Heyder ji min ra bû heleqê têkilîyan.

Ji bona dest bi mamostetîyê bikim, biryara ku lazim bû ji wezatretê bihata hîn nehatîbû. Ji ber wê min nekarî dest bi kar bikim. Dora roja din 13 ê Îlonê derbazî Enqerê bûm. 17 ê Îlonê jî tevî xwîşka min Ekîle û birazîyê min Rojhat em çûne gundê me Haysivê. Zana jî vê êvarê ji Dîyarbekir hat.

Em li mala Bayram dimînin, lê ew jî di nava înşaetê de ne, karker û mîvanên xwe hene cî tê ra me hemûyan nake. Bona ku li gund cîhê em bisekinin tune, dora roja din ew, hemû bi hev ra çûn Dîyarbekirê, tene ez li gund mam. Roj li cîhê înşaetê wext derbaz dikim, êvaran jî terim mala jêrin, şev li wir dimînim. Xwarinê jî pir caran em bi hev ra dixwin. Xeynî karkeran, Bayram, xanima wî Emîne û lawê wan mamoste Welî û ez em çar kes in.

Min di roja 19.09.2004 telefona Swêd kir. Xeberek ne baş dane min ku ez pê êşîyam. Lawê min Bengîn di lîstika baskêtbolê de ketîye herdu pîlên wî şikîyane. Bi vê nûça xirab gelek nerehet bûm. Dora roja din min dîsa telefon kir. Bengîn dixwaze dîyaxan bide min. Dibêje, *"wexta ku lingê min firîyabû ew zahmettir bû. Yek jî ew morfîna ku dane min ez pê sermest bûm, bo wê meriv dixwaze hin cîhên xwe yê din jî bişikîne."*

Du salan berê ew bo xwe xijkirina ser berfê tevî sinifa xwe çûbû Romea. Li wir jî ew ketîbû û banda jonîyê wî bizdîya bû.

Çend rojin li benda kepçê me. Ew bê, temela ku beton bûye, dor bi axê bê dagirtin. Lê duh ez û Mamoste Welî heya saet 20 û 30 benda kepçê man, ew nehat. Ji Korpî yê Hesen telefon kir ku kepçe wê sibê were.

Îro 22 îlonê ye. Serê sibê saet pênc û mîvan de rabûm hatim cîhê avahîyê. Avahî du qoran av da û bi erebê ber bi kepçê çûm Hêwedan. Şofêrê kepçê tê ew rê nizane min ew anî.

2004.10.18

Ez li Dîyarbekirê me, lê îro terim Dêrsimê, terim gundê xwe, Haysivê. Dadgeha dewa PKK ê destpêkirîye û ji der û hindurê welat gelek kesên polîtîk û rojnamevan bona dadgehê bişopînin li Dîyarbekir kom bûne.

Saet 10 ê sibê li otogarê ji bona otobusa ku tere Dêrsimê, Can Dersîm bilêtek girt û em bi rêketin.

**Ez carek din terim Qeyserîyê**

2004.10.26

Em çar kes ez, xwîşka min Ekîle, birazîyê min Zana û Şergir êvarê saet 17.00 de ji gund derketin ber bi Xarpitê terin. Ez rêwîyê Qeyserîyê me yên din jî terin Dîyarbekirê.

Saet 19.30 de li Xarpitê min ji firma otobosê ya Sur-Dîyarbekir, bilêt girt da rîya Qeyserîyê. Rêwîtîya min nêzî 7 saetan girt. Saet 2 an 15 de em li Qeyserîyê peya bûn.

Cara duyeme ku ez têm vî bajarî. Min teqsîyek kirê kir û me ajote otêla-mala mamostan. Vê cara heqê teqsîyê 5 mîlyon pereyê Tirk girt. Cara pêşin ku ez mehekê berê hatîbûm, di eynî wext û ji eynî mesafê ra heqê teqsîyê 8 mîlyon girtîbû.

Gotinên li ser canbazî û xapînokîya mirovên vî bajarî hate bîra min. Ji ber ku gelê wî bajarî bi gotinên rengîn, mubalaxa û bi propagende kirin û firotinê ra jêhatîne.

Sibê de ji otelê derketim çûm midûrîyeta Perwerdê karê xwe bimeşînim. Tesadufen rastî Heyder Teksîn hatim. Em bi hev ra çûn Midûrîyeta Perverdê.

Li wir fêr bûm, bo ku wek mamoste ez bikarim dest bi kar bikim ji wezaretê agahî hatîbu. Lê midûrîyeta Perwerdê du belgên nu dixwastin. Belga yekê îspat bike ku min leşkerî kirîye, ya duyem jî didixwastin li ser rapora ku min ji nexweşxana Dîyarbekirê girtî bû, bê nivîsandin ku "di her îqlim û her derê Tirkîyê dikare bixebite." Min belga leşkerîyê ji daîra leşkerîya Qeyserîyê girt. Bi rîya Heyder min mifettîş Burhan Demîr dît. Burhan ji Gênca Çolîgê ye û nasekî minî kevn e. Şev saet 22.00 de em çûn otogara Qeyserîyê û rapor bi dest şand Dîyarbekirê ji Zana ra. Wî çi dihat xwestin li raporê zêdekir û dora roja din şunde ji min ra şand. Ji ber vê lezgînîya me memûr mat mayî mabûn.

Piştî min karê buroqatîk qedand ez û mufettîş Burhan çûn dibîstanê. Me midûrê dibîstanê dît û sohbet kir. Midûr pirsî, min kîjan dibistan xwendîye û di xwendevanîya xwe de çep an rast min li kîjan alî cîh girtîye? Min raste rast her tişt jêra got. ... û ez alî çepê bûm.

Dawîyê min got ez ji bona mamosteyê nehatime, dixwazim tekawîd bibim bi çend mehan pêwîstîya min heye levma ez li virim.

Ew jî vekirî peyîvî, got:

-Di zanîngehê de ez lîderê ulkucuyan bûm. (...) Nuha nasekî min di cîhê te de vekîl-mamosteyî dike, eger tu dest bi karbikî karê wî diqede. Madem tu bo demik kin hatî, ez naxwazim ew karê xwe biqedîne.

-Min got baş e; çend rojan îzîn bide min ez herim li Dîyarbekir rapor bişînim. Me li hev kir.

-Got sibe were dest bi kar bike û dixwazî îzîn bigirî sibe binivîs û bixwaze.

Dora roja din 28 ê Cotmeh[82] a 2004 an sibê çûm herim dibistanê, durva min dî, di bexçê dibistanê de hemû xwendevan kom bibûn. Di destê wan de flama û ala Tirkan û marşa Tirkan a netewî dixwendin. Canê min nexwast herim dibistanê li wir li ser bankê rûniştim. Toren qedîya çûm dibistanê.

Salan bu ez ji wan dîmenan dûr bûm. Gelek cudahî ketibû navbera me. Wan bi vê merşa û vê ala neyartîya gelê me dikir.

Fikirîm ez nikarim carek din di dibistana Tirkan de mamosteyî bikim. Li himber alê rawestim û merşa şovenîst bixwînim, an jî guhdarî bikim. Dema ku em ji Kurdeyatîya xwe zêde ne şîyar bûn, me ew yeka dikir. Lê piştî 24 salan ji dervayî welat mayîn û di karê polîtîk de xebitandin û 28 salan jî ji mamosteyî durketina min ez ji wan tiştan dûr xistî bûm.

Ew yeka ne ehlaqî bû jî, meriv, polîtîk hin tiştan bêje û here, li dijî dîtin û gotina xwe, gorî sîstema perwerda Tirk xizmeta zimanê wan bikî ew ne di cîh de bu. Li Swêd jî ji ber wan sedeman ne min ne jî xanima min me nexwast em mamosteyîya zimanê Tirkî bikin.

Min wê rojê du kaxiz îmze kir yek ya dest bi kar kirinê, ya din jî daxwazîya îzînê bû. Min bo sê rojan îzîn girt û ez vegerîm Dîyarbekir.

2004.10.30

Qeyserî bajarekî Anatolîya navîn e. Paqiş û bi plan e. Mirovên xwe sakîn û rûnerm in. Tenê bi tîcareta xwe re mijûl dibin. Li sûqan leşker û polîs tune. Dîdarên ku em li bajarên Kurdistanê dibînin li vir tune. Her çiqasî hin jinên xwe bi peçê dev û rû yê xwe dipêçin jî, gelekê wan serqotin. Jin û keçên serqot û bi çekên modern di bajar de bi rihêtî dikarin bigerin. Cûdayîke din jî her çiqasî partîyên olperest li Qeyserî yê xwedî bingehek xurt bin jî, li vir jin qasî Dîyarbekir serpêçayî ninin. Rocî ya Remezanê jî li vir rihet derbaz dibe. Îro şeş roj e, rocîya Remezanê destpêkiriye û ez li vî bajarî me. Taştê û şîvê cîhê ku lê me, ango li mala mamostan, nîvrojê jî derva, li

[82] Wan nizam bi çi sedemê cejna cumhurîyetê- komarê rojekê berê pîroz dikirin. Li Tirkîyê ew cejna 29 oktobirê- cotmehê tê pîrozkirin.

restorantan dixwın. Ji bona xwarin û vexwarinê cîhên ku vekirîne gelek in, ji Dîyarbekir ê zêtir e. Min ji bona gelê xwe yê paşdemayî fedî kir.

Hevalên ku min li vir dîtin, an jî nas kirin di cadda Fûzûlî de rûdinin. Heval Burhan jî li vir rûdine, wî ez birim, mehella xwe, mehella Fûzûlî. Cîhê elewîyê Sariz û Sêvazê, cîhê pêşverûyan e. Li vir hemû qehvexane û aşxane vekirî ne. Di qehwexanê de ji ber dû yê cixarê çav çavan nabîne. Lê ez nikarim di cîhê ûsa de dirêj rûnim.

Îro Husnîya xwîşka min jî telefon kir. Di salên 1986 de ew sirgunê vir kirîbun, wê jî li vî bajarî mamostetî kirîbû.

Li suka serrefan 50 euro bi 93 mîlyon perên Tirkan guharî. Xwarina êvarî li restoranta mala mamostan xwar. Ji bona îftarê amade dikin û tenê 5 mîlyon perê Tirkan e.

Pereyên li ser min kêmin jî, min xwe ranegirt û bi perê heyî de defter û pirtûkan. Pirtûka Li Ser Demoqrasîyê, ji alî Robert A. Dahl ve hatîye nivîsîn min kirî, pirtûkek balkêş e.

Di oda ku têda dimînim her şev bi miştêrîkî nû ve odê parve dikim. Otel erzan e, lê zahmetî yê xwe hene. Hin kes pir caran nîvê şevê tên şevikê disekinin û şevaqa sibê terin. Hin kes şev dixûrên, tewî wan di odekê de razan zahmet e. Ji ber wê min xwest perê nivîna din jî bidim û di odê de tenê razim. Lê qebûl nekirin.

Min ji nexwaşxana Dîyarbekir ser hev çend mehan rapor şand, çûm li gundê xwe, bi avakirina xanî ra mijul bûm.

## Em dixwazin avahîyê bi qedînin

2004.11.24

Ez û Şergir ji Dîyarbekirê derketin ber bi Haysiv a şêrîn terin. Haysiva cîhê bav û kalan. Haysiva ku xwedîyên wê ber ji zilma dewletê terikandîye û ew bê xwedî maye. Haysiva ku me zaroktî û xortanîya xwe têde derbazkirîye. Haysiva ku însanê wê ew gelek sal û zemane ku terikandîye. Piştî xerîbîya 24 salan cara sêheme têm, welat û gundê xwe.

Me li Kovancîyan ji bona xwarinê hin tişt girt û bi taxsîyekê hatin mala Bayram a kevn. Saet 17.00 êvarê ye, lê hewayê berfê heye. Em dixwazin heya zivistanê destpênekirêye, berf nebarîye înşaaetê çati bikin. Lê derengê şevê ez bona avrêjê derketim derva heta wê wextê di malan de toalet tune bû, min dî ku berfê zû de destpêkirîye. Hewayê dest xwe ra sar kir. Soba me amade ye. Ji xwe kesî ew ji cîhê wê ranekirî ye, belkê jî pênc sale ku ew di cîhê xweda ye. Me ev bi êzingên hişk dagirt. Wê êvarê me bi gale galê û pirtûk xwendinê wext derbaz kir. Oda ku ez têda razîyam sobe tune bû û pir sar bû. Şev tu caran germ ne bûm, ji ber sermayê min

nkarî ku deqekê jî razêm. Lê min biryara xwe da ku şeva bê ez ê li oda dinê razim. Şev jî çend caran çûme der lê berf bi hevên mezin dibarîya.

Îmkanên bajêr hat bîra min. Toalet di hindur da, qalorîfer û ava germ avantajên başin. Şertên gund çetin in. Gelek salin ku em ji erdnigarîya (coxrafya ) xwe dûr bûn. Ji bona vê jî hîn bûna şertên nû wext digire. Zarokên me ku li Ewrûpa çêbûne û mezin bûne çawa bikarin li vir bijîn?

Bi lez ketim nava nivînan, lê pir sar e, qet germ nabim. Sibê de zû rabûm. Dixwazim gavekî zû sobê pêxinim. Hemû der û dor di binê çarşefek spîda maye. Me hin hazirî kir, taştê xwar û em çûn cîhê înşaetê.

Saet 15.00 piştî nivrojê ye, berf hîn jî tûji tûji dibare. Mi ji hin cîyan re telefon kir, karkerên me li benda sekinandina berfê bûn. Em gihaştin wê encamê ku di vê hewayê de kes nayê, em çûn, xanîyê jêrin cîhê razanê. Me soba xwe dîsa dagirt û dest bi xwendina pirtûkan kir. Di malê de li ser nexwaşîya heywan û mirovan gelek pirtûk hene. Ji ber ku di malbatê de du doxtor, du hemşîre û 4 heb jî weterîner hene. Lê ji bona xwendinê tenê yek pirtûkek heye, ew ji pirtûka M. Kemal Nitûqcîlda duyem e. Xûya ye wan ji ber tirsa leşker û polêsan ew pirtûk tenê li ortê hiştine. Bona ku di mal sekirinê de tansîyonê daxinin.

Îşev di oda germ de razîyam. Berf bê sekin dom dike. Xûya ye ku hatina me vala ye. Em bêy ku tiştekî bikin divê vegerin Dîyarbekirê.

Saet 12.00 nîvroje em dîsa çûn cîhê avahîyê. Hemû avahî, texte, tuxle, kîremît, qûm û hesin di binê berfê de ye.

Divê em tiştekî bikin. Li gorî nûçên radîyo, wê berf raweste û rojên germ şûnde bên. Saet 13.00 em ber bi cîranê me Husênê Heydê çûn, li ba wî me şorba şîr vexwar.

Piçek goftûgo şûnde em dîsa çûne Haysiva xwe. Sobe vêxist, ji kanîyê ava xwarinê anî, çay da ser. Ji bo êvarê em xwe amade dikin. Di gunde jor sê kes, jêr jî ez û Şergir tenê ne.

Saet 22.30e, em pirtûk dixwînin, elektrîk nişkeva çû. Me mûm vêxistin û li benda elektrîgê man. Lê vê şevê ceryan nehat. Berf jî bê navber dibare û dibare.

2004.11.27

Dora 30-35 cm berf barîye. Em ji xwarina heyî, ji bona taştê hazirîyê dikin. Tiştên basît dibijêrin, hêk difirînin rûn, zeytûn, tomatês û îsot. Çay jî her wext vê re helbet.

Nan tenê ji bo sibê ji taştê re heye. Em derketin, terin avahîyê. Berf nabare, roj di ezimanê sayî de dibiriqe. Hindik be jî berf dihelê.

Ji ber ku hêvîya me ji hatina karkerên înşaetê nema, me telefon kir ji gundê Hulimanê dû karkêr Aydin û Eşref hatin. Havalên hatî, ji me ra çend nan jî bi xwe re anîne. Eşref di sala 2009 ande gundîkî xwe kuşt bi 12 sal hepsê hate cezakirin.

Bi hev ra me tuxle û kiremît kişandin di hindur înşaetê de dan serhevnijinandin, em êdî li benda biharê dimînin.

Rîya gundê me û Pira Seyîdan ji berfê hatîye girtin.

Saet 16.00 heva gelek sar e. Herdu karkerên me çûn mala xwe, em jî daketin Haysiva jêrin, mala Bayram a kevn.

Ez gelek cemidîyam. Bi lez û bez agir pêdixinim. Soba me germek rind dide der û dora xwe. Me bi hev ra xwarina patatêsê ya kutanndî çêkir.

2004.11.28

Herdu karkerên duhî îro jî hatin, dixebitin. Me li şantîyê agir pêxist û çay keland. Di sermê de çay gelek bi qîmet bû. Li dora saet 16.00 em dîsa belav bûn. Piştî vê saetê serma zêtir dibe. Me xwe avêt mal, sobe dagirt û agir pêxist. Heya nîv saetê ji ber sermê, jana tilîyên min derneketin. Şergir dixwaze îro jî şorba tomatêzê çêke.

Li cîhê înşaetê wexta ku me der û dor hildiçand, malzeme davit hindur di nava borîya plastîk da, mîna pelê hişk min tiştek dît, li ser borîyê dilive lê jê dernakeve. Nêzik de min lê mêzekir ku di hindur borîyê de çukek ji ber sermayê borîyê ve qemitîye û cemed girtîye nikare xwe jê xilas bike. Min ew jê xilas kir anî mal. Nuha ev germ bû, di nava malê de fir dide, tere pencirê û tê.

Min îro telefonî Swêd kir ji xanima xwe Nazli û keça xwe Bejna ra peyîvîm. Nazli dibêje ku Zinar qursa avjenîyê cîhiştîye û humorê wî jî gelek hatîye guhartin. Bona ku bi Zinar ra bipeyîvim min du caran telefona mal kir, lê ew ne li mal bû.

Êvarî çûm, kanîya gund min xwest avek teze bînim, lê xijbûm ketim, curnê avê. Pê yê minê rastê heya ber jonî şil bû. Dibêjin, "Şaban pir xweşik bû, serda jî xwiri derxist" nuha li ber sobê xwe zuha dikim.

**Çûk germ bû di nava malê de fir dide tere pencirê û tê.**

2004.11.29

Sibê de zû bi cam nîqûlkirina, çûkê ez şîyar bûm. Ez û Şergir, em her yek di odekê de radizên. Di odekê de tenê, bi serê xwe razandin piçekê lux be, jî meriv hin caran tenêtî jî dikişîne. Di demên ûsa de her livik der û dora merivan dibe merkeza balkêşîyê. Ji bona wê jî pircaran pisingek, çûkek, marek, zirxûtikek, mêşek di rewşek usa de dibe qehremanê bûyerê. Ez bala xwe didim vê çûka mîvan. Ode ronî dibe nabe ew xwe li caman dixine, li dolavan, li fere û folan, li asraxan dixine. Pir caran jî tiştên tehlûke dike, xwe ji tiştên zerar naparêze. Dikeve ocaxê bi agir ve dagirtî, an jî li ser borîyên soba şevitî û li wir tar digire. Piştî ku germê hîsdike fir dide cîh diguhare. Heywanên kuvî di şertên kedîkirî de nikarin bijîn. Eger ez vê azad nekim, nêzik de ew dawîya jîyana xwe bîne. Ya xwe bişewitîne, yan jî xwe li camên pençirê xine û bimire. Min ew azad kir.

Derva roj heye, eziman vekirîye, sayîye. Mîna her roj em terin cîhê înşaetê. Lê ji karkeran tu kes nahatîye. Aydin telefon kir ku ew îro û sibe nikare bê, tere Goman li wir cinaze heye.

Me di nava înşaetê de agir pêxist xwe da ber. Ji ber sermê me deyax nekir, em hatin mal. En cîhê reihet mal e. Cîhê me germ e, xwarin û vexwarina me jî heye. Elektrîk ji duh ve tuneye, me şîva xwe di bin ronahîya mumê de xwar. Îsal rezan ji gelek tirî girtî bû. Payîzî me bi hev ra tirî komkirîbu, kiribu aqit û şerbet. Şergir û Bayram, hinek şerav jî çêkiribûn. Çend şûşên coca cola yê dagirtî jî li gund hiştine. Me yek anî vekir, piçek jê girt vexwar, şereba xwe xweş bû. Piştre em ketin nava gala gala rojên buhorî û serpêhatîyên me. Heya derengî şevê çik û çika dengê sobe şevitî reheti û aramî de me.

2004.11.28

Tiştê ku em bikin tune. Sibê de dîsa me taştîya xwe xwar û em çûn cîhê înşîatê. Der û dor di bin berfê de ye. Rîya navbera Korpîya Seyîdan û gundên alî me jî berfê hatîye girtin. Ji bona ku îro ji Îzmîrê cinaze tînin gundê Goman, ji dur ve xûyadike ku kirêderek hatîye rê vedike.

Gundên dorê hemû xisim û dostin. Gundî hevûdû dinasên û li hev xwedî derdikevin. Me jî biryar da, em herin Goman merasîma cinaze.

Roj germ e, berf dihelê. Min û Şergir peyatî da rîya Goman. Me xwe gîhandîbu dîyarê mezelê Hulimanê Bayram ji Edenê telefon kir.

Li ser rê Hesê Began û xanima wî dewarek avitibûn erdê serjêdikirin. Pir xwestin em bibin mîvanê wan lê em derbazî qehwa gund bûn.

Çend xort me li wir dî û cinaze pirsî. Wan da zanîn ku cinaze berî me derbaz bûye. Navbera Huliman û Goman rê vekirî bû, em rehetî çûn. Raste rast çûn ser mezelê.

Dora sed kesî li ser gorê kom bibû. Gelek ji wan nas, ji gundên dorê bûn. Hin hevalên kevn jî min li wir dît. Piştî defnkirina cinaze em çûn mala Memî Meho pîreka malê Îpek Xanim eqrebeyê me ye, wê şevê em li wir man. Mêre malê ji çavan pêrîşane û guhên wî jî rind nabihîse. Lê dostin, têkilî û germahîyên dilê xwe rawa me dikin. Jina male Îpek xanim qala rojên bihorî, mîvantîya gerîlllan û kirinên leşker dike. Di gotinên wê de gelek tiştên balkêş û dersgirtinê hene.

Dora roja din saet 9.30 de em xatirê xwe dixwazin û didin rîya malê. Derva sar e, sol li ser lingê me dicemidin. Em dora saetikê peyatî ji Goman çûne Haysivê.

**Di vê hewayê de xebat nabe**

2004.12.01

Wek her roj em disa çûn cihê înşaetê. Me disa di bîdonê mezin de agir dada û xwe da ber. Xanî tenê iskeletê xwe heye, dîwar çene bûne. Nava zevîyek di bin berfa sipî de bînake bê dîwar û bê çati.

Zana telefon kir rê dipirse, ka rê vebune an na. Demekê şûnde jî mutahîtê ku xanî çê dikir, Hecî Şevket ereba xwe li Mezelêhemê park kirîye peyatî hat cihê înşaetê.

Hecî Şevket:

-*"Ji bona ku heva sare karker nikarin û naxwazin di vê hewayê de bên û bixebitin. Lê hûn qet mereq mekin ew yeka dênê me ye, kîngê be em ê dê çêkin."*

Min jî lê vegerand ku;

-*Di vê hewayê de xebat nabe, Hecî Şewket, êdî em benda biharê bisekinin.* Hecî Şewket jî karker Aydin jî çûne mala xwe, em jî daketin mala Bayram. Sobe me rind dagirt û agir pêxist. Xanî ji ber ku ji axê ye rind germ dibe. Xwarin xwar, çay vexwar û dixwazim me îro çikirîye binivîsim.

Li der jî û hindur male de jî bêdengîyek heye, tenê ji soba sor bûyî de dengê êzingên dişevitin tê.

Heke em radio venekin bi dinyê ra tu têkiliyên me çênabe. Ji ber ku telefon jî li vir mala jêr nakişî ne. Wexta ku em dixwazin telefon derikê bikin divê em herin, dîyarê Kilîsê, serê rezan.

2004.12.02

Roj li ezimanan bona germkirina erdê cehd dike. Lê bê feyde ye, gelek sar e. Berf ji ber şewqa rojê dibiriqe. Me hin texte û hacetên li dora avahîyê axmekirî topî ser hev kir.

Bona ku dewarê serberdayî û hin kesên beradayî bi rihetî nekevine nava avahîyê, me pencire û derî bi tuxle û textan girt. Me mîna cejna newrozê agir dada. Ji xwe bê agir di nava îskeleta bêtonê de îdarekirin, xebitandin ne mimkun e. Motora li ser avê me rakir bir mal.

Sobe dagirt sol û goreyên xwe da ber sobê ku zuha bin. Karê pêşin me çay da ser. Şergir goştê ku çend rojan berê qewirandîbû, hin pîvaz, tomatêz û îsot kir nav û xwarinek xweş çêkir. Serda jî em çay û şerava Şergir bi xwe çêkirîye vedixwin. Cara duyem e ku em li vir şereba malê vedixwin.

Saet 22.00 yê şevê ye, em li ser gelek babetan dipeyîvin. Lê sibê em rêwî ne. Lazim e em xwe amade bikin û heta Mezelê Hemê bimeşin. Li wir erebê sîyarbin û herin pira Seyîdan an jî Kovancîyan.

Saet 23.00 şevê ye. Li orte yawanê yek malek û di malê de em du kes. Berfa erdê tariya derva ronî dike, lê tirs û xofek mezin li vir heye. Xasima ji provakasyonan ra gelek vekirîye. Di dema bihurî de çawa li vir jîyane? Dayika min, Xatûna bejn zirav – nuha ew bul bûye- çar salan li vir çawa tenê xwe jîya ye?

Gava din pisîkek belek li paş derê kadînê kire mîyav. Min derî vekir ev girt hindur. Sibeda jî li vir bû, taştî ya xwe jî li vir xwarî bû. Biharê jî min ev li vir dîtîbû, ev wext pir kuvî bû. Weka birûsk bazdida û ji me dûr diçû. Lê nuha ji min baznade, xwe lîngê min re dike, dora min re tê û tere. Ez ecêp mayî mam, ev pisinga kuvî çava xwe nêzikî min dike û natirse? Piştî ku xwarina xwe qedand deng jê dernakeve. Min ew dîsa avite kadînê, ew li wir dikare here der û bê, sibê em rêwîne. Heke ew di hindur de bimîne dikare bimire. Ji ber ku kes li mal nîne carek din jî kîngê vegerin ne dîyare.

Dixwazim serê salê tevî zarokên xwe derbaz bikim. Min ji bona roja 2004.12.22 an de bilêtek girt ez hatim Stockholmê.

Sibat 2005 an de min xwast ez herim Qeyserîyê bo teqawît bunê miracaet bikim. Wê salê berf pir barî ji ber berf û sermayê li Tirkîyê betlanea dibistanan ya Sibatê hefteke hat dirêj kirin.

Li Stenbolê teyera Qeyserîyê sîyarbum, ji rêwîyan fêr bum ku balafira Qeyserîyê ji ber berfê du roj e, ranebûye. Rêwî yê kêleka min got, wî ji Elmanyê cinaze anîye, du roje di balafirê de ye.

2005.02.07

Min rojekê şunda ji Midûrîyeta Dibistana H. Mustafa Gazioglu ra namek nivisî.

Di name da da zanîn ku *min 61*[83] *salîya xwe dagirtiye û ji 16 Sibatê vir de dixwazim emeklî bibim*. Lê midûr dixwast rojek be jî ez bikevim dersê, got:"Tu hatî û terî. Tu deftereke de jî îmze te tune, îro bikev dersikê, piştî wê ez nama te bigirim. Vira Tirkîye ye, sibê çi diqewim e, meriv nizan e."

Min got: na midûr ez naxwazim bikevim yek dersikê jî. Xwazî îmza meke ez ê herim." Rastî ji nuha ji min ra pir çetin dihat. Dawîyê îmze kir.

**Îxaneta dil**

Min xwest ez name û belgên dagirtî bi dest bibim Enqerê gavikê zû bona teqawûtbunê encam bigirim. Midûr çûyîna min pejirand got: *"ji bo du rojan îzîn ne lazime, tu dikarî îşev herî sibê êvarê bê"*

Li ber derê dibistanê rastî mufettîş Burhan hatim, haya wî çêbû ku ez bê îzîn terim, Enqerê. Got,*"Midûr, dikare tiştek bibe, çima Kazim bê îzîn tere?"*

---

[83] Li gorî zagonek nu kesên ku 15 salan xebitîne û 61 salê xwe dagirtîne dikarin emeklî bibin.

-Em îdare dikin, *"Formalîta îzinê wext digire, rojekê tere rojekê tê."*

Ew gotin ket serê min jî. Êvarî saet 10 an de sîyar bûm, sibê saet dora 5 an li Enqerê nêzikî qeymakamlixa Çanqayê em peya bûn. Ber bi Kizilayê meşîyam herim otelê. Li sukê tu kes tune bû. Nişkeva janekê avit sîngê min, min nekarî çi bikim. Heya wê demê cara yekem bû, rastî êşek usa dihatim. Destpêkê min got ji ber sermayê ye, piçikê mist da rêya xwe dom kir.

Rast karkerikî hatim paqişîya sukê dikir, karkerên Şaredarîya Dîyarbekir anî bîra min. Min jê pirsî li wan nêzikan otel he ye an tune? Got: *here Ulusê li wir otêl him pirin, him jî erzan in.* Lê wî jana min nedizanî.

Giran giran çûm sukê Sumerê, li wir min li otelikê cîh pirsî. 90 mîlyonê wê demê, xwest, car din poşman bû got saet 06 ê sibêye 60 milyon bese. Ez hema çûm ketim nav nivînan, min hêwîdikir eger ez germ bi bim wê jana min derbaz bi be.

Raketim saet 10 an de rabûm. Dixwazim herim wezereta Perwerdê. Li himber avahîya Gîmayê janê carik din ez girtim. Li cîhê xwe rûniştim ji hevalekî kevn Dr. Ruhî Koç ra telefon kir.

Wî xwest ez di cîh de herim nexwaşxanê, ew êş ne normal êş e, problema dil e. Lê min zêde bawernekir, ji sala 1980 vir de min her roj spor dikir. Hin caran bi kilometran baz dida. Hin caran diçûm havûzê 2 hezar metre avjenî dikir. Min meşa xwe domand, Ruhî carek din telefon kir, dî ku ez ne çûme doxtor xwe aciz kir.

Min kaxiz û belgên heyî teslîm hevalê Eskerî Teksîn kir û taksîyek girt çûm akuta naxwaşxana Hacettepê.Wan li wir heta saet 22:00 yê şevê ez razandim; EKG kişandin, tansîyona min pîvan, xwîn tahlil kirin. Dawîyê gotin tişteki te tune" û ez şandim mal. Tevî Mehmetê lawê kurapê min Adil çûm mala wan. Du rojan li ba wan mam problem derneket.

Du rojan şunda li mala brayê Nazliyê Şahîn bûm, min hîs kir ku ji binva nerehetîyek tê, me taksî girt em carek din çûn akuta Hacettepê. Em çawa ketin hindur min got *"ez ji bîrve terim"* û sedya ku li vir bû min xwe avit ser. Şîyar bûm ji xwêdanê kinc û kolê ser min bû ne av.

Doxtor got, *"tu nîv deqê çûyî û hatî."* Min got *"raste çûm cennetê hûrî tinebûn şunva hatim."*

Dora roja din anju kirin gotin lazime tu bypas bi bî. Lê ji bona wê jî ji midûrê dibistana min kaxiza îzînê dixwastin.

Min telefon kir, midûr got qet ne muhim e, emê çareser bikin. Bi faksê dane zanîn ku ez li dibistana wan mamoste me û bi îzîn hatime Enqerê.

Lê dûra bi alîkarîya Dr. Rojhat Budak û Dr. Ruhî Koç bi nexwaşxana Guvenê ra têkilî hate danîn. 28.02.2005 - 06.03.2005 di nexwaşxanê de razîm amelîyat bûm, çend rojan li Enqerê li mala xwîşka xwe Ekîlê mam. Jina min Nazli, keçên min Ciran, Bermal, Brayê min Sîdar û xwîşka min Husnîye di amelîyata min de hazir

bûn. Ji Londrayê xwîşka Nazliyê Zîlan û Nural, ji Stenbolê dîsa xwîşka nazliyê Zuhrîye bona zîyaretîya min hatin Enqarê. 16 Adarê ez û Ekîlê em bi hev ra çûn Qeyserîyê bûn mîvanê Burhan. Dora roja din min hemû karê xwe qedand û 17 Adarê vir de bi daxwazîya xwe dev ji mamostetîyê berda. Demikê şûnda vegerîm Stockholmê.

2005.09.20

18 e Îlonê ji Stockholmê hatim Stenbolê, saet 21.30 de jî hatime Dîyarbekirê. Zana û dîya min li gundin. Dora roja din hatim Kovancîyan, li wir min Zana dît. Zana Emîne anî bû doxtorê didanan. Em bi hev ra vegerîyan gund. 21 ê mehê de dîya min, Zana û Şadîye bi hev ra çûne Dîyarbekirê. Ez, Bayram û Emînê li gundin.

Dîya min zêde dilnedikir ku here Dîyarbekirê. Lê min dî ku ew xwe gelek diwestîne, behîvan top dike, qaşikê wan ji ser dike, kakilê wan derdixine... Bi kurtasî vala nasekine. Min got here, lê serî mehê dîsa were. Îro jî min rîya xwe li gundê Karê Alî Şawo xist. Ji bona mirina lawê wî sersaxî dayê û me gelek guftûgo kir. Êdî ew kalekî 90 salî ye. Qala kirkirina Filan- Ermenîyan- û talana Şêx Seîd kir. Her weha kirinên PKK jî kir. Meriv wexta ku tiştên qewimîne dibîhîze bawer nake ku mirov li himber mirovan van kirinan dike.

Nîvroyê li gundê Karê bûm mîvanê Alîqîya. Me serborîyên 25 salan berê bi bîr anîn. 1980 de şevikê li mala wî bibûm mîvan. Wê demê li min dihate gerandin, ango ez qaçax bûm. Êvarî Îzzet ez bi ereba xwe anîm mala me. Ji gundê Kotarîcê Mahîr Budak telefon kir.

Me bi nan û mast şîva xwe kir, televîzîyon temaşe kir. Pir derbaz nebû ez derbazî oda xwe bûm, ew jî razîyan. Nuha ez di xwanîyê kevn de tenê me. Di sala 1962-63 ande, 40 salan berê jî çawa ku li gundê Çoligê, Mirilê tenê bûm, dîsa ûsa tenê me.

2005.09.23

Saet 8 ê sibê ye, rabûm lê Bayram zûde çûye ser karê xwe. Karê wî ya vê demê topkirina behîvane. Xanima wî Emîne Xanim jî rûniştîye behîvên heyî kaşilan serda dike. Wan di nava xwe de spontane kar beş kirine. Ji bona ku congê Emînê diêşin, nikare bigere, ew nare yavanê, lê li mal dixebite. Behîv sipîkirin jî ji wê re ne rehet e. Herçî diçe wê diêşîne, seqet dike.

Emîne dayîka 12 zarokan e. Piranîya zarokan jî perwerde bûne. Pêşverû û welatparêzin, fêyde didin derûdora xwe. Emîne dora 70 slîye çongên xwe diêşê, nikare zêde bigere. Lê di cih de rûniştin jî herçî tere wê seqet dike. Nikare sed metre here. Lê ew ji xwe ra zêde nake problem, şev û roj li ber derê xanîyê kevn rûdine û behîvan sipî dike. Dibêje em wext nabînin ku hermîkê an jî qawunekî

bixwin, em wext nabînin, herin guşîk tirî bînin bixwin. Hemû hêz û wexta xwe dane ser behîv topkirinê.

Aydin ku boyaxa xanî dike, îro nehat, ew çûye Xarpitê, dawetê. Ez li siya darê rûniştim pirtûk dixwînim. Ji gûndê karê mamoste Hesen Mirad, Fikrî, M. Alî û cîranê me Qîya jî pêre hatin ba min.

Ji ber ku me di nava zevikê de dest bi avakirina maleke nû kirîye ji bona îkramkirinê ji hurmî û sêvên bexçe bêtir tu hazirîke me nîne.

Em şev terin di xanîyê Bayram a kevn de dimînin. Ew ji fidekarîyek mezin nîşan didin. Lê heta ku yek malek bû em bi hev ra diman ser de ji karker û mîvan jî hebûn.

Mîmarê me Zana li Dîyarbekir e. Wî derî û pençirên xanî li Dîyarbekir dane çêkirin, ew bi wan re mijûl e.

Dora roja din, Şemîyê piştî nivro li Gundê jorin tenê me. Hewa germe. Wexta ku ez hatim li Stokholmê me dem deman kalorîfer vêdixist, lê li vir hîn jî roj bi tin e, ez li ber rojê dîyax nakim û xwe davêjim sîya daran.

Tabîet (xweza) ango gîya, sinc û sûrî hemû hişk û zer bûne. Hûrmî, hûrmîyên hûngivîn, şekok kamil bûne, tirî gihîştîye. Çûkan, moze û mêşan bi daran ve girtine têra xwe dixwin. Hin hûrmîyên li gûlîyan heya nîvî ji alî moz û çûkan ve hatine xwarin. Gûşîyên tirî li ser mêvê hatine pûtkirin. Ev jî şûxûlê beraz û rovîyan e. Lê bi salane gund bê xwedîye, ked û şopa însan têde tune ye xweza wahşîy e û birîndar e. Zevîyên natine ajotin bi sincan, giya û kelemê ve hatîye niximandin.

***

Wê demê bala min kişandibû têr û tûr, heywanên beyanî, çivîkên sivîngan, kevok, gogercîn, kiriq, qijik, dîksilêman, simborek û qertalan xûya nedikirin. Lê berê ha bû? Li gorî gundîyên cîran kewên nîkûlsor, rovî, kergûh, guran ji ew der terikandîbûn.

Lê îro ne ûsaye. Piştî ku em du mal vegerîn, gund jîndar bûye, têyr û heywanên beyanî jî ber bi gund vegerîne. Simborekên sorik û poç dirêj di bêxçe da ji darekê bazdidin darek din. Lotikan didine xwe û didine xûyakirin ku ew ji me natirsin û ji hatina me kêfxweşin. Bi lingê tazî tu nikarî ku gavekê bavêjî. Bi solên havînê yê sporê jî tu nikarî pê rihet bigerî sinc têde terine xwar. Ji ber vê yekê min potîn an jî nivcîzme sol anîne wan kartînim. Hawirdor daristan e. Bi salane destê mirov le neketîye, pez jî tune ku lê biçêre. Bona wê jî daristan xurt bûne. Zevî pulik pulik pasik cîh mane di nava daristanan da. Qaşo ew di dema çûyî de zevî bûn. Sinc û Sûrî bi grnug û gûnî der û dor hatîye dagirtinê.

Mezra me ji eqreban pêk dihat. Şeş mal bûn. Pênc mal Budak û malek din. Lê ji bîst salan zêtire ku di gund de kes namîne. Tenê mala Bayram havînan tên çend mehan dimînin û terin. Xanî hemû xirabe ne.

Ez cara dawî Gûlana 1980 an de hatibûm gundê xwe. Piştî wê ji ber şertên polîtîk wekî gelek welatparêz ez mecbûr mam derkevim dervayî welat.

2005.09.25

Aydin hat boyaxa hindur dike. Heya saet 18.30 an xebitîya. Ji xeynî hindik tiştên piçûk, wî karê xwe qedand. Ew sibe naye. Min ava ser bexçê sêvan guharî, torbên çîmento niximand û ez çûm mal. Saet 18.30 Bayram û jina xwe mina her roj li derva ber derî rûniştine behîvan spî dikin. Ewran tarî kirîye, birûsk dijene. Me şîva xwe balcan û îsotên kutandî xwar.

Telewîzyon vekir xeber guhdarî kir. Lê Bayram êvaran zû radize. Saet 20.30 ye ew dihênûje. Ez di mala wî ya kevn de dimînim. Ew herdu ji kalin û nerihetin. Karên wan jî gelek e, lazime zû razên û zu rabin. Tu sanîyekê ji bona sihat û rehetîya xwe nafikirin. Pircaran ew gazinan dikin ku ew tenê ne û wexta wan tune ku ew sêv, hûrmî an jî guwşîk tirî bixwin.

Emîne dibêje,*"me hawînî jî negîhand ku em tasek tûyê xwe bixwin."* Ew saet 04 ê sibê heya saet 8-9 ê êvarê tim û tim dixebitin.

***

Hin caran zûrinîya guran û dengê beqan bêdengîyê diçirîne ewqas. Bê xwendin û nivîsandin wext derbaz nabe.

Pirtûka Dostoyevskî bi navê Suc û Ceza dixwînim. Ew pirtûk min berê jî çend caran xwendîye. Lê bona ku pirtûkên din tune ku mirov bixwîne, dûbare dikim. En tiştê sereke jî, elektrîk heye. Wexta ku elektrîk hebû gelek tiştê din jî pê ra tê. Weka telefon, TV, saringe, makînê kincan û makîna fereqşûştinê uyd.

Berê me bê lambe nîvê şevê di rîyan de derbaz dikir. Saet 2-3 ê şevê em rêdiketin diçûne Lexanê, Depê, Paloyê, Qowancîyan, Nazimîyê an jî Mêzgirê û Dêrsimê. Lê nuha jîyan hêsantir bûye.

Ji Kovancîyan grubek ji karkerên înşaeta me hatin em bi hev ra çûne masîyan. Me dora 100 kg masî girt. Heya ku me anî mal heval gelek westîyan. Lê barê min zêde negiran bû. Ji ber ku min tifing û hin hûrûmûrên din girt. Em hîn ji çêm dûrneketibûn, ku martîyan ser gola Sêgîrtîn girtin û masîyên bermayî topkin. Min gullek avit yek ji wan birîndar bû. Lingê wê ya şikestî pê de dardabû me hemûyan dî û em pir berketin. Ew hat seqetkirin, lê wê çawa jîyana xwe derbazkir nizanim. Poşmam bûm lê çi çare carekê bû û çû.

Eyûp Hoste û hevalên xwe 3 kase jî hirmîyên hûngivîn topkirin.

Payîz demsaleke bi berhem û bereket e. Qavun, qerpûz, Sêv, hirmî, şekok, tawî, gîjok, rixok, behîv, guz, bîyok, hinar, tirî û gelek fekîyê din, ji bo xwarinê di vê demsalê de kamil dibin.

Sibê sibê, kerîk nan an dixwum an jî naxwum lê heya êvarî bi xîyar, kute, tamatês, qavun, qerpûz, tirî û hirmîyan xwe têr dikim Ne nan ne jî xwarin ne lazime. Şivanên gundên dorê dibêjin *meriv li Haysivê birçî namîne.*

Dîya min dixwaze tola salan bigire. Yên ku pir dicedidînin ew û Bayram in. Tu divejî hela ew di lecê de ne. Bi olçegan behîv topkirine. Lê ticar erzan digirin. Yên şîrin mîlyonek, yên talik jî 6 sed lîre dikirin. Li gorê zahmetiyên wan ew fiyatek gelek erzan e. Topkirina behîvan gelek çetine. Çûyina ser darê û hewkirin an jî bi rotan kirina bin, erdê û hilçandina wan di nava sinc û Sûrîyan de gelek çetin e.

Sinc û Sûrî bi grnug û gûnî gund hatîye dagirtinê.

Dora salekê ye ku em bi awayîyê re mijûlin. Der û dor pir axme ye. Qalas, dîrek, tuxle, kiremît, torbên wala, yên çimento û kirecê, loda qumê û axa ku ji temelê hatîye vedan, borîyên qanalîzîsyonê, têl û qabloyên elektrîgê, qutîyên boyê, torbeyên çîmento, kartonên mozayîxê der û dora me dêrskirîye. Îro min ji wan gelek ciwand ser hev û agir berdayê paşê jî min agir tefand. Gîya û sincên hişk mîna pîşoyê ne. Ba jî heye eger çiruskek bi pekî nava gîya yê hişk, şewat wê heya ber çem here.




Xatûna dîya min kordela-şirita xanî dibirc. Ji alî çepê Şadîye, Ez û Mîmarê me Zana Budak.

Gelek caran ji ewrûpê hatin û çûyînê, me xanî ava kir û di sala 2005.10.13 an de em çûn binî. Dayîka min ev serkevtina bi çave xwe dî û bawerim, ku bi vê yeka çend salan emre wê dirêj bû.

Avahîya sê qat, bi sîwan (çati) û enerjîya rojê jî tevê.

Dîya min jî bi vê serkevtinê pir kêfxweş bû, kordela vekirinê jî wê birî. Ev yeka wê heq kiribû, ji ber ku ew bi salan tenê bi sere xwe dibinê xanî yê xirabe de bi rik û înat rûnişt û li benda wegera zarokên xwe ma bû.

Ew gorî ku nasnama wê de hatibû nivîsîn 1919 an de ji dayîk bûye. Lê di wexta xwe de nivisîn wê demê ji bo tu Kurdekî nebûye nesîb.

Li gorî nasnamê ew, di 92 salîya xwe de sala 2011.08.6 an çû ser dilovanîya xwe. Hin kes ji me dipirsin we çima ev awahîya avakir? Hêzên hikûmatê dikarin wê hilweşînin.

Bona hatina gund lazim e, cîhek starbûnê hebe. Ya duyem mala li gund dikare bi be merkez bona zarokên me yên ku li gelek welatên ewrûpê belav bûne. Her yek ji wan li welatekî ne û zimanekî dipeyîvin. Ingilizi, Elmanî, Danîmarkî, Swêdî, yên welat jî Tirkî û Kurdî.

Ya din jî dost û eqrebeyên ku belavbûne dikarin xwe li awahîyê bigirin û bên. Wexta ku gûr û çeqal dikevin nava refên karxezalan kerî belav dibe her yek alîkîve bazdide. An ji dema ku rovî dikeve nava koma çêlekevan wan diteqizîne. Piştre dayîka wan bi hêwî bana wan dike û wan dicivîne ser hev.

Avahîya me jî dê wek histêrika şivan, şewle bide, xisim û dostan bine ba hev. Ji sera pir wext derbaz nebû usa jî bû.

Piştî ku li Haysivê lambê şewle da, ji gelek cîyan dost û eqraban berê xwe dan Haysivê, hatin xêrhatina me û vegera me pîroz kirin.

Her sibê, her êvar û her saet mûzîga Kurdî guhdarî dikim. Dengê bilind a televîzyona Kurdî bi vê manê xizmet dike.

Bi wî dengê bilind dixwazim bidime zanîn, çîya û gelî, daristan û deşt, têyr, gûr û çeqal hemû jîndar haydarbin ku Haysiv şên e, li Haysivê jîyan heye. Haysiv dîsa vedigere rojên xwe yên kevn. Behîvan top dikin, rez dibirin, hermîyan diqelişin ango qaxan hişkdikin.

Bayram jî malek xweşik avakirîye. Kevnar Mamoste Welî 40 donim rez avakir.

Dayîka min a 90 salî saqol û havlêk tedarîk kir, der û doran dimale.

Evana hemû li Haysivê îşaretên jîyanek nû ne. Ev qoçberîya ku 1980 ê û salên dû wê ber bi metrepolên Tirkan û Ewrûpê destpêkiribû, niha paşve dizivire.

**Mirina Zana ya bêwext**

Di 10 ê meha Gulanê 2006 an da, di rîya Erganî-Dîyarbekir de ereba Zana qûlipîya ew û kekê wî Şergir giran birîndar bûn. Ji wê rojê vir de Zana di nexweşxana Metrepolê de tedavî didît.

Doxtor û hemû xebatkarên nexweşxanê alîkarîyek mezin nîşandan. Lê çi çare ku ji ber birînên xedar nikarîn wî rakin ser lingan.

Me roja 2006.05.16 ew bir li Haysivê li dîyarê Qendîlan li cem bavê wî ew spart axê.

**Min li ser gora Zana bi zimanê Kurdî ew axavitin kir.**

Xwîşk û brayên delal,

Wekî tê zanîn me Zana wenda kir. Di 10ê meha Gulanê 2006 an de di rîya Erganî-Dîyarbekir de ereba Zana û kekê wî Şergir qûlipîya ew herdu giran birîndar bûn. Ji wê rojê vir de Zana di nexweşxana Metrepolê de tedawî didît.

Doxtor û hemû xebatkarên nexweşxanê alîkarîyek germ, cehtek mezin nîşan dan. Lê çi çare ku ji ber birînên xedar nekarîn wî rakin ser lingan. Zana ji mezra Haysivê –Dêrsim- ê û ji malbatek welatparêz tê. Wî di salên piçûk de bavê xwe şehîd da.

Ew bi hesreta bavê mezin bû. Hêrs û kîna wî li himber dijmin bê sînor bû. Wî xortanî û emrê xwe yê kin li Dîyarbekirê jîya û qedand. Wek mîmar di daîra girêdayî yê Wezereta Karên Gundan de dixebitîya.

Ew, miroveki têgîhîştî, zana, mîmarekî baş bû. Ew di nava xebata civakî û welatparêzî de hate patin û ew bû tekoşereke azadîyê.

Xebat û pêşveçûna başûrê welat eşq û hêvî dida wî.

Di xeyalê wî de Kurdistanek azad hebû û ew ji bona wê dixebitîya.

Em carek din ji hemû personalê nexweşxana Metrepolê re, ji dost û hevalên alikar re û hevalên hazir re spas dikin.

Serê me, serê gelê me sax be. Kesên ku ji bona azadîya welatê xwe xebat kirine nayne bîrakirin.

Bijî xebat û tekoşîna ZANA!

ZANA di dilê me de ye!

Bijî gelê me!

**Birayê delal Zana**

2006.0517

Min ew nivîs di deftera ser şînê de nivisî. Xwîşk û birayên te, ap û metên te tewî eqrebe dostan li ser gora te bi sedan kes gîhîşte hev. Dostên me gelek xem xwarin, her yekî bi bîranîneke tu bibîranîn. Gundîyên me, karkerên ku ji me ra xanî ava

kirin, dukancîyên ku me jê kirîn kirîbûn, hemû hatin bona ku ji te xatirê xwe bixwazin.

Dost û hevalên Dîyarbekirê bi 40-50 erebe yî tevî te hatin û li ser gora te amade bûn. Di nava niv emrî kêmtir wext da, te çawa ewqas dost qezanç kir, li ser gel ewqas tesir kir?

Gelê me qedirşînase, dost û yarên xwe bîra nake. Neyarê xwe jî ...

Mêrxwasî, welatperwerî ji bavê te mîras e, ez dizanim. Lê jîyana te jî mîna ya wî kin bû, nîvjîyan bû. Te jî wek bavê xwe lezand û tu ji nava me çûyî. Lê em kesên ji malbata te, heval û dostên te dest di paşilê da, heyîrî mane.

Me tu li ba bavê te hilanî, ji ber ku te hesreta bavê xwe pir kişand. Piştî jîyana xerîbîyê mirinek bêwext rê neda ku hûn bi hev şabin.

Nuha hun bav û law di hembêza welatê xwe de bi hev ra ne, hesreta xwe derbaz bikin. Em sê rojan, bê hêwî, li cîhê şînê rûniştin. Me dizanîya ku tu wê qet venegerî, lê dîsa jî... Gelek heval û dostên te hatin seredana me. Mêr, jin, xort kal, nas nenas lê gelek dost. Mamosteyên zanîngehê, hevalên te yê dibistanan, yên xebatê û yên meş û şeran. Em dizanin hemû jîyan kin an jî dirêj rojekê dawî lê tê.

Wexta ku jîyan dest pê dike, mirov roj bi roj mezin dibe û ber bi mirinê jî gav davêje. Laşê zindî him dijî, mezin dibe, him jî ber bi dawîyê tere. Ji ber wê mirin jî qismeke jîyanê ye. Jîyan beza ber bi mirinê ye. Jîyan û mirin ber bi hev dibezin, lê hin caran mirin lez bazdide xwe zu dîgîhîşînî jîyanê.

Pir caran hin tişt di destê mirovan de nîne. Qezayek dikare dawî jîyana mirovan bîne. Mîna te.

Lê kin be jî te gelek xebatên hêja kir û şax berda dilê dostan.

Kes ji xwe re malê dinê nikare bibe. Lê ji paş xwe ve tu dikarî tenê tiştên ku te kirine bihêlî. Tiştên te ji bona der û dora xwe, ji bona gelê xwe, ji bona sîvîlîsasîyonê kirîye te dide jîyandin. Kêrhatina mirovahîyê pîvan e.

Her mirin bêwext e û bêbext e, tu gotin têrê nake, Rûsarî û xemgînîye tu derman karnake.[84]

**Seddam**

2006.12.30

Îro ber bi sibê saet 04an de diktatorê xwînmij Seddam li Bexda dê hat êdam kirin. Destê wî paşve hatî bûn kelepçekirin. Paltokî reş li ser bû. Wî nexwast çav û suretê wî bê girtin. Qûran daxwaz kir, tevî îmamekî dua kir. Gelê Iraqê bû, du perç e, aligirên Seddam û yên dijî Saddam. Şiî û Kurda şahî kirin.

[84]Li ser kevirê gora Zana ew nivîs hate nivisin: "Her mirin bê wext e û bê bexte, tu gotin têrê nake, Rûsari û xemgînîye tu derman karnake."

Dilxwazên wî xwastin cinaze bibin Yemenê, lê berpirsîyarên Emerkî rê ne dan. Sunîyan êrîşên terorê zêde kirin. Îro (80) heyştê kes hat kuştin. Îsraîl, Îran, Emerîka şa bûn. PLO wek cînayetek sîyasî binav kir, Lîbyayê 3 roj şîn danî. Tirkîye bêdeng e, dibêje karê Iraqê ya hindurîye. Yekitîya Ewrûpê êdam wek barbarî binav kir. Balyozxana Emerîkî ala xwe daxist nîvê. (Ez nizanim ev çima?)

ABD, Iraq li himber Îranê kir şer. 10 salan bi hev ra şerkirin.

Seddam 1987 an de li Ducala 140 şiî kuştin, ew ji ber wê dozê hat daliqandin.

16ê adarê1988 an de bajarê Helepçe bi gaza kîmyawî bombe barankir. Li gorî agahiyên fermî 5000 kurd bi gaza kimyavî hatin kuştin û bi qasî 10 hezar kes jî birindar bûn.

Ji 21 sibat 1988 û 6 îlona 1988 an de 182 hezar kurd hatin qir kirin. Qirkirina ku di wê peryoda de hat kirin ra dibêjin Enfal. Enfal navê komkujîya kurdan a başûrê Kurdistanê ye. Hikûmata Herêma Kurdistan 14 ê avrîlê wek roja Enfalê êlan kir, û di wê rojê de çalakî têne darxistin. Kesên ku xap kirine hustu Seddam sloxana "bijî Sadr" bang dikin. Xelkê tirk ser navê "bisulmanîyê", tedexulkirina Emerîkê û daliqandina Seddam baş nabînin. Lê sedema esasî, ew naxwazin Kurdên Başûr statuyekê bi dest xinin. Azadbûna (Bakurê Iraqê!) ango Başûrê Kurdistanê jî wan dike fikaran.

## Partîya Civaka Demoqrat (DTP)

2008.11.03

Daxwazên kurda ewin ku ji alî sîyasî ve hikûmat gav bavêje. Alîkîve tê gotin ku li Grava Îmralîyê serokê PKK ê Abdulla Ocalan rastî êşkencê hatiye. Çend roje Partîya Civaka Demoqrat (DTP) li gelek bajarên Kurdistan ê xwepêşandinên protestoyê pêk tîne. Ango bê îtîadi ya sivîl pêktîne. Partî di hemû qadan de di nava protestoyê de ye.

Parlamenter, şaredarên şaredarîyan , endamên jin, xort û dilxwez hemû gel di nava livikê daye. Serokwezîr Erdoxan jî gera xwe ya bajarên Kurdan didomîne. Duh li Wanê gel hatina wî bi xurtî protesto kir û di navbera gel û polês de şer derket.

Li Heqarîyê di bîna Partîya desthilat de teqandin çêbû, birîndar hene. Di xwepêşandan û çalakîyan de divê li himber şaşitî û provakasyonan hişar bin.

Çend rojan berê li Dîyarbekirê, li Dêrsimê, li Rûhayê û li Batmanê jî xwepêşandanên mezin hatine çêkirin. Rojnamên Tirkan dinivîsîn ku,*"li Dîyarbekirê li himber kolordîya 7. Emîn sedan kesî bi hev ra rûniştin pêk anîye..."* wê yeka weka ku li himber tiştekî miqades bê hûrmetî bê kirin şirove dikin.

Di hemû rojnamên Tirkan de li himber DTP êrîşek tundî heye. Hin pênûsên, hin caran tiştên pozîtîf dinivîsîn, navê pêşverûtî û demoqratîyê dabûn ser xwe hemûyan berê xwe dane DTP ê û li barê wan dixinin.

Hin kurd jî bi navê rexnê li himber PKK û DTP ê neyartî û êrîşên xwe didomînin, lê li himber kirinên leşker û polîs bê dengin, meriv ji xwe dipirse *"ma gelo tu gûnehê diz tune?"* Dewleta Tirk, kesên ku dewletê îdare dikin pir humanîst û demoqratin?

Tenê polîtîkek netewî û rast gelê Kurd digîhîjî ne hedefê. Ji bona wê jî hemû xebat, gotin û propaxende lazim e, bi vê armancê re xizmet bike. Îro ji her wextê zêtir ji platformeke netewî ra pêwîstî heye.

Li welatê me rewş gîhaştîye merhaleke nû. Kes, grûb û hêzên Kurdistanî yên din, jî divê li ser PKK ji nû ve, bi şikleki objektîf bifikirin û bikarin tewî wan xebatê bigrine rojeva xwe. Rexnekirin ne bese, divê alternatîf jî nîşandin. Tenê gotina "PKK terorîst e," an jî "ajan e" ne bese û gel qane nake. Propagende û vaca kirina nûçeyan parçek ji şerê sar e. Wexta ku hostatî bê karanîn tesîr û rola xwe mezin e.

Di wî alî de dewlet xwedî derfetên mezin e. Pir caran nûçeyên çewtî û nebûyî dikare mîna nûçeyên rastî bi xwendewanan bide bawer kirin. Îro bûyerên ku li Kurdistanê diqewimin di saya weşanên Kurdî û ewrûpî de têne zanîn. Ew nebin gelek tişt nerast wê li gorî gotin û şirova dijmin bêne pejirandin. Îmkan û olaxên gelê kurd di vî warî de jî bi sînor e. Yên heyî jî dewlet firsendê nade. Hin xebatên hene jî saziyên dewletê bi metodên terorîstî dajo ser. Bona fetisandina wan gelek qanûn û metodên bê qanunî hene. Dewlet *"qanuna li dijî terorê"* dixwaze dijî weşana Kurdî karbîne bigire.

2009.12.11 de Partîya Civaka Demoqratîk ji alî mehkema Bilind ve hate girtin. 2009.12.15 de li Bulanixê protestokirina girtina partîyê bi gulebarana xwefroşekî bi navê Kemal Aycan û Necmî Oral du welatperwer hatine şehîd kirin. Hin Kurd jî bi can-û dil polîtîka hikûmatê- dewletê diparêzin û PKK sucdar dikin. PKK xwedî gelek kêmasî û şaşitî ye, xasima li himber mixalefeta tevgera Kurd û mixalefata nav xwe da. Lê dîsa jî maf nade wan kesan ku ew li himberî tevgera Azadîya gelê xwe rawestin û polîtîka hikûmatê biparêzin.

Şaşitî û kêmasîyên PKK ê di platformên cuda de divê bêne ziman û gotin.

2009.10.30

Di roja 2009.10.18 de 36 qasidên aşitîyê, ji Başûrê Kurdistanê (Qendîl û Maxmûr) bi wêrekî û serbilindî ji derê Silopîyê de hatine mala xwe. Ji Mexmur- Qendîl heya Dîyarbekirê bi sedhezaran kes tevî rêkirin û pêşzawazîya qasidê aşitîyê bûn.

36 kes li Sîlopîyê hatin dad û azad kirin. Îro rojeke dîrokî ye.

Gelê Slopîyê bi coş û kêfxweşîyek mezin çun pêşwazîya "kevokên azadîyê." Li ber derê Xabûrê bi sedhezaran kes civîyan. Parlamenterên DTPê (Partîya Civaka demoqratîk), nûnerên sazîyên demokratîk, Mazlum-Der, Kesk û 43 parêzer amadebûn.

Ne tenê Silopî ji her çaralî Kurdistanê gelê me rêwitîya koma aşitîyê şopand, piştgirîya xwe de xuyakirin û ew sê rojan weka festîval pîrozkir. Bi dilgermî ev hembêzkirin û gotin "kevokên aşitîyê hun bi xêrhatin."

Kesên ku xwe negîhandîbun Slopîyê jî di bajarên xwe de xwepêşandin, şahî û çalakî li darxistin. Li Dîyarbekirê, Gewerê, Çolemêrgê, Şemzînan, Tetwanê, Agirîyê, Sêrtê, Dêrsim, Elazîzê, Sembol û li Mêrsînê û gelek deverên din gelê me kon vedan, belavok belavkirin, govend girtin û hatina kevokên azadîyê slavkirin.

Gele kurd bi cesaret û eşkere li ewladên xwe û aşitîye xwedî derket.

Helbet va şahî û pêşwazîya germ ji bona aşitîyê, ji bona rawestandina şer bû. Şahî li hember bi hêvîya li dawî hatina şer, şewat, sirgunkirin û kûştinê ye.

Ev lehîya gel, coş û şahîya gel hêvîya aşitîyek rasteqînî bû. Li nasname û tekoşîna xwe xwedî derketin bû. Lê himber valakirin û şevitandina gundan, li himber kûştîyên failê xwe dewlet, li himber zilm û zordarîya qontrgerîlla, jîtem û polês û leşker serhildaneke gelêrî bû. Li axa xwe, li aşitîyê, li ewladên xwe û nasname xwe xwedî derketin bû. Li şehîdên azadîyê û li gelê xwe xwedî derketinbû.

Yên hatî 36 can bûn. Lê gelê me şêhîd û pêşmêrgeyên xwe di şexsê wan de slavkirin.

Gelê me li hêvîya gelek tiştane: dixwaze îdara xwe bi xwe bike, di mala xwe de bê tirs razê. Li ser axa xwe di zevî û baxçê xwe de azad bixebite û bijî.

Naxwaze ewladên xwe li serê çiyan şêhîd bide. Ew çek û şer, kuştin û cinaze naxwaze. Dixwaze ziman û çanda xwe pêşxine û bide jîyandin. Weka gelê tirk xwedî azadî û serbestî be.

Lê xûyadike ku dewleta tirk bingehê prosesa aşitîyê ava nekirîye. Bi hin tedbvîrên teng dixwazin encamên bi berhem bigirin. Ji xwe armanca gelek derdoran jî ev e ku PKKê bê çek bikin, ji holê rakin.

Hin der û dorên şerxwaz şiklê peşwazîkirine ji xwe re kirine mane. Çima gerîlla bi cil û bergên leşkerî hatine, çima ew mina lehengan hatine peşwazîkirin. Lê ew tazî bihatina, ma çekên wan yên din hene ku ew biguherin. Ew ji ji bajaran nayin ew ji serê çîyê hatin. Va çawa demoqratîk bûne ku cil û bergên wan qayil nabin. Û ew çawa demoqratîze bune ku hun ji çekên wan eciz dibin.

Çima ew çeteyên Ergenekonê ne, an çeteyên susurlixê ne? Helbet ew lehengên gelê xwe ne û wan ew peşwazîya heq kiriye. Eger ew ne lehengbuna wan ji bona aşitîyê ev risk nedigirtin. Ew yeka fedekarî û xwedi qedir û qimet e. Ji ber ku koma ku 1999 de hatibû welat bi 10-15 sal hatin ceza kirin.

Dewlet ji dîmenên Silopîyê xoft girt. Tirs kete dilê wan, nava wan qetîya. Şovenîzm, bi serbilindî û nepoşman hatina qasidên aşitîyê ne rehet bûn. Hikimatê li himber rexne û êrîşên CHP û MHPê û medya tirk, pêşwazîkirin weka şova DTPê nirxand û paşve gav avit.

Serokwezîr Recep Tayîp Erdogan di axavitina xwe ya li Agirîyê û li Erzûrûmê de DTP rexnekir nerazîbûna xwe de xûyakirin. "Eger ha bidome pêvajo bêgirtin, em dîsa vegerin sêrî."

Wezîrê Karê Hindur Beşîr Atalay jî got ku "*em, dîmenên ku li Silopîyê derketine holê napejirînin. (...) Kakilê pirsê ev e, çek deynin, ji çîyê dakevin. Hatina kesên li Ewrupê ji bo me, ne di qora pêşinda ye.*"

Dewletê dîsa durûtî kir. Di nava xwe de biryar girtin û proses cemidandin. Li gorî daxûyanîya 26 cotmehê, nivîskarê rojnama Mîllîyetê û dewleta kûr Fîkret Bîla, *Serokwezîr Erdogan û Serokleşker Başbûg ji bo navber dayîna vegerên* ***grubên aşitîyê*** *bi rîya telefonê li hevkirine.*

Berdevikên grubê ku ji Ewropê biçûna welat Îsmet Kem û Vesîle Yuksel jî bi daxûyanîye kê ev pêvajo nirxandin. Wan danezanîn ku "*xwe ji bo çûyîna Tirkîyê û ji bo aşitîyê bixebitin amadekirine. Lê qonsolosa Tirkîyê ji bona vegera 15 kesên ku ji Evropê biçûna Tirkîyê pasaport neda. Ew vê pêvajoyê vê bişopînin.*"

Partîyên mixalîf CHP û MHPê, serokleşkerî, derûdorên şerxwaz ji biryara navberdayına *dayîna vegerên* ***grubên aşitîyê*** şabûn. Hemû bi hev re bang gel dikin ku dakevin sûkan gavên demokratîk bêne astengkirin.

Di ciwîna CHPê ya 27.10.09da serokê CHP, Denîz Baykal bi şêwazên provakatîv hestên şovenîst pîjkir, bona ku ew gav sernekeve xebitî.

Li gorî Baykal; *yên ku ji Başûr hatine ne poşmanin û ji PKKê jî neqetîyane û mîna lehengan hatine pêşwazîkirin. Li Silopî yê mobîl dadgeh, an jî çadir dadgeh hatin avakirin... Lê tu wan digirî hindur û berdidî.... Naveroka şer çî ye? PKK dixwaze welatê me parçebike, yekitîya me xira bike.*

*Gel va yeka dî û li hember derket, lewma wan navber da, an jî dev jê berdan.*

*Di nava me de ji her netewî kes hene. Lê ya esasî eve ku xwe parçek ji netewa tirk bihesibînin... Li Çeçenîstanê jî çeçen hene li vir jî. Li Iraqê û li Lubnanê ereb hene, li vir jî...*

*Li Anadolîyê protesto hene, eger ku hukimat vana negirin berçavan, bi milletre bikevine nava înadê netîcên nebaş bêne holê."*

Li Konyayê 100-150 kesî di roja 25 ê cotmehê de êrîş bire ser avahî ya DTPê.

Lazime hemû kurd li peşmerge ji li qendile ji li DTP ji xwedi derkeve. Be şert û destkevti danina çekan a PKKê ne rast e. CHP gensoru dayê di derhaqê beşîr Atalay de. Mixalefet ji hatina kurdan ne razîye, wan mirî dixwaze.

* * *

*"Bona ku histêrên çavên dayîkan raweste em, nikarin şerê li himber terorê rawestînin."*

2009.11.10

Di 10 ê meha 11 sala 2009 an de li ser pêvajoya rêliber vekirina pirsa Kurdî di parlamento Tirk de nîqaşek hat darxistin. Berdevikê CHP Onur Oymen jî dîtina partîya xwe (CHP) anî ziman. Li himber rê li ber vekirina pirsa Kurd derket û got "bona ku histêrên çavên dayîkan rawestê em nikarin şerê li himber terorê tê dayîn rawestînin. Çima di şerê rizgarîkirina Tirkîyê da, di şerê li himberê Şex Seîd, şerê li Dêrsimê û Qibrisê de dayîk negîryan? Kesî got ku em şer rawestînin bila dayîk negîrin?"

Ew bi vê peyva xwe li himber nermbûnê derket û qetlîam û hovitîya ku di coxrafya Kurdan de ji alî CHP ve hatîbûn kirin pejirand, ew metod û rêbaz ji bona îro jî weke çare pêşniyar kir.

## 3ê meha tîrmehê em çûn Alanyayê

2010.06.30

30ê meha hezîranê em ji Stockholmê hatin Stenbolê û ji wir jî hatine Enqerê, daweta Beran, lawê Şahîn.

Ez, Nazli, Zinar û Dersîm in. Li Enqerê balafirgehê Cîran jî tevî me bû. Ew ji Qahîrê tê. Em li Bêşewlerê çûn Otêla Mala Mamostan.

Dora roja din çûn bajar, mala Şahîn xalê zarokan, Dr. Rûhî Qoç ji wê dere e em birin mala xwe. Li havîngeha wî me şîv kir saet 12.00 şevê em danîn otêla me.

Ji bo yek merivekî em 50 lîre perê Tirkan didin, taşt di nav de ye. Otel paqiş û lux e. Dawet- dîlan li Golbaşi- Serêkanîyê di otelek lux de çêbû. Wek tê gotin otel ya Mehmet Haberal e.

3ê meha tîrmehê em çûn Alanyayê, li wir jî me di otêlê de cîh girtîbû. Lê bona ku Cîran dûra hat me ji wê re jî cîyek pêyda kir, çar rojan şûnda ew vegerîya Qahîrê. Dora roja din Zinarê birayê min û keça xwe Şîlan hatin heya 14 ê mehê li ba me man.

Katibê otêlê bi hîlle xwest hesavekî zêde ji me bigire lê min da rû û ew rastkir. Ji bona 12 rojan 5 mîlyar perê Tirkan me da otelê, xwarin vexwarin di nav da.

Dersîm û Zinar çûn Stenbolê, şevikê li ba Bêrîvanê bimînin û ji wir jî vegerin Stockholmê. Ez û Nazlîyê çûn Dîyarbekirê, Zinarê mezin û Dîyar jî hatine. Ez û Nazlîyê ji bona çend rojan çûne Çolîgê, ji wir jî derbazî gund bûn. Gund dîsa şên e. 27 ê Tîrmehê Nazli û Şîlan li Xarpitê sîyarbûn, terine cîhê xwe. Serdar jî ji Londrê hat. Dr. Baran (Omer Polat) jî tev kurapê xwe bûn mîvanê me.

Di destpêka meha Îlonê de qoçberîya ber bipaş dest pêkir. Serdar, Mexpule, Şadîye, Zinar pê hev ji gund dikişin. Rojhat tevî hevalekî hatin bûne mîvanê me.

Çend rojan em bi hev ra çûne Depê, Dêrsimê, germika golan û Baxînê, me xweş wext derbaz kir.

Li gund ez, Ekîle û Dîya min man. 19 Îlonê Ekîle jî bona daweta lawê xwe Azad tevî Baran çûn Dîyarbekirê. 26 ê mehê de terin Îzmîrê. Ez û dîya xwe li gund tenê ne. Der û dor bê deng e, dîya min hin caran qala bûyerên kevn dike, lê zêde tişt nayên bîrê.

Welî û Bedrîye hatin, me heta derengî şevê sohbet kir. Bedrîye li ba dîya me ma. Nazli, Bengîn, Dersîm, Bermal, Bejna, Zinar hemûyan telefon kirin, başin. Cîranê ra jî min telefon kir.

21 Îlonê ez Bayram û Mamoste Welî çûn gundê Kotarîcê. Mixtarê gund Bahrî qeza trafîqê kirîye, mirîye.

## Li ser pirtûka Burkay

Pirtûka ku ji alî Kemal Burkay ve hatîye nivisîn û bi navê Anilar Belgeler cilda 2 em hezirana 2009 de li Stockholmê di nava *Weşanên Roja Nû de* hatîye weşandin ket destê xwendevanan.

Lê wî di pirtûka xweda dijî hêwîyên me dîroka tekoşîna partîyê reşkirîye, keda kadroyan înkar kirîye û pirtûk bi pîsîkolojîya ku hemû tişt bi wî destpêkiriye û dîsa bi wî biqedê, nivîsîye.

Di derhêqê pirtûkê de nivîsa ku min bi zimanê tirkî nivisîya bû û di sîta Gelawêj de hat weşandin. Kurdîya wî jî min di vir de cîh dayê. (...)

Her çiqasî dîroka nivîsandinê kevne jî di welatê me, Kurdistana Bakur de ji Doza Kurdistana Zinar Silopî û *Hatiratim* û *Dîroka Dêrsimê* ya Dr. Nûrî Dêrsimî bêtir di derheqê dîroka Kurdistanê de zêde çavkanî tune. Îro berhemên herdu welatparêzên kurd di destê kesên ku li bûyerên derbazbûyî dikolin çavkanîyên hêja ne. Xasima berhemên bi destê kesên di nava bûyeran de cîh standîne, xwedî tecrube û zanînin, hatine nivîsandin dîroka civatê ronî dikin û ji têkoşîna hatira, rê rava dikin. Qadroyên kevn, yên ku bûne şahadê gelek bûyerên dema xwe, bona ku ew nenivîsîne û ji şunde çavkanîyên nivîskî nehiştine, em pir caran ber dikevin û wan rexne dikin.

Bona vê yekê divê Kurdên welatparêz bûyerên ku jîyane an, jî dîne, li gorî dîtîn û bawerîyên xwe wan şirove bikin, binivîsîn û nehêlin ew bêne bîrakirinê. Ew yeka ji bona dîroka gelê Kurd girîng e.

PSKT-PSK jî di şîyarbûna gelê kurd de rolek baş list. Bi navê *Rîya Azadî* kovarek, bi navê *Roja Welat* Rojnamek û bi dehan pirtûk weşand. Di rêvabirina sazîyên demoqratîk de cîh girt û şîyar bûna îdeolojîkda pêşengî kir. Di şerê demoqrasi û sosyalîzmêda bû teref û mil de xebatên pêşverû û demoqratîk. Li

Dîyarbekir û Agiriyê li du bajarên navenda berxwedana tevgera Kurdda şarederîya bajar qezanç kir.

Di tekoşîna netewa Kurdda PSK xwedî cîhekî baş e. Sedema ku Kemal Burkay jî demek dirêj sekreterîya wê partîyê kir û di polîtîkayê de xwedî tecrûbe û ked e, divê wan tecrubeyên xwe derbazî nifşê nû bike. Ew yek him girîng e, him jî vatinîyek e

Lê tiştên ku di pirtûkê de hatine nivîsîn ji bîranînan bêtir, sûçdarkirin û mehkûmkirina, kesên ku ji partîyê veqetîne.

Tiştên ku di derheqê qadro û berpirsîyarên ku gelek salên xwe di nava partîyê de bi tekoşînê derbaz kirine hatine nivîsîn hemû jî tiştên negatîfin. Halbûku di derheqê partîyek ûsa de dîrok, an jî bîranînên ku têne nivîsandin, zêtir objektîfî û ciddîyetê heq dike.

Bûyerên kevn, yên ku di pirtûkê de cîh girtine bi alîkarîya weşanên kevn bi dor, kronolojîk hatine rêzkirin û ew ji bîr bûnê hatine xilaskirin. Li gorî bawerîya min ew fêydek herî baş ya vê pirtûkê ye. Zimanê neqil kirinê ahengxweş e, bala xwendewan dikişîne ser pirtûkê, lê naverok ne ûsa ye henekê xwe bi endamên xwedî ked dike, wan nizm dike, dehf dide, birîn dike û xebata wan reş dike. Hin bûyerên ku di pirtûkê de hatine nivîsîn ji rastîyê dûrin û nivîskar ew qasî ku xwastîye dîtîye û li gorî dilê xwe şirove kirîye. Ji wê eda nivîskar a neheq, nizmdîtî û henekkirî ne tenê qadroyên nava PSK ê, bêje hema hemû qadroyên Kurd jî yên ku salên 60î vir de di nava tekoşînêdane para xwe girtine.

Kemal Burkay di rexnê xwe de alî negatîf bi mezinkirî derdixine pêşberî xwendevanên xwe, mirov dikare bêje wî tenê rexnên negatîf bijartine, ji bona wê jî pirtûk bi vê xisûsîyeta xwe ve jî balkêş e.

Eger ku di hin cîyan de ji bona qadroyekî sifatekî erênî bi kar anî be jî, hema bi hevokê dûyem de bi gotin û nîşanên neyînî ew jî reşkirine û ji holê rakirine.

Mînak; "*Farûq li gorî, dereca zanebûna xwe û şexsîyeta xwe ya efendî, bi rastî merivekî pir tembel bû, xwe neda kar, di organa partîyê ya bilind de kêr nehat. Îhsan jî hin tiştan bike jî, piranî xira kir.* (rûpel .7)

"*Zekî merivekî zîrek û di têkilî danîn de serkevtî bû. Ji bona vê yekê, me ew girt nava partîyê şûnde di wextek kinda jî ew anî komîta merkezî. Lê pir bi hirs bû, di zikê xwe de xwedî bazarî bû û li himber hevrêyên xwe hesûd bû. Wî jîyanek lûmpenî derbaz kiribû. (...) Pir zêde ji şîddetê hez dikir. (...) di xebata polîtîk de jî xwedî daxwazîyên qomployî bû.(r.263) M. Elî tîpekî usa bê sebir e ku hêrsbûna xwe zû dide xûyakirin. Lê li himberî vê jî li Dîyarbekir ji partîyê veqetandinê de li himber partîyê durist tevgerîya û îmtihanek baş da.*"

Çawa ku xûya dike heger di derheqê yekî da, hevokek erênî nivîsî be jî bi hostatî, bi hevokek sûbjektîv, bi sifatek negatîvî wê jî pûç dike.

Di matematîgê de neyînî û erênî hevûdû bêqîmet dikin û li dawîyê sifir dimîne. Burkay di pirtûkê de yên ku kirine binê sifirê jî hene. Ez qala wan jî nakim. Kesên ku demikê di partîyê de berpirsîyarî kirine, tevî wî tekoşîn dane, fêdekarî kirine bi vî şikilî, neheq rexnekirin, nayê qebûlkirin.

Kesê ku rêza keda mirovan negire, hemû tiştan bi xwe bide destpêkirin û bi xwe bide qedandin, bi pîsîkolojîyek kîndar û bi hêrs texlîla bûyeran bike dikare encax tobloyek usa derxine holê. *"Mirov li hêwîya dara mazî nebe ku gûl vede."*

Di nava gelê kurd de gotinek heye, dibêje, *"eger ku va dirêjahîye lê ka berayî?"* kesên ku te di pirtûka xwe de bi nav kirine hemû *"xirab"*, *"ne kêrhatîne"* lê yên baş kî ne û ew li kiderê ne?

Divê ji nivîskar bê pirsîn, kesên ku di pirtûkê de wek kêrnehatî hatine nîşandan, bi salan weşan belavnekirin, di nava gel de xebata polîtîk nekirin, bi pere fêdekarî nekirin? Van qadroyan di Kurdistanê de sazîyên demoqratîk ava nekirin û rêva nebirin? Van qadrona karên xwe, zar û jinê xwe û welatê xwe neterikandin û sirgunîya 20-25 salan nejîyan? Van qadrona zîndan ranezîn, êşkence nexwarin?

Neheqîyek mezine ku di nava partîyê de mirov xebat û cehda havalan piçûk bike û fedekarîyên wan nebîne. Nivîskar xwe kirîye merkeza hemû xebatan û hemû serkevtin jî bi meqaleyên ku wî nivîsîne ve girê dide. Lê xwendevan jî dizane ku mirov li Enqerê rûne û bi maqeleyan li Kurdistanê tevgerek usa nikare damezirîne. Her tişt ûsa bi reşbelekê nabe. Eger ku hemû tişt bi tilsima nivîsên te va girêdayîye, li Dêrsimê rewşa partîyê ya xirab, em bi çi dikarin şirove bikin?

Hemû dilxwaz, endam ne nivîskar bûn. Lê wan jî hin marîfet û xisusîyetên xwe hebûn, ew jî bi van bûn piştgirê partîyê.

Avahî li ser temel, bingeh û stunan tê avakirin, lê diwar, pencire, derî û çati jî gelek girîng in, hemû bi hev ra malê temam dikin. Te wek sekreter cehd kir, nivîsî, zêtir xwedî kedî, karên ku te kir, me nekir. Lê te jî karên ku me kir, nekir û nedikarî biki jî. Nivîs û pirtûkên ku hatin nivîsîn, kesên bênav, ew belav kirin, firotin, ji ber wê bûn hedefa êrîşên polês û prowakatoran, ketin zîndanê, êşkence dîtin.

Li Kurdistanê *"tekoşîna didan ra didan"* ew qadroyên ku te bi sifetên *"tembel"*, *"lumpen"* û *"kaba"* bi navkirine, wan qadroyan ev tekoşîn da. Eger ku ew qadro ewqas nekêrhatî û bê hûner bûn, çawa wan karin ewqas karên baş bikin?

Tu bi gotina, *"hindekan ji partîyê baz da, hindekan jî me berî wan da"* bê berpirsîyarîyê dikî û bi gotina *"hinek tembel bûn hinek lûnpen bûn"* jî rastîyê bervajî dikî. Dilê min dest nade, di derheqê te de tiştên ne rast bêjim an jî li te neheqîyê bikim. Lê lazim e, bêjim ku tu bêedaletî, neqilkirina bûyeran de objektîf ninî û keda mirovan ra hurmet nakî. Eger te bikarîya ew pirtûk bi xwînsarî, bi toleransî û nîyetek paqiş binivîsîna tesîr û fêyda xwe wê zêtir bûna. Wek; di xebat û serkewtinên partîyê de hemû endam û dilxwazên partîyê xwedî par in. Kesên ji

partîyê veqetîne jî, kesên di partîyêda ne jî xebatên hêja kirin. Îro destkevtîyê heyî, di saya bi xebat û fedekarîyên hevpar hatine destxistin.

Hinek heval nuha di nava partîyê de nebin jî ew ne dijminê me ne. Hevalên ji partîyê veqetîne yek alî gûnebahr kirin ne rast e. Bona ku wek partî me jî, hunera ku bikarîya ew îdare bikira nîşan neda. Divê em xwe jî berçav ra derbaz bikin. Hinek hevalan ji nava me bar kirin, çûn ser dilovanîya xwe, em wan bi rahmet bîr tînin. Ji bona arîkarîya wan sipas dikim. Bi berpirsîyarîyek objektîf, maqûl û rast bûyer bihatanê nivîsîn çi dibû, ma rîya rast ne ev bû?

Burkay di pirtûkê de li çavnêrîya dîrokê nefikirîye bi çavekî sûbjektîfi li bûyeran mêzandîye dîtinê xwe di binê tesîra hestan de anîye ziman û ji şûxwe ve şopên kûr hiştine. Lê kesên lîder gotin û dîtinên ku di wexta hatî de cuda têne şirovekirin nakin. Di tesîra bûyerên teze de û bêwext, gotin û kirinên ku şundxwe ve şopan dihêlinin nakin, ji bona hakemtîya dîrokê rê dihêlin.

**Ma çav tenê ji bona gîrîyê ne?**

Ma tu pênûsa xwe tenê ji bona tiştê negatîf binivisî bi kartînî? Ewqas *"qadroyên ne baş"* anîna ba hev û ji wan ra serokatî kirin jî hûnerekê dixwaze! Ew jî te bêcer kirîye.

Ew kîn û qara te ya li himberî qadroyên welatparêz, rexnên tûj me digîhîjîne encamekê. Ew jî di nava ewqas qadroyên welatparêz de bêdost û bêhaval bûna te ye, jîyanek bi tenê. Dil dixwast ji bona azadîya gelê xwe, xebat û keda ku me bi hev ra xerc kir, fedekarîyên ku me kirin jî bihatana gotin. Rastî û şaşitîyen me çi bûn ew bi şikleki çêker, hostatî bihatana xûyakirin, belkê nifşên hatî jê ders wergirtina.

Bûyer bêqehremanê xwe nayên gotin!

Ew qadroyên ku di pirtûka te de bi yek du hevokên neyînî portrê wan tê çixiz kirîne, kronolojik di hemû bûyer û xebatên partîyê de rolên sereke girtine. Tenê hin xebatên ku li Dîyarbekirê hatine kirin û di pirtûka te de cîh girtine, wek; hilbijartina şaredarîya Dîyarbekirê, hilbijartina TOB-DERê, Greva sendîqa Genel-Îşê, bîranîna 15-16 Hezîranê, greva Firinciyan, xebata UDGê, li Bîtlîsê pîrozkirina lê Gûlanê uyd. Heger Nazîf Kalelî, M. Zana, Mehmet Yokuş, Zekî Adsiz, Kazim Budak, qadro û endamên DHKDê neyêne gotin kêmasî dibe.

Xebata Kazim Budak a nava partîyê ya 23 salan, bi çend hevokên negatîf meriv dikare bi edeletî binirxîne? Xebat û berpirsîyarîya min a li welat, berpirsîyarî û xebata min a li Sûrîyê, berpirsîyarî û xebatên min ên li Swêdê te bîra kirine.

15 salan zêtir endamê Komîta Merkezî û berpirsîyarê liqê partîyê a Swêd bûm. 10 salan serokê komîta redaksîyona kowar û weşanên Roja Nû bûm. Li ba peryodîk derxistina kovara Roja Nû bi dehan pirtûk jî hatine çapkirin. Demekê endametîya komîta nivîsana rojnama Rîya Azadî bûm. Ser navê partîyê di Komîta Rêvabir a

Tevgerê de kar kir. Bi salan di ciwîn û xebatên komikên partî û komelê de ked û wexta ku me di wan civînan de venda kir nayê hesav kirin.

Dîsa civînên ku tevî partîyên din hatin kirin, beşdarbûna aktîvîtet û xebatên hevpar, amadekirina belavok û mesajan pir wextê me girtin. Ji xwe em dizanin civînên me kurda çiqasî dirêj in. Ji bona beşdarbûna civîn, konferans û xebatên partîyê çendî çend caran bi trênê çûyîna Fransa, Norveç, Holllanda û Almanya nayne hêjmartin.

Bi kurtasî me jî di vê peryoda têkoşînê de ji te kêmtir ked û wext xerc nekir. Bi dehan salan ji bona xebatên komelê û partîyê xebitîn, him jî bê bedêl. Serda jî hin xebatên ku jî bo parastina sekreter hati kirîn jî caba. Endaman, kê bi mehan di mala te de nobet girt, kê zarokê te bir dibistanê, kê rojnama rojê anî mala te, kê bi salan tu birin komelê, doxtor, sosyal, balafirgehê û kîderê te xwast tu birin û anîn. Nivîsên te jî kê daktîlo kir, kê suret çêkir, kê çapkir û kê jî firot. Bi kurtasî ji enerjîya endamên komelê û partîyê en pir te jê fêyde dît.

Tevî ku ew endamana bo karên komelê û partîyê şev û roj xebitîn jî te di pirtûka xwe de qala wan nekirîye. Kesê ku pirtûka te bixwîne bêje "wan merivana nîv jîyana xwe bi têkoşînê derbaz kirine lê hemû bi hevûdû ra meşxûl bûne, an jî polîtîk kêm tişt kirine."

Balkêş e ku di pirtûkê de qala xebata bi dehan salan tê kirin, lê ne ji bona xebata sîyasî, tenê *"kesên ku mîzanpaja vê pirtûka kirine û ew rêz kirine (...)"* ji K. Burkay sipasî heq kirîne.

Kesên ku ji partîyê veqetîyane li benda menfatikê an jî maaşê teqawutîyê ninin, tenê dixwazin, fêdekarî û xebata wan neyê înkar kirin û reşkirin. Burjuvazî jî xebata kesan taktîr dike û taltîf dike. Lê înkarkirina keda mirovan û neheqîyên hêzên welatparêz meriv têna gîhîşe.

**Di welatparêzî û fedekarîyê de alîyê me yê ji te kêmtir tune bû.**

Hemû endam û dilxwazên partîyê sekreterîya K. Burkay bi şiklekî ûsa bi fêdekarî, azad û bê heseb qebûlkir ku, ew yeka şansek bû û nesîbî her lîdere kî nabe.

Bo lîder ne bê bawerî, lê me dizanî ku ew jî ji hestî û goşt hatîye meydanê û ew jî dikare şaşitîyan bike. Dîsa jî mîna musilmanên ku çawa bawerîya xwe bi tiştekî pîroz tîne, girsê gel li pişt lîderê xwe usa rêz girt.

Bingeh ji fedekarî, jî piştgirîya ya maddî, manewî û dostayetî de kêmasî nekir. Lê sekreter bi dîtinek fireh, bi şiklekî layiqî lîderan, nekarî li bûyeran hûr binihêre. Ji bona nîşandana van tolerans û xweşdîtinan sebebek hebû ew jî têkoşîna azadîya gelê me bû. Zanîn û tecruba te em bipejirînin jî di welatparêzî û fedekarîyê de alîyê me yî ji te kêmtir tune bû.

Ew sedema binketina partîyê, bêy ku îdeolojîk û pratîka xwe ji ber çavan ra derbazke, hin kadroyên partîyê sûcdar dike. Serkevtin û pêşketinan de jî binketin û wendakirinan de jî her endam li gora cîhê xwe xwedî berpirsîyarî ye.

**Çend nimune ji bo vatinî li himber qadroyên ku ji partîyê veqetîne.**

PSK ji bo li himber qadroyên ku ji partîyê veqetîyane xwedî kevneşopîyek baş nîne.

Li gorî wî kesên ku ji partîyê vediqetin hemû neyarin, dijminin. Kesên ku dîtinên wî parve nakin dijminin, ji ber wê, ew xwedî gelek dijmin e. Te di nava partîyê de rêçek ûsa xirab danî û em li himber hev usa pîjkirin ku hevalên ji bo hev diçûn mirinê, neçûn ser cinazê hev û du. Di sîta Gelawêjê de nivîsa ku Saît Aymaz bi navê "Bi Zekî Adsiz ra Rêwîtîya min a dawîyê" nivîsîye, musteva têkilîyan rind radixine ber çavan.

Çend salan berê li Stockholmê di civîna cinazê Dursun Belge (Belengaz) de ji te hat daxwazkirin ku tu di derheqê endamê xwe yê kevn de çend gotinan bêjî. Lê te ew daxwazî red kir. Meriv wek endam xebatên wî ya salan nehesibîne jî, bi mehan rojnama te ya rojane ji dukanê digirt her sibê dianî mala te.

Nazîf Kalelî di sala 1980 de li Dîyarbekir hat girtin û zîndan kirin. Wê demê, ew endamê komîta merkezî ya PSKT ê û serokê komîta herêmî bû. Piştî ji girtîgehê derket jî heta, ji partî veqetîya di welat de wek mesulê yekem a partîyê bû. Ji ber êşkencên giran a bi salan wî jîyana xwe ji dest da. Êlana mirina Nazîf di weşanên partîyê de cîh negirt. Te sersaxî jî neda malbata wî. Dewrîmê lawê Nazîf li Stockholmê sed metre ji dûrî te rûdine, bi çavê tijî digot *"eger ez rastî Apê Kemal bêm dixwazim jê bipirsim, ma te gotina "serê te sax be"* ji bo min pir dît?

Burkay di weşanên partîyê de ser mirina endamên partîyê ya kevn tu gotinek ne ninivîsî, lê li ser mirina du endamên TÎP ê, (du hevalên xwe yê kevn) nivîsek dirêj nivîsî. Di pirtûka xwe de buha yê ku bi ked û cehda qadroyên welatparêz hatine ortê, dijî qadroyên Kurd, lê bo qadroyên Tirk kartîne ew yeka jî merivan him dike fikaran him jî diêşînî.

Ew di pirtûka xwe de li himber rêhevalên xwe rexnên nerast û gran dike, alî din ve jî pesnê du endamên Partî Komunîsta Iraqê dide.

*"Azîz Muhammed*[85] *merivekî laş gir, kej, henekçîyekî usa ye ku ew pir nayê dîtin û xwînşîrîn e. Wê wêxtê ew dora 50-55 salî bû.*

*Alîkarê wî Kerîm Ehmed jî wek xû daha girtîye, lê merivekî efendî ye. Herdu jî durist, xwedî bîr û bawerî û xwedî şexsîyetek bi îtimad in.* (Rûp. 243)

[85] Ew kesên tu pesna wan didî, ew ne ji bo Kurdistanê, ji bo welatê xwe dixebitin. Lê tu çima qadroyên ku ji bo azadîya Kurdistanê cane xwe didin heznakî?

Di pirtûkê de pesnên usa ne bûye, nesîbê tu endamekî PSKyî yên kevn an jî nû. Her weha ew, ne bûne nesîbê lîderekî Kurd jî, ne Qasim Lo, ne Talabanî ne jî Barzanî.

Nazîf ji partîyê veqetîya gelek wext şunda li Stockholmê bû mîvanê min. Heya derengî şevê me qala rojên buhurî kir û bûyer tev da. Dema ku wî qala sekreter dikir, yek carekê jî bê kek negot Kemal an jî Burkay. Lê rojekê berê sekreter li komelê ba endamên komelê gotinek ne layiqî wî karanî bû. Seranserî şevê min herdu helwest dan berhev, ji rewşê xemgîn bûm. Ez endamê partîyê bûm, lê sekreterê partîyê li himber endamekî kevn xwe nizm û neheq kirîbû, ango binketî bû. Halbu ku dilê merivan dixwaze, sekreterê partîyê kêm şaşitîyan bike, zêde bi berpirsîyarî be û bingeh hembêz bike. Ew gotinên ku sekreter li komelê serf kirîbû, îşareta tepkîya wî ya li himber endamên veqetîbû.

Lê meriv ne mecbûre, heya dawîya emrê xwe di partîkê de bimîne. Çawa ku sekreter jî ji TÎP ê veqetîya.

Burjuvazî kesên bi maaş xizmet kirine taqdîr dike, taltîf dike, lê li himber qadroyên welatparêz ewqas înkarkirî, nîyetxirab û xwedî hukmî pêşin bûna tewgera welatparêz lazime li ser bê rawestin.

Di gotinek pêşîyê ya Çînî yan de hatîye ziman, *" şaşitîya ku ketîye nivîsê, ji hezar rastîya ku neketîye nivîsê zêtir rasttir e."*

Me jî wextê ra xebatên xwe, bona ku nekir nivîsê, şaşiyên ku te kirine pirtûkê wê bibe dîroka xebata me.

**Li ser wekhevîyê parvekirina îmkanan**

Di pirtûka xwe de li ser Yekitîyê dibêje "li Dêrikê bi pirs me mala merivê Yekitîyê dît. (...) Dûra li Şamê, li Ewrûpê û li Kurdistanê bûm mîvanê Mam Celal û qadroyên wanê din, ên bilind.

Di sofrê wan de her wext pîlavên bi goştê qelandî û mirîşk, meyve û şîranîyê ve xemilî, wîsky û şerav jî amade, her tim ew şerkar, ew pêşmergê seqet, anî bîra min.

Dostên me yên Iraqî jî van kirinên xwe ra digotin şoreş, lê di navbera jîyandina qadroyên jor û jêr de pir ferq, zinar hebû. Îmkanê heyî wekhev nedihate parve kirin.

Tu sersaxîyêkê jî pir dibînî, dibêje Yekitîyê îmkanên xwe wekhev parve nedikir. Ma me îmkanên partêyê wekhev parve kir? An jî me çiqasî parve kir?

Madem ku *"jîyan li her derê jîyane li herdêrê ji bona jîyanê jî divê hin tişt bine kirin."* Ez jî bi serbilindî dikarim bêjim, tiştên ku lazim bû me kir. Hele welatê ku me zimanê wan nedizanî, derfetên heyî ya bi sînorkirî û di ortamak usa de me tiştên serkevtî kirin.

Qadroyên ku ji ewrûpê wek muffetîşê partîyê dihatin çend rojan şûnda vedigerîyan diçûn. Lê em dora çar salan li Sûrî man û gelek tengasîyan ra rû bi rû

man dîsa jî me ala têkoşînê bilind girt. Tevî wê jî fedekarî , metanet û cehda mirovan nehatîye dîtin.

Me li Sûrîyê çikir?:

- Plankirina nobedarî û duzena malê,
- Pêşwazî û rêwîkirina hevalên hatî û çûyî. Bêje hema qadroyên ku derketin Ewrûpa hemû ji Sûrî ra derbaz bûn.
- Ji bo çûyîn û hatina welat xebata ser sînor,
- Di Qampa leşkerî de perwerdekirina qadroyan.
- Kar dîtin, tenduristîya hevalan ra mijul bûn.

Bona ku kadro herîk ji cuda tebeqên sosyalî hatîbûn, ji ber wê berxwedan û fama mesulîyetê jî cudabû.

- Bi hêzên Fîlîstînî, Ereb, Tirk û Kurd ra, dan û standin têkilî danîn. Di civîn, semîner û hevdîtinan de cîh girtin.
- Civîn û xebatên Hevkarîyê
- Ji bo hevalên ku li Sûrî diman derxistina nasnaman û ji bo kesên derdiketin Ewrûpê jî pasaport pêda kirin, tanzîm kirin, vîze girtin.
- Bilêt girtin. Ew karê herî zahmet bû. Li Sûrî her tişt bi rûşwet dimeşîya. Bo ku em bîyanî bûn û pasaport û vîzên me jî ne saxlem bûn, bilet girtin pir çetin bû.

Ji kesên xortre, ji yên bin 25 salan ra bilêta balafirê nîv fiyat bû. Pasport piranî me xwe tanzîm dikir, bona ku em erzan bilêt bigirin, me salê hemû rêwîyan di bin 25 salan ra dinivisîya. Ew jî di nav mamûr û polêsê Sûrî de dibû henek. *Digotin; hevrê porsipî kirîye, lê ne ji ber emr e, ji ber zilma faşîzmê ye.*

***Cîhkirina qadroyan***

Sekreter ne li Rojhilata navîn, li Elmanyê rudinişt, ji bona civînan dihat Şamê û diçû, ew jî ne baş bû.

Ji bona li Rojhilata navîn ciwarbûnê plan û projekî partîyê, armancek xwe ya ji bo şer xwe amadekirinê tune bû. Partî, bona qadroyên ku derketîbûn dervayî welat jî bê plan bû û ji wan tenê sebir dixwest. Ji ber wê yekê jî li wan deran mayîn bêmane bû. Qadroyên ku derketîbûn derva bi salan li Kurdistana Rojhilat û li Sûrîyê di hindur de bê armanc û bê hedef rûniştin şûnda berê xwe dan Ewrûpa. Digotin " eskerîya Tirkan jî wextek xwe heye, em heya kengê li van deran bin û çi bikin?

Sekreter di pirtûka xweda dinivîse;*"Armanca min ev bû, ez ne li Şamê bimînim, derbazî Ewrûpê bim. En baş li wir min dikarî bi welat ra têkilî deynim. Li wir girsek karkerên Kurd heye û di nava wan de komelên me jî heye. Bona têkilîyên navnetewî jî ji*

*bo min en cîhê minasiv Ewrûpa bû. Lê Sûrî jî bo xebatên ku me girtîbûn ber xwe grîng bû."*

Celal Talabanî, Mesud Barzanî, Qasimlo tevî pêşmergên xwe li Kurdistanê, Abdullah Ocalan jî li Sûrîyê bû.

Sekreterê partîyek îllegal, li Ewrûpê polîtika dikir, lê kadroyên ku di komelên demoqratîk û legal de hatibûn bijartin û xebitîya bûn jî li Kurdistana Rojhilat û li Rojhilata navîn de hatin ciwar kirin. Heger li Ewrûpê polîtîka kirin armanc bûna, lazim bû ew kesên ku wextê ra li welat di komelên demoqratîk de xebitîya bûn, derketina li Ewrûpê xebat bikirina. Bi sazîyên Ewrûpî ra têkilî danînê de ew zêtir xwedî awantaj bûn. Kadroyên ku di nav DÎSK û TOB-DER ê de bûn-dikarîyan zutir derkevin ewrûpa sazîyên sîvîl û der û dorên sîyasîra qontax deynin. Him jî alî aborî de jî em ne rehetbûn.

Li Şamê 15-20 kes di malikê da, bi salan rûnişt. Bêkarî û bê armanc rûniştin bîna wan teng dikir. Sibê wê ew çibikin kesî nedizanî. Vê yekê aczî û nerehetî anî. Her qadroyek ji cuda sosyal kok dihat, ji bona wê jî eleqe, berxwedan, fama mesulîyetê cuda cuda bû.

Kesên analfebet û yên zanîngeh qedandî, kîjan nuxtên hevpar de dikarî bînî ba hev û wan, bi salan hev ra bidî rûnûştin? Ew kar nebû, û ne meşîya. Hin şertên maddî jî têkileyên nava hevalan xira kirin. Wek nimune, nêzî 4 salan em li Sûrîyê man. Tu kesî nivînek xwe tune bu ku tenê razê. Hevalekî bi henekî digot, *"bona ku em çift ranezên ne zevicîn,lê li vir jî em şevê bi yekî ra cih parvedikin."*

Dema ku ji bo rojên hatî plan û proxramek partîyê tune be, qadro ji reşbînîyê nikarin xwe xilaskin. Betalî û jîyanek monoton jî hêvîyên hevalan dişikand. Li gorî bawerîya min wexta ku meriv qadroyan li gorî hin pîvanan nebijêre û li gorî wê rêz neke şaş dike. Tenê gotinên birqokî ne bese, jîyan tiştekî din e.

**Ji Sûrî yê derxistina hevalan**

K. Burkay di pirtuka xwe de dinivîse ku (s.338) *"Bulgarên hevrê yê | |me di derxistina kadroyan Ewrûpê ji mera alîkarî kirin, ji her kesî re pasaport derxistin."*

Kesên ku ji bona perverdê hatine şandin Bulgaran pasaport dan wan. Ew jî 10-15 kes bûn. Li Sûrîyê me bi îmkanên xwe dora 20 kesî re pasaport pêda kir û şandin Ewrûpa.

Bi navê Eyşê keçik hatîbû Şamê. Pasaporta xwe dabû hevalan ji bo ku karbînin. Wê demê hevalê me yê jin yên ku derkevin derva tune bûn, ji bo mêran jî pasaport kêm bûn.

Me tenê fotoxraf guharî bi eynî navî, bi navê Eyşê hevalê Cemîl şand Danîmarkê. Ew nav, di nav Ereban de navekî eyan bû. Lê bona ku polîsê Sûrîyê

elîfba latînî nedizanî me ûsa şand. Hevalê Cemîl jî ceseret nîşan da û bê problem çû li Kopenhagê peya bû.

Burkay di nama xwe ya bê tarîx de dinivîse ku:

*M. Alî can,*
*Çend pasan ji te ra dişînim.*

*Pasa S. Î...., heya Cotmeha 1986 an e, lê ji bo Swêd divê neyê karanîn.*

*Ya (C. H....) heta 82 an e, divê bê dirêjkirin an jî serastkirin. Ew jî ji bo Swêd neyê bi karanîn.*

*Ya H. A....., jî heta 1980 ye, bê dirêjkirin an jî serastkirin.*

*Her sê pasên jorin jî ji bo Fransê karanîn minasiv e. Eger nekarin vîzê bigirin bila ji bo Îtalyê bilêt bigirin, heval wan di rêyên minasiv derbazî Fransê dikin. Lê dive en hindik hefteki, 10 rojan berî em agahdar bin.*

*Ya Cezayirê ji bo Fransê neyê karanîn.*

*Ya A. A...., bawerim jêra vîzê divê ji bo Swêdê neyê karanîn.*

*Ji tera perê vir 30 hezar (D.mark) dişînim.*

*Ji bo yên ku tên Danîmarqê eger pirsa vîzê heye wê wextê ji Berlînê ra bigirin. Em wan ji wir dikarin bişînin. Ew jî ne be, emê çareyên din bifikirin.*

*Nasnama û ehlîyeta Seyît bi hevalê hatîra bişînin.*

*Wekî din jî yên ku terin Swêd û Danmarqê 50 ê D-mark, yên terin Fransa, Hollanda, Swîsra jî 200 mark bidi yê.*

*Yên ku em ji bo Yunan difikirin kîngê derbazbuna wan mimkun dibe di rojên hatîda agahî didim we.*

*Yên ku derbazî Hollande û Swîsra dibin en hindik 10 rojan berê agahîya me hebe.*

*Li ser pirsa Saît rawestin wê agahî bidim. Şûkrû (Kemal Burkay)*

*Bona ku tu ji nuhava Nazli û zarok bişînî min agahî şandî bû.*

*Têbinî: yên ku bi vîze an bê vîze ser Îtalyê va derbazî Fransê dibin bila pasaportên xwe neçirînin. (xasima ya S. û H. şuve didin) wekî din jî meriv dikare wan dîsa kar bîne.*

Rûpel 302 de di çûyîna Kurdistana Başûr (di 1983 an) M.Alî bêdil bû. Rast e ez bê dil bûm. Çimku sekreter di nama xwe de ji hevalên nava welat ra nivisî bû, jin û zarokên min bihatana Sûrî yê. (Ew name jî di mala berpirsîyar de hat dîtin û ket deste polês. Di iddîanamêda di rûpela yekem de cîh girt.) Ez li benda wan bûm û

divîya ez li wir bû ma. Min dixwast piştî ku min ew şandin Ewrûpê herim Kurdistanê.

Bona rojê hatî jî partîyê programek xwe tunebû, çi bikira ne kifş bû. Kadroyên li Rojhilata Kurdistan dixwastin ji wir bên, em jî diçûn wir.

Kekê min Mistefa du sal bû li Kurdistana Rojhilat bû û nexwaş bû. Pêşneyara min, Mistefa ji wir bê, di cîhê wî de kesekî din li wir berpirsîyarêyê bigire. Mistefa jî bê, li Ewrûpê tedawî bibe. Sekreter ji vê pêşniyara min aciz bû, got *"ma çima va leşkerîye?"*

Min jî got; hin kadro ji Enqerê derbazî Ewrûpa bûn, û ji wir Kurdistanê mêze dikin, bila ew jî herin rewşa wê derê nêz de bibînin.

Kêmasîyê hin kesan ji vê ra dibûn avantaj. Digotin ew li Kurdistanê bi hevalan re nikare derbaz bike uyd."

**Meqes vedibe**

Di sala 1992 an di kongra sêyem de biryara ji bo perwerda leşkerî li Kurdistan a Başûr ciwarbûn hatîbû pejirandin. Li gelek welatê Ewrûpê û li Stockholmê jî bi endam û dilxwazên partîyê ra civîn hatin çêkirin.

Sekreter di civînan de digot yên ku dixwazin bên Kurdistanê bila bên, yên ku nayên jî bi ekonomîk alîkarîya me bikin.

Lê van gotinan ji bona çûyîna Kurdistanê di endaman de daxwazîyek germ û heyecanek çênekir. Usa xûya dikir ku sekreter tenê bona biryara partîyê cîh bê, ew gav davit.

Berî ku Burkay here K. Başûr em rûniştin peyîvîyan. Dîtina min ev bû, kesên ku ji ber rewşa polîtîk, ser navê partîyê ji welat derketibûn derva, heger sedemên xwe yên maqûl tunebin divê herin Kurdistanê.

Kesên di derheqê têkoşîna çekdarî de biryar digirin eger xwe nerin, zarokên xwe neşînin, nikarin zarokên xelkê bîşinin.

Wexta ku meriv xwe nere tenê bixwaze kesên din herin ew jî ne di cîhê xwe de ye. Eger qadroyên ku, di nava xebatê de berpirsîyarîn û cîh girtine biçin, ew yek bala eqrebe, der û dora wan jî dikişîne, dikarin hin kes jî bi wan têkilîyan bên. Her mirovekî li gorî xwe tesîr û der û dora xwe heye.

**Lê Burkay usa nedifikirîya;**

-Ez sekreter im, terim bila yên din jî bên. Endamê partîyê ji bona wî biçûna, lê yên ne endam?

Min daxwazkir û got; em ne ji ber aborî, ji ber sîyasetê hatin dervayî welat, ez jî dixwazim bêm Kurdistan ê. Naxwazim jîyana xwe ya sîyasî li Stockholmê bi borîn im.

Burkay li ser daxwazîya çûyîna min celeb celep mane dane ber min. *"Zarokên min û debara wan, tenduristîya min ... "* Min got vana hemû ji bo min ne problem in.

Dawîyê got ;

-Lê em xortan, xortên ku salê xwe 21/32 salîne dixwazin.

-Ma çima ji partîyê ra tenê qetîl lazimin? Karê polîtîk jî ne lazim e, di nava partîyên Kurdistanê de li meqar ji ser sîh salî ra kes tune? Salê te ji yê min mezintir e, tu çima terî? Di bingehdanîna meqar de qadroyên sîyasî ne lazim in?

Piştî gelek wext sekreter tevî hin qadroyan çû li Kurdistana Başûr cîh bû. Berî ku here jî bê biryara komîta navendî çû li Şamê- Beqeayê serokê PKK ê Abdullah Ocalan ra daxuyanîyek jî îmze kir. Min bi PKK ê ra li hevhatin ne, lê şiklê protoqol îmze kirinê, bê biryara partîyê tenê bi serê xwe çûyîna wî û bi serê xwe îmze avitina protoqolê rexne kir.

Lê perwerda leşkerî ji welat piştgirîyek xurt negirt, kes neçû qampa leşkerî, salekê şûnda Burkay kilît li derê meqarê xist vegerî Stockholmê.

Me dîsa hevûdû dît li ser rewşê, çûyîn û hatina Kurdistanê em peyîvîn. Ji min ra got.

-Dîtina te rast derket, kes nehat me meqar girt û em hatin.

Min sekreter bê biryara komîta navendî, tenê bi serê xwe girtina meqarê û hatina wî rexne kir. Ji ber ku li Başûrê Kurdistanê cîvarbûn biryara kongre bû, ji bona girtina meqarê jî divîya bû biryara dezgehek din lazim bû.

Dema ku min, girtina meqarê şaş dît û rexne kir. Got sekreter jî divê ji ser kongre ra nebe, biryarên kongre sekreter bi serê xwe nekare ji holê rake.

Bi hêrs got;

-Yên ku dixwastin bila bihatana.

- Ma min nexwast?

-Temam, te xwestîbû tu bê, lê yên din nexwestin bên.

Em li ser pirsa yekitîyê jî peyîvîn.

Min got; xûyaye ku şerê çekdarî ne ûsa hêsan e. Hîn li ortê tiştek jî tune, we yek merivê xwe jî kuşt û hûn jî Kurdistanê vekişîyan. (Sê kesên ku ji qampa PSKê veqetîyan xwastin derbazî Kurdistana Bakûr bibin, li Zaxoyê ji alî dilxwazên PSKê ve hatin gule barankirin. Ji wan yek hat kuştin, du kes jî birîndar bûn) Wê demê alternatîfek dimîne ew jî PKK jî di nav de hemû hêzên sîyasî u sazîyên sîyasî civîneke çêkin û bi hev ra çareserîyan bigerin.

Gorî min, tu di dawîya emrê xwe de ji bona yekitîya tevgera azadîyê dikarî gavekî girîng bavêjî û bikevî dîrokê. Li himber partîya me û serokatîya te di nava bingehên hêzên din de jî sempatîyek heye. Ez di sohbetan de pir caran bûme şahad ku hin endamên tevgerên Kurd dibêjin *"eger ku Kemal Burkay bixwaze û hewil bide, dikare tevgera Kurd bicivîne ser hev û bibe sekreterê me hemûyan jî."* Ew li himber şexsê te bawerîyên xwe tînin ziman û ji te hêvî dikin ku ji bona yekitîyek netewî

xebat û fedekarî bikî. Eger tu piçekê fireh bifikirî, dîyalox u pêwendîyan de bînteng nebî, dikarî rolek netewî bilîzî.

Hemû roj tu wexta xwe di komelê de derbazdikî. Komela Komkar û komela Partîya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê di yek bînakê da, ser û binin. Lê te salane yek carikê jî komela wan zîyaret nekir, silavek li wan nekir û çayek wan venexwar. Divê tu wek serokê tevgera Azadîyê tevbigerî, ne wek serokê komela Komkarê, ew li te dişikê.

Ser van gotinên min wi jî got ku "*Ji tevgerên din cuda dîtinên me hene, em aborîya Kurdistanê nîvfeodalî dibînin, ew qapîtalîst dibînin. Ew ji bo Kurdistanê serxwebûnê em federasyonê diparêzin. Ya din em navê partîyê, PSK e çi bikin?*

Tê gotin wexta ku Osmanîyan êriş birîye ser Stenbolê û zeft kirîne, papazên kilîsa Stenbolê di nava xwe de nîqaşa, "*pêrî jin in, a mêr in*" dabûne.

Ya me jî ew bû, têkilîyên aborî ya Kurdistanê feodalîye an jî kapîtalîstîye nîqaş dikir. Halbuku nixtên me yê hevpar ji yên cuda zêtir bûn, lê me ne ew, yên cuda derdixistin pêş.

-PSKê tiştê ku dikare bike kir, ew hatîye nixta xitimandinê, têrxwarinê. Hger ku usa dom bike, PSK jî karê ku Komele dikin bike.

Bi yekitîya ku bê damezrandin ra maf û fêyda navê PSK ê tê kirin, gotin. Heger hêzên din di bin bana PSK de civandin pejirandin PSK, ne pejirandin jî di cîhê wê de navekî din tê bijartin. Ji xwe partî ne armanc e, hacet in. Partî haletên, bona gîhiştina hin armancanin. Heta dawîyê bi yek navî jîyandina partîyan jî ne ayet e.

Burkay dawîyêda xwest ku ez van dîtinan di kongra partîyê de bînim ziman û bê nîqaş kirin.

Ser hevdîtina me ra pir wext derbaz ne bû, kongra partîyê ya 4 em çê bû. Ez berpirsîyarê partîyê a liqê Swêd im, têkilî yê min bi wî re bû. Ji bo kongre ez nehatime agahdar kirin, bi rîya partîyê dîtinên xwe jî nivîskî bigîşînim kongre. Xûya bû sekreter ji dîtin û pêşniyarîyên min bo tîfaqê, nerehet bibû, tol digirt.

Armanca min ew bû, ku bi cehd û xebata PSK ê em bikarin hemû hêz û girse ya xwedî daxwazî û enerjî, di platformekê de bicivînin ser hev, hêzên welatparêz yên bela wela di binê şemsîyeke hevpar de bihata ba hev.

Wî bi zanîn û hunera xwe hin tişt kirin lê mîsyona lîderîtîyê nekarî pêk bîne. Zanetî û qabîlîyet tiştekî baş e, lê bi xwe ra lîdertî yê nayne, ew qabîlîyetek din e.

**Çima ji PSK ê veqetîyam?**

Gotin û kirinên sekreter hevûdû nedigirt, gotinên xwe xweş bûn lê, tiştê ku dikirin çewt bû. Gotin û rexnên xwe li himber endaman, himber hêzên Kurd ne çêker bû. Ji hêza xwe bêtir tehammula kesî nedikir. Sekreter xeynî sedemên sîyasî terikandina Kurdistanê û îlticakirina Kurda ra îtiraz dikir. n

Rojekê Burkay xezûrê xwe yê duyem dixwest bîne, raya min jî pirsî. Min got ez li himberim, şaş e.

Hêrs bû got, jina min bi îmkanê xwe tîne, tu çima li dijî?

Min got, wek pirensîp partî hatina Ewrûpayê şaş dibîne û hevalên ku ji eqrebên xwe re alîkarî dikin tu rexne dikî.

Xanima te li kîjan welatî kê dinasê? Pasaport tedarîk kirin, pêşvazî û mîvan kirin bi rîya partîyê dibe.

Ya sêyem jî, navbera te û jina te ne baş e, wexta ku bira jî li cem bin halê te xirabtir dibe.

Dûra ew kesa jî bi alîkarîya partîyê anî li Stockholmê cîh kir.

Meriv alîkî ve binivîse û semîneranda valakirina Kurdistanê, hatina Ewrûpayê rexne bike, alî din ve jî merivên xwe bîne Ewrûpê, li hev nedişikîya.

Piştî kongra 2.em di komîta Merkezî ya nû de li ser hin guhartinên proxrama partîyê dihate peyvandin.

Min pêşniyar kir ku di proxramê da, *"Kurdistana Tirkîyê"* derbaz dibe maneke rast nade, divê em wê biguharin, di cîhê wê de gotinek minasiv bê nivîsandin. Mîn hîn dawî li gotina xwe nanî bû sekreter bi lez got, *"ji xwe Kazim pêşniyarên usa tîne, di wextê de ji bona Rîya Azadî jî gotî bû ku rojname tê girtin bila bê girtin. Ev xisûsîyeta goşîzmê ye û wî ji Dev-Gençê girtîye."*

Min jî got, *"tu jî ji TÎP ê, opurtunîzmê tê."* Bê dengîyek çê bû. Min pêşniyara xwe *"parçeyê Kurdistana ku di binê dagirkerîya Tirkanda ye temam kir."* Wî jî ew formulasyona eciband û ew îfade hat pejirandin.

Got; *"xazila me gudarîya hevûdû bikira."*

Em bêne ser peyva, rojname" *Rîya Azadî tê girtin bila bê girtin."* Sekreter li Dîyarbekirê bû ji bona polîtîka partîyê ya hilbijartina 5 ê Heziran a 1977 an bi bingehê partîyê bide hazim kirin bi endaman re hevdîtin çêdikir. Biryara partîyê piştgirîya Partîya Cumhurîyeta Gel (CHP) bû. Argûmentên xwe frehbûna sînorê demoqrasîyê û bi reheti çap bûn û emir dirêjbûna Roja Welat û Rîya Azadî bû. Min jî got ku bi zimanê Ezop nivisîn, naveroka nivîsên kovara Rîya Azadî wen de dibin. Vekîrî û wêrekî meriv navê pirsê deyne kovar jî tê girtin bila bê girtin.

Gotina ku, 10 salan berê min li Dîyarbekirê gotîbû û sekretêr li Elmanya ji min re dikir serevde û bi goşîzmê nav dikir, ev bû.

PKK ê di weşanên xwe de sekreter hedef nîşan dida û bi kuştinê tehdît dikir. Jin û zarokên wî jî di binê vê bandora psîkolojîk dabûn. Li ba hin sedemên din vê yeka jî têkilîyên wî û jina wî jî xirab dikir. Burkay bi jina xwe ra poblem dijîya. Çendî çend caran ji mal çû, lê piştî demikê bi tawîzên mezin ew dîsa vedigerîya mal. Ji bo tehdît PKKê ew ji mala xwe pir hindik derdiket derva. Têkilîyê xwe ji der û dora

xwe ra tune bû. Ez diçûm dîtina wî, me li ser hin kar û barê partîyê xeber dida, dihatim.

Vê rewşa wî ya îzole li ser psîkolojîya wî jî tesîr dikir. Em fikirîn ku eger ew ji mal derkeve bê komelê bi endaman ra têkeve nava têkilîyan him li ser psîkolojîya wî tesîrê baş bike, him jî, ji malê dûrketinê problema xwe ya bi jinê ra jî kêm be. Ez bi komîta partî ya herêmî ra peyîvîm me li komelê ji bo wî odek veqetand, mase sandelye avit ode û ew bi arebê anî komelê û bir malê.

Wî li wir niwîsên xwe dinivisî, hin navberan jî dihat nava hevalan bîna wî der diket. Lê roj bi roj hin caran li komelê her wext kes amade nedibû. Vê vextê wî nobadarî pêşniyar kir

Piştî ji vegera Kurdistana Başûr ew ketî bû nava bê moralî û psîkolojîyek ne baş. Ji semeketina xwe ra li manan digerîya, dixwast ji qadroyan tol bistîne. Rojekê daxwaz kir ku endamên partîyê yên mêr, li komelê nobedarî bigirin. Gora min jî komîta komelê ya rêvabêr lazim bû karê komelê xwe bike. Ez li himber pêşniyara wî derketim. Ew di navbera me de bû pirsgirêk. Partîyê bi cezayê 6 mehan cemidandinê ez cezakirim. Ser wê min ji partîyê ra namen jêr nivisîn veqetîyam.

## Jî sekretêre partîya sosyalîst a kurdistanê ra

Ez biryarê (li komelê tene, nobedari kirina endamên partîyê) şaş dibînim. Ew yeka ne karekî sîyasî ye. Derî vekirin, bersiva telefonan dayîn û ezimandina mêvanan divê karê komelê be. Komîta karger bi xwe ji heqê vî karî bê der. Ji bona wê jî ez li komelê nobedarîyê nakim.

Wexta ku sekreter ji min ra behsa pêşniyarê kir, min got komîta karger a komelê lazime problema nobedarîyê çareser bike. Piştî ku wî ditina xwe dubare kir, min ew pêşniyar bir komîta partîyê, li wir jî dîtina min nehat guhartin. Di civîna freh de jî min bona nobedarîya komelê navê xwe neda nivîsandin. Di civînê de pêşniyarê sekreter hate pejirandin. Endamekî ji bo kesê ku li wir ne amade bû got ez bawer nakim ku ... nobedarîyê bike. Sekretêr jî got heke nobedarî neke ji partîyê tere. Helbet ew gotin çiqasî di cîhê xwe de ye, an jî nîne tiştekî din, lê hin xwenezanan jî ew gotin ji xwe ra kirin hincet.

Di komîta herêmî de hin endaman ji bona bi hev ra xebitandinê nobedarî şert danîn. Gotin heke tu nobedarî nekî em bi te ra naxebitin, sekretêr gotîye *"kî nobedarî neke te re."* Yanê ji rewşê wezîfe derxistin. Min jî ji ber wê serokatîya komîtê îstifa kir. Lê rîya derî nişandan ne hêsan e, heke meriv keda qadroyan piçûk nebîne. Eger di azadkirina welat de îddîa merivan hebe. Min dixwast ku ew gotin, ji bo vegera welat, ji bo çûyîna Kurdistana Başûr bihatana gotin, ne ji bona nobedarîya komelê.

Meriv dixwaze ku organên partîyê rewşa endamên xwe paşçav neke, ked û xizmeta wan jî zû bîra neke. Divê meriv gora şertên objektîv gav bavêje. Lê wexta ku partî hemû endamên xwe bi navê wekheviyê ji bona vekirina komelê mecbûr bike, ew ne tişteki realîst e.

Ya baş ew e ku partî li gorî qabîlîyeta endaman ji wan kar bixwaz e. Endam jî bi alîkarîya partîyê xwe pêşxinin, ji bona xelkê xwe karên baştir bikin.

Madem usa ye bila îllegalîte bê rakirin, em hemû di komelan de bixebitin. Ma îllegalîte ji bona qontrolkirina karê legal e?Li gorî bawerîya min karê komelê lazim e komîta karger a komelê bi xwe rêz û plan bike. Çima tenê endamên partîyê nobedarîyê digirin, endamên komelê nobedarîyê nagirin? Ma ew nikarin derî vekin, bersiva telefonan bidin û bi mêvanan ra mijul bibin?

Heke sekretêrê partîyê bona vekirina komelê civîn çêke, biryar bigire, lê komîta karger çi bike? Qaşo, em dibêjin Komele bi şikleki demoqratîk karê xwe bike, em têkilî karê wan nebin.

Ji bona têkilîyên sîyasî jî endamên komîta herêmê, rojê yek dikare li komelê hazir be. Lê endamên (partîyê) komîtê jî xwe layiqî wê nabînin.

Partî qadroyên xwe bi karê ne polîtîk ra mijûl dike. Ew yeka qadroyan wek moral, wek ruh, dikuje, asoyên wan teng dike. Wexta ku partî bi karên piçûk ra mijûl dibe, karên esasî têne bîra kirin. Endam ji bona babe ta xebata partîya xwe dikeve şikê. Ez yek ji wan im. Wexta ku min ev pêşniyar ji sekriterê partîyê bîhîst gelek demoralize bûm. Partîyê di kongra xwe ya 1992 an de biryara li Kurdistan a Başûr ciwarbûnê girt, lê îro em wek partî bona nobedarîya Komkar-Swêd biryar digirin. Difikirim ku, partî hêdî hêdî xwe ji karî polîtîk dikişîne, lewma jî îhtîyacîya xwe bi qadroyan ne ma ye. Partîyên din ji rêzê merivan digirin perwerde dikin, wan dipijîn, dikine qadro, berpirsîyarî didinê, sekreter jî ji qadroyên heyî ra derî nîşan dide!

2- Ser daxwazîya min a çûyîna Kurdistana Başûr sekreter digot "tenduristîya te û salê te ne munasib e!" Lê îro dibînim ku ji bona nobedarîya komelê salê min jî, tenduristîya min jî minasib tê dîtin.

3-Ya sêem jî piştî ewqas têkoşîn û xebat ez xedemetîyê nakim. Karekî usa ji bona xwe neheq dibînim. Di sazîyên burjuwazîyê de jî ked û xizmeta mirovan ra rêz girtin heye. Ez ji kesî madalya naxwazim, lê ji bona nefspiçûkkirinê li ser xwe biryar girtinê jî naxwazim. Di PSK ê de maqama dawî ne xedemetî ye. Ew kar ne karekî sîyasîye, lê ez ji karên sîyasî ra amade me.

4-Sekriter rol û însîyatîfa xwe li himber qadroyan şaş bikar tîne. Ji dîtinên cûda ra tolerans nasnake, ji bona tiştên piçûk gotinên hişk û tûj dibêje. Divê meriv tu caran cuda nefikir e. Ji ber wê gelek kes jî hevce nabînin ku bi xwe bifikirin, dibêjin sekriter usa got...

Endamekî digot,*"bê şansîya me ew e, ku sekreter li vê bîrimê dimîne û her karê me têkil dibe."*

Hûn şaş dikin qadroyên ku bi salan ji bona partîyê xebat kirine, di komelan de xerc dikin. Çima ji me semîner dayin, nivîsandin nayê xwestin ji bona têkilîyên der û hindur kar nayê xwestin? Li ser arşîvkirinê, şopandina medya Kurdî û medya cîhanê xebat nayê xwestin?

Lê em dibînin ku partî yê wek qadroyan derdikî xwe tune. Ji xwe sekreter dinivîse, hinkes jî bi çapê ra mijûl dibin. Îro partî di rewşek ne baş de ye. Di polîtîkayê de xitimandinek heye. Li ser axa Kurdistanê xebata partîyê kêm e, di rojên nêzik de pirsa Kurdî çareserîyek xûya na ke. Endamên partîyê her roj sist dibin, hinek ji wan tiştên xirab dikin. Partî nikare qadroyên xwe û xebata wan qontrol bike.

Bi kevçî tê kom kirin, hin kes jî bi çentan dixwin (bûyera li Elmanyê). Li her derê gelek tişt tê gotin, lê kes dezgehên partîyê agahdar nake. Me wek komîta Swêd di rapora xwe de daxwaz kir ku malî ya partîyê baştirîn bê qontrolkirin. Lazime malîya partîyê ji bêrîka şexsan derkev e, bi destê komîtakê bê rêva birin. Li Swêdê jî ne komîta, kesê ku çarpim cetvelî jî nizane, hesavê weşanan girtîye ser xwe.

Ew biryar dide xuya kirin ku em bi çira mijûl in, lewma em nikarin xebatên balkêş, hedefên mezin bidine ber xwe. Di nava karên rojane de bi hev û du ra meşxul dibin.

Ew biryar şaş e, wek sîyaset ji partîyê ra zerar tîne. Partî ne ji bona nobedarîya komelê, ji bona kar û xebatê xwe dibê bixebite. Di nava gel de gotinek heye: ji bo ku goşt bîn nede xo dikin, lê ku xoyê bîn da çi bikin? Pirsa me ji ewe, endam ku kêmasî dike tê ceza kirin, lê wexta ku hûn şaşitî û kêmasîyan dikin çare çîye?

17.09.1997

M. Alî (Kazim Budak)

**Ji bo Partîya Sosyalist a Kurdistanê- Komîta dervayî welat**

Min nameya we girt. Nama we rastî jî ne layiqî navê PSK ê bû, lê li gorî xulamtî û sewîya komîta we bû. Ew nama di rojên hatî de ji bo nizmbûna komîtê û karûbarê ku komîte pê ra mijûl dibe dikare bibe belgeke ber bi çav.

Di nama pêşin de min xwest binivîsim ku, *"bi komîta we bawerîya min tune. Ji ber ku hûn ne bi serê xwe ne, hûn hatine tayîn kirin, bo ku ji gotinên "kekê" ra erê, hin bêjin. Ji ber wê jî bona serrastkirina biryara di derheqê çaycitîyê ra, daxwazîyek min tune ye."* Lê pişt re min ew jê derxistî bû. Nuha heq didim xwe ku min li we neheqî ne kirîye. Ew biryara han rola we ya di komîtê de rind radixine ber çavan.

Xwazî gora wê ceza giran li ortê sucek hebîya. Lê xûyaye ku hun dixwazin ji qadroyan xilas bin. Partî bê endam rehettir tê îdare kirin.

Lo mesulino, meriv ji bona çaycitîyê biryarek usa çawa dide? Hûn çend kesên xûrde li Ewrûpê li ser partîyê bê berpirsîyarî tasarufan dikin. Lê ji bo kesên ku bi çentan pereyên partîyê dixwin, kesên ku pereyên partîyê ji bo karê xwe yî şexsî xerc dikin û kesên ku şûxulên pintî dikin, hun çi difikirin?

Ji bona ku hûn bizanin rastî çîye we qet xwe ne westandî ye. Sekretêr ew biryar minasiv dî ye, we jî erê gotîye. Bi vê biryarê sekretêr dixwaze bide zanîn ku ew xwedî çiqas qûl e. Lê ew di rêyek pir şaş de ye. Ew yek gerê bê dîtin. Ew ne pêxamber e. *(Bona ku min ji xedemetî û bodyguardbûnê ra na got, 6 mehan têkilîyên min hat cemidandin.)*

Di dîroka tu partî kê de biryarek ha ya nizm tune. Li kîjan bîrimê partîyê ew tetbîq heye? *(Sekretêr ji xwe ra badygoardan amade dike.)* Kî ji we li komelan nobedarîyê digire? Him jî hin ji we bi salane ji partîyê maaş distine. Komîta partîyê, herêmî a li Swêd bi destûrên taybetî û bi valîyên awarte tê îdarekirin. Ceza jî ne gora xetan, li gora şexsan tê tetbîq kirin. "Ji bona parastina yekitîya! partîyê" tedbîrên radîqal dive!

Heke, *"mesûlê partîyê lazim e bibe nimûne"* dive ew yeka ji sekrêtêr dest pê bi ke. Ji vê biryara ra komîtê jî xûya dike ew çiqasî nimûne ye!

Di nava we de kesên dilxwaz hene fermo, verin di cîhê min de jî çaycitîyê hûn bikin, karê piçûk jî yê mezin jî têra we heye. Ez kêfxweşim ku ji bona karekî pîs natime sucdarkirin.

Heta roja îro ez gora bîr û bawerîya xwe durust xebitîyam. Min ne ji partîyê maaş girtî ye, ne jî pere yê leşkerî yê, ne jî kompîtûr. 23 salin di partîyê de çi ket ser milê min, min kir. Min di nava partî yê de qelsîyek nîşan neda, tenê min nexwestîye li komelê nobedarîyê (badygoardîyê) bikim. Lê hûn dixwazin bi ruh me zeft bikin. Heke me qebûl bikirina ji we zêtir zorker hebûn. Ji malbata xwe belkê hûn tenê di nava va xebata dane, lê me ji bona piştgirî û dîtinên vê partîyê gund û malbata xwe bela wela kir.

Lê min tu wext îxaneta nava partîyê hesab nekirî bû. Dîsîplîna ku hun jê fêm dikin ev e, qeşmerî ye, bila bimbarekî we be. Eşkere ye ku, ew kesên ku bi maeşê xwe partîyê ve girê dane, zahmet e li himber şaşitîyan rawestin. Dijî we kî tiştên ne li gorî we bêje, hûn fetvayê bidin. Piranîya komîtê qûl e û bi kontenjan hatine bijartin, jê lom na be.

Mîna endamên (MKG) Komîta Ewlekarî ya Netewî ya Tirkan tu berpirsîyarek we tune. Hûn jî di kirinên xwe de bê sînor in. Çawa canê we dixwaz e, hûn usa biryar didin. Ji şaşitî û kirinên we jî tu hesav nayê pirsîn. Tu sazîyek din tune ku şaşitîyên we rast bike.

(....)

Naxwazim neheqîyê bikim, min jî li gorî hêza xwe 23 salan ked da vê partîyê. Lê hin caran kirinên we û dezgehên burjuwazîyê didim ber hev, kirinên we li himber qadroyan giranttir û dijî demoqrasîyê ne.

(...)

Sekretêr di nivîsa xwe de ji kesên demoqrat, ronakbîr, welatparêz û ji qadroyên nava tevgerên din daxwaz dike ku ew li himber şaşitîyên partîya xwe derkevin. Lê ji rexnên kesên nava partîya xwe ra tehammula xwe tune.

Her çiqasî nama ku, ji min ra hatîye şandin bi navê komîtê be jî, naverok dîtinên sekrêter in. Wî name ne li gorî realîtê, li gorî dilê xwe dagirtîye. Sekretêr him teref, him şahid, him qadi, him jî biryar nivîsî ye.

Dibêje ku,*"di navbera komîtê û min de problem derketîye."*

Di navbera min û komîtê de tişt tune bû. Eger tu bi meselê nelîstana nedihate vê derecê. Bona ku min ji nobedarîya komelê ra na got, hin endamên komîtê bi xulamtîya xwe şîyar bûn. Ew hêrs dibin ku ez çima bûme sedemê hîşarbûna wan. Ew dixwazin min jî bikin wek xwe. Lê di xulamtîyê de wekhevî nabe. Çima bona karên din nabêjin M.Alî neke, em jî nakin, an jî M.Alî dike em çima nakin? Di nama komîta dervayî welat de dîsa tê gotin ku, *" (...) du salan li mala xwe rûniştî bû."* Hun kî li mala xwe runeniştine, li serê çîyan in?[86] Ya din jî hûn ewqas rastbûn, çima rûyê we negirt, ku bipirsin, ka ez çima rûniştime?

Lê ez 23 sale di nava vê partîyê de dixebitim. Di her qedemê de min kar girt. 10 salan endamê komîta merkezî, 15 salan nunertîya partîyê liqê Swêd bûm. Deh salan serokatîya komîta kovara Roja Nu û weşanxana Roja Nû kir. Wan du salên ku tu behs dikî jî serokê komîta Kovara Roja Nû bûm û ser navê PSK ê di Komîta Tevgerê de dixebitîyam. "Di mala xwe de rûniştî bû" derewek hişkhole. Te tenê qala du salên dawîyê kirîye, çima behsa 21 salên mayî nakî? Ewqas bêbextî li te dişikê?

Min bi raya xwe kar girtîye. Lutifê tu kesî jî ne bû. Heke te bîra nekirîye, te xwe di got; *"Deh salin tu li Swêd mesulî, bi wî malzeme yî te rind îdarekir."*Çend caran min ji tera got ku, *"ez dixwazim bême Kurdistana Başûr. Lê te got na (...), ji me ra xort lazim in, tenduristîya te ne baş e..."*

Dema ku min dî, tu di nava endaman de balans çêdikî, li ba wan tiştekî, pişt wan de tiştekî din dibêjî, min ji te xû kir, ji xebatê sar bûm. Partîyê malûmatên ne rast dida bingehê xwe. (....)

[86] Sekretêr di nama xwe da usa dinivîsê, lê yê ku ji mala xwe dernediket jî ew bi xwe bû. *"Ew kesî ku êrîşî dîne min dike barê musilman bûna."*

Kongra partî ya çarem çê bû, ez mesûlê PSK liqê swêd bûm. Kesên ku du mehan berê ketîbûn nava partîyê, komîtê ji bo kongrê dîtinên wan girtin. Têkilîyên min bi sekrêter ra bû, wî tu dîtinên min negirtin.

Min jî got madem ew partî, partîya te ye, ez jî tune me. Ez berpirsîyarîya partîyek usa çima bidomînim? Piştî ku em du qolî peyîvîyan, te şaşitîya xwe qebûl kir, lê nuha tu çi dibêjî nizanim. Di civîn û sazîyên partîyê de meriv tiştekî dibêje, gora dilê sekrêter ne be çand salêndin şûnda be jî ew dikare wek belge derxine ber te. Di konferansa partîyê de min de zanîn ku ... wek partî em nikarin têkûz texlîla têkçûna sosyalîzmê bikin. Me 20 salan propaxanda sosyalîzmê kir, nuha jî bi texlîl têkçûna wê kirinê wext wenda kirin e. Çapa polîtîkvanên Kurd a jî dest nade ku vê pirsa rexne û çareser bike.

Sosyalîzm wek îde baş e, lê di rewşa îro de heya ku navnetewî hin tiştên gelemperî neyne danîn, pê ra mijul bûn vala ye, ji bona Kurdistanê jî xeyalekî dûr e. Bawerîya min di wextek nêzik de bi serkevtina sosyalîzmê tune. Lazim e em giranîya xwe bidine ser azadkirina Kurdistanê. (...) Em dikarin li ser navê partîyê jî bifikirin.[87]

Wexta ku me li ser kongrê minaqeşe kir, wî jî *"partîya me partî ke sosyalîst e, te jî di konferansê de gotî bû ku bawerîya min bi sosyalîzmê tune"*, ango te ha got me jî tu nebirî kongrê, an jî tu dikarî dev jî partîyê berdî. Min got nuha jî di nêzik de bi serkevtina sosyalîzmê bawerîya min tune, lê partî bona têkoşîna netewî jî dixebite, ez ji bona vê xebatê di partîyê de me.

Te kêmfirsendî kir. Min dîtinên di konferansê de anî bû ziman li himber me bû suc. Lê tu çend sale van neheqîyan dikî? Kî ji te hesav dipirse?

Çawa ku di namê de tê îddîakirin, min di civîna komîtê de ji kesî ra heqeret nekirîye. Ez ne Kemal Burkay me.

Lê min ji nezan ra got, tu bê hurmetîyê dikî, tu heddê xwe nizanî. Wexta ku we di KUK ê de dijmintîya vê partîya dikir, ez di nava vê partîya de dixebitîyam. Tu nikarî bibêjî ku, *"kî çaycitîyê neke tere."* A va ye heqeret kirin? Ji bona nîyeta xwe ya cezadayînê zorakî li sedeman megerin. Min ji kesîra heqeret nekirîye. Heke hun li himber van gotinan, gotinên min heqeret dibînin, hun mixtacê pisîkulox in.

Wexta ku sekreter li komelê bi çar endamên komîtê ra dipeyîvî, ez jî li komelê bûm, wî çima negot tu jî were li rû hev bipeyîvin, te çi gotîye, wan çi gotîye? (ez jî endamê komîtê bûm.) Lê tu du ra di namê de dinivîsî ku,*"tu nahêlî kes ji hevalan ra heqeret bike."*Tu tiştên xeyalî derdixinî. Exlaqê sosyalîstî ji vê ra çi dibêje? Endam dikarin, bêjin em bi filan kesî ra dikarin bixebitin an jî na? Lê di vê rewşa de ev gotin kêrî te tê, tu dikarî wan pîroz bikî, ji ber ku, *"ji rewşê wezîfe derxistin."* Ez jî bêjim

[87] Navê partîyê Partîya Sosyalîsta Kurdistana Tirkîyê bû. Dihat niqaşkirin ku gotina,"Tirkîye" bê derxistin, min pêşniyar kir ku gotina "Sosyalist"jî ji navê partîyê bê derxistin.

sekretêr heke tu nobedarî nekî, ez bi tera naxebitim. Ez çiqasî bi heq dibim, tu çiqasî ji teref hevalan va nayê xwestin?

Wexta ku tu endaze û pîvan tune be, ji bona hemû kesî di komelê de nobedarî hate ferz kirin sibê ew tişt bo sekretêr jî bê xwestin. Heke ku ferqîya tu endaman tune, çima ferqîya sekretêr heye? An jî, 23 sale ku em wek partî têkoşîn didin. Me çend xalê proxrama xwe birîye sêrî? Madem usa ye tu çima hîn sekretêrî? Ez nobedarîyê piçûk dibînim, layiqê xwe nabînim, rast e, lê layîqê hevalê xwe jî nabînim. *"Yê ku layiqî xwe nabîne layiqê hevalê xwe dibîne"* sekretêr bi xwe ye.

Mertalê sosyalîzmê jî êdî tema tirşîyê dide, bona her tiştî mîna dermanê dopîngê sosyalîzmê kar neyinin. Hun xwe pir sosyalîst dibînin, *"ferqîyê nakin nava karê piçûk û mezin"* fermo hûn bikin. Meriv ne tenê sosyalîst, lazim e piçekê jî dirust be, bi berpirsîyarî be. Bi gotinên xapînok û birqokî sosyalîstî rehet e, lê ya girîng, di kar û barê rojane de meriv çiqasî pêk tine?

Piştî ji vegera Kurdistan a Başûr sekreter ket nava bêmoralîyek mezin, psîkolojîyek ne baş. Ji semeketina xwe ra li sedeman digere, dixwaze ji qadroyan tol bistîne. Sekreter problemên nava partîyê hez dike. Salane ew di nava partîyê de mirovan tîne himberî hev û jê îstifade dike. Polîtîka wî hemû qadroyên kevn ji partîyê durxist.

Di her civînikê de behsa alîkarîya xwe ya, *"ji bo kesên ji partîyê dûr ketine bike. Ew kesê veqetî, çiqasî bê kêr, bê berhem û bê xêr bûn!"* Qet ew nawestê. M, Z, N, W, Y... nuha jî M. Alî.

Ji xwe qeyde ye, kesên ku ji partîyê dûr dikevin, di mala xwe de rûniştine, westî ne û bê kêr in. Di her civînê de behs bike, *"te çiqas xwest ku tu M. Alî bînî ser rîya rast!"* belkê Kurdistan bi vî hawî rizgar dibe.

Bes e, tu gerê vî karê xwe cîh bihêlî hevalê sekretêr. Lazim e tu jî êdî bibînî ku nikarî bimeşînî. Tu nikarî ewqas bê perva pê bileyzî. Bi sedan kesî can û ked daye, tenê ne partîya te ye.

Tu li ser exlaqê sosyalîstî dinivîsî, lê ked û xebata sedan kesî tu dimijî, kîngê li te nehat ji derî nîşan didî. Di exlaqê sosyalîstîyê de bersiva vê jî heye...

Biryara we neheq, giran, bê etlahî û biryarek pêşin e. We ne nîyet û dilsozîya min a welatperwerî, ne jî xebat û keda min ne dîye. Hemû xebata mina salan hun bi biryarekê ji ortê radikin.

Endamên merkezî, qadroyên berpirsîyar, qadroyên emekdar ji partîyê terin, an jî ji partîyê tên dur xistin, di nava partîyê de tu pirsek nayê pirsîn. Evên ku çûne çima çûn, an çima hatin durxistin? Bingeh çi meqamê didin dest, wê helbestê dibêje. Lê va bingeha dikare bi karê giran ra rabe? Qadroyên PSK ê heke usa bê berpirsîyar bin, serbixwe nebin, qûl bin çawa gel azad ke, çawa welat rizgar bike? Baş e ku pir kesî qedera xwe bi PSK ve girê neda ye.

Partî ku male sekretere, partî ku mafê mirovan ra rêz nagire, keda mirovan piçûk dibîne, partî ku li himber endaman bûye dezgehê tolgirtinê, partî ku karê polîtîk betlane kirîye, ji qadroyan ra rîya xedemetîyê rawa dike, ew partî li we pîroz be. Ez ê ji partîyê îstifa bikim. Êdî endambûna PSKê ji bo min ne şanazî ye. Lê hûn endamên ku di vê biryarê de xwedî parin, ji xulamtîyê ra biryar didin, her wext bi vê rureşîyê va bijîn. Eger ku ne hîssîyat, mantiq rê rawa merivan bike encamên bûyeran dikarin bên gûhartin.

Em 18 sale ji welat derketine, ji bo ku şertên welatê xwe biguharînin li derwa xebat dikin. Îro li Kurdistanê rojê sed kes tê kuştin welat vêran bûye. Dive ji bona vê xebat bê xurt kirin, lê sekretêr di komelê de lîsta çay çêkirinê ra mijul dibe.

Nivîskarî tişteki din lîdertî tişteki din e, nivîsên herî baş jî di pirtûkan de ne.

1998.5.26 M. Alî (Kazim Budak)

**MESAJÊN KU SER NAVÊ PARTÎYÊ – liqê Swêdê hatine şandin hindikan ji wan dibijêrim û li jêr dinivisim**

**JI PARTÎYA DEMOQRAT A KURDISTAN-IRAQ – liqê Swêdê ra**

Îro, di dawîya sedsala 20 an de gelê Kurd di welatê xwe de di bin zulmek giranda ye û di hemû parçên Kurdistanê de tevgera azadîxwaz di astengîyek dijwar de derbaz dibe.

Xasima li Kurdistana Başûr piştî rawestina şerê Îran û Iraqê li himber gelê me şerê mayîn û nemanê tê ajotin. Rejîma Baxdadê li ber çavîn cîhanê çekên kîmyewî kar anî. Bi hezaran jin û mêr, zar û kal hatin kuştin. Bi hezaran kes jî mecbûr man xwe avitin nava sînorên dewletên din. Lê ew li wir jî di binê tehlûka mirinê de ne.

Dewleta Tirkîyê mafê îltica kirinê nade wan, ew bê îzîn nikarên qampên lêne biterikînin. Zarokên wan bê dibistan, bê xwarin û bê mal in. Li himber birçîbûnê, nexweşî û sermê têkoşîna jîyanê didin. Dewleta Tirk vê rewşa han jî ji wan ra pir dibîne. Gora daxwaza hikûmeta Iraqê pêşmerge û qadroyên politîk teslîmî wan dike, an jî bi destê xwe wan jardarî dike. Yên xwe ji bombên kîmyewî xilas kirine, bi destê dewleta Tirk bi şikleki din têne qetil kirin. Dewleta Tirk a faşîst li himber welatîyê xwe yên Kurd jî bi her metodê şer û terorê bi kar tîne.

Di gund û bajarên Kurdistana Bakur de can û malê gelê me di bin êrîşên dijmindaye. Gundî şivan, jin û mêr ji alî hêzên fermî û vêşartî va dijmin têne hesibandin û têne kuştin. Gundî nikarin di zevîya xwe de bixebitin an jî dewarê xwe biçêrînin. Gel ji teror û provakasyonên dewletê bêzar e û ew welatê xwe diterikînin û ber bi Anatolî yê terin. Îro Kurdistan bi destê hêzên dewletê li ber valakirinê ye.

Li Kurdistana Rojhilat jî rewşa gelê me ne baş e. Li Tehranê melayên desthilatdar ên kevneperest naxwazin ku gelê Kurd bigîhîje mafê xwe yî netewî, ji bona wê jî bi sala ne di Kurdistanê de xwîn dirijînin. Lê êrîş û harbûna dijmin vala ye. Gelê me îro ji her wextê zêtir şîyar e. Kesên ku ji bo azadî û rizgarîya welat xebitîne û di vê rê de xwe westandine tu caran nayne bîrakirin.

Serok Mistefa Barzanî yek ji wan kesane ku emrê xwe ji bo azadîya welatê xwe xebat û bi dijmin ra bi şer derbaz kir.

Lê wî Kurdistanek azad û serbixwe nedî.

Gelê me wê Kurdistanê rizgar bike û tola hemû şehîdên xwe bistîne.

Şehîdên azadîyê nemirin!

Bijî têkoşîna serok Barzanî!Bijî têkoşîna gelê Kurdistanê!

3.03.1990

Partîya Sosyalîst a Kurdistan

(PSK)

Liqê- Swêdê

**Ji Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê re**

Em kongra 13 emîn ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd, pîroz dikin û ji kar û xebatên kongrê re serkevtin dixwazin.

Hevalino,

Îro di welatê me de bûyerên girîng diqewimin. Di seranserê Kurdistanê de li himber gelê me barbarî û hovitî bi her cûreyî tê karanîn. Hîkûmeta Federalî ya Kurdistana Başûr bûye kelêmên çavê dewlêtên dijmin. Ew ketine nava tirseke mezin, ji bo hilweşandina vê kela azadîyê di nava xwe de planan çêdikin.

Ji xwe Saddamê xwînmij jî dest ji komplo û terorê nekişandîye. Hemû hêzên demoqratîk û polîtîk divê li hikûmata Kurda ya Federalî xwedî derkevin, ji xebat û têkoşîna wan ra piştgirîyê bikin da ku ew ji bo Kurdistaneke mezin bibe sengerê azadîyê.

Dewleta Îranê ya terorist di nava sê salên dawîn de du serokê Partîya Demoqrat a Îran û hin kadroyên hêja bi bextî kuştin. Li himber gelê me ya wê herêmê şerekî xwînî berdewam e. Lê ew bi wan kirinên xwe nikarin pêşîyê li tevgera Kurd bigirin.

Di Kurdistana Bakûr de kes ji dûweroja xwe ne bawer e.

T.C bi mana "şerê li dijî terorîzmê" rojê bi dehan welatparêzê Kurd qetil dike, bajar û gûndan vêran dike.

Ji bo teşhîr kirina, kirinên dijmin di hemû perçen de û girtina piştgirîya raya gel a welatên derva hewcedarîyek mezin e. Komele û organîzasyonên ku li derva ne, di binê berpirsîyarîyek giranda ne. Di wan xebatên giran bûha de rola Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd, jî ber bi çav e. Bawerî û pêşnîyarîya me ewe ku federasyona Kurd kar û xebatên xwe ya welatparêzî wê hîn xurttir bike û bimeşîne.

Serfirazî û serkevtina we daxwazîya me ye.

1993.02.27

Partîya Sosyalîst a Kurdistan (PSK)

Liqê – Swêdê

Kazim Budak

**Ji komîta bîranîna serok Barzanî ra**

Stockholm: 1993.03.05

Hevalên hêja,

Îsal 14 sale ku serokê nemir Mele Mistefa Barzanî ji nava me koç kirîye. Lê aşkereye ku ew tenê bi cismê xwe di nava me de nine, bi bîr û bawerîyên xwe bi xebat û têkoşîna xwe ew bû sembola berxwedana gelê Kurd û wê her bijî.

Mistefa Barzanî emrê xwe di şerê rizgarîya welat de derbazkir.

Di jîyana wî de gelek bûyerên bi rumet û hêja hene, ew ketine nava dîroka Kurdistanê û tu car nayne bîra kirin.

Ew bi pêşmergên xwe ve di damezrandina Mehabadê de başdar bû û piştgirîya gelê xwe kir. Heya dawîyê jî li hember dijmin şerkirin pêşniyara wî bû.

Wî di Kurdistana başûr de ji bo destxistina mafên netewî bi salan xebat û têkoşîn da.

Îro li ser bingeh û rêça ku wî danî bû, gelê Kurd xwe gîhande qonake nû. Dewleta xwe ya federalî îlan kir, rêva birina kar û barê xwe girt destê xwe.

Bi vê serkevtina han rihê hemû şehîdên Kurdistanê jî û yê Mistefa Barzanî jî wê şad bibe.

Di Kurdistana Başûr de gelê me her çiqas gavên mezin avitine jî di perçên din de, çi li Kurdistana Rojhilat, çi jî Kurdistana Bakur zordestî û zilma li ser gelê me roj bi roj zêtir dibe.

Îro tevgera gelê Kurd a Kurdistana Bakur li hember komplo û terora dewletê di rewşeke pir nexweş de ye.

Hêzên sîyasî bi hev ra, bi rêvabirina polîtîkake rast dikarin, pêşîyê li wê rewşa xirab bigirin. Ji bona wê jî divê, berî her tiştî em yekitîya xwe pêk bînin. Wê demê em dikarin welatê xwe rizgar bikin û dawîya hemû zilm û zordestîyê bînin.

Em carek din şehîdê mezin M. Mistefa Barzanî û hemû şehîdên Kurdistanê bi rêzdarî bibîr tînin û ji gelê xwe ra serkevtin dixwazin.

*Şehîdên azadîyê nemirin!*

*Gelê Kurd şehîdên xwe bîra nake!*

*Bijî gelê Kurd û Kurdistan!*

Partîya Sosyalîst a Kurdistan
(PSK) liqê- Swêdê

**Ji bo yekitîya rewşenbîrên welatparêzên Kurdistanê**

Stockholm: 1993.09.26

Bi sedan sale ku gelê Kurd ji bo şikandina nîrê koletîyê berxwe dide û bedêl dide. Îro jî bi sedhezaran hêzên çekdar, hêzên taybetî û qontrgerîlla li ser gelê me teror û qetlîama xwe didomîne. Ji yekû yek kuştinê bigire, heya jenosîdê hemû cûreyên kuştinê li ser gelê me dicêribîne. Bi destên hêzên bi dewletê ve girêdayî rojê dehan evladên gelê me tên kuştin, gund û bajarên me tên vêran kirin.

Dewleta Tirk li himber bûyeran xwe bê gûneh dide xûyakirin, kuştina welatparêzên Kurd dike ser "Hîzbullah"ê. Lê hemû kes dizane ku hîzbullah ji teref dewletêve hatîye damezrandin, çekdar kirin, ango ew dewlet bi xwe ye. Pelên terora

dewletê xwe digîhîjîne parlamenterên Kurd jî. Şehîtkirina parlementerê Partî ya Demoqrasî yê Mehmet Sincar îşareta vê yekê ye.

Şehîdên welatparêz Musa Anter jî, Mehmet Sincar jî şehîdên ne yekem ne jî yên dawîn bin. Gelê me ji bo bigîhîje azadîya xwe çiqas şehîd pêwîst be wê bide.

Em bi mîlyonan in, heke em berê xwe bidine dijmin ew nikarin zilm û zordarîya xwe bidomînin. Yekitîyek netewî tenê dikare dawîya zilma dijmin bîne û welat rizgar bike.

Em pê kêfxweşin ku partî û rêxistinên Kurdî ew rastîya[88] dîne û ji bo enîyek netewî hatine ba hev.

Xeleka girîng hatîye zeft kirin, wî dawî jî bê. Welatê me bê rizgarkirin tola hemû şehîdên me bê girtin. Em dizanin, xwîna şehîdên azadîyê vala naçe.

Duweroj gelê Kurd e!

Gelê Kurd şehîdên xwe bîra nake!

Şehîdên azadîyê nemirin!

Nuwênerîya Swêd a
Partîya Sosyalîst a Kurdistan
(PSK)

**Ji bo yekitîya niştimanî Kurdistan- liqê Swêdê**

Stockholm: 93.08.27

Em bi dil û can 18. Salîya Yekitîya Niştimanî Kurdistan (PUK) pîroz dikin. Bi salan e li Kurdistana Başûr hêzên welatparêz şerê azadîyê di din. Di wî şerî de gelek xwîn hate rijandin û şehît hate dayin. Di vê têkoşîna bi rûmet de Yekitî Niştimanî Kurdistan jî xwedî cîyekî taybet e. Lê em pê şane ku xwîna gelê me vala ne çûye. Îro Başûrê welatê me azad e, gelê me xwedî parlamento û hikûmat a Kurd e. Ew bi sazîyên netewî xwe îdare dike, duweroja xwe bi destê xwe ava dike.

Ew yeka di azadîya gelê Kurd de merhaleke bilind e. daxwaza me ev e ku, birayên me xebat û têkoşîna xwe xurttir bikin, sengerên heyî wenda nekin. Lê Seddamê qîlfirî bo ku îmkan nabîne nuha bê deng e, ew roja ku di xwe de quwet bibîne êrîşên xwe dîsa nûve bike.

Ji bona vê jî dive hêzên Kurd yekitî û dostayetî ya xwe xurttir bikin. Ji bona parastina gel û sazîyên heyî tedbîran bigirin.

[88] Di vir da protoqola ku nava A. Ocalan û K. Burkay da hate îmze kirin, piştî wê 12 tevgerên Kurd hatin ba hev tê qesitkirin

Dîsa kewandina birînan, avakirina gund û bajarên şewitî, pêş xistina çand û ziraetê xebat û fêdekarîyek xurt dixwaze. Lazime gelê me di şerê aborî de jî serkeve.

Dewleta federalî ji bo hemû perçên Kurdistanê sengerekî netewî ye. Diwê hemû kesên welatparêz li hikûmeta Kurd xwedî derkevin û wê biparêzin. Partîya me bi dil û can piştgirîya hikûmata federalî dike.

Rojên hatî ya gelê Kurd e.

Em carek din 18. Salîya Yekitî Niştimanî Kurdistan pîroz dikin û ji wan ra serkevtin dixwazin.

Bi slavên biratî yê.

Nuwênerîya Swêd a
Partîya Sosyalîst a Kurdistan
(PSK)

**Ji bo partî demoqrat a Kurdistan - liqê Swêdê**

Komara Mehabad ê 43 salan berê di meydana Çuwarçira de bi banga Qazî Muhammed hatîbû êlan kir in.

Wî di gotara xwe de weha got: *"Ey sembola heq û edaletê alarengîn li hember te soz didim ku heta mirinê ji bo yekbûna me û rakirina dubendîyê ji nava me wê bixebitim. Nuha ala me ya rengîn tenê di parçekî Kurdistanê de azad ba dide. Lê sibê vê di hemû perçen de ba bibe û zilmê û neheqîyê bi qewirîn e. bijî Kurdistanek mezin."*

Rastî jî Qadi Muhammed jîyana xwe ji bo azadîya welatê xwe da. 16 ê Çilê Pêşin 1947 de Komara Mehabadê bi xwînî hate hilweşandin û serok Qadi Muhammed û hin hevalên wî hatine şehîd kirin. Li ser gelê Kurd zilm û zordarîyên nû hat kirin.

Pir wext derbaz nebû tovên ku bi xwîna şehîdan hatin avdan bejn dan û li himber dijmin bûne senger. Îro jî gelê me ji bo mafên xwe yê netewî, ji bo azadîya xwe dijmin ra serî danayne û şer dike.

Dûr an jî nêz ve serkevtin ya gelê Kurd be!

Bijî Kurdistan a azad!

Bijî Qadi Muhammed û şehîdên Kurdistanê!

1989.02.11
Nuwênerîya Swêd a Partîya Sosyalîst a Kurdistan (PSK)

**Ji bo partî ya demoqrat gelî Kurdistan- Iraq**

Îro di hemû parçeyên kurdistanê de li ser gelê me zordarîyek mezin heye û tevgera azadîxwaz di merhaleke dijwar de derbaz dibe.

Xasima gelê me yê li Kurdistana Başûr di van salên dawî de bi zulm û barbarîyek mezin ra rû bi rû ma.

Piştî rawestina şerê navbera Iraq û Îranê dijmin bîna xwe girt û bi hemû hêza xwe ajot ser Kurdistanê. Seddamê xwînrij, ber çavê hemû cîhanê çekên kîmyevî bi kar anî. Hezaran mirov hate kuştin, sed hezaran kes jî mecbûr man xwe avitin nava sînorê dewletên din.

Di dîroka Kurdistanê de gelek rûpelên usa bi xwîn, qetlîam û talanan hene. Lê piştî van hemû bûyeran jî gelê me birînên xwe pêçaye û li dijî dijmin ji berê xurttir cîhê xwe gîrtîye. Îro jî gelê Kurd ji her demê zêtir hîşar e. Bîr û bawerîyên welatparêzî di nava refên gel de xwedî kok û rîçal e. Di hemû parçeyan de xwedî rêxistinên welatparêz û pêşverû ye. Gelê ku hîşar bû ji bo rizgarîya xwe ku ket rîya têkoşînê, zû an dereng wê bigîje azadîya xwe.Aşkere ye ku serkevtin bi yekitîya hêzên welatparêz û pêşverû va girêdayî ye. Ji ber vê yeka partîya me qîmetek pir mezin dide Cepha Kurdistan a Başûr û piştgirîya wê dike.

Ji kongra we ra slavên biratî rêdikin û di xebatên we de serkevtin dixwazin.

Bijî Azadîya Kurdistan!

11.12.1989<br>Partîya Sosyalîst a Kurdistan<br>Komîta Merkezî<br>Kazim Budak

**Piştî evqas xebat û zehmet, hepis û sirgun, diyarî jî ithamên usa bin?**

Di destpêka sala 2008 an de di malpera HPG (Hêzên Parastina Gel) de di derheqê sîyasetmedarê Kurd Îbrahîm Guçlu de nivîsek hate weşandin. Di wir de Ibrahîm wek ajanê dewleta kûr,(nivîskar bona ku zêde gunehbar bike ne tenê dewlet, dewleta kûr bi kar anîye. Ji ber ku dewlet legal e xefîf dimîne(!)) û bi têkildarîya jîtemê ve tê tawanbar kirin. Xwedîyê nivîsê Aram Masis, bang" ciwanên Welatparêz" dike ku dengê Îbrahîm bibirin. Hema destpêkê de bibêjim ku ew itham ji bona Îbrahîm Gûçlû neheqîke mezin e. Îbrahîm Gûçlû, dilgerm, xwedî moral û îdeal bû. Bi raman û fikrên xwe bi têkoşîn û xebata xwe ji bona azadîya gelê Kurd hewl dida. Piştî derba leşkerî ya 1980 li dervayî welat, li Sûrî, li Swêd xebat û çalakîyên me yên hevpar çêbûn. Îbrahîm tu wext di wan çalakîyan de xwe neda paş.

Çil sale ez Îbrahîm nas dikim. Lê dûre hin platform û çalakîyên mişterek de me hevûdu zêtir naskir.

Îbrahîm bi ramanê xwe, bi îdeal û moralê xwe û bi têkoşîna xwe ve welatparêzekî hêja ye.

Hemû jîyana xwe bona azadîya gelê xwe zîndan û sirgûnan derbaz kir. Nuha jî li Dîyarbekirê her roj di çalakî kê de cîh digire. Geh di desta megafon di kolanê

Dîyarbekirê de îmza kom dike, geh li Nusaybînê kirinin rejîma Baas a Sûrîyê protesto dike, geh çûyina leşkerê Tirkan ser sînor protesto dike, geh di TV Tirkan de bi camêrî pirsa Kurd û Kurdistanê minaqeşe dike. Piştî evqas xebat û zehmet, hepis û sirgun diyarî jî ithamên usa bin?

Lê bi kêfxwaşî dikarim bêjim ku gelê me qedîrşînas e, xebatkarên doza xwe nasdike.

Em dizanin Ibrahîm bi bîr û bawerîyên xwe ji PKK dûr e û wan rexne dike. Hin caran rexnên wî jî dikarin şaş bin û ji pîvanê jî derkevin. Lê dîsa jî mafê tu kesî tuneye ku bi vê metodê bersiv bide û wî bike hedefa hin xirabîyan.

Di naveroka gotinê de neheqî tehdît û prowakasîyonek eşkere heye. Gotinên ewqas giran lazime bi hin belgan bêne îsbatkirin. Usa nebe xwedîyê gotinê di binê îthamên xwe de bimîne û bifetise.

**PKK/KCK divê iddîayên ku di belavokê de hatiye nivîsîn lêbikole, xwedî lê derdikeve ya na eşkere bike. Di vê tevliheviyê de hezên tarî dikarin provakasîyonekê bikin.**

Sazî û dezgehên Kurd,welatparêzên Kurd li himberî hev divê di rexne û kirinên xwe de bi pîvan û bi însaf bin. Dost û dijminê xwe tevlihev nekin. Gotinên tûj, dijminane û bê bingeh me nêzî hev nake bîlakîs, ji hev dûr dixine. Gotin û rexnên me divê di nava welatparêzan de nakokî û dubendî yê kûrneke, nêzikbûn û yekitîyê re xizmet bike. Kesên ku cuda difikirin eger bi ajantîya dewletê ve bêne ithamkirin wê demê ajanê rastî xwe daha rehet vêdişêrin.


Îro neyar tank û topan bi teyeran, bi çekên kîmyevî sed hezaran leşker ve li hemberî gelê me şer dike. Her roj bi dehan xortên me têne kuştin.

Ne lazim e di rewşek usa de em bi hev ra dengekî netewî derxinin? Lê bê dîyologî û rexnên tûj, sîyaseta şaş di nava welatparêzan de dîwarên bilind afirandine.

Divê em demoqrasîyê hezbikin, hezim bikin û di nav xwe de bişuxulînin.

Em Kurd jî, mîna gelên din bi rîya diyalog û rexnê hevûdu fêm bikin bi rêbazên demoqratîk problemên nava xwe çareser bikin.

Sibat 2008-Stockholm



Türkiye Cümhuriyeti
Maarif Vekâleti
İlk Tahsili Bitirme Şahadetnamesi

Şehadetname № 5 / 21

Mektep № 234

| Adı | Hüseyin ağa gün ef. |
|---|---|
| Babasının adı | Mustafa ağa |
| Aile adı | Budo oğulları |
| Doğduğu yer | Merkez |
| Doğduğu yıl | 1331 |

| DERSLER | NOTLAR | DERSLER | NOTLAR | DERSLER | NOTLAR |
|---|---|---|---|---|---|
| Türkçe | iyi | Hesap - Hendese | iyi | Musiki | iyi |
| Tarih - Coğrafya | Ç. iyi | Resim - Elişi | iyi | Ev idaresi | |
| Tabiat - Eşya | Ç. iyi | Cimnastik | iyi | | |

GİDİŞ VE HAL Ç. iyi

Salı de Muhtelit İlkmektebinde tahsilini bitirerek geçirdiği imtihanda yukarda gösterilen dereceleri kazanmış olan Hüseyin ağa gün efendiye bu şehadetname 1930 yılı haziran ayının 10. Salı günü verilmiştir.

Sınıf Muallimi — Başmuallim — Maarif Müdürü

Tasdik olunur.

M. Kemal

Diploma Husên



Kekê Mistefa, Hîlmî Elçî û Kazim Budak Çolîg 14 gulan 1964



1962 li gundê Mirilê, tevî xwendevanên xwe ketime ber ava Muradê




Li ber çeme me, Gegîyê Bavê min Sileman Budak, Sileman Budak (torne meta mın) Bayram Budak, Kazim Budak û ya hemeza mın brayê mın Turgut Budak



Lı gundê Karê tevi hin heval û dostan. 1980 Dema ku lı mın dıhat gerandin.



Li Qamişlo yê 1981 Seydayê Keleş, Aladiin Înce û Kazim Budak



Nazif Kaleli û Kazim Budak, 1992, Şeqlawa




Kazım Budak, Reşît Hemo û Hemît Dewrêş, hin hevalên partiya Pêşverû li qamışloyê nîşana hevalekî 3 ê tebaxê 1983



Ehmed, Bedirxan, Dr Faik, Kazım Budak, Alaettin Ince, Ehmed û Fikri Budak



Li Stockholmê, nexaşxanê de ez û Nazliyê li ba Mistefa Budak, 10ê adara 1984an





Sedema mirina Mistefa Budak li Şamê, heval û hêzên dost vî bi bîr tînin-1984 (8) Hevalê Bedirxan ji Şamê da zanîn ku, bi minasebeta mirina hevrê Mustafa ser navê partîyê civînek darxistine. Dora 25 nunerên hêzên Kurd, Tirk, Ereb û Filistînî di ciwîna partîyê de amade bûne, bi peyîv û mesajan xemgînîya xwe anîne ziman.



Kemal Burkay, Şêx Îzzettîn Huseyîn û Kazim Budak di navbera konferansa Stockholmê de 1991 Saltsjö




Dîya mın Xatûn Budak ji Londonê hat Nyköping me li balafirgeha vir suretek girt. 1998



Ez û bavê xwe Silêmanê Bûdê, 1976



Bavê min malaxinê lêdike û apê min Hisên makînê badide.



Ez, dîya min Xatûn û keça min Ciran



Ciran, ez û Bermal



Ez û lavê min Bengîn û Zinar



Ez û Dersîm, zivistan li Stockholmê



Bejna û Bermal li Çolîgê, li ba bapîra xwe




Xatûna dîya min kordela-şirîta xanî dibire. Ji alî çepê Şadîye, Ez û Mîmarê me Zana Budak.




Yekê gulana 1988an de zarokên komela KOMKAR-Swêd komkujîya Helebce hat protesto kirin.


**Kazim Budak**

*Wek gelek kurdan tarixa ji dayîkbûna min jî nediyar e. Li gorî di nasnamê de hatîye nivisin 20ê çileya paşin, meha yekê sala 1944an da li Haysivê ji dayîk bûm e.*

*Warê me Haysiv mezrake şîrin a Dêrsimê ye. Navê xwe yê dûyem Mezra Bûdan e. Mezra me bi ax û avîyên xwe, dar û bexçên xwe ve gelek dewlemend bû.*

*Haysiv li qiraxa çemê Gêxîyê (Pêrê) ye û girêdayî Nehîya Moxindîyê ye.*

*Me rojên xwe yên havînê pir caran li ber wî çemî derbaz dikir.*

*Di xortanîya xwe da bûm endamê Partîya Sosyalîst a Kurdistanê. Wexta ku cunta fasîst li Tirkîyê dest da ser hukim derbazî Surî bûm. Ji wir di 1984an da jî çûm Swêdê. 23 salan di her qedemeyên PSKê da xebitîm.*

*Bi berxwadana hêzên welatparêz û pêşverû pelên zulmê şûnde wekişîyan. Piştî 24 salan şûnde 28 avrîl 2004an da vegerîyam welatê xwe.*

---

*From Haysiv to Stockholm*
*by Kazim Budak*

ISBN 978-91-86139-97-1